# SERDEMA NÛ YA ŞOREŞAN
# ŞOREŞA AZADIYA ROJAVAYÊ KURDISTANÊ

**PIRTÛKA SEYEMÎN**

# KOBANÊ-EFRÎN-HELEB

**MEHMET EMÎN MUTLU - ERSÎN ÇELÎK**

# NAVEROK


**PÊŞEK**
**DESTPÊK**
**BEŞA YEKEMİN: ÇIRÛSKA 19’Ê TIRMEHÊ KOBANÊ**
1-Ji Milê Civakî û Siyasî ve Kobanê
2-Xebat û Amadekariyên Şoreşê
3-Çirûska 19’ê Tirmehê
4-Piştî Şoreşê Li Kobanê Xebatên Avakirinê
**BEŞA DUYEMÎN: DESTANA SEDSALÊ BERXWEDANA KOBANÊ**
1-Di Salvegera Şoreşê de Êrîşên Cebhed El Nusra
2-Êrîşên 15’ê Îlonê yên DAIŞ’ê; Li Hemberî Tarîtiyê Şerê Rûmetê
3-Şerê Nava Bajêr
4-Rizgarkirina Kobanê
5-Rizgarkirina Gundan
6-Rizgarkirina Girêspî û Yekbûna Kobanê û Cizîrê
7-Pêvajoya Piştî Rizgarkirina Girêspî
8-Kobanê Bajarê Şehîdan e
**BEŞA SEYEMÎN: EFRÎN**
1-Beriya Şoreşê Rewşa Efrînê û Amadekariyên Şoreşê
2-Li Efrînê Şoreşa 19’ê Tirmehê
3-Li Efrîn’ê Xebatên Xweseriyê
4-Li Efrînê Xebatên Parastinê
**BEŞA ÇAREMÎN: HELEB**
1-Di Pengavên Ewil yên Şoreşê de Rewşa Heleb’ê
2-Li Helebê Wane û Taybetmendiyên Şerê Bajaran
3-Li Heleb’ê Êniya YPG-YPJ’ê
4-Li Helebê Bênavber Şerê 22 Rojan
**BEŞA PENCEMÎN: ENCAM Û PEYAM**

**PÊŞEK**

*Me di cîlda dawî ya pirtûkên xwe de jî xwest Kobanê, Efrîn û Helebê bigirin dest. Her çiqasî li ber şert û mercên şer, me nikarîbe em biçin Helebê jî, kesên dizanin ji me re gotin, "dîtin û fêmkirina Efrîn û Kobanê, têrê neke jî tê wateya dîtina Helebê jî." Bi rastî jî, her çiqasî her cihekî şoreşê em pir tesîr kiribin jî, tesîra Kobanê û Efrîn'ê pir cuda bû. Mirov dikşîne nava xwe; her axaftin, sûred, nêzikbûn, kar ji me re pir xwezayî hat. Weke ku em 30'î sale li wir jiyan dikin. Dibe ku hûn bibêjin her cihekî Kurdistanê dişibe hev, rast e; lê dîsa jî me li Kobanê û Efrînê çêjeke naye îfadekirin girt. Em herdu jî, fersendê careke din çûyinê digerin. Jixwe Heleb jî di dilê me wê her hesretek be…*

*Di derheqê Efrîn, Kobanê û Helebê de bi kûrtasî be jî em dixwazin hin agahiyan bidin. Jixwe di nava hevpeyvînên ku me kiriye de ji her alî ve tê destgirtin.*

*KOBANÊ; Kantona Kobanê di navbera Cezîrê û Efrînê de ye lê ji her duyan jî dûr e. Bi navê Şêxler û Sirîn, 2 navçeyên mezin û 300 gundê wê hene. Serhejmariya Kantona Kobanê bi koçberên şer ve ji 300 hezarî zêdetir e. Dikeve hemberî Pirsûs a Rihaya Bakurê Kurdistanê. Kanton piraniya xwe Kurd in. Li hindek gund û navçeyan gelê Ereb jî dijî. Li rojhilatê Kobanê Girêspî û li rojavayê wê jî Cerablûs heye. Ev Kantona Rojava jî ji aliyê ser erd û bin erd ve gelekî dewlemend e. Bi taybetî jî ji aliyê genim, ceh, nîsk, nok, pembû, kuncî û îsot ve berhemdar e.*

*Wekî din gelê Kobanê di kolana bîrên avê de jî bi nav û deng in. Makîneyên bi navê "Hefara", ne tenê li Kobanê lê li piraniya deverên Kurdistanê li ser kar in. Kobanê ya ku nêzîkî çemê Firat e, ava xwe bi kolana bîran peyde dike. Li Kobanê di aliyê civakî de eşîretên kevnare hene û yek ji wan jî bi rengekî konfederasyon eşîra Berazî ye. Ji hêla din ve Kantona Kobanê jî dîrokî ye. Li çiyayê Miştenûr gelek cihên dîrokî hene ku yek ji wan Şikefta Qîzikan e.*

*EFRÎN; Kantona ku li rojavayê Rojavayê Kurdistanê ye. Şeş navçeyên xwe yên bi navê Cindirêsê, Mabata, Reco, Bilbilê, Şiyê û Şera hene. 365 gundê wê hene û li gor hindek nêrînan ji bo her roja salekê gundek hatiye ava kirin. Efrîn bi hemû navçe û gundên xwe ve Kurd in. Li navenda bajarê Efrînê hejmareke kêm ji gelê Ereb hene. Wekî din li navçeya Mabata Kurdên Elewî û li derdora Qestel Cindo û çend gundê din ku nêzîkî Ezazê ne, Kurdên Êzîdî dijîn. Piraniya Efrîniyan di heman demê de li Helebê jî xwedî mal in. Lê ji ber ku taxên weke Eşrefiyê û Şêx Meqsud yên Helebê ku piraniya nişteciyê xwe Kurd in, ji şer bandoreke neyînî ya mezin dîtin, berê xwe dane Efrînê. Ji ber vê yekê jî serhejmariya Efrînê ku berê nêzîkî nîv mîlyon bû, niha li derdorê 700 an jî 800 hezarî ye. Di Efrînê de şopa eşîra zêde xuya nake û eger gotin di cî de be Kantona Efrînê di aliye civaknasî de "Kurmanc" e. Efrîn bi çanda xwe ve di Kurdistanê de xweser e û di aliyê dîrokî de kevnare ye. Li Efrînê, li gelek navçeyan berhemên dîrokî yên Hurî û Romayiyan hene. Ya herî bi nav û deng Kela Hûriyan e. Ji hêla din ve dema Efrîn tê gotin zeytûn tê bîra mirov. Dema mirov ji bilindahî li Efrînê dinêre baxên zeytûnan yên ku darê xwe rêz bi rêz in wek dîmeneke xweşik xuya dike. Berhema zeytûnan ya Suriyê ji zêdehî ya Efrînê ye. Ji bilî zeytûnan gelek cûreyên fêkî û keskahî jî tê hilberîn.*

*HELEB; Bajarekî mozaîkan e. Hemû gel û baweriyên ku li Sûriyê jiyan dikin, li Helebê jî hene. Her çiqasî paytexta Sûriyê Şam be jî, ji aliyê mozaîkbûyina gelan û tîcaretê ve paytext Heleb e. Her wiha di dîrokê de jî, ji gelek dewlet û împaratoriyan re malevanî kiriye. Li vî bajarî nêzikî 500 hezar Kurd jî jiyan dikin. Her çiqasî piraniya wan, di ew sedsala dawî de ji Efrîn û Kobanê koçberî Helebê bûbûn jî, Kurdên ku bi sedsalan li wê derê dijîn jî hene. Bi taybetî hê di dema Selehadîn Eyûbî de, piraniya rayederên dewletê û malbatên pêş yên Helebê Kurd bûne. Tevgera Azadiya Kurdistanê jî, bi çûyina birêz Ocalan ya Sûriye ve, li vî bajarî gelek xebat pêş xistine. Heya dema şoreşa dawî jî saziyên ku hatine avakirin, xwe li ser piyan girtine. Bi taybetî taxa Şêxmaqsûd û Eşrefiyê, weke taxên Kurdan tên zanîn û di destpêka şoreşê de jî, Kurdên li vir dijîn rêveberî û parastina xwe pêş xistin û tevî hemû êrîşan ev herêm hê jî di bin serweriya YPG-YPJ'ê de ye. Berxwedana gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê didome.*

**DESTPÊK**

*Di hemû hevpeyvînên ku di nava van pirtûkên me de cih digirin de, heqîqetek tê jiyîn; Şoreşa Rojava ya hemû Kurdistanê ye. Bi taybetî jî, gelê Bakur bi can û dil xwedî li vê şoreşê xwedî derket. Di dema berxwedana Kobanê de jî, di destpêkê de Pirsûs (Suruç), hemû bajarên Bakurê Kurdistanê berxwedaneke pir mezin nîşan dan. Kobanê û Pirsûs bûn yek. Ji ber vê yekê me xwest em di destpêka ev pirtûka xwe de cih bidin vê mijarê. Me ji kesekî ku di dema berxwedana Kobanê de, li ser sînor kar kiriye û bi gotina wî li ser xetê tevlî berxwedana Kobanê û Pirsûsê bûye, ango Zinar Suruç ev nivîsa destpêkê xwest. Zinar Suruç demeke dirêj, di zindanên Tirkiye de maye. Dema ji zindanê derdikeve berxwedana Kobanê jî hêdî bi hêdî destpê dike. Ew jî weke peywîreke xwe ya şoreşgeriyê tevlî berxwedana Kobanê dibe. Her çiqasî yekser di nava şer de cih negre jî, weke gelek rêhevalên xwe yên dîtir, li ser sînorê Kobanê û Pirsûsê karên cur bi cur yên şoreşê re mijûl dibe.*

*Piştî komkûjiya Kobaniyê ku di nava bajêr de çêbûye, êdî ew jî nikare xwe bigre û derbasî Kobanê dibe û cihên cudayên Rojavayê Kurdistanê di nava xebatên şoreşê de cih digre. Ji ber vê me xwest, ew destpêka vê pirtûkê binivisîne.*

**Serxet û Binxet**

Li Kobaniyê şerekî dîrokî rû da. Lê ev tenê ne şerê Kobaniyê bû, şere çar parçeyên Kurdistanê bû. Bi taybet gelê Bakurê Kurdistanê ji 7 salî heta 70 salî seferberî îlan kiribû. Dizanîbû ku ev şer tenê ne şerê parçeyekî yan jî navçeyekê ye. Dema êrîşa çeteyên DAIŞ'ê li hember Kobaniyê dest pê kir, hemû welatparêzên li Bakurê Kurdistanê kargeh, mal û zarokên xwe berdan û li ser sînor kom bûn. Dibe ku bi awayekî fizikî li Bakur bûn, lê dil û mejiyê wan timî li Kobaniyê bû. Vegotina wan rojan ne hêsan e. Em dizanin ku hewce ye têkildarî vê berxwedanê bi hezaran roman û pirtûk bên nivîsandin, fedayîtiya her hevalekê/î mijara bi cildan pirtûk in. Ev şer ji bo gelê Bakur jî ne hêsan bû, xwişk û birayên wan ên bi wan re xwedî heman ziman û çandê bûn, di nav têkoşîna hebûn û tunebûnê de bûn. Ev xak û gelê pîroz ê ku dijmin berî niha bi salan di navbera wan de têl kişand mirovên ji heman malbatê û xizm bûn ji hev qutkirin, bi gotina 'Tu binxetî yî' (aliyê jêra sînor), 'Tu serxetî yî' (aliyê jora sînor), ji hev cuda dikirin, dikirin xerîbên hev, di nav zor û zehmetiyan de bû. Yekane kesên wê xwe spartibana wan gelê Bakur bû. Çeteyên DAIŞ'ê destpêkê ji aliyê Cerablûs ve dest bi êrîşê kirin. Me jî qeraxa Firatê li gundê Ziyaret û Aşme konên piştgiriyê vedan. Hêviya gel ew bû ku wê Çemê Firat ê pîroz ji vê hovîtiyê re bêje, 'rawest e' lê wê rojê Firat xemgîn bû, bêdeng bû, hêza karibe bibe asteng di xwe de nedidît.

Gelek kesan hêviyên xwe bi hêzên derve ve girê dabûn, wê hê jî hêzeke xwedî wijdan derkeve û dê ji vê hovîtiyê re bêje raweste. Wê di dîrokê de cara yekemîn hatibana alîkariyê bidin Kurdan, lê bendewariyeke vala bû. Cîhan ker û kor bibû. Ji qîrîn û hawarên dayik, zarok û gelekî re guhên xwe girtibûn. Ji bo wan jixwe em gelekî tuneyîbûn. Me li wir ew baş fêm kir, ji derveyî hêza xwe kesekî em pê bawer bin tunebû. Şevekê saet nêzî 12.00'an çeteyên DAIŞ'ê bi tank, top û çekên giran dest bi êrîşan kirin. Hevalan bi keleşan nêzî 8 saetan li ber xwe dan. Gel bi êşa nikare tiştekî bike, zêde tehemûl nekir. Nîvê şevê têl hatin qutkirin û ciwanan xwe li têlan dan. Dayik û îxtiyar bi çavên tijî rondik, dûa dikirin û dirûşm qîr dikirin. Sibehê saet nêzî 08.00'an hevalan agahî şandin û gotin, "Heval em pir tî bûne, avê ji me re bînin." Gel tavilê ket nav tevgerê. Lê li pêşiya wan astengiyek hebû, leşkerên Tirk û têlên sînor. Gel ber bi sînor ve meşiya, di destên wan de bîdonên avê û bi torbeyên nan. Dema leşkeran biryardariya gel dîtin neçar man wan berdin. Mirovan xwe ji ser têlan re avêtin û xwe gihandin hevalan. Dayikan bi tilîlî û dirûşman di nav şadiya ku karîbûn tiştekî bikin de bûn.

Roja dîtir dijmin ew hezm nekir û sibehê saet 04.00-05.00 bi awayekî hovîtî êrîşî konên me kir. Em hemû di xew de hatibûn girtin. Me xwe kom kir û em ketin nav berxwedanê, lê heman kêliyê çeteyên DAIŞ'ê, li aliyê din ê sînor jî êrîşî hevalan kirin. Ji sedî sed bi peyman her duyan jî pêkve dest bi êrîşê kiribûn. Wê rojê li her du aliyan berxwedaneke mezin hebû. Li hemberî bombeyên gazê û ava şid berxwedana bi keviran zehmet bû. Yek jî ji ber çeteyên em gulebaran dikirin û girê li pêşberî me ket, em xemgîn û bêmoral bûn. Dijmin konên me û gelek wesayîtên me şewitandin. Gir jî ketibû û tu maneyeke ku em li wir mabana nemabû. Me jî berxwedana xwe neqlî gundê Etmanekê ku li pêşberî Kobaniyê kir. Me yê li wir 19'ê Tîrmehê roja azadiya Rojava pîroz kiriba. Wê rojê ew der bibû mîna cihê cejnê. Ji her aliyê Bakurê Kurdistanê mirov ji bo tevlî coşa vê cejnê bibin diherikîn vir. Cejn

hebû, cejna Kurdistanê. Me wê rojê biryar girtibû, çi biba bila biba me yê têlên ku emperyalîstan kiribûn navbera me parçe kiribana. Me amadekariyên xwe li gor wê kiribûn. Di pîrozbahiyê de em têra xwe nêzî têlan bûn. Me yê têl qut kiribana û wê ciwan derbas bibûna, yanî hevalên ku karîbana şer bikin. Me têl qut kirin û em li wir sekinîn da ku ji bilî ciwanan kes derbas nebe. Bêguman tiştekî xerîb rû da, leşkerekî Komara Tirkiyeyê (KT)'ê bang dikir û digot, "Hûn çawa ciwan in, xaka we ji dest we diçe, çima hûn naçin şer?" Paşê berê xwe da leşkerê li cem û got, "Berde bila biçin, jixwe wê DAIŞ hemûyan bikuje, em ê jî ji wan xelas bibin."

Armanca wan ew bû ku Kurdan û di şexsê Kurdan de Tevgera Azadiyê li wir îmha bikin. Me têl qut kirin, bi sedan ciwan derbas bûn. Me dît ku yên ne ciwan jî derbas dibin. Me hewl da em wan asteng bikin. Dayikek hat, 65-70 salî bû. Min destûr neda. Min jê re got, "Dayê tu nikarî derbas bibî, tenê ciwan derbas dibin. Ew jî diçin şer. Li wir şerekî dijwar heye. Eger tu niha biçî tê ji hevalan re bibî asteng." Ji min re got, "Kurê min, ji bo em wan têlên di navbera me de ji holê rakin, ew qasî sekinîn. Ev xeyalên bav û kalên me û yên me bûn. Tu îro ji min re dibêjî, tu nikarî derbas bibî. Tu hêz nikare min asteng bike, berde ez biçim." Min dît dayik bê pêlav e, çavên wê tijî rondik in. Eger min ew bernedaba min ê xiyanet li xeyalên wê kiribana û wê ew xeyalên ku heta niha taloq kirine wê bi cih nehatibana. Min ê jî timî êşa wê kişandiba. Min got, "Derbas bibe dayê, derbas bibe. Jixwe tu hêz nikarin li hember vê xwesteka te bisekine. Ez jî nikarim bisekinim" û ez paşde vekişiyam. Dema min ew rewşa gelê Bakur dît, baweriya min a bi serketinê hê xurttir bû. Li pêşberî îradeya tevgereke xwedî gel û dayikên wer tu hêz nikarin bisekinin, nesekinîn jî. Rojane dehan bûyerên bi vî rengî diqewimîn.

Ew ruhê seferbertiyê yê di pêvajoya wî şerî de ku di ruh û mejiyê min de bi cih bûye, heta hetayê ez nikarim ji bîr bikim. Dema çeteyên DAIŞ'ê êrîşî Kobanî kirin, gelê li wir ji bo Şengaleke duyemîn rû nede, xwe li têlan dan û derbasî aliyê Bakur bûn. Hemû gel ket nav seferberiyê. Ji bo gelê tê em ji wir derxin em ketibûn nav hewldanan, lê têkildarî mijara wê gelê Bakur wan çawa pêşwazî bikin em bi fikar bûn. Gelo wê gelê Bakur û Pirsûsê li vî gelî xwedî derketiba? Lê bi qasî ku em jî şaş bimînin gelê Pirsûsê ne tenê malên xwe, dilê xwe jî ji vî gelî re vekir. Bêguman mirovên bêwijdan ên hewl dan wan bimêtin, bixapînin jî derketin. Lê pir kêm bûn. Ew xwedîderketina gel mirov hestyar dikir.

Me piştî li gundê Ziyaretê, li gundê Etmanek jî kon vedan. Wê berxwedana me li wir dewam kiriba. Leşkerên KT'ê li gundê Etmanek jî êrîşî me kirin û konên me şewitandin. Lê me yê pes nekiriba, wan dişewitand, me yeka nû vedida. Di wan rojan de çend bûyer hatin serê min ku her tên bîra min çavên min tijî rondik dibin, hestyar dibim û nizanim ez ê çawa bînim zimên. Dema gel hatibû bi kincên xwe yên li ser xwe hatibûn. Di lingên hinekan de pêlav jî tunebûn. Me ji bo wê kampanyayên alîkariyê dan destpêkirin, her kes ketibû nav seferberiyê. Ez rojekê çûm mala welaparezekî. Ji min re got, "Heval ez jî dixwazim alîkariyê bidim." Min jêre got, "Rewşa te ya madî ne baş e." Got, "Na heval em ê îdare bikin." Min dît pêlavên di lingên zarokên xwe de derxist, kir poşetekê. Min meraq kir û jêre got, "Heval te ew pêlav dan min, lê ma pêlavên zarokên te hene?" Got, "Tiştek nabe heval, bila zarokên min mehekê ji malê dernekevin. Dema min meaşê xwe wergirt ez ê ji wan re bikirim. Tu cihekî ku mirovên me yên ji ber şer koçber bûne xwe bispêrinê nîn e. Îro ji zarokên min zêdetir pêdiviya wan pê heye." Dema min got, "Nabe." Got, "Eger tu wernegirî, tê dilê min bişkînî. Xwezî ji wê zêdetir min karîba ez tiştekî bikim." Wî hevalî jî mîna hemû mirovên welatparêz û xwedî wijdan hewl dida wezîfeya xwe bîne cih.

Ew heval her roj piştî kar dihat ziyareta konên me yên li gundê Misenter û Measerê. Ji ber ev der ji bo me cihê nû yê berxwedan û piştgiriyê bû. Hemû gelê welaparêz dihat wir. Û nêzî 8 mehan li wir nobet hat girtin. Çavên her kesî li ser Kobaniyê bû. Her ku dengê top, tank û çekan dihat, te digot qey di dilê gel de diteqin. Çavên xwe ji wir qut nedikirin. Bi sirûdan me dest bi rojê dikir, xelek dihat çêkirin û dirûşm dihatin gotin. Bi dengekî bilind dirûşm digotin da ku deng bigihêje hevalên di çeperan de şer dikin, zanibin ne bi tenê ne û moral werbigirin. Li wir tevahiya 8 mehan heta Kobanî hat rizgarkirin, gel zarok û malên xwe hiştin û li ser sînor man. Gel carinan xemgîn dibû, bi taybet dema dijmin êrîşên berfireh pêk dianî, dema di rojên dawî de rewşa şer di aliyê me de pêş ket û heval pêşde diçûn jî pir kêfxweş dibûn. Hemû jiyan û hestên wan girêdayî hevalên li qada şer bû. Te digot qey dilê wan bi wan re lê dide. Ji derveyî şer û berxwedanê tu rojeveke wan tunebû. Hemû jiyana wan ew der bû. Ji ber kesên li wir şer dikirin ne xerîb bûn, hemû jî zarokên wan bûn. Yan xwişk û birayên wan an jî xizmên wan bûn. Ya herî girîng jî fedayiyên ku axa wan a pîroz diparastin. Li wir tenê parçeyek xak nehadihat parastin. Dizanîbûn ku li wir li hemberî hovîtiyekê şeref û rûmeta gelekî tê parastin. Bêguman di wê pêvajoyê de ne tenê gelê Kurd mirovên çepgir, sosyalîst, demokrat û xwedî wijdan jî li wir bûn. Wijdanê hinekan ji wan zêde tehemûlî wê hovîtiyê nedikir, li şûna bi awayekî bêçare li wir sekinîbina xwe li têlan didan û di nav refên berxwedanê de cihê xwe digirtin.

Ez dixwazim behsa bûyereke din a di tevahiya jiyana xwe de ez ê ji bîr nekim bikim. Rojekê bi alîkariya KT'ê çeteyên DAIŞ'ê êrîşî deriyê sînor ê Kobanî kirin. Derî di destê kê de bûya hakimiyet wê ya wan bûya. Jixwe tenê derî di destê me de mabû. Di derî de bombe hat teqandin û rewşa Kobanî ketibû xeteriyê. Em di nav gumanan de bûn. Tu çareyeke me nemabû. Me di hoparlora şaredarî û mizgeftê de bang kir û me got: "Îro roja şeref û namûsê ye. Kobanî di rewşeke xeter de ye. Bila gelê me ber bi sînor ve bimeşe. Em nikarin hevrêyên xwe tenê bihêlin." Di

carekê de gel bû lehî û ber bi sînor ve meşiya. Li Pirsûsê nêzî 40-50 hezar mirov ketin ser rêyan. Hinek jî bi wesayîtan ketin ser rêyan. Dema ez di rê de dimeşiyan tiştek li ber çavên min ket. Mirovekî îxtiyar ku nêzî 70 salî bû, bi bivirê di destê xwe de bi lez dimeşiya. Min pir meraq kir. Ez gihiştim cem û min jêre got: "Apo tu wer diçî ku derê?" Li min zivirî û got, "Kurê min ez diçim Kobanî. Îro ji bo Kurdan roja namûs û şerefê ye. Ez ê jî biçim şer." Min got, "Apo qisûrê efû bike, ez tiştekî bêjim, min meraq kir, ez bivirê li ser milê te ji bo çi ye?" Got, "Kurê min ew çeka min e. Ew li cem min heye, ez ê axa xwe bi vê biparêzim." Min got, "Apo ma mirov dikare bi vê li hember tank û topan şer bike?" Got, "Kurê min eger her kesî li gor hêz û derfeta xwe, xwe tevlî vî şerê 40 salan kiriba, Kurdan îro ew êş nedidît. Welatê me nedibû çar parçe." Ez sekinîm û fikirîm.

Belê wî apê îxtiyar rast digot. Eger me hemûyan li gor hêza xwe, bi awayekî rast tevkarî kiriba wê Kurdistan nebûba çar parçe, wê Rêberê me îro ne di nav çar dîwaran de bûya û tu hêzan wê nikarîba çav berdabana xaka me. Wê rewşa li Kobanî rû nedaba û me yê bi hezaran şehîd nedaba. Wê ew êş jî rû nedabana. Belê apo te wezîfeya xwe anî cih. Li Bakur gelek welatparêzan di wê pêvajoyê de bi awayekî layiq wezîfeya xwe anîn cih. Bi taybet di serhildanên 6-8'ê Cotmehê de bûn tirsa xewnên zilamê ku digot, "Kobanê ha ket ha dikeve." Gel bêyî bikeve xema mirinê herikî kolanan. Bi dehan şehîd dan. Lê destûr nedan Kobanî bikeve û nehiştin dijmin di xaka me ya pîroz de bi cih bibe. Ev berxwedan li Kobanî bû sedema hêz, moral û serketinê. Ruhê yekîtiya neteweyî hat wergirtin. Li derdora Kobanî bûn çembera berxwedanê. Heya roja dawî ya şer, heta dijmin ji ser xaka me hat avêtin gel bi ruhê berxwedanê di nav serhildanan de bû.

Lehengên mezin ên vî şerî hebûn. Hinekan ji wan di çeperan de şer kirin û bûn fedayî. Hinek ji wan li Bakur jiyan û pêşeroja xwe tenê bi serketinê ve kilîd kirin û têde bûn xwedî roleke mezin. Ew qas lehengên bênav hene ku li Pirsûsê bi zanebûna wezîfeya li ser milên xwe tevgeriyan. Pirsûs eniya paş a Kobanî bû û haya wan ji vê hebû. Eger Kobanî ketiba wê Pirsûs jî ketiba. Wê mirovatiyê winda kiriba. Lewma timî bi wê hestyariyê nêz bûn. Di serketina Kobanî de ked û tevkariyeke mezin a gelê Bakur çêbû.

Roja ku Kobanî ji dijmin hat paqijkirin tê bîra min. Ew kêfxweşî çawa tê vegotin ez nizanim. Hê jî dema ew roj tê bîra min çavên min tijî rondik dibin û ez hestyar dibim. Dema ferq û cudatiya di navbera roja ku Kobanî hat dagirkirin û roja hat azadkirin de tê hişê min ez dibêjim gelo ma xewnek bû. Dema gel cara yekemîn dihat, hezin û xemgîniya di çavên wan de û roja Kobanî azad bû, kêfxweşiya wan tê bîra min. Lê tiştekî ku nehatibû guhertin hebû, yek jê rondikên xemgîniyê yek jî rondikên kêfxweşî û şadiyê bû.

Me agahî wergirtibû, me agahiya ku dê wê rojê Kobanî ji çeteyan bê paqijkirin girtibû. Heta me agahiya misoger wernegirtiba me yê agahî nedaba gel. Lê tiştekî ku me hesabê wê nekiribû hebû. Kesên zarokên wan li wir şer dikirin, ji me zêdetir xwedî agahî bûn. Tu nabêjî wan jî agahî wergirtibû, saet nêzî 8-9'ê êvarî ji kampên derdorê û Pirsûsê dengê dirûşm û tilîliyan bilind bû. Em hema derketin derve mirov bi coşa cejnê herikîbûn kolanan, di destên wan de fîşekên hewayî û li ser zimanê wan qîrînên serketinê bi dirûşmên, "Bijî berxwedana Kobanî, Kobanî azad bû" û "Em bi ser ketin, bi berxwedanê em bi ser ketin" erd û asîman dihejandin. Em tavilê derketin kolanan. Me ji gel re got, "Me hê agahiyeke misoger wernegirtiye, vê şevê hûn çima derketine kolanan?" Lê kesî em guhdar nedikirin. Ji 7 salî heta 70 salî mirov li derve bûn. Mîna ku ditirsiyan dê ew xewnek be, lê ne xewn bû agahiya serketinê bû.

Di carekê de her kes ket ser rêyan, di destê wan de wêneyên zarokên wan ên şehîd, bi dirûşm û çavên tijî rondik. Mîna lehiyekê herikîn kolanan. Li Pirsûsê hewayeke cejnê hebû. Lê di wê kêliyê de tiştekî bala min kişand, hema her kesî hevdu hembêz dikir û digiriyan. Cara yekemîn rondikên şadiyê ji çavên gelê Kurd dihatin xwarê. Ji ber gelên bindest bi ser ketibûn. Ev gelê ku bi mehan bi hêviyekê çavên xwe ji Kobanî qut nedikirin, carinan xemgîn dibûn, carinan digiriyan û lanet li qedera xerab dibarand, ev şadî heq kiribû. Lê di dilê me de tirsek hebû. Ew mirovê ku gotibû, "Kobanî ha dikeve, ha wê bikeve" niha di qesra xwe de xewn lê herimîbû û dîn bibû. Em ditirsiyan ku dê vê serketinê hezm neke, wê çeteyên xwe bişîne ser gel û zerarê bide wan. Em jî tavilê ketin rê, me agahî da hemû hevalan. Me got ku bila her kes bi hev re derkeve, pêkve tevbigere da ku dema neyêniyek rû bide em karibin mudaxele bikin. Me nikarîbû em gel asteng bikin, êdî wext bû ku êşa bi mehan di dilê xwe de veşartiye derxe derve. Tu hêz nikarîbû li hember vî gelî sekinîba. Gelek mirov ji ber kêfxweşiyê bê pêlav derketibûn derve. Hemû ketibûn ser rêya Kobanî û dimeşiyan.

Me ji wan re got: "Hevalno bisekinin, hûn vê şevê diçin ku derê?" Çavên hemûyan tijî rondik, em hembêz dikirin û digotin, "Em jî nizanin. Kobanî azad bû. Em êdî azad in." Bi şev saet nêzî 22.00'an gel careke din ber bi sînor ve meşiya da ku kêfxweşiya xwe bi hevrêyên xwe yên binxetê re parve bikin. Heta sibehê fîşekên hewayî hatin teqandin.

**Zinar SURUÇ**

## BEŞA YEKEMÎN

## ÇIRÛSKA ŞOREŞA 19’Ê TIRMEHÊ: KOBANÊ

### 1-Ji Milê Civakî û Siyasî Ve Kobanê

***-Şoreşa 19’ê Tirmehê li Kobanê destpê kir. Ev taybetmendiyên ku li Kobanê şoreş dan çêkirin çibûn?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Di destpêkê de li Kobanê, rewşa rejîma Suriyê bi tevayî sîstemê xwe, saziyên xwe yên dewletê hemû di cihê xwe de bûn. Lê belê pir quwetek wisa mezin tune bû. Bi tenê hinek baregehên wan, asayişên wan, hepsên wan hîn di cihê xwe de bûn. Saziyên sivîl yên bûrokratîk û sazîyên leşkerî hebûn. Di dema destpêka şoreşê de, bandora xwe hê li ser civakê pir bû. Hê jî civak di bin bandora rejimê de bû. Gel li beramberî rejîmê hê jî tirs jiyan dikir.

Ji bo wê hê jî zû bi zû cesaret nedikirin weke welatên gelê Ereb rabin û şoreşê bikin. Dest danîna li ser sazî û rêxistinên dewletê de pir bi xof nêz dibûn. hê jî hesab ji dewletê dikirin. Tabî dewletê bi salan li wir bandora xwe dabû avakirin. Çendî bi giştî li Rojavayê Kurdistanê bandora rejîma BAAS zêde jî bû, li Kobanê hîn zêdetir bû. Di hemû hêlan de bi salan civak xistibû bin tesîra xwe. di hêla Kurdîtiyê ve tenê civak bi pîrozkirina Newrozê ve sînordar hiştibûn, di wir de jî kuştin, binçavkirin didan meşandin.

Foto-1

Di Rojava de Tevgera Azadiyê û Serokatiyê demên dirêj xebat meşandibûn, li rexmê vê xebatê jî bandorek zêde ya rejîma Sûriye li ser gel hebû. Tirsek mezin li ser civakê dabû çêkirin. Kesên behsa Kurd û Kurdîtiyê dikirin hemû digirtin û di zindanan de bûn û ji îşkenceyan re derbas dikirin. Gerek ti kes qala Kurd û Kurdîtiyê nekira. Bi taybetî çawa sîstemên deshilat li ser Kurdistanê bandora xwe çêkirîbûn, li Kobanê ji rewşek wisa hatibû jiyankirin.

Dema ku ev pêvajo li welatên Ereban pêş diket, me texmîn dikir wê bikeve Kurdistanê jî. Ji ber ku dewletê li gelek bajarên Ereban rewatî û hakimiyeta xwe winda kiribû. Rejîmê ji gelek bajaran xwe şûn ve dikişand. Di vê rewşê de civak fetisandinek jiyan dikir. Di Kurdistanê de jî, li Kobanê di rewşek bi vî awayî bû. Di warê aborî de birçîbûn û tunebûn dihate jiyankirin. Jixwe dewletê di salên kevin de ew bajar ji çavê xwe derxistibû. Tû navendên ku civak tê de debara xwe bike nehatibûn çêkirin. Weke şîrket, koperatîf, kargeh, lawirvanî ku civak pê aborîya xwe pêk bîne nehatibûn çêkirin.

Di bajarê Kobanê de hemû rêkên aborî yên ku civak pê debara xwe bike hatibûn qedexekirin. Li Kobanê tişta herî zêde Kobaniyan pê debara xwe dikir sondajên bîran bûn, dewletê ew jî qedexe kiribûn. Ji bo wê rewşa civakê di vî warî de fetisandinek jiyan dikir. Tenê civak bi xebatên rojane û mehane ve sînordar kirîbû û diçûn li cihên weke Şam, Heleb û bajarên Ereban kar dikirin. Di hundirê herêmê bi xwe de kar ji bo civakê tine bû, bi qismî heger çandiniya erdê hebe jî pir sînordar bû. Heger xwedî erd jî bin, serê malbatê parçeyek erdê biçûk hebû. Bi vî parçê biçûk jî civakê nedikarî debara xwe bike.

Di warê exlaq de rejîmê civak parçe kirîbû. Hemû tiştên xirab di nava civakê de pêş xistibûn. Taybet bi riya îstixbaratê, ewlehiya hawayî, ewlehiya siyasî; sîxûrtî di civakê de dabû avakirin. Li ser ciwanan di warê exlaq de, xirabûn pêşxistibûn. Şixûlandina esrar, heb, heşîş û heyinên hişbir, di nav civakê de belav kiribûn. Di van karan de kesên ku kar bikin hatibûn amede kirin, berpisyarî dabûn pir insanan ji bona van tiştan di nava civakê de bidin kirin.

Dîsa di warê jinan de xirabûn hebû. Ji bo ku jinê weke milkekê bikire-bifiroşe û di fûhûşê de bi kar bîne şebeke ava kirîbûn. Dema ku me dest danî ser hinek saziyên dewletê, belgeyên bi vî awayî ketin destê me. Kesên ku di van şebekan de kar kirine, navê wan ketin destê me, mehane mûçeya wan çi ye, hemû ketin destê me. Me dît ku rejîmê rewşek pir qirêj li ser civakê daye avakirin.

Lê belê rûxme hemuyan, taybatmendiyên Kurdîtî hê jî di herêmê de xurt bûn.  Bi taybetî keda ku serokati ya ku 20 salan li wir daye, bi xwe re bingeheke civakbûnê ava kiribû.

Di vir de li milek dewlet û ji milê din ve jî sistêma axatiyê pir hakim bû. Di şexsê hin derdoran de pergala axatiyê pêş ketibû û dewlet ji bo hîn zêdetir civakê belav bike ev derdor bikar anîbûn. Ji bo vê di herêmê de *“dozên xwînê, dozên erd û dozên jinan”* ji demeke pir dirêj ve dewam dikirin û heya pêvajoya şorêşê ket rojevê hîn jî dewam dikir.

Tabî van texribatan bi xwe re pir bandorên neyînî dan avakirin, tim di nava civakê de pevçûn û li hevnekirin hebû, di eşîran de şer derdiketin, di nav qebîle û gundan de timî hevdû dikuştin û bi vî awayî parçebûn di nava civakê de dabû avakirin. Beramberî vê jî tebeqeyek ya hevkar di nava reîs eşîran de dabûn avakirin. Ev hemû jî bi xwe re li ser civakê dibûn zext û gef.

Bajarekî weke Kobanê wisa lêhatibû her roj hev û din dikuştin. Di bajar de jî bikaranîna madeyên hişbir pir zêdebû, ji bo wê civakê rihet nedikarî tevbigere û parçebûn jiyan dikir. Jixwe piştî 2004'an xebatên Apogerî jî hatibûn sekinandin û pir sînordar bibûn. Ev jî bandorek neyînî li ser gel çêdikir. Gel di bin pêkanînên pergalê de dima.

Ji ber îtifaqa di navbera Tirkiyê û Suriyê de, dema kesên Apoger digirtin teslîmî Tirkiyê dikirin, ji bo wê xebat zêde nedihat meşandin. Vê valatiyê rejîmê baş kar anîbû, çi xwestibû di civakê de dabû avakirin. Bi tû awayî nehêlabû pêşkeftin di Kobanê de çêbibin. Ger malekê xaniyêkî du qatî lêkiriba qata duyan yê dewletê bû û diket xezîna dewletê. Di bajêr de tenê firinek hebû û ava bajar jî ji bajarên Ereban dihat. Elektirîka bajar heman awayî bû, ji Tişrîn dihat, arê bajar ji bajarê Minbicê dihat.

Bi vî awayî tiştê bingehîn yê jiyana civakê di bin kontrola dewletê de dihat. Jixwe Kobanê weke xeleke ye. Ji aliyê Bakur ve Tirkiye hidûd e, ji hêla Rojhilat ve Til Ebyat, li hêla Başûr ve bajarê Sirînê heye. Ji hêla Rojava ve jî Şêxlera jorîn, Şêxlera jêrîn û Cerablûs heye. Weke xelekekê tevayî derdora xwe ji hêla Ereban ve di demên kevin de hatibû dorpêçkirin. Tevî her tiştî jî Kobanê cihekî ku di demên kevin de jî timî li ber xwe daye. Ti caran serî li ber dewletê netewandiye. Di demên herî zêde dewletê zext kirîn, civakê li ber xwe daye.

Kembera Ereban gava ku li Cizîrê despê dike heya Girêspî diçe, bi hidûd re xeteke. Ev kember di sala 62 yan de çêdibe. Di wê demê de Kurdan şer kiriye û nehiştine Kembera Ereban bigihije ava Firatê. Di hedefa Ereban de ew hebû ku vê kemberê bigihînin Cerablûsê, lê Kurdan nehêla ye.

Foto-2

***-Beriya ku em derbasî nirxandinên şoreşê bibin, li Kobanê sosyolojiyeke çawa hebû?***

**DILDAR KOBANÊ:** Mirov dikare bêje li Kobanê civakbûneke yekreng heye. Li wir olên cûda tine ne. Dibe ku ew cihên din yên ku Kobanê ve girêdayîne, hin kesên olên cûda ve girêdayî hebin. Lê hebin jî bi awayekî eşkere nedikarîn nasnameya xwe ya olî bînin ziman. Lewra wisa hejmareke zêde tine ye. Li aliyê Ferat, hinek gundên Ereban hebûn. Ji aliyê sînorên Kobanê ve, li hinek cihan wisa Kurd û Ereb di nava hev de bûn. Ji aliyê Girêspî Kurd û Ereb di nava hev de bûn. Li Cerablûs, Kurd kêm bûn, nêzî 200 malî Kurd hebûn. Li Minbicê ji ser 230'î re malbatên Kurd hebûn, li gundên wê jî 3 gundên Kurdan hebûn. Li Reqa behsa 400 malên Kurdan dikirin.

Weke erdnîgarî, li Kobanê av tineye. Jixwe vê meseleyê hiştiye ku navê Kobaniyan bi sondajan bên naskirin. Ji ber tunebûna avê pir sondaj lêdidan. Ew hefareyên xwe ji Sûdanê bigre heya Hîndîstanê belav kirine. Ango Kobaniyî li kû bin, hefareyên wan jî hene. Ciwanên Kobanê jî piranî li derva ne. Hem karê hefareyan dikin, hem jî karê hesin dikin. Ew kare hesin yê li Rojhilata Navîn di destê Kobaniyan de ye. Hata gelekên wan weke marqa navê xwe li ser xistine. Wê zihabûnê hiştiye ku bikevin lêgerîneke û wisa li her derê bîr kolane. Di meseleya hesin de jî zîrek in. Firat li ber wan re derbas dibe, lê dewletê av nedaye wan. Ji Reqayê heya Şamê av biriye, lê nedaye Kobanê. Cihê ku daye jî, daye gundên Ereban.

Axa Kobanê pir zêde ye. Erdnîgariya wê jî deşt e, lê weke Cizîrê ne deşt e, di nav de girik hene. Rojavayê wê Firat e, aliyê Bakur sînorên Tirkiye ne, aliyê rojhilat Girêspî heye, ji aliyê başûrê rojhilat ve jî Sirîn heye.

Foto-3

Civaka Kobanê eşîr in. Weke Kêtikan û Baraziyan. Di nava xwe de jî dibin çend bavik. Ew eşîr li Bakur jî hene. Jixwe piraniya xizmên wan li Pirsûsê ne. Ji ber vê ji Kobanê rê dibêjin "*deşta Sûrûcê*" jî.

Navê Kobanê jî, ji kompanî (company) tê. Kompanî peyveke Îngîlîzî ye, tê wateya şîrket. Dema ku riya trenê çêdikin, ji wir şîrket heye û bi vê ev der tên naskirin. Ev bi nav kirin heta niha te, hinek diguhere û dibe Kobanê. Ji aliyê ziman ve jî pir pêşketî bû. Li bajarên din yên Rojava û Bakur gelek peyvên Tirkî û Erebî hene, lê li Kobanê hemû peyv Kurdî ne. Yên ku ne Kurdî bin jî, zivirandine Kurdî.

Xeynî wê gelek edetên wan hene. Mesela dema ku kuştinek çêbibe, ef û sûlh tineye. Di kuştinê de jî yê muxatap ne kesê ku ew kuştin pêk anî ye. Di wê eşîrê de kî pêş be û kî zîrek be, diçin û wî dikujin. Hata hinek bûyer çil sal bere hatine jiyîn, lê piştî çil salan ji bo wê bûyerê kesan dikujin. Zû bi zû qaneh nabin. Di navbera xwe de bi nakokî ne, lê li hemberî derva yekbûnek jî heye.

Gelek çanda Kurdîniya kevnar jî li Kobanê hene, lê vê dawiyê dewletê pir xirab kiriye. Piranî jî di mijarên exleqî de pê lîstiye. Bi taybetî heşîş xistiye nav. Araq, xûmar, fûhûş, faîz û hwd pir pêşketibûn. Bi taybetî piştî serhildana 2004'an dewletê ev tişt pir pêş xistibûn. Mesela hinekan bi faîz pere didan gel, pişt re diçûn û dest didan ser her tiştê wan. Xûmar û araq jî wisa bû.

Di nava civakeke wisa feodal de, pêşketina tiştên wisa dibû sedem ku di nava civakê de nakokî zêde bibin. Wisa dibû ku bi hev re mijûl dibûn û hev û din dikuştin. Dewletê jî zêdetir her du alî bera hev didan. Pirsgirek hal nedikir, da ku pişt re dîsa bi hev bikevin. Bi van nakokiyan deshilatdariya xwe xurt dikir. Hem îşkence wan dikir, hem dest dida ser milk û malê wan. Bi vî awayî hem vîn dişkena, hem deshilatdariya xwe xurt dikir. Bi kevirekî çend çuk dikuştin.

Li Kobanê welatparêziyeke pir xurt jî heye. Lê ew tirs û xofa dewletê, vîna wan şikenandibû. Jixwe xebatên tevgera azadiyê jî hebûn û Serokatî cara ewil ji wir re derbasî Rojavayê Kurdistan û Sûriyeyê bibû. Li Kobanê yê dijmin dijmin e; dost jî yekser dost e. Li hêremên din ne wisa bû. Li Kobanê di navberê de mayin tine ye.

Partiyên din jî li wir hebûn. Partiyên din yên qaşo Kurd, her çiqas hinekên wan weke ku YNK'ê ve girêdayî bên dîtin jî, piraniya wan bi PDK'ê ve girêdayî ye. Felsefeya wan ya bingehîn jî dijbertiya me ye. Dixwazin me ji holê rakin. Siyaseta wan hemû li ser esasê reşkirina me bû. Bi reşkirina me xwe ser lingan digirtin. Bi vê yekê nedixwestin ku gel bi me re bikeve têkiliyan. Lewra dema ku em bi kê re diketin têkiliyan me digirt aliyê xwe, me rêxistin dikir.

***-Tiştê ku Kobanê, ji herêmên dîtir yên Rojava cuda dikir çi bû?***

**ÎSA KOBANÊ:** Li gorî Kantona Cizîrê û Efrînê, taybetmendiyeke Kantona Kobanê heye. Derketina Rêber Apo ji Bakur û çûyina Rojhilata Navîn li ser Kobanê re çêbûye. Demeke li Kobanê maye, naskirina Kobaniyan ya Rêber Apo heye. Ji 79'an heya roja me, li Kobanê naskirin û dîtina Rêber Apo û tevgera PKK çêbûbû. Ew avantajek bû, ji milê çanda Kurdîniyeke azad li vê derê weke tov hatibû çandin. Ji milê welatparêziyê ve, rewşa heyî mirov dikare weke bingehekê binirxîne. Jixwe hê jî li her maleke Kobanê şopên Serokatî hene. Mesela li gelek malên Kobanê kevokên Rêber Apo û çilêkên wan hene.

Rewşa civakî ya Kobanê jî, hinek ji kantonên me yên din cudatir e. Berê gelê me yê Kobanê tenê li ser zîreatê debara xwe dikirin. Piştî salên 1960'an bi çêkirina bendevan, êdî av û kaniyên Kobanê jî dimiçiqin û êdî zîreat debara wan nake, pêwîstiyên wan pêk nayne. Ji ber vê piştî wê demê, derketina derva her roj li Kobanê zêde dibe. Hemwelatiyên Kobanê, ji Şam û Helebê bigre heya Siûdî, Lûbnan, Yemen, Fasê  çûne û li wan deran kar kirine. Debara xwe piranî bi karên derva kirine. Li ser vê esasê debara xwe kirine û jiyana xwe dane meşandin.

Di demsalên bihar û havînê de li derva kar kirine û zivistan jî li Kobanê derbas kirine. Bi vî rengî jiyaneke aborî çêbûye. Ew dezavantajek e. Ji bo pergaleke mayinde û her berdewam bike, pirsgirek çêdibin. Mirovên xwedî çawanî û têgihîştî ku bikaribin pergalê bidin meşandin, ji ber vê dezavantajê tengav dibûn.

Li Kobanê xwendekarî kêm bû. Li ser esasê têkiliyên Sûriye û Rûsya, çûyin û li dewletên girêdayî Sowyetê xwendin di astekê de heye. Bi taybetî bijîjkên ku li Kobanê kar dikirin, hemûyan li Rûsya xwendiye.

Li Kobanê bingehek hebû. Ji ber ku civakek eşîrî bû û girtîbûnek hebû, ji ber ku giştî Kurd bûn û bi gelên dîtir re têkiliyeke xurt nehatibû danîn, xwe esas girtinek hebû. Di dema şoreşê de jî ji ber ku wan hêzên din yên mûxalîf re pir têkilî nehatibûn danîn, rêxistin û pergala xwe esas hatibû girtin. Li ser vê bingehê, kar û xebateke rê ve biribûn û têkoşînek meşandibûn. Bi vî rengî asteke giştî ya rêxistinî çêbûbû.

Ji ber ku hemû Kurd bûn, bandora rejîmê û mûxalîfên Sûriye pir zêde li ser Kobanê tine bû. Lê tesîra van partiyên din ku li ser navê Kurdbûnê tevdigerin li Kobanê hebû, lê dîsa yên herî bi bandor û rista xwe dîlîstin yên Apoger bûn. Piraniya welatparêz û kesên zane li derdora tevgera me kom dibûn. Em dikarin bibêjin ji sedî 85'ê Kobanê li gel me bû. Li ser vê esasê xebat û rêxistinbûnên me pêş diketin.

***-Nêzikatiyên gelê Kobanê, li hemberî şoreşgeran çawa bûn?***

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Kobanê, bajarekî mirov tê de Kurdayetî, welatparêzî, girêdana Serokatî û şehîdan didît bû. Taybetmendiyên welatparêziyê ji berê ve li Kobanê hebûn, lê bi çavên xwe dîtin li ser mirov bandoreke cuda çêdikir. Hevalên ji Kobanê yên di nava Tevgerê de jî van hestan diteyisînin, lê dema ku mirov di nav de jiyan dike hesteke cuda diafirîne. Min bi xwe pir zêde ji gelê Kobanê hez kir. Wan jî bi taybetî li hemberî YPG û YPJ'ê ew hezkirin didan diyarkirin. Mirov li hemberî wan nêzikatiyan hîs dikir ku tu zarokê wî gelî yî. Mesela li Kobanê mirov tu caran xwe bi tenê hîs nake, lewra hemû malbat weke malbatên te nêzik dibin. Hemû dayik, dayikên te ne; hemû bav, bavên te ne; hemû zarok weke xwişk û birayên te ne. Tu jî wisa li wan meyze dikî, ew jî wisa li te meyze dikin.

Ji ber ku Serokatî di destpêkê de hatibû Kobanê, welatparêziyeke wisa hatibû afirandin. Ji ber van nêzikatiyan, tevî ku ez demeke kurt jî li wir mam, lê ji bo min pir bi wate bû. Gel ti caran tu bi tenê nedihêlişt. Her li cem te bûn. Vê yekê çavkaniya xwe ji çi digirt? Pêwîstiyeke şoreşê hebû, pêwîstiya pêşengan hebû, êdî ew jin be, an jî zilam be pir ne girîng bû. Min wisa dît. Ji ber vê yekê gelê Kobanê li ser min pir bandor kir. Bêguman hin nêzikatiyên feodal hebûn, lê ji bo şoreşê her tiştê xwe dikirin qûrban. Ji ber ku hinek fêmkirina Serokatî û rêxistinê jî hebû, civakeke welatparêz bû ku xwe dida hezkirin û xwe dixist dilê mirov.

**2-Xebat û Amadekariyên Şoreşê**

***-Beriya şoreşê li Kobanê rewş çi bû, kîjan amadekarî hatin kirin?***

**DILDAR KOBANÊ:** Di sala 2011’an de, xebatên ji nû ve rêxistinkirinê pêş diketin. Hinek heval li wir hebûn û qederek xebat meşandibûn û em jî tevlî van xebatan bûn. Destpêkê dewlet serwer bû, îhtimala girtina me hebû, ji ber vê me bi tevdîr hereket dikir. Lê peleke şoreşê hebû, li ser vê esasê perspektîf hebûn. Divê me xwe bi vê şoreşê re amade bikira û bi awayekî lezgîn gel amade bikira. Da ku gel bikaribe xwe li ser lingan bigre.

Bi vê perspektîfê û bi vî rihî me dest bi xebatan meclîs û komînan kir. Di demekê kin de meclîsên bajêr, saziyên civaka sîvîl hatin avakirin. Dervayî civînên endam û rêveberiyê, di 8 mehan de me nêzikî 900 civînên gel li Kobanê darxistin. Li gund û bajaran civîn dihatin darxistin.

Lê Kobanê ne weke bajarên din yên Rojava bû, dewlet bi awayekî taybet li ser Kobanê lîstibû. Li Cizîrê siyaseteke cûda dabû meşandin, li Kobanê siyasetek cûda dabû meşandin. Mesela karê faîzê ku li Kobanê dihat kirin, li tu cihan tine bû. Gelek kesan dest dabûn ser malê gel. Gelek pirsgirekên exleqî ku bi vî rengî ne hebûn.

Ew qesa sal dewletê pirsgirekeke wan çareser nekiribû. Çawa ku serweriya dewletê sist bû, em şev û roj nesekinîn û me dest avêt pirsgirekên 80 salî. Hem komek xebatkarên ku di rêveberiya bajêr de cih digrin, hem jî hevalên din, nedisekinîn. Ez bawer nakim ku hevalek seatekê bêhn dabe. Mesela hevalek hebû, nexweş bû. Bi seroma destê xwe diçû xebatan. Hemû gel jî şahîdê vê ye.

Di destpêkê de tirsek hebû. Mesela rojekê ji van gundên aliyê Sirînê telefonek hat. Gotin, “*heval dewlet hatiye û hemû hefarê me biriye.*” Mî jî got, qey 100-200 leşker çûye. Nêzî 15-16 hefereyan kom kiribûn. Me got “*çend leşker hatibûn*” Got, “*dû şirte.*” Ango ew Kobaniya ku ew qesa ber xwe dide, serî radike; dû şirte leşker diçin û 15 hefereyên wan kom dikin. Lê tirsek wisa ketiye dilê wan ku nikarin dengê xwe derbixin.

Dîsa ji bo dibistanan ez dikarim mînakekê bidim. Jixwe di destpêkê de min karê ziman, çand û malbatên şehîdan dikir. Ew qesa xaniyên vala hebûn, me dixwest em bikin dibistan û malên gel. Lê tû kesî cih nedida. Dema ku me di serî de xaniyek girt jî, yekî xirabe bû û xwediyê wê pîrek bû. Lê me got, tiştek nabe, bes bila ew tirs bê şikandin. Lewra dijmin gel çavtirsandî kiribû û vîna wan şikenandibû. Te digot çi, wan digot “*lê dewlet...*” Piştî wê dibistanê, me li cihekî din navenda çandê vekir. Hêdî hêdî wisa saziyên me hatin avakirin.

Pişt re me meclîsên bajêr ava kirin. Meclîs jî bi hilbijartina sandiqan me ava kirin. Komîn jî me bi civînan ava kirin. Mesela me bajar kir neh parça, ew neh parçe jî di navbera xwe de kir deh parça û me li wan kolanan civîn darxistin. Di civînan de, me di serî de rista meclîs û komînan ji milet re digot, heya donzdeh komîteyên ku di nava meclîsan de cih digrin me yek bi yek pênase dikirin. Li ser vî esasî yên ku dixwestin di nav de cih bigrin, me dikirin lîsteyê û em diçûn hilbijartinê. Bi vî awayî me meclîs û komîn ava dikirin.

Di her meclîsekê de teqez komîteya sûlhê û komîteya parastinê hebû. Komîteya sûlhê bi pirsgirekên civakî re mijûl dibû. Komîteya parastinê jî herî kêm 120 endamên xwe hebûn. Ji wan heft kes berpirsyar bûn. Di destpêkê de xeynî vê me nedikarî em ji civakê û pirsgirekên wê re bibin bersiv. Di nava bajêr de nêzikî 2 hezar endamên parastinê çêbûn. Çekên wan jî hebûn.

Êdî li her şeş kolanan, heya sibê dewriye digeriya. Sedema vê jî; yek, divê me mantiqê parastina cewherî di milet de ava bikira. Du, divê me bingeha hêza parastinê ku bê avakirin amade bikira. Armanca me ew bû. Jixwe perspektîfa rêxistinê jî ew bû, divê her mesclîs û komînekê hêzên xwe yên parastinê hebûna.

Di destpêkê de yên ku di komîteyên parastinê de cihê xwe digirtin zilam bûn. Di xebatên din de jî, li Kobanê di destpêkê de jin derxistina pêş pir zor bû. Heya ku me bi xort û keç komek 17 kesan ava kir, me pir zehmetî kişandin. Kesî jin tevlî vî karî nedikirin. Ji bo hemû ciwanan ew hebû, lê ciwanên jin zêdetir diparastin. Her wiha tirsa ji dewletê jî hebû, digotin ger ew qîzik bên girtin em ê rezîl bibin.

Di meseleya parastinê de; ne ku tu tenê li hemberî êrîşên derva xwe biparêzê; di hûndir bi xwe de jî tevlîhevî pir hebûn. Yek dewletê tevlîhev dikir; îstîxbarata dewletê hebû, çend malbatên ku dewletê jî dewletir hebûn. Malbatên Ereb bûn. Dema ku dewletê dengê xwe dernedixist jî van malbatan bertek raber dikirin. Komên serxweş hebûn, yên araq vedixwarin hebûn. Ber her ciwanekî re çentî hebûn. Tiştekî weke şûran e, lê kêmek nerm e. Dema

me meclîs ava kirin, me bîryar girt ku em wan çentiyan rakin. Lê me hemû meclîs û gel tevlê kirin. Tenê meclîseke me di taxa xwe de 700 çentiyen di taxa xwe de kom kir.

Birayekî hevalekî şehîd ew çentî di nava kolanê de parçe parçe kiribûn. Ji wan serxweş û berdoşên êvaran digeriyan, milet ditirsiya. Ji bo ewlekariya milet; ji bo hem bawerî bidê gel û hem jî tevdîrên xwe bigrin, divê li hemberî bûyerên wisa me bîryar bigirtana. Jixwe dibêtiya êrîşa dewletê her hebû, divê em jî her bi tevdîr bana.

Mesela meclîseke me hebû, dewletê rojekê di ser wan de girtibû û sê endamên meclîsa me biribûn. Me nêzî hezar kesî endamên parastinê yên çekdarî kom kirin û me ji dewletê re xeber rekir, me got "*heya du seatan berdidin bila berdin, an na ew dizanin.*" Ji tirsan re hema endamên me berdan. Vê ji gel re wêrekiyek çêkir. Careke din serokê meclîsa me ya Kaniya Mûrşîdê ku di dema şer de heya dawî di destê me de maye hebû, me xeber girt ku dewlet dixwaze li ser wî operasyonê bike. Me nêzî dusid kesên çekdar kirin taxê. Bi çend maşîneyên bi doçqa yên dewletê hatin û li dora taxê zivirîn, zivîrîn, lê newêriyan bikevin taxê. Wisa gel careke din wêrek bû.

Di destpêkê de yekîneyên veşartî hebûn. Xebatên meclîsan vekirîbûn. Lê xebatên parastinê veşartî bûn. Yekîneyên biçûk di malan de xwe rêxistin dikirin. Divê kesî nizanîbiya û tiştek çêbû bikaribin parastina gel bikin. Wê demê gefên DAIŞ'ê tine bûn. Tevdîrên me li hemberî rejîmê, an jî hêzên ku dixwazin werin cihê wê bûn. Yek jî li hemberî Tirkiye me tevdîr digirtin. Rêveberiya Kobanê li ser vê esasê nîqaşên xwe dimeşandin û li ser vê esasê tevdîrên xwe digirtin. Di destpêkê de tû xetereyên din tune bûn. Lê li hemberî her îhtimalan jî hevalan hêzên parastinê xurt dikirin.

Tiştên balkeş jî çêdibûn. Mesela dema ku me Dibistana Mamoste Sebrî vekir, roja paştir partiyên din meş darxistin. Di megefonan de tîqa tîqa wan bû û bi me dikenin. Digotin, *"em li pêy Kurdistanê ne; ew jî ketine pêy sazî û nizam çi."* Henekên xwe bi me dikirin. Di meşa xwe de jî dirûşmaya "ketina rejîmê" dianîn ziman. Dixwazin rejîm hilweşe. Lê cihê rejîmê dê çi têkeve ne diyar bû. Tiştên ku bilind dikirin jî alên Arteşa Azad bûn. Rengekî Kurdîniyê tine bû.

Di destpêkê de em pir ketin zehmetiyê, me nedikarî gel baş qana bikin. Van derdoran jî propagandaya, "*van alîgirên Beşar in*" dikirin. Digotin, *"pêşiya şoreşê asteng in."* Vê tesîreke mezin jî li ser gelê me dikir. Jixwe plan û perspektîfa me şoreş bû. Lê em ne amadebûn ku xwe biavêjin macerayekê û berê rejîmê bidin xwe. Divê me xwe rêxistin bikira û dema ku dem û cihê wê hat, em biketana tevgerê. Heya ku me gel rêxistin nekiriba, saziyên xwe ava nekirana û parastina xwe xurt nekira rabûna serhildanê pir ne bi wata bû.

Ger rejîm biçûya jî, tiştek holê tunebe dê tûyê çi bikê? Di cihekî wisa de, îhtîmala ku derfet bizivirin dijşoreşê her hebûn. Jixwe ew derdor jî pêlîstokên opozîsyon, PDK û Tirkiye bûn. Dixwestin me tehrîk bikin û hêza şoreşê bişkînin. Hema weke serhildana Şêx Seîd dikirin bînin serê me. Me jî her hefte meş dardixistin, lê me digot "*em ê di pratîkê de rejîmê hilweşînin.*" Divê me bingeha wê ava bikira. Rejîmê jî digot, "*yên xetere ne ew partiyên din in. Xetereya esas ew kesên ku ji bin ve xwe rêxistin dikin in.*"

Ew rewş heya ku me rêxistinên xwe ava kirin û parastina xwe xurt kir, berdewam kir. Dema ku em amade bûn jî divê hemû bajarên din yên Rojava amadebana û bîryareke giştî ya rêxistinê hebûya. An na tenê serê xwe Kobanê nedibû. Lewra tu siyaseteke giştî dimeşînê. Piştî ku her sê kanton û cihên dîtir amade bûn û bi bîryareke giştî rizgarkirina bajaran ket rojevê, me gel re got hûn dikarin ew dirûşmaya "*bila rejîm birûxe*" biavêjin. Wê demê gel rewş fêm kir û ji kêfan dikirin bifirin.

Piştî ku me zemînek ava kir, em gihêştin wê astê. Lê dema ku wan partiyên din yên Kurd meşên girseyî li darxistin. Şandayeke wan çûbû Başûr û rayedarên PDK'ê re rûniştibûn. Digotin, "*hûn alîkariya madî bidin me, dê em ê di sê mehan de Apogeran li Kobanê tine bikin.*" Wê demê pereyekî mezin jî girtibûn û bi sedama wan parayan jî bi hev ketibûn. Yek kuştin jî. Nakokiyek wisa jî di navbera wan de çêbû. Lê piştî ku me amadekariyên xwe xilas kirin û meşên girseyî darxistin, êdî meşên wan kêm bûn û girseya wan nedima. Weke ku tu derziyekê li balonekê bixê; dema ku girseya me ji nav derket, hûndirê meşên wan jî valabûn. Lê her tevlîhevî derdixistin.

Di du-sê mehan de me tenê li nava bajêr neh meclîs û gelek komîn avakirin. Meclîsên bajaran li ser esasên taxan bûn. Her wiha li her gundekî jî meclîsek dihat avakirin. Zêdetirî çarsid gundî hebûn. Piştî wê meclîsa giştî ya Kobanê hate avakirin û herî dawî jî meclîsa giştî ya Rojava hate avakirin. Em ji jêr ve dihatin, me ji gund û kolanan destpê kir. Lê ji ber ku hinek rewşên siyasî hebûn, meclîsa giştî ya Rojava ji jor ve hate avakirin. Ew rêxistin jî hemû li ser navê TEV-DEM'ê dihatin avakirin.

Komîteya parastinê jî di her meclîsekê de dihat avakirin. Li gund û bajaran kuderê meclîs hebûna di heman demê de komîteyên xwe yên parastinê jî hebûn. Ew xebat, dervayî hêzên leşkerî dihatin kirin; hêzên leşkerî jî yekîneyên xwe cûda avadikirin, karê xwe cûda dimeşandin.

Di sala destpêkê de me sê dibistan li Kobanê vekiribûn. Lê heya şoreşê me li gundan jî dibistan û navendên çandê ava kirin. Jixwe dibistanên me yên ewil, li ser esasê amadekirina mamostayan bûn. Pişt re heval ketin medreseyan û li wir dersên xwe dan. Pêwîstî nema ku em dibistanên cûda vekin.

Di merheleya destpêkê de, me gelek sazî ava kirin. Ji esnafan bigre heya tûcaran, me beş bi beş rêxistin dikirin. Bi meclîsan re, lê dervayî meclîsan xwe rêxistin dikirin. Her saziyekê jî şaxên wan hebûn. Mesela saziyên zêrîngeran hebûn, di nava saziya tûcaran de jî cihê xwe digirtin. Berdevkên her saziyê jî di nava meclîsa bajêr de cihê xwe digirtin.

Foto-4

Di hemû meclîsan de me hevserokî pêş xistibû. Li cihên dîtir, di destpêkê de ew pergal pêş neketibû. Lê Kobanê hemû meclîs bi hevserokan dihatin rêvebirin. Meclîsa bajêr jî wisa bû, meclîsên taxan jî wisa bûn. Meclîsa bajêr jî bi nûnerên meclîsa kolanan û bi nûnerên meclîsa taxan pêk dihat. Meclîsên taxan jî ji nûnerên meclîsên gundan pêk dihatin. Gund dihatin gel hev û meclîsên taxan ava dikirin. Xeynî vê nûnerên saziyên weke jin, ciwan, çand, ziman û malbata şehîdan di nava meclîsê de cihê xwe digirtin.

Ew sazî hemû ji destpêkê ve hatibûn ava kirin. Weke bîna cihê wan tunebû, lê weke sazî hatibûn avakirin û xebatên xwe dimeşandin. Berê jî bingehek hebû, lê êdî xwe yekser bi pergal kirin. Bi vî awayî nûnerên van saziyan û rêveberiyên meclîsan di nava meclîsa bajêr de cihê xwe digirtin. Jixwe van saziyan jî hemûyan di nava xwe de şaxên xwe û saziyên cûdatir dihewandin. Ev meclîs li ser esasê xweseriya demokratîk û konfedaralîzma demokratîk hatibûn ava kirin. Di vê çarçoveyê de bername û rêziknameyên wan jî hatibûn ava kirin.

Cihê bîryaran gel bi xwe bû. Mesela li kolanê pirsgirekek hebe, komîna wê kolanê ew pirsgirek çareser dikir. Pirsgirekek pevçûnê ba, pirsgirekek sûlhî ba; bêyî ku ji komîna meclîsan re derbas nebe, cihekî din nedikarî dest bidê. Hem lijneya giştî ya sulhî hebû, hem jî her meclîsekê lijneyeke xwe ya sûlhê hebû. Heya ku doz ji lijneya kolanê derbas nebe, nediçû lijneya giştî ya sûlhê. Carna lijneyên kolanan ji lijneyên din yên kolanan jî alîkarî dixwestin.

Wê demê Girêspî, Cerablûs, Minbic û Reqa jî bi Kobanê ve girêdayî bûn. 180 meclîs bi Kobanê ve girêdayî bûn. Lê hemû hevalên ku xebat dimeşandin 18 heb bûn. Yên leşkerî jî di nav de. Her wiha her hevalek jî bi qada xwe re mijûl dibû. Mesela xebatkarê ciwanan bi qada xwe ve mijûl dibû, xebatkarê çandê bi qada xwe ve mijûl dibû.

***-Nêzikbûnên gel di wê demê de çawa bûn? Tevlêbûneke çalak hebû?***

Gel di destpêkê de ditirsiya, lê pişt re pir germ nêzik dibû. Mesela dema ku me meclîsa yekemîn ava kir, me pir zehmetî kişandin. Civîna destpêkê nêzî 40-50 kesî tevlê bûbû. Piştî wê me hinek kolanan jî civîn çêkirin. Kesî xwe nedida ber ku bikeve meclîsan. Meclîsa destpêkê qederek dema me jî xwar. Lê meclîsên din ne wisa bûn. Me bi îqnayê endam didîtin ku em tevlî hilbijartinê bikin. Divê ji bo her meclîsekê 31 endam hebûna, ji bo hilbijartinê jî divê qet nebe 40 namzed hebin ku em biçin hilbijartinê. Mal bi mal em digeriyan û me qana dikirin.

Dema ku me lîsteya endaman diyar kir, qiyamet rabû. Gotin "*dê ew lîste di înternetan de were belavkirin, dê me bigrin û hwd.*" Em dikarin bibêjin meclîsa destpêkê me bi darê zorê meşand. Lewra em neçarbûn wisa bikin. Lê dema ku yek hat avakirin û tiştek nebû, êdî tirs jî şikest. Dema ku me dixwest em bînayan bigrin jî, welatparêzên me wisa bi tirs nêzik dibûn û bînayên xwe yên vala nedidan me.

Bi taybetî piştî serhildana 2004'an dewletê tirsek wisa xistibû nava gel û vîna gel şikestî bû. Ew gelê berê ku hatiye rêxistinkirin nemabû.

Endamên meclîsa me ya yekemîn, xwe vedişartin û nediwêrîn ji kolanan re bimeşin. Partiyên din jî di serê gel de nakokî çêdikirin. Pişt re hêdî hêdî îqna bûn, lê heya ew bîryara meşên ku em tê de dirûşmeya "*bila rejîm birûxe"* diavêjin, hê jî di serê gel de nakokî hebûn. Wê demê jî me şîroveya rewşe kir, me got êdî em dikarin xwe li ser piyan bigrin û em amade ne. Di civîna giştî de jî li ser vê esasê me ew bîryar girt.

Di vê pêvajoyê de astengiyên nefêmkirinê jî hebûn. Digotin, "*dê em ê van meclîs û komînan ava bikin, lê çawa bibe."* Di nav xebatkaran de hevgirtin û yekbûyinek hebû. Rihekî hevpar yê xebatan çêbûbû. Şoreşa 19'ê Tirmehê jî encama van xebatan bû hinek. Lê di gel de fikar û nefêmkirin pir bû.

Jixwe dema ku meclîsa giştî hat avakirin, bar hinek sivik bû. Endamên meclîsê pir bi xwestek,, şev û roj kar dikirin. Bi rastî jî ekîbek baş bû.

Di rêxistinkirina xebatên leşkerî de jî, keda Şehîd Şîlan û Şehîd Kendal pir bû. Ew keda wan tû caran naye bîrkirin. Di nava wê bêderfetiyê de, roj bi roj yekîneyên leşkerî rêxistin dikirin. Di destpêkê de komên biçûk yên sê kesan û bi awayekî veşartî xwe rêxistin dikirin. Komekê ya din nas nedikir û xwe îlan jî nekiribûn. Lê piştî şahadeta Heval Xebat, weke "*Şervanên Şehîd Xebat*" hatin îlankirin. Pişt re jî weke YPG hate îlankirin.

Cihekî weke Kobanê gel nedizanî komîn û meclîs çi ne. Yek jî di serê wan de dewlet hebû. Mesela me komên parastinê ava kirin, jixwe li Kobanê her kes ji bo şer amadeye. Lê dema ku me komîteyên parastinê ava dikirin, hinekan destê xwe radikirin û digotin "*lêxistin heye, an na?"* Digotin, "*lêxistin hebe, em jî hene."* Di komîteya

parastinê de cih girtin, weke deshilatdarî û hêzeke dîdîtin. Dema ku tu bibêjê lêxistin serbest e, dê sedan kes tevlê bibin; lê dema ku tu bibêjê "*na, di felsefe û pergala me de tiştên wisa tine ne!*" her kesî xwe paşve vedikşand. Ji ber vê tiştên balkeş dihatin jiyankirin.

Piştî du mehan ku hemû meclîsên me hatin avakirin, me komîteyên parastinê jî îlan kirin. Me ji dewletê re jî xeber şand û me got, "*ger dewriyeyên we bikevin nava taxan, dê em ê lêxin.*" Bi taybetî dema ku xwestin endamên meclîsê bigrin, me wisa kir. Me amadekariyên wê jî kirin. Bi vê yekê hemû bajaran berî 19'ê Tirmehê me ji dewlet qût kir. Tenê hin di cihên navendî de mabûn. Dema ku ew helwesta me dîtin, hêzên dewletê jî tirsiyan. Li gund û taxan êdî me parastina xwe dikir. Êdî li taxeke bûyerek çêbe û îxbarek bê kirin jî, dewletê digot *"em nikarin werin."*

Li Rojava û herema Kobanê cara ewil Mala Gel, li Minbicê hate avakirin. Ew mal cihên rêveberiyê bûn, cihên çareserkirina pirsgirekên gel bûn. Piştî wê li her derê malên gel hatin avakirin. Ew mala gel ku cara ewil li Minbicê hate vekirin, tesîr li ser Erebên wir jî kir. Wan jî got, *"em dixwazin rêxistinbûna xwe ava bikin."* Jixwe Erebên Minbicê zêde ne xirap bûn. Ew Erebên wê xetê, dewletê bi taybetî li hemberî Kurdan rêxistin kiribûn. Lê yên Minbicê ne xirab bûn.

Li Kobanê malbatek hebû, bi eslê xwe Ereb bû. Bi îstîxbaratê re kar dikirin. Hêzên dewletê yên li Kobanê jî bêyî wan nedikarî tevbigerin. Yek dijberî wan derketa, hema ji nava dewletê derdixistin. Gel pir ji wê malbatê ditirsiya. Berê pir zext li ser gel kiribûn, hê jî karê xwe berdewam dikirin. Hevalan ew şiyar jî kiribûn, lê hê jî karê xwe yê qirêj dimeşandin. Rojeke heval rastê tên ku yek girtine, heval jî hema wan digrin.

Ew bûyer bibû xaleke veguhertinê. Êdî em ketibûn serê sala 2012'an û zivistan bû. Jixwe em jî firsendekî wisa digeriyan. Heya ku destê me dihat, me nedihişt ku alozî derkevin, lê wan ji gel kesek revandibûn. Her provakasyonên wisa dihatin kirin. Êdî me soz ji wê malbatê girt ku dev ji vî karî berdin û hinek kesên wan Kobanê terk bikin. Li ser vê esasê hatin berdan. Me jî got qey tirsiyan e. Lê di seata ku hatin berdan de, em civînê de bûn; heval me gerîn û gotin, "*bi çekan li nava kolanan digerin*." Me got qey tirsiyan ji ber vê bi çek digerin. Jixwe li her kolanê dewriyeyên me hebûn û me tevdîrên xwe girtibûn. Lê êvar fîşekan avêtin dewriyeya me.

Hemû dewriyeyên me ku dengê fîşekan dibihîzin, berê xwe didin wê kolanê. Ew kolana ku ew malbat tê de bû, mala Salîh Mûslîm jî nêzikî wan bû. Emîn Cewî, berpirsyarê hêzên wan yê leşkerî bû. 8 leşkeran jî digre gel xwe û ber bi mala Salîh Mûslîm ve dimeşin, hevalên dewriye guleyan li ser direşînin û wî dekujin, dû leşker jî birîndar bûbûn. Van cenazeyên xwe berdidin û direvin. Ew hêzên din yên dewletê jî yek jî newêrî cihê xwe derkeve. Dema ku me ew cihê wan girt, kamera li ser malan hebûn, me ji wan kamareyan hemû dîmenên vê bûyerê dîtin.

Di wê navberê de bi sedan telefon hatin, hinekan digot rejîmê teyareyên xwe rakirine, hinekan digot ji Minbicê debabe ketine rê, hinekan digot dê Kobanê bikin deşt. Lê hevalan got, "*kî tê bila bê.*" Dîtin ku em pir cîdî ne, newêrîn ku dengê xwe derxin. Wan sehkir ku me amadekariyên pir mezin kirine û me bi plan ew bûyer derxistiye. Ji ber vê jî newêrîbûn derkevin.

Di wê navberê de kesekî ji van partiyên reformîst, bi maşîneya xwe ji wir re derbas dibe û bi guleyekê tê kuştin. Gule ji kû ve hatibû ne diyar bû. Lê her kes qane bû ku hêzên rejîmê lêxistine.

Me tevdîr girtin û wan cinazeyên xwe girtin. Lê dewlet pir tirsiyabû, digotin *"van çima wisa kiriye û nizanim çi.*" Lê me nameyek vekirî da wan û me got, ger wisa bibe dê her tişt qût bibe. Tabî di nava me de jî hinek dost hebûn, ditirsiyan. Lê me hemû gav bi hesap û bi tevdîr diavêtin. Hemû berpirsyarên wan rejîmê belgeyek îmza kiribûn û ji me re jî xwendin. Gotibûn, "*ew kesê bi navê Emîn Cewî kesekî nesekînî bû û ew malbat jî bela serê me bû. Sedema kuştina wî jî ew kes bi xwe ye."* Raporek wisa nivîsandibûn û şandibûn.

Ew bûyer, di nava gel de weke 19'ê Tirmêhê ya ewil lê hat. An jî weke provayeke 19'ê Tirmehê bû. Lewra cara yekemîn hêza xwe dibîne. Dît ku Emîn Cewî hat kuştin, lê dewletê jî newêrî ku lê xwedî derbikeve.

Berê dema ku yekî fîtikê dixist, dewletê bi ser de digirt û bi dehan kes dikirin bin çavan. Lê niha zilamên wan tên kuştin û birîndar dibin û lê dewlet nikare dengê xwe derbixe. Lê piştî vê bûyerê ew tirs şikest. Gaveke ku Kobanê berv bi 19'ê Tirmehê ve bir ew bûyer bû. Di heman demê de roja din di rakirina cenazeyê ew endamê partiyên din de jî wêrekiyek derket holê. Ew partiyên din dixwestin li ser bilîzin, me û dewletê di ew merasîma cenazeyê de bikin yek. Li gorî vê derûşmayên xwe jî amade kiribûn. Lê me nehilişt, em çûn malbata wî re axifîn û me got "*her çiqasa di navberê de jî jiyana xwe dest dabe, dewletê lêxistiye û ew şehîdê me ye."* Malbat jî îqna bû. Bi vî awayî ew lîstik jî hat vala derxistin.

Xaniyên ew kesên çete jî hatin şewitandin. Hinek di nava wan de feqîr bûn, me pêşî li girseyê girt û nehilişt ku malên wan bişewitînin. Lê sê-çar mal hatin şewitandin. Dema ku ew kes jî bajêr derket, êdî tirs nema.

Yekî dîn hebû, navê wî Welat bû. Welat diçe, rûyê xwe digre û li ber Emin Siyasî bi keviran kolanê digre. Ew berpirsên Emin Siyasî jî newêrin derkevin derva, serê xwe ji şibakeyê re derdixin, meyze dikin û hema dîsa dikevin hûndir. Yekî telefon kir, got "*hûn çi dikin? We çûye pêşiya Emin Siyasî hacîz daniye.*" Em jî şoq bûn, lê pişt re me mesele fêm kir. Ji ber ku serê xwe girtiye, kes wî nas jî nake. Hemû maşîneyên ku derbas dibin, nasnameyên wan kontrol dike. Ew tirsa dewletê yekser şikest û êdî dewlet ji gel ditirsiya.

Bûyereke din ya haciz e. Êdî em gihêştin cihekî ku tenê dewriyeyên taxan bes nedikir. Êdî me haciz danîn û me rê kontrol kirin. Divê me dewlet bixista bin kontrolê. Gav bi gav divê êdî me dewlet kontrol bikira. Wisa me bîryara hacizan da û cihên kontrolê çêkirin. Riyên ku dikevin bajêr û derdikevin me haciz danîn. Mesela li ser riya Helebê, li ser riya Girêspî, li ser riya Cerablûsê me haciz danîn. Lê qiyamet rabû, dewlet dîn bû.

Ji ber ku ew qesa çûn û hatin, heval ketin navberê. Me bermîl danîbûn, gotin “*ew pergala dewletê ye.*” Lê me got, “*em qet tawîz nadin.*” Gotin, “*ger hûnê deynin jî, maytaban deynin da ku weke bendên dewletê xûya nebin.*” Pişt re di navbera dewletê û rêxistinê de hevdîtin çêbibûn, li ser xwesteka hevalan me bermîl rakirin û tiştên weke tekeran danîn. Lê piştî her hacizê me çeperên xurt çêkirin. Ji aliyê sînorê Tirkan ve me qederê du metroyan satir çêkirin. Bi axê me bilind kiribû. Me qûlûbe jî danîn nava rê. Êdî wan partiyên din diçûn gel dewletê û digotin, “*dewlet jî dest çû.*” Lê dewletê nedikarî tiştekî bike.

Êdî hêzên dewletê nedikarîn bê xebera me bikevin bajêr û derkevin. Jixwe me ji wan re jî gotibû, ger hûn bikevin bajêr û derkevin divê xebera me hebe. An na hacizê dê we bigrin. Êdî bi destûra me diçûn û dihatin. Ji ber ku li bajarên din yên Sûriye jî gel di nava serhildanê de bû, nedikarîn hêza xwe bidin ser me. Lê teqlîtek hatibû çêkirin.

Dibêjin dema ku Beşar di xew de bûye, çûne ew rakirine û pê re gotine, *“Heleb çû, Şam çû*.” Ew jî şiyar bûye û gotiye, “*Kurd rabûne ser xwe an na*.” Gotine, “*na*.” Gotiyê, “*wê demê tiştek nabe”* û dîsa razaye. Ger Kurd di serî de rabûna dê xirabtir bibûya.

Civînek li Helebê çêbû, me got divê li hemberî van pirsgirekan em asayîşekê çêbikin. Heya wê demê haciz jî komîteyên parastinê yên meclîsan digirtin. Dervayî bajêr sê, di hûndirê bajêr de jî 12 cihê hacîzan hebû, dema ku tiştek bû dê kî yê kû derê bigre diyar bû. Di komîteyên parastinê de heft rêvebir hebûn û her yekî jî yekîneya xwe hebû, di rewşên awarte de cihê her heft kesan jî hatibû diyar kirin.

***-Di pêvajoya ku hûn behs dikin de cih û saziyên dewletê ketibûn destê gel yan na?***

Hêdî bi hêdî destpê dikir. Li Kobanê erdekî dewletê hebû, berê dewletê ew der dişûxiland. Baş naye bîra min gelek mezin bûn. Me bîryar girt ku em wê derê biçînin. Dê me ceyê wî erdî rabikira. Me meclîsan re jî got. Me bi yekîneyên parastinê, rê girtin û hevalên ku hatibûn amadekirin di seat pencê êvarê ketin navê. Heya bû sibe ew ceh hemû rakirin. Dewletê ferq kiribû xwestibû mûdaxalê bikin, lê me hevalan re gotibû çi dibe bila bibe nehêlin ku bila bajêr derkevin.

Çend maşîneyên wan yên bi doçqa diçin hecîza li aliyê Cerablûsê, lê heval çend fîşekan ji ser re diavêjin vedigerin. Diçin hecîza Helebê dîsa wisa dibe. Diçin riyên axê, meyze dikin dîsa rê girtîne. Dema ku seat bû donzdeh, me nameyek da. Me got, “*ger hûn nesekinin dê tiştên ne baş biqewimin.*” Bi vî rengî belav bûn. Çalakiyek esasî bû. Bi vî awayî me dewlet ji welatê xwe diavêt. Jixwe erdê gel bû û dewletê dest dabû ser. Di mantiqê dewletê de cihê ku tu dest bidê ser malê wê, dest bide ser arteşa wê baştir e. Lê nedikarîn tiştekî bikin. Pişt re ketin dewrê û gotin, “*qet nabe nîviyê wê bidin me.*” Lê me got, “*jixwe ew qesa sal e hûn erdên vî miletî dagir dikin, hê hûn mafê çi dixwazine.”*

Piştî wê me hêdî bi hêdî xwest dest daynin ser cihên dewletê. Jixwe amadekariyên me xelas bûn û dê me asayîş avabikirana. Lê divê me cihek ji asayîşê re peyda bikira. Cihekî bacê yê dewletê hebû, hevalan çûn derî şikenandin û tiştên wî kirin seyareyekê û anîn. Hevalan gazî mûdûr kir û got, *“vaye tiştên xwe, bigre û here.*” Şoq bû, got “*ew çiye, kî vî karî dike?”* Me got, “*hûn dizanin kî dike.*” Ew cih di nava bajêr de ye, çend caran seyareyên wan ber re hatin û çûn. Lê dît ku ser bînayan hevalên çekdar hene, newêrîn xwe bidin ser. Roja din me ew belge û tiştên din derxistin û bîna xweşik çêkir.

Me neh kes jî weke rêveberiya asayîşê diyar kirin. Yek ji îstîxbaratê berpirs bû, yek masaya terorê bû, yek masaya pirsgirekên exleqî bû. Di destpêkê de me nedizanî dê kî dikare çi karî jî bike, dê me bi ceribandinê hinek tişt zelal bikirana. Tasarûfên şexsî çêdibûn. Lê pergala asayişê me hinek da rûnişkandin. Dîsa haciz û dewriye komîteyên parastinê yên meclîsan dikirin, lê gelek tişt jî asayîşê dikirin. Tiştekî awarte çêbûbana hemû komite diketin dewrê, lê bûyerên asayî û rojane asayîş pê re mijûl dibû, mûhatabê wê diyar bû. Jixwe rojane lênuska tekmîlan dihatin nivîsandin. Di destpêkê de heval li ser asayîşê tune bûn, lê dema ku me dît hinek zehmetî tên jiyankirin me hevalek xwedê ezmun danî ser.

Dîsa cihekî din yê dewletê hebû, cihê çêkirina xaliyan bû. Ew der jixwe vala bû û dezgah rakiribûn. Ew der ji bo saziya malbatên şehîdan me difkirî. Mûdûrek li wir bû, ji malbata şehîdan bû, lê me nas nedikir. Ji Helebê hatibû. Me çend ciwanan re got, şevekê biçin û li ber wî cihî çend fîşegan biavêjin û hinek deng derxin. Dema ku ciwanan wisa kir, yek jî wan nema. Reviyan û çûn. Dema ku endamên meclîsê ew bihîstin, hinek pirsgirek derxistin. Lê dema ku me hinek heval şandin û dîtin ku li wir tû kes tine, me dest danî ser wir jî. Ew der jî me kir Mala Gel û Saziya Malbatên Şehîdan. Çend cih me wisa girtin.

Bûyereke din, şehîd Delîl li Bakur şehîd ketibû. Hevalekî ji Dêrikê bû. Dema ku cenazeye wî hevalî derbasî Rojava bû, li ser deriyê Girêspî re hat derbaskirin û em jî çûn pêşwaziyê. Dema ku gel li wir şehîdê xwe pêşwazî dike, hêzên rejîmê ji ser qonvoyê re guleyan direşîne. Jinek û qizeke wê birîndar bibû. Hema em kom bûn û çûn. Jixwe yekîneyên parastinê ku Heval Kendal û Heval Şîlan li ser disekinîn jî hatibûn. Ji ber ku di navbera rêveberiya wir de hevsengiyek jî hebû, di demeke lêz de em kom bûn û me mûdaxale kir.

Hê birîndar negihêştibûn nexweşxanê, me bîryar girt û êrîşî du baregehên rejîmê ku ji milê rojhilat in bikin. Dê ji êrîşa wan re bibûya bersiv. Jixwe baregehek di hundirê pênc deqan de ket destê hevalan û hevalan ew der şewitandin. Lê cihê din ber xwe dan. Ji ber ku zarok û malbat jî di nava cihê de bûn, hevalan nedikarî awayekî rehet êrîş bikin. Jixwe dewletê jî dixwest ku yekî sîvîl tiştek pê were. Pişt re ew cih jî hate girtin, lê ji bo pir alozî çênebin, hevalan gotin dev jê berdin.

Bi kûrtasî em dikarin bibêjin ku beriya şoreşê, me dewlet anîbû xetekê. Êdî di bin kontrola me de bû. Heya 19'ê Tirmehê êdî bûyerên wisa bi aloz derneketin. Jixwe êdî dewlet ji cihên xwe dernediket derva. Provaqasyonên partiyên din jî pir çêdibûn. Jixwe di nava gel de jî belav dikirin, digotin "*ew bi rejîmê re ne. Ew li dijî şoreşê ne, pêşiya şoreşê asteng in.*" Hemû tevgerînên wan bi vî awayî bûn. Bi dûrûşmayên xwe Arteşa Azad dixwestin, digotin "*bila ew werin vir.*"

Rikek li hemberî me hebû. Van partiyên din, wisa her dijberî me bûn. Serokatî qebûl nedikirin, şehîd qebûl nedikirin. Digotin, "*ciwanên Rojava birine û ji xwe re kirine qûrbanî.*" Digotin, "*ji bo me çi kirine ku şehîd in*." Nirxên me yên herî pîroz jî heqeret lê dikirin. Dema ku desteya bilind çêbû jî, şertê wan yê ewil; digotin, "*em di bin sûretên Apo de nameşin.*" Sûretê Beşar radike ne pirsgirek e, sûretê Busch radike ne pirsgirek e, yên Sedam radike ne pirsgirek e. Lê yên Serokatî dibin pirsgirek. Te dizanî ku çi siyasetê dimeşînin.

Kobanê cihekî wisa bû ku di destê her kesî de çek hebûn, di destê me de çek tune bûn. Heya ku ez ji Kobanê hatim jî, li gel çekên ku me dewletê girtî, 180 çekên me hebûn. Di destê her kesî de doçqa hebûn, di destê me de doçqa tune bûn.

Dema ku me li Helebê civîn çêkir û bîryara saziyeke ewlehiyê girt, li ser nav jî hate nîqaş kirin. Hinekan got, "bila şûrte be." Hinekan got, "bila polîs be." Lê di dawiyê de ji ber ku peyveke Kurdî bû, me kir asayîş. Yek jî rêxistina polîsan, rêxistiniyeke dewletê bû. Peyva asayîşê, peyveke kevn ya Kurdînî ye. Berê di civatên Kurdan de jî dihat karanîn. Weke kincên asayîşê yên ewil jî, ji ber ku pir derfet tune bûn, me tenê yelekek da çêkirin. Li ser piştê jî asayîş dihat nivîsandin. Bi vê gavê li Kobanê bingeheke asayîşê jî hate avêtin.

***-Dema li Kobanê ew pêşketin çêdibûn, helwesta rejîmê û opozîsyonê bi çi rengî bû?***

Dewlet jî pir ser gel de nedihat, da ku di pêvajoyekî wisa de Kurdan hêrs nekin û nedin hemberî xwe. Gelê rêxistinkirî Kurd bûn, ji ber vê tirsa her kesî Kurd bûn. Jixwe dema berî şoreşê jî ew qûwetên mûhalefetê, bi hevalan re hevdîtin çêkiribûn û gotibûn, "*gelê herî rêxistinkirî Kurd in. Ji ber vê jî hûn pêşengiya serhildanê bikin. Da ku em jî piştgiriyê bikin*."

Digotin, *"em bibêjin ya allah, dê Kurd bê hesap û kîtap, bêyî ku tiştekî bixwazin dê rabin. Dê dewlet jî komkujiyekê çêke û muhalefet jî li ser vê siyasete bike."* Ango dixwestin Kurdan bikin qûrbanê xwe. Dixwestin weke Helebçê bînin serê Kurdan. Lê Kurd, ne Kurdên berê bûn.

Perspektîfa netewa demokratîk, konfedaralîzma demokratîk hebû. Hemû heval jî di vê çarçoveyê de hişyar tevdigerîn û li her cihî me hemû helwest nîşan didan. Di vê xalê de em neketin kêmasiyan. Ji aliyekî ve dewletê dixwest me bikşîne aliyê xwe, ji aliyekî ve jî opozîsyonê wisa dikir. Li ser vê esasê li ser me zext jî dikirin, lê me siyasetek pir xurt meşand. Hevalan jî li gorî vê tevgerînek çêkir. Dibe ku pir kêm lewazî derketibin di vê mijarê de, li tiştekî li ser giştî bandor bikira çênebû.

Dema ku me li Kobanê xwe rêxistin dikir û otorîteya dewletê sist dibû; ew pirsgirekên ku dewletê çareser nekiribûn, her roj diteqiyan. Yekî yekî dixist, yekî xûmar dîlîst, yekî araq difirot. Berê dewletê ew tiştan ji aliyekî ve teşwîq dikirin, lê ji aliyekî ve jî tirsek ava kiribû; di ser wan de digirt û pere ji wan digirtin. Dûalî dilîst. Le dema ku tirsa dewletê jî rabû, ew pirsgirek hemû teqiyan.

Piştî hinek naskirina bajêr, me bajar weke neh taxan parçe kir û me got, em ê li gorî taxan neh meclîsan ava bikin. Di heman demê de divê me hemû saziyên esnafan û saziyên civaka sîvîl ava bikirana. Piştî ku hemû meclîsên gund û bajarên derdorê jî hatin rêxistin kirin, dê me meclîsa hêremê ava bikira. Me hemû saziyên xwe de jî hevserokatî esas girt. Lê di saziyên pîşeyî û hwd de jin tune bûn.

Me hem di bajaran de, hem jî di gundan de dest bi kar kir. Li ser esasê sê xetan me kar meşand. Xetek bajar bi xwe bû, xetek aliyê rojhilatê bû, xetek jî aliyê rojava bû. Me nexşere danî pêşiya xwe û bajar kir neh parçe. Li gorî mezinahiya wan jî, me tax parçe kirin. Mesela me hin tax kirin bîst parçe. Hinek kirin deh û hinek jî kirin penc parçe. Di nava van taxan de me kom ava kirin. Dostê me be jî, ne dostê me be jî em mal bi mal geriyan.

Jixwe ew peyva dost jî balkêş bû. Li vê derê ji bo welatparêz û sempatîzanên me peyva dost dihat karanîn. Dema ku Serokatî li wir kar dike, ji bo ku dewlet zextan kesî nexwe ew peyv bikaranîbû. Lewra ji bo dostaniyê kes naye sûcdar kirin, lê sempatizan tên ceza kirin. Lê dost, kesên ku bi te ve ne girêdayî ne û tenê piştgiriyê didine te ye. Ji ber vê me hevalan ve jî nîqaş kir û me got divê em vê peyvê rakin. Vê peyvê wisa dûbendiyek çêkiribû. Yên ku ne Apoger bin, ne dost bûn. Yên hemberî me jî dibêjin, em ne dostên we ne, em dijminên we ne. Vê tesîr li ser gel çêdikir. Hinek kesên nû bi nû xwe nêzikî me dikirin re digotin ne dost e, ji ber vê ew jî dûr diketin. Hinekan jî digotin, "*em dostên kevn kom dikin.*" Dema ku me li van taxan civîn çêdikirin jî, di serî de me welatparêzên ku berê bi hevalan re kar kirine kom dikirin û em wan re diaxifiyan, pişt re jî me gazî her kesî dikir û di maleke mezin de civîn dardixistin.

Her şevê herî kêm di nava bajêr de penc civîn dardixistin. Carna heya sibê em civîn bi civîn digeriyan. Tiştên ku bên nîqaşkirin jî me diyar kiribûn. Komîn çi ne, komîteyên ku li ser esasê komînan bên rêxistinkirin kêrî çi tên, rista wan çi ye, hemû hatibûn diyar kirin. Di nava van komîteyan de jî komîteya jinê, komîteya ciwanan, komîteya perwerdê, komîteya ziman, komîteya sûlhê, komîteya xizmetan, komîteya parastinê hebû. Di nava komînan de donzdeh-sênzdeh komîte hebûn û karê her komîteyekê hatibû diyar kirin.

Piştî ku hinek fêmkirin çêdibû, yên ku dixwestin di nava van komîn û komîteyan de cih bigrin dihatin hilbijartin. Dema ku me dû-sê şevan de ew civîn xilas kirin, ew navên ku xwe pêşniyar kirine me hemû kom dikirin, ger kêm bin me hinekên din qana dikirin û ji bo avakirina meclîsên amadekariyên hilbijartinê dikir. Di hilbijartinê de me hejmara jinan jî diyar dikir. Me lîsteyên hilbijartinê jî li gorî alfabeyê çêdikirin. Me sûret ji her namzetî digirt û ji lîsteyê dixist. Pişt re me digot, *"biçin hefteyekî propagandaya xwe bikin, da ku em biçin hilbijartinê."*

Di navbera wî hefteyî de jî me li taxên din civîn çêdikirin. Tevlêbûn pir xurt bû, ti taxan bin sê hezar kesî re nehatin ser sandoqan. Sala hilbijêran jî herî kêm me weke şanzdeh salî diyar kir. Di meclîsa destpêkê de em pir ketibûn zehmetiyê. Yên ku dihatin ser sondoqan jî ditirsiyan. Heya ku me kesek ji bo namzediyê qana dikir, me pir zehmetî dikşandin. Meclîsa yekemîn me li harata Kaniya Kurdan çêkir.

Dema ku me lîsteyên xwe amade kirin, me ji milet belav kirin û dê çawa hilbijartin çêbibin me di nava gel de propagandaya wê kir. An na cara yekemîn e ku li Sûriye hilbijartin çêdibin, kes nizane dê çawa dengê xwe karbîne. Em çûn û me sandoq li nava zeviyekê danîn, me hûnermend anîn û wisa bi kêfxweşî deng dan karanîn. Me derdorê tevdîr jî girtibûn. Lewra me dixwest em wê tirsê bişkînin. Sandoqên hilbijartinê ji gel re pir biyanî dihatin. Me her tişt amade kiribû û lîste belav kiribûn, lê gotin kesekî xwe paşve kişandiye. Me ew kes ziyaret kir û me got, "*tu neçarê bikevê hilbijartinê.*" Lewra ger me ew qana nebikira, dê her kesî xwe şûnve kişandiba. Di encamê de me ew jî ji nû ve qana kir.

Roja hilbijartinê jî me hemû namzed derxistin hemberî gel û dan naskirin. Bi vî rengî me 31 kes hilbijartin û me meclîsa xwe îlan kir. Îlankirina vê meclîsê li Kobanê hawayekî cûda çêkir. Her kes şoq bû, digotin *"bi awayekî vekirî çawa dikarin vê bikin."* Piştî vê pêşiya meclîsan vebû. Jixwe êdî ew meclîsa yekemîn jî piştgirî dida me. Digotin, "me pêk aniye, tiştek nebûye. Ji ber vê di demekê kin de me meclîsên bajêr xilas kirin. Di yên gundan de me hinek zehmetî kişandin. Dîsa di demeke kin de meclîsa Minbicê me ava kir.

Herî dawî di nava meclîsan de jî hevserok û rêveberî çêdibûn. Ew jî bi pêşniyar û hilbijartinê dihatin kirin. Lê me perspektîfa vê dida, me feraseta tevgerê ya rêveberiyê ji wan dida fêmkirin. Me digot, *"kesên ku bikaribin vî karî bimeşînin û xizmet bikin, pêşniyar bikin."*

Sazî jî me bi vê rêbazê çêkirin; di serî de em diçûn û me çend esnaf kom dikirin û em bi wan re diaxifîn. Ew jî welatparêz bûn û yên ku berê mîlîstî kiribûn. Me perspektîfa saziyên civaka sîvîl dida wan û me dem dida wan. Da ku di nava vê demê de xwe rêxistin bikin. Me rista wan, peyvirên rêveberiyê, têkiliyên di navbera saziyan de û di nava meclîsan de cih girtinê hemû kîte bi kîte vedigotin. Jixwe gelek pirsgirekên wan hebûn û me rêbazên çareseriyê jî nîşan didan. Me bi seatan nîqaş dikir, weke perwerdê lê dihat.

Piştî wê demê jî me civînek girseyî darxist, ji bo civînekê nêzikî sêsid kesî hatibûn. Piştî wê gotin hinek hevalên me kêm in, me civînek din jî piştî wê darxist. Me meclîsek çêkir û rêveberiyek ji nava wan derxist. Dîsa di bin meclîsê de me lijneya hevkirinê û çareserkirina pirsgirekan hilbijart. Me digot, "*divê kesê ku di lijneyê de cih bigre zana be û di nav endaman de bê qebûl kirin.*" Mesela hinek tornevanên extiyar hebûn, yên din hemû ber destê wan mezin bibûn û wan re digotin "bavo." Her kesî guhdarî wan dikirin. Hinekên wan di nava meclîsê de, hinekên wan jî di nava lijneyê de cih digirtin.

Heman kesî dikarî di nava du meclîsan de cih bigre, lê divê du rêveberiyan de cih negirta. Lewra her du kar nedikarîn bi hev re bimeşandina. Lewra me kar dida pêşiya wan; ger meşek çêbibûya divê girseya xwe anîba û tevlê bikira. Pirsgirekek çêbûbûya, divê rista xwe bîlîsta. Mesela her saziyê komîteyek wê ya parastinê hebû.

Di xebatên ziman de jî, di serî de me komek mamoste perwerde kir. Ji hevdeh kesan pêk dihatin. Belgeyên me pir tine bûn. Bi danehevên xwe me perwerde dida. Lê bi wê ve nesînordar bû. Lewra dê wan mamostayan tenê perwerdeya ziman nedabana. Dîroka wêje û ziman e, çand û exleq e, dîroka Kurdistan û têkoşîna azadiyê ye. Li ser

vê esasê me perwerde dikirin. Mamoste di serî de pir ketin zorê. Hem gelek kes ditirsiyan ku mamostatiyê bikin, hem jî gelek kes ditirsiyan ku zarokên xwe bişînin mektebên me.

Hemû saziyên me di malan de kare xwe dimeşandin. Dema ku me ew xanî çêdikir, zarokek hat û bi zorê ket hûndir. Hevalan lê pirsî, gotin "*tu çima hatî?"* Got, "*ez hatim ku fêrî zimanê xwe bibim.*" Ew yek hesteke pir cûda bû. Miletekî ku ew qesa hatiye tepisandin û tirsandin heye, lê zarokekî hê nikare biaxife, dibêje *"ez hatime da ku fêrî zimanê xwe bibim.*" Di heman demê de roja ku em ê saziya ziman ya Osman Dadalî vekin, dayikek heftî salî hatibû ber dîwar rûniştîbû û digîriya. Me got, *"yadê xêre, tu çima digîriyê?*" Got, *"kurê min ez ji kêfan digîrim.*" Got, "*min ew yek jî dît, êdî ez vê seatê bimrim jî ne xem e.*" Miletekî ew qesa hesreta zimanê xwe, hesretê hebûna xwe li pêşberî me bû. Li hemberî van dîmenan serbilindiyek çêdibû.

Ji ber ku endamê PYD Osman Dadalî jî di şikenceyê de hatibû kuştin, me navê wî dabû saziyê. Jixwe kûrdeleya vekirina saziyê jî hevjîna wî û zarokên wî qût kirin. Ji bo wî miletî mirov çi bike jî hêja ye. Di vê şoreşê de, tiştên gelek wisa xweşik hebûn ku coş û kelecanî didan me. Mesela tu hilbijartina xwe dikê, rêveberiyên xwe çêdikê, saziyên xwe vedikê, çopên xwe kom dikê; ew hemû gavên ku mirov jê kelecanî û moral digirtin bû. Mesela derfet pir tine bûn, her meclîsekê tiraxtorek girtibû û pê çopên taxa xwe kom dikirin. Pişt re ew bajarê ku dewletê wisa qirêj hiştibû hat paqijkirin. Gelek tişt dihatin guhertin. Dibe ku pir zanebûn tine bû, lê her kesî kelecaniyek ji van karan digirt.

Ger me berî meclîsa giştî ya Rojava, meclîsa giştî ya Kobanê îlan bikira dê dîmenekî parçebûnê derbiketa holê. Ji ber vê demekê me xebatên xwe yên meclîsê dan sekinandin. Me gund, bajar û cihên dîtir hemûyan dest bi civînan kir, da ku li gorî hejmara hatiye dayin em endamên xwe yên meclîsa giştî ya Rojava hilbijêrin. Ji ber vê xebatên me yên din bi piranî di nîv de man. Me gel re digot, "*yên ku di nava komîn û meclîsên taxan de cih negrin, nikarin biçin meclîsa jor.*" Lê dema ku meclîsa jor çêbû, hin cihan meclîsên taxan û gundan nehatibûn ava kirin. Piştî wê dema ku me hilbijartinên meclîsan kirin, hinek endamên meclîsa jor gotin, "*hûn nikarin tiliyên me boyax bikin, lewra em endamên meclîsa jor in.*" Lewra yên ku reyên xwe karanîne me tiliyên wan boyax dikirin. Xwe jor dîdîtîn. Hinek hebûn, pir mûtewazî bûn. Lê yên ku di nava meclîsan de neçûne, kar nedikirin. Me bi zorê xistin meclîsa bajêr, me got yên ku di meclîsa jor de ne, neçar in ku bibin endamên meclîsa bajêr.

Ji ber vê ew gotina Serokatî ku, weke "*ji jêr ve çûyin û dîsa anîna xwarê"* pênase dike, di pratîkê de jî me fêm kir. Ji ber ku di nava meclîsê jî neçûye, dê kî wî bîne xarê. Ji ber vê divê di rêxistinên nû de em vê pergala pîramît ku ji jêr ve destpê dike dîqat bikin.

***-Di wan xebatên meclîs û saziyan de, gelên derveyî Kurdan jî tê de cihê xwe digirtin, an na?***

Pirsgireka me ya esas çi bû? Heya şoreşê me piraniya meclîs û komînên xwe avakirin, lê hinek man. Jixwe di demeke ew qesa kêm de em nedigihêştinê. Dema ku me hilbijartin çêdikirin, roja din me hemû gel kom dikir û kesên ku hatine hilbijartin îlan dikirin. Me hejmara jin û ciwanan jî diyar dikirin, ji ber ku gel û baweriyên cûda li Kobanê tune bûn, me ji wan re hejmar diyar nekiribû. Mesela weke Cizîrê gelê Ereb û Kurd di nava hev de jiyan bikirana û xwe nêzikî me bikirana, dê me ji wan re jî hejmar veqetanda. Lê Erebên Kobanê, piraniya wan xetên sînorên Kobanê jiyan dikirin û jixwe zêde xwe nêzikî me jî nedikirin.Yek jî xebatên herî esasî yên van meclîsan parastin bû.

FOTO-63

***-Pergala parastinê çawa bû, her kesekî/ê dikarî di nav de cih bigre?***

Her meclîsekê komîteyeke wê yê parastinê hebû. Ew komîte jî her yek ji heft kesan pêk dihat. Di serî de di taxên xwe de dewriye diavêtin, heya sibê gelek bûyeran re mijûl dibûn. Ji ber ku hê dewlet li Kobanê hebû, tenê li taxan dewriye dihat avêtin. Mûdaxaleyên bûyerên weke xûmar û her wekî din jî dikirin. Her wiha li hemberî êrîşên dewletê yên weke girtin û kuştinê tevdîr digirtin.

Di van komîteyan de heft rêveberî hebûn, lê giştî her komîteyek parastinê 120 endamên wan hebûn. Jixwe çekên wan jî hebûn. Çekên hevalan tune bûn, lê yên endamên parastinê hebûn. Çawa meclîsên taxên bajar ava bûn, me dest bi karê parastinê kir û her meclîsekê komîteyeke xwe ya parastinê ava kir. Hemû dewriye jî bi çek bûn. Piştî 5-6 mehan, me ew vegerandin asayîşan. Jixwe xebatên yekîneyên parastinê ku pişt re bizivire YPG cûda bûn. Me her kes jî nedixist nav kare yekîneyên parastinê. Em bijarte nêzik dibûn.

Piştî demekê li Kobanê tirsa dewletê şikest û ji ber vê ew pirsgirekên ku dewletê tepisandibûn, yek bi yek derdiketin holê. Êdî me dev ji rêxistinbûnê berdabû, em bi pirsgirekên civakî re mijûl dibûn. Em ji pirsgirekê

direviyan pirsgirekê. Nakokiyên ku di nava civakê de hene, derdiketin holê. Weke me got, pirsgirekên weke fûhûş, xûmar û pirsgirekên din yên exleqî û hwd hebûn. Jixwe dewletê ew pirsgirek her di nava civakê de weke nakokî hiştibû da ku kêngê bixwaze jê sûd werbigre. Hevalên ku çûbûn karê rêxistinê bikin jî, neçar mabûn ku di serî de van pirsgirekan çareser bikin.

Partiyên din jî li ser vê yekê xwe didan jiyankirin. Ango me nedikarî em li benda avakirina meclîsan û komîteyên sûlhê bimana. Ji ber vê me di nav xwe de civînek darxist û me bîryar girt ku em lijneyeke ku ji kesên tên naskirin û tên qebûlkirin ava bikin, da ku van pirsgirekan çareser bikin. An na me nedikarî karên xwe yên rêxistinî bimeşandana. Piştî civînê jî ez bi xwe ji vê meseleye re mijûl bûm, me kesên ku gotina wan tê guhdarî kirin hilbijartin, me bêjingê re derbas kirin; me zêdetir kesên ku ji berê ve di nava karê rêxistinê de ne û her kes li ser hemfikir dibe hilbijartin. Bi vî awayî li bajar lijneyeke sûlhê ku ji yanzdeh kesên daîmî pêk tê ava kir. Êdî li ku pirsgirekek çêbibe, divê vê lijneyê mûdaxale bikira û êdî divê pirsgirek neçûba cihen din.

Di heman demê de li xetên gundan du lijne, li Girêspî yek, li Minbicê jî yek hate ava kirin. Bi giştî penc lijneyên sûlhê di destpêkê de li hêrema Kobanê hatin ava kirin. Di heman demê de wan lijneyên gund û bajarên derdorê di nava lijneya giştî ya bajêr de cihê xwe digirtin. Piştî danehev kombûn, êdî vê dawiyê ew lijne zivirîn dadgehan. Lê rêbazeke wisa dihat pêş xistin; heya ku pirsgirekek bi rêbaz û hevkirinên civakê hal bibûya, me nedibir dadgehê. Kengê ji rêbazên civakî nedihat çareserkirin, wê demê diçû dadgehê. Jixwe her meclîs û komîna ku me ava kir, di nava xwe de lijneya sûlhê çêdikir.

Ji bo saziyên civaka sîvîl jî wisa bû. Mesela pirsgirekeke hesinkaran çêbûbûya, di serî de lijneya sûlhê ya meclîsa hesinkaran pê re mijûl dibû, ger nikarîbana çareser bikin dişandin lijneya sûlhê ya giştî. Ji bo ku ew pirsgirek ji ber destê me derkevin, kare ku di serî de em pê re mijûl bûn, ew bû. Dîsa jî gel belaya xwe li me venedikir, digotin “*divê hevalan çareser bikin.*” Mesela lijneyên sûlhê yên meclîsan herî kêm di mehekê de heftî pirsgirek re mijûl dibû. Carna di mehekê de hinek meclîs ji 170’î pirsgirekî re mijûl dibûn, piraniya wan jî çareser dikirin. Lê dîsa jî bi van lijneyan jî baş nedibû çareser kirin.

Mesela dê me pirsgireka hişbirê çi bikira; me carekê re dest biavêtê xeter bû. Berî ku em xwe rêxistin bikin, ger me dest avêtibûya hinek pirsgirkan dibe ku ji me bizivirîbûya. Mesela hinek mirovan ji ber faîzê milk û malên xwe winda kiribûn. Dema ku me nedikarî em mûdaxaleyî van pirsgirekan bikin, em pê diêşiyan. Pêşiya me jî dibûn asteng, milet digot “*êdî hûn rêvebir û berpirsyar in, divê hûn çareser bikin.*”

Piştî ku me meclîs avakirin, em neçar man ku hinek bîryaran bigrin. Mesela di meclîsên taxan de, me bîryara firotina araqê li taxan qedexe kir. Piştî çend mehan jî xeynî sê dûkanan me bi giştî firotina araqê qedexe kir. Berî wê di sedan dûkanan de dihat firotin. Lê me bi giştî nedikarî em qedexe bikin. Her wiha me got, “*yên dixwazin dikarin di mala xwe de vexwin, lê ger mala xwe û derdora xwe nerehet bike, em ê mûdaxale bikin.*”

Wisa çend kes jî hatin girtin. Mehekê em li ser van pirsgirekan sekinîn û me mûdaxaleyên pratîkî dikirin. Nêzî neh kesên ku nayen rê jî me girtin; lê em pê re axifîn, me eşîr xistin dewrê, dîsa jî nehatin rê. Ji ber vê jî me ew girtin. Xûmar hate qedexe kirin. Hin kesên ku dest dane ser milkê gel, dîsa milkê gel lê zivirandin. Van tiştan tesîreke baş li ser gel dikir. Lewra berê ji ber van serxwoş û berdoşan milet nedikarî êvarê derkeve derva. Mesela ji bo qedexekirina çintiyan, her meclîsekê li taxên xwe bi dehan civînên gel darxistin. Êdî her kesî digot, “*vaye çintiya kûrê min jî heye bên bigrin.*” Hinekan xwe bi xwe radest dikir.

Ger me gel wisa zane nekirîba û nekiriba dewrê me nedikarî em van tiştan kom bikin. Mesela li taxekê 700 çintî kom kirin. Hemû birin hesinkaran û parçe parçe kirin. Me dixwest ku di wê mehê de ew hêrsa gel li hemberî hev ji holê rakin. Me berê vê hêstê jî rêxistinê ve zivirand. Mesela yên wisa bi piranî me dikirin komîteya parastinê. Yên hêvî didin û paqij bûn, hevalên yekîneyên parastinê pê re mijûl dibûn û rêxistin dikirin. Bi vî awayî li her taxekê dewriye digeriyan. Dema ku bûyerek wisa dibû, ew kes digirtin û dibirin radestî malê dikirin.

Wê demê hinek mazot û tîp kêm bûn, rê jî hatibûn girtin; pirsgirekeke ku di serî de me dest avêtê jî ew bû. Lewra dewletê li gorî dilê xwe belav dikir; dida yên dewlemend û yên hêjar jî wisa diman. Li Rojava, dema ku mazot tunebe jî tu nikarê ti karî bikê. Lêwra her tişt bi mazotê ve girêdabûn. Ava xwe jî bi mazotê ji bîran dikşandin. Dewletê jî cihê belavkirinê yê ava Kobanê li gundê Şêxler çêkiribû û kêngê dixwestin av qût dikirin. Jixwe di civîna me ya ewil de me got, *“Kobanê weke giravekê ye.*” Divê me demên pêş bifikirîbana, lewra bi ambargoyê her tişt lê dihat qût kirin. Divê me tevdîr bigirtana, di serî de jî divê me tevdîra mazotê bigirta.

Me hemû tişt milet re digot, “*herî kêm divê hûn tevdîra xwe ya şeş mehan bigrin.*” Ango divê her malbatekê ji her alî ve tevdîrên xwe yên şeş mehan bigirtana. Gelek kes ji van gotinên me dikeniyan, lê dema ku ambargo çêbû hemû li me digeriyan û digiriyan. Lewra tevdîrên xwe negirtibûn.

Ji bo avê jî me lijneyeke mûhendîsan ava kir û me şand welatên din, da ku fêrî pergala av û barajan bibin. Lewra me dixwest, em ji Ferat sûd werbigrin. Ew mûhendîs çûn lêkolîn kirin û proje anîn. Me hinekên wan kirin meriyetê. Mesela me tûcaran re digot, biçin Bakur bi tonan komirê bînin, dê di demeke wisa bê ku hem hûn ê pê karê xwe bimeşînin, dê hem jî pêwîstiyên gel bên bersivandin. Lê hinekan ji van tiştan bawer nedikir. Gelek

hevalan jî digot, “*ew riyên me bigrin dê em jî riyên wan bigrin.*” Bawer nedikirin ku dê rojekê amborgo li ser Kobanê bê danîn. Em rê bigrin jî, ew dikarin riyên din re biçin, lê yê me derdora me hatiye dorpêçkirin. Ango ji destpêkê ve hewldanên me yên bi vî rengî hebûn. Di her civîneka xwe de me van tiştan nîqaş dikirin.

Berî şoreşê weke me got, gavên hatin avêtin hebûn. Naxwe 19’ê Tirmehê carekê re çênebû. Di destpêkê de me dest avêt karê firin û mazotê. Ji bo ku gaz bikeve bin kontrolê, çûbûn û dewlet qewitandin. Hinek ber xwe didin, lê hevalekî şemaqek li fermandarê wan dabû. Li ser vê gel şoq bûbû, di şexsê wî hevalî de cara ewil gel şemaq diavêt dewletê. Jixwe ew cihên gaz-mazotê yên gel bûn, lê dewletê kiribûn bin tasarûfa xwe. Pişt re civan ji belavkirina gazê re mijûl bûn, lê dema ku me firin girt, meclîs pê re mijûl dibûn.

Firinên biçûk ku di destê gel de bûn hebûn. Lê firina navendî ya mezin di destê dewletê de bû. Ji ber ku êdî nan nedidan gel û zext li kesên ku diçûn nan bigrin dikirin, me dest danî ser ew firina dewletê jî. Li Kobanê her du gavên ku di destpêkê de hatin avêtin ew bûn. Her du cih jî ji dewletê hatin girtin û radestî meclîsên gel hatin kirin. Cihê gazê di serî de ciwanan kontrol dikir, lê pişt re ew jî me radestî meclîsê kirin.

Ew amadekariyên ku berî şoreşê hatin kirin, avakirina meclîsan û rêxistinkirina gel baş bû. Lê tiştê kêm perwerde bû. Me nedikarî em wan perwerde bikin, ew derfetên me tune bûn. Di dawiyê de me 6-7 dewre vekirin, lê têrê nedikir. Li Rojava pirsgireka me ya bingehîn perwerde bû. Ger ew saziyên ku hatin avakirin, neyen perwerdekirin dê têk biçin û bê encam bimînin.

Piştî gavên gaz û firinê, hin gavên din hatin avêtin. Ew bûyera kuştina Emîn Cewî bû. Dewletê êdî di bînayên xwe de hinek karên fermî pêk dianîn. Lê milet êdî wêrek bûbû, êdî neditirsiyan. Jixwe beriya wê jî çend bûyerên wisa ku gel wêrek bike çêbûbûn. Careke hin endamên meclîsê hatibûn girtin, me hema ew tehdit kirin û hevalên me berdan. Careke xwestin serokekî meclîsê bigrin, me hevalên çekdar kirin kolanê û me nehiliştin binçav bikin. Van bûyeran hemûyan, li Kobanê êdî gel bi vîn dikir û dewlet jî tengav dikir.

Dervayî dewriyeyên kolan û taxan, êdî me haciz jî danîn. Jixwe ger te li qadekê haciz jî danîn, êdî ew qad di destê te de ye. Çiqasa dewlet li wir be, bila be. Lê êdî bê bandor e. Lê rûxmê ku ji van tiştan re dewletê nedikarî dengê xwe derxe, lê van partiyên din nerehet dibûn. Digotin “*kê ew hêz daye we?*” Bi vî awayî dewlet li Kobanê nemabû. Jixwe me komîteyên sûlhê jî ava kiribûn, wan jî pirsgirekên gel çareser dikirin. Pêwîstî bi dewletê jî nemabû. Jixwe me di civînên xwe de digot, “*divê êdî tû kes serî li dewletê nede.*” Saziyên me jî hêdî bi hêdî bersiv dida pêwîstiyên gel. Xeynî hin saziyên mecbûrî, gel alaqaya xwe bi dewletê nedianîn. Mesela saziyan nifûsê, ya zîrayê û şaredariyê kar dikir. Xeynî vê tû saziyeke dewletê kar nedikir. Bi vî rengî me hemû Kobanê bi dest xwe xistibû, lê îlankirinek tune bû. Her wiha bêbandor bin jî hê mûxabarat û hin hêzên dewletê li wir hebûn. Lê di sukê de û di bînayên xwe de tengav bibûn.

Piştî vê demê, weke me berê jî got me dest da ser zeviyên ceh yên dewletê. Di vê bûyerê de jî bîryarek giştî hebû. Ew bîryar hinek xetere bû jî. Dibe ku di navbera me û dewletê de pirsgirek jî derketibana. Lê me tevdîrên xwe girtin û me ew ceh kom kir. Hinek gengeşî jî çêbû, lê pişt re nikarîn dengê xwe derbixin. Vê di gel de kelecaniyek din çêkir. Êdî ji 7 salî heya 70 salî her kesekî/ê ku ala xwe digirt dest xwe, dadiket kolanan.

Foto-5

***-Ewlehiya bajêr tenê komîteyên parastinê yên meclîsan digirtin? Gelo dikarîbûn mûdaxaleyî bûyerên sûlhî jî bikin?***

Na, jixwe pişt re me bîryara avakirina asayîşê girt. Ew jî dîsa bi meclîsan ve girêdayî bû, lê navendeke we ya giştî di bajêr de hat avakirin. Me dest da ser bînayek dewletê jî û kir cihê asayîşê. Me dixwest em cihekî din jî bigrin, lê ji ber ku fêmkiribûn, şûrte danîbûn wir. Lê me piştî çend rojan ew der jî girt.

Jixwe weke me berê jî got, di demekê wisa de êrîşa dewletê ya li ser konvoya şehîd Delîl çêbû û li hemberî vê me dû baregehên wan girtin. Bi vê bûyerê, nakokiyên me û dewletê gihêştin asta jor. Heval ketin navberê.

Xeynî van saziyên me girtine, me di saziyên weke şaredariyê de jî xwe rêxistin kiribû, ji ber vê me pêwîstî bi girtina wan deran nedîdît. Lê cihekî çandê hebû, me xwest em bigrin. Lê rêveberiya me got, “*bila demekê bisekine.*” Pişt re gotin, “*hûn dikarin bigrin.*” Em êvarekê çûn û me mûdûrê wî re got, “*ka tiştê xwe bigre û biçe*.” Bi vî rengî me dest danî ser wir jî.

Berê kesî bînayên xwe nedidan me, ku, em ji bo saziyeke kirê bikin. Lê her cihê ku me digirt, me saziyeke xwe tê de bi cih dikir. Ew cihê çandê yê dewletê ku me girtiye jî; me saziya ziman, çand, konfederasyon û ragihandin tê de bi cih kir. Lewra cihekî mezin li ser sê qatan bû.

Êdî li hemû gundan mala gel vebû. Navendên çandê vebûn, mektebên bajêr hatin girtin û mamosteyan me tê de cih bûn. Her wiha gelek saziyên din hatin vekirin û bi vî rengî em gihêştin şoreşa 19’ê Tirmehê.

***-We jî beriya şoreşê li Kobanê xebat meşandine, bi taybetî ji milê leşkerî ve kîjan pêş ketin hebûn?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Dema ez ji milê Cizîrê çûm Kobanê, rêxistinbûna leşkerî di çarçoveyekê de karê xwe tanzîm kiribû. Komên veşartî hatibûn rêxistinkirin. Xeta Rojava hevalê Şiyar rêxistin dikir, xeta Başûr hevalê Rohat hebû, hevala Şîlan li ser xeta Rojhilat bû. Bi vî awayî rêxistinbûnek hebû. Di nava bajêr de hevala Zeynep hebû, kom rêxistin dikirin. Bi van koman re nîqaş çêdikirin, ew perwerde dikirin û amade dikirin.

Li milê Rojhilat, heya Girêspî rêxistinbûna ciwanan çêbûbû. Di nava rêxistinbûna ciwanan de jî xebatên veşartî yên leşkerî çêdibûn. Li Til Findirê, me cara yekemîn cihekî perwerdê vekiribû. Pê ve girêdayî qontara Çiyayê Keremox jî hin xebatên me yên perwerdehiya leşkerî çêdibûn. Li wê derê şikeft hebûn, cihekî pratîkî yê perwerdê hatibû vekirin. Êdî em derbasî asta perwerdekirina ciwanan bûbûn.

Piştî van perwerdeyan cara yekemîn em li Kobanê derbasî pergala yekîneyan bûn. Çiqasa xeteriyên wê hebin jî, êdî wêrekiyek çêbûbû û hin tişt hatibûn derbaskirin. Yekîne dihatin gel hev, sond dixwarin û ji bo parastina herêma xwe amadekarî dikirin.

Yekîneya yekemîn ku me rêxistin kiriye, li Gundê Helincê bû. Piştî ku çend yekîne hatin perwerdekirin û hatin gel hev me taxim ava kirin. Piştî Helincê di nava bajêr de û di gundan de çend taximên din hatin rêxistinkirin. Jixwe li Kobanê bi eşîrtiyê vê giredayî wêrekî û şerkeriyek jî hebû. Hatina gel hev pir ne zehmet bû, zû bi zû deşîfrebûyin çênedibû. Ji ber vê yekê pergala komên leşkerî zûtir çêbû. Mesela 2 gundên ku mirovên hev in re, li gel hev pergala wan ya koman û parastinê dihat çêkirin.

Di bajêr de jî bi vî awayî kom dihatin çêkirin. Ji bo ku pergaleke parastinê bê rûnişkandin, bi şêwaza komên biçûk be jî perwerdehiya çand û exleqê dihat dayin. Şevan ji bo fêrbûn çêbibe û zirarê nedin gel, li derdora bajêr û gundan gerandin û elimandinek dihat çêkirin. Ji bo ku li ser Kobanê kontrolek çêbibe û dewlet jî were bêbandor kirin, tevgereke bi vî rengî çêdibû.

Her ku xebata me berfirehtir dibû, xebat jî hêdî bi hêdî ji hev û din cuda dibûn. Hin mijar zelal dibûn. PYD hebû, rêxistina jin û ciwanan çêbû, saziyên dîtir hatin avakirin, YPG jî weke hêza parastinê rêxistinbûna xwe çêkir. Bi taybetî bi avakirin û îlankirina koman bi awayê hêzeke xweser xwe tanzîm dikir. Dema ew xebat di astekê de rûniştin û zelal bûn, êdî dawiya sala 2011'an dihat. Bi destpêka sala nû re têkoşîn jî gihêşt asteke nû.

Li Minbicê jî Kurd hebûn û li wir jî rêxistinbûna me hebû. Wisa armanceke giştiyê Minbicê girtina me tine bû. Ji ber ku Ereb jî hebûn, da ku em Kurdên wê derê rêxistin bikin û li gel Ereban pergala wan çêbikin xebatên me çêdibûn. Ji milê leşkerî ve komên parastinê li wê derê jî çêbûbûn. Me yekîneyên wir dianîn Kobanê û perwerde dikirin. Bi vî rengî xebatên parastinê li wê derê jî hatibû avakirin û dimeşiya. Wê demê Reqa jî Kurd hebûn, rêxistinbûna me li wê derê jî di heman astê de bû.

Wê demê hevalê Qehreman berpirsyarê xebatên leşkerî yên Reqa bû. Di Reqa de jî komên veşartî hatibûn rêxistinkirin. Da ku êrîşek çêbibe, em bikaribin gelê xwe yê li wê derê biparêzin. Xeynî vê planeke me ya mezin ji bo Reqayê tine bû. Xebatên me li ser esasê parastina gelê Kurd yê li Reqa bû. Ji bo Minbicê jî nêzikbûneke wisa hebû û li gorî wê jî amadekarî û perwerdehî dihatin darxistin.

Li eniya Rojhilat hevala Şîlan kar dimeşand, pişt re li Efrînê şehîd ket. Ji ber ku hevala Şîlan girêdayî kar û xebatê xwe bû, yekîne û rêxistinbûnên me yên milê Rojhilat beriya her cihî çêbûn. Cîdî nêzik dibû, li ser karê xwe disekinî. Ji ber ku ji milê rêxistinkirinê ve berê jî daneheveke wê hebû, pir zû ciwan komî ser hev dikirin û dikarî wan bide meşandin. Rista xwe di wê derê de lîst. Bi taybetî bi gel re danûstandinên wê, têkiliyên wê pir bi tesîr bûn. Ji ber vê di Kobanê de bandoreke mezin da çêkirin.

Dema ku hevalên jin li cihekî weke Kobanê kar bikin, zêdetir bal dikşandin. Zêdetir nirx dayin û guhdarkirineke wan çêdibû. Di xebatên bajêr de jî hevala Zeynep hebû. Her çiqasa berê vê pir danehevên wê tune bûn jî, bi şêwaza xwe ya nêzikbûnê û rêxistinkirinê, zûtir ciwan û gel tesîr dikirin.

Di vê demê de çiqasa çek û derfetên me yên madî kêm bin jî, asteke xebatên leşkerî hat girtin. Quweteke ku bikaribe gelê xwe biparêze çêbûbû û şêwazeke tanzîmê derketibû holê. Di van deman de xebatên din yên rêxistinî û civakî jî di astekê xurt de dihatin meşandin. Cara yekemîn gel dikarî vîna xwe derxe holê û bikaribe xwe bi xwe biparêze. Hêdî bi hêdî ber bi rêxistinkirina vê pergalê ve çûyin çêdibû.

Her ku diçû rêxistinên jin û ciwanan, saziyên dîtir jî xurtir û berfirehtir dibûn. Her ku rêxistina me li Kobanê mezin dibû, wan partiyên dîtir li Kobanê bê rist diman û lewaz dibûn. Her ku ji milê siyasî û civakî ve pêşketinek çêdibû, asta rêxistinbûna me jî berztir dibû.

**3-Çirûska 19'ê Tirmehê**

***-Weke tê zanîn, şoreşa 19'ê Tirmehê di destepêkê de li Kobanê çêbû. Ev yek bi çi rengî pêş ket û bi xwe re hawayekî çawa afirand?***

**DILDAR KOBANÊ:** Me dixwest di 14'ê tirmehê de dest bidin ser tevahiya bajêr, lê me nikarî em hevalên xwe bidin qebûlkirin. Jixwe tiştek jî di destê dewletê de nemabû. Me dizanî ku ew dewleta li wir maye, nikare ber xwe

jî bide, tirsek mezin ketibû dilê wan. Ji ber vê me pêşniyar kir ku di 14'ê Tirmehê de Kobanê bê rizgar kirin. Hevalan di serî de got nabe; lê di 17'ê Tirmehê de li ser pêşniyara me heval hatin Kobanê, civînek darxistin.

Civîn li gundekî hat darxistin, lê dema em civînê de bûn, xeberek hat; gotin "*Arteşa Azad Cerablûs girtiye.*" Me jî di civînê de nîqaşa wê dikir. Piştî wê gotin "*Şêxler girtine.*" Me hema hevalan re got, *"telefonî gundar bikin, bila riyan bigrin.*" Hevalan li hemû sînorê rojavayê Kobanê ku dikeve navbera gundên Ereb û gundên me cihên kontrolê danîn. Jixwe Şêxler diket rojhilatê Firatê û girêdayî Kobanê bû. Piştî nîvro xeber hat ku li Sîrînê şer heye. Me hema, hemû heval rêkirin. Yên man tenê rêveberiya Kobanê û hevalên ji kordînasyona Rojavayê Kurdistanê bûn. Êdî me nîqaş kir û me heval jî îqna kirin ku em Kobanê rizgar bikin.

18'ê Tirmehê êvar ew bîryar hate girtin. Ji ber ku me dizanî li Kobanê rewş çawaye û dewlet di kîjan astê de ye, em ji xwe bawer bûn; lê hevalên kordînasyonê hinek bi fikar nêzik dibûn. Yek jî li Şêxler û Sirînê şer bû û hinek leşkerên wan ji bajêr derketibûn.

Me plan çêkir, da ku em wê şevê saziyan bigrin. Sê cihên Şebîbên BAAS'ê hebûn, du cihên partiya wan hebûn û hwd çend sazî hebûn ku me dixwest em êvarê bigrin. Hema me şeva yekemîn ew yek pêkanîn û me hevalên hêzên parastinê re jî got, *"amadekariyên xwe bikin da ku şeva dîtir jî em dest bidin ser cihên weke şûrta."* Lê di serî de meye dest cihê mûxabaratê nedabûya. Lewra hevalan digot, *"ger em cihên weke mûxabarat û emîn siyasî bigrin, dibe ku dewlet êrîş bike."* Ew roj ji bo me rojeke cûda bû. Gihêştina bîryareke wisa ne hêsan bû.

Me çawa bîryar girt, em çûn me rêveberiya meclîsa bajêr kom kir û me got em ê êvarî dest bidin ser hinek saziyan, sibê jî em ê tevahî cihên dewletê bigrin.

***-Wê demê hawayekî çawa çêbû?***

Di her hevalekî/ê de kelecanek cûda çêbû. Êdî dilê mirov di qefesê de hilnedihat. Tiştekî ku bi hezaran salan, hêvî dihat kirînbû. Weke xeyalekê bû. Dîsa di nava milet de tirsek hebû, digotin "*dibe ku dewlet êrîş bike.*" Lê hevalên kadro hemû bi bîryar bûn. Me hema hêzên parastinê komkirin û me dest da ser saziyên ku hatine diyarkirin. Lê cihekî xeter hebû; ew cihê BAAS'ê weke mexferekê bû. Di hûndirê wê de çekdar hebûn, me nêzî donzdeh çekan ji wir girtin. Me derdora wir girt û komek heval ku ji çar kesan pêk tê jî me şand hûndir û me got, *"vê derê radest bikin.*" Dema ku dîtin derdorên wan hatine girtin, qana bûn û derketin. Bi vî awayî şer derneket. Me nehilişt ku tiştekî jî derxin. Wê êvarê hemû cihên ku me diyar kiribûn bê pirsgirek girtin.

Sibê hemû gel kêfxweş bibû. Li gorî planlamaya me divê cihê mayî jî me êvar bigirtana. Lê telefonek hat, hevalan gotin *"me li ser rê mûdûrê mintiqayê û Emîn Cewî girtiye.*" Êdî em neçar man ku bikevin tevgerê. Me xeber da peywirdarên din yên dewletê jî. Da ku em cihekî kom bikin û bi wan re biaxifin, lê gotin "*em newêrin werin, lewra hûnê me bigrin.*" Mûdûrê mintiqayê jixwe di destê me de bû; me wî re got "*tu gazî bike, em tiştekî nakin.*" Di encamê de hatin, lê ji tirsan rengê wan çûbû. Me rewşa siyasî ji wan re got; me got, "*jixwe Arteşa Azad Cerablûs girtiye, Tirk ketine tevgerê, ger bikevin Kobanê rewş dê baş nabe. Jixwe me derdor jî girtine, em naxwazin xwîn birije, em dixwazin bê şer ew mesele hal bibe.*" Wisa bi awayekî berfireh me rewş vekir.

Di vê navberê de hevalan xeber dan, gotin tensîqiyetan çek girtine û ber bi me ve dimeşin. Nêzî sed kesî bûn. Me jî got, "*pêşiya wan bigrin û ger venegerin lêxin.*" Lê tirsan vegeriyabûn. Van peywirdarên dewletê jî telefon guhdarî dikirin, me got "*vaye rewş diyar e. Ger em negrin, dê tensîqiyat bigre.*" Di vê navberê de seyareyek dewletê jî ji şer reviyabû û li hacizê Helebê hevalan girtibû. Me ew kesên dewletê hemû şandin, lê me got "*dema girtina me ya bajêr de divê guleyek jî neteqe.*"

Hevalan Mexfer girtin, gel jî rabûbû ser piyan. Me ew leşkerên girtî jî çekên wan jê girtin, kincên leşkerî jê kirin û me got biçin. Ew çek jî me anîn asayîşê. Di wê navberê de me dît yên tensîqiyatê jî ketine dewrê. Me xeber da hevalan û em çûn Emîn Cewî, me got "*hereket nekin, an na em ê we bikujin.*" Hevalan ew der girtin û alek jî li wir ve kirin. Em çûn Emîn Eskerî, 48 leşker tê de bûn. Gotin, "*em bexta we de ne, me nekujin.*" Rih di wan de nemabû. Me ew der jî girt. Heya ku em xwe bigihînin Emîn Siyasî, wan zilaman xwe gihandibûn wir û belge şewitandibûn. Lê hevala Şîlan çûbû û ew qewitandibûn. Xeynî wê me nehilişt cihekî din belgeyan bişewitînin û li her cihê me girt jî me alên TEV-DEM'ê daliqandin.

Heya ku me ew der girtin, em çûn ku ew tensîqiyat çûne û ala xwe danîne ser şaradariyê û kêf dikin. Em çûn, me got "*wê alê daynin. Lewra ew cihê gel e, ne yê dewletê ye. Jixwe me bixwasta me ji zû ve ew der digirt.*" Ala xwe danîn. Çend cihên din xirabe hebûn, ala xwe danîbûn. Lê hevalên ciwan gotin; "*dev jê berdin*." Gotin, "*em niha bibêjin van alan daynin, dê bêjin qey me çikiriye. Lê em ê çend caran ji ber re derbas bibin û bibêjin seata we xweş, dê xwe bi xwe biçin.*" Bi rastî jî wisa bû. Jixwe cihên hilweşiyabûn. Weke cihê pez kar dianîn. Bi vî rengî me hemû cihên dewletê girtin û alên xwe daliqandin. Li me dest nedabû ser çekên hinekan û weke dîl me di hûndir de dihiştin. Me nobedar danîbûn ber derî û ew jî di hûndir de bûn. Lewra hê jî dê çi bibe, ne diyar bû. Dibe ku teyare jî rabikirana.

**19’ê Tirmehê zayineke nû ye**

Mirov nikare wê rojê bîne ziman. Hemû gel bi çekan daketibû kolanan. Coşek pir zêde hebû. Fikara qazayan jî hebû, jixwe guleyek teqiyabûya dibe ku hêzên dewletê jî xwe biparastina. Dê wê demê alozî derbiketa. Di encamê de bêyî ku qezeyek çêbibe, me her cih girt. Wisa heya çend rojan, li cihekî ku alek cûda mabe û tiştekî ku neketibe kontrola me tune bû. Jixwe berî şoreşê, me li Kobanê çend saziyên gel û dewletê hene diyar kiribûn û di hûndirê wê de jî çi heye diyar kiribû. Mesela di dibistanan de çiqasa pênûs û jêbir hene, me lîsteya wan jî derxistibû û ji mûdûrên wir jî dabû îmzakirin. Me gotibû, “*ger tiştek ji van tiştan winda bibe mûdûr û meclîsa gund û taxan berpirsyar e.”*

Me nehilişt ku tiştekî biçûk jî di dema şoreşê de bê dizîn. Maşîneyek çar teker çûbû, ew jî me dîsa vegerand. Yek jî dema ku mexfer hate girtin, gel hin tiştên dewletê dest danibûn. Lê me nehilişt, car din me ji wan girt. Me pêşî li tiştên wisa digirt.

Di dema girtina bajêr de, em wisa difikirîn; me digot bila bê bûyer û bê pevçûn bikeve destê gel. Lewra ger di rizgarkirina bajarê yekemîn de, dema tu rabê û hin gengeşî derkevin û şikestinekê jî bixwê, dê cihên dîtir jî xeterbûya. Jixwe bajarên Ereban dewletê destûr nedida ku tiştekî wisa bibe, lê ji bo Kurdan çawa tevgerîbaya? Ji vî alî ve fikarên me hebûn. Dewletê jî nedixwest, navbera xwe û Kurdan pir xirab bike. Ew hevsengî me baş dimeşand, dê kengê kîjan gav bê avêtin me pir zirav hesap dikir. Bi hevalan re jî em her di nava danûstandinan de bûn û me bi awayekî kordîne kar dikir. Me hasasiyet pir zêde ber çavan digirtin.

Bi awayekî ekîbî kar kirina hevalan jî girîng bû, vê dihêlişt ku em bîryarên rast bidin û pengavên rast biavêjin. Jixwe di pratîkê de jî diyar bû, cihên ku rihê hevpar yê rêveberiyê tunebe û her kes bi serê xwe tevbigere; dê kar çiqasa hêsan be jî serkeftin ne gengaz e. Di Şoreşa Rojava de, li hin cihan ew pratîk derket. Li ku kîjan bûyer û pêşketin çêbûbûya, hevalan hema bi riya telefonê em agahdar dikirin. Jixwe wê demê cîhazên muhabere, çek û hwd di destê me de tune bûn. Me bi telefonan hev û din agahdar dikir.

Wê demê di destê me de pir çek tune bûn, YPG jî xwe bi giştî rêxistin nekiribû û bi awayekî veşartî tevdigeriyan. Hêdî bi hêdî weke yekîneyan derdiketin holê.

Dema ku me bajar rizgar kir, rihekî şer û berxwedanê yê hêzên dewletê nemabû. Bi alîkariya meclîsên taxan û komîteyên parastinê me hemû sazî girtin. Hinek saziyên weke banka, firin û şaredarî me alên xwe lê nedaliqandin. Lewra jixwe ew saziyên gel bûn, endamên dewletê li wan deran tune bûn. Lê saziyên ku dewlet tê de bû û me bikaranîbana hemû me digirtin û alên TEV-DEM’ê lê didaliqandin. Jixwe saziyên dewletê yên herî esasî li Kobanê; Emîn Siyasî, Emîn Eskerî, Emîn Cewî û Emîn Dewle bû. Leşkerên van hemû hevalan girtibûn, leşkerên wan jî hemû Ereb bûn. Dema ku ew cih hatin girtin, jixwe pişt re qûwetên YPG jî hatin, li hemû bajêr kontrol ket destê me. Heya nîvro her tişt xilas bibû.

Li mexferê heval hinek ketibûn zehmetiyan. Lewra gel xwestibû tiştan talan bike, lê hevalan pêşî lê girtibû. Her hevalek bi berpirsyarî û kedeke mezin tevdigeriya, da ku zirarek neye gel. Şoreşa 19’ê Tirmehê, bi vî awayî sibê di seat 8’de destpêkir, heya nîvro gihêşt encamê.

Wê rojê kelecanî û coşek mezin hebû. Lê fikarên me jî hebûn, da ku tû qeze çênebin. Lewra her kesî dest dabû çekan. Me got, “*xeynî komîteyên parastinê û asayîşê bila kes dest nede çekan.*” Êvar em bi van partiyên din re jî rûniştin. Me got, *“vaye me her cih girtiye, werin em bi hev re rêvebibin.*” Me got, *“li her saziyekê de penc hevalên me hene, hûn jî li her saziyekê penc endamên xwe deynin.”* Jixwe fikir û planek wan ji bo şoreş û rizgarkirina bajêr tune bû. Xwe bi xwe re digotin, “*jixwe Arteşa Azad vê derê rizgar bike, em ê jî di nav de cih bigrin.”* Dê ew jî bibana hevkarên Arteşa Azad. Derde wan ew bû ku dê pêşiya şoreşê çawa bibin asteng. Li ser vê difikiriyan.

Dema ku me meclîs ava kirin wisa bû, dema ku me haciz danîn wisa bû, dema ku me asayîş çêkir wisa bû. Diçûn û şikeyeta me ji dewletê dikirin. Digotin, “*dewlet li ku ye, van ew qesa tişt dikin.*” Ew belgeyên wan jî, di van saziyên dewletê de derketin. Li gorî perspektîfên partiyên Kurd tevdigeriyan, ku ew jî bi Tirkan re hev kiribû û dê li Rojava çawa şoreş pêk naye, li ser vê kar dikirin. Dixwestin Cizîrê ji wan ra bihêlin, Efrîn û Kobanê jî Tirkan re bihêlin. Hê jî ew projeya wan berdewam dike.

Dema ku ew plana wan tam negihêşt serî, Arteşa Azad xistin dewrê. Ew jî nebû, El Nusra û DAIŞ xistin dewrê. Her wiha di dema şoreşê de ev partiyan tevgeriyan. Rûxmî ku me got, *“bila bên em bi hev re saziyan û bajêr bi rê ve bibin”* jî, pirsgirek derxistin.

Bi kûrtasî ew pengavên ku yek bi yek me li Kobanê diavêtin, di 19’ê Tirmehê de gihêştin lûtkeyê û şoreş pêk hat. Dewlet li Kobanê ji holê hate rakirin. Karê aborî, civakî, siyasî, parastin û hwd hemû di destê me de bû. Jixwe ji van qadan, ew demek bû me kar dikir. Bi awayekî pratîkî me ew kar dimeşandin, jixwe dewlet wê demê têk çûbû. Demeke dirêj me dewlet xistibû dorpêçê, bêyî destûra me nedikarî bikeve bajêr û bajêr derbikeve jî. Di heman

demê de meclîs hatibûn avakirin, komîteyên parastinê çêbûbûn. Malên gel dihatin avakirin, saziyên gel û civakî dihatin avakirin. Medrese ketibûn destê me, mamosteyan akademiyên xwe çêdikirin. Binesazî çêbûbû.

Jixwe ew hemû bi plan pêş ketibûn, da ku Kobanê ji roja şoreşê re amade be. Ger wisa nebûya, pergalek rûneniştibûya; dê roja 19'ê Tirmehê her tişt tevlî hev bûbûya. Li ser vê esasê me gel jî agahdar û zane kiribû. Gav bi gav em ber bi çi ve diçin, em ê çi bikin? Ew hemû hatibûn diyar kirin û gel jî di vê mijarê de hatibû serwextkirin. Tenê roja dawî ku hêzên dewletê bi tevahî ji bajêr bên derxistin mabû. Wê rojê dema ku her kesî dest avêt çekan, em hinek tirsiyan. Jixwe gelek kesên ku dixwestin tevlîheviyê derbixin hebûn.

Dema ku em wan partiyên din re rûniştin, gotin "*we mala gel vekiriye; divê mûqûbilî wê hûn cihekî bidin me, da ku em mala Kurdî vekin.*" Gotin, "*we cihek daye PYD, mûqabilê wê hûn her partiyekê cih bidinê.*" Gotin, "*cihê ciwanên we heye, divê mûqabilê wê hûn her baskên ciwanan yên partiyên me cihekî bidinê*." Me hesap kir, ger em hemû malên welatparêzên xwe jî bidin wan têrê nake. 28 partî û tensîqiyat bûn. Ew tensîqiyatên di bin banê ENKS'ê de hemû hebûn. Me got, "*em nehatine ji bo parve kirine malan; ew mal, mala gel e, dê xizmeta gel de be. Em dibêjin, bên em bi hev re rêve bibin. Ew cih ne yên me ne; ne jî yên we ne.*" Piştre navber dane, nakokî ket navberê wan. Hinekan got, "*em dixwazin cûda bi we re biaxifin*." Jixwe hemû komikên biçûk bûn. Tenê di tiştekî de me hev kir, divê xeynî qûwetên leşkerî û asayîşê kes çekan raneke. Ew jî me di nava gel de îlan kir. Wê rojê em çûbûn dûnyayek din, ew hesreta bi hezaran salan me jiyan dikir. Ew roja şoreşê, weke ew dayika ku di roja vekirina dibistana zimanê Kurdî de digirî, bi sedan mirov wisa lê hatibû. Hinek fikarên gel jî hebûn, digotin "*gelo ew rewş mayinde bibe, an na? Dê dewlet êrîş bike, an na?*" Lê me tevdîrên wê jî girtibûn.

***-Ti hewldanên dewletê yên êrîşê çênebûn? Ew dîlên di destê we de çi lê hat?***

Ew mûxabarat û leşkerên ku me girtine, heya demekê me di wan bînayan de girtî hiştin. Me nobedar danîbûn ber deriyan. Da ku dewlet jî nikaribe bi hêsanî êrîş bike, an jî êrîşên hawayî pêk bîne; me ew di nava bajêr û di destê xwe de digirtin.

Roja ku Desteya Bilind hat avakirin û me dixwest li gel partiyên din bi hev re meşê darbixin; gotin hinek Ereb bi we re dixwazin hevdîtînê bikin. Me zanibaya Arteşa Azad in, em bi wan re rûnediniştin. Lewra em di meseleyên siyasî de, pir bi wan re rûnediniştin jî. Lijneyeke me ya meclîsê hebû, ew pê re rûdiniştin. Meseleyên leşkerîbana, hevalên me yên berpirsyarê parastinê jî pê re rûdiniştin. Di dema wê meşê de hatin, derketin ku Arteşa Azad in. Tirkî jî diaxifiyan û her dixwestin me tehrîk bikin. Gotin, "*hûn ê ew endamên mûxabaretê di destê xwe de bidin me.*" Her wiha digotin, "*hûn bi rejîmê re ne, hûn ne bi şoreşê re ne.*" Wisa em tehrîk dikirin.

Hat cihekî wisa ku me ew pê re got; "*dema ku hûn zilamên dewletê bûn, em li hemberî we şoreşger bûn.*" Jixwe yên wisa di nava wan de hebûn. Piştre gotin, *"hûnê çek û maşîneyên ku we ji dewletê girtine bidin me.*" Me jî got, "*hem weke Kurd hem jî weke tevger, tiştekî wisa di exleq û rêgezên me de tine. Ne ku me girtibe, ger mirovek xwe biavêje mala me jî em radestî kesî nakin.*" Lewra êdî xwe xwediyê Sûriye dîdîtin. Piştre zilaman got, "*şerê me yê esasî ne bi rejîmê re ye; piştî ku me karê rejîmê xilas kir, şerê me yê esasî bi we re ye.*" Xwest me tehrîk bike, nikarî ser bikeve. Piştre bi xwe tehrîk bû û tiştên di hûndirê xwe de gotin.

19'ê Tirmehê, hem weke kes hem jî weke gel; ji bo me zayineke nû bû. Coşek cûda bû. Coşa gel jî pir pir zêdetir bû. Tabî barê me jî giran dikir. Dewletê jî nikarî refleksekê nîşan bide. Endamên dewletê yên di nava Kobanê de jî, jixwe bê bandor bûbûn. Derdora me jî dewlet nemabû. Cerablûs, Minbic, Sirîn hemû opozîsyonê girtibûn. Êdî piştî 19'ê Tirmehê baweriya gel jî yekser gihêştibû lûtkeyê. Ew tirsa dewletê ku gav bi gav dişikest, di 19'ê Tirmehê de yekser şikest.

Êdî em ketin nava tevgerê û me hem saziyên xwe yên berê ji nû ve rêxistin kirin, hem jî yên mayî me xilas kirin. Li gorî belgeyên ku ketine destê me, me tevdîrên xwe jî girtin. Me nehilişt ku tu sazî jî bisekinin û karê xwe nîv de bihêlin. Me ew kesên di wan saziyan de kar dikirin, ne qewirandin. Piraniya wan dîsa karê xwe berdewam kirin. Yên çûyî jî, me hema cihê wan dagirt. Jixwe me nehilişt ku ew tiştên di hûndirê van saziyan de jî biçin. Me berê ceribandibûn, tenê li cihekî hinek tişt çûbûn; maşîneyek, televîzyonek, makîneyek fotoqopî û hin tiştên wisa hûrik û berik çûbûn. Jixwe me hemû jî dîsa vegerandin. Bajarekî ew qesa mezin de, di demeke wisa bi aloz de tenê ew tişt çûbûn. Tû cihan tiştekî wisa nehatiye dîtin. Her tişt di bin kontrolê de bû.

Hinek çekên giran, dema ku leşkerên dewletê çûbûn şerê Cerablûsê bi xwe re biribûn, ew venegerîn. Dibe ku ketibin destê Arteşa Azad jî. Xeynî wê hemû çek jî ketin destê me.

Di van deman de, li Helebê rojekê dewletê top avêtin taxa Şêx Maxsûda ku di destê me de bû. Me got, em jî van dîlên di destê xwe de berdin. Me şevekê maşîne amade kirin û bêyî ku tiştekî xwe jî bigrin, me ew komkirin û şandin. Hevalan biribûn û nêzikî hacizê Sirîn berdabûn. Jixwe wê demê hê hacizê Sîrîn di destê dewletê de bû. Yekî wan jî dabancayek biçûk pê re mabû, hevalan di rê de ferq kiribûn û ew jî jê standibûn. Ew yek piştî dû mehan pêk

hat û êdî Kobanê tû endamên dewletê neman. Piştî vê êdî dema pêvajoyê avakirinê bû. Divê êdî em li ser pêwistiyên gel bisekinîbana û me tevdîrên wan bigirtana.

***-Di nava vê şoreşê remza ku herî zêde derket pêş çi bû?***

Gelek bûyer û meseleyên dûv dirêj hene ku mirov nikare vegotina hemûyan bike. Ji van bûyeran jî diyar dibe ku ew şoreş, şoreşa Serokatî bû. Ger milet di vê demê de guhdariya me kiribe, xêra Serokatî û partiyê bû. Hêz û keda Serokatî bû. Hêz û baweriya hezaran şehîdan bû. Dîsa keda gelek hevalên ku şev û roj nesekinîn û şoreş gihandin wê astê bû. Hevalên ku li wir bi awayekî hevseng kar kirin û ew xebat gihandin wê astê jî kedeke giran bûha xerç kirin.

Foto-6

Şoreş bi piranî çekdarî tê dest girtin, lê di mînaka Rojava û Kobanê de jî diyar bû ku şoreş tenê wisa pêk nayen. Mesela roja ku Kobanê rizgar bû tenê fîşegek jî neteqiya.

Şoreş armancek e, rê û rêbaz in. Tu bi kîjan rê û rêbazê bigihêjê armanca xwe, şoreşa herî baş ew e. Rêbaza gihandina armancê ye. Ger dervayî rêbazên çekdarî, rêbazên baştir hebin; çima xwîn birije? Ger di destpêkê ve me ew qesa tevdîr negirtibana; ger gav bi gav me ew pêşketinan çênekiribana; ger me dem û cih rast bikarneanîbaya dê tiştên cûdatir derbiketana. Di cihekî weke Sûriye ku rejîmeke zalim li ser e, dê pir xwîn bihata rijandin. Dê komkujî çêbûbana.

Li cihên din yên Rojavayê Kurdistanê jî heman rêbaz kar hat. Lê Kobanê pêşengtiya vê kir. Mesela dema ku Dirbêsiyê jî hat rizgar kirin, ez li wir bûm. Heman rêbaz hatin karanîn. Dema ku şerê Serekaniyê destpê kir, me li Dirbêsiyê kontrol xist destê xwe. Li wir jî fîşekek neteqiya. Tenê dema ku ala me hate daliqandin, ji bo pîrozbahiyê fîşek hatin teqandin. Mînaka Kobanê, bû danehevek tevgerê. Dewletê jî dît ku me endamên wan nekuştin û armanca me cûda ye. Ew hêzên din yên opozîsyonê, diçûn kû û kuder bi dest xwe dixistin; hinekên wan didaliqandin, hinekên wan maşîne ji ser re dibirin. Lê me yên di destê xwe de jî, bi saxî birin radestî xwediyên wan kirin. Ew jî di demê wê de me kir. Mesela yên li Kobanê di destê me de bûn, di dema ku rejîmê êrîşî Helebê kir me şandin. Hemû karê xwe jî di dema wê de û bi awayekî mafdar me dikir. Ji ber vê dewletê jî nedikarî dengê xwe derbixe.

Me rewşa derdorê û hemû partiyên din, bi ziravî hesap dikirin. Ger em wisa tevnegeriyabana, dê em nedigihêştin serkeftinê. Jixwe weke me berê jî got, bi kuştina Emîn Cewî êdî Kobanê di destê me de bû. Di van pêvajoyan de, rûxmî ku baş fêmnedikirin, gel jî li gorî tevgerê diket hereketê. Ango bi Serokatî û tevgerê ve ew qesa girêdayî bûn ku, rûxmî her tiştî bi me re bûn. Dema ku me şaştiyek jî bikira, hema bertek nîşan didan. Serokatî ew perwerde kiribûn.

***-Piştî şoreşa 19'ê Tirmehê li Kobanê tiştekî din ku hûn dixwazin balê bikşînin ser heye?***

Li Kobanê bûyereke din ya sosret jî qewimî. Dû gundên nêzî hev hebûn. Eşîrên cûda bûn, lê her du gund jî bi me re bûn. Gundekî wan jî bi her tiştê xwe bi me re bû. Ango zêdetir nêzikî me bû. Haciz me li wir danîbû. Dema ku hinekên wan heşîş tînin û nêzikî haciz dibin, berê maşîneya xwe didin deştê. Hevalên ku li haciz bûn gûman dikin û pêy wê maşîneyê dikevin û digrin. Hinekên wan jî direvin û xwe digihînin gund. Yên gund kom dikin û êrîşî haciz dikin. Di wê êrîşê de yek tê kuştin. Yên ku êrîş dikin, ji gundê Aşmê ne. Yên ku li hacizê dimînin jî ji gundê Cibînê ne. Yê tê kuştin jî ji Aşmê ye.

Her du jî eşîrên mezin bûn, di nave her yeke de jî deh-donzdeh bavik hebûn. Jixwe li Kobanê yek bê kuştin, sûlh tine ye. Divê heyfa xwe helînin. Wê demê hê nû şoreş pêk hatibû. Me gazî hevalan kir û me hemû hêzên leşkeri kirin navbera van her du gundan. Lê dibêjin, "*ti alaqaya me bi partiye ve tine, meseleya me bi vê eşîrê ve heye.*" Wî gundî hinekên wan jî li jorî sînor, li Bakur bûn. Li wir cerdevaniya dewletê dikirin. Tirkiye jî bi riya wan, ew tehrîk dikirin û tevlîhev dikirin. Me nehilişt ku bibe meseleya eşîran.

Me çi kir jî qana nebûn. Dibêjin, "*mêrek ji me hatiye kuştin.*" Weke rêxistin me got, "*hacizê me ye. Kê kuştibe jî mesele ya me ye. Hûn çi dixwazin em amade ne.*" Destê hêzên derva tê de hebû. Lê me zû mûdaxale kir, hê ku şerekî mezin di navbera wan de neqewimiye, me mûdaxale kir. Me berpirsyarê eşîran hemûyan kom kirin û me got, *"em meseleye hal bikin."* Hinekên nakokî derdixistin jî hebûn, me got "*ger sibê tiştek çêbe, em we nas dikin."* Me bi berfirehî cemeat agahdar kir û me got *"çi dibe bila bibe hûnê vê meseleyê hal bikin.*" Bi vî rengî çareser bû.

Yek jî li Kobanê, piştî şoreşê van partiyan tên zanîn konevaniya heşîşê dimeşandin. Ji bin ve li gel Tirkan çandina heşîşê belav kiribûn. Gelek kesan jî çandibûn, malbatên me yên şehîdan jî çandibûn. Xebera me jî lê tune

bû. Gotibûn, *“hevalan jî gotiye, milet feqîre bila xwe re biçîne.”* Lê xebera me tune bû. Carekê me dît ku li Kobanê her kes axê dikşîne ser xaniyên xwe û dibêjin em çandiniya gulan dikin. Me jî got, *“şoreş e, bila her cih bibe gul.”* Lewra heya wê demê dewletê ne dihêlişt ku darekê jî biçînin. Piştî demekê em pêhasiyan ku her cih bûye heşîş.

Tiliya PDK’ê û Tirkan tê de bû. Tovê wê bê pere belav kiribûn. Armanca vê, xirabkirina civakê bû. Yek jî dixwazin pê me teşhîr bikin. Me hema civîn çêkir û me tekmîl da kordînasyona giştî ya Rojava. Hevalan got, *“mûdaxale bikin.”* Me meclîs kom kirin û hemû rêveberî me kirin tevgerê. Me li her cihî civîn darxistin. Me xwest gel di vê mijarê de zane bikin. Me dît ku kes kom nake, me mûdaxale kir. Me ji malbatên şehîdan destpê kir. Me di serî de yên wan kom kirin. Me amadekariya operasyonên mezin dikir, lê hevala Şîlan hat û got, *“her kesî li hemberî me dest daye çekan.”* Gundên herî nêzikî me jî wisa kiribûn. Xeynî mûdaxaleya leşkerî çareya me nemabû.

Van partiyan jî di nava xwe de civîn çêkiribûn û ji bin ve gel re digotin, “*heşîşa xwe ranekin.*” Gotibûn, *“ger bûyerek derkeve û çend kes bimrin; dê hemûyê werin aliyê me.”* Ger me bi komîteyên parastinê mûdaxale bikira, dibe ku careke din mesele bizivirandina meseleya eşîrî. Ji ber vê me ji derve hêz xwestin. Heval hatin û operasyonê destpê kir.

Gundê Til Xezel hebû, 4-5 malbatên me tê de bûn. Yên mayî ji partiyên din bûn. Vî gundî berê jî pirsgirek derxistibûn. Dema ku YPG hat îlan kirin, gund bi gund digeriyan û propaganda dikirin. Dema diçin vî gundî, ew jî li ser navê hêzên parastinê li hemberî hevalên YPG çekan dikşînin. Gotibûn, “*em nahêlin bikevin gund.*” Hevalan nêzî 500 arabeyî tijî heval kiribûn û ber bi gund ve çûbûn. Lewra divê cihekî ku em nekevinê li ser vê axê nemîne. Pişt re hinek ketin navberê û me heval dan sekinandin. Weke şandeyek meclîsa bajêr em çûn gund. Lêborîna xwe xwestin. Lê me got, “*dê hevalên YPG bên û bikevin gund û di meşa bajêr de jî hûnê werin û li ser megafonê lêborîna xwe bixwezin.”* Wisa jî bû.

Vî gundî piştî wê demê doçqa kirîbûn. Dema ku heval ji bo heşîşê kom bikin diçin vî gundî, bi doçqayê êrîşî hevalan dikin. Hevalan jî lêxistibû û yek kuştibûn, dest danîbûn ser doçqayê jî. Bi vî awayî li hemû Kobanê heşîş hate rakirin. Pişt re li Efrîn û hin cihên din jî operasyonên heşîşê hatin çêkirin. Lê van partiyên din siyasetekê pir qirêj dimeşandin. Piştî rakirina heşîşê, rabûn û li hemberî me meş darxistin. Her tişt jî xwe dikirin û diavêtin ser me. Lê her tişt di pratîkê de diyar dibû.

***-Şoreşa 19’ê Tirmehê, hûn dikarin çawa vebêjin?Dema ku 19’ê Tirmehê gav gav vedigeriya rojeke şoreşê, hûn jî di nav de bûn. Bi taybetî ji bo wê rojê hûn dikarin çi bi me re parve bikin?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Di 19’ê Tirmehê de dema Şêxlera jor û jêr şikiya, bûrokrasiya dewletê ya di Kobanê de dest bi revê kir. Hemû rêkên diketin bajar me xistibûn kontrola xwe, hacizên me li ser hebûn, şev û roj me kontrol dikir. Demjimêr 6 sibê bû, li ser riya Helebê hevalên me berpisyarê Emin Siyasî bi heft kesan ve girtin ku di maşineya wan de tijî çek bûn. Dixwestin ji Kobanê birevin. Berpirsiyarê ewlekariya hewayî hevalan di demjimêr 7’ê sibê de li ser riya Cerablûsê girtin.

Me bîryar girt ku dewlet bi hemû saziyên xwe ve teslîmî me bibin, bêyî ku şer bikin û ew kesên rehîn dewletê agahdar bikin. Lê wan kesan qebûl nekirin. Di vê esnayê de dewletê birindarên xwe yên ku di Şexlerê de çêbûne anîn nexweşxaneya Kobanê.

ENKS jî di vê esnayê de firsed dît, meş lidarxist û xwest êrîşî birîndarên di nexweşxanê de bike, lê hevalan nehêlan. Xwestin êrîşî saziyên din yên dewletê bikin. Heval Enwer me şand, me got “ji wan partiyan re bêje bila belav bibin.” Jixwe piştî hevdîtinê belav bûn. Wê demê şehîd Kendal, Şahîn, Dildar, Rojîn, Zeynel wana hebûn; me bi wan re niqaş kir ku yên me belav kirin îhtimale dîsa xwe kom bikin û êrîşî saziyên dewletê bikin û bixin destê xwe. Pêwîst e em lez mûdahale bikin.

19’ê Tîrmehê di demjimêr 12’ê nîvro de me rabû dest danî ser hemû saziyên dewletê yên di Kobanê de. Em di girtina Siyasî Şûbê de direng man, partiyeke girêdayî ENKS‘ê dest danî ser. Di wê demê de ji ber jimara hevalên pêşeng kêm bû, me nedikarî em kontrol bikin.

Ev girtina bajar û saziyên dewletê bi xwe re pêvajoyêkî nû dianî. Di hundirê bajêr de di du navendan de quwetê wan yê eskerî ma. Yek fermandariya hêzên hawayî bû û ya din jî baregeha Eskerî bû. Me nobeta wan digirt, bi vê me dixwest em helwesta dewletê fêm bikin û me wan rehîn girtîn. Heya tebaxê jî ew di destê me de man. Qaymaqam, mûdir, berpisyarê baregehê, albayek û hinek eskerên wan bûn. Pişt re dema dewletê êrîşên hewayî li ser Şexmeqsûd kir û Kurd hatin qetilkirin, me bîryar girt ku em van ji bajêr biqewitînîn. Ez bi kurtasî van dikarim lê zêde bikim.

**Bihara Ereban zivirî bihara Kurdan**

***-Şoreşê bi xwe re kîjan encam derxistin? Ji ber ku ceribandina ewil bû gelo astengiyên ku derdiketin hebûn?***

Girtina Kobanê di Rojava de bû şoreşek. Gava yekemîn ya şoreşê bi vî awayî hat avêtin. Mirov dikare bêje bihara Ereban zivirî bihara Kurdan di 19'ê Tîrmehê de. Ji vê dîrokê û şûn ve êdî her kes mecbûr ma ku Kurdan jî hesab bike. Di berê de çi pilan bihatana kirin ji derveyî Kurdan dihatin kirin, yan jî li ser tinekirina Kurdan dihatin kirin. Ev dîrok bû sedem ku êdî herkes Kurdan bihesibînin û gelê Kurd ji tê de cihê xwe bigirin.

Piştî vê pevajoyê gelê Kobanê û gundên Kobanê xwe bi xwe rê ve birin. Gundên Ereban bi viya qayil nebûn, artêşa Suriyê jixwe rêxistinkirina kurdan ne razîbû û tehamûl nedikirin. Ji bo vê dem bi dem astengî li herêmê derdixistin. Qutûzad qut dikirin, insanên sîvîl digirtin. Kesên diçûn Helebê, Reqa direvandin û digirtin.

Bi vî awayî dihat xwiyakirin ku ji Kurdan û xwe rêxistinkirina Kurdan nerehet in. Me pêwistî dît ku em pêwistiyên gel tedarîk bikin, ji ber heya wê rojê dewletê her tişt ji derve anîbû, gel wisa fêrkirîbûn. Me hinek aş kirîn û anîn, ji bo genimê xwe bihêrin, me jenerator anîn û bi vî awayî hinek gav hatin avêtin.

Sîstema bajêr weke sistêma gundan bû. Di despêkê de, dewletê giringiyek nedabû bajêr. Dema şerên ku di 2010'an de li Şam, Heleb çêbûn, gel koçberî Kobanê bibû û Kobanê mezin dibû. Di hundirê du salan de nifûsa wê bû du qat. Bi zêdebûna şêniyê re binêsaziya bajêr, elektirîk, nan û qut têrê nedikir, me van kêmaniyan tedarîk dikirin. Ji bo kêmaniyên gaz, benzîn dernekevin me hin refîne danîn.

Di 2013'an de me rêveberiyek sîvîl ji civakê ava kir ku civakê di her qadê de rê ve bibe. Di Kobanê de kanton hate avakirin li ser vê, meclisa gel ku bikare tevayî kar û barên gel re bibe bersiv me da avakirin. Rêveberiyên kantonan hatin avakirin, ji bo ku van kantonan di her beşê civakê de karibin civakê temsil bikin li gorî wê endam hatin amadekirin.

Meclisa gel ya Kobanê endamên xwe yên ku di xebatan û saziyan de cih bigirin bi hilbijartina bi rengekî demokratîk hilbijartin û kirin rêveberên xwe. Ji bona ku vîna gel bîşkênin, dijmin maşîneyek bomba barkirî di Heyva Sor de teqand. 12 insanên sîvîl ku piranî zarok bûn jiyana xwe ji dest dan. Sê çar kes jî ji wan Ereb bûn. Jixwe Ereb di Kobanê de tune bûn, tenê du mal bûn ew jî tesadûfî hinek ji wan di wê êrîşê de jiyana xwe ji dest dan. Bi kurtasî hem li Kobanê, hem jî giştî Rojava û Sûriye, şoreşa 19'ê Tirmehê tesîreke mezin kir. Ji ber ku di destpêkê de pergal baş rûneniştibû, hin pirsgirekên civakî derdiketin, lê bi rê û rêbazên guncav dihatin çareser kirin. Ji bo çareseriya hin tiştan jî pêwîstî bi plansaziyên dûvdirêj hebû.

**4-Piştî Şoreşê Li Kobanê Xebatên Avakirinê**

***-Piştî ku di 19'ê Tirmehê de Kobanê ji dewletê hate paqijkirin, ji milê avakirina pergalê ve kîjan xebat pêş ketin?***

**ZELAL EFRÎN:** Li gorî cihên din, li Kobanê hevalên ku pergalê ava bikin pir kêm bûn. Ji ber vê jî pergalek hatibû avakirin, lê ne berfireh bû. Di rêxistinbûna TEV-DEM'ê de kêmasî hebûn. Li bajêr hinek rêxistinî pêş ketibû, lê ya gundan lewaz bû. Gund jî weke 3 xetan hatibûn diyar kirin; xetên rojava, rojhilat û qûble. Di her xetekê de nêzikî 100 gund hebû û hevalekî xort û hevaleke jin lê diman. Gelek caran jî hevalên jin tenê lê meyze dikirin. Ji ber vê jî rêxistin lewaz bû, pergaleke baş nehatibû rûnişkandin. Zehmetiyên Kobanê jî zêdetir bûn, lê di serî de ev encamên kêmasiyên me bûn.

Li Kobanê hinek hişkbûn hebû, heya ku îqna nebana, xwe tevlî kar nedikirin. Ji milê jinê ve jî wisa bû. Ez li milê rojhilat disekinîm. Karekî pir berfireh dihat xwestin. Li hin gundan meclîs tine bûn, di destpêkê de me xwest em meclîsan di wan gundan de ava bikin. Jixwe li gelek gundan meclîs hatibûn avakirin û me xwest em berfirehtir bikin. Gelek hevalên welatparêz ku di rêveberiyên meclîsan de cih digirtin hebûn. Mesela hevalê Mehmûd hebû, di komkujiya Kobanê de şehîd ket. Zêdetirî 2 salan, rêveberiya xeta rojhilat kir. Ji aliyê avakirina meclîsan ve rûnişkandina pergalê de ristek girîng lîst. Bi xwe jî ji gundê Helincê bû. Gundekî her li gel tevgera me ye û şehîdên wan jî pir in. Her wiha di rêveberiya meclîsê de hevala Pelîn hebû, ew jî wisa bû. Dixwestin kar bikin. Me ji wan re pergal dabû avakirin û wan jî kar dikir.

Li wê derê 2 heb mala gel hebûn. Ji ber ku xet jî pir fireh bû, me ji wan hevalan re digot, "*her yek li milekî bisekinin.*" Hevala Medya li wir bû. Nêzikî 150 gundî di nava qada me de bû. Di dawiyê de me got, em her yek li milekî bisekinin da ku kar bimeşe. Cihên ku komîte û meclîs jî lê tine bûn, me xwest xebatên xwe pêş bixin. Me dixwest hemû gundan tevlî pergalê bikin...

**-Di xebatên komîn û meclîsan yên gundan de, we dikarî encama ku dixwazin bigirin?**

Dema ku xwesteka mirov kar hebe û mirov bi hev re bixwaze tiştekî bike, kar tê meşandin. Dibe ku kêmasî jî hebin, tu pergala xwe didê rûnişkandin. Di gundekî de 100 mal hebû, ji 2-3 eşîran pêk dihat. Dema tu hemû malbatan bibînê û bînê gel hev, mirov encam digirt. Mesela me digot, "*em ê rêveberiya vî gundî derbixin.*" Her kes

bi xwe dixwest di nav de cih bigre. Ji milekî ve baş bû. Ji ber ku eşîr bûn, divê hemû gund tê de cihê xwe bigirta. Ji her eşîrekê 2-3 kes me di nava meclîsê de erkdar dikirin. Bi xwe li hev dikirin. Di rêveberiya wan de jî hevaleke jin û hevalekî xort hebû. Komîteya aştiyê tê de cih digirt. Ciwan û jin di nav de bûn. Me xwest em bi vî rengî bimeşînin. Komîteya perwerdê jî hebû. Me digot, hevalên ku di rêveberiyê de cih digrin, divê biçin perwerdê. Ew welatparêzên ku weke dostên berê dihatin bi nav kirin jî, fedakariyeke mezin dikirin û di nav her karî de cih digirtin. Li gel rêveberiyên meclîsê, cihên rêxistin lewaz be, me bi vî rengî kar dida meşandin. Meclîs 24 seatan di nava tevgerê de bû. Lewra qadeke berfireh bû û kar zêde bû. Di destpêkê de Girêspî jî, bi ser Kobanê ve bû. Ji Girêspî bigre, heya gundê Çûxûre xetek bû û pir berfireh bû. Jixwe piştre me bi rengê du xetan çêkir. Bi hezaran mirovên ku bên rêxistinkirin hebûn.

**Jin pêşengtiya Şoreşa Rojava Dike**

**-Weke jineke şoreşger hem ji bo we, hem jî ji bo hemû jinan, di ev pêvajoyê şoreşê de sekin û asteke çawa hebû?**

Ji milê kar ve hevalên jin pir zehmetî dikşandin. Çi bikira jî divê di gundê xwe de bikira. Zilaman her tişt ji xwe re maf didîtin, lê jin sînordar dikirin. Ji ber vê me digot, divê em giraniyê bidin karê Yekîtiya Star û jinê bixin nava xebatê. Yekîtiya Star, rêxistina xweser ya jinê bû. Yekîtiya Star, birêxistinkirina hemu jinan xwe berpirsiyar dîdît. Di nav civakê de jin rêxistinkirin, jinan zana kirin, xistina karên şoreşê, di nav civakê de çanda baviksalar ji holê rakirin û çanda azadiyê dana runişkandin esas digirt û ji bo vê yekê xebat dimeşand.

Dema ku jin diketin nava xebatê jî, kar pir pêş diket. Hejmar kêm be jî her me hewl dida jinan bixin nava her xebatê. Di bajêr de pir pirsgirek tine bû, lê li gundan sînordar bû. Jinên ku diketin nav karê Yekîtiya Star û TEV-DEM'ê jî divê di gundê xwe de kar bikira. Nedikarîn ji gund derbikevin. Lê bi demê re karê Yekîtiya Star jî pêş ket. Hinek jin hebûn, mirov bi heyranî lê meyze dikir û moral didan mirov.

Çend jinên ku 24 seatan nedisekinîn jî hebûn. Di civînên Yekîtiya Star de, me digot teqez divê em wê bandora eşîrî li ser jinan rakin û jinan bixin nava xebatê. Çiqasa jin bikevin nava xebatê û di meclîsan de cih bigrin, ew qesa me dikarî gavan biavêjin. Ger ji milê çandî û zîhnî ve hin qalibên ku di nava civakê de çêbûne, me bikaribûya bişkenanda jin zêdetir tevlê dibûn. Ji bo xebatên meclîsê û Yekîtiya Star me her ew esas digirt. Dema ku ew yek çêbû, ji milê zîhnî ve hin şikestin dan çêkirin. Mesela me hevaleke jin kiribû rêveberiya meclîsê, ûslûbê wê jî bandor dikir û gelek tişt didan guhertin. Me digot, *"pergal ya jinê ye. Jin pêşengîtiya Şoreşa Rojava dike."* Me hewl dida li her cihî hejmara jin û zilaman wekhev bikin. Dema ew tişt dibûn, jin kêfxweş dibûn. Lê me digot, tenê kêfxweşbûn têrê nake, divê hun di nav de cihê xwe bigrin. Hejmara hevalên jin kêm be jî xwe didan ber kar û tevlê dibûn. Meclîsên ku me nû avakirine, me hejmara jin û zilaman yek digirt. Di yên berê hatine avakirin de jî me hewl dida hejmara jinan zêde bikin.

Dîsa me hewl dida ku hem rêveberiyên meclîsê, hem jî gel perwerde bikin. Lewra pergal bi zanebûnê dihat pêş xistin. Me digot, divê gel bibe vîn û xwe bi xwe rê ve bibe. Jixwe berê Serokatî li wir kar meşandibû û her heval li Rojava pêşengîtî kiribûn. Heya wê demê gel pir pêşengîtî nekiribû. Lê dema ku me digot, "*divê hun bi xwe bimeşînin, rêveberî ya we ye*" kêfxweş dibûn. Êdî xwe weke xwediyê wê pergalê didîtin. Lê divê perwerde bihata kirin.

Ji milê perwerdê ve gelek akademî hatibûn avakirin. Akademiya ciwanan, ya Yekîtiya Star û akademiya meclîsan hebû. Xebateke berfireh ya perwerdeyan jî dihat meşandin. Lê piştî demekê li milê Girêspî şer dest pê kir. Jixwe piştî çûyina min 3-4 meh derbas bû, em ketin nava şer. Lê divê heya wê demê pergaleke ku hemû gel û rêxistinê dike yek, hebûya. Weke min di destpêkê de jî anî ser ziman, ji vî milî ve kêmasiyên me hebûn. Lewra gel hemû nehatibû rêxistinkirin û nehatibû perwerdekirin. Ji ber vê yekê pergal baş rûnenişt...

**-Dema ku xebatên perwerdehiyê û rêxistinbûnê berdewam dikirin, şer bi çi rengî pêş ket?**

Welatparêzekî bi navê Ferhat hebû. Ji ber derfetên aborî, çûbû milê Cizîrê û kar dikir. Lê dema ku şerê Serekaniyê destpê kir, li wir tevlî şer bûbû û şehîd ketibû. Ji gundê Alîşarê bû. Jixwe ji ber ku rê qut bûbû, cenazeyê wî li Cizîrê mabû. 2-3 rojan li gundê Alîşarê şîna hevalê Ferhat hebû. Gelê Kobanê hemû, serdana malbatê dikirin. Roja 19'ê Tirmehê, di salvegera şoreşê de li Kobanê mîtîng çêbû. Moraleke pir mezin hebû. Bi hezaran mirov ew roj pîroz kirin. Gel bi germahiyeke mezin tevlê bû. Ji êvarî ve destpê kir û heya nîvê şevê berdewam kir. Di gel de moral, bawerî û hêzeke mezin derketibû holê. Rojeke wisa girîng bû. Jixwe dema ku bi şev mîtîng xilas bû, li milê Girêspî şer destpê kir. Dema ku di salvegera şoreşê de şerekî wisa çêbû, hejandinek çêkir.

Gelê Girêspî zêdetirî xwe Ereb in. Li wir xebatên me jî hebûn, mala gel hatibû vekirin. Lê hesabê her tiştî nehatibû kirin. Dema ku şer destpê kir, çend welatparêzên me li wir girtin, malbatên şehîdan jî di nav de hebûn.

Hinek dostên me girtibûn, hinek berdabûn û hinek jî bernedabûn. Jixwe çend welatparêz şehîd ketibûn. Divê li gorî şer, me gel rêxistin bikira. Her hevalek ku karê avakirinê dimeşîne digot, em mûdaxale bikin. Divê me alîkariya hêzên leşkerî bikira. Jixwe bi giştî ji 200 hevalî zêdetir hêzên leşkerî li wir tine bûn.

Jixwe piştî wê êrîşa Girêspî heya şerê dawî yê Kobanê, ji ber ku hêzên leşkerî kêm bûn, divê em hemû biketana nava şer. Ji ber vê jî pêşxistina pergalê, baş çênedibû. Lewra piştî wê êrîşa ewil, êdî her şer çêdibû. Te li cihekî karek pêş dixist û tiştek dida rûnişkandin, lê êrîşek çêdibû, em neçar diman yekîneyên parastinê derbixin û giraniya xwe bidin wir. Lewra şerê gelê şoreşger bû, ji extiyaran heya ciwanan herkesî şer dikir. Ji ber ku ji Minbic û Reqayê jî Kurd qewirandin, ji wan deran jî koçberî çêbû û gelek welatparêz hatin Kobanê. Divê me jî li gorî wê hesabê xwe bikira û tevdîrên xwe bigirtana. Çend caran şer çêbû û em bi ser ketin, gel jî kêfxweş dibû. Lê gelek mirovên me şehîd ketin. Gelekên wan xwedî mal û bi temen bûn jî. Ji ber ku eşîr bûn û girêdayî xaka xwe bûn, şer dikirin. Lê divê me hesabên xwe bikirana, pir kêm tevdîr hatin girtin. Hinek çek hatin kirîn, lê hesabên pir berfireh nehatin kirin. Ji Minbic, Girêspî û Reqayê Kurd hatibûn derxistin û derdora Kobanê hemû Ereb mabûn...

**-Rastiyeke dîrokî heye; di encama konevaniyeke dewletê de gelê Kurd ji cihên xwe hatiye koçberkirin. Lê di encamê de rastiyeke gelê Ereb ku li hêrêmên Rojavayê Kurdistanê bi cih bûne jî heye. Di vî pêvajoyî de nêzikbûna gelê Ereb, li hemberî pêşketina çawa bû?**

Divê di serî de me têkiliyên xwe bi gelê Ereb re jî çêkirina û ew jî bixistana nava pergala xwe. Lê di avakirina pergalê de kêmasiyên pir mezin derketin. Mesela li gundên Minbicê, Ereb û Kurd di nava hev de bûn. Lê me ji bo wan pergaleke alternatîf pêş nexist. Bi giştî li Kobanê me Ereb qezenc nekirin. Me pergala xwe derbasî nava gelê Ereb nekiribû. Divê em vê kêmasiyê bibînin û rexne li xwe bigrin. Dema ku em ketin ferqa wê jî dereng bûbû. Ji ber ku me ew hesap nekir, me zirareke mezin dît. Em nabêjin bila weke Kurdan tevbigerin, lê me dikarî pergaleke alternatîf nîşanî wan bida. Belkî ji sedî sed nebûna dostên me, lê bi piranî nedibûn dijminên me jî. Bi vî awayî ew hemû Erebên ji herêma Kobanê paşî bûne dijminên me û kîjan ketîbe ango tabûr bihata wir, diketin bin bandora wan. Jixwe herî dawî jî tevlî DAIŞ'ê bûn. Tevî fikrên Rêber Apo û paradîgmaya me jî, me gelê Ereb tevlê pergalê nekiribû. Kêmasiya herî esasî ya rêveberiya Kobanê ew bû.

**-Hûn çiqas li Kobanê man?**

Ez 3 salan li Kobanê mam...

**-Di nava van sê salan de herî zêde we kîjan xebat meşandin?**

Me karê civakê û jinan dimeşand, lê divê me hemû karê xwe li gorî şer araste bikira. Her me xwest di nava şer de gelê xwe perwerde bikin...

**-Di vê demê de tevlêbûna ciwanan çawa bû?**

Karê ciwanan hinekî din cuda bû. Gelek hevalên ciwan ku şehîd ketin jî hebûn. Ji wan yek jî hevalê Firaz bû.

*Weke ku di her hevpeyvîneke me de çêdibe, hevpeyvîna me ya bi Zelal Efrîn re jî bi piranî li ser têkoşerên ku di her cih û demeke şoreşê de jiyana xwe dest dane bû. Wê jî ji her tiştekî zêdetir dixwest şehîdan vebibêje. Di destpêkê de hinekî sekinî û dengê wê lerizî. Berê wê li me bû, lê em bawerin valatiya ku wê bala xwe dabû ser, bi rêhevalên xwe ku di heman çeperan de şer kirine û jiyana xwe dest dane dadigirt. Leva wê hinekî dilerizî, lê çavên wê dikenîn. Karê çend deqeyan me jî nikarî em biryar bidin ka em jê çi bipirsin. Zelal Efrîn, ya rast her kesekî/ê ku em pê re axifiyane, di nava wan çend deqeyan de di mejiyê xwe de hemû hevalên xwe yên şehîd dianîn gel hev û bîranînên wan ji ber çavên xwe re derbas dikirin.*

**-Hûn dixwazin hinekî qala Şehîd Fîraz bikin…**

Şehîd Fîraz, bi xwe ji Efrînê bû. Li Şamê tevlî bûbû, malbata wî li wir bû. Hevalekî zana bû. Dema ku tevlê bûbû xwendekar bû. Li Kobanê li milê rojhilat kar dikir, me bi hev re jî kar kir. Bi kelecanî û moral, bi awayekî çalak tevlî kar dibû. Li milê rojhilat 100 gundî zêdetir bû, lê ji bo heval weke gundekî lê hatibû. Ji Helincê bigre, heya gundê Qilanê û Bexdikê ti cihên ku neçûnê tine bû. Weke bahozekî bû, mirov dikare navekî wisa lê bike. Li wir karê ciwanan tenê wî dimeşand. Bi sedan heval perwerde dikirin, gelek ciwan tevlî karên leşkerî kirin. Ji bo ciwanên Kobanê bû pêşeng. Deqekê li cihekî nedisekinî û kêliyeke xwe vala derbas nedikir. Karê ciwanan dikir, lê pêşengiya hemû gel dikir. Gel pir jê hez dikir. Biçûya kîjan gundî, ji dayikan bigre, heya jinên ciwan herkes li dora wî kom dibû. Çavkaniya kelecanî û moralê bû. Em gelek caran bi hev re jî dixebitîn û li gundan digeriyan.

Foto-7

Şehadeta wî jî pir bi êş bû. Li gel 3 hevalan şehîd ket. Li milê Çelebiyê muameleyek hebû, jê re digotin muamela Tirkan. Ji ber ku vala bû, YPG akademiya xwe li wê derê ava kiribû. Nobedar û komên me yên din jî li wir hebûn. Hevalê Firaz jî çûbû wî milî, êvarê li ser yekîneyên ciwan û gel digeriya. Hinek nobedarên gel hebûn, em li ser rêxistiniya wan disekinîn. Ji xwe me rêveberiyek ji nava wan derxistibû. Çûbû gel hevalê Kendal, hevalê Kendal jî hevalekî xwedî danehev bû. Du hevalên ji gel jî li gel wan bû. Kamyonek tê wir û nêzikî cihê hevalan disekine. Yekî Ereb kamyonê li wir dihêle û diçe. Gundî jî li wan derdoran hene. Hevalê Firaz germ e û dixwaze fêr bibe ka çi ye. Dema ku deriyê wê vedike, kamyon diteqe! Di wê teqînê de her çar heval şehîd dikevin.

Di mercên Kobanê de, em neçar diman ku hem karê xwe bikin, hem jî ji bo şer hin karan bikin. Hevalê Firaz jî xwediyê taybetmendiyeke wisa bû. Dema ku li wir kar dikir jî, li ser ciwanan û gel bandoreke pir mezin kir. Hezkirineke wî li hemberî gel hebû, xwe xistibû nava dilê gel. Ji ber vê her kesî dixwest hevalê Firaz biçe gel wan. Moral û manewiyeta wî her bilind bû. Di destpêkê de maşîneyên me tine bûn. Lê hevalê Firaz bûçûya ku hema ji gel hinek rêxistin dikirin û bi maşîneyên wan kar dikir. Di karê wan gundan de maşîne pir girîng bû. Lê maşîneya me tine be jî, hevalê Firaz ji xwe re nedikir asteng, hema yek rêxistin dikir. Hem di cidîyeta karê xwe de bû û hem jî moraleke pir mezin dida derdora xwe. Ciwanek li kû hebe, diçû wir û gundên ku me xwe nedigihandê jî ew diçû û karên dîtir jî dikirin. Di xebat û pergala ciwanan de rih û hêzeke mezin ava dikir. Bi dehan keç û xortên ciwan şandin perwerdê.

***-Şer li ser kar û xebatên we yên pergalê çawa tesîr dikir?***

Min karê TEV-DEM û Yekîtiya Star dimeşand. Di karê TEV-DEM'ê de, me gund bi gund rêveberî derxistibûn û her meh me civînên xwe dar dixistin. Her meh perspektîfeke civînê çêdibû, lê her meh em neçar diman ku balê bikşînin ser parastinê. Parastin beriya her tiştî bû. Me digot, divê her mehê em di çend gundan de perwerdeya leşkerî bidin. Jixwe li ku meclîs bihata avakirin, komîteya parastinê dihat avakirin. Me digot, "*bila herkes gundê xwe biparêze."* Ji ber vê yekê, karê TEV-DEM û parastinê di nava hev de dimeşiya. Lewra çend mehan carekê şer derdiket. Şerê destpêkê yê Girêspî bû, şerê Evdiko yê duyemîn bû û piştî wê careke din êrîş çêbûn. Jixwe herî dawî cara çaremîn jî hemû Kobanê ket nava şer.

Li Kobanê hemû xebatên pergalê hatin meşandin. Lê karê herî esasî parastin bû. Mirovên ku tevlî karên me dibûn, neçar diman ku di nava parastinê de jî cih bigrin. Lewra em neçar bûn wisa bikin. Me gel ji bo parastinê jî her amade dikir. Ji bo zilaman pir ne zehmet bû, jixwe piraniya zilaman bikaranîna çekan dizanîn. Lê me li zêdetirî 20 gundan perwerdêya çekan da jinan. Gelek hevalên jin di civînan de digotin, "*em dixwazin fêrî bikaranîna çekan bibin."* Lewra gelek keç li ser hacîzan jî disekinîn, lê bikaranîna çekan nedizanîn. Ji ber vê jî me perwerdeya çekan da wan. Me dema ku perwerdeya çekan dida wan, jinên ciwan jî dihatin û bala wan dikşand. Me hewl dida em wan jî tevlî YPJ bikin. Perwerde ne tenê ji bo çekan bû, me li ser derûnî û stratejiya şer jî perwerde dida. Lewra gelek zilaman çek bi kar dianîn, lê gelek jin hebûn ji çekan ditirsiyan.

Mesela gundê Qehreman heye, zêdetirî 400 malî bûn. Gundekî welatparêz bû, tenê 40-50 malî xwe nêzikî me nedikirin. Ji şerê Girêspî bigre, heya şerên din heya dawiyê tevlêbûn çêkirin. Ji ciwanan bigre heya extiyaran hemû tevlê bûbûn. Bi şehîdên xwe dihatin nas kirin. Mirov moral ji wan digirt. Bi dehan şehîd û pêşengên wan di nava tevgerê de hebûn. Li wê herêmê herkesî ew gund nas dikir. Ger me li wî gundî civîn, an jî çalakiyek çêbikira, herkes tevlê dibû. Welatparêziya wan hebû. Bandora Tirkan jî li ser wan hebû, lewra di ber sînor de bûn. Mexfera dewletê jî berê di gundê wan de hebû. Ango ji dagirkeran pir zilm dîtibûn. Digotin, *"me bawer nedikir ku em van rojan bibînin, ji bo vê em ji her tiştî re amade ne."* Ji ber vê yekê, dema ku me xeber bişanda, hema dihatin û tevlî şer dibûn, an jî parastina hevalan dikirin. Me komîna yekemîn ya Kobanê li wî gundî ava kir. Me lîsteya gund derxistibû, 400 mal hebû. Me kom bi kom derdixistin û semîner dida wan. Me dixwest di despêkê de li gundên welatparêz û girêdayî tevgerê komînan bidin ava kirin. Beriya şer derkeve di 2014'an de me amadekariyeke bi vî rengî kiribû.

Berê gund bi gund me meclîs ava kiribûn, lê komîn nehatibûn avakirin. Li her sê xetên gundan û navenda bajêr divê me komîn avabikirana. Me bîryareke wisa girtibû. Ji ber vê jî di destpêkê de me li gundê Qehremanê dest pê kir. Me bi dehan civîn lê çêkirin, me dixwest em hemû malbatan jî ziyaret bikin û dest bi avakirina komînan bikin. Lê şer destpê kir. Serokatî her behsa şerê gelê şoreşgerî dikir, lê me pir fêm nedikir. Dema ku em di Kobanê dê ketin nav, me fêm kir. Her tiştî hev û din timam dikir. Ji milekî ve rêxistinkirin çêdibû, ji milekî ve gel dihat perwerdekirin, ji milekî ve jî şer pêş diket. Bi rastî jî di nava hev de dimeşiya. Ji ber vê dema ku şerê Girêspî destpê kir, divê li gorî wê me tevdîr bigirtana û gel rêxistin bikira. Lê me nekir, em rexne li xwe digrin.

Em li Kobanê neçar dibûn ku hem pergala xwe ya xweseriya demokratîk pêş bixin, hem jî şerê gel yê şoreşgerî bidin meşandin. Bi rastî jî şerê ku li wir hatiye meşandin re, em dikarin bibêjin şerê gel ê şoreşgerî. Her sê

pêngavên şer yên ku li Kobanê pêş ketin, pêngavên gel bûn. Lewra gel şer dikir. Hejmareke kêm hevalên YPG û yên din hebûn. Ji ber vê hem avakirina pergalê, hem siyaset, hem jî şer di nava hev de dimeşiya. Lewre me mînaka gundê Keremox da. Ew gund hem pêşengê şer bû, hem jî pêşengê siyasetê bû. Ji kîjan alî ve te bigota çi, amade bûn. Gelekî ku di her kêliyê de ji her tiştî re amade bû.

Em çiqasa behsa pergala xwe ya xweseriyê dikin, em li kêleka wê jî behsa şer dikin. Ji ber vê jî em dibêjin şerê gel ê şoreşgerî. Lewra em nikarin ji şer qut bigrin dest. Bandora şer li ser xebatên din pir zêde bû. Heya pêngava dawî jî gel ji her tiştî re amade bû. Divê em nebêjin, gelê me ked nedaye. Heya şerê dawî yê DAIŞ'ê 2-3 salan gel di nava şer de bû. Lê me hesab baş nekir. Da ku em pêşiya wî şerî bigrin. Divê teqtîk û nêzikbûnên xwe di ber çavan re derbas bikin. Gel fedakariyeke pir mezin nîşan dide û şer jî dike, lê tu nikarê wî gelî hemûyê bike leşker. Dîsa jî gel xwe tu caran nedida paş. Lê me peywirên xwe nedianîn cih. Zêdetir bi berfirehî û stratejîk fikirîn çênebû. Heya cihekî hesap dihatin kirin, lê kêm ma.

Di Newroza 2014'an de amadekariyeke pir berfireh dihat kirin. Hem hevalên çandê, hem jî gel amadekariyeke pir mezin dikir. Me digot, dê ji derva mêvan û dengbêj werin Kobanê. Lê di şeva Newrozê de careke din li milê gundê Kendalê şer destpê kir. Roja ku şer destpê kir, me dixwest em ji milê rêxistinkirina gel ve jî tevdîran bigrin. Da ku gel gundên xwe vala neke û neçe Newrozê. Ew gundên nêzikî xeta Ereban, me tevdîr girtin. Me li wan deran bi meclîsan re civîn çêkirin û xwest wan agahdar bikin. Ne ku em tirsekê bidin avakirin, lê me tevdîr derdixist pêş. Bi rastî jî gelek kes neçûn Newrozê û li gundên xwe man. Milê Toxliyê û Golê, em gund bi gund geriyan. Me nexwest di Newrozê de valatiyeke çêbibe û firsend bidin dijmin.  Me gelek tevdîrên parastinê girtin. Dîsa jî di şeva Newrozê de, li milê Kendalê şer destpê kir. Şerekî pir dijwar bû. Jixwe her 2-3 mehan careke şer destpê dikir.

***-Piştî şoreşê li Kobanê xebatên avakirina pergala civakî bi çi rengî bûn?***

**ÎSA KOBANÊ:** Di 2013'an de xebatên meclîsan di gundan de jî pêş ketin. Me gundên Kobanê kirin sê xet. Jixwe bajar meclîsek hebû. Gund jî weke xeta rojhilat, xeta rojava û xeta başûr bûn sê meclîs. Her wiha di nava xetan de jî her gundekî meclîsa wê dihat avakirin. Bi vî rengî hemû gundên Kobanê meclîsên wan hazir bûn. Kêm gund mabûn ku di nava meclîsan de nehatibûn rêxistinkirin.

Lê ji milê çawaniyê ve ne di asta ku tê xwestin de bû. Dîsa jî li gorî derfetan, bi awayekî lezgîn avakirina pergala van meclîsan girîng bû. Xwe weke vîn û navenda çareseriyê dîtin pêş diket. Cihekî ku bikaribin vîna xwe tê de temsîl bikin û xwe rê ve bibin hebû. Ji vî milî ve çandeke baş pêş diket. Hinek gundên ku bi pirsgirek bûn û qet têkiliya wan bi hev re tine bû hebûn. Lê bi riya van meclîsan dihatin gel hev û ew pirsgirek çareser dikirin. Ji milê erenî ve, xebatên bi vî rengî pêş diketin.

Bi vî rengî pergala meclîsan her ku çû pêş ket. Di her hefteyî de rojeke, hemû meclîsan perwerdeyên xwe dardixistin. Di warê zîhnî û mejî de perwerdeyên wan dihatin dayin. Xeynî wê perwerdeyên taxan yên gel dihatin darxistin. Da ku ji bo pêşerojê gel bê amadekirin.

Akademiya me ya siyasî hebû. Ji rêveberiya asta herî jor, heya yên taxan hemû emdamên meclîsan 15-20 rojan ji perwerdeyan re dihatin derbas kirin. Bi vî rengî pergala perwerdê jî di nava civakê de xwe belav dikir. Saziya Fikir û Ramanê ya Nurî Dersîmî hatibû avakirin. Komeke ku di warê fikir de xwe pêş xistiye, di wê derê de hem lêkolîn dikirin, hem jî ji bo perwerdeya gel xebatek dimeşandin. Li gel meclîsan bi hev re xebata perwerdê dimeşandin.

Xebatên meclîsan heya demekê li ser esasê xebatên me yên rêxistinî bûn. Piştî ku di 2013'an de kanton hatin îlankirin, pêwîst bû ku hinek kar ji karên me yên rêxistinî ji hev cuda bibin. Êdî xebatên hûkimetê, ango rêveberiya xweseriyê cuda bûn. Mesela rêveberiya kantona Kobanê jî, hemû welatparêzên me bûn. Li Kobanê dervayî tevgera me hizbên din pir lewaz bû. Îlankirina kantonê û xwe bi xwe rêvebirin û hilbijartina hûkimetê, ji milê gel ve bi kêfxweşî hate pêşwazî kirin. Piştgiriya rêveberiyê, ji vî milî ve berfirehtir bû.

Ji milê Heleb û Şamê şer bû. Koçberiyek ji wan deran çêdibû û gel ji milê me ve dihat. Hejmareke zêde ya koçberan jî hatibû Kobanê. Hê wê demê ji bo koçberan sazî hatibûn avakirin. Cihkirin, tanzîmkirin û pêwîstiyên wan pêkanîn, bi riya malên gel û meclîsan dihatin meşandin. Heya demekê bi vî rengî meşiya.

Di serê 2012'an de dema ku TEV-DEM û ENKS hev kirin û Desteya Bilind hate avakirin, hat xwestin Desteya Bilind li Kobanê jî bê avakirin. Bi alîkariya çend partiyên çep, me li Kobanê jî Desteya Bilind û xebatên girêdayî wê ava kirin. Karê wê yê esas, xebatên koçberan û alîkariya ku di bin banekî de bê meşandin bû.

Me û van rêxistinên din li ser sê beşan hev kir. Yek, divê di saziyên xizmetê yên weke şarederiyê û hwd de cih bigrin. Yek jî di xebatên têkiliyan yên li Sûriye, an jî bi Ereban re divê em bi hev re tevbigerîyana.  Mesela seyemîn jî, dixwestin di asayîşê de cih bigrin. Di bin bana Desteya Bilind de, me li ser van her sê xalan li hev kir. Bi vî rengî xebatek hate meşandin. Xebata herî girîng, yekdestkirina sazî û xebatên alîkariyê bû. Gelek kesan di bin navê alîkariyê de sazî ava kiribûn, ji derva alîkarî dianîn û dixwarin. Gelek rêxistinên wisa hebûn, mesela tevgereke Kurd

ya girêdayî Birayên Misilman hebû. Serokê wê Şêxekî ji Kobanê bû. Demekê li Siûdîyê, demekê jî li Katarê rûniştibû. Wan saziyeke bi navê Biratiyê vekiribû. Jixwe navê wê yekser Îxvan-î Mûslîmîn dianî bîra mirov.

Her wiha hin parezer hebûn, wan saziyek ava kiribû. Me jî Heyva Sor vekir. Di encamê de em gihêştin wê bîryarê ku hemû saziyên alîkariyê di bin bana Desteya Bilind de bên gel hev û alîkariyeke bi adalet çêbibe. Divê pêwistiyên gel, ji yekdest bên belav kirin û her kes li gorî xwe belav neke. Bi vî rengî me xebateke rêxistinî da meşandin, baş bû. Jixwe yên ku li gorî xwe alîkarî kom dikirin û dixwarin deşîfre bûn û reviyan. Yên biratiyê jî me kirin bin kontrolê.

Pişt re ew şêx hat û xwest hin tiştan bike. Lê ji ber ku me dizanî bi Katar û Siûdîyê ve girêdayî û ew dixwazin çibikin, me pir rê neda wan. Piştî ku rejîm ji Kobanê kişiya, cihê wan yê diyanetê hebû. Girêdayî wir gelek dibistanên olî, dûkan û arazî hebûn. Ji ber ku xebatên me yên olî tine bûn, valatiyek di vê qadê de hatibû jiyankirin û ew şêxê ku min behs kir ketibû dewrê. Rejîmê heqdestê wan oldaran qût kiribû, lê wî şêxî heqdestên wan dida.

Me bi wan re hinek hevdîtin kirin, xebatên me di nava wan de çêbûn. Me ew jî ji derva qut kirin. Me ji wan re rêxistinek çêkir. Da ku li ser esasê çanda Kurdî, olê îslamê bê meşandin. Tesîrên Erebî me xwest li ser rakin. Jixwe bi sedan zarok dihatin wir û ber destê wan perwerde dîdîtin. Bi wan re nîqaş hat kirin û mûfredateke nû hate derxistin. Ji bo pêşxistina welatparêziyê, di perwerdeya zarokan û xûtbeyan de sererastkirin hate çêkirin. Berê şovenîzma Ereban ya Îslamê li ser wan serwer bû.

**-Em bawerin di van rojên ku hûn qalê dikin de, li ser serhejmarê jî li Kobanê xebatek hatibû meşandin…**

Rast e, ji aliyê serhêjmara Kobanê ve, di adara 2013'an de, me bi nêzikî 60 kesî komîteyek ava kir û li bajêr me serhêjmariyek kir.

**-Encamên wê serhejmariyê çawa bûn?**

Nûfûsa bajêr 61 hezar derket, 9 hezar jî kesên ku bi koçberî hatibûn Kobanê hebûn. Bi giştî 70 hezar bû. Pişt re dema ku li Eşrefiyê û Şêxmeqsûd şer zêde bû, koçber jî zêde hat Kobanê. Lê piraniya wan diçûn gundan. Jixwe Kurdên ku li Helebê jiyandikirin, ji Kobanê çûbûn. Di dema şer de jî dîsa dizivirîn.

Jixwe di destpêkê de, gelek gund vala bûn. Pir koçber bûbûn. Lê dema ku bajarên Sûriye şer dijwar bû, careke din vegeriyan. Dema ku li Reqa û Girêspî jî şer dijwar bû, nêzikî 800 malên Ereb xwe sipartibûn me. Lê yên Kurd jî pir bûn. Mesela hejmara bajêr piştî şer gihêştibû 100 hezarî. Li gorî pergala berê 360 gundên Kobanê hebûn. Hejmara wan jî du qatê Kobanê bû.

Ger em Girêspî, Şêxler û gundên Ereban yên derdora Ferat hesap nekin, bi giştî nifûs nêzikî 300 hezarî bû. Bi giştî cihkirina milet û tanzîmkirina koçberan meclîsan dikir. An li gel mirovên wan dihatin cih kirin, hinekan cihên wan hebûn, bi wan re têkilî dihatin danîn, dixistin nava rêxistinekê, pêwîstiyên wan dibersivandin.

Piştî şoreşa 19'ê Tirmehê, dema ku dewlet ji Kobanê vekişiya hinek pirsgirek jî derketin. Dibe ku ji derve ve şoreşa 19'ê Tirmehê weke plankirî û amadekariyên pir xurt hatine kirin û wisa destpê kiriye, tê nirxandin. Lê ne wisa bû. Mecburiyetek derketibû holê. Ger hevalan dest nedanibana ser Kobanê, qûwetên girêdayî Arteşa Azad, xwe li Minbicê amede kiribûn ku di 23'ê tirmehê de, bi ENKS ve dest bidin ser. Ew roj nehatibû plankirin. Lê amadekariyek jî hebû.

Vê yekê dê xeteriyeke pir mezin bi xwe re bianibûya. Êdî hevalên li wir, bi tanzîmkirina welatparêzan weke mecburiyetekê di 19'ê Tirmehê de dest datînin ser saziyên dewletê. Ji ber wê jî dema ku Kobanê ket destê me, ji milê pratîkî ve hin pirsgirek derketin. Ger te careke re hemû saziyên civakî ku dewletê ve girêdayî ne, qût bikirana dê pirsgirekên pir mezin bi xwe re derbixistana. Di salvegera yekemîn ya 19'ê Tirmehê de, li Girêspî Cebhed El Nusra êrîş kir û şer destpê kir. Beriya wê hêdî hêdî Kobanê dihat dorpêçkirin.

**-Di nava wê dorpêçê de pêwîstiyên rojane yên gel çawa dihatin bersivandin?**

Heya wê demê av û ceyran hebû. Ava Kobanê ji Şêxlerê dihat, ceyran jî ji Tişrînê dihat. Hinek di destê Arteşa Azad û hinek jî di destê karmendên dewletê de bû. Ango êdî bi kêfa xwe av û ceyran didan Kobanê. Kîjan demê bixwestana, av û ceyran qût dikirin. Beriya ku şer destpê bike jî li ser Kobanê xeterî û gefxwarineke bi vî rengî hebû.

Her wiha di anîna gelek tiştên jiyanî de, piştî 19'ê tirmehê pirsgirekan destpê kiribû. Riya Helebê ji Minbicê re derbas dibû. Wê demê li Minbicê mala gel ya Kurdan hebû û hinek rêxistinbûna me jî hebû. Lê serweriya wir di destê Cebhed El Nusra de bû û 72 ketîbe pê re bûn. Li ser riya Helebê hacizên van ketîbeyan hemûyan hebûn. Tû alaqaya wan bi şoreşê re tine bû. 100-150 mirovên kê li ku hebin, ji xwe re komeke çekdar ava dikir û rê qût dikirin. Te nedizanî kî bû jî. Rewşeke wisa li derdora Kobanê derketibû holê.

Pêwîstiyên rojanê yên Kobanê jî, hemû ji Reqa û Helebê dihatin. Di Kobanê de tiştek nehatibû avakirin. Aşek jî tine bû. Li Kobanê tenê firinek hebû. Genimê wê di sîloya dewletê de, aşê wê jî di Minbicê de bû. Genim te bi Arteşa Azad ve parve dikir. Te 100 ton genim dişand, ew li ser Minbicê, Sirînê û Kobanê dihat belav kirin. Tenê 20 ton vedigeriyan Kobanê. Bi vî awayî pêwistiya nan dihat bersivandin.

Her wiha pêwîstiya xwarinê û germkirinê jî li ser mazotê çêdibû. Mazot pêwîstiyeke rojane bû. Ger mazot tine be, mirov nikare çayeke jî çêkê. Mesela zivistana 2012'an, me bê soba jiyan kir. Mazot tine bû. Rewşeke bi vî rengî ya dorpêçkirinê û bê îmkaniyê derketibû holê. Vê yekê di nava civakê de nerehetî jî çêdikir. Digotin, "*hûn bûne îdare, êdî dewlet hûn in, divê hûn peyda bikin.*" Lê rûxmî ew qesa dorpêçkirinê, bi rêbazên cur bi cur pêwîstiyên civakê di astekê de dihatin bersivandin. Heya salvegera yekemîn a 19'ê tirmêhê, wisa meşiya.

**Li Kobanê Damezrandina YPG-YPJ**

***-Piştî ku dewlet ji Kobanê hate derxistin, ji milê parastinê ve çi pêşketin çêbûn?***

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Dewlet hatibû derxistin û coşa gel di asta herî xurt de bû. Li ser vê esasê bingeheke YPJ û YPG hatibû avakirin. Bi taybetî xebatên YPG pir li pêş bûn, wê demê hejmara jinên tevlêbûne pir kêm bûn. Hîn nû komên hevalên jin dihatin rêxistinkirin da ku bikevin nava hêzên leşkerî. Ji ber ku pir zêde derfet jî tine bûn, piraniya endamên YPG û YPJ me dişandin Efrînê û li wir perwerdehiya xwe didîtin. Lê piştî meha 10'an ya 2012'an me li Kobanê êdî dest bi avakirina akademiyên xwe kir. 2-3 dewreyên perwerdê ji bo hevalên xort jî hate lidarxistin. Her eniyeke Kobanê jî, hem ji milê hevalên xort, hem ji milê hevalên jin ve amadekariyên xwe dikirin. Di wan qadan de nû rêxistinkirina ciwanan dihat çêkirin da ku em hêzeke xwe ya leşkerî çêbikin.

Piştî çend dewreyên perwerdê, me xwest cara yekemîn li Kobanê akademiya jinê vebikin û weke jin em amadekariyên hêzeke leşkerî ya jinê bikin. Jixwe çend hevalên jin çûbûn Efrînê perwerde dîtibûn û vegeriyabûn. Yên din jî me di malan de perwerde dikirin. Ji ber ku destpêk bû, hinek zehmetî jî hebûn. Ger tu keçan bîne û bi qasî mehekê perwerde bike, malbatan ji bo vê zû bi zû destûr nedidan. Malbatên pir nêzikî me bûn, hinek rehet nêzik dibûn. Bi giştî her çiqas tevlêbûneke zêde di nava partiyê de hebe jî, wê demê çûyina perwerdê ya keçan û piştî ku mehekê perwerde dîtin vegera wan xweş nedihat dîtin. Di wê derê de feodalîteya herêma Kobanê derdiket holê. Pir zehmetî çêdibûn. Hinek keç hebûn me bi zorê dixistin perwerdê. Me digot, bila bên em dest bi vê dewreyê bikin da ku em vê zîhniyetê bişkênin. Ji bo ku ew zîhniyet bişkê û baweriyek bê dayin, mal bi mal em digeriyan.

**-Da ku mijar baştir were fêmkirin, hûn dikarin hin mînakan bidin?**

Mesela Zîlan hebû, keça yadê Eyşê bû. Me dixwest em ji wan keçên mamoste û hwd dest pê bikin. Me 10 keçên wisa amade kirin û me dest bi perwerdê kir. Me digot, qet nebe em 10-15 rojan perwerde bidin. Me dem jî wisa kurt dikir ku qebûl bikin. Piştî ku me bi 15 rojan perwerde xilas kir, pir serkeftî bû. Wê demê kincên YPG jî tine bûn, ji bo ku wisa bi heybet be, me hin kincên reş bikar anîn. Hinekan jî dev û rûyên xwe girtibûn da ku neyên naskirin. Dema ku çek û rext jî girêdan, zêdetir bi heybet bûn. Dema ku me dewre qedand, me hemû dayik û keç vexwendin û me hem moral çêkir, hem jî me xwest propaganda bikin. Cara ewil dewreyeke keçan xilas dibû û heybetek çêkiribû. Vê yekê bala keç û malbatên wan jî kişandibû. Êdî wisa pir ecêb nehat dîtin. Vê yekê tesîra xwe li Kobanê çêkir. Ew nêzikatiya keç û jinan ya bi tirs jî şikest. Ew tişt me weke gavavêtin û serkeftinekê girte dest. Ew ji bo jinan pêngaveke herî xurt bû.

**-Pişt re…**

Piştî ku ew pêngava yekemîn hate avêtin, êdî me xwest li her eniyeke Kobanê keçan tevlî perwerdê bikin. Li ser vê esasê êdî me dest bi perwerdehiyên hevalên keç jî kirin. Ji ber ku hejmara xortan zêde bû û rehet bûn, wan di van mijaran de pir tengasî jiyan nekirin. Bi vî rengî êdî tevlêbûnên hevalên jin jî çêbû û malbatan jî destûr dida. Lê hemû malbat wisa nêzik nedibûn, malbatên ku bi me re bûn û li hemberî me baweriya wan hebû keçên xwe tevlê dikirin. Ji bo van xebatan me jî li ser malbatan tevlêbûna keçan ferz dikir, em mal bi mal digeriyan û me dixwest wan îkna bikin. Ji ber ku min û hevala Şîlan pir zêde Kobanê jî nas nedikir lê em digeriyan. Me keçek li ku bidîta, ji bo tevlêkirinê me gelek ked dida. Me dixwest bi îqnakirina malbatê, em wan keçan tevlî YPJ bikin. Piraniya hevalên jin bi vî rengî kar dikirin. Jixwe bi giştî em 6 hevalên jin bûn. Hemû hevalan jî ji milê xwe ve hewldanek nîşan didan. Di wê demê de li Kobanê hevalan jî kêm bûn, ne weke qada Cizîrê bûn. Ji ber vê jî hinek zehmetî dihatin jiyankirin. Vê yekê tesîra xwe li ser kar û xebatan jî dikir. Mesela cihê ku xebata eniyekê 2-3 heval bidin meşandin, tenê hevalekî dida meşandin. Ji ber van sedeman di rêxistinkirina gel de zehmetî dihate kişandin.

Me di demeke wisa de bîryar girt ku em ew hêza xwe xurtir bikin. Gelek hewldanên me çêdibûn ku em wan keçan ji malê derbixin û gelek qewimînên balkêş çêdibûn. Gelek malbat hebûn ji bo keçên xwe nedin, pevçûn derdixistin. Me jî pir israr dikir. Keçikên Kobanê jî ne wisa ji rêzê bûn, bi rastî jî serhildêr bûn. Ji bo tevlêbûnê her tişt dikirin. Ne weke bajarên din bû. Hêrs û xwestekeke wan ji bo azadiyê hebû. Pergala dewletê û ya malbatê di asteke jor de ne dipejirandin. Jixwe vê yekê em di Kobanê de kirin hêz. Li hemberî malbat û pergalê derketina wan hêzeke pir mezin dida me. Lê bêçaretiyek jî hebû ku di rê û rêbazê de hinek zehmetî dihatin kişandin. Her çiqasa zehmetiyên wê hebin jî, me dizanî ku hêzeke me heye û emê hêzeke jinan ava bikin.

Li ser esasê vesazkirina YPG û YPJ, bi vî rengî rêxistinkirina jin û ciwanan çêdibû. Di xebatên destpêkê de zehmetî pir hebûn. Divê hem xebat bi awayekî veşartî bihata rêxistinkirin, hem jî xurt bihata pêş xistin û hîmê wê xurt bihata avêtin. Lê bi taybetî hevalên xort nedikarîn bi awayekî veşartî xwe rêxistin bikin. Sebra wan nedihat, çi dibe bila bibe divê xwe bidana diyarkirin. Bîryar hebû ku, tîmên xwe yên veşartî li bajêr û gundan ava bikin. Da ku pir zû deşîfre nebe, lê ciwanan nedikarî xwe bigrin.

***-Wê demê dewlet li Kobanê nemabû, ma pêwîstî bi veşartîbûnê hebû?***

Rast e, wê demê di Kobanê de dewlet nemabû, lê li cihên weke Şêxler, Minbic û Cerablûsê dewlet hebû. Divê rêxistinbûnên me yên leşkerî heya astekî veşartîbana. Ji milê leşkerî ve xwestek û kelecanek bilind jî hebû. Hemû tişt didan aliyekî û li ser vî karî disekinîn. Lê ji milê tevlêbûna keçan ve heya demekê zêdetir zehmetî dihatin jiyankirin. Mesela hevalan dihat gilî dikirin û digotin, *"me xwestiye em keça falan malbatê tevlê bikin, malbatê ew revandiye bajerekî dîtir, ew veşartine."* Ew tiştan hemû dihatin jiyankirin. Gelek aliyên Kobanê yên baş hene, lê di mijara jinê de weke namûs didîtin. Ji ber ku dizanîn, piştî ku tevlê bibe wê aîdî tevgerê bibe, pir bertek nîşan didan. Ew mijar her di rojevê de bûn. Bi taybetî di gundan de zehmetiyên bi vî rengî dihatin jiyankirin, bajar hinekî din cuda bûn. Hinekî din di nava xebatan de bûn û ew germbûn didîtin. Lê li gundan zêdetir li ser jinê tepisandin hebû. Di heman demê di asteke bilind de xwesteka tevlêbûna jinan hebû.

Hêza me êdî di astekê de hatibû çêkirin. Lê pêwîstiya çek, seyare û hwd hebû. Divê êdî mirov navenda wê pêş bixista, divê ew hêz bihata rêxistinkirin. Me tenê akademiyek pêş xistibû, perwerdeyeke bi qasî mehekê dihat dîtin û êdî her endamek diçû qada xwe û li gorî pêwîstiyên wir tevlî karê perwerdehî yan rêxistinkirinê dibû. Di destpêkê de 50-60 çekên me hebû. Me ji bo perwerdekirina şervanên nû bi kar dianîn. Lê divê êdî yên ku perwerde dîtine û tevlê bûne, çek bigirtana û bajar û cihên xwe biparastana. Êdî bûbûn leşker, bê çek mayîn qebûl nedikirin.

Li gel vê li asayîşê, hêzeke bi vî rengî dihat rêxistinkirin.  Lê gelek pêwîstiyên leşkerî jî hebûn. Ji ber bêderfetiyê, me tenê dikarîbû êlegên leşkerî bidana wan. Lê ji vî milî ve afirandinekê pêwîst dikir. Ji bo vê lêgerînên me jî hebûn. Me hewl dida em pêwîstiyên xwe ji komên dîtir bikirin. Derfetên wan zêde bûn, alavên xwe difirotin me. Lê pir biha bûn, bi neçarî me dikirîn. Lewra dema ku me çek û amûrên leşkerî didan ciwanan, bi wan re hêz û baweriyek jî çêdibû. Yên derdora xwe jî tesîr dikirin.

Cara yekemîn me doçqayek jî kirî. Ew jî li ser têkiliyên van koman çêbû. Pêwîstiyeke wisa bi giştî li Rojava hebû, ji ber ku li herêma Cizîrê hêz û rêxistinbûn zêdetir bû, pêwîstiyên wir zêdetir dibûn.. Dema ku ew doçqa gihişt Kobanê, weke ku hemû malê dûnê bûye yê me, kêfxweşiyeke wisa çêkir. Weke bûkekê me diparast. Li gorî derfetan me çekek li kû didît, me hewl dida ku em bikirin. Ji milê cebilxaneyê ve me pir zehmetî kişandin. Hemû me li çep û rast komdikirin. Piraniya wan çekan jî êdî nedihatin bikaranîn, lê ji ber pêwîstiyê me çi bidîta me kom dikir. Dema ku hêza me hinekî komî ser hev bû, gumanên me jî hinekî rabûn, me xwest em doçqaya xwe derxin derve.

Lewra tesîr li ser civakê çêdikir û bawerî dida derdorê. Cara yekemîn, me wisa hêza xwe kom kir û bi 100 maşîneyî em derketin kolanan. Me bîryar girtibû ku bi wê hêzê hem di nava Kobanê de, hem jî derdora wan gundên ku ne nêzikî me bûn, em geryanekê pêk bînin. Lewra me dixwest li ser her derdorekê tesîr bikin û baweriyê bidin gelê xwe. Her hevalek çeka xwe girtibû û hatibû, jixwe heybeta doçqayê jî pir zêde bû. Hem ji bo gel, hem jî ji bo hêzên me yên YPG û YPJ moraleke pir mezin bû. Ne tenê hêzên Kobanê, hemû hêzên eniyên derdora Kobanê jî me kom kiribûn. Her hevalek li ser eniyan e, hêza xwe girtibûn û hatibûn. Me bi wî hêzê li nava kolanên Kobanê carek geriyan. Gel weke serhildanê pêşwazî dikir. Ji seyareyên me zêdetir, yên gel hebûn, bi sedan motor tevlî karwanê bûn û em li gundan geriyan. Coş û morala wê demê mirov nikare bîne ziman.

Bi vê yekê me dixwest, em hêza xwe nîşanî hêzên derve jî bidin. Me digot, “binerin, hêzeke me ya hevgirtî heye, me weke gel xwe kiriye vîn û kî êrîşî gelê me bike, em dikarin biparêzin.” Sedama duyemîn, me dixwest moral û bawerî bidin gel û tevlêbûnan zêde bikin. Ya din jî di wê demê de ji bo Kobanê mijareke pir girîng hebû. Bîryar hatibû girtin ku heşîşa ku hatiye çandin, ji holê bêrakirin. Berê taybetmendiyeke çandina heşîşê li Kobanê hebû. Dema ku devlet hate derxistin jî, çandina heşîşê gihandibûn asteke bilind. Dixwestin xwe dewlemend bikin û

debara xwe bikin. Bi vî rengî li gelek cihan heşîş çandibûn. Rêxistinê jî nîqaş dikir ku çawa vê yekê ji holê rake. Di encamê de bîryar hate girtin ku ew heşîş nekeve Kobanê. Di nava şoreşeke wisa de, çandina heşîşê neyînî û ne baş bû. Bi vî awayî bîryar hate dayîn ku heşîş bê rakirin. Lê rêbaza rakirina wê heşîşê jî girîng bû. Lewra li hemberî vê bîryarê wê bertekek çawa derkeve, nedihat zanîn. Hin eşîr hebûn, dikarîbûn ji bo vê yekê bi me re şer jî bikin. Xeteriyên mezin yên bi vî rengî hebûn. Hêza me jî hê nû bû û hindek ciwanên ku bi me re jî, heşîş çandibûn. Me dixwest bi nîşan dayina hêza xwe, vê meseleyê jî bêyî ku pirsgirêkek derkeve, ji holê rakin.

**-Gelo we karî hûn çandîniya heşîşê ji holê rabikin?**

Ji bo rakirina heşîşê, divê me destpêkê kesên ku di nava hêzên me de cih digrin û heşîş çandine îqna bikirana. Me civîn çêkirin û gelek heval tevlêbûn. Ji bo wan jî, ji bo me jî pir zehmet bû. Lê wan ciwanan hemûyan xwe dan ber vê berpirsiyariyê. Digotin, “*ji bo vê şoreşê çi dibe bila bibe, tiştekî ku em nekin tine ye.*” Dema ku me bîryara rakirinê girt, hêza me ya Kobanê jî têrê nedikir ku hemû heşîşan rake. Jixwe yên Kobanê jî hinek feodal bûn, kê bîdîta ku ciwanên teniştа wî ku tevlî YPG bûne, diçin û heşîşa wî radikin, wê eciz biba. Zilamek ji wê malê bihata kuştin, ew qesa li zora wan nediçû. Dema ku me cara yekemîn hêza xwe kom kir û em çûn ku wan heşîşan rakin, bi zilam û jinan qêrîn dikirin da ku em heşîşê ranekin. Ew yek ji bo me pir bi zehmet bû. Jixwe hêzên me yên dîtir jî hebûn, lê divê hêzên Kobanê jî hemûyan dev û ruyê xwe bigirtana. Hemû hevalên me ku li Kobanê hene û hevalên ku di her qadê de kar dikin, pêşengîtiya vî karî dikirin. Me hemû hêza xwe kom kiribû, wê demê jî du doçqayên me çêbûbûn. Doçqayek di pêşiyê de, yek jî di dawiyê de dihat.

-**Dervayî van kesên ku dixwestin pêşiya rakirina heşîşê asteng bibin, tesîrên erenî yên ev hewildanên we çênebû?**

Destpêkê di qada navnetewî de jî bandoreke erênî çêkir. Ji ber vê yekê pir girîng bû, bala her kesî kişand. Ji bo YPG û YPJ jî, gelek kesên ku em nas nedikirin nêzikî me bûn. Dibe ku me heşîşê wan jî rakiribe, lê li ser wan bandoreke erênî jî çêkiribû. Hêza me bi vî awayî pir mezin bû. Dema ku bi çavên xwe dîtin, zêdetir bi eleqa nêzikî YPJ, YPG bûn. Keç û xortên Kobanê jî eleqeya wan ya çekan zêdetir e. Dema me heşîş radikirin, hinek keçan bi dizî li me meyze dikirin. Di nava wê aloziyê de hinek keçan digot, “*heval bi xwedê hûn me jî bibin.”* Bi vê yekê ji milê hêza Kobanê ve, serkeftinek çêbû û êdî li hemû gundên Kobanê pêşiya tevlêbûneke xurt jî vekir.

Piştî ku pêngava me bi awayekî serkeftî bi dawî bû, di wê navberê de pir zêde tevlêbûn jî çêbûbû. Hem keç, hem jî xort pir zêde dihatin gel me. Jixwe karên me yên perwerdehiyê jî berdewam dikirin. Lê hevalên din yên rêxistinê, ji bo vê pêngavê hemû karên xwe dabûn sekinandin û pêşengîtî dikirin. An na pêngav bi ser nediket. Vê pêngavê ji milê gel ve êşek jî dabû çêkirin û zehmetiyên wê jî hebûn, lê hem weke YPG û YPJ, hem jî ji bo xebatên din, avantajên mezin jî derxistin holê.

Foto-8

**Îlana Tabûrên YPG-YPJ’ê**

Di vê navberê de bîryar hate girtin ku li hemû bajarên Rojava, hêza YPG bê îlan kirin. Ew hêza me ku heye, divê êdî ji her kesî re bihatana nişandan. Yanî bi awayekî fermî hêzên parastinê yên gelê Rojava hene û li ser esasê parastinê hemû amadekariyên xwe kirine û ji her tiştî re amade ne. Navê tabûr û lîwayan hatin eşkere kirin. Her eniyekê çend tabûrên xwe ava dikirin, lê bi giştî hêzên ku li Kobanê hebûn lîwa bûn. Hemû hêzên ku li herêma Kobanê hebûn, divê di bin navê “Lîwa Şehît Sadîq” de bihata rêxistinkirin. Bi giştî li Cizîrê jî bîryareke wisa hebû û rêxistinbûnek li ser vî esasî pêş ketibû.

Di nava tevgera me de, şehîda jin a Rojava ya ewil hevala Dîcle bû. Bi xwe jî ji Kobanê bû. Ji hevalên xort jî, şehîdê me yê ewil ji Kobanê bû. Dema ku Serokatî jî, cara ewil derbasî Sûriye dibe, tê Kobanê. Wisa weke ku her tiştê Şoreşa Rojava li Kobanê destpê kiriye, rastiyek derdiket holê. Dema ku te ew rastî ji gelê Kobanê re dida diyar kirin, wisa hêz û moraleke xurt digirtin. Digotin, “*her tiştî ji Kobanê destpê kiriye, divê em her tiştî jî li Kobanê bi ser bixin.*” Şoreşa 19’ê Tirmehê jî li Kobanê destpê kir, cara yekemîn dewlet ji Kobanê hate derxistin. Ew pir girîng bû. Ji ber vê yekê me xwest, em lîwayên YPG jî cara yekemîn li Kobanê bi rêxistin bikin. Li ser vê esasê me dixwest cara yekemîn, Lîwaya Şehît Sadîq li Kobanê îlan bikin. Di 12’ê Çileya 2012’an de me hemû hêzên xwe kom kirin û me Lîwaya Şehît Sadîq îlan kir.

Hevalê Sadîq jî, hevalekî ku hem di nava giştî tevgerê de, hem jî li Kobanê xwediyê kesayet û bandoreke girîng bû. Li Cudî şehîd ketibû. Malbata wî jî pir welatparêz bû. Dema ku me li ser navê wî lîwa ava kir, birayê wî hat û tê de axaftinek kir.

Foto-9

Piştî pêngava heşîşê û perwerdeyan, pêngava rêxistinkirina Lîwaya Şehît Sadîq jî tesîreke pir mezin kir. Giranî û girîngiyeke YPG-YPJ derket holê. Jixwe dema îlankirina lîwayê, ji bo ku heybetek çêbe, hemû hêzên me dev û rûyên xwe girtibûn. Tesîreke pir mezin çêkir. Piştî îlankirina lîwa, bi hemû hêza xwe careke dîtir di nava Kobanê de geryanek hate pêkanîn û bawerî hat dayin. Hejmara endamên lîwayê, nêzikî 600 heval bû. Di nava vî hêzî de hevalên jin jî hebûn, lê hê nehatibûn îlankirin. Piştî wê jî tesîrek mezin çêbû û tevlêbûneke xurt derket holê.

Piştî van amadekarî û xebatan, divê ji milê leşkerî ve xebatên jinê yên xweser jî bihata pêş xistin. Jixwe heya wê demê hêza me gihiştibû astekê. Di her qadekê de hevalên YPJ hebûn û hatibûn rêxistinkirin. Dîsa civînên xweser hatibûn çêkirin û nîqaş pêş ketibûn. Bi şevê derxistina wan ya arazî û birina ser cihên kontrola rê ango haciz çêdibû. Bi vê yekê jinê xwe weke hêz didît û bawerî bi xwe dianî. Hewldanê bi vî rengî pir zêde bûn. Ji vê yekê re pêşengîtî dihat xwestin. Bi taybetî bi şev jî derketina jinan û tevlî xebatên leşkerî bûyîn, gavavêtinek bû. Ji milê malbatan ve zû bi zû destûr nedihat dayîn. Lê bi zehmetî be jî pêşketin ji vî milî ve jî çêdibûn.

Bi vî awayî cara yekemîn li Kobanê 25 hevalên jin tevlî perwerdehiya profesyonel bûbûn. Wê demê li Cizîrê hîn tevlêbûnek di vê astê de tine bû. Piştî vê bîryar hate girtin ku 'tabûrên xweser' jî bên îlan kirin. Jixwe kordînasyonê jî xeber şandibû û gotibû: "*Hêza xwe amade bikin, çawa ku şoreşê li Kobanê destpê kiriye, emê îlankirina hêza jinê jî li Kobanê bikin.*" Li ser vê esasê me amadekariyên xwe kirin. Lê ji bo îlankirin û dayîna ragihandinê, hejmar kêm bû. Ji ber vê yekê me giranî da rêxistinkirinê. Hêzeke amade hebû, lê ji ber ku cara yekemîn bû, me dixwest bi heybet be. Di wê navberê de hêzên Efrînê gotin: *"Em amade ne!"* Rêxistinê jî got: "*Bila Efrîn destpê bike!*"

Di 21'ê Adarê de, Efrîn tabûrên xwe yên xweser îlan kirin. Tabûrên Kobanê û bajarên me yên din jî piştî çend rojan hatin îlankirin.

Di dema Newrozê de gelek keç tevlêbûn. Bi tevlêbûna van keçan jî gaveke mezin hate avêtin û hejmara YPJ ya Kobanê gihişt 45'an. Hinek hebûn tevlî xebatên YPJ bûbûn, diçûne mal û dihatin. Lê ew hevalên ku em behsa wan dikin tevlê bûbûn, ji mala xwe qût bûbûn. Bi taybetî keçên Kobanê wisa bûn. Jixwe re navê *"kadroya herêmî"* û hwd qebûl nedikirin.

Me amadekarî dikir ku di 23'ê Adarê de tabûra xwe ya YPJ îlan bikin. Lê divê me ew hevalên ku nû tevlê bûne, dernexistana merasîmê. Lewra wê malbatên wan bihatana wir û careke dîtir pirsgirêk derbixistana. Me ji wan hevalan re got: "*ji ber van sedeman em nikarin we bibin merasîmê.*" Lê pir dixwestin werin. Hevala Sozdar hebû ku di şerê Kobanê de şehîd ket, li gel keçapa xwe tevlê bûbû. Birayekî wê jî di nava YPG de bû. Ji bo tevlêbûna merasîmê pir israr kir. Me jî dixwest, lê me nikarî em wan bibin.

Hevala Sozdar dema ku nû tevlê bû jî, pir bi moral û bi bîryar bû. Ji ber ku wan hevalan perwerdehiya şervanên nû jî nedîtibûn, di nava tabûrê de perwerdehiya xwe didîtin. Di nava tabûrê de jî hevala ku di destpêkê de me fermandariya taximê dayê, hevala Sozdar bû. Keçeke pir zîrek bû û li ser gelek tiştan hakîm bû. Li Kobanê destpêkê di nava hevalên jin de ya ku hem ji hevalê jin re, hem jî ji hevalên xort re fermandarî kir hevala Sozdar bû. Di şerê xwe de jî pir xurt bû. Bandora xwe li ser tevahî tabûrê dida çêkirin. Jixwe pişt re hevalan xwestibû bikin fermandarê tabûrê, lê di şerê Kobanê de şehîd ket. Ger pir zû şehîd neketiba, wê ji bo keçên Kobanê rol û risteke pir cuda jî pêk bianiya. Keçeke pir hêja bû.

Bi vî rengî me Tabûra Şehît Dîcle di 23'ê Adarê de li Çiyayê Miştenur îlan kir. Hevala Dîcle jî ji şehîdên ewil yên Kobanê bû. Li ser pişta Miştenur, qadeke berfireh heye. Me li wir merasîm çêkir. Hemû heval û gel li wir kom bûbû. Di wê demê de çek û alavên me jî kêm bûn, lê me ji hevalên xort girtibûn. Me li her milekî hevalên jin jî doçqayek bi cih kiribû. Jixwe hevalên xort ewlehiya qadê girtibûn. Dema ku piştî merasîmê bi tirimbêlan hemû hevalên YPG û YPJ xwe berdan nava kolanên Kobanê, heybet û kelecaneke pir mezin çêbû. Gel ji bo pêşwazîkirinê li kolanan kom dibû, bi kelecaneke mezin pêşwazî dikirin.

Foto-10

**-Avakirina tabûrên YPJ'ê li ser gel tesîreke çawa kir?**

Ew gavavêtinek pir mezin bû, zîhniyeta feodalî ya ku heye jî bi erdê re dibû yek. Mirov nikare van hestan bîne ziman, lewra pir cuda bû. Dema ku weke hêzeke xweser ya jinê, di nava kolanên Kobanê de, ew keçên bi çek û rext digeriyan, ji bo jinên Kobanê wateyeke pir mezin bû. Hestên pir mezin jiyan dikirin. Êdî herkesî digot, "*ger pêwîstî hebe, bila keça min jî tevlê bibe*." Hemû hevalên hatine merasîme jî matmayî dibûn, destpêkê bawer

nedikirin ku wê ji jinên Kobanê hêzeke wisa derkeve. Digotin, “*ew kîjan hêz e û we ji kû aniye?*” Bi vî rengî giraniyeke YPJ çêbû.

Foto-11

Piştî ku tabûra Şehît Dîcle hate avakirin, êdî kesî nedikarî pêşiya keçên Kobanê bigre. Her roj 7-8 hevalên jin dihatin û tevlê dibûn. Weke volqanekî ku diteqe lê hatibû. Bi xwe ji mal direviyan û dihatin navendên me. Piştî wê em neçûn cihekî da ku em keçekê bînin û tevlê bikin. Bi xwe dihatin. Di destpêkê de ew qesa zehmetiyên wê hebûn, lê pişt re kom bi kom dihatin. Yên tevlê dibûn jî, hemû dibûn tevlîbûnên profesyonel. Vê yekê jî bandoreke pir cuda çêkir û hêza jinê di Kobanê de xurtir bû. Ji ber ku hejmar jî zêde bûbû, akademiya me têrê nedikir. Ji ber vê yekê yên weke kadro tevlê bûne, me dişandin tabûrê. Yên qad û taxan, li akademiyê dihatin perwerdekirin.

Dema ku hejmara Tabûra Şehît Dîcle gihişt 70-80 jî me pêwîstî dît ku em tabûreke din ava bikin. Jixwe li ser esasê pêşniyar û lêhûrbûnên wan, me gelek ji wan jî dişandin herêma Cizîrê. Wateya vê pêngavê ji bo Kobanê ew bû ku di wê derê de zîhniyetek şikest. Ew zîhniyeta ku jinê weke *“mal û namûsa xwe”* dibîne, piştî îlana wê tabûrê ber bi şikestinê ve çû. Piştî wê dayikan bi xwe keça xwe dianîn û tevlê hevalan dikirin. Xwişk û keçap bi hev re tevlê dibûn. Ew zîhniyet bi giştî neşikestibe jî, bi piranî ji holê hat rakirin. Êdî kesî nedikarî ji jinê re li gor xwe sînoran dayne. Pişt re ji bo wan hevalan, me akademiya kadro ya Şehît Şîlan ava kir. Akademiyên giştî jî hebûn, lê weke xweser cara yekemîn li Kobanê akademî hatin vekirin. Jixwe li cihekî weke Kobanê, di destpêkê de mirov nikare perwerdeyên têkel ango di nava hev de pêk bîne. Hevalên xort û hevalên jin ji hev serbixwe perwerdehî didîtin. Pêwîstiyên xweser jî hebûn, lê bi taybetî ji bo nêzikbûnên hindek Kobaniyan me wisa dikir. Dema ku didîtin xweseriya jinê heye, hinekî gumanên wan jî ji holê radibûn.

Cihên heyî têra hêzen me yên leşkerî nedikir. Ji ber vê zehmetî dihatin kişandin. Cihê herî xweş li gel radyo bû, me ew jî dabû tabûra Şehît Sadîq. Ew heval jî pir hêja bûn lê ji bo hevalên jin jî cih qet tine bû. Me maleke gundiyan ku di nava araziyê de bû, dabû hevalên jin. 60-70 hevalên jin tê de cih bûbûn, lê ew jî cihekî teng bû. Hevalên ku di wan deman de di nava wan tabûran de cih digirtin bi piranî şehîd ketine. Weke me got, tabûrên ewil yên Şehît Dîcle û Şehît Sadîq bûn, ji wan hevalan pir kes nemane. Piranî şehîd ketin. Fermandarê wan hevalê Emîn bû, ew jî şehîd ket. Hevalan sekneke pir lehengîtî nîşan dabûn û şehîd ketibûn. Piraniya wan çalakiyên fedaî kiribûn. Ew rih û kelecaniya ku di wê demê de jiyan dikirin, di şerê Kobanê de derxistibûn holê û rista xwe pêk anîbûn. Hevalên ku ji wê demê mane bi tiliyan tên hejmartin. Wan hevalan wisa perwerdeyeke pir xurt jî nedîtin. Ji ber derfetan rêveberiyên wê demê jî nedikarîn tiştekî pir zêde bikin. Ji milê leşkerî ve jî di hinek mijaran de zehmetî hebûn. Lê herkesî qebûl dikir ku parastin nebe nabe. Herkes hesas nêzikî parastinê dibû.

**-Di vê demê de, li bajar û derdorên cîran yên Kobanê pêşketinên çawa hebûn?**

Hêza ‘Arteşa Azad’ li wan derdoran hebû, lê ji ber ku di navbera wan û dewletê de şer hebû, nedikarîn li ser bajarên me pir zêde bi bandor bibin. Carna hin hêzan di navbera me û wan de nakokî derdixistin. Lê tesîra xwe pir zêde nedikir. Mesela ew di wê demê de li Girêspî, Minbic û Cerablûsê hebûn, lê hêzên me jî di wê derê de bûn. Em diçûn van bajaran û me rêxistinên xwe çêdikirin. Rêxistinbûna gelê me li wan deran hebû, rêxistina hêzên me yên leşkerî di wan deran de hebû. Nû bi nû hevalên jin jî tevlî parastinê dibûn û me ew perwerde dikirin û careke dîtir dişandin cihên wan. Em dikarin bibêjin gavek li wan deran jî hatibû avêtin. Li van deran jî keda gelek hevalan heye. Mesela li Minbicê, Arteşa Azad li milekî bajêr bû, em li milekî bûn. Nakokiyeke pir kûr tune bûn. Hesabekî wan jî li ser Kobanê tine bû, ji ber vê yekê bi awayekî giştî li Kobanê mantiqekî “*tiştek nabe*” pêş ketibû. Hêzên YPG, yên asayîşê, yên rêbendan li qadên xwe nobeta xwe digirtin û diparastin. Li hemberî êrîşan hin tevdîrên parastinê hatibûn girtin.

## BEŞA DUYEMÎN
## DESTANA SEDSALÊ: BERXWEDANA KOBANÊ

### 1-Di Salvegera Şoreşê De Êrîşên Cebhed-El Nusra

***-Êrîşên ewilî yên li ser Kobanê çawa çêbûn, li hemberî wê berxwedaneke çawa hate dayin?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Ji bo pîrozbahiya rizgarkirina Kobanê di 19’ê Tirmeha 2013’an de li Kobanê gel pîrozbahî dikir, heman şevê li Girêspî ku bi Erebî digotin Til Ebyad şer derket. Komên girêdayî Arteşa Azad û Cebhed El Nusra êrîşî

ser Kurdan kirin û xwestin mesajêkê bidin me û gotin: *"Hûn nikarin azadiyê jiyan bikin û em ê we bixin bin destê xwe!"*

Şerê ku di 19'ê Tirmeha 2013'an de despêkirî bi xwe re pêvajoyekî nû da avakirin. Di girtina Girêspî de, em jî bi Arteşa Azad re ketibûn bajêr. Dema Arteşa Azad xwestin Girêspî bigirin, bi me re îtifaq çêkirin û li ser Kobanê re derbas bûn. Heger bajar bê girtin, wisa hatibû hevkirin ku em ê di meclisa bajêr de ji sedî çil cihê xwe bigirin. Di her saziyêkê de wê esas bihata girtin. Di Girêspî de rejîm zû ket. Meha Îlonê bû dema Girêspî ket. Îtifaqa ku me bi Arteşa Azad re kirî weke heyî ket meriyetê. Ev rewş heya 2013'an 19'ê Tîrmehê li Girêspî dewam kir. El Nusra ku girêdayî Arteşa Azad bû êrîş kirin, qatlîam çêkirin, Kurd qetil kirin, mala gel hat teqandin. Hinek hevalên me di wî şerî de şehîd ketin û birîndar bûn.

Ji ber quweta me ya leşkerî pir kêm bû, mecbûrî me xwe ji nav bajêr kişand. Li gundê Yapsinê şer çêbû, di wê esnayê de berpisyarê Til Ebyad yê El Nusra rehîn bû di destê hevalan de, ev rewş me baş kar neanî. Wan xwestin em îtifaq bikin bi şertê ku em Ebû Meshef berdin, wan jî şer nakin, wê xwe şûnve bikşînin, bi vî awayî wê şer bisekine. Me rabû îtifaq qebûl kir û berpirsê Cebhed El Nusra berda û em di cihê xwe de bûn. Dema berpisyarê wan giha cem gûrobên xwe yên leşkerî, êrîşa mezin despê kir. Êrîşeke ji ya berê hîn dijwartir, mezintir û bi teknîkekî xurt ya debabe, topan ji hudûdê Tirkiyê jî alîkarî digirt despê kir.

Dîsa ji Girêspî jî hem di hêla jimar de û hem jî di hela teknîkê de êrîşeke dijwar despê kir. Despêkê li gundê Yapsê, Gir Hiso û Eskeriyê şerên dijwar û demdirêj despêkirin. Di wê demê de derfetên me pir hindik bûn. Di asta teknîk, çek û hêza rêxistinkirî de quwetên me kêm bûn. Di wê demê de du tabûr hevalên me hebûn. Hinek heval û hinek jê ji nav gel nu derketibûn û perwerdekirîbûn, pêkdihatin. Ev tabûr şerkerbûn û rihê xwe yê êrîşê hebûn. Yek ji wê tabûrê şehîd Emîn li ser dima ku piştre li Kobanê di êrîşa 2014'an çêbûyî de şehîd ket.

Hêza ku li beramberî me şer dikir pir zêdebû û Tirkiyê jî destek didayê, bi vî awayî em mecbûr man ku gundê Kurdan Yapsê berdin. Şer giranî ket gundê Eskeriyê û Gir Hiso ku bi hev ve ne û nîştecihên wê nîv Kurd û nîv ji Ereb in. Di wî şerî de gelek heval şehîd ketin. Hinek ji wan hevalan ji bêtecrûbetiyê şehîd ketin, ji ber di wê demê de li Kobanê hemû kesê sîleh girtibûn hatibûn şer şehîd ketin û gelek jê birîndar bûn. Di şer de kordîneyeke ku baş şer rê ve bibe jî tunebû. Ji ber wî jî windahiyên me li wir çêbûn.

Di wî şerî de heval Dilovan şehîd ket, ku ji gundekî Kobanê Şêranê bû. Hevala Viyan mamostayê zimanê Kurdî bû, pişt re li gundekî bi navê Kendalê şehîd ket. Hevala Peyman ji gundekî Kobanê bû, di şerê gundê Gir Hiso de şehîd ket. Hevala Peyman hevalên li gel hemû şehîd ketibûn û ew bi xwe jî birîndar bibû, derfetên em heval xilaskin tune bû, herçendî me xwest em xilas jî bikin lê nedibû, jixwe ji bo hevalan xilas bike heval Dilovan şehîd dikeve, heval Peyman ji bo nekeve destê çeteyan bomba xwe di xwe de diteqîne.

Foto-12

Şer sê rojan dirêj kir, ji bo wê me bîryar girt em xwe paş ve bikişin û bên xeta gundê Sûsikê û Evdikê de mewzî bigrin. Pevçûn pir dijwar bûn, di wê esnayê de hevalan xeber dan me û gotin, komeke Lîwa Tewhît ya girêdayî Arteşa Azad li ser riya Reqa û Helebê diçe û tê. Wê demê wan bi me re ne di şer de bûn, bi dewletê re di şer de bûn, hevalên me komek ji 12 kesan ji wan digre. Xeber dan me, me ew kesan rehîn girtin û birin cihekî veşartî. Doçqayek wan 23 ya du lule hebû, hinek B-7 û nêzî deh hezar guleyên doçqayê hebûn me dest danîn ser. Ev çekên giran pir başbûn û bi van çekan em ketin şerê Girêspî yê 2013'an.

Foto-13

Piştî 20 rojan me çekên wan dan wan û serbest berdan. Me li xeta Sosik, Kendalê, Evdikê mewzî girtin û mewziyên xwe çêkirin. Di wir de me binesaziya xwe xurt kir û komên pêş û paş ava kirin. Di wê demê de heval Masîro wan hatin. Heval Masîro hat ser wê êniyê. Di wê demê de me ne dixwest em ji her çar aliyan ve bikevin şer. Êdî diyardeyên ku di xeta Firatê de şer çêbe hebûn. Di xeta Şêxlera jêr, Şêxlera jor de ji diyardeyên şer derdiketin holê.

Xeta Sirînê heya diçe gundê Çeqil Wêran, Kun Eftar, Tepê Sêvê xeteke dirêj e; dikeve Başûrê Kobanê. Me li wir dest bi mewzî çêkirinê kir. Li wir ji ber qûwet tine bû, me piranî gundî kom kirin. Gundiyan tepe digirtin, mewzî digirtin, şer dikirin. Mirov dikare bêje şerê 19'ê Tirmehê 2013'an de despêkirî şerê gel bû. Gelê Kobanê di vî şerî de rolek pir mezin lîst. Ev şer şerê gel yê şoreşgerî bû. Di van eniyan de yê ku şer kirin gelê herêmê bûn. Me di asta perspektîf, plan û program de rêxistin dikirin, lê yê din hemû ji gel pêk dihatin. Yê ku şer dikir, li ber xwe dida û nedihişt dijmin pêş ve bê gelê herêmê bû. Rolekî pir mezin dilîstin.

Piştî demekê li xeta Şêxlerê pevçûnan destpê kir. Bi vî awayî eniya şer ya Kobanê bû dudu. Girêspî berê despêkiribû, vaye 20 roj bû dewam dikir. Vê carê di Şexlerê de jî şer despêkir û bû du enî. Yanî hem di Rojhilat û

hem jî di Rojavayê Kobanê de şer despê kir. Ji bona em vî şerî bidin sekinandin hewldanên me pir bûn, ji ber quweteke me ya perwerde kirî tune bû û cebîlxaneya me jî têrê nedikir. Ji ber wê me dixwest em şerê ber ava Firatê bidin sekinandin û tenê di eniya Girêspî de şer berdewam bikîn.

Di şerê ber ava Firatê de gelek heval şehîd ketin. Di wî şerî de pir komên çekdar tevlî şer bûn, komên ketîbên Îslamî, Selefî, Tewhid, Ehral El Şam, Cindil îslam nêzî bîst gûrûban hebûn û jimarên wan jî zêdebûn. Di vî şerî de rûxmî ev çend kom jî hebûn însiyatîf ji destê me derneket. Çend çalakiyên bi bandor çêbûn, wan şikiyan.

Yek ji wan çalakiyan ya Tepê Ilicaxê bû. Di Tepê Ilicaxê de heval Hogir hebû. Ev heval ji Bakurê Kurdistanê, bajarê Muşê tevlî bûbû. Di 2014'an de di êrîşa gundekî Kobanê Çarikayê de şehîd ket. Di 2013'an de di Tepê Ilicaxê de hevalê Hogir berxwedaniyek pir mezin meşand. Rexmî çetan pir êrîş kir nekarîn vî tepî bigirin. Pişt re dema heval birîndar dibin û şehîd dikevin tepe tê girtin. Ev tepe cihekî xwe yê stratejîk hebû li ser ava Firatê; hevalan piştî du rojan dîsa êrîş kirin û gir girtin. Ji ber di vî girî de kuştîyên çetan pir çêbûbûn, xeta Sirînê, xeta ku taqwiye ji wan re bê me girtîbû, mecbûr man ku îtifaq bikin û şer bisekinînin.

Di îtifaqê de şert hebûn. Ji wana yek Riya Navnetewî ya ku riya ji Heleb tê û diçe Iraqê, divê me ji wan re vekira, li beramberî vê em ê di mewzîyên xwe yên kevin de bimînîn û wan jî wê xwe bikişînin mewzîyên xwe yên berê. Bi vî awayî şer hat sekinandin. Nêzî 40 kesan hatibûn ji bo hevdîtinê. Di nav wan de Dewrî Sewrê hebû, meclisa Şerîet hebû, berpisyarên leşkerî, berpisyarên siyasî hebûn, hemû qadên wan di nav de cih digirtin, bi wan re peyman hate çêkirin. Pratîkî şertê riya navendî nehat meşandin, ji ber pişt re jî her tim pevçûnên biçûk derdiketin, ev xal piratîze nebûn. 2013'an heya payîzê rewş bi vî awayî berdewam kir.

Di vê demê de fedakariya gelê Kobanê pir zêdebû û bandorek xwe ya mezin hebû. Di hemû eniyên şer de gel cihê xwe girt. Pir gund hebûn xwe xistibûn yekîne, her demekê kom kom dihatin parastina giran dikirin û nobeta xwe digirtin û gundên xwe diparastin.

Di wê demê de êdî dorpêçan despê kirîbû. Ambargo hebû. Ji derve ti tişt nedihat hundir. Riya di navbera Kobanê û Cizîrê de jixwe hatibû girtin. Kobanê êdî bi tena xwe mabû. Hewldanên me ji bo civak vê rewşê derbas bike çêdibûn, timî bi rekên dizî ji Heleb, Reqa, Girêspî û Tirkiyê me dixwest pêdivîyên civakê tedarîk bikin ji bo koçberî çênebin.

Di wê demê de wan av, elektîrik li ser bajar qûtkirin. Me 10 bîrên avê kolan û girêdana wan bi hev re çêkir, bi wî awayî me pêwîstiyên avê tedarîk kirin. Pêwistiyên weke benzîn, gaz û mazotê jî bi pereyek zêde me ji Cebhed El Nusra û DAIŞ'ê digirt. Heya şerê Girêspî derkeve mazota bajarên Şêxler, Cerablûs, Girêspî û yê Sirînê me dida. Wan dixwestin bi birçîbûnê Kobanê teslîm bigirin. Ger kesek alîkarî jî bikira yan ev digirtin, yan lêdixistin, yan jî dikuştin û bi vî awayî dixwestin îrada gel bişkênin. Di van deman de pir insan winda kirin, kes niza girtîne, an şehîd in, aqubetê wan ne diyare. Ev şer ji berîya DAIŞ jî hebû. Yê wan komên biçûk bûn, lê belê yê DAIŞ'ê mezin bûn.

***-Di salvegera şoreşa 19'ê Tirmehê de, bi taybetî li Kobanê li Rojava êrîş destpê dikin. Bi çi awayî ew êrîş pêş ketin? Dema ku em vê dîrokê jî ber çavan digirin, armanç û plan li ser çi esasî bû?***

**MERYEM KOBANÊ:** Wê deme em diketin nava pêvajoyekî nû. Pêvajo hem di aliyê şer de û hem jî di aliyê konjoktûrê de li Sûrîyê berbi rewşekî nû ve diçû. Di wê demê de li aliyê Cizîrê piştî ku Arteşa Azad lewaz ket û Cebhet El Nusra kete dewrê, êdî şerê me bi Cebhet El Nusra re berdewam kir.

Di ew şerê ku hate berdewam kirin de wehşeta ku wan da meşandin, xwestin li Girêspî çavê gel bitirsînin. Xwestin çavtirsiyê di şerê 20'ê meha heftan 2013'an de pêşbixin. Di wî şerî de armanca wan ew bû, bi taybetî çavê gelê me yê li Girêspî bitirsînin. Dema ku li wir Emîrê wan esîr kete destê me, wan li Girêspî ji nav gel bi hezaran kes li meydanekî kom kirin û gotin *"ger hûn emîrê me neberdin em ê van sivîlan hemûyan bikujin."* Wan xwestin bi tehdîdkirina gel ve bazarê bi me re bikin.

Em dizanin ku Cebhet El Nusra li ser esasê îxanetê hatiye avakirin. Tevgereke komploger e. Ji ber wê xwestin di wî şerî de gel ji bo xwe bikin mertal. Şêwazên wan wisa bûn. Gel esîr digirtin ji bo ku ji me tewîzan werbigirin. Niha jî şêwazê wan wisa ye. Bêgûman dema ku ji bo me gel bû mijara bazarê her tişt disekinî. Me got em ê çawa gelê xwe bikin mijara bazarê. Emîrê wan ê ku di destê me de Ebû Mishaf bû. Me rabû bi wan re hevpeymanek çêkir. Lê me dizanîbû ku bawerî ji wan naye. Em di ferqê de bûn ku wê komplo li me bikin. Piştî me Emîrê wan berda wan hêza xwe hemû komî hev kirin û êrîşî ser hêzên me kirin.

Jixwe ew nêzî salekê bû li derdora Kobanê û Efrînê şer berdewam dikir. Ciwan ji Kobanê diçûn û li Helebê şer dikirin. Cardin li dorbera Serêkaniyê nêzî salekî şer hebû. Her wiha li Til Temir, Hesekê û li Cizîrê giştî şer hebû. Kobanê di navînê de mabû, şerekî dijwar li navendê tune bû.

Wê demê hem di hêzên me leşkerî de û hem jî di nava civakê de nêrînekî wisa hatibû avakirin, digotin: "*kes zû bi zû di Kobanê de wê şer neke, ji ber ku hemû Kurd in kesî were êrîş bike nîne*." Digotin: *"ger em êrîşî kesî nekin wê kes êrîşî me nekê."* Ev feraset ji çi çavkaniya xwe ji dilpaqîjiya Kurdan digirt. Ji rastiya ku pir aliyan de hesabê

dijminê xwe nekirinê digirt. Ev jî feraseta me a Kurd e. Mixabin ev feraset di me hemûyan de di pêşdaye. Bi gîştî di gel de ev feraset li pêşbû. Yani digotin "*ma kî dikare me.*"

Di demên berê de eşîrên Ereban êrîş li ser Kobanê kiribû, lê ser nexistibûn. Wan jî bi fikra eşîrtî dimeşiyan. Digotin: "*berê jî kesî nekariye me binbixe, niha jî kes nikare.*" Yanî demdirêj nedifikirîn. Digotin: "*Erebên Sirînê ne, hemû xwarziyên me ne, em wan nas dikin, me berê jî wan bin xistibûn.*" Yanî baweriyeke hundirê wê vala hebû. Zîhniyeta civakê li gorî şerekî demdirêj amadekirin, xweparastina cevherî pêşxistin, stratejik fikirandin rastî jî nebû.

Piştî 20'ê mehê bi şerê ku li Til Ebyad'ê hate meşandin, Kobanê kete cemberê. Him ji aliyê aborî, him leşkerî, him aliyê siyasî, him aliyê çûn hatinê ve kete çemberê. Ya rastî di dîroka şeran de her tim ev teqtîk hatiye bikaranîn. Kobanê jî dema ket dorpêçê derfeteke ku têra xwe bike û xwe rê ve bibe tineye. Ji aliyê têrê xwe kirinê ve Kobanê lewaz e. Em bêjin genim e, petrol e, tiştên wisa pir tine. Herêmek ji aliyê axê ve pir ne dewlemend e.

Di destpêka şer de hemû gel di pêş de bû. İnsanên me yên 70 salî bigre heta ciwanan hemû bi çekên xwe di nava şer de bûn. Dema li Girêspî şer çêbû, bi sedan kes çekên xwe girtin û çûn şer. Weke hatin hawarê. Yanî ev çanda hewarê heye, weke ku bejin li ser eşîrekê şer e, bi wê mantiqê em jî biçin alikariya wan. Di civakê de ji aliyê sosyolojik ve wisa hatiye rêxistinkirin. Bêgûman ev ji bo şerekî dem kurt dibe. Lê ji bo şerekî demdirêj nikare bibe bersiv. Ji bo şerekî eşîrtî, li hemberê bajarekê, rêxistinekê dem kurt mirov şer bike, dibe ku feydeya xwe hebe. Lê bes demdirêj aliyê teqtîkê şer ve ev yek ti feyde çênake.

**Sê pêşengên şerê Kobanê**

Foto-14

Di vê pêvajoyê de berxwedayinek gel hat meşandin. Ev berxwedayina gel ya bi rastî rengekê bêhempa dihat meşandin girîng bû. Destpêkê eniya Xerbê bû. Di eniye rojhilat de teybetî mile xeta Sûsikê, mile kendalê, Evdiko piştî demeke êdî me xetek çêkir. Wê deme jî Heval Dilovan şehîd ketibû. Şahadeta Heval Peyman, Heval Necbîr çêbibû. Her sê hevalên ku destpêkê şehîd ketibûn jî, ji wê heremê bûn. Vê bandoreke pir mezin li ser civakê kir...

Foto-15

**-We qala tesîra vê şehadetê ya li ser civakê kir, hûn dikarin vê mijarê hinekî din vekin, tesîreke çawa bû?**

Bi taybetî ji milê jinê ve bandoreke erenî dikir. Me beriya wê di Kobanê de pir zehmetî dikişand. Mînak tenê tabûreke hevalên jin hebû. 45 kes bûn. Em bi tabûreke xort, tabûreke keç ve ketin şer. Yanî hêzên me giştî du tabûr bûn. Dema me şerê Girêspî meşand, em bi herdu tabûran ve ketin şer. Kesên ku tevlê dibûn, ji gel qut dibûn. Yani yên herêmî tune bûn. Vê yekê jî ji civakê bingeha xwe digirt. Ji ber ku civakeke ne wekî civakên din e. Tu tevlê bibê, pêwîst e tu derkevî. Çênabe tu biçê û werê. Tu derketî, pêwîst e tu venegerî.

Di vê pêvajoye de bi şahadeta van hevalan ve tiştek derkete pêş, çi bû? Ya rastî di Kobanê de bandoreke pir cidî da avakirin. Şoreş di hundirê şoreşê de çêbû. Ez dikarim bêjim piştî şerê Til Ebyad her çiqasî rêxistineke jin nehatibe avakirin jî herikandineke pir zêde hat çêkirin. Di nava mehekê de 100 hevalên keç tevlêbûn. Gelekên ji wan, bavê wan dayikên anîn. Pirî malan du zarok bi hevre hatin tevlîbûn. Hatîn di eniya herî pêş de cihê xwe girtin. Viya bandoreke pir mezin li ser civakê kir. Di cephê de keç û bavê xwe, bi hevdu re cihê xwe girt. Civakê dît ku jin dikare di eniya herî pêş de cihê xwe bigire.

Şahadeta van hevalên jin bandoreke çawa li ser civakê kir, civakê got 'ger keç di eniye pêş de cihê xwe girtibe, çima em neçin?' İnsanên ixtiyar yên emrê wan 60 salî her êvarî dihatin nobet digirtin. Yê ku çifteyên xwe dianîn, yên ku çekên xwe yên li malê dianîn hebûn. Ango wekî serhildana gel çêbû. Viya êdî bi xwe xwe hate rêxistinkirin. Ew tabûren berê yên YPG, weke me got tabûrek keç, tabûrek xort bûn, êdî têra parastina wan deran nedikirin.

Destpêkê eniyek tenê bû. Piştî demeke kurt eniya duyemîn hat çêkirin. Eniya Rojava. Viya jî pir demdirêjî dom nekir. Di nava demeke kurt de eniya Rojava jî kete dewrê. 17'ê meha 8'an 2013'an kete dewrê. Li vir jî şer destpêkir. Êdî bûne du ênî. Yanî di Kobanê de him ji mile Rojava ve, him jî ji mile Rojhilat ve şer derket. Ew demeke dirêj bû, di eniyeke tenê de şer hebû. Demeke kurt de milê Şêxler, milê xeta Zêrik, Tehlik, Zor Maxarê heta ku digehê ber xeta ava Firatê şer derket û berdevam kir.

Di wî şeri de heta heval gehiştin li wê dere, milet bi xwe ber xwe da. Berxwedayinek milet bi xwe li wir çêbû. Berê jî di şerê eşîrtî de milet şer dikir. Gundê Cibnê bixwe tabûrek hebû, gundê Çarikli wisa. Hevalê Munzur berpirsiyarê asayişa Kobanê giştî bû, wê demê şehîd ket. Hevalê Munzur destpêka şerê Serêkaniyê de cihê xwe girtibû, di şerê ku hat meşandin de roleke giring listibû. Hevalekî ji Efrînê bû. Salên dirêj di nava tekoşînê de cihê xwe girtibû. Dema dibihîse şer derketiye raste rast berê xwe dide gundê ku pevçûn lê derketî, tevlî şer dibe… Li wê dere Heval Mûnzûr şehîd ket. Heval Munzur, rihê welatê xwe parastin, ji bo gelê parastina gelê xwe di çepera herî

pêş de cih girtin, di xweda avakiribû. Yêk jî Hevalê Dilsoz bû. Herdu heval diçin cihê ku lê pevçûn heye. Li wê dere şehîd dikeve.

**-Bawerim di van rojan de li rojavayê Kobanê jî pevçûnan destpê kiribû…**

Bêgûman mile Rojava wek eniyekê derkete holê. Berxwedayina li wir hatî çêkirin şûnve giştî wê eniye xwe rêxistin kir. Ya girîng li wir bajarên derdora Kobanê bûn. Wê demê Cebhet-El Ekrad li Reqayê hebû. Ew hêza Cebhet El Ekrad ku xwe li Reqayê rêxistin kiribû xistibûn dorpêçê. Çûnûhatin qedexe bû. Dixwestin komplo li ser bikin. Her carê pirsgirekek derdixistin, hincet derdixistin ku êsîr bigirin. Hem ji gel hem jî yên ku me li wê dere rêxistin kiribûn, ji Kobanê çûbûn, hejmareke heval hebûn; berpirsiyarê wir re em axivîn û me rewş pirskir. Me dît ku dixwazin tine bikin. Rêyek tenê ji mere dima; pêwist e em qûwetên xwe bi rêbazên cuda derbixin.

Li ser wê esasê xebat hate kirin. Ji bo ku em bikaribin vi qûwetî ji wir derxin, me gelek rêbaz ceribandin. Ji ber ku teqviye nikare jê re biçe, tenê eger bimînin dê bi imhayê re rû bi rû bimînin. Li wir mayina hevalan me weke teqtîk guncav nedît, weke hejmar miletê me jî pir kêm di Reqa de hebûn. Kesên eşîrên Ereban ne bi me re ne. Jixwe li pêşiya wê jî Cebhet El Nusra û pir ketîbeyên din hebûn, wan ketîbe îmha kirin. Gelekên wan kuştin, serê wan jêkirin, dest danîn ser cebilxaneya wan.

Di Reqayê de Cebhet El Nusra hakîm bû. Hêzeke ku jê re digotin Suwar El Reqa, hijmareke wan ya pir zêde jî hebû. Pişt re li hemberê me şer kirin. Ez ê werim ser vê mijarê. Pêwîst e keleka me şer kiribana, lê li hemberê me şer kirin. Lê pir windahiyên wan çêbûn. Taybet ew kesên ku ji Reqayê dihatin di ênî Rojhilatê de şer dikirin, pir kuştiyên wan çêbûn.

Ew kesên ku dixwestin êrîşî gundê Kendal'ê bikin jî, ji Reqayê hatibûn. Ev bi vê sozê hatibûn. Dema ku diçin dibêjin, "*em diçin, ji bo ku em gundê Bexdikê nimêj bikin*." Bi wê bîryarê tên. Bi tanqan hatin ketin gundê Kendal'ê. Cara yekemîn me tanq ji wan girt. Heval Rustem hebû, hevalekî bi xwe ji Sûrûcê bû. Heval Rustem, Heval Viyan Mamoste li wê derê bûn, wexta tanq dikeve navbera wan de Heval Viyan dide ber tililiyan. Heval Rustem jî bi fedaiyane diçe ser tanqê. Hijmareke pir mezin cenaze dikevin deste me. Tanqek ket destê me, du sê doçqa ketin deste me, nêzî 20-30 çekan ketin deste me. Yanî yên ku hatine wir kes jê xelas nebû, hevalan giştî kuştin. Piraniya kesên ku ketin gund, careke din derneketin. Hevalan derdora wan girt, tevlî cebilxaneya wan, cenazeyên wan, doçqa, tanq hemû ketin deste me.

Viya baweriyek pir mezin da avakirin. Derfetên me yên cebilxane jî pir kêm bûn. Du doçqayên me hebûn. Me yêk şande eniya Rojava, yêk jî me şande eniya Rojhilat. Mînak Zagroseke me hebû. Şehît Rodî bikar dianî. Ji mere pir girîng bû. Çekeke tenê di deste me de hebû. Karnasên me, doçqayên me, çekên me yê giran pir kêm bûn. Ev di baweriye me de avabibû ku em bi cebilxaneyek kêm, lê bi riheke fedai dikarin pir tiştan dest bixin. Tabî viya hêzeke baweriyê da avakirin.

Ew kesên ji Reqayê dihatin şer dikirin, wexta bi hijmareke kêm vedigeriyan bertekek da avakirin. Mînak 50 kes tên 10 kes vedigerin, 20 kes tên 5 kes vedigerin. Yanî hijmareke mezin birîndar û kuştiyên wan çêdibin. Vana xwest hevalên me yên li wir tengav bikin. Me bîryar girt ku em hevalê xwe bikişînin. Heval hem Tebqa hebûn, him li Reqa hebûn. Taximek hevalên me li Tebqa jî hebûn..Yê ku me karî em derxin me bi rengekê veşartî derxistin. Feqet grûbek hevalan li wir man. Gotin "*em tiştek xwe li wir nahêlin.*" Li gel cebilxaneya xwe bi rengekî dizî ji bajêr derketin.

Me bîryar da ku ew gelê welatparêz ku dixwaze derkeve jî em derxin. Mesafeyeke pir dirêj e, ji Kobanê dûr e. Hemû cih jî ne girêdayî me ne, herêmên ku Ereb tê de jiyan dikin in. Ji bo ku em hêzên xwe taqwiye bikin, an jî ji wê derê derbixin, em bi gelek zehmetiyan re rû bi rû diman. Rê hemû jî girtine. Çendek heval in. Hijmareke pir hindik e. Me got bila gel jî derkeve. Ji ber ku weke metropolekê ye Reqa. Ne gundekî biçûk e, ne bajarekekî nêzî me ye ku em teqwiye jêre bişînin. Ji milê Cizîrê yan Helebê ve jî em nikarin teqwiye jê re bişînin.

Bîryara me ya herî rast ew bû ku me şûnde kişandin. Li wê dere grûbek heval dimînin. Ev grûp pir hêstiyarî nêz dibin. Dibêjin "*em ê çawa li vir biçin, gel li vir şehîd ket, heval çûn.*" Pişt re grûbek din jî derdikeve, hevalê Baran û Hevalê Qehreman tenê dimînin. Dibêjin "*em gelê mayî jî hemûyê derxin, pişt re em ê derkevin.*" Hevalê Qehreman fermandar bû, Hevalê Baran jî fermandarê yekîneyek bû.

Sibehê çete êrîşî ser cihê hevalan dikin, lê hevalan cihê xwe vala kirine, textik meşandine. Çete dikevin nava milet de, dibinin ku milet jî cih vala kirine. Jixwe kesê reviya reviyabû. Miletên din jî hinek biribûn cem xwe, hinek dest danîbûn ser malên wan. Ew hevalên mayî û miletên mayî heta cebilxana wan ya dawî şer dikin, hevalê Qehreman li wir çalakiya fedayi dike. Bi xwe di xaniyekî de ye, ji hevalên din re dibêje "*bila ew werin ez ê çalakiya fedai bikim.*" Yêkî ji gel jî li gel hevalan e. Hevalê Qehreman, dema ku çete tên ser ji bo ku nekeve dest, çalakiya fedaî dike. Heval Baran jî piştî wî demeke kurt şehîd dikeve. Li gorî agahiyên ku me ji gel girtine, gel jî xwe di araziyê de vedişêre. Bi şev derdikevin tên.

Ji van hevalan yêk jî hevalê Şoreş mabû. Pişt re tê girtin ji aliyê Cebhet El Nusra ve. Piştî salekê wî berdidin. Ji aliyê fikir de ciwanekî pir pêşketibû. Ji aliyê şerê xwe ve jî hevalekî mînak bû. Piştî ku hat, tevlî hemleyê bû. Destpêka berxwedayinê de ew heval şehîd ket. Rastî jî ciwanekî pir hêja bû. Digot, *"em sê çar heval bûn, lê bi hezaran kes dihatin ser me, êrîş dikirin."* Bi rastî hêrsek di wî de hatibû avakirin. Bixwe ji gundekî nêzî Baxdikê bû. Gundekî Kobanê ye.

Foto-16

Di vê pêvajoyê de dîsa mile Cebhet El Ekrad jî şer hebû. Li Minbicê hêza Cebhet El Ekrad, ku piştra xwe weke Şems el Şîmal rêxistin kirin, li wê dere şer dikirin. Tevlî ketîbên din yên Arteşa Azad şer dikirin. Demeke şûnde ew çeteyên Arteşa Azad, tevli Cebhet El Nusra bûn, êdî têkiliyên me û wana xera bibûn. Dixwestin hevalên me re komplo bikin.

Jixwe wê demê jî sê hevalên me bi komployê şehîd xistin. Yêk ji wan jî navê wî Xidir bû. Dibêje *'dibe ku ez bi navê Cebhet El Ekrad şehîd bikevim. Lê hûn ala me ser min de bikin."* Dibêjê, "*bi zarokatiya xwe ve ez li Kobanê nemam, lê ez dixwazim ser axa xwe şehîd bikevim."* Ev mile Sefirê şehîd dikeve. Ew heval û hevalekî din li wê dere şehîd dikevin. Êdî li wê dere jî hêzên me ketin şer.

***-Dervayî Cebhed El Nusra û van komikên din, hêzên ku di nava van êrîşan de xwedî rist bûn, hebûn?***

Planeke berfireh hebû. Ne girêdayî Artêşa Azad yan ji Cebhet El Nusra bû. Ew plan çibû? Di cihên din de nikaribûn me. Ji ber ku, Kobanê jî hineke aliyê erdnigarî de mûsait e, da ku bikaribin dorê lê bigrin, ew der xistin armanca êrîşên xwe. Di dîroka şeran de jî ji bo ku cihekê bigirin her tim derdorê wê dere girtine, av, xwarin, cebîlxane li ser qut kirine, wisa ew der xistine. Li ser Kobanê jî plan hinekê navnetewîbû. Girêdayî Tirkiye bû, Sûriye jî di nav de bû. Heta ez dikarim bêjim planeke komplogerî bû. Ji bo ku viya ser bixin destpêkê her êrîş kirin.

Mesela li Rojava careke din êrîş kirin, êrîşên wan şikestin. Girê Elecaxê girtin, pişt re em çûn me gir girt. Çend gundên ku girtibûn, me careke din ji wan girt. Me xeta xwe çêkir. Me pêşiya wan girt. Gel bi rastî jî şer dikir. Yanî tenê yek xwedî ezmun jî cem wan heba, ji wan re gotiba 'wisa bikin' dikirin. Jixwe enîyek bû, lê tenê du heval sê hevalên xwedî ezmun hebûn, yan jî komek bû, tenê hevalekî hebû.

Heya demekî şer bi vî rengî meşiya. Ji vê pêvajoyê heta ku em beriya bikevin 2014'an de şereke girîng yê ku pir bandora xwe kir çêbû. Li wê demê mile Serêkaniyê şer bû. Milê Elok wan deran girtibûn. Heval rewşeke pir xeter de bûn. Eniya mile Rojhilat jî hinekê girêdayî Serêkaniyêye. Ji mile Til Ebyad wan deran ve alikarî ji wan re diçe. Me wê demê plan kir ku em êrîşê li ser wan bikin. Ji bo ku em ser eniyê wan êrîşan kêm bikin.

Ya rastî di vê pêvajoya şer de me ji xwe re hinek cebilxane girt. Ji ber ku me nedikari em li ti cihan cebilxane bînin, me cebilxana xwe bi şer digirt. Me wê demê doçqayek li mile rojhilat girt, du doçqa li mile Rojava girtin. Me gelek cebilxane ji mile Rojhilat girtin. Yani me cebilxaneya xwe li ser dijmin temîn kir.

Di mile rêxistinî de jî em ketin pevajoyeke nû. Me êdî zanî ku ev qûweta me têrê nake. Pêwist bû em hêzên xwe hinekî pispor bikin. Me akademiyek vekir. Yêk akademiyek hevalên jin hebû jixwe. Yêk jî ji bo ku em şervanên nû, pispor bikin me akademiyek şervanên nû vekir. Ji bo ku em gel rêxistin bikin, perverde bikin me xebatên xwe zêdekirin.

Pişti ku gundê Elok kete çembere tengaviyek çêbû. Êrîşî Rimêlanpaşa, Serekaniyê, mile Hesekê kirin. Milê Helebê jî şer hebû. Wê demê şerê mile Efrînê sekinîbû. Giraniya xwe dabûn ser Cizîrê, Kobanê, Heleb'ê. Me bîryar girt ku em çalakiyekê bikin ku milê Cizîrê êrîşan sivik bikin. Çalakiya Sûsikê heye, di dîroka şerê me de girîng e. Gundekî li ser sînorê Tirkan e. Dîroka vê çalakiyê jî 2013 16'ê meha 9'an e.

Di vê çalakiyê de me hemû gund kirin dest xwe. Di nava çend deqîqeyan de gund hemû ketin dest me. 45 kesî zêdetir tê de hebûn. Wan jî amadekarî dikirin ku êrîş bikin. Em piştê gund re zivirîn. Eniyê herî pêş de bû. Di wî şerî de cara yêkê me çekek giran ya bi navê hawan li ser wan girt. Doçqayeke 23 me li ser wan girt. Me 45 qilêş, BKC, B7 li ser wan girtin. Hejmareke zêde cenazeyên wan ketin deste me. Ez dikarim bêjim çalakiyek pir serkeftî bû. Serkeftinek mezin li gundê Sûsikê çêbû. Tenê hevalek şehîd ket. Ew jî mile Tirkan ve çêbû. Ji ber ku ew gund li ser sînorê Tirkan e wisa bû. Heval pir pisporî çûn çalakiyê. Vê çalakiyê di nava milet de bandoreke mezin kir, li ser dijmin jî psîkolojiyek giran da avakir. Heta wê deme em piranî di parastinê de bûn. Diyar bû ku dema em êrîş bikin, em dikarin pir tiştan bikin. Gund bi xwe aliyê cografîk ve cihekî kûr bû, parastina wê nayê kirin.

Ez dixwazim di vir de bêjim ku di şer de teqtîk pir girîng e. Hinek cih hene mirov digire berdide, hinek cih hene mirov digire bernade. Pêwîst e mirov guhartina teqtîk re vekirî be. Ew êdî girêdayî zekaya şer e. Di kuderê de mirov hişk bike, kuderê de mirov nerm bike, li gorî pêwistiyan mirov dike. Di girtina gund de teqtikê me baş bû, lê piştî şer me dikarî em hîn zêde teqtîk bimeşînin. Ew hevalên ku wê dere girtine, digotin "*me ewqas vê derê girtiye,*

*me şer kiriye em bernadin."* Hinek hestiyarî nêz bûn. Wek rêvebirî kêmasiyên me jî hebûn, me bi awayekî teqûz bîryara wê neda. Ji bo wê çalakiya Sûsik'ê di herêma Kobanê de jî bandora xwe cuda kir. Piştî wê demê hemû hevalan digot: *"Em êrîş bikin, em êrîş bikin!"* Pêşketina vê derûniyê jî bêgûman girîng bû. Piştî wê mile rojava jî pevçûn çêbûn, lê dijmin nikarîbû zêde pêş ve were. Ew xeta me girt, me careke din berneda.

Hetanî dawiya sala 2014'an şerê me bi Cebhet El Nusra re bû. Me sê merhele derbaskirin. Merheleya bi rejîmê re, merheleya Arteşa Azad re, merheleya ku em dikevin pevajoya Cebhet El Nusra. Cebhet El Nusra jî bi salan şer kiribûn, profesyoneltiyek hebû, lê belê bi rastî jî bi hêzên me nikarî bûn. Ya rastî pêvajoya Cebhet El Nusra re em neketin êrîşê. Me piranî cihên ku aidê me bûn parastin. Eger di wê pêvajoyê de em ketibana êrîşê, belkî jî me pir cih bi dest xistibana. Siyaseta me ew bû ku ciheke ku êrîş li ser me nebe, em tenê rewşa xwe biparêzin. Lê di qanûna şeran de ew tişt heye: eger mirov xwe biparêze, pêwîst e mirov derveyî cihê xwe, xwe biparêze. Mirov ne tenê di cihê xwe de be. Tecrubeyên me ji şerê bi Arteşa Azad, heta Cebhet El Nusra, rejimê girtî ew bûn. Ji ber ku me parastina xwe di herêma xwe de kir. Ew wek şaşîtiyek teqtîkî bû. Ez wisa digirim dest. Me digot em ne despot in, em ji bo gelan şer dikin. Lê belkî jî me wisa nekiriba me nedihişt ku gelek cih dewrê DAIŞ'ê werin kirin. Hemû xebatên me li ser esasê ku em gelên din qezenç bikin, sîstemeke demokratîk ava bikin bûn. Bêgûman viya ne şaş e. Em êrîşî li ser cihên din nekin, em mirovan îqna bikin, em netewên din bikin nava pergala xwe, em bikaribin wan jî rêxistin bikin. Her tim lêgerînên me di wê alî de bûn. Bi vî rengî em ketin pêvajoya 2014'an.

***Têkiliya Êrîşên Kobanê Bi Girêspî ve***

***-Şerê Kobanê yê destpêkê hûn çawa dinixînin? Di êrîşên ku li derdora Kobanê pêş diketin de, gelo tirsa azadkirina Grêspî hebû?***

**ROZA EFRÎN:** Jixwe êrîşan li aliyê Girêspî, roja ku em 19'ê Tirmehê pîroz bikin destpê kir. Dema pîrozbahiyan de me gel re got, "*weke şoreşa gelê Kurdistanê em 19'ê Tirmehê pîroz dikin, roja çirûska gelê Kurd e; lê divê em ji her alî ve amade bin, lewra dijminê me wê xwe li me ranegre. Divê em bikaribin bajarê xwe biparêzin û bibin bersiv."* Bi rastî jî roja dîtir li Girêspî şer teqiya. Êrîşî li ser Girêspî kirin.

Ew tişt kirin hincet; li wir rêxistina me ya veşartî hebû, gelê me li wir bû. Her wiha li gundan xebatên me dihatin meşandin. Lê kênge me li wir mala gel vekir ku em pêwistiyên gel bibersivînin û bi gelên din re têkilî deynin, êrîş çêbûn. Me dixwest ku em xwe bi wan bidin nas kirin û ew ji vîna gel ya 19'ê Tirmehê netirsin.

Ew xebat li Girêspî, li Minbic û li Cerablûsê dihatin meşandin. Ew her sê cih jî girêdayî Kobanê ne. Lê bi destê hêzên derva, ew qebûl nedikirin. Bi taybetî Tirkiye pir tevlîhevî derdixist. Ereb jî di dema berê de li cihê Kurdan bi cih kirine. Bi tirsa vê qebûl nedikirin. Dema ku me li wir mala gel vekir, bû sedema nîqaşan. Gotin ew bajarekî Ereban e, hûn dixwazin Girêspî jî ji me bistînin. Ew alozî heya radeyeke hatin çareserkirin. Lê belê em pê hesiyan ku xwe ranegirtina li hemberî deskeftiyên Kurd li Kobanê jî xwe ji me radikşînin. Di demeke wisa de êdî Kobanê ket nava şer. Cara yekemîn di 20'ê tirmehê de şer li Girêspî destpê kir.

Jixwe aliyê amadekariya YPG ve, hê nû bi nû perwerde û rêxistin dihatin pêş xistin. Di nava gel de jî propagandaya, bila her kes rahêje çekan û gund û bajarên xwe biparêze hate kirin. Divê di serî de meclîsan ew berpirsyarî bigirta ser xwe. Her çiqas ew xebat dihatin meşandin jî li gorî wê demê hêza me kêm bû. Destpêk bû, tenê du tabûrên profesyonel xwe rêxistin kiribûn, yên din jî gel bûn. Her kesî bi çeka xwe hêrema xwe diparast.

Dema ku roja ewil şer çêbû, komek heval weke mûdaxale çûn wir. Ji ber ku hem ji aliyê Reqayê ve, hem jî ji aliyê Girêspî ve êrîş kirin komek heval ket dorpêçê. Xwestin gundan ji komkujiyê re derbas bikin. Dema ku mûdaxale çêbû, li gel gundiyan komek ji sî hevalî pêk tê, di nava gund de kirin dorpêçê. Heya sibê gundî jî hatin xilas kirin û hinek heval jî hatin xilas kirin. Lê ji ber ku şer giran bû, du heval ji me qût bûn. Pişt re ji wan hevalan yek gihêşt me, lê hevalê bi navê Çekdar Efrîn winda bû. Pişt re gundiyan got şehîd ketiye û li nava kolanên bajêr gerandine. Lê me yekser zelal nekir. Hevalekî bi navê Mahmûd ku ji Kobanê bû, şehîd ket. Di ew şerê yekemîn de ew her du heval şehîd ketin.

Piştî wî hem ji aliyê gel ve, hem jî ji aliyê YPG ve mûdaxale hat kirin û ew êrîş hate şikenandin. Lê gundên Kurdan yên Girêspî hatin valakirin. Yên ku pir nehatine nas kirin, tê de man. Lê vî şerî heya salekê, 40 km li dûrî Kobanê berdewam kir. Derdora gundên Girêspî her berdewam kir. Ew der êdî weke sînor ma. Cih bi cih êrîş dikirin, ji bo ku xetê derbas bikin û gundan bigrin, lê nedikarîn. Lê êdî amadekarî hatin kirin. YPG tevdîrên xwe girtin, piştgirî hat. Ew yek tenê bi aliyê Girêspî ve sînordar nema. Ji aliyê Firatê ku weke xeta rojava tê pênasekirin û xeta Başûr ku ber bi Helebê ve diçe jî pêş ket. Van hêreman jî gelê Ereb heye û li sê eniyan jî şer destpê kir. Bi vî awayî tevdîrên YPG jî her ku çû xurtir bûn. Sengerên ku me dişkandin, me weke sînor diyar dikirin. Şer bi vî rengî 40 km li dervayî Kobanê berdewam dikir. Wisa şer heya cihekî jî hate sekinandin. Lê hundirê Kobanê aram bû.

Ez dixwazim hinek hevalên ku di wan şeran de şehîd ketine jî bi bîrbînim. Wan hevalan fedakariyên mezin nîşan dan û gihêştin şehadetê.

Rêheval Viyan hebû; dema ku di 19'ê Tirmehê de şer destpê kir got, "*serkêşiya şer ez ê bikim*." Ango fedakariyek wisa hebû. Jixwe mamostaya zimanê Kurdî bû û hevalên xwe re got, "*dibe ku ez mamoste bim, lê ez hemû karan re jî amade me. Ji bo jiyanê jî, ji bo şer jî ez ê gelê xwe re xizmet bikim."*

Piştî hevala Viyan hevalê Dilovan jî şehîd ket. Dijmin dîsa êrîş dike; nîvî hêzên me ji gel bûn, ne profesyonel bûn. Şervanên heyî jî baş perwerdeyek nedîtibûn. Di navbera qûwetê de bêdengiyek hebû. Ji ber vê heval Dilovan bi xwe dikeve nava şer û dixwaze 6-7 hevalên ku dora wî ne xilas bike. Ew jî birîndar dibe û digêhêje şehadetê.

Di wê pengavê de hevalên ku şehîd ketin, bandorek pir mezin li ser gel çêkir. Bû sedem ku her kes ji aliyê xwe ve tevlêbûneke xurt çêbike. Lewra hem hevalê Dilovan pir dihat hezkirin, hem jî sê hevalên ewilî di nava gel de dihatin nas kirin. Hêsta tolhildanê di nava gel de çêdibû. Digotin, *"çi dibe bila bibe, divê em nehêlin ku heval tenê bikevin nava şer. Divê em ji heft salî, heya heftî salî xwe tevlê bikin.*" Hem ji bo YPG, hem jî ji bo YPJ tevlêbûn pir xurt bû. Li ser esasê girêdana bîranîna heval Necbîr, Viyan û Dilovan bi dehan keç û xurt tevlê bûn.

Piraniya mamostayên ziman û şagirtan tevlêbûn. Digotin, "*hevala Viyan, bi ew hêrs û xwesteka xwe tevlê bû û şehîd ket. Divê em jî bi vî rengî tevlê bibin.*" Dibû hêza moralê û bandoreke mezin li ser xebatên ciwanan û xebatên din jî dikir. Heval Dilovan di heman demê de xelkê wir bû. Ji malbateke dihat naskirin bû. Hevalekî bi bîryar, bi dîsîplîn û bi israr bû, şûnve gav nediavêt. Şehadeta wî di dilê her hevalek de birînek kûr jî vekir. Her heval soza tolhildana van hevalan didan. Bi vî rengî tevlîbûna xebatên parastinê û xebatên din dibûn.

***-Êrîşên destpêkê yên li ser Kobanê bi kîjan mebestê çêbûn?* Di van êrîşan de rista Tirkiyeya ku her navê wê derbas dibe çiqas bû û armanca wan çibû?**

**MEHMUD BERXWEDAN:** Ne tene Tirkiye, gelek hêzên ku dijberî şoreşê hebûn. Lê belê Tirkiyê hîn wê demê di Tîrmeh-Tebaxê de ji Cerablûs heta nêzî Kobanê rê vekir. Wekî din di navbera sînorê Kobanê û Bakur de araziyeke mayinkirî ya dirêj heye. Ev nêzî 70-80 sal e mayin kirine û hem jî têla rêsayî heye. Tirkiyê çi kir, li beramberî gundên Aşmê, Kor Elî, Mizir Dawidiyê, Qeremox û bajarê Kobanê bi xwe rê vekir. Helbet em wê çaxê fikirîn ev çima rê vedikin. Amadekariya êrîşê çeteyan jî bo valakirina Kobanê hebû. Yanî hesab û planên li ser Kobanê ji 2013'an de çebûn.

Piştî gelek amadekarî û planan, di yekemîn salvegera şoreşê de, di 19-20'ê Tîrmeha 2013'ê de, çeteyên Cebhet el Nusra, Ahrar Şam û Artêşa Azad ji cebheya rojhilat ji milê Girêspî êrîşî Kobanê kirin. Ev êrîş ne tenê êrîşeke leşkerî bû. Girêspî ji sedî 30 zêdetir Kurd in. Esas di we derê de Kurd qirkirin û Kurd di wê derê de nehiştin dihate plan kirin. Plan ew bû ku wê derê ji binî ve vala bikin û ji wê derê dest pê bikin. Yanî ew plana qirkirina Kurdan bû. Wisa jî kirin, di Girêspî de Kurd şehîd kirin, yên mayî reviyan û malên Kurdan hemû teqandin. Di bajêr de destpêkê Mala Gel teqandin. Jixwe bi vê êrîşê re, êrîşa li ser Kobanê jî dest pê kir.

Piştî wê bi êrîşên wan re şer dîsa dest pê kir. Di rojên destpêkê de Hevalê Dilovan şehîd bû. Hevalê Dilovan yek ji rêveberiya Kobanê bû û bi rastî di nava pratîkê de pijiyabû, salên dirêj di nava têkoşînê de mabû. Bi xwe jî ji gundê Şêranê yê Kobanê bû. Hevalekî pratîkî û wêrek bû. Dema Heval dikevin dorpêçê, ji bo wan rizgar bike diçe û komek hevalên birîndar tîne. Piştre bi suîqastê şehîd dikeve. Bi vî awayî Kobanê wisa di salvegera şoreşê de kete nava şer.

Hêzên leşkerî yên Kobanê bi piranî li wir hatibûn rêxistinkirin, yanî herêmî bûn. 2 tabûr hevalê profesyonel çêbûn. Tabûrek hevalên xort û tabûrek jî hevalên jin. Esas Kobanê bi du tabûran û hindek hêzên herêmî kete şer. Lê bi rastî jî gelê Kobanê taybetmendiyeke wan a leşkerî heye. Kobanê piraniya xwe eşîr in û eşîr jî piraniya xwe çekdar in. Bi destpêkirina şoreşê re tevlîbûneke wan ya pir bi coş û xurt hebû. Heya wê demê êrîş li ser Kobanê çênebûbû. Ji ber ku eşîrên Ereban yên derdorê hesab ji Kobanê dikirin, nas dikirin û dizanîn eger tiştek bibe, Kobanê tola xwe li erdê nahêle. Lê Kobaniyan jî ji bo erda Ereban dîqat dikir. Digotin "*Heval em nêzî axa Ereban nebin.*" Yanî li wir di navbera gelan de hevsengiyek ji tecrûbeyên dîrokî çêbûbû, her kesî dîqat dikir û çi pirsgirêk hebûn bi dîplomasî çareser dikirin. Lê me dizanî ku serdem û mercên siyasî hatine guhertin û xeterî heye. Eger hêza Kobanê nekeve şer wê sibe, du sibe li hember êrîşên hîn mezintir bê amadekarî bimîne û wê tengasiyên mezin bikşîne. Ji ber ku heta wê demê li Kobanê şer nehatibû jiyan kirin ciwanên wir digotin "*Heval em biçin, li Kobanê şer tune ye, em bawer nakin li Kobanê şer derkeve, ji bo wê em dixwazin ji Kobanê derkevin.*" Me digot "*hûn ê bi ku de herin?*" Digotin "*li Serêkaniyê şer e, li Efrînê şer e, li Helebê şer heye, em herin wan deran*". Ji ber vê psîkolojiya rihet û aram di şerê destpêkê de zehmetî û tengaviyek hate jiyankirin.

Dema ku li Kobanê şer dest pê kir, tenê ne li wir lê bi awayekî giştî li Cizîre jî dest pê kir û li Serêkaniyê jî dest pê kir. Li Serêkaniyê heta wê çaxê şer sekinîbû. Taxa aliyê rojava di destê çeteyan de bû, sê çarîkên bajar jî di destê hevalan de bû. Jixwe dema ku şer dîsa dest pê kir, fersend çêbû, hevalan di şevekê de lêxist û hemû Serêkaniyê girtin. Jixwe ew hîn di Serêkaniyê de amade nebûn. Dema wan êrîşî Kobanê kirin hevalan jî di derbekê de li

Serêkaniyê êrîşî wan kirin û Serêkaniyê girtin. Yanî hem li Serêkaniyê û hem jî li Kobanê şer derket. Lewre jî êdî ji bo Kobanê teqwiye nedikarî were.

Ji hêla din ve çeteyan li ser Kobanê dorpêça aborî jî danîn. Heta ava Kobanê ji Şêxler dihat, elektrîk bendava Tişrîn dihat, hemû hate qutkirin. Ev ji bo Kobanê pêvajoyeke nû bû û esas şer di sala 2013'an de destpê kir. Lewre jî ji aliyê gel û ji aliyê rêxistinî ve êdî hemû tiştê me ber bi leşkerî ve çû. Ji doxtorê me de bigre yanî ji tendurustiya me heya her qadê wisa seferberiyek çêbû. Hema bêje her kesê ku dikarî, çek hilgirt û ji bo şer xwe amade kir. Ji hêla din ve, cebheyên Kobanê pir fireh in. Li her hêlê Kobanê amadekarî hatin kirin. Heta ji rêxistina leşkerî ya jinê YPJ cudatir, jinên bi temen jî li gundan yên ku ji dest hat li ser rêbendan nobedarî dikirin. Çi destê wan dihat dikirin heta yên ku nikaribûn jî digotin em ê xwarinê çêbikin. Destpêkê dema em hatin, li navenda YPG, me dît ku hemû dayîk in û xwarinê çêdikin.

Helbet di aliye cebheyên şer de hate fikirandin ku em xeteke şer çêbikin. Yanî ji şerê serasera û bê kontrol re tedbîr bê girtin. Rast e du tabûrên me rêxistinkirî bûn lê gelê ku derketiye cebheyan, komîteyên wan çêkirin û kordîne kirin pêwîst bû. Ji ber ku hinek ji wan rasterast çûbûn li Girêspî ketibûn şer. Di şerê du sê rojan de hemu rêveberiya Kobanê jî di vê nêrînê de bû ku xetek çêbibe. Di wê xetê de em bikaribin parastinê pêkbînin û li ser pîvanên gerîlatî bimeşînin. Ji bo wê ji xeta gundên Kendalê, Giresorê, Evdikê, Kopirlik heta diçe şîrketa Tirkî, xetek hate çêkirin. Cebheyek li aliyê Girêspî çêbû. Çeteyên Cebhet el Nusra u Ahrar Şam jî dixwestin hem li wê derê şer bikin hem jî dixwestin li me vegerin. Ji ber ku çiqas êrîş kirin bi ser neketin. Piştî wê 4 rojan li ser gundê Kendalê êrîşeke pir dijwar çêbû.

***-Cihên ku şer lê navendî bûn û qedera wî şerî diyar kirin kuder bûn?***

Bi rasti jî di Kendalê de berxwedaneke dîrokî çêbû. Esas çavê dijmin di wê derê de tirsiya û dijmin di wê derê de şikest. Hemû hevalên wê derê, di serî de hevala Viyan Amara di nav vê berxwedanê de bûn. Heval Viyan mamosteya ziman bû û esas ne di nava YPG'ê de bû. Weke me got, dema şer derket her kes di xebatên cuda de jî seferber bûn. Hevala Viyan bi sekna xwe ya di nava gel de û di nava xwendevanên xwe de heta niha bandora xwe hiştiye. Ew heval di destpêkê de li Kendalê şehîd bû. Dijmin êrîş kir û kete gundê Kendalê lê bi dehan cenazeyên wan li erdê man. Cara yekê me tanqên wan li wê derê girtin. Me li wê derê du sê doçqayên wan jî girtin. Çekên wan ên cuda hatin girtin. Cara destpêkê dijmin bi hemû hêza xwe êrîş kir û li wê derê şikest. Vê serkeftinê bi me re, bi gel re moraleke bilind çêkir. Kendalê bû sembolek. Lê hêla din hîn navbera Evdalê, Giresorê wan xetan bi dijmin re rû bi rû bûn. Her roj şer bû. Wan êrîş dikir û hevalan jî li ser wan bi tarzê gerîla çalakiyên dikirin. Lê şikestina Kendalê li ser wan bandoreke mezin çêkir. Di nava gelê Kobanê de jî guman û fikareke nepenî hebû ku "G*elo, YPG wê bikaribe me biparêze an na!"* Baweriya miletê Kobanê bi hevalan bêdawî ye, lê ev fikar jî hebûn. Dema Hevalan tanq ji dijmin stand û anîn bajêr bi gelê Kobanê re bawerî avakir, hêvî çêkir.

Foto-17

Piştî wê jî şer li vê herêmê cih bi cih dewam kir. Hem me êrîş dikir û hem jî wan êrîş dikir. Wan nekarîbû xeta me bişkênanda. Ketin nava lêgerînekê ku cebheyeke din vekin. Yanî wan fêm kir ku nikarin di cebheyekê de me bişkînin. Çiqas derdora me girtibin jî bes di cehbeyeke de bi me nikarîn. Di 4'ê Tebaxa 2013 de cebheya aliyê rojava li me vekirin. Li vê cebhê hîn Cebhet el Nusra nebû, Artêşa Azad hebû. DAIŞ jî hîn xuya nedikir lê di nava Artêşa Azad de bû. Dewleta Tirk ew bi ser me de diajotin.

Wê demê Hevalê Kendal hatibû Kobanê. Me Hevalê Kendal, da ser vê cebheya rojava. Ji ber ku hêza me ya profesyonel kêm bû û bi piranî li cebheya rojhilat bû, Hevalê Kendal zêdetir bi gundî û ciwanên qadê re amadekarî kirin. Me dixwest ku cebheyekî din li me venebe. Esas ne cebilxane û ne jî binesaziya me têra du cebheyan dikir û ne jî amadekariyên me radikirin. Wan di 4'ê Tebaxê de li cebheya rojava êrîşî girê Necaxê kirin. Li wir Gundê Qinê jî heye ku nîvî zêdetir Ereb in. Gundê Necaxê jî milê Bakur Kurd in derdorê gir Ereb û Kurd in. Çeteyan amadekariya xwe kiribûn û ji her milî de êrîş dikirin. Me xwest wî girî teqwiye bikin, ji ber ku stratejîk bû. Heta nîvê şevê hevalan şer kir û gir bernedan. Lê du ciwan şehîd ketin û fermandarê wê derê Hevalê Hogir jî birîndar bû, li wê derê şehîd nebû paşî şehîd bû. Ew jî wê çaxê, ne di nava YPG'ê de bû, di nava karê rêxistiniyê de bû.

Di encam de beşekî gir ket destê wan, beşek jî ma di destê me de. Me heta sibê di mesafeyeke 50-60 metroyê de şer kir. Ji ber ku derfet li wir zêde tune bûn, me ji hevalan re got paşve bikişin û me gir berda. Paşî li wê derê jî me xeteke parastinê çêkir û me xwest em pêşiya wan bigrin. Di gundê Necaxê, piştî Qinê, Serketê û Dadalê di xetekê de, me xeta parastinê çêkir. Ya din jî ji Necaxê xetek diçe heya avê, esas di nava çeteyan de ye. Gundê Degirman û Borîs me bernedan. Wisa weke xetekê di nava wan de ku her du alî jî çete ne, me berneda. Wan

dixwest wê xetê bişkînin û xeta Şêxler û wê xetê bigihînin hev. Di gundê Borîs de şerên mezin çêbûn. Ya din jî şerê herî xurt di Degirman de çêbû. Tevî hemû êrîşan jî Dibistana Degirman neket.

**Bênavber 17 rojan şer...**

Piştî 5-6 rojan me bi şev bi ser Girê Îdrîsa de girt û me girê girt. Me ji wê derê doçqayek rakir. Ev şer bênavber 17 rojan dirêj kir. Tevî hemû amadekarî û êrîşên wan, nikarîbûn xeta me bişkînin û me jî hem çalakî dikirin û hem jî parastina xwe dikir. Bi vî rengî di du cebheyan de şer çêbûn. Çeteyên Artêşa Azad pir wendahî dan û tengav bûn. Me jî dixwest di milekî de cebheyekî bisekinînin.

Mînak doçqaya me tenê 2 gule li ser mabûn. Wan hevdîtin xwest û di 25'ê Tebaxê de me li gel Artêşa Azad civînek li dar xist. Hema bêje hemû kesên wan yên fermandar tevlî bûn. Tenê DAIŞ nehatibû. Hinek rûspî jî tevlîbûbûn. Me got "*lazim e hûn vegerin cihên xwe yên berê*." Wan jî got "*divê hûn gundê Zor Mixarê berdin."*

***-Taybetmendiya gundê Zor Mixarê çi bû?***

Zor Mixarê, cihekî di xala sifir de ye. Sînorê Tirkiyê, Cerablûs û Zor Mixar hema bêje di ber hev de ne. Eger em berdin cihê herî stratejîk yê wî aliyê ava Firatê ji dest diçe. Ereb û Kurd li gund di nav hev de ne. Me got *"bila gelê gund xwe biparêz e, ne hun û ne jî em tê de bin."* Bêguman me gund bi rêxistin kiribû.

Ya din jî rêya xeta petrolê-rotko me girtibû, gotin "*berdin*." Me go "*pêwîste hûn jî berdin*." Bi vî rengî şer sekinî. Me ji bo ku bişopînin heyetek hevbeş çêkir. Ew, ji cihê ku hatine derketin û paş de çûn; girê Necaxê berdan. Ji gundê Borîs derketin. Me mijara rotko jî hiştibû dawî. Di ser re 15 roj derbas bûn. Piştî 15 roj derbas bûn, jixwe rewşa wan tune bû ku şer bikin. Wan xwe bêdeng kir, em jî ji rêya xeta petrolê derneketin. Me rêxistina xwe ya Zor Mixarê jî belav nekir. Ji bo me du xalên girîng hebûn, me di encamê de her du jî bi ser xistin.

Bi vî rengî şerê cebheya rojava sekinî. Lê şerê me yê cebheya rojhilat di wê salê de dewam kir. Ber bi dawiya salê ji Cotmehê bi şûn de rewşeke nû derket holê. Ew jî DAIŞ bû! Bi derketina DAIŞ'ê re hemû peyman tevlîhev bûn. Şerê me yê heta wê demê bi Artêşa Azad û Cebhet el Nusra re bû. Îcar DAIŞ derket.

**2-ÊRÎŞÊN 15'Ê ÎLONÊ YÊN DAIŞ'Ê**
**LÎ HEMBERÎ TARÎTÎYÊ ŞERÊ RÛMETÊ**

***-Piştî şerê El Nusra û komikên din, êrîşên DAIŞ'ê yên li ser Kobanê çêbûn û hêdî hêdî ew êrîş dijwar bûn. Ew pêvajoyê DAIŞ'ê li Rojava û Kobanê çawa destpê kir?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Di vê pêvajoyê de bi taybet piştî Îlonê 2013'an li herêma derdora Kobanê şer bi çeteyên DAIŞ re pêş ket. Berê jî DAIŞ xwe bi rêxistin dikir. Lê di vê pêvajoyê de yekser ket rewşeke aktîf. DAIŞ di tevahiya Sûriyê de xwe bi rêxistin kiribû. Lê bi taybetî di herêma Reqa û Kobanê de weke ku ew jî hêzeke ji muxalefeta Sûriyê ye, bi wî awayî xwe bi rêxistin dikir. Jixwe DAIŞ hem li Sûriyê û hem jî li Iraqê ji demeke ve xwe bi rêxistin dikir. Koka wan Selefî û Wahabî ne. Ji dervayî fikra xwe wekî din ti fikrên din qebûl nakin. Heta Sûniyan jî qebûl nakin. Lê destpêkê pir bi şêweyekî nerm xwe bi cih kirin. Destpêkê bi rejîmê re şer nekirin. Heta bi muxalefetê re jî şer nekirin. Pêvajoyeke xwe bi cihkirinê nirxandin. Mînak di bajarekî de cihê herî stratejîk ji xwe re digirtin.

Cihên ku di nava gel de hem ji aliyê aborî ve û hem jî ji aliyê civakî ve xwediyê girîngiyê ne, digirtin. Mesela firinek, aşek, fabrîqayek û bi taybet jî navendên petrolê li ku bû diçûn û digirtin. Ji bo milet nêzî xwe bikin û bi xwe ve girêbidin her tişt dikirin. Bi taybet qadên ku berê Artêşa Azad lê bû, xwe li wan deran bi cihkirin.

Pişt re, ji meha Îlonê 2013 şûn de li derdora Reqayê dest bi tasfiyeya muxalefetê kirin. Di muxalefetê de kîjan bi hêz e destpêkê ew kirin hedef. Piştî ku yên herî bi hêz hatin tasfiye kirin yên biçûk jixwe tirsiyan û ji ber xwe de teslîm bûn. Hovitiyeke pir mezin bi kar anîn. Destpêkê serjêkirin û dardekirina mirovan, şerê hov yê psîkolojîk dane pêş. Xofek xistin dilê Artêşa Azad û ketîbeyên wê yên cuda.

Pişt re ji Reqa rejîm derxistin û bajar êxistin destê xwe. Destpêkê jî Ahrar Şam, Cebhet el Nusra û Suwar Reqa jê derxistin. Di navbera wan de şerên dijwar derket. Paşî Girêspî ji destê Ahrar Şam derxistin. Heya sersala 2014 jî Minbic û Cerablûs girtin. Di zivistana 2014 de Sirîn jî girtin. Bi girtina vê derê bi temamî derdora Kobanê girtin. Artêşa Azad li wan deran nema.

***-Artêşa Azad çi jê hat?***

Ew jî hinek tevlê DAIŞ'ê bûn, gelek ji wan çekên xwe firotin û reviyan çûn Tirkiyê. Bi vî rengî karekterê dijminê me hate guhertin.

Piştî vê demê DAIŞ'ê li pêşiya xwe stratejiyek danî. Hinek hêza xwe ji Helebê û derdora Efrînê kişandin û bi temamî ber bi Kobanê ve anîn. Di meha Sibata 2014'an de êrîşî bajarokê Sirîne kirin û girtin. Piştî Sirîn girtin êdî tek hedefeke wan hebû ku Kobanê bixin. Sirînê hema di sînorê Kobanê de ye. Em wê demê tê de tune bûn. Hin grûbên lawaz yên Artêşa Azad tê de bûn. Berxwedaneke xurt jî nekirin. Li milê ava Firat Şêxler heye, ew jî girtin. Li wê derê, li ser Erebên muxalefetê qetlîam kirin û ji eşîreke wan bi dehan mirov serjê kirin. Jixwe gelek eşîrên ku nexwestin bi DAIŞ'ê re tevger bikin, Erebên wê derê yên Cewadirî reviyan hatin Kobanê.

Ji hêla din ve ji cihê ku me girtibû, êrîşê Sûskê kirin. Di êrîşa wan ya Sûskê de şerêkî dijwar qewimî û nêzî 15 Hevalên me şehîd bûn. Di encamê de me hevalan xwe ji Sûsikê qedemekê dane paş. Em bi vî awayî di Sibat û Adara 2014'an de li gundewarên Kobanê êdî bi DAIŞ'ê re ketin temasê. Êdî me dizanî ku dijminekî me yê weke DAIŞ heye û divê em li gorî wê xwe amade bikin.

Di vê demê de pêşketineke din çêbû û piştî ku Cizîrê û Efrînê xwe weke 'Kanton' îlan kirin, Kobanê jî fermî kanton û rêveberiya xwe ragihand. Dîsa me xwest bi Erebên ku ji DAIŞ'ê reviyan re hevgirtinekê çêbikin û li ser vê bingehê hindek xebat hatin meşandin. Ev di aliyê siyasî de gavên nû bûn. Di aliyê leşkerî de jî di destpêka meha Adara 2014'an de DAIŞ êrîşên giran anîn ser baregehên me. Yanî piştî ku Sirînê girtin xwestin sawamaya Sirînê jî bigrin. Hêzên me tê de bûn. Sawamaya Sirînê di cihekî pir stratejîk de ye. Hem li ser Sirînê, hem jî li ser gundên Kurdan hakîmiyeta xwe heye. Niha li Rojava li araziya rast sawama pir bilind in, ji ber wê weke qale ne.

DAIŞ ji bo ku vir bigre, hêza xwe ya Çeçenî anîbû. Yanî wan dizanî ku YPG'ê ne weke Artêşa Azad e ku ji despêkê de bişkîne û zû bi zû pêş de were. Tevî ku li ser me dorpêç hebû, derfetên me jî gelekî sînordar bûn, em ketin pêvajoyeke nû ya xeternak de. Ev jî êrîşên berfireh û bi bandor yên çeteyên DAIŞ bûn.

Di sawama Sirînê de şerekî ji sibê heta êvarê hate kirin. Nikarîbûn ji me bistanda. Helbet êrişê wan bi şev û roj nesekinîn. Ev yek hefteyekê dirêj kir û berxwedaneke dîrokî çêbû. Hevalên me yên hêja, bi lehengî destan nivîsandin. Di serî de jî Hevalê Derdo û Hevalê Ehmed… Ehmed Hevalekî ji gundê Dêrîkê ji Kasanê bû. Ciwanekî 17-18 salî bû. Coş û heyecaneke mezin pê re hebû. Hema bêje di cihê xwe de nedisekinî. Destpêkê hate Efrînê, piştre zîvirî Dêrîkê. Bihîst bû ku li Kobanê şer heye, bi tena serê xwe ji Dêrikê xwe li sînoran û nav mayînan dabû û derbasî Kobanê bûbû, navê xwe jî kiribû Semedar. Bi vî rengî tevlê şerê sawama bû. Dema ku tanqa dijmin nêzîk bû Semedar got *"ez ê wê tanqê bînim Kobanê."* Bi rastî jî bi bombeya xwe derket ser tanqê û bombe xist nava tanqê! Li wê derê birîndar bû û di paş de kişandinê de li wê derê şehîd bû.

Hevalên din hemû bi wî rengî bûn ku qet nefikirîn gavekê jî paş de biavêjin. Qet jî ji şer û psîkolojiya DAIŞ'ê netirsiyan û bi rojan li ber xwe dan. Bi roj û şev di nav şerekî giran de bûn. Piştî 7-8 rojan bi vî awayî êdî çeteyan bi hêza xwe ya Çeçenî û di her mili de êrîşeke hîn berfireh û dijwartir dest pe kirin. Esas me ew sawama ji bo genim û derfetên wê parast, ji berê de ne di destê me de bû. Depoyên genim yên Kobanê jî vala bibûn. Ji ber ku demeke dirêj şer berdewam bû, tenê genim di wê derê de mabû. Lewre jî me hem şer kir û me hem jî genimê wir kişande Kobanê. Têra Kobanê ya 3-4 mehan me anî. Piştî wê me bîryar da ku qademekê xwe paş de bidin. Bi vî awayî sawamaya Sirînê kete destê DAIŞ'ê lê me xeteke din ya parastinê çêkir.

**Kendalê bûbû keleha berxwedanê...**

Çend roj şûn de, yanî piştî Newroza 2014'an vê carê jî li milê rojhilatê Kobanê êrîşê gundê Kendalê kirin. Jixwe me behs kiribû, berê bi çeteyên Cebhet el Nusra û Ahrar el Şam re şerên dîrokî li Kendalê çêbûbûn. Vê carê jî çeteyên DAIŞ êrîş dikirin. Dîsa li Kendalê berxwedaneke dîrokî çêbû. Kendalê bûbû keleha berxwedanê. Nikarîbûn Kendalê bigirtana. Heta êvarê bi dehan cenazeyên wan ketin destê me de. Me ew di Kendalê de şikandin. Lê di Kendalê de gelek şehîdê me jî çêbûn. Ji wan hin hevalên me yên rêveberiyê bûn.

Yek ji wan Hevalê Hebûn bû. Heval Hebûn ji Amedê bû. Berpirsiyarê cebheya me ya rojhilat bû. Heval Hebûn demeke dirêj e ku hatibû nav şoreşê. Bi taybet di cihê herî krîtîk de erk digirt. Mînak li Minbicê erk girt. Li Minbicê Kurd û Ereb bi hev re dijîn. Eger Heval Hebûn li wir hevsengiyeke bi hostatî çênekiriba, wê çeteyan li ser Kurdan komkujî çêbikira. Jixwe tê zanîn ji ber ku parastina wan tune bû Kurdên Til Eran û Til Hasil di komkujiyan re derbas bûn. Di serî de bi keda Heval Hebûn Kurdên Minbicê ji rewşeke bi vî awayî rizgar bûn. Heval pişt re hate Kobanê û tevlê YPG'ê bû. Di nav hemû hevalan de dihate hez kirin, bi şervanan re jî bi hevalên fermandariyê re jî yekbûneke wî çêbûbû. Mîna Hevalên din lehengî û berxwedaneke mezin nîşan da.

Foto-18

Kendalê weke sembola me lê hatibû. Çawa ku tê gotin '*berxwedana Kobanê'* esas Kendalê jî prototîpa Kobanê ye. Yanî Kobanêya biçûk Kendalê bû. Niha tu herî her xaniyekî ku bi darbeyên guleyan neperîtiye tune ye. Hevalê Hebûn jî sembola Kendalê ye, hişt ku Kendalê nekeve. Hevalê Hebûn dema çû û şer koordîne kir şehîd bû. Me nehişt Kendalê bikeve lê berdêla wê lehengên weke Hevalê Hebûn in. Ji wan hevalan yek jî Hevalê Siyabend bû ku ji Başur bû û hîn beriya şoreşê hatibû Kobanê. Di xebatên YPG de cihê xwe girt. Pêwîst e ez vê bêjim yê di êrîşa destpêkê de ku êrîşa dijmin şikandî, Heval Siyabend bû. Ji bo wê jî Kendalê jê re bibû cihê serbilindiyê. Piştre hate perwerdeyê û li wê derê got *"ez ê herim Kendalê"* û dîsa zivirî. Hem Hevalan jê hez dikir hem jî ew bi wê derê ve hatibû girêdan. Sembola Hevaltî û netewebûnê bû Hevalê Siyabend. Rihê berxwedana Kobanê bû. Hevalê Siyabend jî di mewziya pêş de şehîd ket.

Foto-19

Hinek Hevalên din jî li wê derê gihîştin asta şehadetê. Lê hezeke girîng ya dijmin jî li wê derê derbe xwar. Bi dehan cenazê çeteyan li wê derê man. Me bi dehan çek ji ser wan rakirin. Esas cara yekê ji ser DAIŞ'ê, me li wê derê çek rakirin. Esas DAIŞ li wê derê veciniqî û çavên wê şikestin. Fêm kir ku YPG'ê ne hêzeke wisa wek yê din e.

Berxwedaneke din jî li girê Sêvê çêbû. Ev gir hem li ser sawama Sirînê, hem li ser pira Qereqozaxê û hem jî li ser gundên derdorê hakim bû. DAIŞ'ê tim dixwest vî girî bigre û 4'ê Gulana 2014'an êrîş kir. Ev gir ji hêla gundê Berxbotanê ve dihata parastin. Gundekî welatparêz ku her tim bi têkoşîna azadiya re bû û şehîdê xwe hebûn. Di komkujiya Kobanê de jî bi dehan şehîdê gund çêbûn. Li gund Hevalê Xabûr hebû, bi xwe mîlîs bû, Hevalekî gelekî fedakar bû. Di êrîşa çeteyan de şehîd ket. Dîsa Hevala Hêlîn mayîn datanîn. Dema bihîst ku êrîş heye hat tevlê şer bû û şehîd ket. Hevaleke jin li gel wê hebû, Hevala Zîlan ew jî li wê derê şehîd bû. Ji ber ku çend Heval li wê derê şehîd ketin gir kete destê çeteyan. Ev ji bo hêzên me û ji bo milet jî nebaş bû. Ji bo Kobanê jî ne baş bû.

Foto-20

Ji ber ku girê Sêvê ji Kobanê re weke piştekê bû, çekên xwe yên giran xistibûnê. Wan di 4'ê mehê de ew der girtin, 5'ê mehê jî bi şev me bi ser gir de girt û me berbangê gir ji wan stand. Sê doçqayên bi cureyên 12,5 û 14,5 û 23 û çend cenazeyên wan kete destê me û me gir ji wan girt. Li wê derê 2 heval şehîd bûn. Yek ji wan hevala Rûken bû. Bi rastî dema 4'ê mehê gir ket, Hevala Rûken digot aniha em herin bigrin. Nedikarî daqurtîne ku ew gir di destê çeteyan de bimîne. Roja din ne li wê derê bû, lê çawa bihîst hat û tevlê çalakiyê bû. Di çalakiyê de bi rastî jî bi roleke mezin rabû. Dema ku baskê wan çû bi rihekî mezin yê êrîşê çûn û ketine gir. Bi rastî xwediyê cewhereke pir mezin bû, wêrek bû, bi YPG'ê ve girêdayî bû.

Foto-21

Dîsa li kêleka wê Hevalê Rizgar hebû, pisporê mayinan bû. Ew jî weke Hevala Hêlîn bû. Wî jî hem li milê rojhilat hem li milê başur bi çalakiyên xwe yên sabotajê ve dijmin felc kiribû. Ev her du Heval di wê çalakiyê de şehîd ketin. Ev çalakiya girê Sêvê ya serkeftî ji bo me moraleke mezin bû. Ji me zêdetir ji bo gelê Kobanê… Gelê Kobanê dîtin ku çeteyên DAIŞ'ê jî êrîş bikin wê di heman rojê de bersiva xwe bigrin. Vê bi xwe re bawerî û moraleke mezin afirand.

Foto-22

DAIŞ fêm kir ku bi êrîşê wisa bi cebheyekî û du cebheyan re nikare Kobanê tengav bike yan jî bigire. Di êrîşên ku ji Sibatê dest pê kir de heta Gulanê, ev yek fêm kir. Helbet şerê li Cizîrê jî dewam kir. DAIŞ hinekî xwest bi vê li hinek cihên din moral wergire. Ya din jî armanca wan ku Reqeyê ji binî de safî bikin. Êrîşî balefîrgeha Tabqê ya nêzî Reqa kirin û girtin. Ya din jî DAIŞ di şerê ku bi me re kiriye de fêm kir ku ji aliyê teknîk ve kêm e, ji aliyê çekan ve hîn pêwîstiya wan pê heye. Di van êrîşên xwe yên Reqayê de gelek tanq û çekên giran bi dest xistin. Şaşitiya me ya li wê derê çi bû? Divê ew tabûra wir me girtiba. Yanî ya bi navê 'Lîwa 93'an di sînorê Kobanê de bû, nêzî 15-20 km jê dûr bû. Di navbera me de DAIŞ hebû, lê eger me hinekê xwe bida ber, dibe ku me girtiba. Ji ber ku gelek tanq tê de hebûn û rejîm li wê derê riziyabû. Hêzeke wê ya berxwedanê tune bû. Ji ber ku ew jî du salên wan zêdetir di çemberê de bûn. DAIŞ li wan xist û ew der girt. Di heman demê de li Dêrezorê û Iraqê jî bi taybet Mûsil, gelek der girtin û çekên giran bi dest xistin.

Piştî van pêşdeçûn û hêzbûna DAIŞ'ê, di 1'ê Tîrmeha 2014'an de pêleke êrîşan ya pir xurt bi ser Kobanê de anî. Ev ji Zormixarê dest pê kir. Di nava daristanê re bi awayekî veşartî hatibûn û ketibûn nava hevalan. Di wir de

12 Heval şehîd bûn. Şer dijwar bû û heta 4’ê Tîrmehê jî DAIŞ nikarîbû 100 metro jî pêş de bihata. Vê carê erîşên xwe hîn berfirehtir kirin. Ne li Zormixarê, li wir zivirî hat Bayadê girt. Gundê Bayadê li pişta Zormixarê dikeve. Helbet wexta ew li piştê zivirîn û hatin ketin Bayadê, hêzeke me ya zêde tê de tune bû. Hêza me ya esasî li Zormixarê di şer de bû. Dema Bayadê ket pişta quwetê, hemû ket. Me ji ber vê sedemê gundên Bayadê, Zormixarê û Ziyaretê berdan û xetekî nû yê parastinê çêkir. Çeteyan vê carê jî, 7-8’ê Tîrmehê li aliyê rojhilat êrîşê gundê Evdikê kirin. Li Evdikê êrîşeke pir dijwar çêbû.

Ez bawer im di şerê me yê heta wê çaxê de êrîş û berxwedanan herî dijwar li gundê Evdikê çêbûn. Bi dehan çete hatin kuştin. Hevalan gund berneda. Gund jî bi giştî bîst mal hebûn ya tune bûn. Li wir hinek heval şehîd ketin. Yek ji wan Hevalê Botan bû. Jê re digotin ‘Botanê reş.’ Botanê Reş Hevalekî ji Kobanê bû. Li wê derê tevlî bibû. Di destpêka YPG’ê de tevlî bibû, di nava şer de pijiyabû. Hevalan digotin *“ev Heval dişibe Hevalên Goyî”*, di çûna ser dijmin de pir dijwar, bi lez û bi misogerî hîna dijmin ji xewê ranebibû encam distand. Hevaleki wisa di şer de serkeftî bû û li hemû cebheyên dijwar cihê xwe digirt.

Foto-23

Dîsa Hevalê Erdal şehîd ket, ji Efrînê bû. Gelek Hevalên din yên ku li gundê Evdikê şehîd ketin, bi rastî jî di Kobanê de ev Heval dîrok in. Ev şehadet ji bo me giran bûn. Dijmin jî hemû teknîka xwe, çekên xwe yên zirxî, hemû îmkanên xwe xistin dewrê ji bo ku wî gundî bigire. Ji ber ku dema ew gund girtin pê re Kendalê jî Giresorê jî diket. Ji neçarî me berda. Êdî çûnûhatina me ya Kendalê zehmet bû. Ji bo wê jî dijmin derfet dît ku mesele di vê navberê re heza xwe ya ku dişikest biguherîne. Lê yê me heman heval bûn û zêde diwestiyan.

Piştî Evdikê, me xeteke nû ya parastinê çêkir. Dijmin ev dît û xwest pêşde were, gundê Kopirlikê wan bigire. Lê Hevalan berxwedaneke mezin nîşan dan, tanq îmha kirin. Tanq heta vê dawî jî li wê derê bû. Bi kurtasî di Evdikê de rihekî wisa yê mezin derket.

Li milê din, yanî cebheya rojava jî hevalan çalakî dikirin. Mesele çalakiya li ser gundê Cidêydiyê heye, li ser gundê Cibil Ferac heye. Hevalan ew gund ji çeteyan paqij kirin û dîsa zivirîn. Çalakiyên wisa xurt hatin kirin. Ew di pêşengiya Hevalê Serxwebûn de bûn. Hevalê Serxwebûn Hevalekî ji Riha-Sirûcê bû. Ew jî di pêvajoya şer de hatibû tevlî Kobanê bibû. Di tv’yê de dîmenên wî derdikevin, stranan dibêje. Esas di şerê Kobanê de komek wisa fedaî hebû. Hemû bi hev re bûn, pişta xwe didan hev, dema ku diçûn, cihekî ku nexistana tune bû. Bi rihekî bilind yê bi binxistina dijmin û bi wêrekiyeke mezin diçûn şer. Di zanebûna pêvajoya şerê Kobanê de bûn. Yanî wan Hevalan şerê dema pêş yê Kobanê di dilê xwe de hîs dikirin. Ji bo wê bê fikar xwe tevlî dikirin.

**-Êrîşên ku li çar aliyên Kobanê çêdibin û berxwedaniya wê derê, li dervayî Kobanê çawa hatin bersivandin?**

Helbet ev êrîşên çeteyan yên ku çêbûyî berfireh bûn. Ev bû sedem ku di raya giştî û di nav miletê Kobanê de eleqeyek mezin çêbe. Bi taybetî jî gelê me yê Bakurê Kurdistanê xwedî derketinek û hişyariyeke mezin ji bo Kobanê pêk anî. Bi hezaran mirov hatin ser sînorê Kobanê; çi li aliyê Sirûcê yanî li aliyê Qeremox ya rojhilatê Kobanê û çi jî li ser sînorê rojavayê Kobanê, di xeta Aşmê de… Bi sedan ciwanên me li wê derê bi rojan konê xwe vedan. Bi rastî jî moraleke mezin bû û me ji dil de hîs kir ku bi rastî jî gelê me li pişta me ye. Li her derê mirov bi me re ne. Ne tenê ev jî, bi sedan ciwan xwe li têlan qelibandin û hatin Kobanê. Bi taybet di xeta Aşmê de di şevekê de 200 – 300 kes hatin û bi piranî jî man. Dewreyên perwerdeyê vebûbûn, tevlî wan dewrayan bûn. Hem di aliyê manewî de û hem jî ev cara destpêkê bû ku hejmareke evqas zêde ji Bakur tevlî YPG dibe. Seferberiyeke giştî çêbibû. Ev li milê Qeremox jî çêbû, milet xwe li têlan da. Miletê sivîl gelek hat, bi rojan li Kobanê man.

Niha DAIŞ ev ferq kir ku ji aliyê milet ve destekek mezin ji bo me heye. Careke din êrîşê milê rojava kirin. Nêzî 10 km dan ber xwe. Ji xeta sînor heta Cebel Ferecê hemû ew xet da ber xwe. Bi taybet du xet esas girtin; xeta Çarqilî, tepê Zagrosê û gundê Cibnê ew xet hemû. Jixwe piştî Bayadê me ew xet girtibû. Baskê wan yê ku êrîş kirî yê yekemîn esasî li ser tepê Çarqilî bû. Li Çarqilî di serî de hevalê me yê Hogir tê de bû. Me berê li ser Hevalê Hogir gotibû. Berê di xebata me ya giştî de bû û di tepê Necaxê de birîndar bû. Dema ku êrîşa li ser Kobanê pêş ket ji bo parastina Kobanê di mewziyên herî pêş de cihê xwe girt. Weke şervanekî YPG nêzî xwe bû û di mewziyan de fermandarî kir. Hevalê Hogir di wî girî de berxwedaneke mezin raber kir. Berxwedaneke dîrokî kir. Jixwe li wî girî şehîd bû. Niha navê wî girî ‘Şehîd Hogir’ e. Jixwe di pişta gir re hatibûn.

Foto-24

Hevalê Agirê Ereb çû, cihê ku heval tê de bûn girt. Got *“min gir girt, bila Heval werin.”* Jixwe miletê Bakur kordîne dikir. Hevalên din jî pê re çûn û di wî girî de, me ew di wê derê de şikênandin. Baskê duyemîn yê çeteyan di Cibnê de şikest. Dema girê şehîd Hogir cardin hevalan girt, derfetên cardin çete bi pêş de werin nema. Ketin merhaleya revê. Hevalan êrîş kirin, gundê Cibnê jî ji wan girtin. Lê li wê derê Hevalê Hogir şehîd bû. Çend Hevalên

me jî li girê Zagros şehîd ketin. Yek ji wan hevalan jî Hevalê Awaz bû. Hevalê Awaz jî ji Kobanê bû, li Kobanê tevlî bûbû. Bi rastî jî di demeke kurt de xwe gihandibû asta fermandariyê. Berpirpirsiyarê wê derê bû. Hevalê Awaz mînaka hevaltiya rast bû. Dîsa bi girêdana xwe ya Kobanê, xaka Kobanê mînak bû. Cesûr û şerker bû. Dixwest li pişt dijmin bizivire. Li wê derê şehîd bû. Helbet li wê derê hinek Hevalên din jî pê re şehîd bûn. Ew der ket destê dijmin. Helbet me li her derê şikênandin. Ew der ma. Hevalan êrîş kirin ji bo bigrin.

Hevalê Firat jî li wê derê şehîd bû. Heval Firat hevalekî ji saziya Ciwanên Kobanê bû. Rihekê mezin yê ciwantiyê pê re hebû. Piştî şerê cebheya rojava bîryar dabû, gotibû *“ez dixwazim di YPG’ê de şer bikim.”* Demekê şervanên nû perwerde kiribû. Bi rastî bi tena serê xwe perwerde dida. Wê demê kesek tune bû. Bi wî rengî asta disîplîna cewherî û leşkerî dida şervanan. Ji bo wê yekê dewreyên perwerde yên Hevalê Firat dida cuda bûn. Demeke dirêj perwerde da û piştre israr kir û got *“ez dixwazim werim cebheyê şer, di şer de bimînim.”* Erka fermandariya girtibû. Dema Hevalê Awaz çû ew jî bi wan re çû. Ji bo Hevalê birîndar bîne. Ew jî li wî gundî şehîd bû. Lê êrîşeke mezin ya dijmin şikest.

Foto-25

Ev şer hemû di Tîrmeha 2014’ê de ne. Armanca dijmin ew bû ku wê xetê bigire. Dijmin hinekê li wê derê sekinî, xwest di milê başûr de derbe li me bixe. Li milê başûr li girê Kun Aftarê me cihok çêkiribûn ku xwe biparêzin û me ser jî beton kiribûn. Yanî cihokên wisa weke qelan. Me wisa qenalên gilover û sergirtî çêkiribûn. Hevalan di pencereyan de şer dikirin. Girekî stratejîk bû û di ser Ava Firatê re bû. Çeteyan destpêka şevê êrîş kirin. Bi vî rengî heta sibê dirêj kir. Sibê êrîş kirin, hatin ketin gir. Heval hemû di mewziyên sergirtî de ne. Nêzî 20 Hevalan hebû. Me çiqas ji derve bi hawanan û bi çekên giran li wan xist û parastina Hevalan kir jî lê hatin ketinê. Heval di binê qenalan de bûn, ew jî hatin ketin ser qenalan. Yanî ji derve de hemû pencere li ser hevalan girtin. Bi torbeyan wisa hemû girtin. Lê li derî digeriyan, peyda nedikirin.

**Panzêra Gelê Kobanê!**

FOTO-26: YPG’NİN İMALATI PANZER FOTOĞRAFI KULLANILACAK

Me lê nerî ku êdî teqez pêwîste em êrîş bikin, ji derve êrîş bikin û gir bigrin. Hevalê Kendal fermandarê wê cebheyê bû û kordîne dikir. Em ketin êrîşê. Helbet me wê çaxê jixwe re panzêrek çêkiribû.

**-Ew panzêra ku hûn qalê dikin, di nava wan şert û mercên giran yên şer de kê çêkir?**

Miletê me yê Kobanî çêkiribûn. Me heta wê çaxê bi kar neanîbû. Ji pola hatibû çêkirin û nû xelas bûbû. Me got hema bila heval bi panzêrê herin bikevin gir û êrîş bikin. Heval li panzêrê siwar bûn, çûn ketin gir û êrîş kirin. Hinek heval jî wisa çûn û ketin gir de. Bi rihê hevaltiyê êdî Kobanê weke kulmekê lê hatibû. Di gir de heval di panzêrê de ne, fîşekê derbas nabe, tiştek bi wan nayê. Çete jî li erdê ne, hevalan di pencereyên panzêrê re li wan xist. Ketin panîkê û reviyan. Panzêrê jî da pey şopa wan. Hevalan gir girt û hevalên di hundir de rizgar kirin. Paşî girekî din jî hebû. Ew der jî girtibûn. Me got bila panzêr here wê derê jî. Panzêr zivirî û çû wê derê jî, li wan xist. Çete ji wê derê jî reviyan. Hevalan ew gir jî girtin.

Li wê derê Hevalê Mihemed şehîd bû. Heval, milîs bû. Mala wan nêzî wê derê bû. Tim ew girên Kun Aftarê wek yê xwe didît. 24 seatan di wî girî de bû. Dema bihîst Heval di gir de asê mane wisa çeka xwe girt û çû gir. Jixwe di rê de şehîd bû. Navê wî girê Kun Aftarê me ‘Şehîd Mihemed’ daniye. Gelek çek û cebilxaneya çeteyan li wê derê ket destê me. Ya din jî me operasyon dewam kirin. Em nesekinîn. Li jêra girê Kun Aftarê gundek hebû heval bi panzêrê ketin wî gundî jî. Hinek heval germ bûn, heta Ava Firatê çûn, reviyan û şikestin. Ev êrîşên meha Tîrmehê rastiyek bi dijmin da fêm kirin; Yanî Kobanê wisa ne hêsan e. Ji bo wê jî dijmin stratejiyeke nû danî. Planeke hîn berfireh, teknîk û hêzeke hîn zêde û pêşketî. Ji hêla din jî bi timî Kobanê nerehet kirin, êrîş kirin.

Piştî Tîrmehê, çeteyên DAIŞ’ê li qadên din her pêş de diçûn. Mûsil berê dagir kiribûn û têra artêşekê çek û dewlemendî bi dest xistibûn. Di Tebaxê de ketin Şengalê û gelek deverên din girtin. Li Iraqê cebheyekî din vekirin. Heta Mexmûr û Hewlêrê çûn. Li Sûriyê jî çeteyên DAIŞ ji sedî 60’ê arazî girtin. Di encamê de çeteyên DAIŞ bûne serxweşên serkeftinê. Bi taybet piştî dagirkirina Mûsil û komkujiya Şengalê bala hemû cîhanê çû ser DAIŞ’ê. DAIŞ’ê li pêşiya xwe planek danîbû. Esas dewleta Tirk serkêşê vê planê bû...

**-Çibû ew plan û çima Kobanê hatibû hilbijartin?**

Ji ber ku ji Rojava û kantonan pir aciz bû û Kobanê weke xeleka herî lawaz didît, Kobanê hilbijartibûn. Jixwe sê milên wê DAIŞ û milekî wê Tirkiyê bû. DAIŞ jî gelek derên stratejîk girtibûn, lê tenê Kobanê mabû. Dixwestin bi Kobanê re êdî dewleta Xîlafetê îlan bikin. Bi vî rengî Tirkiyê û DAIŞ di mijara dagirkirina Kobanê de li hev kirin. Jixwe dewletên weke Siûdî û Qeter jî li pişta wan bûn. Hindek derdorên Kurd yên noker jî di vê planê de hebûn.

Van hêzan hevbendiyeke hov çêkiribûn. Armanc li gor rêzê Kobanê, Efrîn û herî dawî Cizîrê tasfiye kirin û hilweşandina Şoreşa Rojava bû. Ji ber wê, êrîşên hîn berfireh amade dikirin. Yanî ji meha Tebaxê de diyar dibû ku planekê amade dikin.

Me jî bi vê yekê re xwest yekgirtineke nû çêbikin. Ji beriya êrîşa Îlonê me xwest yekgirtineke nû çêbikin. Bi taybet li ser bingehê xeta me ya ji bo Sûriyeke demokratîk, Sûriyeke hevbeş li hemû Sûriyê em esasekî danin. Destpêkê me hêza leşkerî bi navê 'Volqana Firat' ava kir. Volqana Firat li hemberî DAIŞ hevgirtineke nû bû. Bi hindek hêzên Ereb re û bi hindek ketîbeyên Artêşa Azad re hevgirtinek bû. Di danezana îlana Volkana Firat de azadkirina Şêxler, Sirîn û Kobanê hemûyan hebû. Hemû hêzên ku li Kobanê li ber xwe didin yên Ereb weke hêzeke 'Odeyeke Çalakiyan' bi hev re dane tevgerkirin pêwîst bû. Ew jî di 10-15'ê Îlonê de hate avakirin. Esas dema me li hemberî DAIŞ'ê ev cebhe ava kir, dinya hemû hêdî hêdî kete ferqa xetere û rîska DAIŞ'ê. Piştî wê hêza koalîsyonê ku niha Emerîka serkêşiya wê dike li dijî DAIŞ'ê hate çêkirin. Bi vî rengî êrîşên 15'ê Îlonê yên çeteyên DAIŞ'ê li ser Kobanê dest pê kir. Niha cîhan hemû jî piştî 15'ê Îlonê Kobanê nas dikin. Yanî weke ku me piştî 15'ê Îlonê bi DAIŞ'ê re şer meşandiye. Esas ev ne pir rasteqînî ye. Beriya wê jî gelek lehengên mezin di berxwedana mezin de şer kirin û şehîd bûn. Helbet êrîşên 15'ê Îlonê cuda ye, ne weke yên din e.

***-Lê ferq û cudahiya êrîşên 15'ê îlonê çi bûn?***

Êrîşa 15'ê Îlonê 2014 ya li ser Kobanê, topyekûn e. Esas çeteyên DAIŞ'ê li gelek deverên Sûriyê jî heta yên Iraqê jî êrîşên xwe bi piranî rawestandin. Hemû hêza xwe ya heyî anî Kobanê. Vêcarê ji ber ku berê jî tecrûbeyên wan hebûn ku ew bi baskekî, du baskan, sê baskan yan jî di milekî ve êrîş bikin, nikarin encamê bigrin. Yanî hêzeke me ya dikare pir lez xwe komî ser hev bike heye. Cih bi cih derbe bixwe jî lê dikare xwe zû komî ser hev bike. Zû dikare motîvasyon çêbike. Ji bo wê, vê carê êrîşeke giştî û hêza me li kuderê hebe, ji hemû milan ve êrîş pêş xistin. Ya din jî pir bi lez û bi plan êrîş pêş xistin û encam girtin. Yanî bi teqtîka lêzbûnê, bi teqtîka pir zû tevgerkirinê û hem jî bi hejmar û teknîkeke zêde mewziyên me yên destpêkê zû şikandin. Armanca wan ew bû ku me hîn xwe komî ser hev nekirî wisa me ji hev belav bikin. Ya girîng jî desteka gel bibirin, Kobanê vala bikin û me bi tenê bihêlin. Min beriya vê jî gotibû. Jixwe Tirkiyê ji bo milet, riyên revê berê amade kiribûn.

Niha ji aliyê me ve jî em di destpêkê de pir li benda êrîşeke wisa nebûn. Yanî di vê berfirehiyê de û bi vê hejmar û teknîkê çeteyên DAIŞ'ê wê di her milî de ji bo navenda Kobanê bigrin, texmîn nedihate kirin. Ji bo wê hinek amadekariyên me yên diyar jî hatibûn kirin. Jixwe şeva 14 û 15'ê Îlonê li hemû herêmên me bi rengekî giran dest bi avêtina hewanan kirin. Berê, li cihekî tenê êrîş dikirin û yên din bê deng bûn. Me jî dikarî herêmên ku li ser êrîş tune ne sivik bikin û cihê êrîş li ser heyî teqwiye bikin. Vêcarê beriya dest pê bikin dema hewan avêtin her derê, me fêm kir ku êdî ev êrîş ne weke yên berê ye. Ji bo wê, cebheyên ku em pê re gihîştin me bi hevalan re civîn çêkirin. Me got êrîşeke berfireh heye bila her kes tedbîrên xwe bigire û bi şev li her derê kemin werin avêtin. Li gel kemînan, hevalan çûn gelek mayinên din jî danîn. Li milê rojava û başûr hevalan agahî dan gotin "*vaye êrîşên wan dest pê kirin.*" Li wê derê beriya bigihêjin nêzîk, Hevalan li wan xistin. Li Zormixarê 3 erebeyên wan, bi mayinan îmhabûn. Di her milî de Hevalan di kemînan de li wan xist. Di gundê Tehlikê de şer dest pê kir. Di heman demê de li milê din Hevalê Kendal wan jî dest pê kir. Bi kurtayî li her dera ku Heval lê hebûn şer dest pê kir.

Di gundê Tehlikê de şev û rojekê şer çêbû, hevalan gund bernedan. Heval Êrîş û Zozan wan bi xwe di gundan de bûn. Berxwedaneke dîrokî li wê derê hate meşandin. Bi hostatî û tecrûbeyên Heval Êrîş û Zozan û bi rih û moralekî bilind hevalan nehiştin ku gund bikeve destê çeteyan. Li wî gundî 48 seatan şerekî di nava hev de çêbû, bi dehan çete hatin kuştin. Piştre heta roja din ber êvarê Hevalê Êrîş got, *"hindekî em zehmetî dikişînin."* Ji ber ku çeteyan hêza xwe ya ku dixwesti di deqê de dikişandin û ya nû dixistin şûna wan. Wekî din bi teknîka xwe bi panzêrên xwe diketin nav hevalan û li pişt hevalan dizivirîn. Çekên me yên li dijî panzêran jî zêde tune bûn. Di heman şevê de gundê Aşmê girtin. Hin qadên ku hevalan tê de şer kirin ne girtin lê hinekê lê zivirîn. Hêzeke me ku em hemû qadan bi şiklekî zincirî bigrin, hejmareke ma ya ku em hemû deran bigrin tune bû. Çeteyan hinekê li pişt zivirîn û hinek milên başûr girtin. Me jî di xeta me ya parastinê de li cihên sabît gelek qela çêkiribûn. Lê dijmin vê carê xwe li qaleyan neda û li pişta wan zivirî. Li aliyê başûr û rojhilat şerên dijwar çêbûn û dijmin hindekî pêş de hat.

Armanca wan ew bû ku di 2 rojan de Kobanê bigrin. Hejmar û teknîkeke pir mezin ya li gor vê anîbûn. Lê di çend rojên destpêkê de hîna xetên pêş derbas nekiribûn. Gelê Kobanê jî alîkariyek mezin dida hevalan. Lê bi êrîşên dijwar yên çeteyan re êdî birîndar û şehîdên me çêbûn. Dixwestin hêza me psîkolojîk bixin.

Dema çete ketin qadê êdî milet dest bi koçê kir. Jixwe gel jiyana bi DAIŞ'ê re qebûl nedikir. Niha me jî xwest vê bikin. Yanî me dît ku armanca wan stratejîk e û Kobanê xistin e. Em jî êdî li gorî wê nêz bûn. Weke berê gundek parastin û ew gund qet bernedan, ji vê zêdetir em karibin xeteke parastinê ku em karibin dijmin tê de bisekinîn çêbikin. Dîsa hêza me ya heyî biparêzin ku bi hêsanî şehîd nekevin. Ya din jî me got em her gundî amade bikin.

Jixwe di bajêr de Hevalan dest bi mewziyan kirin. Gel jî şer dikir lê dema çete pêş ve hatin, yên ku li gel me şer dikirin jî gotin, “*em malbata xwe bigihînin ewlehiyê heval, em ê dîsa bizîvirin şer.”*

**Em ê li hemû cihan bi ser bikevin…**

Piştî 4-5 rojan me dît ku êrîş stratejîk in, li milê rojava û başûr me xeteke nû çêkir. Xeta Îza'yê, Kaşê dolê û heta tê Berkel û Kaşê Qişlê. Li xeta rojhilat jî 16'ê Îlonê bû; dijmin êrîşê gundê Serzorî kir ku di xetên destpêkê de ye. Heval di gund de şer dikin û piştre dikevin dibistana gund, di wê derê de şer dikin. Dijmin nikare têkeve dibistanê lê derdora wê digre. Esas derfet hebû ku ew heval derkevin lê wan qebûl nekir. Esas rih û xeta me ya ku em li ser bimeşin hevalên li Serzorî diyar kir. Wan got, “*em paş de nakişin û em ê li vê derê dijmin bişkînin û dijmin encax di ser cenazeyê me re here.”* Di serî de Hevalê Rodî, Hevala Peyman û gelek hevalan heta dawî di wê mektebê de şer kirin. Heval bi cîhazê bi wan re diaxifîn ji bo moralê bidin wan, lê wan moral dida hevalan. Digotin “*rast e, belkî em li vir wenda bikin, lê em ê hemû cihan bi ser bikevin.”* Yanî hêviya xwe ya serkeftinê qet wenda nekirin. Di dîrokê de tiştê wisa çênebûye. Bi coş çûyîna mirinê; bi berxwedan, vîn û xwestek çûyîna mirinê… Tu car dev ji vê xakê bernedan û dirûşma “*li vê xakê em hatine dinê û em ê li ser vê xakê jî bimirin.”* Bi rastî jî berxwedana li Serzorî xeta Kobanê, yanî xeta me ya berxwedanê diyar kir. Ya yekê “*dijminê bi hêsanî nekeve xaka me, eger ketê jî em ê biperçiqînin”*, yanî rihekî wisa derket holê.

Heval li Serzorî bi vê heybet û bilindahiyê çûne şehadetê. Helbet vê bandoreke mezin çêkir. Ya din, sekna Hevalan di serî de Zozan, Êrîş û hevalên li gel wan, diyarîker bû. Ji roja destpêkê de bêyî ku bêjin ‘*wele ez westiyam’* bi rihekî bilind şer kirin. Mînak gundê Tehlikê ket jî, lê hîn ji Degirmen, Borîs û wan gundan heval derneketin, dijmin nikarîbû pêş de were. Hevalê Êrîş digot; “*Eger em gundekî berdin jî divê em dijmin tê de bifelişînin, divê çi malên me yên ku dijmin tê de nemire nebin. Mezrayeke ku dijmin were bi rehetî bikevê divê tunebe. Belkî dijmin were gundekî bigire lê em ê tê de dijmin bikujin. Dijminê rehet neyê nekeve gundên me.”* Gund berdan lê di araziyê de belav bûn û bi vî rengî qademe bi qademe paş de kişiyan, lêxistin û tasfiye kirin, esas ev nêrîna Hevalê Êrîş bû.

Foto-27

Helwesta Hevalê Kendal jî wisa bû. Esas ya Hevalê Kendal hîn radîqal bû. Digot; *“Em ê malekê berdin, malekê bigrin.”* Bi rastî jî Hevalê Kendal mal bi mal şer kir. Yanî qet wisa gundekî ku dijmin rehet hatî û ketiyê tune bû. Wisa bi rêkûpêk, moral dida Hevalan, ji hevalan agahiya wî hebû. Li kuderê cebilxane xelas dibû digihandê, li kuderê pêwîstî pê hebe li wê derê bû, li kuderê teqwiye pêwîst bû digihandê, eger nikaribe teqwiye rêbike jî cihê wan diguherî. Helbet hemû heval jî bi vî rengî bûn.

Heval Emîn jî di cebheyê başûr de, di wê nêrînê de bû ku em bi rastî jî dijmin di xetekê de bişkînin. Dîsa Hevalê Cûdî û Hevalê Dilgeş hebûn. Cihê ku her du heval lê bûn, timî rihekî berxwedanê tê de hebû. Bi taybet piştî berxwedana Serzorî bandoreke xurt li ser Hevalên li milê rojhilat çêbû.

Esas ev Heval şehîd ketin lê perspektîf dane me. Xet diyar kirin û peyam dan ku em xwedî li wê derkevin, li gorî wê tevbigerin. Hevalê Cûdî digot, “*divê em teqez tola Serzorî hilînin*”. Jixwe di çalakiyên piştî wê çêbûn de, bi awayekî pir zêde û bi bandor ji ser dijmin çek hatin rakirin. Dijmin li hin cihan derbe xwarin. Lê wisa arazî pir berfireh bû. Piştî ku me cebheya yekê berda, cebhe fireh bû. Helbet li her derê, li rojhilat jî li cihên din jî em ketin hewldanê ku em karibin kombûnekê çêkin ku em xetekê de bin û karibin parastina hev bikin. Nehêlin ku dijmin li pişt bizîvire.

Piştî vê hin cihên me ketin destê dijmin û îcar pêwîst bû ku em derbasî merhaleyeke nû bibin. Yanî ne tenê em parastin bikin, çalakî bikin, lê xin û pêş de herin. Ji bo em karibin cihên me berdane bi tarzê gerîla bikevinê. Me ev piçekê dereng xist. Divê me li wê derê tarzê gerîla hîn zûtir û xurtir pêk anîba. Me dest pê kir. Lê piçekê bi derengî ket. Di şer de dem girîng û jiyanî ye. Tu gavekê niha bavêjî yan jî piştî rojekê bavêjî, ferq û bandora wê zêde ye. Tevî vê derengbûnê jî me grûbên destpêkê yên gerîla amade kirin û me şand aliyê pişta dijmin. Destpêkê grûbên biçûk bûn. Lê bandora xwe li ser dijmin kir. Yanî dijmin berê bi erebeyên xwe serbest dihat. Piştî ku grûb çûn û hemû rê xistin mayin êdî erebeyê wan dihat û mayin pê de diteqiya. Dîsa hevalan çalakî kirin, li wê derê û li vê derê xistin, bandora xwe çêbû.

**Divê Ev Dijmin Kobanê Nebîne**

Mirov beriya bigihê bajarê Kobanê, li ser ‘Kaşê Dolê’ Kobanê xuya dike. Weke din li tu deran bajar xuya nake. Dema em derketin ser vê derê Hevalê Êrîş got; “*Heval, ji vê derê Kobanê xuya dike. Divê tu caran dijmin Kobanê*

*nebîne. Pêwîst e em tu carî vê derê bernedin, eger em berdin dijmin ê Kobanê bibîne. Divê em bi vî dijminî Kobanê nedin dîtin."* Pişt re ji hevalan re civîn li dar xist û got; *"Heval em ê ji vê derê gavekê paş de neavêjin. Dijmin encax pêlî cenazeyên me bike û ji vê derê derbas be. Yê ku mewziya xwe berde ew xayîn e. Ji ber ku li vê derê Kobanê xuya dike. Divê dijmin tu carê Kobanê nebîne."* Li gorî min ev manîfestoya Kobanê bû! Yek Serzorî, yek jî Hevalê Êrîş û Hevala Zozan manîfesto bûn. Helwest û dîrok bûn.

Yên ku di nava şer de lawaz derketin jî hebûn. Yên weke Kawa Sûrûç, weke Amed Gûzo ku li wê derê îxanet kirin hebûn ku ez naxwazim navê wan li kêleka hevalên leheng bi bîr bînim. Xeteke xiyanetê ji xwe re diyar kirin. Lê helwesta lehengên Serzorî jî ya Heval Rodî wan jî diyar bû. Yanî bi rengekî zelal derket holê ku divê em çawa bikin.

Êrîşa çeteyan li ser Kaşê Dolê bi şêweyekî dijwar û bi tanqan çêbû. Êrîş heta sibê dewam kir. Bi rastî jî Hevalê Êrîş soza lehengiyê anî cih! Tanqan pêlî cenazeyê wî û hevalên li wir kir û wisa derbas bun. Wî jî û Hevala Zozan jî, ji roja destpêkê ve yanî ji berxwedanên Boraz, Degirman, Tehlikê, Kaşê Qoçlî, Dadalî û Şemê ve lehengiyeke dîrokî meşandin, gav bi gav hatin hate Kaşê Dolê. Li Kaşê Dolê jî tu car qebûl nekirin ku dijmin li pêş çavên wan wê derê bigire ku Kobanê bibîne. Mînaka girêdana bi xakê, girêdana bi Kobanê, helwesta şoreşgerî ya mezin Hevalê Êrîş, di destanên Serzorî û Kaşê Dolê de bi hevalên xwe re nîşan da. Ev her du destan cewherê berxwedana Kobanê ne. Hemû Heval pê bandor bûn. Kaşê Dolê ket destê dijmin lê ew xet me berneda. Paşî Hevalê Sefqan di Îzaa de birîndar bû. Hevalê Rojhat li wê derê şehîd bû. Hevalê Rojhat hevalekî ji Geverê bû, sekvan bû. Temsîla rihê hevaltiyê bû. Hevalê Çekdar jî li wê dere şehîd bû. Hevalê Çekdar ciwan bû, bavê wî jî çend caran birîndar bû. Apê wî şehîd ketibû. Ji malbateke wisa bi hemû hêza xwe di nav têkoşînê de bûn. Hevalê Çekdar bi temenê xwe yên ciwan mînaka Kobanê bernedan, li Kobanê mayîn û helwesta li hember çeteyên DAIŞ'ê nîşan da.

Foto-28

Dîsa Hevalê Delîlê Sor ew jî bi Hevalê Rojhat re şehîd bû. Ew jî di destpêka YPG'ê de li gel Hevalê Botan û Hevalên din bû. Hevalê Botanê Sor şehîd bû. cara destpêkê çalakiya fedaî kir ev heval bû. Hevalekî ji Kobanê bû. Qebûl nekir, digot *"çete wê çawa werin van gundan bigrin."* Birîndar bû û çû xwe di nava çeteyan de teqand. Dîsa Hevalê Baran Serhed hebû. Ew ji di rêveberiya cebhê de, li gel Hevalê Êrîş bû. Hîn beriya Hevalê Êrîş li Kaşê Meydanan wî destberdana wê derê qebûl nekir. Bombeya xwe bi xwe de teqand. Bi berxwedan û destanên bi vî rengî dijmin heta mehekê zêdetir nekarî têkeve bajêr. Êrîşên dijmin li ser hev çêdibûn. Ev yek di hêza me de jî westandin çêkir. Heta ku dijmin hate nêzî bajêr, ji ber ku gund hemû ketin dest dijmin û piraniya milet derbasî Bakurê Kurdistanê bû.

Foto-29

***-Li Kobanê şer li gel DAIŞ'ê roj bi roj mezin dibe û li her cihekî Kobanê belav dibe. Şerê bi DAIŞ'ê re yê 2014'an çawa destpê kir? Bi taybetî li gundên derdora Kobanê rewşa we û DAIŞ'ê çibû?***

**MERYEM KOBANÊ:** Di wan deman de êdî DAIŞ'ê hemû derdorên Kobanê xistin bin serweriya xwe û hêdî bi hêdî berên êrîşên xwe didan Kobanê. Heta meha 3'yan li hemberî van şerekî me çêbû. Em jî çûn û me Sewama Sirîn'ê girt. Di vir de ez dixwazim girîngiya viya bînim ziman. Genimê Kobanê xelas bibû. Têra 5 rojan mabû. Em neçar bûn ku ji bo vê yekê şerekî bikin. Eger em vî genimî bi dest nexin, rewşa me dê xerap biba. Me ji gel re jî nedigot. Me hemû hêza xwe kom kir û me êrîşî wê dere kir û sawama girt.

Di wir de me 13 heval şehîd dan. Ji ber ku em mecbûr bûn milet têr bikin, pêwîstiyên milet pêk bînin. Nexwe dê gel koçber bibe. Van êrîşên mezin li ser wir kirin. Berxwedayineke dîrokî hat meşandin. Sawama jî di navbera sînorê Kobanê û Ereban de bû. Vê berxwedayinê destpêka meha sibatê destpê kir, heta meha Adar'ê domiya. 19'ê Adar'ê me bîryar girt ku em berdin. Ji bo berdana wî; Şehît Emin hebû, digot "em bernadin."

Tanq anîn û xistin nava sewamê. Hevalek hebû navê wî Ehmed bû, navî wî yê kod Derdor bû, ji Derik'ê bû. Di wir de bi hevalan re axaft û got "*ez ê we tanqê bînim Kobanê.*" Bi rastî jî çû ser sere wê tanqê û bombe xist nava tanqê. Ji bo ku em hevalan ji wê sewamê derxin, me pir berxwedayin da. Lê hevalan digotin, "em bernadin."

Foto-30
Foto-31

Hevalên ku di berxwedayinê de şehîd ketin; Hevalê Erdal hebû, ji Riha'yê bû, hevala Derya hebû, bi xwe sekavan bû. Digot, "*ez nahêlim kes bikeve wê Sawamê.*" Hevalê Rohat jî li wê dere şehîd ket. Yanî rihê

berxwedayinê pir mezin bû. Ciwanek hebû, navê wî Sozdar bû. Hevalekî xort bû. Digot, “*çi dibe bila bibe ez vê dere bernadim.”* Heval Rohat wisa, hevalê Canfeda wisa bû. Hevalê Berxwedan hebû. Van hevalan di asta herî jor de fedakarî kirin.

Piştî demeke me dît ku dê xeterî çêbibe. Ji ber ku em ketibûn çemberê. Me bîryar da ku em sewama berdin. Pişta Sewama girek heye. Jêre dibêjin Gire Şehît Xabûr. Me êdî xeta xwe çêkir. Cara yêkê bû li hemberî DAIŞ’ê berxwedayinek wisa tê kirin. Wan bixwe jî hemû hêzên xwe anîn. Me bîryar da ku em xeteke nû çêbikin. Em werin cihê xwe yê berê. Em xeteke xurt çêbikin. Tabî li vê dere di DAIŞ’ê de dîtinek çêbû. Dîtin ku em ne wek hêzên din in. Em li hemberê wan berxwedayineke dimeşînin.

**DAIŞ’ê Cerablûs di nava seateke de girt, lê nikarî gundekî Kobanê jî bigre**

Ew der ji me girtin. Pişt re çûn êrîşî gundê Kendal’ê kirin. Eniyê rojhilatê êrîşî gundê Kendal’ê kirin û ji me girtin. Fermandarên wir Heval Siyabend û Heval Hebûn bûn. Piştî seatekê me gund careke din girt. Hatin Tebaşa girtin. Ew jî gundek kêleka wî ye. Heval Botan, Heval Dilgeş û hemû hevalên din ve me careke din ew gund ji wan girt. Me hejmareke mezin DAIŞ’î kuştin. Nêzî 20-30 cenaze ketin deste me. Cara yêkê bû ku me ew qas DAIŞ’î dikuştin. Plankiribûn ku werin, derdorê me bizivirin wisa me bin bixin.

Di dîroka şerê DAIŞ’ê de cara yêkê DAIŞ bin diket. Li kudere şer kiribe ser diket. Vê carê li gundê Kendalê DAIŞ ji cihê wê hatibû derxistin. Viya baweriyek pir mezin di gel de çêkir. Hevalên pir hêja li wir şehîd ketin. Hevalê Siyabend, hevalekî ji Rojhilat bû. Ew heval fermandarê wî eniyê bû. Hevalê Hebûn Amed hebû. Fermandarê eniye rojhilatê bû. Heval Hebûn pirî caran digot; *“vana ne hêzên normal in, pêwîst e em wan baş nas bikin.”* Yani bizanebûn nêz dibû.

Me didît ku teqtîkê wan, êrîşên wan ne wek hêzên din in. Yanî wan jî peyama xwe girtin ku ev der ne wek cihên din e, ne wek Minbic, Cerablûs, Dêra Zorê’ye. Cerablûs di nava seetekê de girtin, lê gundeke wekî Kendal’ê nikarîn bigirin. Kendal’ê 50-60 mal tê de hebû. Di wexta şer de me vala kiribû. Tenê heval tê de hebûn. Wê demê 7 heval şehîd ketin. Yêk ji wan heval Siyabend bû, yêk hevalê Sadîq bû, yêk hevalê Welat bû, hevalê Erdal Efrin û Cûdî Efrin bû. Pir heval birîndar bûn. Lê pir bi moral bûn.

Gundek hebû, li sînor bû. Jê re digotin Cirin. Me 20 cenazên wan anîn wî gundî. Hijmareke mezin çek me anîn. Viya di gel de jî di hevalan de jî baweriyek çêkir. Heta ku gundê Kendal’ê hat girtin di gel de tirsek hebû. Carna diçûn Reqa’yê, DAIŞ’ê digot *“em ê Kobanê bigirin!”* ev propaganda jî ev ditirsand.

Piştî şikandina gundê Kendalê, ev mêzandin jî şikest. Bêgûman di wir de sekna hevalê Siyabend, heval Hebûn, sekna heval Welat pir girîng bû. Welat bi xwe ciwanekî Kurd bû, lê di nava Ereban de mezin bibû. Mala wan li Eyn İsa bû. Di êrîşan de mala wan, her tiştên wan xerab dikin. Wisa koç dikin tên Kobanê. Her tim xeyalê wî ku biçe mala xwe û warê xwe bibine hebû.

Hevalên jin jî di wê derê de pêşengtiyeke girîng kirin. Di wî şerî de gelek mînakên şer yên hevalên jin hene ku mirov bibêje. Mesela li cihekî ji ber heriyê pêlavên xwe danîbûn û ketibûn êrîşî. Ev sekna hevalên jin bi sere xwe destanek e. Ev bi sere xwe rihek e, hêviyeke dide avakirin. Ew rihê ku heyî, eşqa jiyana azad, bawerî, hêstên welatparêziyê mirov dikare bi pir tiştan bi binav bike.

**Gundê Kendal’ê Destanek e**

Dema ku dibihîzin fermandarên wan şehîd ketiye, her kes ji aliyê xwe ve dikeve êrîşê. Hevalên xort dibihîzin ku hevalên jin nîvî gund girtine. Hevalê Botanê Reş û heval Dilgeş hebûn, Şehît Cûdî jî dema dibîhîze rixmê ku seetekê ji gund dûre jî xwe di nava 20 deqîqeyan de digihîne gundê Kendalê. Şehît Emîn jî xwe digihijine gund. Şehît Dilgêş digot; *“dema ku dengê stranên hevalên jin têne min, ez dizanim ku dîlana azadiyê digirim.”*

Ew sekna hevalên jin di nava hevalan de ewek da avakirin, ji bo ku mirov xwe biparêze pêwîst e mirov her tiştî bike. Piştî ku heval hatin linge hemûyan de perçeyên caman hebûn. Xwîn bibûn, birîndar bibûn. Gundê Kendal’ê ji bo me destanek e. Piştî wê wan jî pir tecrube girtibûn. Ev cih me ji wan girtibûn. Lê wan vê carê êrîşî Qulbê kirin. Êrîşî Gire Sêwê kirin. Ew jî ser sewamaya Sirînê’ye. Di tepe de 12 heval şehîd ketin. 6 ji wan jî hevalên jin bûn. Heval Hêlîn bû, Heval Zelal bû û gelek hevalên din bûn. Hevalê Xabûr û birayên xwe li wî girî şehîd ketin. Piştî ku van ev gir ji me girt, piştî ku heval li wir şehîd dikevin; heval Hêlîn heye, ji Amed’ê ye, bi xwe ne li tepe ye, lê dema dibîne êrîş li ser tepe çêdibe, diçe ser tepe.

Ev heval di mayinan de pîspor bû, cihê ku mayîn datanî ew mayîn vala nediçû. Diçe mayînan datîne biniya gir, pişt re diçe dikeve êrîşê û li wir şehîd dikeve. Şehît Xabûr wan şehîd dikevin. 11 heval di wî tepeyî de şehîd dikevin. Gundekî welatparêz bû, 20 şehîdên xwe hebûn. Herî dawî di qetlîamê de 35 kesan jiyana xwe dest dabû. Berxbotanê ser gund re bû. Dema li Berxbotanê xwestin êrîşî Gire Sêvê bikin, xwestin vîna me bişkînin. Di Kendalê

de, eniya rojhilatê de serneketin, xwestin di vir de îrade bişkînin. Ji xwe gundek hebû, navê wê Bogazê bû. Nêzî Kobanê bû. Digotin, "*em ê nimêja înê li wir bikin.*"

Foto-32

Psîkolojiyeke cuda dixwestin bidin ava kirin. Me jî bîryar girt ku heta êvarî ev tepe di deste wan de nemine. Bi rastî di wî tepeyî de hemû hevalên me pêşniyar dikirin ku bikevin eniye pêş. Me êvarî êrîşi gir kir, roja din kete destê me. Me 15 cenazeyên wan rakirin. Doçqayek 23, doçqayek 14 nîv, cebilxaneya wan ket destê. Me tenê yek ji wan nekuşt. Hevalan digot "*me zanebûn ew nekuşt, ji bo ku bizanibin ka em kî ne.*"

Di vir de şikestina wan ya duyemîn çêbû. Li ser Kobanê planên cuda çêkirin. Ew cebilxaneya me li ser wan girtî ji bo me girîng bû. Li giştî cihanê jî hat dîtin ku ev der wisa hêsanî ji destê me dernakeve. Di vê navberê de êrîşên wan li çend cihan çêbûn. Her dem êrîşên wan hatin şikestin, tu cih ji me negirtin. Me êrîşên wan bi sînor kirin. Heta ku piştî Gire Sêvê, êrîşên wan ser riya dualî çêbûn, ew êrîşên wan jî şikestin. Çend cihên ku êrîş kirin ev êrîş hemû hatin şkandin. Nikarîbûn tê de gav biavêjin. Piştî vê dijmin jî kete nava tevgereke nû.

Di vê demê de ew heza Arteşa Azad ku hatibû cem me, rêxistinkirina wan hate çêkirin. Ev jî xaleke girîng e. Êdî me plansaziya xwe çêdikir ku em bikevin êrîşê. Dikete meha 5'an, di wê demê de êrîşî ciheke din kirin. Ew der Kun Eftar bû. Kun Eftar cihekî tepe ye, me di tepe de mewziyên bin erdî çêkirine. Van hatin êrîş kirin û gund girtin, 4-5 sivil hebûn, bi xwe re birin çûn. Tepe jî girtin. Heval ketin mewziyan. 23 heval bûn.

Me di hemû tepeyan de mewziyên binerd ku deriyê wan veşartîbûn çêkiribûn. Me tepeye Sêvê ku piştre navê vê bû gire Şehît Xabûr, jî wisa çêkir. Di vê êrîşê de 7 seat û nîvan, heval di bin erdê de man. Careke din ew rihê berxwedanê derdikeve pêş. Van nikarin cihekî ji me bigirin. Eger bigirin jî em ê dîsa ji wan bigirin. Hatin ketin tepê. Vê carê me êrîşî tepe kir. Hevalên me jî di bin gir de bûn. Van digotin, *em ê teqez vê carê vî girî bigirin.* Ji ber ku ji wan re pir girîng bû. Ya rastî di hemleyên pêşî de dixwestin vî girî bigirin ji ber ku xetekê çêbikin eniye rojava û qulbê ji hevdû qut bikin. Wisa perçebûyîne bixin navberê.

Di vî tepê de hevalan şer kirin, pişt re xwe xistin qanalê. Çete çiqasî qenalê digerin jî qenalê nabînin. Her kî tê tepe em dordorê tepe bi çekên giran lê didin dikujin. Heta seet 5-6'an di wî girî de pevçûn hebû. Herî dawî xwestin mayin bînin ew mewziyên ku heval tê de biteqînin. Di tepe de kunên biçûk hebûn. Me çêkiribûn ji bo ku em şer tê de bikin. Benzîn anîn xwestin ku birijînin hundir û di hundir de bişewîtin.

Di wan pevçûnan de gotinên hevalan yên pir girîng hebûn. Heval bi cihazê axafin gotin; "*Em çi bikin, yanî dê çawa bibe, bang dikin dibêjin teslim bibin, dixwazin me bişewitînin!*" Hevalan ji wan re got; "*Ew ê tu caran nikaribin, hûn bes sebir bikin em ê kesinlikle bigirin.*" Dema hevalan ji wan re wisa got, hevalan da ber tililiyan. Şehît Kendal hebû, fermandarê wê êniyê bû. Hevalê Kendal got: "*Heval ka cihazên xwe vekin û guhdar bikin; ez soz didim we, bes nehêlin kes bikeve hundir de, ez ê vê dere ji wan re bikim cehennem!*" Rastî jî hêstên pir cuda ne...

Min dît carekê Heval Masîro jî ji eniye rojhilatê telefon kir, Şehît Dilgêş hevalên din gotin "*vaye em tên.*" Heval dibihîzin wexta em di cihazê bi hevalan re diaxivin. Dizanin ku tengavî heye, min dît carekê de Botanê Reş bi tabûra xwe ve, Hevalê Dilgeş ew hemû hatin. Heta seat bû 6 heval Emîn gihişt û di baskekî de êrîş kir. Milekî tepe dijmin jê derket, pêwîste em xwe bigihînin hevalên mewziyê de ji ber ku cebilxane nemabû. Hevala Nûcan hebû, hevaleke ji Serêkaniyêye, pişt re di berxwedayina Kobanê'de şehîd ket. Heval Nûcan cebilxane girt, çeka xwe xist ber milê xwe, li ser dijmin gule barandin heta ku xwe gihand ber deriye mewziyê.

Di vî şerî de hevalê Şoreş hebû, hevaleke zewicî bû, min dît carekê cihaz girte deste xwe û dest bi sloganan kir. Got ew nikarin heta du seetên din li vir jiyan bikin. Dema heval gihiştin me, gir di carekê de hat paqijkirin. Wê demê me êdi bi dest hemlê kir. Heta ber avê me wan birin. Gotina Şehît Dilgeş hebû digot, *"ez ê biçim navbera seatekê de ji wî çemî avê vexwim."* Ew, Botanê Reş, Heval Emîn, Heval Nûcan û Heval Roza ku piştre di berxwedana Kobanê de şehîd ket, dema dibîne heval di zorê de ne, BKC'ya xwe digire tê tepe; hemû li wir bûn. Wê rojê ev heval ketin ber avê. Wê demê heval Şoreş û hevalek din şehîd ketin. Edi dijmin jî zani ku tene di eniyeke de nabe. Pişti wê du rojan êrîşê milê cebhê rojava kirin.

-**Girîngiya stratejîk a êniya rojavayê Kobanê çibû?**

Li xeta Fêrat ev êrîşên wan hemû şikestin. Piştî wê, di 2'yê meha 5'an de êrîşên rojava destpê dikin. Viya dibe pêvajoyeke nû. Êrîşa cebhe Rojava pêvajoyeke cudatir destpê dikir. Ew pêvajoya destpêka salê heta meha 6'an berdewam kir. Di vê navberê de DAIŞ'ê xwe îlan kir. Piştî ku Mûsûl girt, di serê her kes de DAIŞ weke hêzeke ku bin nakeve hat çêkirin. Bû hêzeke wisa ku biçe kudere, ala xwe nîşan bide, di wê dere de deng dernekeve û herkes bireve, jê bitirse. Yanî di nava çend seetan de Mûsûl girtin. Ya rastî beriya îlankirina wan, me guman dikir ku dê êrîşeke wisa çêbibe.

Cihê ku em tê de, di navenda cihên ku wan girtî de dima. Di milê cografik de Kobanê wekî striyekê dikete çavê wan. Ne ku cihekî pir dewlemend bû. Ji ber ku Kurd bûn, cihê berxwedayinê bû, dixwestin bikevin. Dixwestin wê xeta xwe hemûyê bikin yêk. Bi baweriyeke wisa ve hat ku dê Kobanê bin bixe. Dema 2'yê meha 6'an 2014 êrîşî Zor Mexarê û eniya rojava kirin, bi vê armancê êrîş kirin.

Bi qûweteke mezin êrîşî eniye Rojava kirin. Hinekî jî ji mile qulbe êrîşan destpêkirin, lê qulbe ne ewqas berfireh bû. Ya herî mezin êrîşa Zor Mexarê bû. Lê tenê êrîş li hemberî Zor Mexarê nebû, min got ya xwest wê xetê giştî bigire. Beriya wê ew ceribandinên wan yên cihê din çêkiribûn hemû bin ketibûn.

Hejmareke mezin yên xerîb jî di nava wan de hebûn. Van qûweteke mezin anîn Zor Mexarê. Hefteyekî li Zor Mexarê berxwedayinek çêbû. Di vê derê de zêde şahadet çênebûn. Tenê Heval Denîz şehîd ket, hinek heval jî birîndar bûn. Ya rastî li wir me dît ku êrîşeke berfireh li ser Kobanê tê kirin. Plansaziya DAIŞ'ê ew bû. Sê çar rojan vê berxwedanê berdevam kir. Êdî me xetek çêkir. Gundê ziyarete wan deran me berda. Li xeta Zor Mexarê me xetek çêkir. Xeta me wê demê çep bû, me xeteke rast çêkir. Di vê xetê de tepe hebûn. Jixwe ji sînorê Tirkiyê destpê dikir. Piştî wê me ev xete girt, êrîşên wan jî zêde bûn. Xwestin cihên pêş, gundên stratejîk bigirin.

Tepeyek hebû me navê wê kiribû tepeyê şehîd Hogir. Tepeyek bilind bû. Di navbera me û sînorê Tirkiyê de bû. Xwestin ew tepe bigirin. Gundê Ziyaretê girtin. Sê çar gund ji deste me girtin.

Foto-33

Heval Deniz û Heval Erdal herdu jî bi hevdure tevlê bibûn. Hevalên hevdû yên zaroktiyê bûn. Herdu jî ji Sûrûcê bûn. Cihê ku heval Erdal birîndar bibû, Heval Deniz jî li wir birîndar bibû. Wê demê min ji heval Deniz re got neçe. Lê wiya got ezê biçim. Bi rengekê fedai çû. DAIŞ cenazeyên wan Cerablûs'ê gerandibûn. Rastî jî ez pir pê bandor bûm. Tişteke pir tesadûfî bû birîna herduyan di heman cihî de bû.

Wekî din heval Ferhat hebû, heval Hogir hebû. Bi rastî jî ew rihê ku bi wan re hatibû avakirin kes nikarîbû pêşiya wana bigire. Me heval ji Zor Mexarê bi zorî derxist. Heta me ji wan re got; '*werin em teqtîk dikin, ji bo ku em xetek nû çêbikin'* wisa derketin. Ji ber ku çend heval jî li wir şehîd ketibûn hevalan nedixwest berdin.

Piştî 4-5 rojan berxwedayînê zehmetî jî çêdibû. Hêza me jî têrê nedikir. Wan piştî ku tepeye Zagros'ê girtin xeta xwe çêkirin. 2'yê mehê wan destpê kir, piştî çend rojan me êrîşên wan dan sekinandin û me xetek li wir çêkir. Wan pişt re êrişî eniyê rojhilat kirin.

***-Êrişê kûdere kirin?***

Êrîşe gundê Evdiko kirin. Bi rastî jî berxwedayina gundê Evdiko pir cuda bû. Şevek û du rojan hevalan ber xwe da. Gund bi xwe jî 20-30 mal in. 4-5 tanqan êrîşî ser hevalan kirin. Heval ji bo ku wî gundî bernedin pir ber xwe dan. Ji ber ku xet qût dikirin, navber qût dikirin, riya wê nîne. Eger wî gundî berbidin dê 6 gund wek gundê Kendalê ji dest biçe ji ber ku xetê qut dike.

Hevalan di wir de pir ber xwe dan, gotin *"em vî gundî bernadin."* Di wir de Hevalê Botan şehîd ket. Girêdana Heval Botan û Heval Erdal pir bi hevdure hebû. Ya rastî dijmin ev teqtîk di Zor Mexarê de jî bi karanîbû. Wexta şer dibû sîngesîng, dijmin sernediket. Ji bo wê jî dijmin di vir de derdorê gund ziviri û hat ket pêşiya hevalan û bi tanqan êriş kir. Pêşiya hêzê girt. Di wê berxwedayînê de heval Agirî hebû. Hevalek ji Kobanê bû. B-7 bikardianî. Bi rastî jî wexta B-7 diavêt her tim li hedefe dida.

Dijmin diçe ser mewziyên hevalan. Heval Agirî jî ji mewziyê derdikeve pişt ve bi B-7 li dijmin dide. Heta êvarî ber xwe dide. Pişt re şehîd dikeve. Heval Erdal, Serhildan, Botan di wir de şehîd dikevin. Gelek heval birîndar bûn. Hevalan xiste meseleya namûsê. Gotin *"em vir bernadin*." Lê me dît ku eger em bernedin em ê windahiyên mezintir bidin. Jixwe di eniyên din de jî şer hebû. Me got şuna ku em li vir qûwetê xwe hemûyê îmha bikin, em biçin cihên din şer bikin. Hevalan jî bikişînin. Me bîryar girt ku em ji Kopurluk, heta bigehe Fewantê û Birguno em xeteke rast çêbikin. Ji bo ku qûwetê me jî têrê bike.

Di vir de jî berxwedayinek bi wate hat meşandin. Wexta ber êvarî dibe hinek heval dibêjin *"beriya bibe şev, em vir berdin."* Hinek heval dibêjin *"me vir xilas kiriye."* Lê me di wir de ferq kir ku bîryara DAIŞ'ê çi dibe bila bibe pêwîst e van deran bigirin. Çiqas kuştiyên wan hene ji bo wan ne girîng e. Ev bîryareke ne ji rêzê ye. Erebeyên wan yên ku fişek têde naçin hebûn. Tijî çete dikirin, dianîn cihê şer vala dikirin, pişt re tijî cenaze dikirin û dibirin. Me jî dît bîryarên van cuda ne. Jixwe me hejmareke hevalan jî şehîd dabû. Me got bi vî rengî nabe. Me qûweta xwe bi cih kir. Jixwe bi mesafeyeke kîlometreyek nêzî wir cih kir.

Berxwedayina gundê Evdiko wisa ne ji rêzê bû. Dijmin pişt re gotibû "*em bi berxwedayîna Şehît Agirî bandor bûn."* Digotin *"li pêşiya tanqê sekini bû bi B-7ê şer dikir."* Heval Agirî ne zêde mezin bû. Hevaleke 20 salî bû. Herhal telefon û lênuska wê li ser dibînin. Di telefona wê de digotin, "*ger em bana; dê me ew heval bikira taca sere xwe."*

Belki ji bo ku me aciz bikin wisa dikirin. Lê ji aliyekî ve jî rastî jî bandor bibûn. Girêdayinek wê qûwetê jî bi hevdure hebû. Hema bêje du sal bûn bi hevdûre di şer de bûn.

Wekî din Heval Erdal hebû. Gencekî 17 salî bû. Li ser komek heval bû. Li Rojava tevlê bibû. Çi şerê ku diketê jî bi rastî jî ser dixist. Heval Botan ji bo ku biçe cenazeye heval Erdal bîne, diçe cihê vekirî. Li wir ew jî şehîd dikeve. Van hevalan di van şeran de pir rola xwe lîstîbûn. Me cenazeyen wan jî anîn jixwe. Êdî şerê Kobanê bû sê ênî. Van jî dît ku berxwedayinek mezin heye, nikarin ser bikevin. Planên cuda xistin dewrê.

Piştî viya bangawaziya Serokatî ya seferberiyê ji bo Kobanê çêbû. Viya di dîroka me de pir girîng bû. Belkî me çend gund dabûn. Evdiko şûnde, me nehişt ku ew pêş ve werin. Wan çiqas dixwest êrîş bikin, hevalan jî her vala derdixistin. Me çend cenaze girtin. Tanqeke wan me imha kir. Hejmareke mezin erebeyên wan me îmha kirin.

***-Di wê demê de piştgiriya gelê Bakur û gelê Kobanê çawa bû?***

Bêguman di vê demê de tişta herî girîng berxwedayina Bakurê Kurdistanê bû. Gelê me yê Bakur bi berxwedana xwe hevpeymana Lozan'ê bê wate kir. Bi sedan ciwan, îxtiyar, jin ji bo seferberiyê hatin. Heta hingê çiqas êrîş çêdibû dihate pûçkirin. Lê cara yêke ew gund ji deste me çûn, viya di gel de dudilî çêkiribû. Lê vê carê di gelê Bakur de riheke cuda hatibû çêkirin. Tabi Serokatî wê demê ji bo me gotibû her gundekî bikin baregehek. Viya cihe rexnedayinêye. Ji ber ku me her gundek nekir baregehek.

Wexta çadir hat vekirin. Li ser gelê wê dere ji aliyê dewleta Tirk ve êrîş çêbû, baş hat zanîn ku viya ne tenê şerê DAIŞ'ê ye. Di esas de şerê Tirkiyê ye. Pişt re me zanî ku kampên DAIŞê li Tirkiye hene, birîndarên wan dibin wê dere, alikariya wan dikin. Ji aliyê Bakur ve teqwiyê ji wan re dihat. Viya derkete holê. Me dît ku di sînor de alikarî ji wan re tê. Piştî bangavaziya Rêberti me jî ferq kir ku hewceye ku em sînor bigirin. Gelê me yê Bakur sînor nasnekirin. Nobet li wir girtin. Viya di gelê Kobanê de û di hevalan de jî moralekî mezin çêkir. Koordineya mile Bakur milet bixwe dikir. Bi çavan didîtin wexta DAIŞ dihat.

Di vê demê de êrîşî girê Şehît Hogir û girê Zagrosê kirin. Xeta me çêkirî ji bo parastinê xeteke baş bû. Wan dixwestin ji me bigirin wê xete. Di wî girî de heval Hogir şehîd ket. Me careke din tepe ji wana girt. Xwestin mile Çarikli bigirin. Lê me nehişt. Tepeyê Zagros'ê de şahadeta hevalan çêbû. Heval Awaz li wir de ye. Dest ji tepe bernadin. Tepe jî me cihokên parastinê çêkirine, ax xistiye ser hevdu wisa girik çêbûne. Wan xwest ku xeta me bişkinin. Lê dîtin ku em dest tepe bernadin. Jixwe me tepeya Şehît Hogir jî bernedabû. Pişt tepeya Zagrosê zivirîbûn hatibûn ketibûnê û dixwestin bigirin. Li wir heta nîvro hevalan berxwedayinek mezin kir. Jixwe derneketin jî. Ji ber ku eger em berdin ji bo xete giştî xeterî çêdibe. Di wê tepê de 7 heval şehîd ketin. 4 hevalen birîndar hebûn. Yên din hemû şehîd ketin. Tepe ket destê wan. Hevalê Ferhat got "*pêwîst e em vî gir*ê *bigirin.*" Hevalekî ser şervanê nû pir mabû. Got "*eger em vî tepeyi berdin, wan dê gelek cih din ji me bigirin.*"

Li derdora tepe zivirîn. Cihek hebû wek mezre bû. Li wê derê heval Ferhat şehît ket. Rastî jî di şerê Kobanê de roleke pir mezin leyist. Pir şervan amade kir. Rihekî pir berxwedêr hebû. Şahadeta van hevalan pir bi bandor bû. Piranî ji hevalên ku pêşengti dikirin bûn. Heta deqiqeya dawî wan dest ji cihên xwe bernedan. Jixwe pêşiyê de ji gruba heval Berfin şehîd ketibû. Hevalên jin di pêşiyê de bûn. Ji vir şûn ve tiştek derket holê. Wan jî zanîn ku êdî sekinî. Çi hêza wan hebû hemû xistin dewrê, lê ser neketin nikarin Kobanê bigirin. Zanîn bi vi rengî nabe.

Heta meha 7'an li Kobanê şer bû. Pişt re dijmin çû Eyn Îsa girt. Çû meterê Tepkê girt. Eyn İsa jî hezar esker têde bû. Hijmareke pir zêde tanq û cebilxane têde hebû. Tenê 35 tanqên ku DAIŞ girtin hebû. Hejmareke pir zêde cebilxane girtin. 8'ê êvarê destpêkirin, sere sibehê girtin. Bi sedan serê leşkerên rejime jêkirin û avêtin ava Firat'ê. Wehşetek li wir de çêkirin. Meter jî cihe ku teyare le radibe ye. DAIŞ didît ku ciheke wekî Tebke dikare bigire, lê nikare cihekî weke gundekî biçuk bigire. Viya di dijmin de nêrînek nu da avakirin. Amadekariyek nû, plansaziyek nû da avakirin.

Di Kobanê de ji baweriyek hat avakirin. Di me de jî baweriyek mezin hatibû avakirin. Ya rastî ji wisa bû. Di demê şerê tepeyê Zagrosê, Şehît Hogir de bi 5 tanqan hatibûn, me 2 tanqen wan îmha kirin û 3 tanq zivirîn. Yanî me dikaribû em pêşiya wan bigirin. Bi B-7 û çekên din me şerê xwe dikir. Yan jî me dikarî mayin daynin pêşiya wan. Sabotaj û hwd pêşbixin.

Hinek hevalên me yên sabotajê hebûn. Yêk ji Efrine bû. Yêk Heval Hêlîn bû. Şahadeta wan rastî jî giran bû. Heta hingê me piranî bi sabotajê mayîn bêbandor dikirin. Derfetên me yên fuzeyan nebûn. Me çend gundên ku hatine girtin, pişt re berdan. Me xwest em vê peyamê bidin ku em dikarin bigirin. Me xwest em qûweta xwe komi serhev bikin, ji bo ku em xwe bigihinin ava Firatê. Dijmin jî di nava amadekariyeke cîdî de bû. Me hemleyek kir û em gehiştin xeta Qûlbe.

**Di Şerê Kobanê de Pêşengtiya Jinê**

**-Mijareke ku bala hemû cîhanê jî kişand ser xwe, berxwedana jinan a li Kobanê bû. Hûn jî weke jineke ku di nava pêvajoya berxwedana Kobanê de cih girtî, li ser pêşengtiya jinê ya li vê derê dikarin çi bibêjin?**

Di destpêka şerê Kobanê de sekna hevalên jin pir girîng bû. Hejmareke biçûk jî kadro hebû. Di destpeka şer heta dawiya şer di eniya herî pêş de bûn. Çeperên pêş yên hevalên jin bûn. Şehît Sozdar hebû, digot "*çima em ne di pêş de ne?*" Her kes dixwest bi heval Sozdar re bikeve çalakiyê. Hevaleke pir bi bandor bû, 6-7 mehê tevlê bibû, lê fermandar bû. Ji gunde Yaramaz bû. Tevlêbûyina hevalên jin li wir zêde bû, di çalakiyan de hevalên jin zêdetir bûn. Heval li wir tevlê dibûn, arazi nas dikirin, tevlî şer dibûn. Ti cari hevaleke jin mewziya xwe bernedida. Ev wekî çandeke hatibû avakirin. Viya bi şahadeta Heval Necbir, Heval Viyan wan wek çandeke hat û berdevam kir.

Foto-34

Ew çand di berxwedanên Kurdan de heye. Ew jî rihê berxwedanê ye. Ne yê teslîmbûyînê ye. Hemû eniyan de hevalên jin hebûn. Yek jî tişte ku hişt di Kobanê de ew berxwedayin çêbibe, şikandina ew feodaltiya hebû bû. Pirî cihan de guhertinen mezin çêbibûn. Bavê wan deste keça xwe digirt, dibir nava şer û digot, "*bila şer bike.*"

Piştî van pevçûnan me bîryareke nû girt. Me taybetî civîn çêkirin ji bo ku em wê zîhniyete bin bixin. Me li ser şerê Şengalê di nava mehekê de bi hemû qûwetên xwe re civîn çêkirin. Me dizani ku dê DAIŞ êrîş bike. Ji bo ku tişte li şengalê bûyî li Kobanê nebe, me digot pêwist e em çi bikin. Me weke hevalên jin bîryar dabû ku çi bibe bila bibe pêwist e em nehêlin kes êrîşan li ser jinan bikin. Ji bo ku em Kobanê nekin wekî Şengal me soz dabû. Jixwe silavên Serokatî jî ji bo jinên Kobanê hatibû. Me bîryar dabû ku herkes gund bi gund parastina xwe bike.

Piştî van civînan me bîryar da ku em tepeye Zagrosê bigirin. Di şexse heval Avesta de di şexsê heval Diyar de dirokeke nû hat nivîsandin. Pêş çavê me her tişt çêbû. Şehît Diyar pêşniyar kir ku biçe ser tepe. Şehît Avesta li ser tepe bû. Şehît Avesta sal û nîvek bû tevlê bibû. Şehît Diyar digot *"ev heval fermandara min e. Ez dibînim ku di ve hevale de rihê fedaî heye."* Şev û rojekê êrîşê berdevam kir. Me ew tepe girt. Me çiqas ji hevalan re got jî tepe berdin, lê wan tepe berneda. Di wî şerî de sekna hevalan bi teybet jî sekna hevalên jin pir bi bandor bû. Her hevalek bi xwe destanek e ku bê nivîsandin. Bi vî awayî me hemleya xwe berdevam kir. Heta ku êrîşên herî dawî çêbibin.

Foto-35

Tiştekî girîng ku em bêjin ew e ku dema kesên ne ji Kobanê dihatin û şehîd diketin, dayikên Kobanê destpêkê diçûn ser cenazeye wan, ne diçûn ser cenazeyê zarên xwe. Ji ber ku derfetê ku dayikên wan werin nebûn. Mesela wexta Şehît Hebûn, Şehît Siyabend şehîd dikevin, 3 dayik hene, ew naçin ser tabûtên kurên xwe, diçin ser cenaze Şehît Hebûn û Şehît Siyabend. Dayik dibêjin "*belki van kurê me ne, me şîr daye wan; lê yên ku were welatê me biparêze jî kurê me ye. Pêwist e em wan bê xwedî nehêlin.*" Bêgûman viya ne tenê sekneke hestiyarî ye, di heman demê de zanist e jî. Rêxistinbûyina gel dide xuyakirin. Mirov dikare weki perçeyekî şer bigire dest û binirxîne.

Rola ciwanên temenê wan biçûk ku dixwestin di vî şerî de cih bigirin hebûn. Rola jinê jî di vê şerî de diyarker bû. Pir dayikan keçên xwe dianîn digotin "*şûna ku bizewicin, bila şer bikin.*" Viya ji bo rihê berxwedayinê, serhildanê pir girîng bû. Rihê şoreşê dida diyarkirin. Ew jî perçeyekî şoreşê yê herî birûmet bû.

**-Her ku DAIŞ li Kobanê darbeyan dixwe û têk diçe, bi hejmareke zêdetir û çekên giran careke din êrîş dike. Ew qesî derfet ji kû dianîn?**

Hamleya duduyan ya ku li ser Kobanê, piştî van cihên dewletê hatin girtin û cebilxaneya ku ji Iraq'ê, ji her du cihên dewletê Reqa û Tebqê hatî girtin çêbû. Jixwe hêzekê ku pê re şer bikin êdî nemabû, Arteşa Azad wan jî ji holê rabibûn, dewlet jî nema; qûweteke tene heye, ew qewet jî heza me ye. Me agahî girtin, belge ketin deste me; me zanî ku dibêjin ev der bi vî rengî bi qûweteke normal naye girtin. Bi girtina 2-3 eniyan, ev der nayê girtin.

Di serî de plansaziya viya bi dewleta Tirk ve çêbibû. Di van demê derbasbûyî hemûyan de projeyekê ji bo ku bikaribin vê hêzê ji holê rakin û cihê ku ji bo şoreşê herî girîng dagir bikin, serkeftin û destkeftiyên ku hene bin bixin, hêza yekemîn ya li ser erdî ku li hemberê wan şer dike lewaz bikin planên wan hebûn. Ya harî girîng jî cihê ku şoreş destpêkiriyê de şoreşê bin bixin, plansaziyek berfireh hate çêkirin. Bêgûman viya li gorî dijmin teqtîkeke baş e. Ji ber ku di cihê ku şoreş destpêkirî de êrîş bikin, dê di şoreşê de şkandin çêbikin. Dema ku em dîroka Kurdistanê jî meze dikin her tim ev plan hatiye bikaranîn. Ji bo ku şoreşê hem di mile siyasi, leşkerî, bîrdozî de bin bixin, vê rêbazê didin şuxulandin. Dijmin bi teqtîka perçiqandinê dihat ser Kobanê. Plan ew bû ku di xetê gundan de me xelas bikin, qûweta me lewaz bikin. Da ku di çembere de werin û bikevin bajêr.

**Fermandarê DAİŞ'e li Tirkiyê bû!**

Di vî alî de Tirkiye jî di asta herî bilind de derfet daye wan. Ji bo ku rehet werin û herin hemû sînorên xwe ji wan re vekiribûn. Berî şer destpêbike du mehan li Tirkiyê qampa AFAT'ê çêdikin. Ji bo ku milet koçber bibin biçin wê derê. Şerê du salan yê li ser Kobanê him Cebhet El Nusra, him Arteşa Azad, him êrîşên DAIŞ'ê de fermandarê giştî yê Tirkiyê bixwe ser disekine. Tê Riha'yê ser projeya ku çawa me bin bixin teybetî disekinin.

Plana ji bo gel jî ew bû ku gel qetil bikin, destpêkê bi çekên giran êrîş bikin heta nerm dikin, pişt re jî ji kelekan bi hemiran bikevin bajêr û talan bikin, ji bo ku qûwetê wan zede qeyip nedin, zû bigihêjin armanca xwe. Ya din jî qûwetên xwe bi sîngesîng nexin şer. Cihê ku dixwazin bigirin dorpêç bikin, bi çeken giran ku di destê wan de heyî bikar bînin û pişt re jî bikevin bajêr. Yêk jî dixwestin ku di nava qûweta me de perçebûyinê çêbikin, qût bikin. Ji bo ku li ser me serweriyê çêbikin.

Ji ber ku ceribandinên pêşiya wî serneketibûn. Li Evdiko, li Kendalê, li Kûn Heftarê, li Tepe Sêvê, li ênî rojavaî, li tepe Zagros'ê, li Zor Maxer'ê, li gundê Leqleqo heta niha teqtîkê ku bikar anîne ser neketi ye, pêwîst e teqtîk bigihûrînin. Dibêjin, *"pêwîst e hejmareke pir zêde tanq hebin."* Yêk jî ev tanqên ku bi deste xwe çêkirine wekî yên me ku mermî lê naçe, dema ku qûwet kirin çemberê ji bo ku tê de biteqînin. Her wiha erebeyên tijî teqemenî tînin, van teqtîkên wan bûn. Bi rojan niqaş çêdikin li ser viya. Pîsporên Tirkiyê bi wan re ne, ew van teqtîkan nîşanî çeteyan didin.

Teqtîkekî dîtir jî pêwîst e tîmên wan yên intiharvarî hebin. Her cihe ku pevçûn çêbûn, pêwîst e tîmên intiharî hebin. Ev jî teqtîkek esasî bû. Ya din jî di araziyê de cografyayê baş bikar bîne. Kesên ku sîstema sîxurtiyê, yên ku berê wan nas dikin dê ji xwe re bikin pêşeng. Plana wan ya çaremîn bilez kar bikin. Ji bo firsetê nedin me teqtîka lezbûyînê pêk dianîn. Dixwazin 24 seetan me di nava pevçûnan de bihêlin. Bifikirin insanek 24 seetan di nava pevçûnan de be, nikare lêhûrbûn bike. Ya din jî koordîneya şer belavkirin e. Ev jî wisa ye ku hemû eniyan de êrîş bikin ku nehêlin mirov giranî bidin êniyeke.

Van ziravtiyan hemûyan nîqaş dikin, ji xwe rê hemû girtine. Tirkiye jî bîryara ku rê bidin DAIŞ'ê ku xwe rê ve bibe û pêwîstiyên xwe pêk bîne. Tabi Katar, KDP, Erebîstan hemû di nava vî karî de ne. Rojên pêş de em ê bizanin ka kî tê de ye û hêviyên wan çi ne! Ji bo ku van planên xwe pêk bînin hêzên teybet tînin, pişt re dê bi çekeê giran lê bidin û bikevin bajêr.

Bi vî awayî şer di 14 mehê ber bi êvarê ve destpê kir. Beriya wê 13-14'ê mehê êrîşê Zêrik û Tehlik kirin. Di gire şehîd Hogir, mile eniye xeta Firat'ê de li wir bi çekên giran lê xistin. Ji mile qulbe jî bi çekên giran êrîş kirin. Li gundê Zerikpevçûn didoman. 14'ê mehê seet 9'ê êvarê êrîşî gundê Nebo kirin. Ev eniya Rojhilatê bû. Di van gundan de gel hebû. hîn me hemû vala nekiribû.  Hinek cihan de jî hatibû valakirin. Ji ber ku bi çekên giran êrîş dikirin me gel ji gundên destpêkê derxistin.

Beriya wê bi du rojan zarokek li gundê Qizelî şehîd ket. Piştî wê pevçûnan destpê kir. Destpêkê li gundê Rojhilatê gundê Nebo li mile Rojava, li mile Qulbe ji di xeta Firat'e de ketin êrîşê. Li mile Zerik, Tehlik, mile dikeve gundê Zagros'ê de bi giştî di wê xetê de pevçûnan berdevam kir. Dîroka şer resmî 13'ê mehê ye. Lê di 15'ê mehê de bênavber êrîş destpêkirin. 13'ê mehe de her sê milan pevçûn hebû. Êrîşên wan yên çekên giran hebûn. Lê me di got dibe ku weke carên din be, me dît ku ne êrîşek wekî carên din e. Me dît ku êrîşên wan pir cuda ne, planên wan pir cuda ne, hedefên wan pir cuda ne. Cihên ku digirin jî bernadin, hedef hîn berfirehtir e. Bi vî rengî em ketin ferqa teqtîkên wan de.

Jixwe berxwedayina li pêşî hatiye meşandin jî dida xuyakirin ku çi dibe bila bibe em cihên xwe bernadin. Tiştê ku herî zêde bandor dikir çekên wan yên giran bûn. Şerê beriya wê çar penç tanq dianîn me, dikarîbû ku em bi çekên giran li pêşiya wan bisekinin. Lê ev şerê niha êdî bênavber bû.  Piştî ku gihêştin gundê Zerik, Tehlik me xwest ku em xetekê li mile rojava çêbikin. Bendekê çêbikin.  Ya rastî di wê eniyê de xeta me ya yêkê şikest. Wek jihevqûtkirinekê dixwestin çêbikin, wek qeliştokekê çêbikin û çep û rastê wê bigirin.

Me ênî kiribûn du beş. Eniyek dikete xeta Zor Mexerê hebû, eniyek ku dikete xeta Firat'ê hebû. Gundê Piling, gundê ku li derdorê wê hene pevçûnê berdevam kir. Du roja sê roja pevçûn domîn. Piştî du-sê rojan, 17-18'ê mehê ev xeta destpêkê şikest, me li hinek cihan gavek şûnve avêt. Ji ber ku pir yoğun çek bikar dianîn. Taybetî ev silahên ku bi dest çêdikirin wek hewanan e, wek tupa di mesafeyeke kurt de pir basıncê çêdikin dişûxilandin. Her çeşîdê çekan bir kar anîn. Bê hesap hewan bikar anîn. Belkî tanq bi hejmar diavêtin, lê bele hewan bê sînor bûn. 6-7 hewan pey hevdu diavêtin. Ji xwe teqtîkê şerê wan jî wisa ye.

Me berê jî dimen girtibûn. Mînak 6 hewanan rêz dikin. Araziyeke ferehiya wê 4 km ne, dirêjahiya wê jî 700-800 metre ye hesap dikin, navbera wan hewanan de yê ku lê bikeve. Ji bo ku wî tesir neke, yê kêleka wî tesir bike teqtîkeke wisa jî didin meşandin. Terzê wan yê hewan avêtinê wisa bû. Lê bele li hemberî van hemûyan ew rihê berxwedanê bilind bû.

Jixwe di 19’ê mehê de hevalê Baran çalakiya fedaî li eniya rojava kir. Ew bixwe jî di wê êniyê de di rêveberiyê de cih digre. Dema çete tên di nava hevalan de xwe diteqînin, heval Baran jî dikeve tepe û hemû hevalên birîndar xilas dike, pişt re benda çeteyan dimîne ku werin bikevin girde. Çete jî dibinin ku kes di tepe de şer nake, tên dikevin tepe di wê demê de heval Baran xwe diteqîne.

Êdî ji bo eniye Rojava merheleyek destpê dike. Piranî hevalên nû bûn. Yên ku ji bo seferberti hatibûn. Çalakiya hevalê Baran pir watedar e. Viya di nava hevalan de moral û hêzek çêkiribû. Digotin “*çi were xwestin pêwist e em bikin.*” Teqtîk hatibû guhertin. Milet ji xwe pişt hevalan de bû. Li gundên pêşiya hevalan milet nebûn. Milet nedikarî li gundan bimîne. Ji ber ku çekên giran pir dihatin şixûlandin. Milet xwe gaveke dide paş.

Di 16’ê mehê de êrîşî eniya qulbe kirin. Piştre xwestin Kûn Eftarê bigirin. Lê hevalan bernedan. Wan piştre, derdora tepeyan girtin. 5 hevalê jin û 2 hevalên xort li wir bûn. Hevalan tepeyên xwe bernedan. Ew qûwetê ku li pişt wan zivirîn êvarî çalakî li ser wan kirin. Hevaleke jin ku fermandara wê quwetebû ku ji Efrîn’ê bû, li wê dere şehîd ket. Ew hevalên di gir de gotin “hûn pêşiya me paqij bikin, em ê li pişte bizivirin. Em gir bernadin. Lê di navbera du çeperên dijmin de mabûn. Tenê cihek heye ew jî xeteke pir zirav e. Heta mirov xwe bigihijîne mirov dê pir windahiyan bide. Hevalan li wir cihê xwe bernedan, du rojan li ber xwe dan. Heta ku hevalan 10 cenazeyên dijmin nexistin erdê tepe bernedan.

Viya weke felsefeyekê bû, çi dibe bila bibe bi hêsanî dest cihê xwe bernadin. Ew ênî kengî şikest. 17’ê mehê. Ji ber ku sistema wir giren biçûk in, dijmin lê zivirî. Dema lê zivirîn, roja 18’ê mehê eniya destpêkê şikest. Edi di piştwir de xeteke divê bihata çêkirin. Di roja 19’an de ew eniya mile Qulbe jî hat û mile nekebê girt. Ew xetên yekemîn ku hatibûn girtin, hatin berdan. Di heman deme de mile sewama Sirîne jî pevçûnan destpê kiribû. Jixwe berê li wir çekên giran bikar dianîn. Miletên wir destpêke ber xwe dan. Heta qedemekê paş ve hatin. Dijmin destpeke de dixwest di eniya rojhilatê de bi ser bikeve. Hedefen wan yêk cihên li ser sînorê Tirkan bû. Ya duyemîn jî bingeha wan ya ku ji Girêspî dihat dikarin xwe zû bigihijînin wir. Li ser eniya Rojhilatê hinek êrîşên wan, planên wan cudatir bû.

**Berxwedana Serzorî, xeta berxwedana Kobanê ye**

Di eniya Rojhilatê de şer destpêkê li gundê Nebo û Kizelî û gundê Bîrkêtkî destpêkir. Van xwastin di xeta Tirkiyê de li gundê Serzorî re bikevin aliyê din. Li wir jî penç hevalên jin û du hevalên xort hebûn. Ev gund jî nêzî bîst malan bû, dikeve piştî hevalên li keleka wan disekinin. Hevalan qenal li wir çêkiribûn. Qenalên ku ji bo maşîneyên ku werin xwe bi teqînin hatibûn kolan bûn, j xwe derdorê gund jî mayîn kiribûn.

Van xwestin tevahî quwetê bixin çemberê. Pêşî di xeta Ebosorî re û Kizelî re eniya rojhilatê û Serzorî ji hev cuda bikin. Bi du baskan re êriş kirin. Jixwe di aliyê pêş ve jî dihatin. Piranî çekên giran bikartanîn. Pêşî hatin êrîşên xwe li ser gundê Serzorî pêkanîn. Êvarê demjimêr 12’an de destpêkir. Di aniya rojhilatê de seat 9:30’an de destpêkir. Lê wan destpêkê bi çekên giran êriş kirin, di bin de jî dixwastin sizma bikin. Du caran hewildanên wan çêbûn, lê heval ferq dikin û wan îmha dikin. Heval êrişên wan jî di nava wan qenalên çêkirine de dişkînin.

Xwesteka wan ya di aliyê Serzorî re hatinê jî ev bû; dixwestin riya di navbera hevalan de bigrin, ger ku vê xetê bigrin wê heval pişt wan bimînin. Weke teqtîkê gundê Evdiko kirin. Hevalên Serzorî jî ketibûn ferqa wê. Gava destpêkê êriş kirin xwestin wir bigrin. Xwestin têkiliyê quwetê ji hev qût bikin. Ew quwetên di pişte de mayî jî dixwestin bikin dorpêçê. Ji milê Serzorê re dixwestin heya Xanê û Eydanê werin. Di pêşiyê de hedefa wan ew bû.

Gava mirov qala Serzorî berxwedanî û têkoşîna wê bike, ew bi serê xwe pirtûkek e. Ji bo ku mirov Serzorî vegotin bike, pêwîst e mirov rihê wê demê jiyan bike, wan kêliyan jiyan bike. Gava mirov berxwedaniyê wê bike, wê dem mirov dê qala tevahî berxwedaniya Kobanê bike. Xeta berxwedaniya Kobanê, xeta berxwedaniya rêhevalên Serzorî fêrî me kirin ku em ê çawa berxwedaniya li Kobanê ser bixin û em ê têkoşîneke çawa bidin meşandin. Wan hevalan xet û şêwazên me yên şer dan diyar kirin.

Jixwe giraniya êrişan birin ser wê derê. Bi çekên giran gelek êriş dikirin, gundekî nêzî sînorê Tirkiye bû. Kêleka wê jî gundekî Ereban heye. Tanqên xwe û tevahî hêzên xwe yên ku di şer de pispor in û şerker in dixwestin di wî gundî de bi cîh bikin. Heta ber destê sibê hevalan yek birîndar da. Di heman demê de cebilxaneya wan jî kêm ma, komek heval jî ji bo hevalan cebilxane birin.

Hevalê Rodî fermandarê wê yekineyê bû. Heval Bahoz jî di xeta pişta wan de disekinî. Rêheval Cudî jî di xeta pêş de disekinî. Rewşa Serzorî pirs kirin, min jî rewşa wir ji wan re got, navbera me qût kirin. Gava qût kirin jî heval encex di aliyê din re derketin. Di seat 1-2’yan de me çend kom şandin, lê heya cihekî çûn, nikarîn heya dawî biçin. Wê demê jî ew xeta ku di navbera hevalê pêş de hêja qût ne kiribûn. Hevalên aliyê gundê Curin disekinîn, tenê wan dikarî alîkarî bidin hevalan.

Hevalan di navbera seat 2-3’yan de gotin *“cebilxaneya me nema ye.”* Heval Rodî û du heval bi hevalan re cebilxane dibin. Piştre heval Rodî diçe gel wan dimîne. Du hevalên din jî çûn gel wan man. Yên ku çûne teqwiye li

wir man ji wir nehatin. Wan heval li wir bernedan, pevçûn kirin heya danê sibê. Me dît ku gelek li ser wir de êriş dikin, me jî ji hevalan re got "*hûn dikarin gavekê xwe bidin paş.*" Hevalan jî gotin "*ger em xwe bidin paş, wê hevalê din bikevin dorp*êçê.*"* Bi rastî jî wisa bû, ji bo wê jî me gelek israr nekir. Me digot çi dibe bila bibe em ê êrişên wan bişkînin.

Ji bo ku em ew çembera ku di navbera me de avakiribûn bişkînin, me grubek heval di xeta Xanê de rêkir. Ew grub dê biça û wan heval di wê çemberê de derbixistana. Heval çûn, yek du mal jî girtin lê ne dikarîn tevger bikin. Hevalan jî her digotin "*rewşa me baş e.*" Ew hevala li gel wan şehîd dikeve jî dişînin gel gruba din. Heval Rodî jî çû gel wan, heval jî hatin ketin gund de hema piraniya gund girtin. Mektebekê gund yê sê qat heye heval jî ketin wê dibistanê. Dibistan jî li ser gelek cihan serwer e. Hevalan BKC ya xwe girtin çûn li ser xaniyekî. Wê demê çete jî hatin ketin gund de, hevalan jî li ser dibistanê sengerên xwe çêkiribûn.

Foto-36

Heval Rodî bixwe sekvan bû. Heval Peyman BKC bi kardianî, heval Cîwan sekvan bû. Ji wî milî ve ew grub gelek zîrek bû. Gava tanq tê birîndarên xwe dibe, ew dem heval derbe li tanqekê wan didin. Piştî wê jî neyar Hemirên xwe anîn. Ew dem hevalan gotin "*pêwîst e, em hemû heval bikevin dibistanê.*" Me jî got, "hûn dikarin hêzên xwe belav bikin li ser gundên din.

Foto-37

Jixwe wê demê di 12-13 gundan de pevçûn hebûn. Gruba Serzorî heya seat 9-10'an Bîrketkê ber xwe da. Wan gavek paşte avêtin. Ji ber çete pişta wan girtibû. Yê aliyê Qizelî jî hevalan li gel hewzê avê pişta wan zivirî bûn. Kopirlîkê jî pevçûn hebû, her wiha gundê Ehmediya pevçûn hebû. Van gundan bi rêz pevçûn dihat meşandin.

Heval Masîro jî di wê xetê disekinî, ez jî aliyê Serzorî desekinîm. Min ji hevalan re got hûn dikarin hêzên xwe çend gavan paş ve bikşînin. Heval jî gotin ne heval nabe em vir bernadin. Em vir berbidin tê wê wateyê ku em pişta tevahî hevalan berdidin. Ji ber heval bi israr xwastin wir bimînin ji bo wê çeteyan jî giraniya xwe dan wê derê. Ji ber neyar jî baş dizanîn ku ew cîh cîhê esasiye, ger wir bişkîne dikare tevahî cihan bişkîne. Her wiha neyar dît ku tevahî gundan de gelek berxwedanî tê kirin û pevçûn jî gelek dijwar tê meşandin. Berxwedaniya ku heye nahêle wê xetê bişkîne.

Hevalan hetanê seat yanzdehan pevçûn kirin, piştê wê jî hatin ketin dibistanê. Hevalan heya seat 1'ê di dibistanê de şer kirin. Piştê wê jî tanq anîn kirin dibistanê. Du tanq li hember hev şûrhên dibistanê ruxandin û ketinê de. Bi rastî jî hevalan qet ne hiştin ku bikevin tê de. Ew dem şehîd Rodî got; *"weke qijikê li derdorê dibistanê ketin.*" Heval Rodî wan li ser banê mektebê bûn, ji bo wê li ser wir serwer bûn. Piştê wê jî neyar bi çekên giran li dibistanê dixist. Heval Peyman li jor birîndar bû. Gava ku heval Peyman birîndar dibe birînên wê ne giran bûn, gotin em ê xwe berdin jêrê. Neyar gelek çek ji bo wan bikartanî.

Hevala xwe berda qata seyemîn. Neyar jî bi du hemiran û bi sê tanqan hate kete hewşa dibistanê û hêzên xwe jî li derdora dibistanê belav kirin. Ketin kata jêr yê mektebê de. Hevalan hemûyan di şopandin, yek bi yek tekmîl didan. Hevalan jî jor, ew didîtin.

Hevalan jî mevzîlendirmeyê xwe çêkiribûn, her çiqasî dixwastin bikevin qata binî, lê hevalan ne dihiştin. Ev rewş qederekê berdewam dike, heya hengê hevalek şehîd ketibû û du heval jî birîndar bûbûn. Hevalan got çi dibe bila bibe em bernadin. Heya wê demê me gelek heval şandin ji bo lêhûrbûyînên wan belavê cihekê din bikin û heval jî xwe xilas bikin, lê neyar wê derê berne dida. Hevalan jî gelek berxwe didan. Jixwe gelek bangawazî ji hevalan re dikirin û di gotin; "*werin teslîm bibin, em ê bikevin Kobanê, em ê roja eydê li Kobanê pîroz bikin, e mê di camiyên wê de nimêj bikin. Çar roj mane em ê bikevin Kobanê."* Tevahî hedefên xwe ji hevalan re di gotin.

**-Li hemberî vê bangawaziyê bersiva we çibû?**

Hevalan jî bersiva wan didan û di gotin; "*ev der ne Musil e û ne Reqa ye û ne jî Eyn Îsa ye. Ev der Kobanê ye û ev der Kurdistan e. Hûn nikarin bikevin vir."* Piranî heval li ser cîhazê coş, moral û bîryarbûyina xwe didan diyar kirin. Digotin em ê ber xwe bidin, zêde bi mere mijûl nebin, em ê ber xwe bidin, bila gundên din nekevin. Heval Ciwan axivî û got; "*ez rexnedayîna xwe didim hevalan, lewma me Rêbertî azad nekir, me Kurdistanek azad neda avakirin û em ê bi ciwantiya xwe şehîd bikevin, ev min têşîne. Ez ji tevahî hevalan pir hez dikim."* Ji heval Dilgeş re got, "*silavên min ji tevahî hevalan re bibêje, ez tevahî hevalan maçî dikim. Lê birastî jî em şehîd bikevin jî em ê bêrûmatiyê qebûl nakin. Em destûr nadin ku çeteyên qirêj li pêl ev axa pîroz bikin. Ji ber ev xak bi xwîna şehîdan hatiye avdan. Em şervan û hevalên Hebûn in, û tevahî rêhevalên xwe yên bi berxwedanî şehîd ketine ne.*"

Bi vî awayî ew moral didan me. Neyar dît ku bi rastî jî nikare hevalan, ji bo wê derdorên dibistanê mayîn kirin û tanqên xwe ji hewşa dibistanê derxistin. Gava ew wisa kirin hevalên dibistanê de jî ferq kirin ku ew ji derve tiştekî dikin. Min heval Peyman re qise kir û min got rewşa we çawane, min dît heval Peyman keniya, min jî got rewşa we çawane heval çi dikin ka tekmîl bide çi heye çî nîne. Heval Peyman jî yek bi yek tekmîla hevalan da. Yên ku şehîd ketine yên ku birîndar bûne. Piştr e jî got, *"bi rastî jî rewşa me gelek başe, me meraq nekin bi hevalên din re mijûl bibin. Em ji felsefa Rêber APO û ji hevalên xwe fêr bûne ku em ê bi hêvî û bi ken biçin şahadetê."*

Tevahî hevalan jî ji bo heman mijarê rexnedayinên xwe didan û di gotin; *"em ji şahadetê natirsin, ji bo me jî gelek pîroz e. Lê tişta ku em pê diêşin ew e ku em ji Serokatî re û gelê Kurd re nebûn bersiv û me soza xwe pêk neanî."* Digotin "*em dixwazin hûn xeta hevalên şehîd bişopînin."*

Foto-38

Di wê dibistanê de sêzde heval hebûn. Heval Berfîn, heval Gulistan û heval Berçem hebûn. Heval Berçem hevalek gelek biçûk bû jixwe ew çend meh bû beşdar bûbû. Min rewşa heval Berçem pirs kir, heval Berçem jî birîndar bûbû, keleka heval Gulistan bû. Dengê nalîna wê dihat min. Bi rastî jî gelek zehmet e ji bo fermandareke leşkerî. Di cîhanê de ger ku pirs bikin bibêjin mijara herê zehmet di cîhanê de çî ye, ew jî ewe ku gava hevalê mirov di zehmetiyê de be û mirov nikaribe jiyana wê xilas bike. Birastî ji di çavê min de ew heval şehîd neketine; ew gotinên wan yên dawiyê, coşa wan.

Ji xwe bi giştî sêzdeh heval bûn, ne artêşek e. Neyar jî ji bo ku xwe bigihîne dibistanê, di nava êrişeke gelek dijwar de bû. Bi rastî jî her curên çekên cuda li ser hevalan bikartanîn. Lê belê tişta herî girîng ew e ku di wan hevalan de dudilî yan jî fikra mirinê tineye. Bi rastî jî di dîroka şerê me de gelek berxwedanî hatine jiyan kirin. Lê kêm weke vê berxwedaniyê hatine jiyan kirin. Bi rastî jî dikarin xwe xilas bikin, lê dîtin ku ji bo ev berxwedanî domdarî bike pêwistiya xeteke heye. Ya girîng ew e ku mirov mirina xwe bike wesîleya rihê berxwedaniyê. Rihê demê biafirîne. Di tevahî hevalan de ew rih û hêvî hebû.

Hevalên Serzorî dan diyar kirin ku çi dibe bila bibe wê li hember wehşeta neyar dide diyar kirin, rihê demê bidin diyar kirin. Van rêhevalên me bi şahadetên xwe tevahî planên neyar serûbin kirin. Plana neyar ew bû ku di wê rojê de çend gund bigre. Lê heya êvarê nikaribûn gundekî bigrin. Dawî jî bi rêbazê wehşane heval şehîd xistin. Ger ne wisa ba hevalan dikar sê rojê din jî ber xwe bidin. Tevahî hevalan bi zanist şer dikir û cebilxaneyên xwe jî bi wê zanabûyînê bikartanîn.

Ruxmê ku tevahî hevalên nû bûn, di şer de ezmûnên wan jî nebûn, piraniya wan ji wir beşdar bûbûn û ji Kobanê bûn. Tenê hevalek li gel wan ji Êlihê ye, yên din hemû ji wê derê bûn. Bi rastî jî tevahî heval li gorî rihê demê tevgeriyan. Tevahî hevalên wir emir dan me û gotin ev berxwedaniya me rexnedayîna ji bo demê ye. Ger ku wê şerek hebe pêwîst e bi vî awayî bi rihê berxwedanî be, tû riyeke din pêşiya me nîne. Berxwedaniya hevalan, vîna neyar şikandin. Li wir hevalan heftî çete kuştin. Ew heval şehîd jî ketin, lê birastî jî rihê berxwedaniyê dan avakirin.

Gava mirov qala berxwedaniya Kobanê dike bêguman yekser rih û berxwedaniya wan hevalan dikeve hişê mirovan. Pêwîst e mirov herdem berxwedanî, rih û xeta ku wan hevalan dane raber kirin bidomîne. Ev rastiyek e, ger ku ew berxwedanî di Serzorî de bi vî awayî pêşneketiba dibe ku çarenûsa Kobanê cuda hatibûya diyarkirin. Tevahî hevalên ku wan guhdarkirin û wan hevalan bihîstin di wan de rihek da avakirin. Şehîd Cudî dibêje; *"em fermandarê we bûn, lê em xwedî we derneketin, me nikaribû we biparêzin. Di nava hevalên ku Kobanê de jiyan dike yê ku bi şans hûn in, we roja destpêkê rêya me da diyarkirin. Hûn ji me şanslîtir derketin, we trajediya gelê xwe nedît. Ev gel bi çi re rû bi rû dimîne we nedît."* Bi rastî jî bi çend gotinan mirov nikare berxwedanî û rastiya ku li Serzorî hatiye jiyan kirin bi lêv bike.

Berxwedana Serzorî, xeta berxwedana Kobanê ye. Xeta şêwaz û teqtîkê Kobanê ye.

Di gundê Serzorî de şevek û rojeke berxwedanî hate meşandin. Neyar dît ku nikarin bikevin gund ji bo wê jî ji xwe re gotin *"pêwîstiya vî şerî hesabekî din heye."* Piştî wê ber êvarê me xetek din çêkir, me hêzên xwe ji wê xetê anî. Me xeta xwe ji Xanê bigre heya digihije şîrketa Tirk berfireh kir. Ev destana Serzorî divê bi serê xwe di romaneke were dest girtin. Hevalan dikarîn bombeyên xwe di xwe de biteqînin. Lê wisa nekirin digotin, "*em ê yek bi yek şer bikin, bi her guleyeke xwe neyar bikujin, em ê her gaveke xwe bi zanebûn biavêjin. Heya ku em neyar bin nexin, em mirina xwe jî ji xwe re na pejirînin."*

Mirov gelek ji hevalan matmayî dima. Heval di nava ew qasî bombe de êrişan de bûn, lê di dengê hevalan de tu guhertin nedihat jiyankirin. Kêfxweşî û coşa jiyanê hebû di dengê tevahî hevalan de. Tevahî hevalan jî rihê demê jiyan kirin. Mirov dikare ji hevalên Serzorî re bibêje milîtanên rihê dema serkeftin û azadiyê. Di kêliyeke de tevahî gerdûn di xwe de zindî kirin.

Di şanzdehê mehê de me di aliyê Xanê de xetek çêkir. Neyar êdî heya nozdehê mehê bi çekên giran êriş kir. Piştê berxwedaniya rêhevalên Serzorî neyar teqtîkên xwe yên şer guhertin. Piranî êdî di xeta sînor yê Tirkiyê re dihatin. Xwestin gundê Xanê bigrin. Ev gund jî di navbera Serzorî de ye, di navbera wan de kîlometreyek heye. Xwestin di wir de berxwedaniyê bişkînin. Di xeta Xanê de hêjmara hevalan pir bû. Çete bi tanqên xwe hatin û ketin di navbera xeta ku me girtîbû û dixwastin wê xetê jî bişkînin. Heya hejdehê mehê xwestin ew xeta ku me girtî bû bişkînin. Ew planên wan yên ku di gotin *"em ê di çar rojan de bikevin hûndirê bajar"* têk çû. Di hûndirê çar rojan de encex karîn çend gundan bigrin û xeta me ya yekemîn bişkînin.

Bê navber şêv û roj li hember me şer dikirin. Qet navber ne didan ku heval nefesek xwe bigrin. Gava diçin Serzorî jî jixwe roja din diçin dibistanê li ser cenazeyê hevalan nasnameya heval Ciwan û heval Serxwebûn yê YPG digrin. Dîmenên wan jî ketin destê me, bi kamerayê hemû kîşandibûn. Bi rastî jî dîmenê wan de jî hebû, gava diçin li ser cenazeyê hevalan jî gelek bi tirs diçin, mirov dizane ku ji cenazeyên hevalan jî ditirsin. Jixwe hevalan jî gotibûn *"em ê wisa bikin ku, ew, cenazeyên me jî bitirsin."*

Piştê vê şer dikeve merheleya duye mîn. Xeta yekemîn şikest, giranî li ser xeta duyemîn hate kirin. Wê demê di eniya rojava, qulbê û eniya Şehîd Emîn de şer gelek giran dihat meşandin. Bi rastî her rojek weke pirtûkek e. Piştî vê jî di cephê Çerxê de, heya 19-20'ê mehê şer berdewam kir. Di giştî cephê de xeta yekemîn şikest. Piranî me xwest ku em xetekê duyemîn bigrin. Xeta duyemîn jî, dema me xwest em bigrin, quwetekî ew pênc, şeş rojan bê navber bi şev û roj di nav şer de ne. Quwet nehatiye guhertin. Hêz nehatiye guhertin. Her demê eynî quwet e, eynî heval in, eynî kes in. Me xwest xetekê ku em bikaribin qet bernedin çêbikin. Ev xet ji Qeremox û Qişlê gihêşt xeta Başûr û Rojava. Lê xeta Qeremox me berda. Ji ber ku hin kesên weke Kawa reviyan, em neçar man ku wê xetê berdin.

Dema me ew xeta Qeremox berda, xeta din jî ket xeteriyê. Hinek quwetên wan jî li milê Çelebî bûn. Ev quwet hat û 20-30 kilometre piştî me zivirî. Quwet wisa li pişt xwe dihiştin. Teqtîkê wan jî ew bû. Di vê pêvajoyê de bê navber êrîşên wan çêdibûn. Teqtîkê dijmin çibû? Ya me berxwedana sîngesîng bû. Ya dijmin çi bû? Her dixwastin di navberê qût bike û quwetê ji hevdu belav bike. Yek ew bû û ya din jî her meşandina şerê bênavber bû.

Piştî ku xeta yekemîn şikest, di xeta duyemîn de yek çalakiya Serzorî bû ya duduyan jî çalakiya Hevalê Baran bû. Van herdu berxwedanan nîşan dan ku berxwedanî heya dawî pêwîst dike. Di vê pêvajoyê de, di girtina xeta duyemîn de me xetek seranserê derdorê Kobanê çêkir. Heya wê demê teqwiye çêbebibû. Piştî 21´ê mehê, 22´ê mehê me bîryar girt ku em vê xetê bernedin. Cepha Rojava gavekî din paşde hatibû. Bîryar hat girtin ku em vê xetê bernedin. Di vê navberê de hejmarekê pir zêde hevalên me şehîd ketin. Pir heval jî birîndar bûn. Quweta ku mabû jî pir westiya bû.

Girek heye li hemberî Kobanê. 15 kilometre ji bajêr dûr e. Hevalê Êrîş tê ser vê girê dinêre, bajarê Kobanê xuya dike. Hevalê Êrîş dibêje "*êdî bajarê Kobanê xuya dike. Êdî di vir de pêwîste gav paşve avêtin nebe. Divê dijmin tenê bikaribe ser cenazeyên me re pêş ve biçin. Wekî Heval Baran û Şehîdên Serzorê. Em dikarin berxwedana wan esas bigrin. Êdî kî cihê xwe berde, xayin e. Em vê xetê divê teqûz bikin.*" Piştî ku me ew xet girt, me dijmin da sekinandin. Êdî xet teng bû, hejmara me jî pir westiya bû. Ji ber ku şer bê navber bû. Pir zehmetî dihatin kişandin.

Dema ku xeta milê Qeremox şikest di vê pêvajoyê de ku me xeta duyemîn girt, gund bi gund, cih bi cih pevçûn hatin çêkirin. Hema me berneda. Her gavekî, li her gundekî, li her cihekî pevçûn çêbû. Her cihê ku lingê me lê ket, teqez me di wê derê de şer kir. Dijmin mutlaqa di vir de windahiyan dida. Bi vê israrê şer hat kirin. Piştî ku em gihiştin vê radeyê, Heval Cudî digot, "*yan em ê rihê Serzorî bidin jiyankirin, yan jî yê ku cihê xwe berde xaîn e."* Şehîd Bahoz digot, *"dervayî vê ti şansekî me yê jiyanê tine ye. Bîryarekê me yê jiyanê heye. Ew jî bîryara Serzorî ye. Pêşengên me ferman dane. Em jî li gorî fermandarên xwe dimeşin. Me fermana xwe girtiye."*

Di vê demê de me grupek heval derxist. Yek, Heval Bahoz bû, fermandarê wê grubê bû. Nêzîkî 10 -15 hevalan bûn. Grupek ku biçe derdorê dijmin bizivire û lêbixe bû. Di vê demê de me xwest ku em vê quwetê jî wekê teqtîkê gerîla bi çalak bikin. Lê ji ber ku şerê parastinê heye; şerê bajêr û çiya û gundan ne wekhev e weke xwesteka me bi giştî pêk nedihat. Ferq û cudabûna wan cewherî ye. Divê di qada te ya manewra de xeta parastinê jî hebe. Da ku tu bikarî bi teqtîkê gerîla piştê bizivirê. Fakat parastina civak, insan û axê cuda ye. Di şerê heremparastinê de tu hin mecbûriyetên te hene. Mecbûrê ku li xetekê sîngesîng jî şer bikê.

-**Taktîkê gerîla kengê pêwîst dike?**

Wextê xetekê te hebe, tu mecbûrê, xeta parastinê çêbikê. Pêşiya vê xetê tu dikarî terzê gerîla bide meşandin. Fakat heta ku em hatin xeta duyemîn, encex quweta me têra çêkirina xetê kir. Di navbera de mesafeyekî pir fireh hebû. Ji ber vê jixwe dijmin di vê navberê de me qut dikir û li pişt hevalan dizivirî. Tabî veya jî psîkolojîyekî pir cuda dida avakirin. Heya wê demê di êrîşên du salan de, her dijmin dihate şikanidin. Vê carê jî piranî hevalên kevin ku vê derê mane şehîd ketin. Hevalên ku tên jî zêde hakîm nînin. Li ser arazî hakîm nînin, li ser teqtîkê şer hakîm

nînin. Derfetên me tune bûn kû em xwe baş jî rêxistin bikin. Li kuderê valahî hebe, hevalên dihatin bi cîh dibûn. Dijmin jî her hêzên xwe diguhertin û êrîşên xwe her didan berdewamkirin. Digotin, "*em ê di roja cejnê de bikevin Kobanê.*" Her teqtîkên xwe didan guhertin. Heta 20´ê mehê xeta me ya yekê neşikest. Dema xeta yekemîn şikest wan teqtîkê xwe guhertin, gotin "*em ê eydê biçin Kobanê û nimêjê li wir bikin.*" Eyd jî 25-26´ê mehê bû.

***-Di wan deman de di êrîşan de jî guhertinek çêbûbû, an jî di berxwedanê de asteke çawa hatibû girtin?***

Di van rojên ku tê behskirin de berxwedana giştî eniyên Kobanê çêbû. Bi hemû çekên xwe yên giran û tanqên xwe êrîş dikin. Dema di şevê de tanq tên, Heval Kurdo heye. Hevalekî ji Nîsêbînê ye, berê di refê PKK ê de bû, ji nav PKK reviyabû. Di serdema seferberiyê de hat car din tevlî bû. Dema tanq tê, tanq dikeve nava hevalan. Hevalê Kurdo çar pênc bombayan bi xwe ve girê dide û diçe pêşiya tanqê. Diçe, xwe davêje pêşiya tanqê û bomba diteqîne. Fedayî ye. Tanq darbe dixwe. Herdu lingên wî jî diçin. Heval dibên, "*Kurdo, em ê werin te xilas bikin.*" Ew dibêje "*Bihêlin, wê niha werin û ez ê xwe di nav wan de biteqînim.*" Di heman wextê de du çalakiyan dike.

Hevalên bi vî rengî jî hebûn. Ên ku xwe davêtin pêşiya tanqan, ji bo ku bidin sekinandin. Hevalên ku mayînê xwe xistine destê xwe û xwe avêtine pêşiya tanqan û hwd hebûn. Gelek hevalên wisa hebûn. Mesela Kurdo çi dike? Ji bo ku psîkolojiya tanqê bişke, xwe dixe çeper, xwe davêje pêşiya tanqê. Ev ne bûyerên normal in. Despêkê bomba davêje biniya tanqê. Wan serî fîşek diavejin, jixwe herdu lingên wî jî birîndar dibin. Dema ku dixwazin careke din werin, bombeyên xwe yî mane dîsa diteqîne û wisa şehîd dikeve. Bi dehan hevalan bi vî rengî lehengtî kirin û şehîd ketin.

Bêguman êrîş dijwartir dibûn. Piştî ku em ketin pêvajoyê xeta duyemîn. Hinek cih hatin girtin. Mesela di xeta Çerxê de bi rastî jî berxwedanek di gundan de hat çêkirin. Di vir de hevalan berxwedaneke fedayî kirin. Yek jî ji wan Heval Nûcan bû. Ew du salê wê bûn di şerê Kobanê de. Her demê di pêş de bû. Bi xwe ji Serekaniyê bû. Dema heval dixwazin gundekî berdin û vekşin gundê piştê, dibêje ku "*Ez pê dihesim ku em tiştekî ne exlaqî dikin. Gotinên hevalên Serzorî di guhê me de ye. Em çawa cihekî berdin? Bêyî ku em bimirin, em çawa cihekî berdin?*" Ew rih hebû. Bê guman kesên ku cuda nêz dibûn hebûn. Hinek kesan ênî berdan. Ev milekî vê ye. Yên ku di nava şer de hevalên xwe di çemberê de hiştin hebûn; fermandarên ku hevalên xwe yên şervanên nû, yên ku nû fêrî şer dibin, hê niha çekan bi kar tînin, sê rojan perwerde dîtine û ji bo seferberiyê hatine, berdan û çûn jî hebûn. Erê berxwedan hebû, lê li hemberî berxwedanê jî hinek kesên ku rihê wan ne di xeta berxwedanê de ne jî hebûn.

Di vê pêvajoya ku şer giran bû de, giraniya şer hate ser eniya Hevalê Êrîş û Hevalan Zozan. Herdu jî fermandarên êniyê bûn. Van herdu hevalan cihê xwe bernedabûn û tanqê pêlî cenazeyê wan kiribû. Hejmareke heval li wir bûn, cihê xwe bernedabûn û şehîd ketibûn. Vê yekê jî rihekî cuda ava kir. Piraniya hevalên li wê êniyê şehîd ketin. Tenê 10-15 heval di wê êniyê de man.

Jixwe êrîş di hemû milan de dijwar bûn. Li hemberî wê berxwedaneke dijwar jî hebû. Rast e gund dihatin berdan, lê tû gund bi hêsanî nehatin berdan. Piştî ku xeta me ya duyemîn şikest, berdaneke ji rêzê ya gundan çêbû. Êdî şer nêzikî bajêr dibû. Divê me li derdora bajêr cihokên parastinê çêbikirana. Hê ku me xeta derdorê bajêr xilas nekiribû, di nava 3-4 rojan de xeta duyemîn şikest.

Di wê demê de teqtîkê şer de jî lewaziyek çêbûbû. Jixwe hêvalê Êrîş, Hevala Zozan şehîd ketibûn. Di xeta seyemîn, ango xeta ber bajêr de hêvalê Emîn şehîd ket. Viya hişt ku hevalên hatine jî bikevin xeta ber bajêr.

Şer êdî li Miştenûr û gundên derdora bajêr çêdibû. Hin gundên mezin yên weke Şêranê hebûn. Divê ew gund bihatana parastin. Da ku em bikaribin êrîşên dijmin bişkînin. Di wê demê de koma Botanê gihişt me. Di şexsa Hevala Hêlîn Torî û Viyan de, rihekî fedaî bi wan hevalan re hebû.

Hevalekî Rojhilatî hebû, Hevalê Karox. Ez wî hevalî ti caran bîr nakim. Dema ew heval hat, dijmin gihêştibû ber bajêr. Hevalê Karox seatekê li Kobanê ma, lê di nava wê seatê de tiştên ku gotin û ava kirin pir zêde bûn. Got, "*em tû caran nahêlin ku ew dijmin bikeve Kobanê. Heya ku Kurdek hebe, dijmin nikare bikeve Kobanê.*" Dema Hevalê Karox hat, êvar bû. Li milê Başûr êrîş pir zêde bûn, divê me teqez taqwiye rê bikira. Me nexwest em di heman şevê de hevalê Karox bişînin, ji bo şandinê me komeke din a hevalan amade dikir. Lê Hevalê Karox got, "*heval ji bo me wateya seatekê jî pir cuda ye.*" Cîhazek xwest, bi xwe re 5-6 heval jî girtin û çû. Piştî seatekê şehîd ket. Gelek hevalên weke hevala Helîn û hevalê Karox hebûn, her yek dikarîbûn êniyeke bidin meşandin.

**'Divê ez bi çavên xwe dagirkirina dijmin di Kobanê de nebînim!'**

Di vê pêvajoyê de çalakiyeke herî girîng jî, çalakiya hevala Rêvana ye. Rêvana keçeke ji Kobanê bû. Salek bûbû tevlî têkoşînê bûbû. Piştî lehengtiya Serzorî, çalakiya hevala Rêvana heye. Tiştê ku hişt di Kobanê de rihê fedaî pêş bikeve, yek jî çalakiya hevala Rêvana ye. Gotinên wê yên dîrokî hene, dema ku tanq berv bi Girê Miştenûr ve tên dibêje, "*hevalno divê êdî çavên min nebînin, da ku ez ketina dijmin a Kobanê nebînim.*" Zenûbya jî dibêje, *"divê ez*

*bi çavên xwe dagirkirina dijmin di bajarê xwe de nebînim."* Gotinên wan pir dişibin hev û din. Dixwaze ji bo Kobanê giyana xwe bike mertal. Dema ku dijmin ket Miştenûr, Hevala Rêvana jî li girekî hemberî Miştenûr bû. Wê demê bombeyên xwe digre û çalakiya fedaî dike. Me qanalên axê çêkiribûn, heval ji Rêvana dixwazin ku ji wir re paş ve vebikşe. Lê Hevala Rêvana dibêje, *"ez ê çawa gaveke paş ve biavêjin, êdî ne mejiyê min, ne jî wîjdana min qebûl dike. Ez ê berê xwe li hemberî dijmin nezivirînim."*

Foto-39

Di vê mijarê de ez dixwazim rexnedayina xwe bidim. Lewma me nikarî em hevala Rêvana pir zêde bidin nasîn. Ez vê yekê weke deynekî xwe dibînim. Divê di şexsê hevalên weke Rêvana de em dîrokê rast binivisînin. Ji hevalên jin, hevala ku di destpêkê de çalakiya fedaî kiriye hevala Rêvana ye. Ji bo wê rihek hate avakiri. Piştî şehadeta wê, dijmin nikarî were ser cenazeyê hevaleke jin. Beriya wê dijmin dihate ser cenazeyê hevalên jin, şikence cenazeyê wan dikir. Lewma dema ku çalakiyê dike, teqtîkekê dide meşandin. Di hundirê cihokê de weke ku şehîd ketibe xwe dirêj dike, dema ku dijmin dixwaze were ser cenazeyê wê, xwe di nav wan de diteqîne. Nîşanî dijmin da ku nikarin nêzikî jinê bibin. Êdî tû kes nikare bi rehetî were ser cenazeyê jinên Kurd. Bi van sedeman, çalakiya hevala Rêvana pir bi wate ye.

Bi awayekî giştî piştî şehadeta van hevalan, her çiqasa dijmin gihêştibe ber bajêr jî, di dijmin de tirsek hate avakirin. Ji bo me jî, hişt ku em bi awayekî rastir ber xwe bidin. Ew bîryarbûn derxist holê.

Li Helincê jî şehadeta hevalê Emîn çêbû. Ew jî pir girîng bû. Hevalê Emîn, fermandarekî ku ji destpêkê ve di nava berxwedana Kobanê de bû. Li kuderê fîşegek teqiyabûya, Hevalê Emîn li wê derê bû. Di berxwedaniya Kobanê de, risteke mezin a Hevalê Emîn hebû.

Foto-41

Piştî ku dijmin gihêşt Miştenûr, 3 rojan di Miştenûr de berxwedanî hate kirin. Jixwe ew bîryara dijmin ku digot, "*em ê di cejna qurban*ê *de di nava Kobanê de nimêj bikin"* vala derketibû. Nêzikî 20 rojan bû berxwedaniyeke pir mezin hebû. Bi taybetî piştî ku dijmin ket Miştenûr, berxwedaniya Mexdelê û Kaniya Kurdan heye.

Di berxwedaniya Miştenûr de gelek hevalên weke Dijwar, Paramaz, Delîla hebûn. Mesela Hevala Delîla, di wî şerî de risteke pir mezin lîst. B7'a Hevala Delîla bûbû tirsa hundirê dijmin. Li kuderê tanqek bîdîta, radihişt B7'a xwe û direviya pêşiya tanqê.

Di nava vî şerî de gelek lehengên wisa derketin. Dema ku mirov vegotina çîroka wan dike, bandora her hevalek cuda ye. Ji ber ku tanq pir zêde dihatin, wê jî pir zêde B7 diavêtin. B7'a wê weke qileşê lêhatibû. Lewma li hemberî tanqan, tenê di destê me de B7 hebûn. Hevala Delîla ji şehîdên Serzorî pir tesîr bûbû.

Ji wan hevalên şehîdên Serzorî tesîr bûbûn yek jî hevala Roza bû. Hevala Roza û Hevala Nûcan pir bi hev ve girêdayî bûn. Ji ber wê piştî şehadeta hevala Nûcan, Hevala Roza digot, *"divê em nehêlin ku tenê dijminek jî bikeve kolanên Kobanê."* Bi rastî jî fermandareke hêja bû, derdora xwe heval pir tesîr dikirin.

Foto-42

Di vê demê de bûyerên ku em jê encam bigrin jî, berxwedana koma hevala Jiyan bû. Dema ku dijmin Miştenûr girt, Hevala Jiyan di Kaniya Kurdan de bû û got, "*teqez ez vê derê bernadim."* Di şerê eniya Rojhilat de, ji roja destpêkê ve cih girtibû. Ew hevalên li Serzorî şehîd ketin jî, hemû li gel hevala Jiyan bûn. Lewma hevala Jiyan Rojhilat di rêveberiya wê êniyê de cih digirt. Berê jî danehevên wê yên şerê Serêkaniyê hebûn. Dema ku şer hate ber bajêr, digot "*ez di şerê bajêr de zêdetir rehet im."* Lewma şerê bajêr dîtibû û dizanî ku di bajêr de em ê bikaribin pêşiya tanqan bigrin. Ango fikrandina wê her li ser şer kûr bû.

Foto-43

Wê û hevalê Baz digotin, *"ger em van mewziyên xwe yên di bajêr de baş bigrin, dê çekên wan yên giran û tanqên wan bê tesîr bibin û dijmin nikare bikeve bajêr."* Bi rastî jî ger di şerê bajêr de tevdîrên xwe bigrê û çeperên te hebin, çekên giran pir zêde nikarin zirarê bidin te.

Ew qonaxeke girîng bû. Ji destpêka şer ve di eniya Rojhilat de ji 250 hevalan, 30'î heval mabû. Jixwe fermandarên êniyê jî hinek şehîd ketibûn, hinek birîndar bûbûn, lê dîsa jî di nava şer de bûn. Jixwe gelek hevalên

birîndar, heya ku giran birîndar nebin û hestiyên wan neşikên, ji çeperan dernediketin. Lewma derfeteke wisa ku heval biçin û birînên xwe derman bikin jî tune bû.

***-We jî di nava vî şerî de cih girt û bi taybetî mijarên ku hûn dixwazin balê bikşînin ser çi ne?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Tiştê ku em dixwazin balê bikşînin ser, divê ew yek baş were zanîn; mirov nikare bêje hema ji nişkan ve DAIŞ hat û di 2014'an de her cih xist destê xwe. Di Iraq û Sûriye de eşîrên mezin yên Ereban hebûn. Komên çekdar yên ku temsila Ereban dikirin rolê xwe hebûn. Weke Arteşa Azad, Selefî, Tewhid bûn. Rolek mezin yê wan hebû pir bajar di destê wan de bûn. Reqa, Minbic, Bab, Cerablos, Til Ebyat, Sirîn, Dêrezor ev bajar hemû di destê wan koman û hindek eşîrên Ereban de bûn. Ji nişka ve hemû tişt ketin destê DAIŞ'ê.

Di vir de hêzeke navnetewî ya veşartî li pişt DAIŞ'ê heye, îspat bû Tirkiye li pişt e, ji bo wê di Sûriye de DAIŞ zû belav bû û bandora xwe çêkir. Rêka DAIŞ'ê ya çûn û hatinê Sûriye û Tirkiye bû. Tirkiye hemû derfet dida DAIŞ'ê. Ji bona ku di Sûriye de DAIŞ pêş bikeve. Ya rast hedefa Tirkiyê ew bû; statûya Kurdan ya di Rojava de xirab bike bû. Jixwe şerê Serêkaniyê yê despêkê, Efrinê, yê li ber ava Firatê, Girêspî û Kobanê çêbû hemû Tirkiyê destek dikir û cebilxane dida wan koman ji bo li beramberî me şer bikin.

DAIŞ'ê otorîteya xwe bi tehdidê, bi qetliamê çêkiribû; civaka Ereb çavtirsandî kiribû. Mînak li Cerablûsê serê hinekan jêkiribûn û di meydanê de danibûn, dema civak van tiştan dibîne hemen teslim dibe. Li Minbicê eynî tişt kiribûn, ketibû kijan bajarê Ereban, ji bo civakê bitirsîne ev nêzîkatî û şêweyê hovane xistibûn dewrê û bi vî awayî civak teslim girtibûn û hêzên din jî jixwe tasfiye kirin. Yê ku tevlî wan bûn jixwe berdewamiya xwe di nav wan de jiyan kirin, yên ku tevlî jî nebûn qetil kirin.

Vê yekê bi xwe re xeteriyek ji bo Rojava û Kobanê tanî. Me texmîn dikir ku ev rêxistina DAIŞ'ê wê bixwaze derdora xwe tevayî bigre. Li gor vê em ê çawa bikin, teqtîkek çawa bimeşinin, gel çawa biparêzin, mewzîgirtinek çawa çêkin, me ew tişt pilan dikir û xwe amade dikir. Lê ev plan ne di wê astê de bûn ku DAIŞ'ê bide sekinandin.

***-We kengê ferq kir ku ew amadekarî û plansaziyên we kêm in?***

Di nava pêvajoyê şer de derket holê. Mesela şerê me yê despêkê di 10'ê Adarê heya 17'ê Adarê li herêma ofisên genim yê Sirînê despêkir. Ev bû sedem ku em û DAIŞ bi hev re bikevin nava şerên demdirêj. Sedemên vî şerî hebûn, ofisên genim nêzî 50 hezar ton genim têdêbûn, herêma Şexler, Sirîn û Kobanê dişixuland. Her tim ew genim dibirin bajarê Minbicê û dikirin ar, qismek diçû Sirînê, qismek diçû Şexler û qismek jî dişandin Kobanê. Piştî hakimyeta DAIŞ çêbû para Kobanê li ser qût bû. Hêdî hêdî pisgirêkên nan li bajar derdiketin.

Ji bo wê me bîryar girt ku li wir şer bikin û ofîsê bigirin, genim ji wir derxin û derbe li DAIŞ bidin û pêdivîyên gel tedarîk bikin. Ev şer heftiyek berdewam kir, nêzî çar hezar ton genim me ji wir derxist, kuştiyên DAIŞ'ê çêbûn û nêzî 12-13 hevalên me di wî şerî de şehîd ketin. Jixwe hedefek me yê sabît bisekinîn û bigrîn nînbû, ew bû em derbe li dijmin bixin û pêdiviyên qut tedarîk bikin bû.

Ev şer di warê polîtika de jî diyar kir ku amadekariyên me kêm in, lê em hêzeke ku li hemberî DAIŞ'ê dikirin şer bikin in. Ji ber di herêmê de heya wê demê tu kes li beramberî wan şer nekirîbû. Jixwe herêm hemû bê şer xistin destê xwe, tû koman li hemberî wana şer nekirin. Dema ditîn me li hemberî DAIŞ şer kir û serxist fêmkirin ku ji derveyî DAIŞ hinek din jî hene û dikarin şer bikin. 2014, nêzî Newrozê dibû, şerê Evdokê heya gundê Kendalê derket. Li wir hevalê Hebûn şehîd ket bi vî awayî êdî li beramberî DAIŞ'ê cih cih şer derdiket.

Ev şer bû wesîle ku em ji nû ve xwe tenzîm bikîn. Ji ber şerên bi komên din re, ne weke şerê DAIŞ bûn. Di warê êrîşê de, bi karanîna teknikan de jî ji komên din cuda bûn. Ji ber wê me ji nû ve mewzî çêkirin. Qadên ji hev qut ku em têdebûn mewzîgirtina wan xurt kirin û ji bona hevdu biparêzin xeta wan hate yekkirin.

Di vê demê de xwendekarên Kobanê ku li Heleb'ê dixwendin, dixwestin biçin ezmûnên xwe. Me texmin dikir wê DAIŞ wan birevîne, me nedihişt biçin, malbatên wan israr kirin û wekaleta wan girtin ser xwe. Di navbera Kobanê û Helebê de li derdora bajarê Minbicê hatin girtin. Nêzî 180 kes bûn DAIŞ'ê li hember me dan şûxilandin. Rehînê wan li gel me hebûn, wan hewl didan ku em bi hevdu biguherin. Me qebûl kir. Pişt re pir pisgirêk derketin, malbatan em muxatap digirtin, pir bi ser me de dihatin, ji bona em rehînan berdin û jî zarokên wan xilas bikin. Piştî hevdîtinên du alî yên bi DAIŞ'ê re bîryar hat girtin ku em rehînan berdin û wan jî xwendekaran berdin.

Me rehîne birin nêzî Sirînê cihê ku em bi hevdu biguherin. Piştî me meyze kir di holê de teqezî nîne, xaîntî heye, wana xwe amade kirine ku qomplo bikin, me îmha bikin û rehînan bigrin; dema me agahî girt ku xwendekar ne anîne amadekariyên komployê kirine, pevçûnên biçûk çêbûn, me rehîne şûn ve anîn Kobanê. Me fêm kir ku xwedî li sozên xwe dernakevin. Jixwe em ne alîgirê vê bûn ku quwetên leşkerî û sivîl bi hevdu bên guhertin. Me dixwest hinek hevalên me yên berê ketine destê wan û hinek kesên ku aqubetê wan nediyar, bidin guhertin. Gel

em mecbûr kirin ku xwendevanan bi rehînan bidin guhertin. Jixwe demek dirêj ev xwendevan di destê wan de man.

Em ber bi Newroza 2014'an dihatin. Li beriya Newrozê bi sê rojan hinek hevalên me şehîd ketibûn, lê belê me tedbîrên ewlekarîyê di derdorê bajar de û di hinek rêkan de girtin, me bîryar da ku em Newrozê jî pîroz bikin. Me texmîn dikir ku wê DAIŞ bixwaze di hindek cihan de vedizîne bike. Di encamê de li ser riya Helebê otobusek ya rêwiyan hebû, ji berî Newrozê DAIŞ'ê li Minbicê girtibû, ji Helebê dihatin. Di roja Newrozê de van ew otobûs tev rehînê tê de berdan. Dema berdan me texmîn kir lîstikek di vir de heye, ji bo wê di ketina Kobanê de di asayîşa yekê de hevalan otebûs sekinand û hemû rêwiyên tê de jê anîn xwar û lêgerîn kirin. Di otobûsê de nêzî 500-1000 kg teqemenî bi cih kiribûn û dixwestin li Kobanê di Newrozê de biteqînin. Hewldanên wan bi vî awayî vala derketin. Di Newrozê de pisgirêk derneketin û cejn hat pîrozkirin.

Di 15'ê meha Îlonê de êrîşa mezin ya DAIŞ'ê destpê kir. Êrîşan di sê aliyan de destpê kir, tedbîrên me kêmbûn. Di asta teqtîk de jî me hîn zêde şerê mewziyan, şerê eniyan dimeşand. Terzê kozikan li hember hêzeke ew qesa mezin û bi teknîkê têrûtijî şaş bû. Pêwîst bû gava şer destpêkirî, hinek teqtîkên gerîla, yekîneyên bi tevger me bixistana dewrê.

Êrişan di Başurê Kobanê de di xeta Sirînê, Cerablûs, Şêxler, Girêspî û Reqa de despêkirin. Êriş di sê aliyan de bû, lê her aliyek bi kîlometroyan qad digirt nava xwe. Şerê despêkê li xeta Sirînê li derdora riya Helebê çêbû, riya ku ji Kobanê diçe li ser pira Qereqozax, gundên Kurdan yên weke Qumçiyê, Aşmê, Toreman, Kun Heftar hebûn.

Di 5'ê meha Cotmehê de DAIŞ'ê Miştenur girt. Danê êvarê derdora demjimêr sê bû. Miştenur li ser qadê hakîm bû. Li ser sê rêyên girîng hakim bû; riya Girêspî, Reqa û Helebê. Ev cih sîlsîleyek dirêj e. Li gor deştê bilind e. Hakîmiyeta xwe li ser bajêr; ji milê Rojhilat û Başûr ve pir zêde ye. Miştenur di heman demê de parastina bajêr jî dikir. Di heman demê de girê Kaniya Kurdan hebû, dema ku DAIŞ'ê Miştenur girt, em li wir bûn. Miştenur li ser me hakîm bû, kîlometreyeke nêz bûn. Miştenur dikeve Başurê bajêr, Girê Kaniyê dikeve Rojhilatê bajêr.

Cihokek li derdora bajêr hebû, lê baş nehatibû çêkirin, di gelek aliyan ve rê dida ku erebeyan derbas bibe. Hevalan di wê derê de şerekî pir dijwar kirin, 4-5 rojan nedihiştin dijmin derbas bibe. Piştî Miştenur ket ji ber li ser wê cihokê hakîm bû, heval mecbûr man berdin. Jixwe pir zêde ji Miştenur li Girê Kaniyê xistin. Bi topan, hewanan, doçqan, qatuşan, tanqan lêdixistin. Di wî girî de penc hevalên me birîndar bûn, sê hevalên me şehîd ketin. Em mecbûr man Girê Kaniyê berdin.

Jixwe di pişta gir de mal hene, hevalan beriya şer bikeve bajêr ew mal kûn kirîbûn. Hema hema malên derdorê bajêr hevalan hemû ji bo haziriyê şer amade kirîbûn. Piştî Miştenur ket, xeta Rojhilat û xeta Başûr jî ket, tenê Rojavayê Kobanê milê Cerablûsê ma. Li wir dar hene, weke daristaneke ye, ji bo wê wir neket û hevalan cihokê neberdan. Li wir jixwe êrîşên pir dijwar nekirin, heyanî îstasyona radyolîk hatin û heyanî gundên Elpelor, Mezrê, Kitkanya girtin û pêşdetir nehatin.

Car caran bi çekên giran li Kobanê dixistin, wekî din pêş ve nehatin. Heval di girê Til Şeîr de bûn, ew jî di wê xetê de ye, jixwe gundaniyan erebe û sewalên xwe li wir sekinandibûn, sînorê Tirkiye bû. Nêzî 3-4 hezar insan li wir kom bibûn, nedixwestin biçin Tirkiyê. DAIŞ'ê çend caran hewldan kirin ku gir ji hevalan bigirin, sitandin lê belê disan hevalan ew gir ji wan vergirtin. Car caran Girê Til Şeîr dest diguhert. Tepêyên wisa bûn ku di girtinê de hêsan bûn, ema di parastinê de zehmet bûn. Ew gir girîng bû; lewma ji bo gelê ku ji bajêr derketiye weke navendeke parastinê bû. Me nedixwest em berdin, ger me berdaba wê qetlîam çêbûna.

Di xeta Minazê de bi awayekî dijwar pevçûn çêdibûn. Ew jî di Rojavayê Kobanê de ye. DAIŞ'ê hewl dida ji wir re bikeve bajêr. Lê di wir de jî nekarî bikeve bajêr. Di encamê de di xeta Rojavayê Kobanê de DAIŞ nekarî bikeve Kobanê. Di xeta Başûr û Rojhilat de ket bajêr. Di riya Heleb û Miştenur, Girê Kaniyê, Mizir Dewrê, xeta Helincê de weke xelekekê kete bajêr. Heya wê demê şer bi pevçûnên nav gundan, bi pevçûnên di nava deştê de, bi çalakiyên vedizînê û şerê êniyê dihat meşandin. Êdî şer ketin nav bajêr. Ji vir û pê ve şer êdî bû şerê bajêr.

***-Ji bo şerê 15'ê Îlonê hûn bi nêrinên çi awayî dikarin wê berxwedanê vebêjin?***

**ÎSA KOBANÊ:** Bêguman şerê 15ê Îlonê pir tişt di vê derê de da guhertin. Beriya şoreşê gelek mirovan debara xwe dervayî welat dikirin, lê gelekên wan ji ber xebatên şoreşê neçûn derva. Hem tevlî xebatan bûn, hem tevlî şer bûn. Ji ber vê divê tevlêbûna gelê Kobanê, mirov di asteke jor de binirxîne û wisa qebûl bike. Şerê DAIŞ'ê jixwe pir cuda bû. Hevalên ku di qadên leşkerî de mane û rêvebiriya bajêr de cih girtine, jixwe gelek tişt vekirine. Hêz û derfetên me çi bûn, êrîşên DAIŞ'ê di çi astê de bûn, heval dikarin berfirehtin bînin ziman. Lê ez dixwazim bi xetên stûr çend tiştan bibêjim.

DAIŞ'ê li Sûriye hawayekî pir giran çêkiribû. Nîvê xaka Sûriye di destê wan de bû. Êrîşî Mûsûlê kirin, arteşa Iraqê di rojekê de radest bû. Li Mûsûlê 70 hezar leşkerên Iraqê hebûn. Mûsûl girtin, Tîgrît û Selahadîn girtin. Heya Kerkûkê çûn. Hin navçeyên Kerkûkê jî girtin û ji ber bi Mexmûrê ve çûn. Kêm mabû bigihêjin Dûhokê. Ji aliyêkî ve jî

berê xwe dabû Bexdayê. Ne tenê di nava gelê Kobanê de, di hemû cîhanê de hawa û derûniyek ava kir. Weke ji Cengîz Xan û ji Moxolan xirabtir hate nirxandin. Dikeve kû xirab dike, dişewitîne û qir dike. Ew ne derûniyeke xwezayî bû.

Piştî ew êrîşên Iraqê çêbûn û pêş ve çûna DAIŞ'ê çêbû, di Tirmehê de êrîşî Kobanê kir. Ji milê xeta Rojhilatê û xeta Başûr ve êrîş kir. Ew êrîş hatin şikandin. Dema ku paş ve zivirîn gotin, "*qet dilê xwe xweş nekin. Em ê biçin Tepqa bistînin, piştî mehekê din em li vir in.*" Ew li ser cîhazan digotin. Ango digotin, em ê bi amadekariyeke mezintir werin. Di tebaxê de êrîşa wan ya Şengalê bû, ger bi mûdaxaleya gerîla nebûya ne gengaz bû ku hêzeke din wan bide sekinandin. Ne arteşa Iraqê, ne jî Sûriye dikarî. Bi hêza gerîla li Şengalê hatin sekinandin.

Careke dîtir li milê Iraqê êrîşên xwe berdewam kirin. Lê di vê navberê de ew hêza ku li Mûsûlê bi dest xistin, hêdî bi hêdî gihêşt navenda wan. Berê xwe dan Sûriye; xwestin Teqba bigrin, lê nikarîn. Vê carê berê xwe dan Reqa. Li Reqa firqaya 93'emîn ya rejîma Sûriye hebû. Quweteke mezin ya leşkerî bû. Çend maşîneyên bombebarkirî di dîwarên wê de teqandin û çend seriyên jê kirî avêtin nava leşkerên rejîmê, qûdûmên wan şikestin. Hemû reviyan, yên mayî jî hatin kuştin.

Piştî wê ber bi Kobanê ve hatin. Di navbera Kobanê û Reqayê de, Eyn Îsa heye. Tabûra zirxî ya rejîmê li wir bû. Wan digot, "*em ê li hemberî DAIŞ'ê ber xwe bidin.*" Hin hevdîtinên me jî bi wan re çêbûn. Me bi israr got, "*li hemberî DAIŞ'ê hûn nikarin ber xwe bidin.*" Rastiyeke leşkeran hebû, li hemberî DAIŞ'ê nedikarî şer bike. Hevalan jî nedixwestin ku bi şer êrîşî wir bikin û ji destê rejîmê derxin. Lê me baş dizanî ku ger amûrên leşkerî yên li wê derê bikevin destê DAIŞ'ê li ser Kobanê xeteriyeke mezin çêdibin.

DAIŞ'ê êrîşî Eyn Îsa kir û di rojekê de standin. Weke ku me berê tespît kiribû, li wê derê 33 tanqên rejîmê hebûn û ketin destê DAIŞ'ê. Lê piştî ku DAIŞ'ê ew girtin, rejîmê bi teyareyan lêxistibûn û hinek tanq îmha kiribûn. Lê herî kêm 10 tanqên sax ketin destê DAIŞ'ê, jixwe li Mûsûlê jî hinek ketibûn dest. Bi wê hêzê ber bi Kobanê ve hatin.

Di 15'ê îlonê de dest bi êrîşê kirin. Bi awayekî fermî di destê me de malûmatek di derheqê hêza DAIŞ'ê de tine. Lê malûmata ku me ji derdorê girtiye, digotin 8 hezar endamên wan hene û di destê wan de 40 tanq hene. Jixwe bi çend eniyan re êrîşan destpê kir. Bi wî rengî qademe bi qademe êrîşên xwe berdewam kirin. Wan hefteyek mûhlet dabûn xwe, da ku Kobanê bigrin. Lê piştî 20 rojan ketin Kobanê. Di 5'ê cotmehê de Girê Miştenûr ket.

Beriya Reqa, Minbic û Cerablûs standibûn. Dema ku Reqa jî standin, ew komên girêdayî Arteşa Azad ref bi ref direviyan û xwe radestî me dikirin. Têkiliyên wan bi Tirkan re jî hebûn. Bi vî rengî derbasî Tirkiye dibûn. Jixwe çekên xwe yên giran cihê şer hiştibûn, yên biçûk jî diavêtin. Yên ku li gel me man ji Cerablûsê eşîrek bû. Di Cerablûsê de li hemberî DAIŞ'ê şer jî kiribûn. Ji wan komek li gel me bû.

Komeke bi navê "*Rizgarkirina Reqa*" hebû, ji Reqayê hatibûn. Serokê wan Ebû Îsa bû. Di dema şerê Girêspî de, komeke herî zêde bi me re şer kir, ew kom bû. Lê dema ku bi DAIŞ'ê re şer kirin û xwe spartin me, derbasî Tirkiye nebûn, li gel me man. Gotin, *"me berê şerê we kiriye, lê em dixwazin li gel we bimînin û li hemberî DAIŞ şer bikin."* Topeke wan û doçqayeke wan ya 23 jî hebû. Doçqayên me hemû 12 û nîv bûn. Çend heb jî 14 û nîv hebûn. Ango çekên me yên giran ku em li hemberî tanqan kar bînin, tenê ew top û doçqaya bû.

**3-Şerê Nava Bajêr**

***-Piştî ku demeke dirêj şer li derdora Kobanê çêbû DAIŞ ket nava bajêr û ew berxwedaniya ku weke 'destana sedsalê' tê bi navkirin hate jiyîn. Dema ku DAIŞ ket nava bajêr rewş bi çi rengî bû?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Piştî 5'ê Cotmehê şer ket bajêr. Ji berîya vê di 5-6'ê Cotmehê de li her derê Kurdistanê, bi taybetî li Bakurê Kurdistanê gel rabû ser piyan. Qehremantiyek pir mezin gel kir. Bi sed hezaran mirov berê xwe dan sînorê Kobanê û Pirsûsê. Jixwe beriya ku bikevin bajêr, gelê Bakurê Kurdistanê sînor rakir û derbasî Kobanê bû. Wî gelî mesaj di vî şerî de dida; digotin, "*em hemû li pişt we ne û heya dawiyê li dijî DAIŞ'ê em ê li cem we cihê xwe bigirin û şer bikin.*"

Gelê Kobanê yê ku koçber bûye, nêzî 200-250 hezar insan li sînorê Surucê bûn û li tevahî Bakurê Kurdistanê belav bibûn û gelê Bakur li wan xwedî derket. Pêdiviyên wan yên jiyanî hemû tedarîk kirin. Viya tiştekî pir bi watedar bû. Gelê Sûrûcê fedakariyek pir mezin kir, xwedî li wî gelî derket, nehişt ew gel perîşan bibe. Di vê hêlê de yekîtiyek pir mezin derket holê. Gelê Bakurê Kurdistanê Rihê welatpareziyê asta herî jor da nîşan da. Gelê Bakur mesajekî pir mezin da cihanê; gotin, "*ev gel yek e û yekitiya wan xurt e.*" Dema şer destpêkirî ew gelê ku ji Bakur hatibû Kobanê hinek ji wan man û tevlî seferberiyê bûn, tevlî şer bûn.

Wê demê nêzî hezar ciwan ji Bakur tevlî seferberiyê bûn. Pir heval ji wan şehîd ketin di şerê Kobanê de. Ji her derê Bakurê Kurdistanê hatibûn. Ji Serhad, Amed, Colemêrg, Riha, Muş, Dêrsim ji her bajarekî Bakurê Kurdistanê

hatibûn tevlî şer bûbûn. Heta civakên cuda jî dihatin tevlî dibûn. Rexmê ku tecrûbeya wan ya şer nebû jî fedakarî û qehremaniyeke pir mezin kirin.

Şer êdî ket bajêr. Hêza me ji bona ku xetekê di bajêr de çêke hindik bû. Banga Rêbertî ya seferberiyê ji bo Kobanê hişt ku gel giraniyeke mezin bide Kobanê. Gelek taqwiye hatin. Piştî ev quwet hat pêşveçûnên DAIŞ'ê yên di hundirê bajêr de sekinîn. Êdî xeteke DAIŞ û xetekê jî heval diman di nava bajêr de. Di mesafeyek pir kin ya 20-30 metro de pevçûn çêdibûn. Di vê wextê de DAIŞ'ê êrişên xwe ti caran nesekinandin. Êrîşên wan heya 28'ê Mijdarê dewam kirin. Bi awayekî dijwar êrîş dikirin û maşîne diteqandin. Di 28'ê Mijdarê de ji sê aliyan ve êrîş kirin. Jixwe piştî wê êrîşê DAIŞ'ê nikarî êrîşan dar bixe.

Di wir de nêzî 60 erebe teqandin. Bi dehan kesan xwe di wî şerî de întihar kirin. Feqet rexmê viya hevalan mewziyên xwe bernedan. Dema despêkê êrîş kirin, teqînên mezin çêkirin. Li ser riya Çilûheştan du makine teqandin. Di hêla Kaniya Kurdan de kamyonek bombebarkirî di asayîşê de teqandin.

Di şerê despêkê yê di nav bajêr de pir heval şehîd ketin. Berpisyarê asayîşê heval Şoreş şehîd ket. Heval Diyar di wan êrişan de şehîd ket. Gelek heval birindar bûn. Milê Kaniya Kurdan girtibûn, heya taxa Gumrikê hatin. Şaredarî xistin destê xwe, di hêla çand û hûnerê de qada Azadî xistin destê xwe. Wisa xeteke ku bajêr bike du parçe xistin destê xwe. Ji hêla Rojava û Rojhilatê ve gelek cih bi dest xistin. Heval jî di Kaniya Mûrşîdê de mabûn, hinek li derdora qada Azadîyê, çand û hûnerê, belediye heyanî tê camîya Hecî Reşîd di hêla Rojava de heval hebûn; di xeta çil û heşt de, Emin Eskerî de li wê xetê heval bicih bibûn.

Ji bo ku DAIŞ vê xetê bişkene her êriş dikir. DAIŞ'ê pir çete anibûn, dema despêkê êrîş kirin nêzî 8-9 hezar çete hebûn. Jixwe dema ku şer qediya, nêzî 30 heb tanq hatin îmhakirin. Hamir û tanqên ku li Iraq'ê Sûriye xistin destê xwe hemû di bajêr de kardianîn. Pir tûp diavêtin. Wan ev tûp çêkiribûn. Roj nebû 200-300 ji van tûpan neavêjin. Li bajêr dixistin, qadên ku heval tê de hakîm bûn dixistin. Bi vî awayî şer pir dirêj kir. Şerê bajaran me nekiribû, bê tecrûbetî hebû, tenê hinek heval di şerê Helebê de mabûn, tecrûbeya wan pir baş bû ji bo şerê Kobanê. Perdekirina soqaqan, diwar kûn dikirin lê li ber nedisekinîn. Berê heval li ber disekinîn, me pir birîndar û şehîd bi wî awayî didan. Li pişt diwaran torbeyên axê didanîn. Di şer de di warê parastin û teqtîk de rolê wan pir bû.

Jixwe hêza wan ya ku hatibû Kobanê, hemû pirofesyonel bûn, ji welatên xerîb bûn, di cîhazan da me gohdar dikir, bi yanzde zimanan diaxifîn. Erebî, Kurdî, Tirkî, Çeçenî, Rûsî, Îngilîzî, Firansî û hwd dişixulandin. Endamên wan ji Misir, Tunis, Libya, Çeçenîstan, Bexda, Ewropa dihatin. Di hemû cihên stratejîk de sekvanên xwe bi cih kiribûn. Komên wan yên êrîşê cudabûn, komên întiharê cudabûn.

**-Di nava van rojan de Serok-komarê Tirkiye Erdoxan got, "Kobanî ket, an jî ber ketinê ye." Alîkariyên AKP'ê yên ji DAIŞ'ê re, li ser we tesîreke çawa dikir?**

Tirkiye jî dixwest di şerê Kobanê de me bişkîne. Hesabê wan bi vî awayî bû, ji bo wê Erdoxan digot *"Kobanê ket û wê bikeve."* Dema dit ku Kobanê nakeve, berxwedanek mezin heye, ji derve jî gelê Kurd, tevayî pişgirîyê dike, hemû êrîşên DAIŞ'ê bi ser nakevin, xwestin ew koma Arteşa Azad bişînin. Jixwe yê ku şerê Kobanê kordine dikir Arteşa Tirkiyê bû. Di wê demê de serfermandarê Tirkiye Hulusî Akar li ser sînor li Urfayê, Akçakale, Sûrûc û di xeta Birecikê de bû. Wan û DAIŞ'ê şer bi awayekî kordîne dimeşandin.

Di girtina Musulê de jî destê Tirkiye hebû. Digotin konsolosên Tirkiye dîl hatine girtin, ew hemû çîrok bûn, bi hevdu şêwirandina Tirkiye û DAIŞ'ê hebû. Jixwe ew dîlên Tirkiye li Girêspî teslîmî Tirkiye kirin. Di şerê Kobanê de jî mirov bibêje tenê hêza DAIŞ'ê hebû, wê şaş be. DAIŞ'ê hêzeke pir xurt ya leşkerî, siyasî û lojîstîka xwe ji Tirkiyê temîn dikir û her tişt jê re dihat şandin. Ji bo wê Tirkiyê dixwest Kobanê bikeve. Tirkiye di Rojava de statûya Kurdan qebûl nedikir û niha jî qebûl nake. Ku Kobanê bişkê wê DAIŞ berê xwe bide Efrînê, Cizîrê û bi vî awayî statûya Kurdan ya li Rojava wê ji holê rabe. Kurd wê têkevin rewşa berê û di qetlîamekê re derbas bibin. Mînaka wê ya li Şengalê berbiçave.

Di aliyê din de jî ji bo Tirkiye nebêje ez alikariya DAIŞ'ê dikim, deriyê sînor vekirî bû. Pêwistiyên bingehîn ya jiyanî di wir de dihatin tedarik kirin. Çûnûhatina birîndaran serbest kirîbû. Ew jî ji ber ku bertekên navnetewî hebûn. Ema disa jî di gelek cihan de birîndarên me dereng dibirin, pir hevalên me di wî deriyê sînor de şehîd ketin, ji ber direng dihêlan. Ne dihiştin ambûlans ji Pirsûsê were, mijûl dikirin.

Ji xwe pişt re eşkere bû ku li ser sînor bi DAIŞ'ê re hevdîtin çêdikirin. Hevdîtinên wan pir xurt bûn. Di şer de sûbayên Tirkan yên faşîst hebûn, şer qordine dikirin. Pir caran li ser cîhazan bi hevalan re diaxifîn, heval tehdît dikirin û şerê pisîkolojîk dimeşandin û fîîlî di nav şer de cihê xwe digirtin. Yan jî ne gengaz bû ku DAIŞ bêyî desteka Tirkiye şerekî ev qasa mezin bimeşîne.

Şer piştî hatina pêşmergan, piştî hatina Arteşa Azad dewam dikir. Di êrîşên bajêr ku pêşketin de, despêkê li cem me hinek komên Arteşa Azad hebûn, wan jî di şer de cihê xwe digirtin. Weke koma Siwar Reqa, di şerê Kobanê de hinek ji wan man. Feqet dema êrîş dijwar bûn piraniya wan reviyan çûn Tirkiye. Komek pir biçûk ma.

Komên Şems el Şîmal man, hinek ji wan heya dawiyê man. Lê van koman, gava ku çûn, ji bona çekê xwe nedin me, hinek doçqa, qilêş, bîsivingên wan hebûn. Xistibûn bin erdê, veşartibûn. Hinek erebeyên wan hebûn, ji bona nedin me û em kar neyînin tekerê wan hemû teqandibûn. Niftê wan bi xwe re biribûn û qûntaxên wan vekirîbûn û xirab kirîbûn. Halbûkî 2013'an hatibûn cem me, salek zêdetir bûn ji Reqa reviya bûn, ji ber DAIŞ'ê reviyabûn û hatibûn xwe sipartibûn me, li cem me diman. Dema ku êrîşên dijwar çêbûn wan li ber xwe nedan û piraniya wan çû Tirkiye. Çend heb man li gel me heya dawiyê.

***-Şerê nava bajêr di vê demê de bi çi rengî berdewam dikir? Piştî ku DAIŞ di bajêr de hate sekinandin, we tektîkeke çawa pêş xist?***

Di vê demê de şerê bajêr her ku çû dirêj kir. Di vir de hevalan hêdî hêdî teqtîkê şerê bajêr wê çawa be, em ê çawa encam bigirin, em ê çawa pêş ve biçin, wê çawa serkeftina hemlê di destê me de be, ya teqtîkî di destê me de be, wê çawa înîsîyatîf di destê me de be, bi demê re tecrûbe çêbûn. Piştî mehekê dema me di hundirê bajêr de şer kir, ev guhertin û lêhurbûn di me de xwe dan pêş. Di meha despêkê de tevahî însiyatîf di destê DAIŞ'ê de bû. Piştî mehekî hem bi hatina qûwetên teqwiye û hem jî bi girtina tecrûbeyên şerê bajêr, çareserbûna pisgirêkên cebilxanê, ferz bû ku êdî em pêş ve biçin.

Di teqtîk de ne xwûlikarî me jiyan dikir. Yanî em ê çawa pêş ve biçin, çawa mewzî bigirin, çawa mewzî çêkin, çawa parastin were kirin, çawa ceper werin girtin, çawa DAIŞ'ê bişkênin, çawa êrîşan vala derxin? Di van mijaran de me bê teqtîkiyeke pir zêde jiyan dikir. Ne diqatkirin hebû, jixwe hevalên me piranî bi sûîkastan şehîd ketin, birîndar bûn. Di êrîşan de pir heval şehîd neketin. Ya vekirî hereketkirinê de heval şehîd diketin, dema kolan qût dikirin şehîd diketin; yan jî erebê xwe di wan de diteqandin û şehîd diketin.

Dema mirov van bi tevahî bigire dest derdikeve holê ku ji bêteqtîkiya me ve eleqeyê xwe heye. Viya bi xwe re pir qeyîb anîn. Sedema ku bi sedan şehîd û birîndar çêbin ev bû. Ecemîtî, tecrûbesizî, bêteqtîkî û çûna şer de terzekî belave, terzekî ji şehadetan re vekirî ew bû sedem ku evqas qayîb çêbibin. Ez dikarim vê rihet bêjim, wê demê ger me baş derdorê bajêr tedbîr bigirtana, mewzîgirtin baş çêbana, dibe ku tevahî gundên Kobanê ketibana jî bajar nediket destê wan. Wê demê di derdorê bajêr de qûwet wisa xurt ketiba çeperan, parastina bajêr baş bihata girtin, cihokeke baş çêba, li gorî wê mewzî baş çêbana, quweteke bi tevger di araziyê de çalakî bikirina, di pişt de li DAIŞ'ê bixistana, li DAIŞ bizivirîna, çalakî li pişt bajêr bikirina ne gengaz bû ku DAIŞ bikeve hudirê bajêr. Ji ber van tiştan çênebûn, DAIŞ ket hundirê bajêr.

**Hêzên koalisyonê xwestin bibin hevparê vê berxwedana dîrokî...**

**-Dema ku şer gihêşt nava bajêr, plana we çibû? Ya duyemîn jî, hemû cîhanê kêlî bi kêlî şerê Kobanê temaşe dikir. Li gel vê helwesta koalîsyona dijî DAIŞ'ê, di alîkariya YPG'ê kirinê de xwe giran dikin, hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

**MEHMUD BERXWEDAN:** Bîryara me jî ew bû ku heta malek jî hebe em ê li bajêr şer bikin. Me li gorî wê tevger kir. Helbet di vê pêvajoyê de hem gelê me yê li Bakur li Sirûcê û li derên din, bi taybet jî dinya hemû rabû ser piyan. Her kes ji bo Kobanê seferber bû. Di serî de Sirûc û Bakurê Kurdistanê seferber bû. Başûr û Rojhilat, heta Ewrûpa her derên Kurdistan û cîhanê destek û alîkariyeke gel ya pir xurt çêbû. 1'ê Mijdarê bû roja Kobanê ya cîhanî.

Mijareke girîng jî nêzîkatiya Koalîsyona Navnetewî ku li dijî DAIŞ'ê xwe îlan kiribû. Di nav wê berxwedana dîrokî de ku ew 40 roj bû berdewam dikir, Koalîsyon bêdeng ma. Qaşo li dijî DAIŞ'ê bû û çeteyên wê li kuderê bin wê êrîş bikira. Esas Koalîsyonê li Kobanê destwerdana çeteyan nedikir. Lê dîtin ku Kobanê bû semboleke berxwedanê ya cîhanî li dijî DAIŞ'ê, mecbur man. Eger mûdaxale nekirana tu wateya wê koalîsyonê jî nedima. Lê ya esas ew bû, piştî ku dîtin Kobanê li ber xwe da û nakeve, li hember DAIŞ'ê berxwedaneke mezin heye, piştre bîryar girtin ku destwerdanê bikin. Ya esasî hêzên koalisyonê xwestin bibin hevparê vê berxwedan û destana dîrokî.

Niha hinek dibêjin; "*Emerîka dest werda Kobanê neket, PDK'ê dest werda Kobanê neket.*" Ne wisa ye. Esas destwerdana wan hebûya wê roja ewil hebûya. Heta 40 rojî wan digot, "*Kobanê wê bikeve.*" Di wê baweriyê de bûn. Heta nêrîna Obama bi xwe jî ev bû. Nêrîna PDK'ê jî ev bû. Kobanê ya ketinê ba, wan destwerdan nedikir.

Nietzsche dibêje, "*mirov ne ku jê hez dikin, lê ji ber ku xwiya bikin li derdora ronahiyê kom dibin.*" Kobanê neket, wan jî xwest li ber ronahiya vê berxwedanê wêneyê wan jî xuya bike.

Piştî ku koalîsyon li Kobanê li çeteyan xist, PDK'ê jî ji bo ku reva xwe ya Şengalê telafî bike û bizivirîne, bîryar da ku pêşmergeyan bişîne Kobanê. Heta Tirkiye ya ku bi xwe plana têkbirina Kobanê çêkiribû, bîryar da ku hin hêzên 'Artêşa Azad' yên girêdayî bi wan ve bişîne Kobanê. Dewleta Tirk, serçeteyekî Artêşa Azad yê bi navê

Abdulcabar Egêdî ku destê wî di xwîna Kurdên Rojava de heye û gotibû, *"em ê li Rojava PYD tune bikin"* bi lez û bez ji milê Helebê anîn. Tev cebilxane derbasî milê Tirkiyê kirin û beriya pêşmerge werin wan ew anîn Kobanê.

**-Çima anîn Kobanê?**

Esas weke 'Hespê Trûwa' fikirîn. Hizirîn "*em ji hundir de vê yekê bikin baş e, îstîxbarat bigrin, agahî bigrin baş e.*" Yek ev û ya din jî ku Kobanê rizgar bû wê bêjin "*esas tê de Artêşa Azad neba Kobanê rizgar nedibû, Artêşa Azad jî me anî Kobanê.*" Yanî dema têkbirin çênebû, hemu xwestin, xwe bixin hevparê serkeftina Kobanê!

Niha me dikarîbû vê qebûl nekin jî. Me dikarî bigota "*bila Artêşa Azad neyê.*" Berê hindek grûbên Artêşa Azad li gel me hebûn. Gelek berxwedan kirin. Di refên me de sekinîn. Ev 'Siwar El Reqa' dibe, 'Şems el Şîmal' dibe, 'Cebhet El Ekrad' dibe, hinek ketîbeyên din dibin, wan di Kobanê de li gel me dijî DAIŞ'ê şer kirin. Lê ew grûbên Abdulcabar Egêdî heta wê çaxê li dijî me bûn, jixwe esas yê ku DAIŞ destek dikir jî ew bûn.

Piştre ew hatin Kobanê, jixwe tişt nekirin. Yanî hatin li Kobanê di xaniyekî de man heta ku çûn. Li Kobanê guleyek jî neteqandin. Lê me got bila werin, em dikarin wan jî bi rê ve bibin. Eger me qebûl nekirina wê bigotana, "*binêrin, em dixwazin alîkariya Kobanê bikin lê YPG nahêle, esas YPG'ê dixwaze Kobanê bikeve, vaye em dixwazin alîkariya Kobanê bikin.*" Ji bo Pêşmergeyan jî mirov dikare heman tiştî bêje… Wekî din Pêşmerge nê hêzeke êrîşê bû. Hêzeke çekên giran bû. Ne di mewziyên pêş de, bi çekên giran ji dûr ve obûs in, hewan in wisa çekên giran, li cebheya herî dawî datanin û dema pêwîst dikir li pêşiyê, li çeperê çeteyan dixistin.

Helbet taybetmendiyên şerê bajêr û şerê gundan weke hev nabe. Şerê bajêr di nava şer hemûyan de yê herî xeter, yê herî zehmet e. Ji ber ku her kes tercîh nake ku şerê bajêr bimeşîne. Şerê ku herî zêde pêwîstî bi hostatiyê heye. Helbet di pêvajoya ku em ketin şerê bajêr de gelek heval ji weke teqwiye hatin. Weke teqwiye ji Helebê bi qasî 12-15 Heval hatin. Hostatiya wan ya şerê bajêr hebû. Ji ber ku li Helebê hem li dijî rejîmê û hem li dijî çeteyên Cebhet el Nusra û DAIŞ şer kiribûn. Ji bo wê, hostatiya wan hebû. Wekî din Heval ji Efrînê, ji Cizîrê û derên din hatin. Ji Bakur pêl bi pêl ciwan hatin. Jixwe teqtîka me ya berê ew bû ku em di nava bajêr de jî di xetekê de dijmin rawestînin, dijmin nikaribe pêş de were. Heta ev hevalên ku hatine me bi cih kirin dijmin di bajêr de qederekê pêş de hat. Piştî Miştenûr di destpêka bajêr de li gelek deveran şerên giran çêbûn.

**-Bêguman gelek lehengên berxwedana Kobanê hene. Hûn dikarin hinekî qala van lehengên ku bi taybetî pêşengtiya ev serdema ku hûn dinirxînin bikin…**

Hevalên ku pêşengtiya van berxwedanan kiriye Rêber Hekarî bû. Ev Heval jî di pêvajoya teqwiyê de hatibû. Bi rastî bajar nas nedikir. Gelek Hevalên ku hatin fedaî bûn, lê bajar nas nedikirin. Lewre jî gelek birîndar û wendahiyên me ji ber vê çêbûn. Yek ji wan şehadetan piştî ku Miştenûr ket, di taxên destpêkê de Hevalê Rêber bû. Ew jî bi evîneke mezin ji bo teqwiyeya Kobanê hat û ji bo Kobanê li ber xwe bide. Mînaka fermandariya di cihê herî zehmet de şer dike û şer bi rêve dibe bû. Cûdî Sîlopiya dîsa wisa.

Cardin Hevalên sosyalîst yên Tirk hatin û li Miştenûr hin Heval şehîd bûn. Helbet Heval Arîn di destpêka Miştenur de riheki berxwedanê yê pir bilind nîşan da û çalakî li dar xist, şehîd bû. Dîsa Hevala Rêvana… Ev sîlsîleyeke berxwedanê bû ya ku ji hevalan pêk hatiye.

Foto-44 Paramaz Kızılbaş'ın fotoğrafı kullanılacak

Foto-45

Diyar bû ji bo mezinkirina berxwedana di nava bajêr de sîstemek pêwîst bû. Eger te sîstema şer çênekir, te bi rêkûpêkî çênekir, dîsîplîn nebû, girêdana mewziyan bi hev re nebû, hemû mewziyan hev neparastin, cih têne berdan. Ev jî pêşî li xeteriyê vedike. Lewre me di qada Azadiyê ya navenda bajêr de xetek çêkir. Li wir di avahiya Asayişa Kobanê de berxwedanên mezin çêbûn. Di wê berxwedanê de Heval Diyar Bagok şehîd bû. Ew jî di xeta Hevalê Êrîş de ku wî jî heman tiştê Hevalê Êrîş ji bo Kaşê Dolê gotibû, ji bo Asayişê anîbû ziman û bîryardariyek mezin nîşan dabû. Bi rastî jî heta şehîd bû di mewziya xwe de ma û şehîd ket. Dîsa Hevalê Doxan ew jî di asayişa me ya giştî de bû, wî jî di asayişê de berxwedaneke dîrokî meşand û li wê derê şehîd bû. Dîsa ji Hevalên ku wek teqwiye hatin rihekî fedaî û mezin raber kirin û gelek hevalên din jî heman helwest nîşan dan. Dîsa Hevalê Serhed di wê pêvajoyê de şehîd ket.

Foto-46

Piştî ku dijmin kete beşeke bajêr di milê rojhilat û başûr de pêşket. Dijmin dixwest vê teqtîkê pêk bîne; Asayîşê bigire, di ber sînor de bizivire deriyê sînor bigire, di milê Başûr de jî pêş de were milê rojava bigire. Ji milê rojava ve bikevê û wisa ji bajêr jî derdorê bide ber xwe û wisa bajêr bigire. Ya me jî esas di xetekê de dane sekinandin bû. Ji ber vê yekê me di qada Azadiyê de dijmin sekinand.

***-Piştî sekinandina wan, rewşeke çawa derket holê?***

Heta vê derê yanî pêvajoya heta bi qada Azadiyê şerê Kobanê merhaleyek bû. Yanî merhaleyeke ku tim Heval paş de dihatin û tim cihê xwe berdidan. Li qada Azadiyê êdî dijmin nikarîbû pêş de were, çiqas li êrîş bikira jî nikarîbû. Bi hatina teqwiyan re hêzeke nû çêbû. Ji hêla din ve li xwaringeha Seyran jî berxwedaneke dîrokî hate jiyan kirin. Pênc caran ji derveyê bajêr li ser Seyran êrîş çêbû, jixwe tabeleya '*Hûn bi xêr hatin Kobanê'* li vê derê ye. Di dawî de cenazeyên wan li wê derê man. Hevalê Kendal cenazeyên wan danîn ber wê tabelayê! Cebheya ku Hevalê Kendal tê de bû qet lawazî çênebû. Wisa bi berxwedaneke mezin gund bi gund, mal bi mal paş ve kişiya û wisa jî heta wê derê hat.

Helbet aliyên xwe yên gelekî bi êş hene. Gelek Heval teqwiye hatin Kobanê. Wisa bi pir lez mewzîkirina wan çêdibû, ji ber ku li her deverê şer bû. Pir Hevalan Kobanê nas nedikirin, gelek hevalan bi çavê roj Kobanê nedîtin û şehîd bûn. Hin Hevalan li Kobanê avek venexwarin, çayeke Kobanê jî venexwarin şehîd ketin. Wê şevê hatin û di heman şevê de şehîd ketin, birîndar bûn. Yek ji wan jî Hevala Hêlîn Torî bû. Min berê jî ew Heval nas dikir, xwediyê cesareteke mezin bû. Bi heman cesaretê li gundê Gulmet êrîşî ser dijmin kir û li wê derê şehîd bû.

Nêzî 2-3 mehan dijmin nekarîbû qada Azadiyê derbas bikira. Dijmin êdî giraniya xwe da du beşan. Êdî teqtîkeke wisa meşand. Yek, di milê Asayişê û di milê sînor re bi israr derî girtin bû. Yanî wisa difikirîn ku di deriyê Kobanê re alîkarî tê û diçe. Yek jî cihên stratejîk weke cihê hikumeta kantonê û navenda YPG'ê ji xwe re kirin hedef. Dijmin giraniya xwe da van deran lê çiqas êrîş kirin serneketin. Wan jî, ji du milan de di navberê re xetek ji xwe re diyar kirin. Ji milê sînor de weke ku her du bigihênin hev û wisa bajêr bixin. Xeta xwe ya rojava sekinandin. Ji ber ku deşt bû. Pir pê pêwîstî jî nedîtin, jixwe di aliyê başûr de diketin milê rojava jî.

Şevekê êrîşeke çeteyan ya gelek dijwar di cebheya başûr de, cebheya Hevalê Kendal de çêbû û di encam de, di dijmin de şikênandineke mezin çêkir. Dixwazim behsa vê bikim. Dijmin hemleyeke stratejîk kir û xwest ku hem hikumetê û hem navenda YPG'ê yanî cihê bilind bigire. Ji her milî ve êrîş kirin, lê êrîşa herî dijwar li ser van navendan bû. Cara yekê balafirên koalîsyonê çete bombebaran kirin. Di vî şerî de heta sibê nêzî 100-150 çete hate kuştin. Hatin ketin avahiya hikumetê. Heval li qatê duyemîn bûn û ew ketin qatê jêr de. Heta bû sibê hem hevalan û hem balafiran, hemû grûbên çeteyan yên li wê derê tasfiye kirin. Wê çaxê Hevalê Kendal bi xwe çû operasyonê. Bi hevalan ve çû dîwar kun kirin, ketin qatê jêr û bi bombeyan ve çeteyên li wê derê paqij kirin. Cara yekê me di bajêr de nêzî 30 çek rakirin. Cenazeyên wan li wê derê man.

**Rihê berxwedaniyê hevalê Gelhat...**

Foto-47

Di vê pêvajoyê de Hevalê Gelhat hat Kobanê. Hevalê Gelhat weke fermandariya me ya wê derê hat. Helbet hatina Hevalê Gelhat bi me re coşek çêkir. Pir qadên Başur û Bakurê Kurdistanê şer kiribû. Hevalekî ku şer de pijiyabû û xwedî tecrûbeyeke mezin bû. Bi rastî jî bi rihekî pir şerker û berxwedêr xwe tevlî kir. Tevî ku tecrûbeyên wî yên şerê bajêr tune bûn jî zêde nebû pirsgirêk. Di demeke kurt de fêr bû, bi coş û moraleke mezin tevlî xebatê bû, pêşengî kir.

Wekî din hevalên ku ji Helebê hatin roleke pir mezin pêk anîn. Ji grûbên Helebê ku xwe di wê xetê de xwe bi cih kirin yek jî Hevala Destîna bû. Dijmin êrîşê avahiya ku ew tê de bûn kir, ji êvarê heta sibê şer qewimî. Nikarîbûn wê avahiyê bigrin. Di dawiyê de binê avahiyê tije TNT kirin û hemû teqandin. Heval Destîna û hevalên li gel wê bi berxwedaneke mezin li wir şehîd ketin. Hevaleke ji Başûrê Kurdistanê bû û ji Helebê hatî bû. Bi rastî jî Hevalê Hemze, Hevalê Cûdî, Hevalê Agir, Heval Rizgar û gelek Hevalên din ku ji Helebê hatin lehengiyeke mezin nîşan dan. Ev heval hemû li cihên cuda şehîd ketin. Yên ku sîstema şerê bajêr bi me dan naskirin hevalên ku ji Helebê hatibûn bûn.

Şehadeta Hevalê Gelhat jî di wê xeta derî de çêbû û ji bo me pir giran bû. Qebûlkirina şehadeta wî ji bo me pir zehmet bû. Me digot divê hevalekî wisa zû bi zû şehîd nebûna. Divê me biparastana. Wê rojê çete dema ku herî nêzî derî bûbûn. Hema bêje sed metro mabû ji bo bigihîn derî û ji bo me qrîtîk bû. Heval Gelhat ji bo wê ew xetere ferq kir û ji bo ku pêşiya wê bigire bi xwe kete êrîşê.

Di şerê Kobanê de berxwedana Derî dîrokî ye. Bi dehan Heval di we xetê de şehîd bûn. Hevalê Rizgar, Hevalê Xemgîn û Hevalên din di wê xetê de şehîd bûn. Di encam de derî neket. Dijmin pir hewl da wê derê bigre. Berxwedaneke bêhempa ya dîrokî hate raber kirin û derî neket.

Êdî sê meh zêdetir derbas bûn, me amadekarî dikir em êdî ji qonaxekê derkevin bikevin qonaxeke nû. Ew jî rizgarkirina Kobanê bû ku êdî çete nikarin Kobanê bigrin û araziya ku ketiye destê wan em ji destê wan derxin. Êdî em pêş de biçin. Helbet ez vê jî bêjim; dewleta Tirk telefonên me dişopandin û agahiyên me dida çeteyên DAIŞ'ê. Mînak, roja ku ji me re teqwiye dihat, hevalên nû dihatin, heman rojê êrîşên dijmin dijwartir dibûn. Tirkiyê dixwest hêza me were û li Kobanê îmha bibe. Mînak pêşiya gruban nedigirtin, weke ku bêjin 'bila herin'. Pêşî lê nedigirtin, lê piştî hatina hêz DAIŞ agahdar dikirin û didan êrîşkirin.

DAIŞ'ê jî heya dawî bi hovane israr dikir. Tevî ku bi hezaran wendahiyan wan çêdibû jî lê hêza xwe ya herî xurt ji hemû aliyê cîhanê dikişandin Kobanê. Êdî wan Kobanê weke man û neman girte dest. Ji hêla me de jî Kobanê bû sembola çareseriya şerê Sûriyê. Nifteya Rojhilata Navîn hemû bû berxwedana Kobanê. Esas têkoşîna dinyayê ya li ser Sûriyê hemû zivirî ser Kobanê. Ji ber wê yekê pir zêde dijwar bû.

***-Bi qasî ku em dizanin, di dema şerê nava bajêr de hûn ji Helebê çûn Kobanê. Dema hûn çûn rewşeke çawa hebû? Bi taybetî hevalên ku ji Helebê hatin, di nava wî şerî de risteke çawa lîstin?***

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Dema ku em çûn wê derê, banga seferberiyê ya Serokatî çêbûbû, ciwan dihatin. Heval ji her alî ve dihatin. Dema em çûn, şer hê nû bi nû diket bajêr.

Dema şer ket bajêr, me li bajêr hêzên xwe bi cih kirin. Ji riya Helebê heya qada azadî, ji wir jî heya ber mala doxtor Xelîl me quwetên xwe kirin çeperan. Xetek dirêj me girt, lê me hevalan re jî got bila tû kes cihê xwe bernede. Bi vî rengî şer yekser ziviriya şerê bajaran. Di wê demê de hevalên Helebê hatin. Jixwe her eyalet û kantoneke heval dihatin alîkariyê. Me pêşniyar kir, me got "bila çil hevalî Helebê were." Lewma ji milê teqtîkên şerê bajêr ve, pêwîstî bi wan hebû. Me tenê komek tanzîm kir, da ku kolan û şibakayan perde bikin. Pişt re dema ku dîtin kêr tê, hemû hevalan perde datanîn. Bawerim hevalên din jî li ser vê mijarê sekinîn, ji ber wê ez naxwazim pir dirêj bikim.

Ew hevalên ji Helebê hatine jî, me her yek ji yekîneyeke belav kiribû, da ku şêwaz û teqtîkên şerê bajêr nîşanî hevalan bidin. Hinek hevalan, me tenê kare çeper, perde û xereqayan dabûyê. Mesela Hevala Zehra, hemû yekîneya xwe fêrî şewaza şerê bajêr kiribû, digotin "*şêwaza şerê Heleb e.*" Piştî rizgariya Kobanê bi mayineke şehîd ket.

Foto-48

Ji Helebê hinek heval bi awayekî fermî hatibûn. Lê hinek hevalan jî karê xwe berdabûn û hatibûn. Mesela hinek çûbûn Bakur kare xwe dikirin, lê dema ku Kobanê şer destpê kir, ew heval jî hatin. Mesela şehîd Hozan, ji Stenbolê hatibû. Her du hevalên Egîd, ji Helebê reviyabûn, derbasî Bakur dibin û tên Kobanê. Wisa bi dehan hevalên Helebê hatibûn. Bi awayekî fermî dû tîm ji Helebê hatibûn, lê bi giştî 23 heval bûn. Wan hevalan bi rastî jî risteke girîng lîstin. Hemû quwetên Kobanê, ew mînak digirtin. Lewra dîsîplîneke wan hebû, şer cîdî digirtin dest. Mesela çeperên xwe cîdî çêdikirin, perdeyên xwe cîdî datanîn. Tanq û topan jî wan çeperan bixista nedikarî xirab bike.

Danehevek girtibûn. Dixwastin hemû bi hev re bin. Lê me digot, wisa nabe. Divê hevalên xwedî ezmûn, di nava hemû yekîneyan de bin. Hevalên Efrînê jî me wisa belav dikirin. Ew heval hinekî bê qûral bûn, lê şer cîdî digirtin. Çavê wan dijmin neditirsiya. Lewra li Helebê, top û tanqan lêdixist neditirsiyan. Rejîmê êrîş dikir, DAIŞ êrîş dikir, Arteşa Azad lêdixist; dîsa jî neditirsiyan. Ango kî dihat lê dixistin. Hevgirtin û hevbawerkirinek mezin hebû. Lewra li kû kêmasî derbiketa, jixwe me hema mûdaxaleyî wir dikir.

Dema ku kîjan ênî lewaz dibû, me hevalên Helebê dişandin wir. Mesela li êniyekê pir êrîş dihatin, jixwe her roj maşîne diteqandin, xwe diteqandin. Ji ber vê hevalan pir tevdîr digirtin.

Mesela hevalê Agir hebû, pê re digotin Agirê Dîn. Li Helebê jî rista xwe lîst. Şer li kû bûya, digot, "ez ê biçim wir." Dema ku em li Helebê bûn, li Şengalê şer destpêkir. Hema rapor nivîsand û got ez dixwazim biçim Şengalê. Li wir me dabû ser komekê.

Careke dibîne ku DAIŞ tê, hevalên gel wî dibêjin, "*heval!..dijmin tê.*" Dibêje, "*bila werin.*" Çend caran heval wî şiyar dikin, dîsa jî dibêje "bila werin." Dema dû zilam tên û dikevin mesafeya 50 metrî, heval Agir fîşekan her duyan jî dixe û diçe çekên wan radike. Me got, wê çekê jî bidin heval Agir. Lê negirt, got dê şaş bê fêmkirin. Cihê ku şer lê hebe, pir rehet bû. Hevalan plan kiribûn ku ew eniya wan pêş ve biçe. Dema dikevin tevgerê çend

kolanan pêş ve diçin. Hevalê Agir, hinek hevalan jî dide pêy xwe û ji nava kolanê re diçe. Heval hemû jî keleka dîwaran re diçin. Di gulebarandineke dijmin de heval Agir şehîd dikeve.

Wisa wêrek û zîrek bû jî. Berî wê jî dû caran birîndar bibû, lê me çi kir, neçû îstîrahatê. Hevalekî pir berpirsyar û fedakar bû. Mesela carekê ew xeta ku me girtiye, ji aliyekî dijmin derbas bibû. Aliyê Yekbûn paşve kişiyabûn. Ji ber ku xetek bû, divê an hevalên din jî vekşin, an jî tu wê derê jî bigrê. Wê demê hevalan şehîd Agir û hinek hevalên din xistibûn tevgerê. Dîsa ew der girtibûn. Lê ji bo ku em wê xetê bigihînin cihê berê me çil şehîd dan.

**Berîtana Nûjen: Destîna**

Foto-49

Heval Destîna hebû, hevalek Başurê Kurdistan bû. Di jiyana xwe de mînak bû. Li Helebê jî li hemberî nîzamê pir şer dikir. Di şerê dijî çetayan de û şerê dijî rejîmê de jî çavreş bû. Bi B7'ê tanq îmha dikirin. Di dema şerê Kobanê de jî, pir israr kiribû û hatibû. Hê ku min ew nedîtiye birîndar bibû, pişt re dîsa hat tevlî şer bû. Ew milê derî dijmin pir êrîş dikir. Me hevalên Helebê bi piranî dabûn wir û bi awayekî kordîne ew xet diparastin. Hevala Destîna jî li wir bû. Rojeke li xeta wan arabe teqandin. Min di telefon de, hevala Destîna re got, "*dijmin dixwaze bikeve avahiy*ê *spî*" Got, "*bila werin.*"

Heval Destîna, heval Ozan û deh hevalên din di wê avahiyê de bûn. Dijmin çiqasa êrîş kir, hevalan dişkenandin. Gotin *"çi dibe bila bibe, em vir bernadin lê cebilxane bigihînin me."* Lewra ji ber êvarkî ve heya seat donzdeh êrîşên pir dijwar li ser wan hebûn. Hevalan cebilxane jî şandin wir. Di bin vê bînayetê de dûkanek hebû. Li ser cîhazan me dijmin guhdarî dikir, ji ber ku nedikarîn bikevin bînayê, dixwestin mayinê bikin wê dûkanê û bînayê biteqînin. Me heval agahdar kirin û me got, li qatê jêrê baş nobetê bigrin. Ji ber ku narîncok pir diçûn, me hinek narîncokên xwe jî ji wan re şandin. Lê dijmin hatibû û ketibû wê dûkanê, ji ber ku deriyê wê jî cûda ye, heval nikarin dakevin wir. Dûkanê tijî mayin dikin û diteqînîn. Dema ku bîna tê xwarê, nêzikî 8 hevalan di bin de dimînin. Hinek heval rizgar dibin, heval wan ji wir derdixin. Heval Destîna û heval Ozan li wir şehîd dikevin.

Bi rastî jî wê hevalê berxwedaniyeke pir mezin nîşan da. Di têkoşîna azadi ya PKK de, Hevala Berîtan hebû. Başurê Kurdistanê têkoşîn dikir, hata fîşeka xwe ya dawî şer kir û ji bo ku teslîmî dijmin nebe xwe ji zinaran avet. Mirov dikare, bibêje xeta hevala Berîtan di şexsê heval Destîna de li Rojavayê Kurdistanê careke din zindî bû. Çawa ku hevala Berîtan radest nabe, heval Destîna jî cihê xwe bernade û heya dawiyê ber xwe dide. Erebe diteqînin bernade, bi her cûre çekan êrîş dikin bernade, bînayê tînin xwarê dîsa bernade. Bi vê şeklî danaheva têkoşîna azadiya Kurdistan li her parçe welat heman rengî bilind dibe û hev yekpare jî dike.

Jixwe dijmin di navbera xwe de diaxifî û digotin, *"em nikarin wê derê bistînin."* Pişt re me çû cihê pevçûnê jî meyze kir, cihekî xeranebûyî yê bînayê û wan derdoran nemabû. Daneheva ku me ji vir derxist, hevalên ku di bajaran de şer dikin; ger di bin bînayê de dûkan hebe, divê paşiya dûkanê re kûnekê vekin û baniya dûkanê re jî kûnekê vekin. Ji bo ku dema dijmin ket dûkanê tu bikarê narîncokan biavêjê hûndir. Heval Destîna û hevalê Ozan bi rastî jî berxwedaniyeke pir mezin di wir de kirin. Berî wê hinek hevalên din di wir de bûn, gotin "*em nikarin bila cihê me bê guhertin.*" Lê hevala Destîna rojekê jî negot, "*ez westiyame û cihê min biguherînin."* Cihekî stratejîk bû, dijmin dixwest bikeve wir. Lê hevala Destîna nehilişt. Jixwe dijmin tu caran nikarî bikeve wir û di demeke kin de me ji bajêr derxistin.

Şehîd Destîna mînakek bû. Ji aliyê hevaltiya xwe ve pir xurt bû. Li ku tengasî çêdibû, digot "*ez biçim*." Li Helebê jî kuderê şer hebûya li wir bû. Hevalan jî pir jê hezdikir. Di hevaltî, danûstandinên xwe de, hezkirina xwe de pir xurt bû. Rihê êrîşî pir xurt jiyan dikir. Hevala Destîna qet paşve gav nediavêt. Di rista lehengtiyê de pir çalak tevgeriya. Ji ber ku li Helebê şer hebû, hat Helebê. Ji ber ku li Kobanê şer derket hate Kobanê. Êdî vegotinên ji rêzê têrî nakin. Divê mirov nav û risteke layiqî wê bide wê.

Birayê wê di asayîşa YNK de bû. Ji wî re eciz bibû û digot, *"nema min re biaxife."* Lê dema ku şehîd ket, malbata wê got, *"em dixwazin cenazeyê wê bibin."* Dema ku şer xilas bû, me cinazeyê wê jî derxist. Gelek hevalên wisa mînak hene. Ji ber ku em nas dikin, dibe ku em zêdetir behsa wan dikin. Lê gelek lehengên ku canê xwe feda kirin û bûn mînak di vî şerî de hebûn. Em çiqasa li ser wan biaxifin jî dê kêm bibe.

Ji bo hevalên Helebê, mirov bibêje çi jî mirov nikare heqê wan bidê. Rûxmî ku hemû ne profesyonel bûn jî, bi awayekî xurt û pir fedakar tevdigeriyan. Me ew heval her yek dida cihekî, rihê berpirsyartiyê wan re çêbûbû. Wisa lêhatibû ku baş elimîbûn; dê çawa çeperan çêbikin, dê çawa xwe û hevalên xwe biparêzin fêr bibûn. Ez dikarim bibêjim ku bi hatina hevalên Helebê li Kobanê xetek çêbû, da ku em bikaribin li hemberî dijmin berxwedaniyekê bikin. Jixwe ew xet me berê diyar kiribû. Hevalê Cûdî hebû. Digot, çend hevalên Helebê li gel min hebin bes e. Lewra karê xwe cîdî dikirin.

Hevalên Helebê xwe elimandibûn. Heya ku bielimin jî ew qesa şehadet û birîndarî çêbibûn. Em bi xwîna şehîdan fêrî şerê bajaran bûn. Hevalê Xemgîn hebû, li Kobanê jî careke birîndar bibû, rexnedayina xwe dida, digot *"ger ez ji ber deriyan re nereviyabûma, ez birîndar nedibûm."* Bi ew birîndariya xwe jî dîsa bi awayekî fedaiyane tevlî şer bû.

Hevalên Helebê pir bi hev ve girêdayî bûn. Dixwestin li gel hev bin. Dema ku me her yek kir berpirsyarê cihekî, qet cihê xwe bernedidan. Hevalên din jî li wan tesîr dibûn. Hevalê Selahaddîn jî, hevalekî kevn bû. Ew heval jî rista xwe lîst. Di 2007'an de tevlî bûbû, lê gelek danehev girtibûn. Ew hevalên Helebê hev û din fêm dikir. Şaştiyek hebe digotin. Hevalê Selahadîn jî pir rehet bû, wisa panîk falan nedikir. Carna dijmin jî pir biçûk dîdît, me rexne dikir. Ji aliyê kar ve xwestek û kedeke wî hebû.

**Paşve gavavêtin bêrûmetiyeke dîrokî ye...**

***-Ger em qala berxwedaniya ku DAIŞ di nava bajêr de daye sekinandin û rihê wê bikin, bi taybetî divê mirov kê bigire dest?***

**MERYEM KOBANÊ:** Mirov dikare qala berxwedana Kaniya Kurdan bike. Belê, piştî ku Miştenûr ket, dijmin ket bajêr. Lê kaniya Kurdan ber xwe da. Dijmin raste rast nikarî bikeve wir. Lewma pêşiya wê vekirî bû û çekên hevalan li ser hakîmbûn. Li wir berxwedana hevala Jiyan û 11 hevalan heye. Hevala Jiyan fedaî bû. Hevaleke Rojhilat bû. Lê ji ber ku di Rojava de ew qesa danehevên wê çêbûbûn, êniyek bi serê xwe dida meşandin. Fermandarê wê êniyê xortek bû, lê ew kes reviya, lê hevala Jiyan karê wî jî kir û heya dawiyê ew ênî meşand. Heya kêliya dawî ber xwe da. Heya ku koma wan hemû şehîd neketin, cihê xwe bernedan.

Wan jî weke hevalên Serzorî kirin. Hevalek ji wan re dibêje, "*heval hinek xwe bidin paş.*" Lê hevala Jiyan dibêje, "*heval dijmin di bajêr de ye, em ê çawa xwe bidin paş. Ma hûn ji min re dibêjin xiyanetê bike."* Heval bi niyeteke baş dibêjin, lê hevala Jiyan li hemberî wê gotinê bertekeke pir hişk nîşan dide. Ew rihek e, bîryarbûnek e. Jixwe piştî ku ew cihê hevala Jiyan wan ket, dijmin ket bajêr.

Piştî wê zêdetir hundir de me xetek çêkir. Di 10'ê Cotmehê de dijmin asayîşa Kobanê girt. 14'ê Îlonê şer destpêkiribû, di 10'ê Cotmehê de gihiştin nava Kobanê. Di asayîşê de berxwedana hevalê Diyar Bagok hebû. Fermandarên herî hêja yên Kobanê yek jî hevalê Diyar e. Di amadekirina şer de û moral dayina hevalan de risteke xwe pir mezin heye. Dema asayîş dikeve, hevalê Diyar li ser cîhazê bang dike û dibêje, "*hevalno, ji vê derê paş ve gav avêtin bêrûmetiyeke dîrokî ye.*"

Hevalê Doxan hebû, berpirsyarê asayîşê bû. Heval Diyar, ji hevalê Doxan re dibêje, *"ger em tenê bi serê xwe jî bimînin, em ê Kobanê bernedin. Em ji çanda Apogeriyê tên. Em di çanda Apoger de fêrî berxwedanê bûne. Di şêwaza Apoger de radestbûn û bêrûmetî naye qebûlkirin. Ez her kesî/ê vedixwînim berxwedanê."*

Foto-50

Ji bo ku di vê demê de xetek çêbibe, gelek heval şehîd ketin. Dayikên ku xwediyê zarok in, di asayişê de şer kirin. Ji van pakrevanan yek jî hevalê Diyar bû. Diyar Bagok her kes vexwend rihê berxwedanê. Got, *"an em hemû şehîd bikevin, an jî tenê malek jî bimîne, em Kobanê bernadin."* Her kes berxwedanî kir, lê hinek hevalên weke Diyar mohra xwe ji dîrokê dan. Hinek hevalan rih dan avakirin, dîroka azadiyê dan nivîsandin. Dema ku hevalên gel heval Diyar şehîd dikevin û birîndar dibin, hemû cebilxaneya wan li ser wan digre û di mala keleka asayîşê de ber xwe dide. Hevalê Diyar fedaî bû. Rihek da ava kirin. Yên ku li ser cîhazê dengê hevalê Diyar digirtin, hêvî û moral digirtin.

Foto-51

Hevalên weke hevalê Diyar û hevalê Doxan hiştin ku em xeteke parastinê çêbikin. Digotin, *"ger cihê lingê me jî di destê me de hebe, em dikarin ber xwe bidin."* Felsefe ew bû. Bila cihê pêlava te hebe, ji bo berxwedanê bes e. Rihê hevalê Diyar berxwedanî da ava kirin. Heval Doxan jî, ji bo ku li Kobanê çeper çêbibin, gelek hewldan nîşan dan.

Beriya wê jî di Meqtûlê de berxwedana hevalên jin heye. Berxwedana hevala Rûken Pepûlê, hevala Sorxwîn, hevala Evrîm, hevala Gulan, hevala Eylem heye. Tanq tê û dikeve nava malan, lê heval bi B7'an êrîşî ser tanqê dikin. Penc hevalên jin di wir de şehîd ketin. Hevala Gulan li ser wê êniyê bû. Di şer de pir xwînsor bû. Te digot, "*dijmin li ku ye?*" Digot, *"ketina mala keleka me, lê tiştek nabe, em ê derbixin."* Dema ku li wir hinek heval şehîd

dikevin û hinek heval jî şûn ve vedigerin, hevala Gulan radihêje çeka xwe û dibeze çeperan. Êrîşî ser dijmin dike. Digot, “*an em ê ser bixin, an em ê ser bixin.*” Rihê radestbûnê û binketinê qebûl nedikirin.

Foto-52

Piştî berxwedana van hevalan û hinek taqwiye hatin. Dijmin gihêştibû qada azadiyê. Lê piştî wê me xeteke teqûz çêkir. Heya wê demê mehekê zêdetir bû, şerê dijwar çêdibûn. Hemû cîhanê dît ku li Kobanê çi şer û berxwedan çêbû. Ew gotina Erdoxan jî di wan deman de bû. Got, “*Kobanî ber ketinê ye.*” Piştî ku her kes dît ku êdî Kobanî nakeve, wê demê teyareyên koalîsyonê hatin alîkariyê...

**-Koalîsyona Navnetewî jî piştî ku fêm kir Kobanê nakeve, mûdaxale kir?**

Rast e. Di vê mijarê de divê mirov hinek tiştan zelal bike. Lewma, divê dîrok rast were nivîsandin, divê hinek tişt rast werin şîrovekirin. An na em ê xwe bixapînin. Piştî gotina Erdoxan, dema ku Kobanî neket, hemû cîhanê dît ku êdî Kobanê nakeve. Di serî de Emerîka jî difikiriya ku dê Kobanî bikeve. Lê me digot, “*tenê Kurdek jî bimîne, Kobanî nakeve. Tenê jinek bimîne, Kobanê nakeve.”*

Bi rastî jî vegotina wan rojan zehmet e; her derê êrîş hebûn, agir dibarî. Lê di rojên wisa de lehengtî, rihê Apogeriyê derdikeve holê. Bêguman kesên xiyanet kirin jî hebûn, lê yêk ku derbasî dîrokê bûn, leheng bûn. Gelek lehengan got, *“ger em bijîn, em ê li ser vê xakê bijîn; ger em bimrin, em ê li ser vê xakê bimrin.*” Ew gotinên girîng û dîrokî ne. Gotineke bi vî rengî dihêle ku dîrok wergere.

Hemû cîhanê Kobanê dişopand. Di vê demê de hêzên koalîsyonê dîtin ku bîryarbûna Apoger, nahêle ku Kobanî bikeve. Herî dawî fermandariya Kobanê ya hevalên jin li ser cîhazê ji hemû hevalan re got, “*heval ger pêwîst bike, em hemû dê weke Zîlanê ji dijmin re bibin bersiv.”* Li ser vê yekê hemû hevalên jin tîlîlî kişandin, dengên dirûşmeyan li ser Kobanê bilind bû. Di encama vê de Kobanî hejiya. Vê hejandinê di hemû hevalan de bîryarbûn ava kir, netirsîn û wêrekî ava kir.

Piştî wê dema ku me xetek çêkir, hêzên koalsîyonê hatin alîkariyê. Heya wê demê alîkariya ti kesî tune bû. Heya wê demê ti hêzan wisa ber xwe nedabû, çokên her kes li ber DAIŞ’ê diricifîn. Hevalên li Kobanê bîryarek dabûn, kî bibêje Kobanê berdin jî, divê Kobanê neye berdan. Lewma me ew qesa şehîd û birîndar dabûn. Piştî wan hevalan berdana Kobanê tiştekî cuda bû. Bi sedan heval li gel me, di çeperan de şehîd ketin, piştî vê mirov nikare bîryarek cuda bide. Tenê mirov dikare bîryara serkeftinê bide.

Piştî wê me bîryar da ku em peyva berxwedanê kar neynin. Divê êdî me bîryara serkeftinê bida û dijmin bin bixista. Divê bi serkeftinê rihên bi teredût me zelal bikira. Û divê me li hemberî êrîşkaran, dijmin bin bixista. Bi vî rengî êdî berdana vê xetê çênebû. Ji sedî 70-80’ê bajêr ketibû destê dijmin. Lê ji şerê Serêkaniyê, danehevên me yên şerê bajaran hebû. Me digot, “*tenê cihekî biçûk jî bimîne, em*ê berxwedanê *ji wir mezin bikin û em dikarin ser bixin.*”

Mesela di şerê Serêkaniyê de jî, em di destpêkê de li keleka bajêr bûn, em ne di nava bajêr de bûn. Lê me bajar girt. Li gel vê yekê ji ber ku ew rihê berxwedanê jî derket holê, baweriya me ji me dihat.

Piştî wê demê em diketin pêvajoyê şerê nava bajêr. Dema ku dijmin dît em naşkên, li her cihê Kurdistanê berxwedan heye. Hêzên koalîsyonê jî ew rih dîtin û xwestin ew rihê ku Kobanê bi berxwedanê li cîhanê ava kiriye, sûd werbigrin, alîkarî kirin. Berjewendiya wan jî tê de hebû. Li ser bejahiyê tenê hêzeke ku pê re kar bikin hebû, ew jî em bûn. Ji bo ve jî alîkarî dan. PDK’ê jî wisa kir. Xwest ew rihê netewî ku çêbûye, sûd werbigre.

Bîryara neketina Kobanê ti hêzan neda. Şehîdên me navê wan hejmartin ku di wê berxwedanê de lehengtî kirin ew bîryar dan. Her wiha gelek ciwan hebûn. Bi xwîna wan Kobanî neket. Tenê 10-15 hevalan çalakiya fedaî kirin. Çûn ser dijmin û di nava dijmin de xwe teqandin. Sedan hevalên ku çîroka wan were gotin û nivîsandin heye, lê em bi rojan jî bibêjin xilas nabe. Yên ku damgaya xwe dîrokê dan û hiştin pêvajo biqûlibe milekî din, ew heval bûn.

**-Em dîsa vegerin ser şerê bajêr; piştî ku ew cihên ku weke stratejîk tên nirxandin ketin destê DAIŞ’ê çibû?**

Di vê demê de komek heval ji Helebê taqwiye hat. Hevalê Gelhat û koma xwe jî hatin. Bi vî awayî heya pêvajoya rizgarbûna Kobanê, me di nava bajêr de şer kir. Şerê bajêr jî mirov dikare weke merheleyeke cuda binirxîne. Piştî ku cihên stratejîk yên di destê me de ketin, şer ket nava bajaran. Dema ku teqwiye jî hatin, di qada azadiyê de me xetek çêkir. Lê dijmin giraniya xwe da Kaniya Kurdan, da ku deriyê Mirşûtpinarê bigre. Êdî hemû êrîşên wan, li ser esasê dorpêçkirina hêzên meyî şer bûn. Şêwaza “*derdorê bigre û bipelçiqîne*” dimeşandin. Di nava bajêr de jî dixwestin sînorê Tirkiye qût bikin û li cihekî çûn û hatin nemîne.

Di wê demê de me bîryara da ku em şerê gerîla bimeşînin. Divê me hem di nava bajêr de xeteke parastinê ava bikira, destê xwe bida destê xwe û dîwarek ava bikira. Hem jî divê me hejmareke kêm be jî divê me hinek quwetên xwe derxista derva û şêwaza gerîla bimeşanda. Di destpêkê de me du komên biçûk ava kirin û şandin milê Rojava û Rojhilat. Van komên ku me şandine jî, pir ne bi amadekarî bûn. Cebilxaneya xwe li pişta xwe kirin û çûn. Di serdemeke wisa de êdî her tişt dabûn ber çavên xwe. Divê êdî her tişt bi xwe biafirandibana. Divê xwedî wêrekî, bawerî û vîn bana. Jixwe ji wan hevalan hinek şehîd ketin.

Piştî ku heval çûn van cihan, bi taybetî li milê Rojhilat heval bi tesîr bûn û taqwiyeyên dijmin qût kirin. Hejmara wan hevalan jî kêm bû, ji ber wê nedikarîn pêşiya her rêkeke bigrin. Lê hem di nava bajêr de, hem jî dervayî bajêr me teqtîka mayinan bi kar anî. Me qadên ku têkevin û nikarin derkevin ava kirin. Mirov ji van re dikare bibêje qadên mirinê. Li qadekê tu ne tenê mayinekê, 4-5 mayinan datînê, êdî dema ku dijmin dikeve wê qadê ne dikare pêş ve biçe ne jî dikare paş ve biçe. Taqwiye jî nikare jê re were. Li ser vî hîmî me xwest em cihên xwe biparêzin, demek beriya demekê xwe komî ser hev bikin û bikevin êrîşê.

Di her mal û bînayekê de destanek hate nivîsandin. Bi taybetî di Kaniya Kurdan de sê cihên girîng hebûn. Ji wan bînayan yek jî li milê sînorê Tirkan bû. Ji bo ku wan bînayan bi dest bixin her tişt kirin, maşîneyên 6 ton madeyê taqemenî bicihkiribû, anîn û teqandin. Lewma ger ew bîna biketina destê wan hakîmiyeta wan li ser derî çêdibû. Ji bo ku van bînayan negrin, me jî her tişt dabû ber çavan. Teqez divê me ew bîna bernadabana. Ji ber ku mînakên wisa jî hatibûn jiyankirin, me xwe bawer dikir ku em bernadin. Jixwe dema ku taqwiye jî hat, ew rihê berxwedaniyê di asta herî jor de dihat jiyankirin.

Di şerê bajaran de hinek qeîde hene, ger tu wan qeîdeyan pêk naynê, tu dihêlê ku dijminê te ser bikeve. Ji wan yek, mewzî çêkirin e. Mal û bînaya ku tu ketiyê de divê tu çeperên xwe teqûz bikê. Lewma cihê te diyar e û her li ser êrîşên dijwar hene. Li gorî wê divê tu çeperên ku sîlahên dijmin nikarin tesîr bikin, çêbikê. Avahiya malên Kobanê jî, pir ne teqûz bû. Piranî mal ji pîrketan hatibûn çêkirin. Vê yekê jî tesîra xwe li ser çeperên hevalan dikir.

Dijmin jî ji bo ku malekê, an jî kolaneke bigre xwe dikir kom. Du kes li milê çepê re dihatin, sê kes milê rastê re dihatin. Du kesên ku B7'an kar tînin li pêşiyê disekinîn û yên din jî ji bin re diketin êrîşê. Ango bi plan tevdigeriyan. Dema ku du BKC, du B7 û çar qilêş li ser xaniyekî bişûxilin, ew xanî nikare li ser piyan bisekine. Ji bo wê jî çêkirina çeperan pir girîng bû.

Hevalên ku ji Helebê hatine di çêkirina çeparan de pir zîrek bûn. Lewma 2-3 sal bûn di Helebê de şerê bajêr didomiya û hevalên ji wir hatine elimîbûn şerên çeperan. Di şexsê heval Piling, Rizgar, Hamza û Agir de wan hevalan di şerê Kobanê de risteke girîng lîstin. Hevalê Hamza, Agir û Rênas di şerê Serêkaniyê de jî mabûn. Hatina wan hem moralek çêkir, hem jî alîkariyeke pir cîdî kir. Hevalên jin jî hevala Destîna ji Helebê hatibû.

Piraniya hevalan jî ji ber ku deriyê xwe teqûz nedigirtin, şehîd ketin. Em ketibûn pêvajoyekî wisa ku kî li beriya kê balyozê xwe bide şixûlandin, dîwarekî kûn bike û bikeve malekê, ew ser diket. Şerekî wisa bû. Dijmin jî milekî ve balyoz lê dixist û kûn vedikirin, me jî milê din re kûn vedikirin. Kî zû bigihêşta wî xanî, xanî yê wî bû. Bi vî rengî şêwazeke cuda yê şer derket holê. Di gundan de şer bi piranî tanqan, çekên giran dihat meşandin. Lê di şerê bajêr de êdî şer zivirî ser çeper çêkirin, perde danîn, rê girtin û kûn vekirinê.

Di şerê Stalîngrad de, ji bo ku çekên giran bê tesîr bikin, şerê lavlavokê dimeşandin. Weke ku tu ji bin re bê û xwe li çend milan ve lê bilefîne. Lê şerê me di ber hev de bû, me êdî hênaseya dijmin dibihîst. Şerekî wisa bû. Ji bo ku tu bikarê vî şerî bimeşînê rih, bawerî û fedaîtiyek pêwîst dike. Ji bo tu rihekî wisa bifarînê jî kedeke pir mezin pêwîst dike. Di wî şerî de her kesek di pêşbirka azadiyê de bû. Ew tişt jî bingeha xwe ji rihê Apoger digre.

***-Hûn dikarin ji bo Berxwedana Kobanê çi bêjin?***

**ROZA EFRÎN:** Bajarê Kobanê, ne weke bajarên din e. Hemû malên yek qatî ne, bînayên pir mezin tine ne. Tenê di navenda bajêr de hinek bîna hebûn. Tanq û çekên giran pir zêde lê tesîr dikir. Ji bo ku em zêde windahiyan nedin, digotin "*em mevziyên bin erde çêkin, xaniyan bi hev re vekin.*" Ji bo ku êdî ew çeper bên parastin amadekariyên bi vî rengî hatin kirin.

Lê di nava pencî rojî de psîkolojiyeke ketina Kobanê çêbibû. Her antipropaganda dihat kirin. Jixwe dengê muxaberatên Tirk û DAIŞ'ê dihatin û digotin, "*hûn çima ber xwe didin, jixwe me bajar hemû ji we standiye. Çekên xwe berdin û birevin.*" Hinek şervanên nû ji vê bandor bûn. Dema ku ketin bajêr, dehan kesên ku nu tevlî bibûn perwerdekirin û şer dikirin, çekên xwe berdan û reviyan, derbasî aliyê Bakur bûn. Hinekên van, bêyî ku bikevin gûmanan, rahiştin qilêşan û bersiv dan, temenên wan jî pir biçûk bû. Lê hinekên wan jî zû tesîr bûn û reviyan. Bi du avahî derketin pêş. Lê hemû hevalên ku mane, bi tevahî di wê bîryardariyê de bûn. Gotin çi dibe, bila bibe em ê bernedin. Yek kolan jî bimîne em ê bernedin.

Heya wê demê bi daxûyaniyên Rêber Apo re quwet gihêştin Kobanê. Vê jî bi xwe re moralekî mezin ava kir. Me hemûyan jî êdî bîryar dabû, me digot em xwe biteqînin jî em Kobanê bernadin, em ê berxwedaniyeke mezin nîşan bidin ku gel çav lê bike.

Derfetên di destê me de pir kêm bûn. Pir lewazbûn çêbûbû. Ji ber derfetan û tunebûna dermanan gelek hevalan ji ber windakirina xwîn şehîd ketin. Jixwe berê jî li Kobanê nexweşxane û derfetên tendûristiyê pir ne zêde bûn. Nexweşxaneyek mezin hebû, ew jî DAIŞ'ê teqand. Ji ber van bê derfetiyan gelek heval şehîd ketin. Birînên wan pir sivik bûn, lê ji ber ku me nedikarî xwînê bidin sekinandin şehîd diketin. Me nedikarîbû rêkin welatn derdor jî. Her çiqas berxwedana gelê Bakur li ser sînor heya dawiyê berdewam jî dikir, Tirkiye ew yek qebûl nedikir. Dixwestin, li ser psîkolojiya me tesîr bikin.

Lê piştî mûdaxale çêbû û quwet hat, weke ku ji nû ve 19'ê Tirmehê zindî bibe bû. Kobanê, cihê şerefe bû, divê me bernedaba.

Quweta nû hat jî, hinek hevalên ku hê ava Kobanê venexwarin şehîd ketin hebûn. Hinek hevalan diçûn şer, vedigerîn, hê sol û cilên wan kaxiz pêvebûn. Dema nu dihatin me cil û sol dida wana. Hinek heval ji ber ku bajar jî nas nedikirin, bi rihê êrîşê diketin nav û şehîd diketin. Gelek hevalên ku bi salan fermandartî kiribûn hebûn; hevalê Gelhat bû, hevalê Cûdî bû. Bi dehan heval hatin, lê nîv seatê li Kobanê neman.

Van hevalan bi xwe re rihekî fedaî ava dikir. Ew şervanên nû ku dîdîtin ew hevalên bi salan berxwedanî kirine û bê teredût şer dikin, moral û coş digirtin. Hinek kesên ji gel jî dema ku ew rih dîtin û zanîn ku heval bajêr bernadin dîsa vegeriyan. Hem gelê Kobanê, hem jî gelê Bakur û cihên dîtir dihatin, lewra ew rih dîdîtin. Vî rihî hişt ku em li bin jî nekevin. Her çiqasa zehmetî hebe jî, di saya vî rihî de em têkneçûn.

Rojên ew qesa zehmet hatin jiyankirin. Sedan heval şehîd ketin. Hinek hevalên kevn hebûn, lê piranî hevalên nû bûn. Di wî şerî de hevalê Hebûn şehîd ket. Rûxmî ku nexweş bû û hêza wî têrê nedikir jî li ser eniya rojhilatê disekinî. Hevalê *Siyabend* şehîd ket, xelkê Rojhilat bû, lê Sûleymaniyê mezin bibû. Hevalê Hogir şehîd ket. Emrê wî pencî sal bû, ji Sêrtê bû. Ji eniya rojava bû. ji ber ku kes tune bû her hevalek neçar bû li ser êniyeke bisekine.

Ew tiştên ku di pencî rojî destpêkê de hate jiyankirin, ez çi bikim jî ez nikarim bi giştî vebibêjim. Lewra jiyan kirin tiştekî cûda ye, mirov nikare pênase bike. Her çiqas berxwedanî û moralek jî bi xwe re ava kir, dengê xwe ji cîhanê veda û bû dîrok jî mirov nikare bîne ziman. Di sedsala bîst û yekemîn de hebûn û vîna Kurdan nîşan da.

Gelek hevalên birîndar li aliyê Bakur dihatin derman kirin, yên sivik jî di cih de dihatin derman kirin. Ew hevalên ku şehîd ketin jî, her yek çar-penc caran birîndar bibû. Hinek ji destan, hinek ji lingan birîndar bûbûn; dihatin hema pansûman dikirin, paçek li birînên xwe werdidan û dibeziyan eniyên şer. Digotin, *"heval tenê ne, em nikarin bisekinin."* Di kozikan de me ew pansûman dikirin. Dema ku ji birîna wan xwîn diherikî jî di kozikên xwe de şer dikirin. Bi taybetî hevalên kevn, gelekên wan bi caran birîndar bûne, dîsa jî di kozikên xwe de derneketine û şehîd ketine. Dema ku ew qesa hevalên nû zêde bibûn jî, wan hevalên kevn kozik bernedidan. Digotin, "*birînên me biçûk in, heya ku em şehîd nekevin em sengerên xwe bernadin."* Ji vî alî ve fedakariya ku hevalan nîşan dida pir mezin bû.

Xebat û tevlêbûnên YPJ jî pir zêde bi moral bû. Berê jî li Kobanê, di nava hemû xebatan de ji sedî çil hevalên jin hebûn. Di nava hêzên leşkerî de jî wisa bû. Tabûrên heyî, ji nîvî zêdetir hevalên jin bûn. Dîsa di her sengerekê de dû hevalên xort hebin, şeş-heft hevalên jin hebûn. Di çalakiyan de jî hejmara hevalên jin zêde bû. Vê bi xwe re moralek jî ava dikir. Bi dehan hevalên YPJ çalakiyên fedaî kirin.

Hevala Sozdar hebû, bi xwe ji Kobanê bû. Şervana sê mehan bû, lê fermandara eniya rojhilatê bû. Nû bû, lê bi ew hêrs û vîna xwe eniyek bi rê ve dibir. Hevaleke ew qesa xurt bû, bi hêz bû. Hevalên xort digot, "*dema ku em birîndar dibin, hevala Sozdar hema me dide ser milê xwe û bi tîlîliyan me xilas dike. Şerê xwe dike û me diparêze.*" Bi dehan hevalên wisa hebûn. Herî dawî têkoşîna heval Arîn Mîrkan, dîsa hevala Revana deng veda. Bi dehan hevalên wisa hebûn. Çalakiyên van hevalan deng da, hatin naskirin, lê gelek hevalên ku ez nikarim navê hemûyan bînim ziman hene.

Gelek hevalên ku kozikên xwe qet bernedan hebûn. Cihêkî ku hevalên jin tê de hebe, teqez gav paşve nediavêtin. Bi hêrseke mezin darbe dijmin dixistin. Di Kobanê de, hêzên jin yên YPG zêdetir rêxistinkirî bûn. Ya din jî taybetmendiyeke jinên Kobanê heye, paşve gav navêjin. Dema ku bîryar didin û diçin ser, paşve gav navêjin. İsrar û rikeke wisa heye. Hevalên din jî tevahî wisa nêzik dibûn. Hevalan digotin, "*ew heval nû ne, lê rûxmî ku danehevên me yên salan hene, em li hemberî wan bêzar dibin. Girêdanbûyina me ya salan heye, lê em nikarin weke van hevalan bikin."*

Di şoreş û berxwedaniya Kobanê de, ya ku mohra xwe dîrokê xist dîsa jinên YPJ yên li Kobanê bûn. Bi hemû aliyan ve fedakariyên mezin nîşan dan. Tenê ne di gotinê de bû ew fedakarî.

Mînak piştî ku rewşa Kobanê hinek baş bibû, rojnamegeran dikarî bên. Jinek ji çapemeniya Emerîkî hatibû. Wê jinê israr kir, got "*ez dixwazim biçim eniya pêş.*" Me jê re got, "*şer heye hûn nikarin.*" Me got, "*hûn çima israr dikin?*" Got, "*ger ez biçim û bêm, êz ê ji we re bibêjim.*"

Me şand eniya ku heval Ezîme û nêzikî pencî hevalên jin hebûn. Çûbû dîtibû û hema gotibû, “*min vegerînin.*” Hevalan gotibûn, “*tu çima hatê û çima hema dixwazê vegerê?*” Gotibû, *“hûn her dibêjin jin jin, min bawer nekir, min got bi vê hovitiyê re van keçên ciwan nikarin şer bikin. Min xwest ez bi çavên xwe bibînim ka di eniya pêş de jin hene an na.*” Dema dîtîbû ku di navbera hevalên jin û DAIŞ de deh metre hene û hin cihan jî heval aliyekî xanî ne, DAIŞ aliyekî xanî ye, ji çavên xwe bawer nekiribû.

Dema hat jî got, “*ger vîn û wêrekiyeke bi vî rengî hebe, hûn winda nakin, ez ji we re serkeftinê dixwazim.”* Piştre giriya, me got “*tu çima digîrê?*” Got, “*ji ber ku cîhan ew berxwedanî û têkoşîna we nabîne, ez digîrim.”* Me jî got, *“ji bo ku hinek bibinin em şer nakin, em ji bo ax û rumeta xwe şer dikin. Êdî cîhan vê bibine û nebine, dê dîrok wê binivisîne.*”

Ew jin çûbû û hema di nava panzdeh rojan de pirtûkeke 600 rûpelî çap kiribû. Navê wê jî, “*tiştê ku tu kes hêvî nake, li Kobanê jin dîrokê ji nû ve dinivisîne û mirovahiyê zindî dike”* bû. Ango kesên biyanî ku dihatin wir jî, ew berxwedaniya jinan didîtin.

Dîsa hevaleke jin dixwazim bibîrbînîm. Ciwaneke hevdehsalî bû, ji Kobanê bû. Nû tevlê bibû û birîndar bibû. Her du lingên xwe, destê xwe û serê xwe birîndar bibû. Li ser darbestê bû, me dixwest em derbasî Bakur bikin. Lê derî re nehiliştin, me cihekî din yê sînor re xwest bi awayekî veşartî derbasî bikin. Hema li ser darbestê stran digotin. Li ser Serokatî û şehîdan stran digotin. Me digot, “*bisekine, wisa xwîn pir zêde diçe.”* Digot, *“na, bisekinin bila her kes ya dilê min bizanibe. Ez birîndarim, lê ez şerê xwe jî dikim. Ez ê bi deng*ê *xwe û dirûşmûyên xwe şer dikim.*” Li wir leşkerek hebû, me nedizanî xelkê Mêrdîne ye û navê wî Ozgur e. Me piştre zanî. Hevalê ku gel min bû, Tirkî dizanî. Leşker pê re got, *“canê vê keçê parçe bi parçe bûye, lê hê jî stranan dibêje û dirûşmayan diavêje, ma şervanên we hemû wisa ne.*” Hevalê bijijk lêvegerand; “*hê sedan şervanên weke wê jî di sengeran de ne.”*

Hevalên wisa pir bûn. Bi hemû rengî birîndar dibûn, parçe bi parçe dibûn, me ew dibirin dermankirinê. Lê xwe ji ambûlansê diavêtin û digotin, “em naçin.” Digotin, “*em ê li keleka hevalan bimînin û bila em li axa Kobanê şehîd bikevin. Em naçin Tirkiye û ber destê bênamûsan.*” Ew qesa hêrsa têkoşînê hebû. Dixwestin li ser wê xakê şehîd bikevin û gav paşve navêjin.

Bi dehan hevalên wisa min dîtin. Ez li nexweşxanê bûm û min alîkariya hevalên bijîjk dikir, li wir min şahidiya gelek bûyerên bi vî rengî dikir. Ji çavên te meyze dikirin û xew ve diçin. Dîsa jî çekên wan ji destê wan nediket.

Dema ku me di bin xirba de cenazeyên hevalên şehîd radikirin, li cihekî neh heval şehîd ketibûn. Hevala Destîna jî di nav de bû. Dema ku me cinazeyê hevalekî derxist, me dît ku destê wî li ser çeka wî ye û pê ve hişk bûye. Jixwe tenê destê wî ma bû. Hevalekî din jî çeka wî wisa di hembêza wî de bû. Rastî ew dîmen vê dide nîşan; heya kêliya xwe ya dawî destê xwe li ser çekên xwe ranekirine û pê ve hişk bûne. Ez bawer nakim ku ew dîmen ti şerên cîhanê de hebin. Ango şervanên Kurd heya kêliya dawî jî destê xwe li ser çekên xwe ranekirine; bi fedakariyeke mezin şer kirine û şehîd ketine.

***-Di şerê nava bajêr de hûn dikarin balê bikşînin ser kîjan xalan? Bi taybetî piştî bangawaziya Rêberê Gelê Kurd, bi sedan ciwan tevlî berxwedana Kobanê bûn. Piraniya van ciwan qet çek jî negirtibûn destê xwe, ew ciwan çawa tevlî ew şerên giran bûn?***

**ÎSA KOBANÊ:** Li ser esasê bangawaziya Serokatî bi rastî jî seferberî hatibû îlan kirin û tevlêbûnên pir hêja çêbûn. Di meha destpêkê de nêzikî 500’î heval tevlêbûn. Wê demê ez çûm xebatên şervanên nû. Li ser esasê fêrkirina şer û piştre derbasî eniyan kirinê bû. Heya sersala 2015’an ez li ser şervanên nû mam. Dema ku me ew xebat êdî dewr kir, êdî Kobanê ber bi rizgariyê ve diçû. Heya wê demê nêzikî 1000’î şervan hatin Kobanê. Moraleke pir mezin hebû. Hefteyekî û 10 rojan me ew şervanên nû tevlêbûne li gel xwe dihêliştin. Pir zêde bûn.

Me di destpêkê de di dibistanan de perwerde dardixistin. Piştî ku çete ketin bajêr, dibistan bûn cihên êrîşê û êdî me di malan de û kolanan de perwerde dan. Li ser esasê teqtîkên şer yên bajêr me perwerde dida. Yên ku bi seferberiyê tevlêbûne, di şertê herî giran de be jî, herî kêm me hefteyekî li ser teqtîkên şer perwerde dikirin. Li gorî her rengê teqtîk û şerê bajaran me ew perwerde dikirin. Jixwe her alî ve perwerde bû. Em Rojavayê bajêr bûn, ji eniyên şer fîşek dihatin cihê me jî. Me cihên ku nakevin milê şer, bi kar dianîn. Heya şefaqê şeq şeqa guleyan û hawanan bû. Odeyên ku me tê de perwerde dîdîtin jî, dibûn hedef. Ew jî ji bo şervanan perwerdeyek bû.

Mesela me êvaran jî hin perwerdeyên bîrdozî dardixistin, an jî di mijarên rêxistinbûnê de sohbet dikirin. Dema ku pir zêde gule dihatin bînaya em lê ne, min meyze dikir hemû şervan bêdeng dibûn. Me digot, “*heval xêr e, hûn çima wisa bêdeng bûne?”* Digotin, *“heval, em dixwazin fêm bikin ku fîşegên diteqin yên kîjan çekê ne.”* Mirov carna weke tirs bi nav dikir, lê moral û manewiyeteke pir mezin jî derdiket pêş.

Her koma ku me şandiye, gotin ku *“heval, em ê biçin û dibe ku em şehîd jî bikevin. Lê teqez em ê biçin şer bikin û dê Kobanê nekeve.”* Bi vê baweriyê diçûn. Jixwe her komên me amade bûn, komên ku 7-10-15-20 şervanan pêk tên û perwerdehiya xwe timam kirine amade bûn û kîjan êniyê bixwesta me dişandin. Di zanebûna rastiya şer de

bûn û xwedî manewiyeteke pir mezin bûn. Min ti cihan moral û manewiyeteke ew qesa xurt nedîtiye. Ew coşa ku wan jiyan dikir û manewiyeta ku pêy wê dimeşiyan, moral û manewiyat dida me jî.

Ya ku me dida wan jî, şêwaza şerê serkeftinê bû. Me digot, "*divê tu kes erzan mirinê qebûl neke, divê hem di şexs de, hem jî li hemberî dijmin şerekî serkeftinê bihata meşandin.*" Me dixwest ew manewiyeta wan bi vî rengî timam bikin. Gelek hevalan tesîrên pir mezin jî li ser me çêkirin. Roj û kêliyên wisa pir hatin jiyankirin.

**-Her wiha dervayî ciwanên Kurd, hin derdorên din ku tevlî berxwedanê dibin jî hene. Tevlêbûna wan çawa bû?**

Di nava şer de hêzên çepgir yên Tirkiye jî hebûn. Gelek komên wan di bin navê enternasyonalîzmê de hatibûn Kobanê. Li ser perwerdeya wan jî me nîqaş meşandin. Bi rastî jî pir guhertin di wan de jî çêdibû. Mesele ne tenê şer bû. Ji aliyê bawerî, jiyanî û şoreşgeriya profesyonel ku Tevgera Azadiyê ava kiriye û ew rihê heye ve pir guhertin çêbûn. Jixwe piraniya wan endamên rêveberiyên wan partiyan bûn û hatibûn wir. Mesela endamekî navendî yê partiyekê hebû, bi temenê nêzikî 40 salî bû. Dû ciwan jî pê re hatibûn. Ji bo ceribandinê hatibûn, dê li gorî wê bîryarek bidana. Dixwestin endamên xwe bînin, an tevlî perwerdê bikin, an jî tevlî şer bikin. Ji bo bîryara vê bidin, hatibûn.

Hefteyekî li gel me man. Şaş mabûn. Digotin, *"Tevgera Apoger ya rasteqîn me li vê derê nas kir, me li vê derê dît. Me digot, sosyalîst em in, Tevgera Azadiyê jî tevgereke netewî ye, em ê çawa li pêş wan biçin. Ew nêzikatiyên me yên şaş pir bûn.*" Me digot, *"herî zêde bala we çi kişandiye?"* Digotin, "*mirov jiyanê temaşe dike; mirov nizane kîjan fermandar e, kîjan şervan e. Bi nîqaş û jiyanê me fêm kir ku hûn ji me sosyalîstir in. Ne tenê ji aliyê ked û jiyanê ve jî, ji milê zîhniyetê ve jî sosyalîzma ku hûn gihêştinê, em hê negihêştinê. Em hê di nava qaliban de ne."* Hevalan li ser wan pir tesîr dikir. Mesela endamên MLKP li Kobanê şehîd ketin, hinekên wan em nas jî dikin. Bi rastî jî hevalên pir hêja bûn. Ji bo şoreşa Tirkiye jî bûn mîras.

**4-Rizgarkirina Kobanê**

***-Pêvajoya rizgarikirina Kobanê çawa destpê kir?***

**MERYEM KOBANÊ:** Êdî bi teqûzkirina xeta parastinê re hinek hevalan li dervayî bajêr bi çalakiyên xwe pergala wan xirab dikirin, hevalên di nava bajêr de jî mal bi mal pêş ve diçûn. Lê ji bo ku em her malekê bigrin, me çend heval şehîd didan. Dijmin jî êdî rikek didomand. Ji sedî 80'ê bajêr di destê wan de bû, bawer nedikirin ku êdî em ê ber xwe bidin. Lê dema ku dîtin, em bajêr bernadin, rêbaza maşînên bombebarkirî pêş xistin. Di nava bajêr de 65 maşîne teqandin. Ger tu 65 maşîneyan li bajarekî weke Stenbolê biteqînê, dê Stenbol ji erdê ve bibe yek.

Maşîne pêşiya xwe dişandin, maşîneyê xwe diteqand û wan jî di nava wê toz û dumanê de êrîş dikirin. Ew teqtîkeke sereke ya dijmin bû. Yek jî 24 seatan bênavber tûp diavêtin. Dema ku ew tûp li xaniyekî diket, nîvê wî xanî diçû. Tazyîka wê pir zêde bû. Ya din jî pir zêde hawan diavêtin. Di hinek rojan de ji 200 hawanî zêdetir diavêtin. Di araziyeke 2 kîlometre de ew tişt hemû dibûn. Ew çekên giran hemû di ew qada teng de dihat karanîn. Dema ku dijmin ji milekî ve fîşek diavêtin, caran fîşekên wan li ser me re digihiştin dijminê ku êniyê din êrîş dike. Cih ew qesa teng bû.

Berxwedana Kobanê di cihekî wisa de çêbû. Di dîrokê de tiştekî wisa çênebûye. Tu di nava du eniyên ku fîşekên dijmin digihêjin hev û din de cîhaneke nû didê avakirin. Ew ne tiştekî ji rêzê ye. Ango hevalên di êniyê de jî, ne di êniyê de jî her tim di bin bombebaranê de bûn. Jixwe cihekî ku nebûbû eniya şer nemabû. Di vê pêvajoyê de her rojek destanek bû.

Di dema xet girtinê de şehîd Gelhat jî hat. Hevalê Gelhat jî di cihê herî xeter de cih girt. Cihê ku dijmin her tişt daye ber çavan ku wê derê bistîne Kaniya Kurdan bû, hevalê Gelhat çû wê derê. Dema ku hevalê Gelhat hat, rihekî pir fedaî çêkir. Hevalên pê re hatine jî pir fedakar bûn. Lê, qûral û qeîdeyên şerê bajaran pir pêk nedianîn. Heya ku heval elimîn, me gelek birîndar dan.

Rista hevalê Gelhat, weke fermandarekî di vî şerî de pir mezin bû. Dîsa di şexsê hevala Gulan de hevalên ji Botanê, ji nav HPG hatibûn û tevlî berxwedana Kobanê bibûn, bi rihekî pir fedaî şer dikirin. Wan hevalan hişt ku berxwedan bigihêje asta serkeftinê.

Di şerê Kaniya Kurdan de, me perde çêkirin me hinek teqtîkên wan vala derxistin. Ya din riya ku jê re maşîne dihatin, bi fedakariya hevalên weke Cudî, Sarya û Newal mayin danîn. Van hevalan bi awayekî veşartî heya ber çeperên dijmin diçûn û dema ku maşîne diketin tevgerê, mayin di wan maşînan de diteqandin. Gelek heval li ser treksan bûn û rê digirtin. Xendek çêdikirin û maşîneyan nedikarî tê re derbas bibin. Wan hevalan jî canê xwe

dideynîn holê. Digotin, *“bila em çend heval jiyana xwe dest bidin, lê bila tiştek ji hevalan neye. Bila dijmin cihên me negre.”* Her carekê dema ku diçûn rêkekê bigrin, venegerîn didan ber çavên xwe.

Ya din jî dema ku maşîne digihişt cihê hevalan û dixwest xwe biteqîne, hevalan xwe paş ve dida û piştî teqînê bi awayekî lez dîsa cihê xwe digirtin. Piştî teqînê wan hesap dikir ku cihê teqînê de tû kes nemaye, lê dema ku êrîş dikirin hevalan darbeyên mezin li wan didan. Ew jî teqtîkekî girîng bû.

Careke din jî dijmin plan kiribû ku wê rojê deriye Mûrşîtpinarê bigrin. Vedizînê kiribûn, di nava hevalan de ase mabûn û ketibûn pevçûnan. Hevalê Gelhat wan jî dixwazin wana ji nava dijmin derbixin. Treksê ku fîşekan derbas nake diajon ser çeteyan û dixwazin xanî di ser wan de hilweşînin. Hevalê Gelhat jî ji wan hevalan re pêşengtiyê dike û di wê derê de şehîd dikeve. Şehadeta hevalê Gelhat li ser hemû hevalan tesîreke pir mezin kir. Hevalekî ku bi salan di nava têkoşînê de cih girtibû û berxwedan meşandî bû.

Di giştiya Kobanê de mirin bê wate bûbû. Lêwma êdî asta mirin û berxwedanê derbas bûbû, êdî an serkeftin an serkeftin bû. Hêvalên ku têkoşîn dimeşandin, bi vî rihî dimeşiyan. Li hemberî bêhêvîtiyê hêvî diafrandin.

Mesela hevalek ku birîndar nebûye û bi bîrîndariya xwe şerê xwe nedomandiye tune ye. Hevalan Şîn hebû, ji Semsûr’ê bû. Birîndar bû û piştî demek kurt dîsa hat. Digot, *“ez êşa birînên xwe hîs nakim, lewma li vir êşeke ji birînên min zêdetir heye.”* Hevala Nûda hebû, ji Wan’ê bû. Rûxmî ku çavekî wê nedîdît, wê jî heman tişt digotin. Mirovên ku gihêştine asteke wisa hebûn.

Wan, êşa canê xwe hîs nedikirin, lê êşa xaka xwe, êşa azadiyê hîs dikirin.

Di van deman de berxwedan gihêştibû asteke wisa ku êdî Kobanê nekeve. Hem li milê Rojava berxwedan hebû, hem li milê Rojhilat û Qûlbe berxwedaneke dijwar hebû. Mesela li milê Qûlbe jî êrîşên dijwar hebûn. Lê hevalê Dilgeş weke fermandarê wê herêmê gav bi gav, mal bi mal li her cihî bû. Ji ber ku ew hevalên nû hatine wê derê re mijûl dibû, her kes hevalê Dilgeş ji xwe re weke fermandar didît. Li Milê Başûr di 240 metro de, me 45 hevalan şehîd dan. Ango tu bost bi bost şehîdan didê. Ji bo ku tu malekê, an jî serê kolanekê bigire; tu giyana xwe dixê çeper.

Piştî wê demê însîyatîf hinekî ket destê me. Hê jî êrîşên dijmin berdewam dikirin, rojekê de 10 caran êrîş dikirin. Mesela bînaya Şehît Zehra heye. Di wê bînayê de cihekî ku gule lênekitibin tine. Bi qesî giraniya wan xaniyan, gule û hawan li wan xaniyan ketine. Ji ber vê yekê jî şerekî fedaiyane pêwîst dikir. Di wê berxwedanê de rista her hevalekî/ê hebû, lê bi taybetî hin hevalan rista pêşengtiyê dîlîst; rih didan ava kirin, bawerî û hêviya serkeftinê didan hevalan. Mesela hevala Dîjle, Hebûn, Viyan, Zehra hebû; van heval hemû li ser eniyan diman. Di vî şerî de risteke dîrokî lîstin. Di van deran de rengê berxwedaniya jinê dan avakirin.

Foto-53

Dîsa di nava demeke kurt de Şehît Ozgur hat. Li ser eniya Rojava bû. Bi rihê fetihê hatibû Kobanê, hatibû ku Kobanê fetih bike. Hevala Jînda hebû, bi şerê xwe yê sekvaniyê, dijmin tengav kiribû. Cihê ku hevala Jînda hebe, dijmin nedikarî xwe bide ser hevalan. Van hevalan rihek ava kiribû, cihê ku ew hene dijmin nedikarî xwe nêzik bike.

Foto-54

Her wiha heval Cudî destanek bû. Digot, “*hevalên ku şehîd ketine, pir bi şans in; lewma cih berdan û koçkirina gelê xwe nedîdîtin. Me ew êş hemû kişand. Lê ji bo ku em vî şerî ser bixin, em ê her hucreyeke xwe bixin tevgerê û feda bikin.”* Dîsa hevalê Denîz, bi xwe ciwanekî Kobanê bû. Di şerê Kaniya Kurdan de risteke pir girîng lîst.

Şehît Xwînda hebû, bi xwe ji Kobanê bû û 4 meh bûn ku tevlê bûbû. Hevalên wê şehîd dikevin û bi tena serê xwe dimîne. Diçe cebilxaneya hevalên xwe jî digre û heya sibê şer dike û nahêle ku dijmin were ser cenazeyê hevalan. Sibê gazî hevalan dike û dibêje, *“werin ku em biçin cenazeyê hevalan rakin.”* Bi serê xwe berxwedaneke wisa kirin, ne tiştekî hêsan e. Bi rastî jî dema ku mirov şert û mercên dijwar jiyan dike, mirov neçar dibe ku tiştên ne ji rêzê biafrîne. Lehengtî û destan wisa derdikevin holê. Dihêle ku hêza mirov a veşartî derkeve holê. Xwe keşifkirina mirov e.

Di vê pêvajoyê de hevalê Avareş hebû. Li ser ew cihoka ku me ji bo parastinê kola bû, nedihêlişt ku dijmin derbas bibe. Dijmin digot, “*ger em vê derê derbas bikin, dê Kobanê bikeve.”* Lê ber wê derê tijî cenazeyên çeteyan bûbû. Rojeke ku herî kêm 4-5 çete nedihatin kuştin tune bûn. Ji bo ku wê cihokê bigrin û xwe bigihînin ber derî, her tişt dabûn ber çavên xwe. Lê berxwedaniya hevalê Avareş wan, di wê derê de nehilişt ku ji wir derbas bikin. Hevalê Rençber jî di wê derê de hebû, bi xwe ji wê derê bû. Ciwanek bû. Ji ber ku li wê derê mezin bûbû, her cihek nas dikir. Hemû hevalên birîndar û şehîd, li kuderê bana jî hevalê Rençber diçû û dianî. Digot, “*me careke din bikara di kolanên Kobanê de serbilindî bimeşiyana û li hemberî gelê xwe rûreş derneketîbana…”* Xeyala wî ew bû.

Ciwanekî pir zane jî nebû, lê girêdana wî bi axê ve, girêdana wî bi gel û Serokatî ve pir xurt bû. Ew rihê welatparêziyê ku tê de hatibû ava kirin, ji mirov dida hîskirin ku mirov nikare bê xak jiyan bike. Ger xaka te nebe, gelê te nebe û netewa te nebe; tu jî tine yê. Ew yek ji me dida hîskirin.

Li eniya navîn û başûr de jî, her êrîşên dijmin çêdibûn. Dema ku dijmin dît ji milê Kaniya Kurdan ve nikare xwe bigihîne hedefê, giranî da milê Başûr. Hevalê Kendal di wê êniyê de bû. Ji roja destpêkê ya şer ve, di nava ew şert û mercên zehmet de berxwedanî pêş xistibû. Fermandarê Kobanê ku ew rihê madî û manewî daye avakirin, ew bû. Di dema rizgarkirina Kobanê, ji rejîma BAAS de jî, hevalê Kendal fermandarê wir bû. Ji bo wê hem gel nas dikir, hem qad nas dikir. Ciwan jî pir pê ve girêdayî bûn. Heval Kendal digot, "*bila heval Roza, Nûcan, Medya û Rêvana li gel min bin; bila arteşa hemû cîhanê bi ser min ve werin.*" Jixwe ew heval jî şehîd ketin. Hevala Rêvana çalakiya fedaî kir. Heval Kendal ji çalakiya heval Rêvana pir bi tesîr bûbû. Digot, "*Heval Rêvana ji bo me rihek e, wê gotiyê 'divê em nehêlin ku dijmin destê xwe bihejîne û ji kolanên Kobanê re bimeşe.' Ew ji bo me fermanek e, teqez divê em pêk bînin û dijmin poşman bikin ku hatine Kobanê.*"

Weke tê zanîn di berxwedaniyê de sedan heval şehîd ketin, bi sedan ciwanên ku ji bo seferberiyê hatibûn şehîd ketin. Mirov nikare navê hemûyan bibêje û qala wan bike. Ew yek mirov jî diêşîne. Lê hemû hevalan jî bêyî ku fikarekê jiyan bikin, şer dikirin. Bi taybetî hevalên jin di vê êniyê de jî gelek heval şehîd kitin.

Di eniya Başûr de binahiyek û kolaneke pir girîng hebû. Di vê binahiyê de me grupek heval bi cih kirin. Da ku van hevalan wê derê qet bernedin. Em fikirîn, em kî hevalî deynin vê derê. Divê hevalek biçe vir, nehêle dijmin wir derbas bike. Cihekî di navberê herdu cephan de bû û bi hevdu ve girê didan. Me nîqaş kir, em ê kî bidine vê derê. Me got, em Heval Rojen deynin. Heval Rojen ji bo ku bikaribe vê derê xurt bigre. Bikaribe herdu eniyan kordîne bike. Jixwe fermandarê êniyê bû. Heval Rojen bi xwe got; "*ez gelek vê xetê saxlem bikim. Ji bo dijmin neçe.*" Heval Rojen, hevalek bi xwe ji Rojhilat bû, fermandariya Apocîtî, fermandatiya jinê, weke milîtanekê di şêxsê xwe de honandibû.

Mirov dikare di şêxsê wê hevalê de fedaîtiya Apoger bibîne. Dema ku şehadeta wê çêbû jî, di milê êrenî de li ser hevalan gelek tesîr kir. Êdî ew der ji bo hevalan bû kelehek. Hevalan digot, "*ji ber ku Hevala Rojen gotiye, divê em dijmin ji vê derê dûr bixin.*" Çawa ku hevala Hêlîn Torî gotibû, "*dema ku ew bajar rizgar bû, divê ez her cihê wê bixim çira, da ku car din tarî nemîne.*" Gotinên heval Rojen jî wisa li ser hevalan tesîr kiribû. Dîsa li wê derê hevala Berîtan hebû, ciwanek bû. Ew rihê ku pê hatiye Kobanê, mirov mînak digirt.

***-Komên we yên derketin dervayî bajêr kengê çûn?***

Piştî wê bû. Dema ku ew ênî wisa hatin teqûz kirin û heval derketin dervayî bajêr û teqtîkê gerîla dan meşandin, vê yekê li ser dijmin tesîreke mezin da avakirin. Hêdî bi hêdî taqwiyeyên wan kêm dibûn. Bi vê yekê re me bîryar girt ku em hem di hundir de, hem jî li derva dijmin bidin. Ya rast heya wê demê sekinîna me jî, hişt ku em pir windahiyan bidin. Me digot, xeta xwe teqûz bikin; lê her ku em disekinîn, me zêdetir zirar dîdît. Ji milê teqtîk ve xeletiyên me hebûn. Em her bendê man ku teqwiye werin û em xeta parastinê tijî bikin. Di şer de li hemberî dijmin pir sekinîn, dibe sedem ku tu winda bikê. Ew lewaziya me bû. Piştî ku xetek hate girtin, divê me êrîşên xwe yên hundir qet nedana sekinandin. Lê dijmin jî pir fersend nedida. Di rojekê de 3-4 caran êrîş dikir.

Piştî vê demê êdî êrîşên dijmin li ser esasê întîharê bûn. Kî bihata êrîşê, divê di heman demê de xwe biteqanda. Wisa çavkorî xwe teqandinek hebû. Baz didan û xwe diteqandin, piraniya teqînên wan vala bûn. Baz didan û xwe cihekî diteqandin. Jixwe derman didan wan, êdî li ser hemda xwe çûbûn. Mesela maşîneyeke teqemeniyê şandibûn, lê şoforê maşîneyê bi zîncîrê bi maşîneyê ve girêdabûn, da ku nereve.

Roja 29'ê Qanûnê li ser dêrî êrîş çêbû, ew rojeke pir girîngî bû. Dijmin li ser esasê 4 baskan êrîş kir. Hevalên me yên dervayî bajêr jî, ji milê Miştenûr ve xetek çêkiribûn û ketibûn bajêr. Dijmin ew pir ferq nekiribûn. Wisa ev roja ku divê hêzên me biketana bajêr û me êrîş bikira, dijmin jî êrîş kir. Wisa rastî hev hatin. Wan jî plan kiribû ku pengava dawî bikin û Kobanê bigrin. Ji milê Tirkiye ve jî êrîş kirin û maşîneyên teqînê şandin. Hemû hêza xwe xistibûn tevgerê, da ku bikaribin wê derê bigrin. Vê dorê Tirkan bêyî ku veşêrin, alîkariya wan kirin. Ya rast Tirk bi xwe ketin dewrê.

Wê rojê berxwedaneke dîrokî çêbû. Bi sedan çetayan êrîş kir, tenê 50 çeteyan xwe teqand. Di deriyê Mirşûtpinar û eniya Rojhilat û Başûr de gelek êrîş çêbû. Xwestin wê xetê bigrin. Ew xet Botana Rojava û Rojhilat bi hev dide girêdan. Dema ku te ew xet digirt, dijmin nedikarî bikeve navenda bajêr. Di wê derê de maşîne teqandin û pevçûnan destpê kir. Di wê berxwedanê de Ebû Şêro, heval Têkoşîn, heval Ozgur, Arjîn Batman û hê gelek heval şehîd ketin. Bi dehan hevalên ku di nava berxwedanê de risteke pêşengiyê dîlîstin, di wê berxwedanê de şehîd ketin. Di pêşengtiya van hevalan de êrîşên dijmin hatin şikandin.

Heya ber êvarê hemû êrîşên wan şikestin. Ew bi xwe jî şaşwaz bûn. Wan texmîn nedikir ku dê berxwedaneke wisa çêbibe. Cara yekemîn êrîşeke wisa berfireh dardixistin û wisa hesap dikirin ku dê darbeya dawî li me bidin.

Cara ewil teyareyên Tirkan jî rabûn û li ser sînor geriyan. Lewma em jî ketin sînorê Tirkiyê û piştî têlan me şer kir. Lewma hemû çete hatibûn wir. Me sînor derbas kir û me çeperên xwe dervayî bajêr çêkirin. Êdî şer li milê Tirkiye berdewam kir. Li hemberî me girekî bilind hebû, dijmin hemû çekên xwe li wir cih kiribûn. Rê jî wan re vekirîbûn û dabûn êrîş kirin. Ji ber vê em jî çûn û ketin sînorê Tirkiyê.

Bi rastî jî wê rojê tiştên ku hatine jiyîn, mirov nikare bibêje. Tenê divê mirov di nav de be ku mirov bikaribe hîs bike. Bi dehan hevalên ku birîndar dibûn, birînên xwe girê didan û şer dikirin hebûn. Hevalên ji serî, pî û destên xwe birîndarbûn hebûn. Hinekan gule li wan ketiye, hinekan parçe li wan ketiye. Lê her hevalek heman gotin, îddîa, nêzikbûn û rih raber dikirin. Tiştekî awarte bû. Her kesî digot, "*em nahêlin ku dijmin gav biavêje, em ê nehêlin ku wê kêfxweşiyê jiyan bike.*" Ez difikirim gelo em ê wî rihî çawa pênase bikin? Ango bi sedan can, kiribûn yek rih.

Piştî wî şerî pêvajoya rizgarkirinê destpê kir. Ji milê Kaniya Kurdan ve, em heya cihekî çûn. Ji aliyê din ve, divê ji milê Botana Rojhilat û Rojava ve me xwe bigihanda Miştenûr. Lewma Miştenûr li ser serê Kobanê bû. Çekên wan yên giran, hemû dihatin wir. Dijmin xwe li wir bi cih dikir û sekvanî dikir.

Ji bo ku em van herdu taxan bigihînin hev û din, divê me ji sê milan ve êrîş bikira. Di şerê bajaran de divê tu weke morîkan, weke hebên tizbiyê ji hev û din qût nebê û bi hev re bimeşê. Divê baskek ji milê eniya heval Heqî wan ve, baskek ji milê eniya heval Rûstem wan ve, baskek jî ji eniya navîn biketa tevgerê. Ango baskek ji milê bînaya çandê ve, baskek li keleka wan, baskek jî ji eniya başûr ve bimeşiya. Ango di rêza hev û din de dimeşin, da ku riya di navbera Botana Rojhilatî û Rojavaî qût bikin û xwe bigihînin Miştenûr.

Hevalan gav bi gav, xanî bi xanî xwe gihandin mekteba Yêrmîk. Gihêştina wê derê, wê rekê qût dike. Lê heval bi hêsanî negihêştin wir. Di her sê baskan de jî şerekî pir dîrokî hate meşandin. Her baskek nêzikî 100 hevalî bû, wisa ji keleka hev û din re gav bi gav meşiyan.

Dema ku dijmin dît, em pêş ve diçin xwest ji pişta me bizivire. Xwestin quweteke ji pişta me bizivirînin û bixin nava me. Da ku lêhûrbûna me belav bibe. Bi awayekî întîxarwarî xwe li nava hevala xistin, xetê derbas kirin û xwestin ku bikevin nava me. Du caran wisa kirin. Lê ev quweta wan ku diket wê derê nedikarî vegere. Lewma tevdîrên me jî hebûn û li pişta xwe jî me operasyon dikir, da ku wan quwetên ketine hundir îmha bikin. Jixwe di dawiyê de hemû hatin îmhakirin û me xwe gihand mekteba Yêrmîk.

**Li ser Miştenûr ala azadiyê li ba dibe**

***-Girtina Miştenûra ku ji bo Kobanê xwediyê risteke stratejîk bû bi çi rengî bû?***

Dema ku em gihêştin Mekteba Yêrmîk ênî berfireh bû û derfet çêbûn ku em zû xwe bigihînin Miştenûr. Di wê xetê de cihên girîng hebûn ku divê me bigirtana. Yek Miştenûr bû, yek Termik bû, yek jî mala Memit bû, ango weke gundekî bû. Cihekî bilind bû û li ser cihên dîtir hakîmiyeta wî hebû. Ew her sê cih jî divê bi hev re bihatana girtin. Lewma mala Memit, li hemberî Miştenûr bû. Termik jî xeteke ku diket biniya Miştenûr bû.

Ji bo ku ev cih werin girtin, berxwedanî şev û roj hate meşandin. Berxwedaniyê mal bi mal, kûç bi kûç berdewam kir di şerê bajêr de. Beriya ku em bigihêjin Miştenûr, li biniya Miştenûr pevçûnên pir dijwar çêbûn. Heya ku em gihêştine ew hedefên hatine diyarkirin, em qet nesekînin.

Heya 19'ê Çileya 2015'an jî hemû alîkarî û piştgirî ji bo dijmin hatin dayin. Di ketina sala 2015´an de, me dest bi hamleyê rizgarkirinê kir. Pêşiya vê jî me destpê kiribû. Lê piştî van êrîşên giran û şûn de bîryara me ya ku di demekê kurt de em bikaribin dijmin bişkînin hebû. Em dikarin jê re bibêjin em ketin hamle zaferê. Ku êdî em zaferê misoger bikin.

Di eniya din jî ew her sê baskên me ku ketibûn tevgerê gihêştin hev û din û xetek çêkirin. Hevalan cihê çand û hûnerê û Mekteba Yêrmîk girtin. Dihat wê wateyê ku me ji sedî 60'ê Kobanê bi dest xistiye. Ji milê eniya Rojhilat jî, Mekteba Keçikan û Çarkoşeya Hêzên Emnî hebû. Cihê şarederiyê falan li wir hebû. Divê ew cih bigihêjtina hev. Jixwe her êniyek jî di nava lêgerînan de bû ku her şev pêş ve biçin û cihekî bigrin.

Di pêvajoya pengava rizgarkirinê de, dema ku em ber bi Miştenûr ve diçûn rihekî pir berz hatibû avakirin. Her kes xwe bi hedefa xwe ve kîlît kiribû. Lewma di her bosteke ax ku dihat rizgarkirin de me şehîdek dabû. Kîjan êrîş çêdibe bila çêbe, êdî rih, bîryar û vîna serkeftinê ser diket. Êdî heval ketibûn pêşbirkê; digotin, "*ka kî beriya kê digihêje hedefa xwe.*"

***-Di van rojên ku hûn qalê dikin de, bi taybetî li ser sînorê Kobanê û Pirsûsê, li Bakurê Kurdistanê serhildanên mezin çêbûn? Encamên serkeftina Miştenûr, li ser gel tesîreke çawa çêkir?***

Girtina Miştenûr, hem ji aliyê psîkolojîk ve, hem ji milê navnetewî ve, hem jî ji bo gelê me yê ser sînor pir girîng bû. Ew gelê li ser sînor her sibê radibûn û berê xwe didan Miştenûr, weke qiblegehekê lê hatibû. Wan jî pir

moral didan me û rihekî pir cuda ava kiribûn; hêz, vîn û enerjiyek didan avakirin. Çawa ku em şev û roj di çeperan de bûn, ew jî şev û roj li ser ser sînor bûn.

Şehîdên ku di serhildana 6-8'ê Cotmehê de li Bakur çêbûn jî, weke şehîdên Kobanê ne. Têkoşîna wan a di kolanên Amed, Gever, Cizîra Botan û cihên dîtir yên Bakurê Kurdistanê de her cih bû Kobanê. Jixwe bi wê dûrûşmeyê rabûn. Rizgarkirina her bosteke Kobanê, tesîra xwe li ser wê jî dikir. Dîsa Kurdên dervayî welat, piştgiriyeke xurt dan. Di her gaveke me diavêt de, me hîs dikir ku em ne tenê ne. Weke ku tu di qadeke fûtbolê de yê û bi milyonan kes te temaşe dikin, divê tu wê lîstikê rast bîlîzê. Hîseke wisa di me de dida afirandin. Ji bo wê em di nava kêlecaneke de bûn. Dibe ku em tenê di çeperan de bûn, lê ew rih jî hebû. Em di ferqa wê de bûn.

Ji bo wê jî dema ku me berê xwe da pala Miştenûrê weke ku tu ketibê pêşbirkeke azadiyê, her kes dixwest beriya yên din xwe bigihîne wir. Hevala Ozgur digot, "*ez ê biçim ser serê Miştenûr, dansa azadiyê bikim.*" Gelek hevalên xurt digot, "*em ê biçin ser serê Miştenûr, weke Kawayê Hesinkar agirekî gûr dadin, da ku her mirovek xwe bi vî agirî germ bike*." Bi rastî bi wî rihî jî çûyin çêbû.

Di encamê de di 1'ê Çilê 2015'an em gihêştin ser serê Miştenûr. Dema ku me Miştenûr girt, êdî bi awayekî giştî însîyatîf ket destê me û em ketin êrîşê. Di girtina Miştenûr de, moral û teqtîkek hebû. Me bi hejmareke pir kêm Miştenûr girt, hê jî dijmin di nava bajêr de hebû. Me xetek vekir, da ku em xwe bigihînin wir û di wir de cihê xwe teqûz bikin. Lewma dûrûşmeya me ew bû, "*ger li qadekê cihê lingê me hebe, em dikarin di wê derê de azadiyê bidin afirandin.*"

Dema em êvar gihêştin Miştenûr, me du tişt kirin; yek daliqandina alê bû, ya din jî pêxistina çireyê bû. Me wisa kir ku hem taritiya Kobanê biçirînin, hem jî gelê xwe yê li ser sînor pê bihesînin. Me li ser serê Miştenûr 6 çira pêxistin. Vê yekê ji bo hemû hevalên di çeperan de, gelê me moraleke pir mezin çêkir. Ji milê leşkerî ve tesîreke psîkolojîk jî dike. Gelê me yê li Bakur jî got, *"ew çi çira ye, li Miştenûr pê dikeve?"* Me jî got, *"me Miştenûr girtiye."* Lê me hê nîvê Miştenûr girtibû. Êdî milet û cîhan ji vê yekê pir tesîr bû. Dema ku sibê jî çavên xwe vekirin, dîtin ku aleke 100 metroyî ku ji Pirsûsê xûya dike, li ser Miştenûr ba dibe. Berê ala reş li wir hebû.

Me plan dikir ku em heya 20'ê mehê bigihêjin cihokên ku me berê li derdora bajêr çêkirine. Lê di wê derê de êdî pêşbirka serkeftinê destpê kiribû. Hemû heval, ji bo ku xeyalên hevalên şehîd pêk bînin û eniyên xwe fireh bikin ketibûn tevgerê. Rûxmî êrîşên dijmin jî, ew cih zûtir dihatin girtin.

Piştî girtina Miştenûr, divê hinek hevalan xwe ji Miştenûr berda û me Mekteba Reş, Sûkilhal û Çarkoşeya Emniyê bigirta. Di 21'ê mehê de komek heval gihêşt ber Mekteba Reş û hevalên din jî bi wan re gihêştin cihê xwe. Beriya rojên ku hatine plankirin, hemû hevalan xwe gihand cihê xwe. Êdî rojane û seat seat plansazî çêdibûn. Jixwe hevalên kordîne dikin, li ser eniyan belav bûbûn û hemû ênî bi hev re dimeşiyan. Di 22'yê mehê de giştî Miştenûr rizgar kir. Wê demê sê riyên esasî ku tên bajêr, ketibûn kontrola me; riya Helincê, Mizirdewcê û Termika.

Piştî Miştenûr, cihê yekemîn ku me ji dijmin girt Termik bû, cihê ku şehîdgeha Şehît Dîjle lê heye. Gundê Termik, di biniya Miştenûr de ye. Piştî du rojan, me Memîtê girt. Piştî girtina wan herdu gundan, êdî em dikevin xeta gundan. Ji milê Başûr û Rojava ve êdî me dijmin ji bajêr derxist û em ketin gundên keleka bajêr. Lê milê Rojhilatê hê jî di nava bajêr de pevçûnan berdewam dikir. Ji bo ku em bikaribin xetên wan qût bikin, hevalên me xwe berdan navbera Helincê û bajêr. Helincê jî gundekî mezin e. Di nava bajêr de me Çarkoşeya Emnî jî rizgar kir. Li milê Kaniya Kurdan jî heval pêş ve çûn û me xeta yekemîn derbas kir, em ketin pengava duyemîn.

Di roja 25'ê mehê de, serê sibehê di seat 9'an de me piranî bajêr ji destê wan derxist, tenê xeteke zirav û girê Kaniya Kurdan ma. Kaniya Kurdan jî ji bo me pir girîng bû, bûbû eniya Şehît Gelhat. Di wê derê de destan hatin nivîsandin. Di seat 9 û nîvan de me hemû bajar paqij kir û em gihêştin qanala parastinê ya bajêr. Lê gundê Helincê pevçûn bû. Me di dawiya gundê Helincê de, çete xistin dorpêçê. Di wê derê çalakiyeke pir bi wate hate darxistin. 16 çete di wê derê hatin kuştin û gelek birîndarên wan çêbûn.

***-Hûn kengê derbasî pengava rizgarkirina bajêr bûn? Ya din jî dema ku vê pengavê destpê kir, li Kobanê hevsengiya hêzan çawa bû?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Me xwest di meha Mijdarê de esas em gaveke nû biavêjin. Me li pişt dijmin jî amadekarî kirin. Armanca me ew bû ku em pişta dijmin bişkînin û Miştenûr bigrin. Me plan kir ku em Miştenûr û xeta başûr hemûyê bixin. Di wê demê de ji pişt dijmin 3-4 çar tabûr Heval hatin jêra Miştenûr û dijmin kete navbera me. Destpêkê hevalan ji Miştenûr heta ser riya Helebê Meşwal hemû mewzî girtin. Yanî xetek çêkirin. Vê carê em li bajêr ji bo qorîdorê fikirîn. Yanî em wê xetê jî bigihînin hev, em qorîdorê jî çêkin esas hema bi rojê re em li her derê li dijmin bixin û derkevin Miştenûr bigrin. Her hal dijmin jî em guhdar kiribûn. Wan jî amadekariyeke xwe ya stratejîk kiribûn. Ew jî hemleyekê bikin. Ya yekê Derî bigrin, jixwe Tirkiyê jî destûr dabû wan û ji bo wan Derî vala kiribû. Ya din jî di holê re di Qada Azadiyê re êrîş bikin û xwe bigihînin kolana giştî. Di milê başûr de jî êrîş bikin, xwe bigihînin mektebê cihê ku cara din lê şikestibûn. Bi vî rengî bajar dikeve.

Esas me plansaziya ku em bajêr rizgar bikin kiribû, wan jî plana ku bajêr bixin kiribûn. Hemleya me û ya wan kete heman rojê. Ez nabêjim tesadûf e, ji ber ku tesadûf ew qas nabe.

**-Ger ne tesadûf be, dervayî wê kîjan dibêtî hebûn?**

Îhtîmaleke pir mezin Tirkiyê telefonên me guhdar kiribin û li gorî vê agahî dabin DAIŞ ku em amadekarî dikin û hemleyeke me heye lê asta wê ne diyar e. Wan jî li gorî wê amadekariya xwe kiribin. Seata wê jî ji wan re gotibin û wan jî li gorî wê hereket kirin. Berbangê ku em ê dest pe bikin, me dît wan dest pê kirin. Wan nedizanî li me gelek xetên wan girtibûn. Ji bo wê yekê di xeta başûr re, di kuderê re hatin ketin nava hevalan. Wan jî texmin nekirin ku em hatine wê derê. Ji ber ku ji milê derve de despêka bajêr bû û me girtibû. Hema ketin nava hevalan û hevalan li wan xist. Gelek ji wan kuştin. Ketin kîjan malê hevalan li wan xistin. Di kuderê re derbas bûn hevalan li wan xistin. Cenazeyên wan ketin destê Hevalan.

Li hember vê wan jî dîsa li Derî teqandin. Tirkiye ew bi rêxistin kiribûn û jixwe di aliyê Tirkan re hatin. Niha ez baş nizanim agahiya PDK jê hebû yan na. Wê rojê fermandarên PDK çûbûn Tirkiyê. Dema ku ew êrîş çêbû ew ne li Kobanê bûn. Ji ber ku me telefonî wan kir û me got divê hûn bi obûsan li Sawamaya Tirkiyê bixin. Gotin *"em lê naxin"* û lênexistin. Paşî ji wan re talîmat hat, tevî ku çete li wir bûn jî lê li erdê Tirkiyê nexistin, li erdê Sûriyê xistin. Gotin "*em li erda Tirkiyê naxin.*" Ev gumanek bû. Wî fermandarî digot, "*mirovên min hatine û ez çûme min ew dîtine."* Lê bi rayedarên Tirkiyê re hevdîtin kiribû. Wî digot "*ji bo çûnûhatina me û erzaq û tiştên me, hevdîtin çêbûye."* Lê tesadûf di wê rojê de pir bi me şêlo hat, bala me kişand. Çete di Deriyê Tirkiyê re hat û xwe di Deriyê Kobanê de teqand. Ji milê Tirkiyê ve êrîş kirin.

Foto-55

Nexweşxaneya me li wê derê bû, me birîndar û hin şehîd dan. Lê li gorî wan dixwest me derbe nexwar. Di vir de doktorên Kobanê, hêjaye ku mirov behsa wan bike. Gelek doktorên Kobanê helwesteke gelek birûmet nîşan dan. Ji Kobanê neçûn û gotin "*bila em jî li gel hevalan şehîd bin.*" Bîst û çar seatan dixebitîn, hinek hatin li gel hevalan şer dikirin. Me bi zorê rêdikirin nexweşxanê û me ji wan re digot, herin birîndaran derman bikin, ew jî şer e. Dema çete hatin û di Derî de xwe teqandin ji wan doktoran gelek birîndar bûn. Em bi xeta başûr re mijûl bûn jixwe. Me qet texmîn nedikir ku di xeta Bakur de êrîş bikin. Carekê hevalê Mihemed yê berpirsiyariyê Derî ku welatparêzek bû, telefon vekir û got, *"Heval xwe bigihînin me, Derî çû*!" Ew hemû Hevalên li wê derdorê, Hevalên lojîstîkê, yên cebilxanê, ketîbeya Şems El Şîmal, hevalên nêzî wê derê hemû me berê wan da Derî. Helbet hevala bi lez tevger kirin û zû Derî girtin. Ji ber ku êrîş ji milê Tirkiyê ve hatibû em derbasî wî milî jî bûn. Jixwe leşkerên Tirk nebûn, ji bo çeteyan ew der vala kiribûn. Me deriyê Tirkiyê girt, li wê derê gundek hebû hevalan ew der jî girt. Me êrîşê sawamaya wan kir û ew jî ji wan girt. Yanî em ketin 'erda Tirkiyê' û me ew der girtin. Di encam de êrîşa wan ya Derî jî vala derket.

Wê rojê Hevala Ozgur şehîd ket, bi giştî 10-11 heval şehîd bûn. Hin heval li Derî şehîd bûn, hin heval li cebheya rojava şehîd bûn. Hevala Ozgur berpirsiyara cebheya rojava bû. Wê rojê birîndarên me çêbûn, şehîdên me çêbûn lê hêza me ya bingehîn derbe nexwar. Çete şikestin, li xeta başûr sê tanqên wan îmha bûn. Dijmin weke ku dixwest metroyekê jî pêş de nehat. Ya din jî hemû cenazeyên wan li erdê man. Bi kurtasî, şikestin. Helbet vê avantajek xist destê me. Wê rojê, me bi şiklekî fermî hemleya rizgarkirina Kobanê da destpêkirin. Me got êdî pêwîst e em dijmin ji ser xaka Kobanê biavêjin. Hêza me ya ku çûbû pişt dijmin, ew jî hat hundir.

Me operasyona rizgarkirina Kobanê ji 29'ê Mijdarê û şûn de da destpêkirin. Ji vê dîrokê bi şûn de êdî gav bi gav hemle dest pê kir. Destpêkê wek teqtîk me gelek xet wisa dane sekinandin. Weke Derî û Xeta Asayîşê. Me xwest ji milê başûr de em qorîdorekê vekin. Wisa Botana rojava û rojhilat heta Kaş yanî hewzê avê û piştre em ji wê derê derkevin Miştenûr. Em girê Miştenûr bigrin êdî em di wê derê re pêş de herin. Dîsa hemû hêz û xet bi hev re pêşkevin û kolan bi kolan em rizgar bikin. Plana me ya giştî ya rizgarkirina bajar bi vî rengî bû.

Hemle bi vî awayî dest pê kir. Me di milê başûr de dest pê kir. Dijmin jî êrîşên xwe li nava bajêr xurt kirin da ku em li cebheya başûr pêş de neçin. Eger li wê derê pişta me bigrin, em ê ji neçarî paş de werin. Lêhûrbûna wan hemû li qada Azadiyê û nav bajêr bû. Mînak, beriya em bigihîn 'mekteba reş', di rojekê de 18 kesan xwe li ser hev teqandin. Êrîşeke dijwar bû ku me di wê xetê de bişkînin. Ji bo ku em bi hêla Miştenûr de pêş ve neçin, dijmin çiqas bi erebeyên bombebarkirî êrîş kir jî lê nikarîbû pêşveçûna me bişkîne. Di van şeran de Hevala Dîcle, Hevalê Cûdî û Hevalê Dilgeş di bajêr de şehîd ketin. Li hember êrîşan bi roleke mezin rabûn. Hem di çûna pişt dijmin de weke gerîla, hem jî di hatina bajêr û di destpêkirina hemleyê de Hevalê Cûdî roleke xwe ya mezin hebû. Di şerê bajêr de bi guleya sekvanan şehîd ket. Hevalê Dilgeş dîsa wisa, cihê ku Hevalê Dilgeş li wê derê bûya timî pêşketin hebû.

Her em pêş de çûn dijmin xwest pêşiya me bigire. Piştî qedemakê wan dest bi teqtîkên nû kirin. Di bajar de her der kirin mayin. Êdî diyar bû ku em ketin qonaxa pêşketinê û ew jî ketin ya parastinê. Ev pêvajoya serkeftinê gihişte heta bi rizgarkirina Miştenûr! Helbet Miştenûr ji bo Kobanê wate û cihekî xwe yê cûda heye. Eger ez vegerim serî esas dema çete ketin bajêr û Miştenûr girtin moralê Kobaniyan jî têk çû. Ji ber ku li gel Kobaniyan wateyeke pir cûda ya Miştenûr heye û wek destekî li ser serê bajêr dibînin. Jixwe dema gir ket, Kobaniyan got, "*Miştenûr jî çû, êdî her tişt çû.*" Jixwe beriya em Miştenûr rizgar bikin, bi sedan telefon ji me re hatin û digotin, "*we Miştenûr girt yan na?"* Nedigotin *"ka we Kobanê girt yan na!"* Her kesî bi vî rengî pirsa Miştenûr dikir. Esas plana me ya rizgarkirina Miştenûr jî bi vî awayî deşîfre dibû. Beriya em herin bi rojekê me got, "*em Miştenûr nagirin!"* Ji bo ku plana me deşîfre nebe, me ji televizyonê re bi vî awayî daxuyanî da. Me got jixwe em niha bi bajêr re mijûl in.

Helbet girtina Miştenûr bi awayekî xwezayî bi xwe re hêvî û bawerî çêdike. Bi rastî jî wateya wê cûda ye. Roja Miştenûr hate girtin esas weke mirov ji nû de were dinyayê. Helbet coş û heyecanek da her kesî. Di dijmin de jî êdî hêvî û bawerî şikand. Bajar bernedan lê hêviya wan şikest. Dema me Miştenûr girt me riyên wan hemû girtin. Me riya wan ya Helebê girt. Jixwe em çûbûn gihîştibûn dawiya bajêr û me Botana rojava û rojhilat girtibû, êdî dijmin ji milê başûr ve nediket bajêr. Li gundan bû, li Têrmik û Mêmîtê bû. Tenê dihat ji milê Mizir de diket destpêka taxa Kaniya Kurdan û Miktelê. Heta Mekteba reş di dest wan de mabû. Dema me Miştenûr girt riya Helincê jî bi awayekî xwezayî hate girtin. Yanî rêkên ku di Helincê re tên û dikevin bajêr, Miştenûr li ser serê wan e. Çi erebe dihat Hevalan lê dixist. Tenê rêkeke wan mabû, di rêka Mizir de bi erebeyan bi lez dihatin. Me doçqa danîbû ser serê Miştenûr, ew di ku re dihatin Hevalan lê dida. Ya din jî keşf û balafir li ser serê wan bû. Ji bo wê bandoreke psîkolojîk li ser wan çêbû. Me êdî fersend neda wan ku tevger bikin an jî pêş de werin.

Ya din jî dema me Miştenûr girt me lez da hemleya xwe ya nava bajêr. Me got, "*divê hemû hêzên me pêş ve biçin*!" Helbet ev serasera çênebû. Yanî bi rêk û pêk, her rojê wê kîjan tax pêş de here, kîjan dever gihîşt kuderê, bi kordîneyî me diyar dikir.

Piştî me Miştenûr girt di hemleyekê de Mekteba reş, bi hemleya duyemîn Asayîş hate rizgar kirin. Dîsa Mekteba Seydan û ew taxên din hatin girtin. Êvara 26'ê Çile me hemleyeke mezin kir û balafiran jî lê xist. Du tax mabûn di destê wan de; Kanî û Miktelê. Êdî di her du taxan de dijmin pir teng bûbû. Derfetên wan li wê derê kêm bûn. Ji derve jî ketin û derketina wan zehmet bû. Jixwe operasyona me jî bê navber berdewam dikir. Her kesî dixwest zû bigihîje dawiya bajêr. Di demeke kurt de taxên ku di destê wan de jî mabûn me girtin. Jixwe dijmin revî, yên mayî mirin, kolan tije cenazê wan bûn. Yê din jî bi lez û bez bi şev xwe avêtin Şêranê û Helincê. 26'ê Çile bi giştî dijmin ji nav bajarê Kobanê hate avêtin. Gundê Memîtê û Têrmik jî yên ku li dawiya bajêr in, me girtin. Bi rizgarkirina bajêr re rewşeke pir cûda derket meydanê. Êdî derfetên ku çete cardin xwe bi ser hev ve bînin û êrîşî bajêr bikin neman. Lê çeteyan xwestin xwe li derdora bajêr bigrin ku xwe bi ser hev de bînin û car din êrîş bikin. Lewre jî gund bernedan.

***-Bawer im we jî di rizgarkirina Kobanê de cih girtiye, wê demê rewşeke çawa hebû?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Rast e, jixwe çûyina min a Kobanê, rastî dema rizgarkirina bajêr tê. Dema ku em çûn, şeva ewil ku me plan kir ku em roja dîtir xetê xurt bikin, dijmin ji xeta şaredariyê re êrîş kir. Wê demê hevalan agahî dan û gotin, "*dijmin xeta me parastinê derbas kiriye û ber bi deriyê Bakur ve tên.*" Me hêzek girt û em çûn wir. Hejmara me kêm bû, me ji çend aliyan ve pêşî birî û me xwest em mijûl bikin. Quwetek jî nû taqwiye hatibûn, me nexwest di roja yekemîn de em wan bixin nava şer.

Lê dema ku êrîş wisa çêbûn, me gazî wan hevalan kir. Bi wan hevalan me li wir xetek çêkir. Her çiqasa xeta ku me plan kiriye hinekî paş ve hatibe jî, ji bo DAIŞ'ê ew cih bû xeta dawî ya pêşve hatinê. Dû rojan ji wî milî ve xwestin pêş ve werin, lê hevalan ber xwe da. Bi vî rengî bêyî ku eniyên din nas bikin, em jî ketin nava pratîkê. Dijmin giraniya êrîşan dabû wê xetê û me jî bi hemû hêza xwe ew xet diparast. Sê çar rojan pêvçûn çêbûn. Piştî ku me êrîşên dijmin di wir de şikandin, divê em pêş ve biçûyana û ew cih bigihanda xeta rastê û çepê, da ku dijmin di nava me de nemaba û êrîşên xwe rehetî pêş nexistibana.

Dema ku koalîsyona navnetewî jî dît ku em ê ber xwe bidin û çi dibe bila bibe em ê Kobanê biparêzin, ew jî ketin dewrê. Êdî ew bajar xirap jî bûbûya, divê em di wir de ser biketana. Lewma em di wir de bin biketana, hemû Şoreşa Rojava û têkoşîna azadiya Kurd darbe bixwara. Dê ew binketin weke deqêkê gemar di dîroka Kurdan de bima. Gelê Kobanê jî digot *"bila di Kobanê dê şervanên YPG û YPJ birîndar nebin, şehîd nekevin û têk neçin; Kobanê xirab dibe jî bila xirab bibe. Bila em dîsa vegerin axa xwe û divê em di nava şervanên xwe de bin, em razî ne ku di konan de razen."* Daxwazî û bîryarbûneke wisa di gel de jî çêbû.

Foto-56

Li ser vê esasê pengava me jî dest pê kir. Di pengava ewil de me dijmin ji nava xwe derxist û me gihand xeta xwe ya ku plan kiriye. Bi vî rengî me çep û rasta xwe teqûz kir.

Dema ku dijmin jî dît ku xeteke parastinê çêbûye û berxwedanek çêdibe, êrîşên pir dijwar dimeşandin. Her cureyê êrîşê hebûn. Li hemberî wan êrîşan jî divê daneheveke hevalan hebûya. Divê bi profesyonelî şerek bihata meşandin. Ji destpêkê ve amatoriyek hebû, lê ked û fedaîtiya hevalan bi gotinê xilas nabe. Xwestek û wêrekiyek hebû, rihekî fedaî hebû. Di hemû hevalan de rik û ecizbûneke hişk li hemberî dijmin hebû. Digotin, *"dijmin çawa dikare bikeve Kobanê."*

Lê divê ew wêrekî û fedaîtî bihata rêxistinkirin. Ji ber ku hestiyarî jî pir zêde bû, wêrekiya kor derdiket pêş. Bi rêbazên aqilane meşandina şer û serxistin lewaz bû. Her xwesteka pêş ve çûnê di hevalan de hebû, lê divê ewilî xeteke parastinê ya teqez bihata çêkirin.

Dijmin jî her bi psîkolojiya serketinê tevdigeriya. Nêzîkî mehekê her çiqasa dijmin nikarîbe pêş ve were jî êrîşên dijwar didomandin. Me jî xeta xwe her xurt dikir. Di wê navberê de hevalê Gelhat jî hatibû. Li gel wê vesazbûnek jî çêbû. Bi vî rengî di rêveberî û eniyan de arastebûnek çêbû û gav bi gav hakîmiyetek pêş diket.

Êrîşên dijmin jî her berdewam dikirin. Ji Kaniya Kurdan heya qada azadî her roj êrîş hebûn. Êrîşên herî dijwar jî ji rêka Helebê, heya Qada Azadî û sînor çêdibûn.  Ew cih her hedef bûn. Careke duduyan li xeta rojava êrîşî Til Şehir jî kirin, teyareyan lêxist û darbe xwarin. Di navbera Kobanê û gundên Zorava wan deran de deşteke rût heye. Çûyin û hatina wan zehmet bû. Dervayî bajêr jî li ser girekî parastina me hebû û hakîmiyeta me li ser deştê çêdibû. Ji ber vê nedikarîn ji wî milî ve hereket bikin. Êrîşên wan bi piranî di nava bajêr de bûn.

Bi vî rengî dema ku piştî mehekê xeteke parastinê çêbû, ji dijmin re jî dengeyek hate avakirin. Dijmin jî dît ku êdî nikare pêş ve were. Her ku dijmin dihat, hevalan lê dida û dijmin darbe dixwar. Êdî heval elimîbûn cihê xwe, çep û rasta xwe diparastin, kordîneyeke hevpar hebû, perda hatibûn danîn û tevgrên hevalan veşartî bûn. Dîsa jî dijmin di kû de valatî bidîta êrîş dikir û şehadet dihatin jiyankirin, lê êdî nedikarî darbe li hevalan bide û wê xetê bişkîne. Dijmin nîvê bajêr girtibû, lê me jî xeteke berxwedanê ava kiribû. Dijmin dizanî ku ger nikare berxwedana me bişkîne, nikare di cihên dîtir de jî bimîne.

**Li Kobanê her hevalek artêşek bû**

Ji milê başûr ve êrîşî navenda hûkûmeta Kobanê kirin. Di wir de şerekî dijwar derket û bi berxwedana hevalan ew êrîş jî şikest. Li wir zêdetirî 30 cenazeyên dijmin ketin destê hevalan, dijmin darbe xwar. Hevalê Kendal berpirsiyarê wê êniyê bû û di wî şerî de rista wî pir zêde bû. Her wiha li wir hevala Azîme û hevalên dîtir ku hevalê Kendal timam dikin jî hebûn. Di wê derê de xeteke berxwedaniyê çêdibû. Her çiqasa dijmin li wir şikandibin jî, roja dîtir dijmin dîsa êrîş kir. Di ew êrîşa dawî de hevalê Kendal jî şehîd ket. Li Kobanê her hevalek ji bo me bûbû arteşek. Lewma her hevalek ku rista xwe dîlîst çeperek-êniyek digirtin. Bi taybetî tesîra şehadeta hevalên weke Şehît Kendal pir zêde dibû. Hevalên weke Şehît Kendal ku di wê astê de xwedî danehev û bihêz kêm in. Ji ber wê şehadeta wî pir giran bû. Min hevalê Kendal li wir dît, hevalekî pir dilgerm bû. Her bi coş û kelecan bû.

Hevalê Dilgeş jî ji destpêka şerê Kobanê ve di nav de bû, têkoşîneke dijwar meşandibû û sê caran birîndar bûbû. Rûxmî wê jî tû caran gav paş ve nediavêt û her çavê wî li derxistina dijmin bû. Nedihêlişt ku hevalên berpirsyar biçin êniyê û ji milekî ve jî hevalên xwe diparastin. Bi xwe li ser êniyê digeriya û pêwîstiya wê demê çûbûya pêk dianî. Her moral û bawerî didan hevalan. Li cihêkî hevalê Dilgeş hebûya, dudilî û fikar çênedibûn. Mesela hin ciwanên ku seferberiyê hatine hebûn, carna ditirsiyan. Lê dema ku hevalê Dilgeş bi wan re diaxifî û diçû gel wan, hemû wêrek dibûn. Ji bo baweriye bide hevalan, li hemberî wan termal digirt û dijmin dixist.

Risteke wî ya girîng di nava wî şerî de hebû. Her çiqasa hevalekî ciwan be jî, bi berpirsyariya xwe û cîdîyeta şer tevdigeriya. Fikara wî her rizgarkirin û paqijkirina Kobanê bû. Di nava wî şerî de ti fikarên din jiyan nekirin. Gelek kes hebûn, di nava şer de neyînî tesîr dibûn, eciz dibûn û diwestiyan. Lê hevalê Dilgeş şev û roj ranediza, dîsa jî dema ku te rûyê wî meyze dikir; mirov tiştekî neyînî nedîdît, her zindî û bi moral bû. Ji ber van sedeman di kêliyeke wisa de şehadeta fermandarekî weke hevalê Dilgeş ji bo me pir giran bû.

Li milê Kaniya Kurdan jî êrîş dijwar dibûn, jixwe ji wî milî re dixwestin xwe bigihînin dêrî. Bi taybetî li ser eniya Şehît Destîna pir êrîş hebûn, da ku wê êniyê bişkînin û xwe bigihînin dêrî. Êdî Kobanê ji bo wan bûbû meseleyeke xwe îspat kirinê. Ji ber vê çiqasa darbe dixwarin û cenazeyên wan li erdê diman jî, êrîşên xwe nedidan sekinandin. Bi taybetî quwetên xwe her diguherandin û êrîşî dêrî dikirin. Pê ve girêdayî seyareyên teqînê xistin dewrê. Wan teyareyên biçûk yên keşfê rê dikirin, cihê hevalan keşif dikirin û seyare dişandin û di wê derê de diteqandin. Cihê ku Şehît Rojda tê de bû, 3-4 maşîne tê de teqandin. Lê nikarîn wê derê derbas bikin. Bi rastî jî rihekî wisa çêbûbû ku paş ve gav avêtin tine bû. Hevala Rojda jî di wan êrîşan de şehîd ket.

Foto-57

Dijmin jî êdî dizanî ku bi şerê sîng bi sîng nikare pêş ve were, li kuderê valatiyek bidîta êrîşî wir dikir û di wê derê de qada xwe berfireh dikir. Mesela li Kaniya Kurdan cihekî qedera 200 metro valatî hebû, hema ketin wir û di wir de cihê xwe xurt kirin. Ji ber ku kolanên wir jî teng in, karîbûn hemû wir qût bikin. Di navbera wan û hevalan de, 10 metro hebûn. Êdî her roj ji wî milî ve êrîş dikirin, dixwestin wir bişkînin û derbasî dêrî bibin.

Li wê derê gelek hevalên me yên fermandar jî hebûn. Ji bo ku em êrîşên wan bişkînin, me bîryar girt ku em êrîşî wan bikin. Komek heval çû û êrîş kir. Gelekên wan kuştibûn û çekên wan rakiribûn, lê dîsa paşve neçûbûn. Roja dîtir planlamayeke berfirehtir hate kirin, da ku em ji wan li wir derbixin. Hevalê Gelhat li ser wan êrîşan disekinî û kordîne dikir. Dê ji du milan ve êrîşî ser wan bikirana. Dê em jî ji milê mizgefta Hecî Reşîd ve pêş ve biçana. Dê me jî ji wî milî ve taqwiyeya wan qût bikira û dê ew çete bi giştî biketana dorpêça me.

Arastebûnên wê êrîşê jî hevalê Gelhat çêkirin. Hevala Sorxwîn û hevalê Rêber jî piştgiriya hevalê Gelhat dikirin. Ew koma wan ya êrîşê ketibû nava hevalan, ger me ew di wê derê de îmha bikirana dê wê êniyê êrîşên wan bihatana şikandin. Li ser vê esasê planlama çêbû û em ketin tevgerê. Trekseke me ya zirxî hebû, ew ketibû dewrê û hevalan xwestibû hin dîwaran hilweşînin.

Lê di wir de birîndarî çêbûbûn û tengaviyek çêbûbû. Dijmin êrîşî ser wan hevalên birîndar kiribû û hevalê Gelhat jî xwestibû mûdaxale bike. Di encama pevçûnan de hevalê Gelhat giran birîndar bûbû û rakiribûn nexweşxwaneyê. Dema em çûn, me dît ku dijmin di wê derê de xwe ase kiriye, ber êvarê ve me planlamayeke nû çêkir. Me cihê wan da teyareyan, teyareyan lêxist û pişt re me operasyon kir û ew der paqij kir.

Me li wê derê 15 cenaze û yek jî dîl bi dest xist. Piştî wê jî heya mizgefta Hecî Reşîd operasyonek hate dar xistin û qadeke berfireh em pêş ve çûn. Hêza xurt ya dijmin di wir de bû, ji ber ku li wir darbe xwarin hêza wan jî şikest. Li ser wê esasê roja dîtir jî me operasyon berdewam kirin û heya qada şaredariyê û Sûkilhal hat ew sêkoşeya bi giştî me girt.

Di encama wê pengavê de hevalê Gelhat bi giranî birîndar bû û şehîd bû. Hevalê Gelhat ne fermandarê ênî, an jî çeperekê bû. Fermandariya giştî ya Kobanê de bû. Lê ji ber ku heval pir şehîd diketin û birîndarî pir çêdibûn, da ku valatî çênedibûn, her bi çeper û eniyan re mijûl dibû. Qet di cihê xwe de nedisekinî xwe nediparast.

Di heman demê de komên ku derketina dervayî Kobanê, cihên weke riya Helincê û Miştenûr jî çalakiyên bi bandor dar dixistin. Hevalê Masîro, Cemşîd û Şervan planeke berfireh derxistibûn û ew qad giştî girtibûn, rêkên dijmin qût kiribûn. Mesela şer li wir rojeke berdewam kir. Vê yekê jî hêzeke mezin da me. Beriya wê hevalên ku derketine dervayî bajêr bi şêwaza gerîla çalakî dikirin, bi piranî mayin diteqandin. Lê cara yekemîn di Helincê de, rojekê heya êvarê şer hatibû kirin û hevalan tê de encam jî girtibû.

Me cîhazên dijmin guhdarî dikirin. Ketibûn nava panîkê. Ji Girêspî û cihên dîtir taqwiye dixwestin. Digotin, “*ew ketine pişta me, rêka me qût kirine.”* Di ew şerê Helincê de her çiqasa dijmin nikarî bû hevalan bişkîne jî, êvarê hevalan weke komên biçûk û şêwaza gerîla xwe dîsa li araziyê belav kiribûn. Lê diyar bû ku êdî em li her cihî dikarin darbeyê li DAIŞ’ê bidin.

Piştî ku me Kaniya Kurdan êrîş kir û me pengav gihand astekê. Divê di wê navendê de jî pengavek pêş biketa û me xwe bigihanda xeta şaredariyê û navenda asayîşê. Da ku xeta wir re yekbûyin çêbibe. Me bîryar girt ku em ji wî milî ve pengavekê çêkin û xwe bigihînin Sûkûlhal. Ya din jî divê eniya hevalê Cûdî pengavek çêbikira û xwe bigihanda wê xetê. Me li milê Kaniya Kurdan planlama çêdikir, hevalê Cûdî jî li eniya xwe planlama çêdikir. Da ku em bi awayekî hemwext pêş ve biçin.

Di wê demê de perspektîfên bîryargehê jî hatin, divê êdî me dijmin bişkenda û darbeyên mezin li dijmin bida. Di encamê de jî divê êdî Kobanê bihata rizgarkirin. Ji kuştina dijmin, cenazeyên wan bi dest xistin û li ser wan cebilxane rakirinê zêdetir, divê êdî armanca me bi giştî paqijkirina Kobanê ba. Ji bo wê hevalan ji me re taqwiye jî şandin. Di asta rêveberiyê de jî hevalê Seyîd, hevalê Şivan û hevala Rûken hatin. Bi hatina wan re bi plan û vesazbûneke nû hate çêkirin. Da ku em derbasî asta êrîş û pengavên rizgarkirinê bibin.

Lewma şerê Kobanê êdî diziviriya şerê kolanan û wê jî bi xwe re dubarebûnek dianî. Di warê teqtîk de lewaziyek çêdibû û divê êdî em ji wê merheleyê derbas bibana. Li dervayî bajêr jî hevalan bi şêwazên dewlemend dijmin dixistin, lê ji bo rizgarkirina Kobanê têrê nedikir.

Roja ku me pengav da destpêkirin, dijmin jî êrîşên pir dijwar çêkirin. Êdî tesadûfî bû, an agahî girtîbûn nizanim. Dema ku hevalan ji milê derva ve Miştenûr girtin, wan jî di destpêkê de li milê Başûr êrîş kirin. Gelek maşîne teqandin, tanqên xwe xistin dewrê. Quweta wan yê duyemîn ji milê qada azadiyê re êrîş kir. Quweta wan ya seyemîn jî ji milê Tirkiye re êrîşî dêrî kirin. Li ser rêkê cihekî hevalan hebû, di wir de maşîne teqandin. Şehadet û birîndariyên me çêbûn. Ew cihê me dervayî bajêr, di nava araziyê de bû. Seyareyek di wir de teqandin û maşîneyên din jî di navbera cihê nexweşnayê û asayîşê de teqandin.

Ji ber ku pengav û êrîşên me gihêştibûn astekê, êrîşên dijmin yên herî dawî li ser derî hatine darxistin jî bi ser neketin. Jixwe di şer de daneheveke hemû hevalan çêbûbû. Ji milekî hevalan êrîşî Miştenûr kiribû û ew xet girtibûn. Bala dijmin çû ser wir. Cihên dîtir jî hevalan berxwedanek nîşan dan. Di dêrî de jî rihekî fedaî derket pêş. Tabûreke me ku di nava şer de bûbû xwedî danehev hebû. Hevalên gelek zîrek bûn. Me ew gel xwe digirtin û didan vesandin. Da ku li kû êrîş çêbibin, mûdaxaleyî wir bikin.

Me ji wan hevalan grubek yekser rêkir dêrî, me komek rêkir eniya hevalê Heqî, komek şandin eniya hevalê Mazlum, grubek jî me da sekinandin. Li her cihî ve hevalan li dijmin da. Teyareyên koalîsyonê jî piştgirî da û 2-3 tanqên wan îmha kirin, çend komên wan yê taqwiye xistin. Bi taybetî di dêrî de şerekî pir dijwar qewimî. Kîjan heval bihîstîbû ku êrîş li ser dêrî hene, berê xwe dabûn wir. Hevalê Evdo, Ebû Leyla, Şehît Rênas û grubê ku me şandiye xwe gihandibûn dêrî. Her wiha hevalên asayîşê, hevalên saziyan, hevalên cebilxanê de kar dikirin, hemûyan berê xwe dabûn wir.

Di ew şerê dêrî de, ji sibê heya êvarê pevçûnên dijwar berdewam kirin. Darbeyeke pir mezin me li dijmin da. Jixwe êvarê hevalan êrîş kir û ew der jî girtin. Hemû cenazeyên xwe pişta xwe berdan û reviyan. Li hemû eniyan dijmin şikest. Vî şerî jî îspat kir ku bîryara me ya pengavê çiqasa rast û di cihê xwe de ye. Cara duyemîn bû ku dijmin li ser Kobanê êrîşeke wisa giştî plan kiribû û cara duyemîn  bû ku di wê astê dihatin şikandin.

***-Piştî wê êrîşê, di plansaziyên rizgarkirina bajêr de guhertin çêbûn an na?***

Piştî ew pengava me û êrîşên dijmin, me rewş ji nû ve girt dest. Quweta hatiye Miştenûr û eniya başûr û eniya Çilûheştan negihişt hev û din. Ji ber vê hêzên me yên derva jî hatin bajêr û ew quwet bû eniya Çilûheştan. Bi vî rengî 4 eniyên milê Rojhilatî çêbûn. Êniyek li milê başûr çêbû û êniyek jî li milê rojava çêbû. Bi vî rengî 6 eniyên esasî çêbûn.

Divê ji bo rizgarkirina Kobanê, dorpêçkirina dijmin esas bigirta. Hevalan jî digot, rêka di navbera Girêspî û Kobanê, rêka Heleb û Kobanê qût bikin. Lê dîsa jî hevalan însîyatîf ji me dihêliştin. Her wiha divê me hin cihên stratejîk tabûrên xwe bi cih bikirana. Ji milê derva jî piştgiriyek hebû. Koalîsyona navnetewî, peşmergeyan, çepên Tirkan, hin hêzên mûxalîf piştgirî didan me.

Her wiha ji her cihê cîhanê mirov beşdarî me dibûn û rihekî hevpar yê mirovahiyê çêdibû. Kobanê bala cîhanê hemûyê kişand ser xwe, divê me jî li gorî felsefeya Serokatî, daxwaz û hêviyên gelê Kurd û mirovahiyê serkeftinek bi dest bixista. Êdî zelal bû ku ew daxwaz wê pêk werin. Lê ji bo zêde şehadet çênebin û berdelên giran nayen dayin, divê teqtîk bihatana esas girtin. Ji ber ku me gelek birîndarî û şehadet jî jiyan dikirin, hevalan em rexne dikirin. Hevalan ew qesa quwet ji me re şandin, divê me ew quwet derbixista derva û pengav ser bixista. Lê em bi tevdîr tevdigerîn. Ji bo ku em windahiyên giran nedin, em lezgîn tevnedigeriyan.

Hemû quwetên me di nava bajêr de kom bûbûn. Ji bo ku em di nava bajêr de xwe tengav nekin, me careke dîtir komên sabotajê û çalakiyan derxistin dervayî bajêr. Di wir de jî hinek lewazî derketin. Lê me pengava xwe berdewam kir. Ew quweta hevalê Masîro ku ketiye nava bajêr, milê Miştenûr û eniya Çilûheştan diparêze. Ji wî milî ve dijmin dan ber xwe û pêş ve çûn. Ew heval heya medreseya Yermûk çûn. Me tabûreke din jî şand aliyê wan.

Milê din jî gav bi gav pêş ve çûyin hebû. Li gorî wê taqwiye ji wan eniyan re jî diçû. Ji eniya hevalê Heqî re jî li qada azadiyê pengavê destpê kir. Heya navenda hûnerê çûyin çêbû û hevalan ew der girt. Piştî ku navenda çandê û medreseya Yermûk hate girtin, moralekî mezin çêbû. Gelê Kobanê pê kêfxweş bû. Dema ku DAIŞ'ê ew navenda çandê girt, daxûyaniyên weke "*me ew der jî girt, êdî li Kobanê hûn nikarin tiştekî bikin, radest bibin*" dabûn. Ji bo vê yekê girtina wê derê gelek peyam didan dost û dijminan. Di rizgarkirina navenda çandê de, hevalekî Faris Rojvan jî şehîd ket.

Cara ewil hevalekî Faris di nava têkoşîna me ya Rojava de cih girtibû, ji bo tiştek li wî neye hemû heval bi baldar tevdigeriyan û ew diparastin. Hevalan di xetên paş de her li gel komên parastinê dihiştin, lê dema ku dîtibû heval birîndar bûne, çûbû eniya pêş ku hevalan xilas bike. Dijmin jî bi sekvaniyê ew şehîd xistibû.

Roja dîtir jî pengavê heya kolana Şehît Murat berdewam kir. Dîsa em pêş ve çûn. Du ênî bi hev re pêş ve diçûn, da ku dijmin nekeve navbera wan. Li eniya din jî, heya rêka Helincê heval 150 metro pêş ve çûn. Cara ewil di nava rojekê de me ew qesa qadeke berfireh digirt. Roja din eniya hevalê Mazlum ket dewrê û şaredarî girt. Roja piştî wê jî divê hevalan xwe bigihandan medreseya reş û asayîşê. Divê eniya hevalê Selahadîn jî biketa Sînea û Sûkilhal. Li milê Miştenûr jî êrîşên dijmin zêdetir dibûn. Lewma hevalan xwe gihandibû qontarên Miştenûr û ew ji bo dijmin xeteriyeke mezin bû.

Piştî ku em du rojan wisa pêş ve çûn, roja seyemîn dijmin li hemû eniyan êrîş kir. Wê rojê xwezî dîmenên wê bûyerê bihatana kişandin. Dijmin agir berda hemû cihên ku ne di destê me de ne. Ew yek pir zora me çû. Rast e her roj şer bû, birîndarî û şehadet çêdibûn. Lê wê rojê agir berdidan Kobanê. Bi agir berdanê, êrîş dikirin. Li ser cîhazên xwe jî propagandaya wê dikir û digotin, "*binêrin Kobanê tine ye, Kobanê hemû di destê me de ye û em*

*dişewitînin."* Bi rastî jî dema ku li her aliyê Kobanê ew dûkelê reş rabû, mirov pir xemgîn dibû. Ji milekî ve jî dûkel derdixistin da ku teyare nikarîbe li wan bidin.

Bi vî rengî ji milekî ve pêşveçûna me çêdibû, ji milekî ve jî dijmin êrîş dikir û darbeyên giran dixwarin. Piştî ku dijmin êrîşî Medreseya Reş kir, roja dîtir me li eniya hevalê Mazlum pengavek da destpêkirin. Da ku Sûkilhal bê girtin û milê Kaniya Kurdan yekser bikeve kontrola me. Li wan deran teyareyan jî nedikarî alîkariya me bike. Dijmin jî pêşiya me pir zêde kêmîn danîbûn. Divê em pir bi tevdîr tevbigeriyana. Wisa hevalan gav bi gav pêş ve çûn û bi awayekî serkeftî ew cih bi dest xistin. Medrese, saziya ciwanan û bînaya hikûmetê hevalan girtibû, tenê asayîş mabû. Jixwe ew cih hemû xirab bûbû.

Eniya hevalê Selahadîn jî pêş ve diçû û hinek cih digirtin, da ku valatî di navberê de çênebe. Wan jî di roja destpêkê de Sûkûlhal girtin, lê piştre pevçûnên dijwar çêbûn. Hinek heval di wê derê de birîndar bûn, ji ber wê me xwest heval xwe bidin paş. Lewma nedikarîn wê derê biparêzin û dê darbe bixwarina. Lê roja dîtir planlama hate çêkirin, da ku zêdetir pêş ve biçin û xwe bigihînin xeta hevalê Mazlum û hevalê Heqî. Li ser wê esasê hemû heval ketin tevgerê. Dijmin panîk jiyan kir û reviya. Lê êrîşên giran li ser Miştenûr hebûn. Di wê derê de gelek heval birîndar bûn.

Ji ber vê hevalê Zehra çû wê êniyê, hevalê Dayan jî her bi wî milî re alaqadar dibû. Ji ber ku dijmin dizanî ji Miştenûr derketina wan mirina wan e, dev ji Miştenûr bernedidan û êrîşên xwe herî zêde li wê derê dijwar dikirin. Carna êrîşî milê başûr jî dikirin, da ku êrîşên me yên li ser Miştenûr bişkînin. Lê hevalan piranî qontarên Miştenûr girtibûn, her roj pêş ve diçûn. Ger hevalan Miştenûr bigirta. Me jî dikarî li aliyê Kaniya Kurdan, pengava dawî ya serkeftinê pêş bixin. Ji bo giştî rizgarkirina Kobanê me hefteyek dabû pêşiya xwe. Divê me di nava wî hefteyî de her cih paqij bikira.

Dema ku hevalan xwe gihandin Miştenûr, em ji milê başûr ve jî pêş ve çûn. Da ku em rêka Helebê qût bikin. Hevalê Masîro ji eniya Miştenûr re mijûl dibû. Heval di şeva yekemîn de gihêştin Miştenûr, ew cihê ku ala me lê çikiyabû. Hin malên wan derdoran girtin û çeperên xwe teqûz kirin. Careke din dijmin êrîşî wan kir, lê hevalan carek cihê xwe girtibûn, ne gengaz bû ku dijmin careke din wir bigre. Jixwe divê piştî wê demê divê tu caran gav paş ve nehatiba avêtin. Milê Memîtê jî heval pêş ve çûn û Qosê Kobanê girtin.

Piştî wê, pengava gundê Memîtê dest pê kir. Gundê Memîtê du heb in, jixwe yek hevalan girtibû. Ger yê din jî bihata rizgarkirin, dê milê başûr giştî rizgar bûbûya. Li milê Rojhilatî Kaniya Kurdan mabû. Divê bi pengavekê ew der jî bi giştî bihata rizgarkirin.

Piştî ku Miştenûr hate rizgar kirin û milê qûlbe jî xeteke parastinê çêbû, teyareyên koalîsyonê jî zêdetir bomberan kirin. Ji ber ku koalîsyonê dît me ji her milî ve pengav daye destpêkirin, wan jî ketin tevgerê. Ji bo pengava Kaniya Kurdan jî di seat 10'an de em ketin tevgerê. Heval bi kontrol pêş ve diçûn, lê pêşiya xwe tiştek nedîdîtin. Quwetê ji milê Başûrê Kaniya Kurdan ve pêş ve çû, rastî dijmin nehat. Quweteke me jî ji milê Başûr ve çû û xwe gihand girê Kaniyê Kurdan, wan jî rastî dijmin nehatin. Bi vî rengî me fêm kir ku dijmin ji wê derê reviyaye. Weke tevdîr hevalan mal bi mal hemû cih jî kontrol dikirin. Heya êvarê vê operasyonê berdewam kir.

Bi serkeftina vê pengavê di 26'ê Mijdarê de Kobanê bi giştî rizgar bû. Ji bo vê 26 Mijdarê 2014 ji bo dîrokek pir girîng e.

Bi vî rengî rizgarkirina Kobanê hate îlan kirin. Çeteyan 2 doçqayên 23 cihê xwe hiştibûn, roketên tanq û hawanan hiştibûn, cebilxane hiştibûn, seyareyên teqemeniyê ku ji bo êrîşê amade kirine hiştibûn. Bi awayekî panîk û psîkolojiyeke tirsê Kobanê terk kiribûn.

Moral û coşê hevalan pir zêde bûbû. Êdî kontrolkirina hevalan zehmet dibû. Milekî ve dîlan dikirin, ji milekî ve guleyên pîrozbahiyê diteqandin. Hê xeterî jî hebûn, mesala gundê Helincê ku kîlometreyekê dûrî bajêr hê di destê dijmin de bû. Lê ji ber ku Kobanê rizgar bûbû, êdî xema hevalan nemabû. Bi rizgarkirina Kobanê, hevalan gundê Memîtê jî girtin. Gundê yekemîn yê Kobanê ku hatiye rizgarkirin jî ew gund bû.

***-Rizgarkirina Kobanê, hûn çawa dinirxînin? Ya din jî, piştî ew berxwedaniya mezin ku bajar rizgar kir, di tektîkên DAIŞ'ê de guhertinên çawa çêbûn?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Di encamê de şerê di nava bajêr de, êdî însiyatîf, serwerî, teqtîk di hemû aliyan de ketibû destê me. Êdî em dihatin ber bi nîva meha Mijdarê. DAIŞ'ê di vê mehê de êrîşên xwe pir zêde kirin. Bi taybetî di xeta Çand û Hûnerê de, qada Azadiyê de, di riya Heleb de, tim û tim dixwestin riya ku ji Tirkiye tê û diçe Helebê, navendê bajêr bixin kontrola xwe û bi vî awayî me tenê di taxeke de sînordar bikin. Ji bo wê di çar hêlan de ser hev êrîş dikirin.

DAIŞ êdî şikiyabû. Êdî DAIŞ'ê xwe şûn ve dikişand, tenê di hinek cihan de xwe bi cih dikirin û dixwestin hîn li ber xwe bidin. Jixwe DAIŞ rêxistineke pir hişk e, zû bi zû binketina xwe îtîraf nake, ji bo wê jî eşkere nedixwest ji

bajêr derkeve. Di 15-20'ê Qanûnê û şûn ve DAIŞ di bajêr de şikiyabû. Lê dîsa jî nedixwest ji bajêr derkeve, jê re bibû înadek ji bo ku bajêr bigire.

Di vê demê de êdî pir cih ketin dest hevalan. Alîyê Mekteba Reş DAIŞ têde mabû. Di Kaniya Kurdan de mabû. Taxa Kêş, Mikderê de mabûn. Weke din piranî hevalan girtibûn, ji DAIŞ'ê sitandibûn. Taxa şehîd Serhed hevalan girtibû, xeta sukê tevahî jî hevalan girtibû, Çand û Hûner hevalan girtibû, alîyê Çilûheştan, Botana Rojava piranî hevalan girtibû, Botana Rojhilatê tevahî hevalan girtibû.

Di despêka meha Qanûnê de gurûbek heval hatibûn amedekirin; heval Masîro fermandariya wê gurûbê dikir, nêzî sed-sedûbîst hevalan bûn. Ev heval ji bajêr derketibûn, bi terzê gerila wê hareket bikirana, wê veşartî bibûna, li gundanên durî bajêr, xetên ku tê re DAIŞ tê bajêr, bi taybetî xeta Reqa ku tê Kobanê de wê çalakî bikiran.

Xeta ji Girêspî tê bajêr, ev koman li wir hereket dikin. Çûnûhatina DAIŞ'ê ji bona asteng bikin, DAIŞ nekaribe teqwiya quwetê mezin bîne bajêr. Di wir de hem kemîn bavêjin, hem mayin biteqînin, hem çalakiyên vedizîne karibin li ser cihên DAIŞ'ê li derveyî bajêr bikin. Bi vî awayî komeke mezin di xeta Rojhilatê Kobanê û Başûrê Rojhilatê Kobanê de, ango di xeta Çelebiyê heyanî tê nêzî cehda uç kardaşê de xwe cih kirin. Van koman gelek çalakiyên baş jî kiribûn.

Koma din jî hevalê Heqî berpisyar bû li Rojavayê Kobanê, yanî xeta Cibnê, Çarliyê bûn. Ev gundan jî 15-20-30 km dûrî bajarê Kobanê ne, nêzî 15-20 hevalan li wir hereket dikin. Koma heval Masîro wan çalakiyên baş kiribûn, ya heval Heqî wan jî çalakiyên baş kiribûn. Bi vî awayî DAIŞ'ê însiyatîf li derve ji winda dikir. Êdî hatibû astekê ku em li bajêr, Miştenûr bigirin. Me bîryar girt ku em Miştenur bigirin. Jixwe êdî 200 metre mabûn em derkevin Miştenûr. Malên di qontara Miştenur de heval hebûn. Despêka meha Çilê bû. Ger me Miştenûr serwerî çêkiriba, me li ser gelek cihên dîtir jî serwerî çêdikir û bi vî awayî DAIŞ tenê di Kaniya Kurdan de dima.

Piştî ku heval ketin Miştenûr jî, piraniya Kobanê ji çetayan hate paqijkirin. Tenê di derdorê girê Kaniya Kurdan hinek mal hebûn, di wan malan de mabûn. Dîsa li ser riya çilûheştan ku riya ji Helincê û Mizirdewrê tê bajêr, di wan derdoran de mabûn. Qismek jî li hêla Memîtê li ser riya Helebê mabûn. Jixwe piştî hevalan bajar girt, însiyatifa DAIŞ'ê di bajêr de şikiya. DAIŞ'ê dest bi şewitandina malan kir. Esas despêkê mal diteqandin, di wan cihên kenarên bajêr de cihê ku tê de bûn êdî dest bi şewitandina malan kirin. Gava ku dest bi şewitandina mala dikirin, êdî diyar dibû ku DAIŞ di bajêr de namine, wê xwe ji bajêr bikşînin. Weke ku bibêje, “ger min nikarîbe di bajêr de bimînin, ez ji tû kesî re jî nakim yar.” Bi vê mantiqê DAIŞ'ê nêzî heftiyekî ew mal tevahî agir berdanê.

Êdî bajar hatibû rewşekî wisa ku ji dumanê xwiya nedikir. Êdî însiyatîf ketibû destê hevalan. Miştenûr hatibû girtin, riya Helebê ketibû kontrola hevalan, riya ku ji Girêspî tê, ketibû kontrola hevalan. Hewildanên DAIŞ'ê êdî pasîf bibûn, wisa cih bi cih sûîqast dikirin, hawan ji dervayî bajêr diavêtin. Ji aliyê Seyran ve hawan diavêtin, ji hêla Minazê ve tup diavêtin, ji hêla Mizir Dewrê, Helincê ve pir zêde top diavêtin.

Dema ku DAIŞ di bajêr de nema û şûnve me di hêla Rojhilat de pir giranî dayê, hevalan dest bi pengava paqijkirina gundan kir.

***- Rizgarkirina Kobanê hûn dikarin çawa binirxînin?***

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Di pengava rizgarkirina Kobanê de rista herî girîng ya berxwedanvanan bû. Gel û gerillayên ku ji Bakurê Kurdistanê hatin tevlê seferberiyê bûn rista van bingeha rizgarkirina Kobanê ye. Ji aliyê psîkolojîk ve bandoreke teyarê hebû, lê ya esas ne ew bû. Dîtin ku berxwedaniya Kobanê xurt dibe, sîng bi sîng şer tê kirin ew  bîryar dan. Lewra cihên weke Musul û gelek bajar bi hêsanî ketin, lê Kobanê nediket, li wir berxwedanî hebû. Ji ber vê gotin, em ê piştgirî bidin. Piştgirî dan, lê ne diyarker bûn. Bi berxwedaniya hevalan Kobanê neket û mohra xwe li dîrokê xist. Ji ber vê berxwedaniya Kobanê bû ya mirovahiyê. Cebilxaneya me jî hebû, lê kêm bû. Peşmerge jî hatin, lê wir şerek nekirin. Faydaya wan, bi wan re cebilxane hat.

Ger ji cihên din heval nehatibana û cebilxane nehatiba, teyare çiqas lêdidin bila lêdin, dê Kobanê biketa. Mesela li Bakurê Kurdistanê, gelek hevalên gerîla fîrara hûndûrîn kirin û hatin Kobanê. Ew rihê Apoger ku di her şert û mercî de welatê xwe û gelê xwe biparêzê hebû. Ji ber vê heval dihatin. Bi mîlîtaniya Apoger şoreş çêbû. Rihê van hevalan hişt ku Kobanê bibe Kobanê û mohra xwe jî li dîrokê bixe. Bi hatina hevalan berxwedaniyek ji wir hat kirin ku mirov çiqasa biaxife jî nikare bîne ziman. Mesela hevalê Gelhat hat, rêveberiya Cûdî bû, lê hat Kobanê. Hevalê Gelhat, ji me re windahiyeke pir mezin bû. Danehevên wî yên salan hebûn.

***-Piştî wê çibû? Di vî şerî rista teyareyên koalîsyonê û peşmergeyan çi bû?***

Di şer de jî, piştî ew xeta me çêkirî, êdî gav bi gav û roj bi roj em pêşve diçûn. Ew peşmergeyên wir tiştek nekirin. Rojeke neketin çeperan. Niha ew qesa propaganda dikin, lê ne rast e. Tenê bi riya wan cebilxane hat, wekî

din bi kêrî tiştekî nehatin. Carê hevalekî henek kiribûn, gotibû *“em sengereke bidin we.”* Gotibûn, “*na, em quwetên parastinê ne, êm ê ji dûr ve biavêjin.”* Hinek çekên giran ji dûr ve diavêtin. Wekî din bibêjin çi jî, ne rast e.

Li wir şerekî pir xurt çêbû, gelek hevalên ku em nikarin navê wan bibêjin fedakariyên pir mezin nîşan dan. Gav bi gav, kolan bi kolan pêşveçûn çêdibû. Me henek dikirin, me digot “*em weke meşa kosiyan dimeşin*.” Hinek heval jî hatibûn, pir zû şehîd diketin. Lewra qad nas nedikirin. Her wiha bi hezaran heval hebûn, me nedikarî li ser hakîmiyetekê jî çêkin. Psîkolojiya ketina Kobanê hebû. Jixwe Erdoxan jî digot, ket û ket. Lê berxwedaneke bê sînor çêdibû. Çiqasa şehîd çêdibûn jî, hevalan paşve gav nediavêtin.

**Pêşengtiya YPJ’ê û pêşengên YPJ**

***-Berxwedaniya Jina Kurd ku li Kobanê dijî DAIŞ’ê pêş xistiye, hemû gelên cîhanê tesîr kirin. Hûn rista YPJ’ê ya di berxwedanê de çawa dinirxînin?***

Di Kobanê de rista YPJ stratejîk bû. Gelek hevalên jin bi lehengtî şehîd ketin. Berxwedaniya hevalên jin li Kobanê pir xurt bû. Niha li cîhanê jî deng veda ye, lê heqîqetek e. Nepixandin qet tê de tine. Gelek hevalên jin bi lehengî şehîd ketin.

Mesala hevala Zozan Kobanê, li gundan şehîd ket, wê hevalê digot, *“çi dibe bila bibe ez cihê xwe bernadim.”* Hevala Rojen hebû, ji Rojhilat bû. Şerekî wisa dikir, kordîneyeke wisa dida meşandin ku mirov heyret dima. Nêzikî bîst hevalan li gel bûn. Her digot, “*bes hûn cebilxanê bigihînin me.”* Xwedî li hevalan derdiket, xwedî li eniyên keleka xwe derdiket. Hevaleke pir zindî bû.

Hevala Zehra Goyî hebû, bi qehremenatî şehîd ket. Di binayetekê de berxwedanek kir ku bê mînak bû. Jixwa niha navê wê bînayetê kirine, bînayeta hevala Zehra. Di şer de her şiyar bû. Di nava şer de bû, me digot “*rewş çawa ye?”* Digot, “*baş e*.” Heya ku Kobanê rizgar bû û em ketin gundan jî wê hevalê şerekî xurt dimeşand. Heval gundekî rizgar dike, derbasî gundê din dibin. Çeteyan mayinek pêy xwe hiştine. Hevalê Nûman ku ji mayina fêm dike re dibêje, *“ka were vê mayinê meyze bike.*” Lê mayin diteqe û her du bi hev re şehîd dikevin.

Hevala Hebûn Derîk hebû, her di avahiya xwe de bû. Bawerî dida hevalan. Di dema gund rizgarkirinê de, heval zêde cihekî kom dibin, dijmin ferq dike û hawanan diavêje. Bi parçeyê hawanê şehîd dikeve. Jixwe beriya wê jî fîşek ji destê xwe xwaribû, lê dîsa jî ji Kobanê derneket.

Foto-58

Hevala Ozgur hebû. Hevaleke her bi kelecan û bi coş bû. Dixwaze hevalekî birîndar xilas bike, dijmin ji dûr ve guleyê lêdixe û ew heval jî wisa şehîd dikeve. Mala wan li Helebê bû. Dayika wê jî, dayikek pir hêja bû. Hevala Ozgur jî di nava şer de bi xwestek û bi coş bû.

Gelek hevalên jin wisa şehîd ketin. YPJ risteke dîrokî lîst. Hem hevalên ku şer dikirin, hem jî yên ku kordîne dikirin rista xwe lîstin. Mirov çiqasa bibêje jî mirov nikare fedakariya wan bîne ziman.

Herî dawî jî ez dixwazim vê yekê bibêjim; Li axa Kobanê, gav bi gav xwîn rijiyaye, da ku rizgar bibe. Kobanê wisa bi awayekî xwezayî çênebû.

Kobanê ne tenê ya Kobaniyan e.

Kobanê ya Kurdistanê ye, Kobanê ya cîhanê ye.

Berxwedana Kobanê, li cîhanê bû remzeke dîrokî. Tû çiqasa behsa Kobanê bikê, dê kêm bimîne.

***-Rizgarkirina Kobanê hûn çawa digirin dest, her wiha di rizgarkirên de tiştê esasî çibû?***

**ROZA EFRÎN:** Piştî banga Rêber Apo, bi tevahî di me hemuyan de hêzek hate avakirin. Bi taybetî piştgiriya gelê Bakurê Kurdistanê, dema ku rabûn serhildanê û sînor rakirin; ew bi serê xwe moralek bû. Lê belê vê têrê nedikir.

Piştî ku mûdaxale hatkirin û quwet hate şandin, hemû aliyan ve hinek rewş baş bû. Ji aliyê gel û şervanan ve hênaseyeke rehet hate kişandin. Lê dema ku gotin, “*ji aliyê Emerîka ve alîkarî bê kirin û dê peşmerge werin,”* heval dîn bûn. Gotin, “*piştî ku me ew qesa ber xwe da û şehîd dan, çima yekî din were û li ser vê siyaseta xwe bike.”* Hevalan ji bo hemû yekîneyan civîn çêkirin û gotin, *“ji aliyê siyasî ve wisa mûnasîp hatiye dîtin, kes nikare berxwedana me înkar bike.*” Wisa hate qebûl kirin. Jixwe hinek hevalan digot, “*ger werin em ê wan bikujin. Lewra yên ku hişt ew plan û siyaset li ser me bê meşandin ew in, çima werin alîkariyê.*”

Gelek hevalan jî heya şehadeta xwe jî çavê wan li peşmergeyan neket, neçûn û silav jî wan nekirin. Ew qesa eciz bûn û bertek nîşan dan. Dema ku cebilxane jî dihat avêtin, hinek heval eciz dibûn, digotin “*bila ew cebilxane nekeve destê me, jixwe em kar nînin.”* Ew qesa bi hêrs bibûn.

Gotinek heye, dibêje *"hem me dikuje, hem jî bi cinazeyê me re dimeşe."* Hemû heval di wê zanebûnê de bûn. Bi wê zanebûnê jî têkoşîn û şerê xwe dikirin.

**Yên ku di jiyanê de ser dikevin, dê şer jî ser bixin**

**-Di nava şer de, dema ku pevçûnên germ çênedibûn we çi dikir?**

Di nava şer de, ji bo ku heval bikaribin hinek xwe komî ser hev bikin, perwerde destpêkirin; lêhûrbûnên deh rojan çêbûn. Malên birîndaran çêbûn. Me digot, *"êdî em hevalan derbasî Bakur nekin, bi xwe derman bikin."* Di nava wî şerî de hevalan digot, "*heval em dixwazin paraznameyên Serokatî bixwînin, guhdarî bikin û wisa biçin çeperan.*"

Di nava ew qesa zehmetî û şerê dijwar de ti kes dev ji jiyana rêxistinê berneda. Rihekî fedakarî û berxwedaniyê hebû. Li aliyê Cîzîrê wan deran, ji aliyê rêxistînî ve hinek pirsgirek dihatin jiyankirin. Lê li wir, her çiqasa piraniya hevalan nû be jî, ji aliyê jiyanê ve pirsgirekeke wisa xwe neda pêş. Ji hemû aliyan ve rihekî partîger û bi dîsîplîn hebû. Dema ku kêmasiyek çêbe jî, hevalan hev û din şiyar dikirin. Digotin, *"ne dema nêzikbûnên kesayetî û dervayî rêxistinî ye. Çi dibe bila bibe, divê em vê jiyanê biparêzin."* Hemû heval jî di vê astê de hişyar bûn.

Ez bi xwe jî li ser perwerdeyan disekinîm, di arastekirinan de min cih digirt. Lê rojeke jî rojeveke me ya bi vî rengî çênebû. Rojeke jî destdirêjiya malê gel nehat kirin. Li hemberî gel nêzikatiyek şaş derneket. Ji aliyê jiyanê ve ji ber ku hêz û fêmkirinek hebû, vê hişt ku em li wir bin nekevin. Weke Serokatî dibêje, "*Yên ku di jiyanê de ser dikevin, dê şer jî ser bixin"* Bi rastî jî ew di Kobanê de hat dîtin. Bê fikar tevgerînek hebû.

Bi taybetî ji aliyê hevalên jin ve ew yek li pêş bû. Her çiqasa hevalên nû bûn jî, ger di van aliyan de pirsgirek nehatibe jiyankirin û astek hatibe girtin, rista hevalên jin li pêş bû. Tevahî hemû zehmetiyên hene jî, hevalan pirsgirek qebûl nedikirin û ji xwe re astengî nedîtin. Heval di hişyariyek mezin de bûn. Meseleyên kesayetî, meseleyên madî, nêzikbûnên şaş li Kobanê nehatin jiyankirin. Dema ku berî şer jî pirsgirekek biçûk derketiba hema li ser dihat sekinandin. Ji vî alî ve rihekî mezin yê berpirsyariyê û fedakariyê hebû. Dibe ku ji taybetmendiyên herêmê jî bê. Ji ber ku hejmar kêm bû û hemû hevalan hev û din nas dikir, zêdetir rihekî rêhevaltiyê jî derket pêş. Ew jî sedemek e.

Ji aliyê jiyanê û têkoşînê ve, jixwe rista YPJ jî pir cuda bû. Di giştî Şoreşa Rojava de, jinê mohra xwe li jiyanê û têkoşînê daye. Di hemû aliyên xebatê de, ji parastinê bigre heya xebatên civakî û rêveberiyên xweser, risteke xwe yê pêşengtiyê hebû. Lê di şer û berxwedaniya Kobanê de ew di asta herî jor de hate jiyankirin. Bi taybetî di şexsê hevala Arîn Mîrkan de ev rist bi cîhanê deng veda. Îspat bû ku jina Kurd dikare bi hemû rengî li hemberî êrîşên hovane berxwedaniyeke xurt nîşan bide û bibe bersiv. Di dîroka azadiya Kurdistanê de her bûye bersiv, di şerê Kobanê de jî ew yek derket holê.

Piştî ku serkeftina Kobanê çêbû. Piştî 4-5 mehan deskeftiyên gelê Kurd li Kobanê careke din hatin dest xistin, me hêstên cûda jiyan kirin. Mirov nizane çawa bibêje. Ne ku me hêvî nedikir, dema ku em her şev ji hev cûda dibûn, me digot "*dê niha hevalên YPG-YPJ xeber bidin û dê bibêjin êdî dijmin nema, me paqij kir.*" Me roj û seat dihijmartin ku em li ser Miştenûr ala YPG û YPJ bilind bikin. Her kes ketibû pişbirkê; bi taybetî hevalên YPJ henek dikirin û digotin, "*em ê li ser Miştenûr ala xwe babikin.*" Hevalên xort digotin, "*na em ê ba bikin.*" Bi rastî jî dema ku Miştenûr rizgar bû, ji sed metrî zêdetir al hate hildan. Wê demê hevalan telefon kir, gotin "*we kêngê ew ala amade kiribû."* Hevalên YPG jî digotin, "*me roja ewil ve amadekiribû. Me dizanî ku Kobanê nakeve û em ê rojekê li wir, vê alê ba bikin."*

Jixwe bi rizgarkirina Kobanê re, êdî gel jî vegeriya. Di şeva ku Kobanê hate rizgarkirin de, bi hezaran mirovan xwe li sînor qelivandin. Berê jî bi hezaran mirov li ser sînor bûn û li benda şer bûn. Di şevekê de me dît ku nêzikî 50 hezar mirov ketin Kobanê. Êdî îspat bû ku Kobanê nakeve. Dibe ku gel jî di serî de ne bizanebe. Lê êdî her kesî digot, "*ger em axa welatê xwe jî bixwin, em dernakevin."* Piştî wê fedakariyeke pir mezin jî nîşan dan. Gotin, "*em welatê xwe bernadin, bila welatê me bibe gora me, lê em bernadin."* Ji heft salî heya heftî salî, kî digêhêşt Kobanê axa Kobanê dixwar. Zêdetirî Kobanê hatibû rûxandin, lê digotin "*tenê konek hebe, em li gel mala xwe dînin, em razî ne."* Bi vî awayî hatin li gundên xwe bi cih bûn. Jixwe piranî yên hatî ji gundan bûn.

Li gorî bajêr gund kêmtir xirab bibûn. Dîmenên wan jî hene. Dîmenên gund û bajaran yên şer jî hemû hene, hevalên ragihandinê ew hemû bi belge kirin, di arşîvan de ne. Wê ji dîroka berxwedaniya Kurd re weke belge bimînin. Dibe ku em bi kûrtasî tînin ziman, tiştên ku em dibêjin parçeyek jî Şoreşa Rojava û Kobanê ye, lê weke belge her tişt eşkere ye. Hevalên ku ew berxwedanî jiyankirin jî piranî şehîd ketin. Pir kêm heval mane.

Ez dizanim ku li gorî jiyankirinên wir, vegotinên me ne têr û tijî ne jî, lê divê hemû hevalên ku bûne şahîd van kêliyên jiyanî bibêjin, binivisînin da ku agahiya her kesî jê hebe. Di dawiyê de jî dixwazim vê bibêjim, dê em ê têkoşîna wan paqrevanan bikin malê cîhanê.

**Tevgera Apoger hêviya sosyalîzma cîhanê ye**

***-Berxwedaniya Kobanê di qada navnetewî de bandorek çawa çêkir?***

**ÎSA KOBANÊ:** Dema ku em ber bi rizgariya Kobanê ve diçûn, di 1'ê Mijdarê de 'Roja Berxwedaniya Kobanê ya Cîhanê' hate îlankirin. Ket rojeva hemû cîhana pêşverû. Tevgerên demokrat, azadîxwez, sosyalîst û femînîst wisa girtin dest. Berxwedaniya Kobanê, bandoreke pir mezin li ser wan kir.

Komên çepgir, demokrat û rojnamavanên baldar jî dihatin, em bi wan re jî mijûl dibûn. Her yek dihat, hefteyekî li gel me di ma û pişt re vedigeriya welatê xwe. Piştî hefteyekî te meyze dikir, ji heman cihî komeke din hatiye û digotin, "*felan kes behs kir û em li ser gotinên wan hatine û em dixwazin we nas bikin."* Her komeke hatiye û li gel me maye, çûne û li welatê xwe tiştên ku dîtine nivîsandine. Bi taybetî jî ji Îtalya û Fransa pir dihatin. Bernameyên alîkariyê dardixistin, sazî tanzîm dikirin.

**-Gelo kesên ku bi we re çavdêrî, an jî hestên xwe parve dikin hebûn? Çawa dihat nirxandin?**

Bêguman çêdibûn, mesala digotin, *"tevgera Apovan, êdî em weke hêviya sosyalîzma cîhanê dibînin.*" Piştî hilweşîna sosyalîzmê, ew hêviya ku têk çûbû, bi berxwedaniya Kobanê û bi naskirina tevgera Apoger zindî bûbû. Bi rastî jî rihê Apoger, li hemberî hêzeke ew qesa hovane bi çi rengî dikare bisekine, me bi çavên xwe dît. Ew baweriya sosyalîzmê û hêviya pêşeroja mirovahiyê, dikare şer û berxwedaneke bi vî rengî bide meşandin. Ew hemû bi xwe dianîn ziman. Ji milê alaqatên gelan ve, ew tiştna ji bo me pir bi nirx in. Mirov çiqasa bikaribe wan rêxistin bike, têkiliyan mayinde bike; cihên weke Ewropa û Amerîqaya Başûr mirov dikare gelek tiştan pêş bixe. Lewra bi sedan kes hatin û çûn. Hemû rojnamevanên bi nav û deng hatin û çûn.

Mînakeke din jî, rojnamevanekî CNN hebû, digot *"beriya ku ez werim, min digot weke şerên dîtir e. Min nefikirî ku pir cuda be, ez bi pêşdarazîbûneke wisa hatim. Lê dema ku ez hatim vir û li çeperan geriyam ez şoq bûm."* Digot, *"ez ji Îsraîlê heya Başûrê Kurdistanê, ji Efrîqaya Bakur heya Sûriye çûme; bi dehan welatan eniyên şer geriyame. Tevgerên weke FARC û Zapatîsta jî min dîtine. Di nava gelek arteşan de jin hene. Lê min tu welatan di eniya şer ya pêş de jin nedîtine. Dema ku min ew yek dît, ez matmayî mam."* Got, "*hinek welat wisa leşkerên xwe yên jin nîşan didin, qet pê neyên xapandin, tenê ji bo nîşandayinê ye.*"

Tevgera Azadiyê asta vîna jinê derxistiye holê û hem dostan ew yek dît, hem jî dijmin. Yên ku ew yek dîtin jî pir tesîr bûn. Ji gelek aliyan ve taybetmendiyên Tevgera Azadiyê, di pratîka berxwedaniya Kobanê de, cîhanê nas kirin. Ger mirov rast binirxîne, netîceyên wê pir zêde derfetan dide çêkirin. Li hemberî tevgerê baweriyeke ava dike. Ji milê hêzên navnetewî û gelan ve êdî tevgera me cuda tê dîtin. Ew jî rastiyeke din ya berxwedaniya Kobanê û şehîdan e.

Bi avakirina nirxên wan û bûyina şopdarên wan, mirov dikare bibe bersivê wan. Bi vî rengî mirov dikare hemberî wan bisekine. Em çiqasa wan nirxan bikin giştî û ava bikin, em ê ji mîrasa wan ew qesa xwedî derkevin. Ez di şexsê lehengên Kobanê de, hemû şehîdên me ku bi awayekî fedaiyane şer kirin û şehîd ketin bi bîr tînim. Em soz didin ku em ê bîranînên wan her bidin jiyan kirin û bejna xwe li ber wan ditewînin.

**5-Rizgarkirina Gundan**

***-Piştî rizgarkirina bajêr, pengavên we bi çi rengî berdewam kirin?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Êdî DAIŞ ji bajêr derketibû. Hemleya paqijkirina gundan despêkirîbû. Tevahî 380 gund û mezrayên Kobanê hebûn. DAIŞ di hemû mezra û gundan de tune bû. DAIŞ'ê di hinek xetên sitratejîk de xwe bi cih kirîbû. Rêka ku ji Kobanê diçe Girêspî, rêka diçe Reqa, rêka dualî ya Helebê, rêka diçe Cerablûs û rêka ji Kobanê diçe Şexler di hinek xetên diyar de xwe bi cih kiribû. Dema DAIŞ ket Kobanê, pir gundan qet neketibûyê. Dema ku DAIŞ ji bajêr derket, êdî diyar bû ku nikare di gundan de li ber xwe bide.

Me civîn çêkir û ew encam derket holê; DAIŞ di bajêr de şikiya, pêwist e êdî pengava rizgarkirina gundan destpê bike û pê ve biçe. Li ser vî esasî di xetên Başûr de, di xetên Rojava û di xetên Rojhilatê Kobanê de di her sê xetên ku DAIŞ tê de, bîryar hat girtin ku paqijkirin destpê bike. Di 20'ê Çileyê de pengavê destpê kir. Gundên ku ewilî pengavê destpê kir; Helincê despêkir û ji Minazê despêkir, ji Seyran despêkir, bi vî awayî pêde çû. Tabî me tecrûbe qezenc kiribû di şerê li beramberî DAIŞ'ê de. Yanî em wisa yek bi yek gundan bidin pêşxwe û pêve herin, em nikarin. Divê em lê bizivirin. Em hinek gundan li pişta xwe bihêlin bila DAIŞ tê de be.

Minak xeta Mizawdewrê, Elî Dewrê, Qeremux, Kazika, Şêranê me bi vî awayî kir. Wisa 9-10 gund yê ku di hidudê Tirkiye de diçin heyanî 10 km heval pê ve neçûn. Ji xeta Başûr de heval lê zivirîn ew gundan xistin çemberê. Dema rê hatin girtin, ew çete neçar man û reviyan Tirkiye. Di carekê de ev gund hatin valakirin. Êdî divê teqtîk li ser vê pêş bikeve. Ev teqtîk bi ser ket, heya girtina Til Ebyat 7'ê Hezîrana 2015'an bi vî teqtîkê em meşiyan. Gundên Kobanê hemû bi vî awayî hatin rizgarkirin.

Di vê pengava rizgarkirina gundan de Şêxlera jêr û Şêxlera jor ku bajarê Ereban e û li ber ava Firatê ne hatin girtin. Riya dualî ya ji Helebê diçe Iraqê hemû hate rizgarkirin. Êdî cihê mane jî gundên Girêspî bû û divê navbera Kobanê û Qantona Cizîrê bibe yek.

***-Pengava rizgarkirina gundan çawa pêş ket?***

**MERYEM KOBANÊ:** Di 25-26'ê mehê de bajar bi giştî hate paqijkirin û dest bi paqijkirina gundan hate kirin. Di 27'ê mehê de pengava rizgarkirinê destpê kir. Di nava wê rojê de piraniya gundên li ser sînor hatin rizgarkirin. Divê quweta Rojava xwe bigihanda ber avê, cihê ku Şehît Zozan wan şehîd ketine. Milê Başûr ve divê me xwe bigihanda riya dualî. Di eniya Şehît Kendal jî divê me ew gir bigirtana. Êdî her eniyek pêşiya xwe rizgar bike.

Di milê Rojhilat de li dijî êrîşan berxwedaniya gel ku hatiye kirin, pir bi wate bû. Jixwe piştî ku bajar hate rizgarkirin, vegera gel destpê kir. Di gundekî milê Çelebiyê de, dijmin êrîş kir û 12-13 gundî li wir bûn. Mirovên êxtiyar bûn. Welatparezekî 60 salî heye, hevalên wî hemû şehîd dikevin, ji bo ku heya heval gihêştine wan nereve ew jî lingê xwe bi çeperê ve girê dide. Mirov tenê li ser vê dikare destaneke binivîsîne.

Di paqijkirina gundan de însîyatîf di destê me de bû. Em ketin pêşî ew DAIŞ'a ku her kes jê ditirsiya. Yên ku heya wê demê xwe dikirin cihê şêran, ji roviyan xirabtir lêhat. Gelek cihan de dijmin ber xwe neda û reviya, lê di hinek cihan de ber xwe didan. Hê jî hêvî dikirin ku hin cihan di destê xwe de bihêlin û qadê li ser me teng bikin. Hedefên meyên demkurt û demdirêj hebûn; me digot, *"em destpêkê li cihên ku ji destê me hatine girtin bigrin, pişt re jî li cihên din çeteyan paqij bikin."*

Li milê Çelebiyê di şexsê hevala Leyla de berxwedaniyeke pir xurt hate kirin. Hevala Leyla keçeke ji Nisebînê bû. Ji destpêka şerê bajêr, heya dawiyê tevlî şer bibû. Malbata wê jî pir welatparêz bû, birayekî wê şehîd bû. Dixwest her di eniya herî pêş de cihê xwe bigre û rista xwe bilîze. Dîsa hevala Silava, hevala Çîçek hebû; herdu jî ji bo me bûn mînak. Dîsa hevala Stêrk Hekarî di pêvajoya rizgarkirina bajêr de, heya ku em gihêştin gundan ber xwe da. Fermandareke pir mezin bû. Şehadeta wê tesîreke pir mezin li ser hevalan kir, cara ewil min dît ku piştî şehadeta hevalekê ew qesa heval digîrîn. Fermandareke ku xwe di dilê hevalên xwe ava kiribû. Jixwe ji bo ku tola wê were girtin, bi wê rihê tolhildanê, hevalan hemû gundên li wir rizgar kirin. Hezkirin û girêdaneke pir mezin ya hevalan ji heval Stêrk re çêbûbû. Dîsa heval Hawar hebû. Şeş caran li Kobanê birîndar bûbû, cara heftan li Helincê şehîd ket. Di şexsê van hevalan de mirov dikare rihê rizgarkirinê îfade bike.

Heval Mawa hebû, bi eslê xwe ji Mêrdîne ye. Le demeke dirêj li metrepolan mabû. Di rizgarkirina Miştenûrê de risteke pir mezi lîst. Bi ciwantiya xwe tesîreke pir mezin li ser hevalan kir. Gelek hevalên wisa ciwan hebûn ku pir demdirêj jiyan nikirin, lê têr û tijî jiyan kirin. Di rizgarkirina Kobanê de, sekna hevalê Mawa sekna serkeftinê bû. Mesela hevalên ji keleka xwe re dibêje, "*heya ku em îşev ev malên pêşiya xwe rizgar nekin, îşev ji bo me jiyan nabe. Av û vexwarin ji bo me ne pêwîst e, pêwîstiya herî mezin ew e ku em ew kolana pêşiya xwe paqij bikin."* Ciwanekî Apogerî bû, mînaka fermandarê ciwanan bû.

Dîsa sedan ciwanên ji Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hebûn û rista xwe di wî şerî de lîstin. Mesela hevalê Kanîwar bû nunerê wan ciwanan. Her hevalek rengekî cuda bû, her hevalekî rihê şoreşê û rihê demê di xwe de dabûn rûnişkandin. Serkeftinê zêdetir tiştek nedifikirîn. Di şerê gundan de jî bi wî rihî şer hate kirin. Dîsa di şexsê hevala Êvarîn de rihê berxwedaniyê hate avakirin. Hevala Êvarîn, di destpêka şer de hatibû, fermandara êniyê bû. Hê ku birînên wê rehet nebûne, di eniya pêş de cihê xwe digirt. Pêşengtî û fermandariya şer girtibû ser xwe. Dema ku em gihêştin, cihê Şehît Emîn ku ji milê Başûr ve me weke hedef diyar kiribû, heval dikevin şer. Komek heval di wir de tengav dibe, lê paş ve venakşin. Hevala Êvarîn dibêje, "*çi dibe bila bibe careke din paş ve çûyin tine.*" Piştî wê derdora wan hevalan digrin û bi awayekî hovane wan hevalan şehîd dixin. Ew rika ku di binketinên de jiyan kirine, dixwazin ji cenazeyên hevalên me yên şehîd derbixînin.

Cihekî din ku di pengava rizgarkirinê de bû keleha berxwedan û destan lê hate nivîsîn jî Girê Bexdikê û Bexdikê bi xwe bû. Piştî ku me ew xet girt, dijmin careke din êrîş kir. Hevala Silava û komek hevalên din li wir şehîd ketin. Dema heval dixwazin wî girî bigrin, dijmin ber xwe dide. Fermandarê çeteyan, ji çeteyan re dibêje, "*bila kes cihê xwe bernede, ew hemû jin in.*" Li ser vê yekê, hevala Silava dibêje, *"ger ez îşev vî girî negrim, ji bo min wateya jiyanê tine ye."* Bi wî rihî êrîş kirin, gelek çete di wir de kuştin, gelek çekên giran li wir rakirin. Dema ku serçete dixwest bireve, li wî xistin û tevahî maşîneyê ew jî girtin û anîn. Fermandarê wan hevalan heval Silava bû.

Piştî wê dijmin êrîş dike, hevala Silava, Viyan Rojhilat û Nefel li wir şehîd dikevin. Hevala Nefel, ji Gabarê bû. Di wî şerî de bi BKC û kenê xwe bûbû remza Kobanê. Dîsa di wê berxwedanê de hevala Berîvan û Hesret heye. Hevala Hesret jî, keçeke Kaniya Kurdan bû. Dema me Kobanê rizgar kir, got "*ger tenê cihê mala me jî ne rizgarkirî ba, di vê cîhanê de jiyan ji bo min bê wate bû.*"

Ji hevalên ku di rizgarkirinê de rista xwe lîstin, yek jî hevalê Cudî bû. Her li erbaneyê dida. Şehît Rizgar ji wî re gotibû, *"dema ku me Kobanê rizgar kir, divê em bi hev re li erbaneyê bidin û kolanên Kobanê bigerin û şehîdan re bibêjin me xeyala we pêk anî."* Dema ku Kobanê rizgar bû, Şehît Cudî kolan bi kolan geriya, erbaneya xwe lêxist û gotinên Şehît Rizgar gotin. Di rizgarkirina bajêr û gundan de di dilê hevalan de ew qesa tişt hebûn ku bi wan hestan şer dikirin.

**Em êşên laşê xwe hîs nakin, em êşa heval û welatê xwe hîs dikin...**

Dîsa li milê Çelebiyê, li gel febrîqaya çîmento hevalê Hogir şehîd ket. Hevalekî ji Kobanê bû, şerê ewil yê Kobanê de jî weke fermandarekî cih girtibû. Dema ku birîndar bûbû û çûbû tedaviyê. Wê demê gotibû, *"ez fêdî dikim ku ez birîndar bûme, çima ez niha ne li keleka hevalên xwe me?"* Hemû hevalên birîndar digot, *"em êşên laşê xwe hîs nakin, em êşa heval û welatê xwe hîs dikin."* Gotineke pir watedar e. Di hemû hevalan ew rih hebû, mirov di çavên hemû hevalan de ew rihê ku bi vê dûrûşmeyê têdikoşe dîdît. Dema ku dijmin êrîşên dijber dikirin de, hevalê Hogir û komeke heval şehîd ket. Di hemû şerê Kobanê de risteke serkeftinê lîstibû.

Dema ku em gihêştin ber ava Firatê û me Zor Mexerê wan deran girtin, êdî şer piranî li eniya Rojhilat çêbû. Şerê eniya Rojhilatî heya Adarê jî berdewam kir. Şer pir dijwar bûbû, çeteyan nedixwest wê xetê berdin. Lewma êdî em ber bi Girêspî û Eyn Îsa ve diçûn. Jixwe em gihêştibûn wan cihên ku berê di destê me de ne, lê me dixwest êdî cihên dîtir jî wan paqij bikin.

Di şerê gundan de jî berxwedaneke bêhempa dihat meşandin. Rihek di hevalan de çêbû ku cihê ku ketinê careke din bernedidan. Da ku em nehêlin cihê ku me girtine, careke din dijmin were ji me bigre. Hevalên weke Medya, Silava, Ferhad, Hogir, Bihar bûn pêşengê berxwedana gundan. Hevala Bihar, bi xwe ji Kobanê bû. Gelek hevalên pê re mabû şehîd ketibûn. Di nava şer de fêrî şer bûbû, dema ku li gundê Korikê dijmin êrîş dike, derdora wan digrin. Li gel hevala Bihar, hevaleke din jî heye, ew heval li ser ban têdikoşe, hevala Bihar jî di hundir de ye. Lê dema ku cebilxaneya wê hevalê xilas dibe, ji bo ku nekeve destê dijmin xwe ji ser ban diavêje, hevala Bihar jî di hundirê xanî de her moral dide hevalan. Dibêje, "*tiştek nabe, divê teqez em vê malê jî bernedin. Divê em jî weke hevalên Serzorî bikin.*" Ew rihê ku hatiye avakirin, di şexsê hevala Bihar de careke din tê zindîkirin.

Foto-59

Piştî vê demê em ber bi rizgarkirina Eyn Îsa û Girêspî diçin. Jixwe ji milê din ve jî hevalan dest bi pengava rizgarkirina Til Hemis û Til Berak kiribûn.

***-Ji bor rizgarkirina gundan, hûn dikarin çi lê zêde bikin?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Bi derxistina çeteyan ya ji bajêr re êdî em derbasî qonaxeke din bûn. Êdî şer li gundan hate meşandin. Jixwe daxuyaniya 27'ê Çile hem salvegera avakirina rêveberiya xweser ya Kobanê bû hem jî rizgarkirina Kobanê bû. Piştî wê duyemîn hemleya rizgarkirina gundên Kobanê di 28'ê Çile de dest pê kir. Helbet ew pêwîst bû ku ji nû ve vesazî çêbin, plansazî çêbin, hêz ji nû ve were vesazkirin. Ji ber ku gelek Hevalên ku di pêvajoya şerê bajêr de hatibûn qet gund nas nedikirin. Ji Hevalên ku nas dikirin kêm mabûn, hin birîndar û hin jî şehîd bûbûn.

Yek ji wan Hevalê Kendal, di şerê bajêr de şehîd ket. Xeyala wî ku di bajêr de digot "*ez ê careke din Kobanê rizgar bikim."* Ji ber ku cara ewil wî ji rejîmê Kobanê rizgar kiribû. Digot, "*ji bo min wateyeke cuda ya Kobanê heye.*" Dema çû mewziya pêş Hevalan kontrol bike li xeta başûr şehîd ket. Di destpêka hemleya gundan de jî Hevalê Hebûn, di gundê Gulmit de bi lêdana hewanan şehîd ket. Dîsa Hevala Zehra şehîd ket ku hîn eserên berxwedana wê li qada Azadiyê hene. Cihê wê diyar e. Cihê wê tu caran neket. Di nava dîmenên rizgarkirina bajêr de dîmenên wê hene. Hevala Zehra bi coş û heyecana xwe cuda hebû. Ew jî di destpêka hemleya gundan de li Yudiqê şehîd ket. Dijmin ji ber ku dest bi çandina mayinan kiribû, bi mayinê şehîd ket.

Di dawî de dijmin di şerê gundan de giraniya xwe da ser mayinan. Bi mayinan dixwest pêşiya me bigire. Hemle dest pê bû, hema di serê Sibatê de ew gundên milê rojava heta Îzaayê me di şevekê de girt. Me bi giştî weke çar cebhe girte dest. Cebheyek li milê başûr, yek li milê rojava, ya din li milê başûr-rojhilat û ya dawî li milê rojhilat bû.

Piştre milê rojava bû du cebhe. Operasyon dewam kirin û gelek gund ji çeteyan hatin rizgar kirin. Vê carê me planeke din danî û me got em cebheya milê rojava rizgar bikin, ji ber ku ava Firatê heye û em xwe bigihînin avê.

Li milê rojava heta Zormixarê, gundên me berê di meha Tirmehê de girtibûn, me ew gund dîsa girtin. Xeta xwe ya bêrê di nav deh rojan de me hemû girt. Di xeta ava Firatê de me zora xwe da ser ku em pira Şêxler bigrin, ya ku diçe Cerablûsê û pişt re Şêxler jî bigrin. Hevalan li gundê Xirab Ato û Nasiriyê lê xistin, çûn û xwe gihandin pirê. Jixwe dema heval gihîştin pire, ewana jî Şêxler hemû berdan û reviyan. Bi wî rengî bajarê Şêxler jî di nav de heval gihîştin ava Firatê. Yanî bi temamî rojavayê Kobanê hate rizgarkirin. Piştre milê başûr jî heta girê Sêvê heval çûn gihîştin dawî. Li aliyê rojhilat pêş de çûn heta Îdaniyê û Bexdikê.

Şerekî mezin li Bexdikê çêbû. Di girê Bexdikê de balafiran qet alîkarî neda. Heval çûn û bi bombeyan dijmin xistin. Di pêvajoya rizgarkirina gundan de jî rihekî êrîşê ku zû bi ser de biçe û zû rizgar bike hate nîşan dan. Di vir de teqtîkên gerîla weke li piştê zivirîn û derb lêxistin pêk hat. Heta meha Hezîranê bi vî rengî çû. Êdî çend gundên me li milê rojhilat Kendalê û Giresorê mabûn. Weke din xeta xwe ya berê, me hemû girt.

**6-Rizgarkirina Girêspî û yekbûna Kobanê û Cizîrê**

Foto-60

***-Piştî ku gund hatin rizgarkirin, li Kobanê rewşeke çawa hebû?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Ji beriya ku em dest bi hemleya Girêspî bikin, gelê Kobanê êdî divegeriya. Yanî texriben beriya Newrozê bû. Qadeke pir fireh ya gundan hatibû rizgarkirin. Bi vê pêvajoyê ve girêdayî gelê ku ji Kobanê derketibû êdî bi rizgarkirina Kobanê û hinek gundên derdorê Kobanê êdî vedigeriya ser xaka xwe. Dema ev gel vegeriya pirsgirêk hebûn, mal tevahî di bajêr de xira bibûn, vê yekê jî bi xwe re pisgirêkên bicih kirinê dianîn. Ji bona em vî gelî bi cih bikin, amadekariyeke pêwîst dikir. Hem di bicihkirin, lojîstik û lê xwedî derketinê de, hem jî di pêwistiyên xwarin vexwarin, kerebe û her tiştê jiyanê de em dikarin bêjin bi xwe re kar û berpisyarî dianîn.

Ji bona em van pisgirêkan çareser bikin bi şaredariyên Bakur, rêxistinên sivil re bi awayekî kolektif xebat hatin meşandin, da ku pêdiviyên vî gelî bên tedarîk kirin. Ji bona gel çadir hatin amadekirin, li rexa bajêr. Yanî mirov dikare bêje bajarekî ji çadiran hat amadekirin. Pêdiviyên elektîrîk û lojîstikê hatin temînkirin.

Di nava hefte de Tirkiye tenê du rojan derî vedikir. Her hefteyekî di navbera 3-4-5 hezar insan dihatin warê xwe. Qismekî ku malên wan nehilweşiyabûn, di malên xwe de man, hinek li cem gundiyên xwe diman û hinek jî di wan konan de me bicih kirin. Yên ku malên bi awayekî giştî rûxiyabûn hebûn. Kobanê jî piranî mirovên hevû din in, ji bo wê di xwe bicihkirinê de zehmetiyek zêde nehat kişandin. Ev veger heya demekê jî berdewam kir.

1'ê Hezîrana 2015'an me dest bi hemleya rizgarkirina Girêspî kirîbû, heya wê demê ser sed hezarî re insan vegeriyabûn Kobanê. 7'ê Hezîranê Girêspî hat girtin. 1'ê Hezîranê li ser esasê ku em bikarin ji eniya Başûr ve Girêspî têxin dorpêçê, yanî hem ji Başûr û hem jî ji Rojhilatê Kobanê ve em weke du baskan Girêspî têxin dorpêçê bû. Dîsa ji eniya nava Girêspî û Cizîrê ve jî dê quwetên Cizîrê têkevin hereketê. Teqrîben li ser riya Reqa muameleyeke luleyan heye, em û hezên Cizîrê em ê bigihin hevdu û Başûrê Girêspî bi hevdu re bigirin dest. Yanî ji Başûr, Rojhilat û Rojavayê Girêspî de operesyoneke dorfireh bikin û Girêspî bigirin.

Civîn çêbûn, bîryar hatin girtin ku em bi vî awayî hereket bikin. Me texmîn dikir ku 20-30 rojan wê Girêspî li ber xwe bide, amadekariyên xurt pêwist bûn. Feqet piştî ku me riya Reqa girt, riya ku ji Girêspî derdikeve diçe hêla Eyn Îsa riyên genel ku tên bajêr, yên ku ji hêla Cizîrê, Reqa û Kobanê ve tên girtin, karê me hêsantir bû. Jixwe aliyekî xwe hidudê Tirkiye ye, li beramberî wir Akçakale ye.

Ev xetek pir fireh û dirêj e, ji bo em bikarin evqas qadan bigirin me rabû seferberî çêkir di bajarê Kobanê de. Ev seferberî li ser esasê ku gel jî pişgirîyê bide me bû. Jixwe bi giştî asayîş, hereketa ciwanan, pir kesên welatparêz, yên ku karibin di êniyê de cihê xwe bigirin, qismek di eniya pêş de, qismek di eniya pişt de weke parastin xetekê çêkin, ango gelek kes tevlî vî şerî bûn. Piranî jî di eniya paş de, ji bo xeta parastinê man. Ger me ew xet çênekira dibe ku em biketana dorpêçê. Seferberiyê, encameke pir baş bi xwe re anî. Pir insan hatin di eniyan de cihê xwe girtin. Bi taybetî insanên sîvîl di eniya pişt de cihê xwe digirtin.

Cihê ku hevalan digirt wan bi cih dibûn û heval pêş ve diçûn. Hêdî hêdî ber bi riya ji Girêspî diçe Reqayê li Başûrê Girêspî dikeve em nêzî wê riyê bûn. Pir gund hevalan di hundirê rojekê de girtin. 6-7'ê mehê ev xet hemû ket kontrola hevalan. Quwetên Cizîrê jî di 7'ê mehê de xwe gihandin hevalan û bi vî awayî ji aliyê Cizîrê ve, ji aliyê Başûrê Girêspî ve û ji Rojhilatê Girêspî ve ketîn Girêspî. Girêspî bi vî awayî ji çetan hat rizgarkirin.

Di wê pengavê de qeyîbên me zêde çênebûn. Li çend cihên li Başûrê Girêspî li hember me pevçûn çêbûn, feqet pevçûnên pir giran tune bûn. Di du sê gundan de çend seatan pevçûnan dewam dikirin, çete şûnve dikişiyan. Li ser riya Reqa û Girêspî rojekê sibê heya êvarê pevçûnên pir dijwar çêbûn, esas quwetên bi giranî di şer de man,

yên li ser avê bûn. DAIŞ'ê li hemberî quwetên Cizîrê li ser wê avê berxwedaneke çêkir û pevçûnên pir mezin di vir de çêbûn. Di encamê de li hember quwetên Cizîrê şikiya.

***-We got, "DAIŞ di vî şerî de şikestiye." Piştî vê tevgera DAIŞ'ê bi çi rengî pêş ket?***

Piştî DAIŞ şikiya qismek quwetê wan mecbûr man birevin Reqa û qismek jî neçar man ku biçin Tirkiye. Yê ku firset dîtin reviyan Reqa, yê ku firset jî nedîtin cilê xwe guhertin û bi civaka Ereb re derbasî Tirkiye bûn. Di wê pengavê de me pir qayîb nedan, çend heval birîndar bûn, feqet li gundên ji beriya ku Girêspî were girtin hin pevçûn çêbûn. Mesela em gundêkî sekinîbûn, maşîneyeke bombebarkirî xwe di me de teqand, li gel me ambûlans hebû; şofêrê ambûlansê û cîgirê doktor li wir şehîd ketin. Herdu jî xelkê Kobanê bûn. Ji derveyî wê qeyîbên me di Girêspî de tune bûn.

Lê belê pir cenazeyên DAIŞ'ê ketin destê hevalan, qedereke çek hevalan li ser cenazayan girtin, makineyên wan yên bombabarkirî di pir cihan de xwestin li ser hevalan biteqînin, hevalan îmha kirin. Di wê operesyonê de hinek rehînê DAIŞ'ê hevalan girtin.

Ev der di 7'ê Hezîranê de hate girtin û li Bakur jî di hilbijartinan de heman rojê gelê ser ket. Girtina Girêspî pêvajoyekî nû bi xwe re anî, riya di navbera Kobanê û kantona Cizîrê vebû. Ambargoya ku du sal zêdetir bû li ser Kobanê dewam dikir hat şikandin. Hêzeke ku êdî di Suriyê de dikare hakimiyeta xwe li her derê çêke, dikare berê xwe bide kuderê bigre, di teqtîk de guhertinan çêke, hêzeke bi vî awayî derket holê û bandora xwe li her derê dikir.

***-Ji ber ku piraniya Girêspî ji gelê Ereb pêk tê. Nêzikbûna we li hemberî wan çawa bû?***

Berê Girêspî Kurd jê hatibûn derxistin, di şerê 2013'an yê 19-20'ê Tîrmehê de Kurd tevahî jê hatibûn mişextî kirin û qismek jî hatibûn qetilkirin. Gava ku Girêspî hat girtin, tevahî dewlet, Tirkiye, Ewropa bala xwe kişandin ser Girêspî. Lewma serhejmariyeke zêde ya Ereban tê de bû. Pir gundên Ereban hene em ê çawa nêz bibin, ecabe em jî weke wan kiriye Ereban mişextî bikîn, yan jî bi Ereban re jiyan bikin, çavê dinyayê li ser viya bû. Jixwe çapemeniyên navnetewî hemû di wê demê de li wir kom bûbûn. Li bendê bûn ka em ê nijadperestiyeke Kurdîtî bikin, yan jî cih bidin Ereban.

Jixwe di encamê de piranîya Ereban di esnaya şer de reviyabûn Tirkiye, li milê din yê sînor diman. Me bîryar girt ku Ereb vegerin bajêrê xwe, vegerin malên xwe, Kurd û Ereb bi hev re pêkve dikarin jiyan bikin. 11'ê Tîrmehê me bîryar girt ku vegerin malên xwe. Di hundirê bajêr de operesyona kontrolkirina bajêr hebû. Ji ber kemîn hebûn, çek hebûn, îhtîmal hebû ku hê çete jî di bajêr de hebin. Ji ber vê yekê di rojên destpêkê de me nedihilişt ku ti kes bikeve bajêr. Jixwe piştî ku bajar hat paqijkirin û kontrolkirin, me bîryar girt ku Miletê Ereb bên malên xwe.

Di hundirê 2-3 hefteyan de tevahî vegeriyan malên xwe. Jixwe yên ku vegeriyan piranî eleqê xwe bi DAIŞ'ê re tune bûn. Yên ku ji berê ve tespît bibûn ku eleqê xwe bi wan re hene, weke malbat nehatin, ew reviyan û heya niha jî nehatine Girêspî. Di vegerê de piranî yên ku bê alî mabûn, malên ku bi zext û zorê, tirsê ketibûn bin hakîmiyetê, ew malan zivirîn.

Di Girêspî de qismekî Turkmen hene, di çend gundan de hene. Jixwe çetan di bajêr de qet şer nekir, tenê di sînorê Rojhilatê Girêspî de di malên despêkê yên Girêspî de hinekî pevçûn çêbûn, ji derveyî vê di ketina Girêspî de pevçûn çênebûn. Lewma çete êdî ketibûn çemberê, ti aliyê ku alikarî jê bigirin nemabûn, şer di bajêr de nekirin. Bajar me zû girt û weke Kobanê xirab nebû. Ji bo wê di vegera Ereban de jî ti pisgirêk derneketin. Ji bo wê Kurdên ku du sal berê ji Girêspî derketibûn hêdî hêdî ew jî vegeriyan malên xwe.

Ji bona ku em tedbîrên parastinê bikin, hema di derdora bajêr de xendek hatin kolandin, haciz li ser riyan hatin danîn, di hundirê bajêr de ji bo ewlehiyê asayîş hat avakirin, di hundirê hefteyekî deh rojan de teqwiye ji Kobanê û herêma Girêspî hatin, Kurdên li wir û qismekî kêm Ereb di asayişa Girêspî de hatin bicihkirin û asayîşa navendî ya Girêspî çêbû. Hundirê bajêr hêdî hêdî ewle dibû, heya demekê quwetên asayişê û YPG'ê bi hev re ewlehiya wê digirtin. Piştî meheke du mehan quwetên eskerî xwe kişandin û êdî asayîşê karê xwe bi xwe rê ve bir.

Di Girêspî de meclisa silhê û rêveberiyê ya Girêspî ji Kurd û Ereban pêktê hat çêkirin û rêveberî dewrî kesên medenî hate kirin û quwetên leşkerî xwe ji bajêr kişandin û tenê bi ewlehiya derve re eleqedar bûn. Firin, depoyê avê, elektîrîk hatin çêkirin di demek kin de. Alîkariya firina bajêr qismek ji Kobanê teqwiye dikir û qismek jî ji Cizîrê hevalan teqwiye dikir. Ard û genim dişandin, ji bo pêwîstiyên nan tedarîk bibin.

Piştî li Kobanê komkujî çêbûn, pêwîst bû em tedbîrên vîya bigirin, ji bo careke din nayên jiyankirin. Ber bi dawiya Timehê ve diçû pengaveke nû destpê kir. Hevalan gelek gundên derdora Sirînê girtin û bajarokê Sirînê jî, piştî wê qetlîamê hevalan rizgar kir. Bi vî awayî êdî xeteriya DAIŞ'ê li ser bajarê Kobanê rabibû. Herî kêm êniyeke

berfireh çêbû. Hin hewldanên DAIŞ'ê hebûn, cih bi cih hinek top diavêtin. Lê belê bandorek xwe ya cîdî tune bû. Bi vî awayî hemleya girtina Sirînê jî temam bû.

***- Pengava Girêspî çawa pêş ket?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Piştî wê planeke hîn stratejîk pêwîst bû. Ew jî rizgarkirina Girêspî bû. Girêspî navendeke stratejîk e. Rast e, Kobanê rizgar bû lê ji çembera çeteyan derketin pêwîst bû. Xistina Girêspî jî wisa ne hêsan bû. Kesî zêde bawer nedikir ku em ê wisa Girêspî bigrin. Dijmin jî li xeta Kobanê, Girêspî û xeta sînor pir amadekarî kiribûn. Ji gundekî heta gundên din hemû kiribûn çeperên bin erd yan ji cihok. Lê me teqtîkeke din da meşandin. Bi hêzên Cizîrê re me operasyoneke hevbeş ku em bigihin hev, pêk anî. Operasyona Şehîd Gelhat û li Cizîre jî ya Rûbar Qamişlo, dest pê kir. Ji ber ku dema hilbijartinan bû, Dewleta Tirkiyê jî bi hilbijartinan ve mijûl bû. Di wê navberê de hêza me û hêza Cizîrê gihîşt hev! Di pişta Girêspî re wisa weke xetekê gihîşt hevûdin.

Dema em gihîştin hev, çeteyên Girêspî panîkeke mezin jiyan kirin. Di wê panîkê de hemû reviyan. Vê carê hatin xwe li xeta me qelibandin û şerekî mezin çêbû. Wê rojê nêzî 50-60 cenazeyên çeteyan ketin destê me. Dîsa gelek cebilxaneya wan ku bi xwe re revandibûn ket destê me. Hêzên Cizîrê jî di heman demê de çûn ser gelek cenazê wan. Hêza çeteyan ya Girêspî gelek hatin kuştin û hinek jî reviyan çûne gel Dewleta Tirk. Yanî bi vî rengî operasyoneke mezin ku qet kesî texmîn nedikir, gihişt serkeftinê.

Niha bi girtina Girêspî re Kobanê ket qonaxeke nû. Ya girîng jî ev gaveke dîrokî bû. Ji ber ku Kantonên Cizîrê û Kobanê gihiştin hev û ew ambargoya ku 3-4 sal in li ser Kobanê hebû, rabû. Ya din jî bi vê hêvî û baweriyê Kobanêyî hemû zivirîn xaka xwe. Êdî me got rawestan nîn e û roja piştî Girêspî rizgar bû me dest bi hemleya Eyn Îsa jî kir. Di nava hefteyekê de, zêde ne ajot, hevalan Eyn Îsa jî girtin.

**7-Pêvajoya Piştî Rizgarkirina Girêspî**

***-Piştî van pengavan, li Kobanê çi pêşketin çêbûn?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Piştî rizgarkirina Eyn Îsa, dijmin xwest bi planeke nû û bi hemleyeke surprîz hem Girêspî û hem Kobanê bigire. Ji bo wê grûbeke xwe ya ji 100 kesî bi awayekî veşartî û bi plan, vedizîn nava Kobanê. Armanca wan bi xistina Kobanê re, derbê li me bidin û hêza me ya operasyonê bê bandor bikin. Pişt re jî Kobanê û Girêspî dagir bikin. Di 24'ê Hezîranê 2015'an de êrîşî Kobanê kirin. Beriya ku werin Kobanê hêza asayişê bi wan hesiya bû. Hevalê Îsmaîl û hevalên din bi wan hesiyan û di despêka bajêr de li wan xistin.

Di berbangê de hîn cihê xwe negirtibûn şer çêbû. Dijmin kete bajêr û hema kî li pêşiya xwe dît lê xistin û kuştin. Hêza me bi piranî li Eyn Îsa û li xetên dîtir bû. Helbet me bilez operasyon dest pê kir. Ji bo nerevin me derdora bajêr girt û roja duyemîn jî me piraniya wan îmha kirin. Roja seyemîn grûbeke tenê mabû, ew jî hatin îmha kirin. Di vê êrîşê de bi sedan insanên me; jin, zarok û mirovên bi temen hatin qetil kirin. Li gundan jî di serî de li Berxbotanê komkujî kirin. Hevalê me şehîd bûn. Bandoreke neyînî ya mezin li ser Kobanê û moralê gelê Kurd çêkir. Armanc ew bû ku tola xwe hilgirin, nehêlin gelê Kobanê vegere û eger karibin bajêr bigrin. Di Kobanê de cara yekê di vê astê de li ser gel qetlîam hate kirin. Ji bo me êşeke mezin bû komkujiya Kobanê. Bêguman Dewleta Tirk dîsa di nav vî sucê mirovahiyê de bû û ev yek zelal bû.

Wekî din ji milê başûr ve êrîşên wan çêbûn, lê bi ser neketin. Ji milê rojava de ava Firat derbas kirin, êrîş kirin û car din nekarîn bi ser bikevin. Ji milê Şêrgiradê yê Girêspî ve êrîş kirin dîsa Hevalan bersiva wan da û çete bi ser neketin.

Di operasyonan de cihekî stratejîk mabû ku hîn me ne girtibû, ew jî Sirîn bû. Jixwe yên ku komkujiya Kobanê kirin di wê derê re hatibûn. Sirîn navendeke esasî ya DAIŞ'ê bû û heta Sirîn heba tim ji wê derê wê êrîşî Kobanê bikirana. Ew der girtin jî girîng bû. Di serê Tîrmehê de operasyona Sirînê dest pê kir. Yanî me plan dikir ku rizgarkirina Sirînê jî em weke tola komkujiya Kobanê pêkbînin. Ya din jî heta salvegera Şoreşa 19'ê Tîrmehê em Sirînê jî bigrin. Ev pêk nehat. Heta salvegera şoreşê me negirt. Di 26'ê Tîrmehê de me Sirîn girt. Girtina Sirînê hindekî zehmet bû. Ji ber ku hem araziya wê çolter bû hem gelek erebeyên bombebarkirî teqandibûn û dijmin xwe tê de yekser bicih kiribû. Lê hêz, moral û motîvasyona ku YPG'ê girtibû êdî nikarîbûn xwe li pêşiyê bigrin. Bi vî rengî Sirîn jî hate girtin. Bi vî awayî beriya salvegera êrîşa topyekûn ya 14'ê îlonê li ser Kobanê, me hem araziya ku ji dest çûyî vegerand û hem ji derveyî wê araziyê Şêxler û Sirîn jî girt.

***-Pêvajoyê piştî rizgarkirina Kobanê û Girêspî hûn çawa dinirxînin? Dema ku mirov vegere û lê binere, encamên çawa derdikevin holê?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Mijareke girîng jî ew bû; di Kobanê de şerekî mezin hatibû kirin û pêwîst bû di bajêr de hinek xebat were meşandin. Jixwe dema ku bajar ji DAIŞ'ê hate rizgarkirin dest bi çêkirina hinek mewzî û xendekan hatibû kirin. Di dema ku Girêspî hatî girtin de hevalan ev cihokên derdora bajêr hemû qedandibûn. Ev 3 metro kûr û 4 metro fireh bûn. Ji bo parastina Kobanê xelekeke ji wan cihokan hatibû çêkirin. Di Miştenûr de hevalan dest bi çêkirina sûreke mezin kirin. Ew hîna berdewam e.

Gundiyên ku vedigerîyan bajarê xwe û gundên xwe pêdiviyên wan dihatin pêkanîn. Ji xwe bajar xirab bibû, ji sedî 70 xirab bibû û bibû enkaz. Bi alîkariya şaredariyên Bakur dest bi rakirina enkazê hat kirin. Tevahî riyên di nav bajêr de hatin vekirin. Heyetek ji endezyariyan ava bibû, tespîta xasara li wir bûye dikirin. Van hinek ji Bakur û hinek jî ji Kobanê bûn. Ji nû ve avakirina meclisan û rêveberiya kantonan hat rêxistinkirin. Saziyên ziman, çand, xebatên dibistanan, akedemiyan ji nû ve tenzîmkirina wê çêbû.

Foto-61

**-Me jî bi çavên xwe dît, bînayeke ku zirar nedîtiye û ne rûxiyaye tune. Ji bo vê hejmareke şênber heye?**

Ya ku tespît bû nêzî 7 hezar mal di bajêr de xirab bibûn ku jiyan tê de nedibû. Ji bo van, xebat hatin despêkirin. Di nava bajêr de cihê ku pir dijwar şer lê çêbûne, weke muze hate hiştin. Nêzî 700-800 malî divê weka xwe bimînin; da ku şerê Kobanê neyê jibîrkirin. Ji bona rastgele kes nekevê, derdora bajêr hate girtin û ew cih weke qada ewlehiyê hate îlankirin.

-***Pişt re?***

Pişt re, ji bo çêkirina bajêr kampanya hat despêkirin. Ji bo ji nû ve avakirina Kobanê kordinasyonek hatin amadekirin. Li hemû parçên Kurdistanê û li Ewropa komîteyên girêdayî wê hatin avakirin. Ji bo wê li Amadê konferanseke ji nû ve avakirina Kobanê hat lidarxistn. Rêveberiya kordinasyonê hat hilbijartin. Ji vir û pê ve gel jî êdî dest bi jiyana xwe ya xwezayî kirin, heta hinekan erd diçandin. Ji bo şerê Kobanê konferansek di bin navê 'berxwedana Kobanê' de hat lidarxistin, ji aliyê YPG'ê ve. Rewşa şerên herdu salên dawiyê hat destgirtin û bi taybetî jî şerê bajarê Kobanê hat destgirtin di wir de.

Ev konferans nêzî 12 rojan dewam kir. Kêmaniyên di warê teqtîk de, di warê fermandayê de, di warê pilansaziyê de, di warê sevk îdarê ve, kêmanî û tiştê were sererastkirin çibin, hemû di wir de hatin nirxandin û desgirtin. Li gorî wê çûna planeke nû hate esasgirtin. Bîryar hatin girtin. Ji bo şehîdên YPG'ê, şêweyê hereketkirinê, mewzîgirtina bajêr, şehîdgehan, birindaran û gaziyan bi giştî konfiranseke di encamê de pir bi rêkûpêk bû û di van waran de bîryar hatin girtin ku xebat bên meşandin. Di konferansê de bi rexne û rexnedayina kêmaniyên ku di piratîkê de derketin hatin mehkûmkirin û bi xwe re encamên erênî anîn.

Di dema şer de dema ku DAIŞ Kobanê û gundê derdora Kobanê girtin, erd û malên Kurdan xistibûn bazarê û difirotin. Li ser malan nivîsîbû *"ev xanî yê firotinê ye."* Erdê Kurdan cot kiribûn û ji xwe re çandibûn. Genim, ceh çandibûn. Dema ku mirov meyze dike hedefa DAIŞ'ê ew bû ku ji Kobanê dernekeve. Jixwe her tişt talan kirîbûn di gundan de, xanî bi tenê mabûn. Tiştê bi nirx hemû talan kirîbûn. Qismek li Girêspî firotibûn, qismek li Reqa firotibûn, hinek derbasî Tirkiye kiribûn. Erebe û alavên milet hemû firotibûn, pez û çêlekên milet hemû firotibûn.

Şîrketeke Fransa ya çîmentoyê di nav gundên Kobanê de heye. 50 km dikeve Rojhilatê Başûrê Kobanê. Fransa û Misir bi hevre şîrik bûn. Şîrketek pir mezin bû. Rojê 10-15 hezar ton çîmento derdixist. Dema ku DAIŞ ketê, heya pêvajoya şerê Kobanê qet dest nedayê. Ema gava ku zanîn wê heval bixin destê xwe vê şirketê, dest bi teqîna wê kirin. Ev çimento difirotin Iraq, Sûriye, Lûbnanê û Ûrdunê. Tenê çêkirina wê şîrketê 2-3 milyon dolar bû.

**8-Kobanê Bajarê Şehîdan e!**

***-Herî dawî ji bo Kobanê tiştekî ku hûn dixwazin bînin ziman hebe, em dikarin bigrin?***

**ELÎ GIRÊSPÎ:** Di şerê Kobanê de qehremaniyên pir mezin hatin jiyankirin. Me navê pir hevalan dan. Pir hevalên ku em navê wan nizanin di pêvajoya şer de şer kirin û şehît ketin hebûn. Pir heval hebûn mewziyên xwe bernedan şehît ketin. Pir hevalên ku heya dawiyê hevalên xwe ne terikandin, şer kirin û şehîd ketin hebûn. Pir heval ji bo hevalê xwe yê birîndar xilas bikin şehîd ketin. Ev pêvajo, pêvajoyekî qehremaniyê bû. Pêvajoyekî rihê fedayî yê Serok APO bû bi wan hevalan re.

Di encamê de Kobanê bû bajarekî şehîdan û weke bajarê şehîdan bê naskirin wê pir biwate be. Li ti deran Kurdistanê, li ti bajarên Kurdistanê evqas şehîd di bajarekî de nehatine dayin.

Di vê pêvajoyê de hevalên weke şehîd Gelhat, şehîd Hogir, şehîd Dilgeş, şehîd Rêber, şehîd Destîna, şehîd Cudî her yek hevalên pir taybet in. Pêwist e di demên pêş de li ser wan; li ser jiyan, şer, xebat û taybetmendiyên wan xebat bên meşandin.

***-Di mijara Kobanê de hûn dixwazin herî dawî bibêjin çi?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Helbet ez ê vê jî bibêjim gelek detay û gelek tiştên me ne gotine hene. Ya rast Kobanê her seata wê, her roja wê destanek e. Ji ber ku nêzî hezar şehîd, dil û canê xwe spart wê xakê. Nêzî 2 hezarî birîndarên me çêbûn. Bi vegotineke bi vî awayî bi rastî jî em nikarin heqê wan bidin. Di Kobanê de şerekî navneteweyî çêbû, ya rast Kobanê kete bin êrîşeke pirdewletî de. Yên xuya dikirin çete bûn lê yên ku li hemberî gelê Kurd bi teknîk, teqtîk û pisporî şer dikirin dewlet bûn.

Lê Kobanê bi ser ket, di kesayeta Kobanê de nirxên hemû mirovatiyê bi ser ketin. Lewre jî ew mirovatî li Kobanê û nirxên xwe xwedî derket. Ya din di Kobanê de kolektîvîzm bi ser ket. Hem kedeke Kurdistanî çêbû hem kedeke navneteweyî çêbû. Gelê Kurd ê li Bakur bi rastî jî bi Kobanê re rûnîşt û bi Kobanê re rabû, bi Kobanê re êş kişand û bi Kobanê re kêfxweş bû. Ji çepgirên Tirkan bigire heta gelê Tirk ê ku hatî tevlîbûyî hemû beşdarî vê destanê bûn. Dilê cîhanê bi şev û roj li Kobanê lêxist.

Roja 1'ê Mijdarê ya cîhanî ji bo xwedîderketina li berxwedana Kobanê, bi keda navneteweyî çêbû. Ya girîng şervanên navnetewî yên Emerîkî, Kanadayî, Frensî, Îspanî û ji gelek netewên din insanên demokrat û şervanên ku xwestin li hemberî hovîtiya DAIŞê bisekinin, hatin li Kobanê şehîd bûn.

Ji hêla din hovîtiya DAIŞ'ê di Kobanê de hilweşiya û têk çû. Kobanê li hember tarîtî û tirsa hovîtiyê, cesaret da dinyayê hemû. Kobanê ev îsbat kir. Helbet di têkoşîna me ya rizgariya neteweyî de jî encameke dîrokî û pir xurt girt. Ev jî bi berdêlên giran û bi berdêla hezaran şehîd û birîndar çêbû. Em deyndarê wan Hevalan in ku canê xwe bexşandin, xwîna xwe rijandin… Helbet dinya deyndarê wan e. Îsbat kirin ku rihê Apogerî ti car bi bin nakeve. Gelê ku li ber xwe bide, bi bin nakeve. Çiqas hêza li beramber xurt dibe bila bibe ew bi bin nakeve. Dijminên gelê Kurd ku dixwestin me îmha bikin hemû têk çûn. Em dîsa ji bo hemû Hevalên şehîd minetdar in û şopdarê ked û xeta wan in.

# BEŞA SEYEMÎN
# EFRÎN

### 1-Beriya Şoreşê Rewşa Efrînê û Amadekariyên Şoreşê

***-Weke siyasetmedareke jin, we li Efrînê di nava Şoreşa Rojava de cihê xwe girt. Di destpêkê de li Efrînê rewş çi bû û li Efrînê şoreş çawa pêş ket?***

**ZELAL EFRÎN**: Jixwe ez ji Rojava me. Dema ku pêvajoyê şoreşê destpê kir, bi xwesteka xwe, ez derbasî Efrînê bûm. Lewma weke şoreşgerên Kurd, divê ji bo karê şoreşê mirov her dem amade be. Çi bê xwestin jî, divê mirov li gorî pêwîstiyên gel bigre dest. Ji vî alî ve lêhûrbûnên me çêbûn.

Di wê demê de nirxandinên Serokatî jî çêbûn; gelê Ereb digot, "*Bihara Ereban.*" Lê Serokatî digot, "*bihar, bihara gelan e.*" Ji ber vê yekê dema ku li Rojhilata Navîn şoreşê destpê kir, ji bo Kurdistanê jî hin derfet derketibûn holê. Bi taybetî li ser Rojavayê Kurdistanê bandor dikir. Dema ku em çûn jî, rewşeke wisa hebû û dê me xwe di nava gel de çawa bi cih bikira û rêxistin bikira, dihat nîqaşkirin.

Pergala Sûriye tê zanîn; bi taybetî di salên 2005-6-7'an de li ser gel pergalek tûnd û wahşî dihat meşandin. Gelek kadroyên me digirtin, li hemberî welatparêzên me tûnd nêzik bûbûn. Bi kurtasî pergaleke wahşetê dimeşandin. Bandora vê li ser gelê Efrînê jî kiribû, mirov didît ku gel çavtirsiyayî bûye. Ew nêzikbûn demekê berdewam kir, gel digot, *"heval hatine, tevger çêdibe; dê ji bo vê dewlet me bigre."* Lê pişt re ew tirs derbas bû. Jixwe hinek welatparêz hatibûn girtin. Ji ber van sedeman, di nêzikatiya gel de ji aliyekî ve tirs hebû; lê ji aliyekî ve jî li hemberî hevalan hezkirinek û hesteke parastinê hebû. Mirov ji vê yekê moral jî digirt.

Bi kurtasî li gorî berê di gel de hin guhertin çêbûbûn. Tirs û gumanek dihat jiyankirin, lê bi çûn û hatinê, bi nîqaşan ew fikar ji holê hatin rakirin. Bi taybetî malbatên şehîdan, malbatên hevalan, mirovên welatparêz û girêdayî kedê, nêzikbûneke erênî nîşan dan. Di destpêkê de jî, em bi wan re diketin têkiliyê û me dixwest wan nas

bikin. Heya dawiyê jî ked dan û fedakarî kirin. Me dixwest bi riya wan gel nas bikin. Bi giştî civakê û gund û bajaran nas bikin. Yên guncav jî me dixistin nava kar.

Min li Efrînê, milê gundan kar dikir. Em û gel, me pir zû hevûdin nas kir. Di destpêkê de, bi awayekî veşartî û bi komên biçûk me xwe rêxistin dikir. Lewra divê di destpêkê de me ew nas bikira û bawerî jê bigirta. Bi awayekî pir zû jî bawerî dane me û hatin rêxistinkirin.

Di destpêkê de, Gund bi gund civîn dihatin çêkirin. Hemû kar di nava hev de dimeşiyan. Karê me negihêştibû pergalekê. Me di destpêkê de civînên giştî çêdikirin. Piştre civînên xweser û taybet hatin çêkirin. Dîsa me mal ziyaret dikirin, yê bikara kar bikira, me tevlî xebatan dikir. Jixwe karê parastinê, gel û yên din bi hev re dimeşî. Erdnigariya Efrînê jî, ji aliyê parastinê ve guncav bû. Hevalan xwe li milê gundan rêxistin dikirin.

Dema ku li wir wargehên leşkerî çêbûn, em her diçûn gel hevalan. Me carinan, komên ji gel û ciwanan pêk dihatin, dibirin wir û perwerde dikirin. Alaqayeke wan jî hebû. Li Efrînê sê qampên me yên leşkerî hebûn û ji Heleb û Kobanê jî gel dihat û li wir perwerde didît. Lê veşartî bû, pir kesî nedizanî.

Ji destpêkê ve di karê me de parastin pir li pêş bû, me pir girîngî didayê. Lê em neçar bûn, bi awayekî veşartî pêş bixin. Ji aliyê gel ve jî alaqayeke mezin hebû. Bi taybetî ji milê jinên ciwan ve, alaqadar bûn hebû û pir zû dihatin îqna kirin. Hezkirina wan ji bo çek û parastinê hebû. Ji ber vê jî zû fêr bûn û fêm kirin. Lê gelek kes jî diketin nava fikaran û digotin, *"gelo di demên pêş de şer dê were kirin?"* Dîsa jî meraq û xwestekek hebû.

Perwerdeyên ewil, pir ne dirêj bûn. Hefteyek bû, herî zêde 10-15 roj bûn, da ku yê perwerdê pir zêde ji mal û derdora xwe qut nebin û neyên naskirin. Di wê demê de, kelecanî û moraleke mezin çêbûbû. Di wan kesên ku dihatin û perwerde didîtin de jî, ji sedî 90 guhertin çêdibû. Hezkirin û alaqayek hebû. Dixwestin nas bikin, fêm bikin. Ger mirov pê bide fêmkirin, nêzikbûneke erênî ya gel hebû.

Di dema destpêkê de, hemû hevalên ku çûne Rojava, di ferqa karê xwe de bûn. Her kesî dixwest kar bike, xebat bimeşîne. Ji ber ku karekî nû bû, xwestek çêdikir. Dema ku mirov bê kar dima, ji mirov re tengasî û ecizbûn çêdibû. Gelek caran me, ji gel kelecanî digirt. Nêzikbûnên gel moral dida me. Her ku diçû, karên ku dihatin kirin moral û coş pêş dixistin. Ez bi xwe jî ketim ferqa hin tiştan. Min digot, *"ji karê herî biçûk bigre, heya karên dîtir; divê mirov kar*ê xwe *bi moral û kelecanî bike."* Ger bê moral kar were kirin, bandor li ser her tiştî mirov jî dike. Her çiqasa car caran tengasî bên jiyankirin jî, me reng nedida.

Bi vî rengî, 2-3 mehan karê me li ser esasê naskirina gel, gund, malbat û kesan bû û civîn dihatin lidarxistin. Piştî wê her mehê civîn dihatin çêkirin û kar bi pergal dibû. Divê ew kar û xebat, tenê bi kesên pêşeng nehatibûya pêş xistin. Ji bo wê jî her gund û cihekî ku em diçûn, me hewl dida em çend kesan nas bikin, bi wan bidin fêmkirin û bi hev re kar bikin. Me bi tiştên biçûk destpê dikir. Wan kesên ku hatine diyarkirin, hem alîkarî ji me re dikirin, hem me ew qezenç dikirin, hem jî kesên dîtir bi me didan naskirin. Alaqayeke gel jî hebû. Li her gundekî bi sedan kes tevlî civînan dibûn. Bi piranî jî kesên welatparêz, malbatên şehîdan û malbatên hevalan; risteke erênî dilîstin. Me bawerî da hev, alîkariyeke mezin dan me, li gel me sekinîn. Heya ku em pergala xwe bidin rûnişkandin û hênaseyeke fireh bigrin, li gel me bûn.

Di destpêkê de tevî ku dewlet jî hebû, me wan xebatên xwe dan meşandin, civînên xwe çêdikirin. Dema me civîn çêdikirin, me tevdîrên xwe jî digirtin, li cihên pêwîst nobedar dihatin derxistin. Hesabê her tiştî dihat kirin. Di wê demê de li gelek cihan, hin kesan digotin, "*li falan cihî kesên noker hene, BAAS'î hene, baregeh hene; divê li gorî wê tevdîr bên girtin."* Ew fikar jî hatin şikenandin. Bi taybetî li milê nahiyeya Reco baregehên dewletê hebûn û hinek kesan ji wan re kar dikirin. Jixwe dema ku te li gundekî civîn çêdikir, hemû gundiyan dizanî. Lê me dixwest, em wê tirsê bişkînin. Lewra çi dibe bila bibe, divê me ew kar bida meşandin. Ji ber vê yekê piştî çend civînan, gel jî fêr bû û ew tirs şikest. Me ew yek dît; dema ku mirov rast nêzikî gel bibe, ti fedakariyên ku nekin, tine ye. Mînak ji gundan, kesekî bi navê Ednan hebû; berê jî pir kar kiribû. Li gel ku xwedî mal û zarok bû, bi şev û roj li gel me bû, her karek dikir. Hinek hevalên jin hebûn, ew jî wisa bûn. Gelê me di destpêkê de pir fedakarî kirin. Heya ku me dest danî ser hin cihên dewletê jî derfetên me pir ne zêde bûn. Gel hemû malê xwe û maşîneyên xwe, di destê wan de çi hebe, dabû xizmetê me. Digotin, "*em ji her tiştî re amade ne, çi pêwîst dike di xizmetê we de ye."* Li hemberî me nêzikatiyeke baş hebû.

***-Saziyên ku di vê demê de hatine vekirin hene?***

Rast e. 3-4 mehan bi vî rengî derbas bû. Lê piştre xebat zêdetir bi pergal bûn. Mînak, li nahiye ya Şiyê me xwest em dibistanekê vekin. Me digot, dê hem zarok bixwînin, hem jî em ê di nav de karê xwe bimeşînin. Em çûn û me bi xwediyê malê re danûstandin çêkir û li wê derê me li ser navê 'Şehîd Kemal' dibistan vekir. Cihekî nêzikî rê bû û alaqaya ciwanan jî pir hebû. Her wiha ji ber şehîdê ewil yê wî gundî şehîd Kemal bû û me navê wî li dibistanê kiribû; vê yekê jî alaqadarî zêdetir dikir.

**-Bi zimanê Kurdî vekirina dibistanan, tesîreke çawa li ser gel çêkir?**

Dema ku me dibistan vekir, weke mîtîngekê lê hat. 30 gundên girêdayî Şîyê, hemû hatibûn. Me dixwest bi vê yekê hem hin peyaman bidin, hem jî wê tirsê bişkînin. Her gundekî bi maşîneyan, bi jin û zarokan tevlî vekirina dibistanê bûn. Gelek kesan qet agahiya xwe ji van tiştan tune bûn. Lê gelek kesan jî ji be rê de, ew nêzikbûn dizanîn. Zimanê Kurdî jî dizanîn.

Dema ku me ew dibistan vekir, bi hezaran mirov hatin wir. Hin kesan digot, *"ez qurbana vê rojê bim ku me rojek wisa dît!"* Dema ku ala kesk û sor û zer li ser dibistanê hate daliqandin, di gel de moralekî pir mezin çebû. Em bi xwe jî bi kelecan û moral dibûn. Xeyalên sedan salan, pêk dihatin. Her wiha ev xeyalên şehîdan ku di oxirê wê de canê xwe dabûn. Ji bo wê jî ew xebat xwediyê wateyeke mezin bûn.

Me digot, weke Kurd siyaseta me diyar e. Em xeta sêyemîn in; em ne bi dewletê re ne, ne jî bi mûxalefetê re ne. Ji milê siyasetê ve jî, ji milê meşan ve jî fikir û bîrdoziyek me hebû. Ji ber vê me xeta sêyemîn diparast. Gelek caran hinek kes diketin nava gumanan. Ji bo ku di destpêkê de tirsa gel bişkê û gel moral bigre, me dest bi meşan kir. Li ser esasê xeta sêyemîn, me meş li dar dixistin. Piranî di bin navê ciwanan de meşên me dihatin çêkirin, carinan meşên mezintir çêdibûn. Rist û rola ciwanan jî di wê derê de zêde bû. Ew meşên ku hatin çêkirin, gavek bû. Hem gel dihat rêxistinkirin, hem jî coş û germahiyeke pir mezin çêdikir. Di her meşê de alên kesk û sor û zer û alên dîtir hebûn. Jixwe dewlet di hin tiştan de şikestibû. Bi riya meş û xebatên dîtir, me dixwest gel qezenc bikin.

Carekê van tevgerên dîtir meş li dar xistibûn, me jî di heman rojê de û li heman cihî meş li dar xist. Jixwe pişt re hinek ji wan tevlî me bûn, hinek jî belav bûn û çûn. Li Efrînê ew tevgerên dîtir ne weke aliyê Kobanê û Cizîrê bûn. Dema ku li Kobanê û Cizîrê meş dihatin kirin, bi van tevgerên din re pirsgirêkên mezin derdiketin. Lê li Efrînê tiştekî wisa tine bû. Çend caran hin hewldan çêbûn, lê tiştên wisa mezin çênebûn. Li Efrînê, xebatên ku me di destpêkê de dan meşandin jî, bingeha wan tevgerên dîtir ji holê rakir û ew bê bandor bûn. Êdî nedikarîn pir eşkere bikevin nava hewldanan, veşartî bûn. Lewra gel li derdora wan kêm bû. Lê meşên me girseyî çêdibûn, êdî wan tevgerên dîtir jî tevlê dibûn. Bi tevlêbûna sedhezaran meş çêdibûn.

Me dixwest êdî herkesî tevlî kar û xebatan bikin. Mesela em diçûn gundekî, ger di wî gundî de 100 mal heba, me dixwest bikevin hemûyan. Gundên ku em diçûnê, ger em dixwazin siyaset û armanca xwe bidin naskirin; bi hêsanî çênabe, hinek zehmetiyên wê hene. Tenê bi civînan xilas nedibû. Me pir civîn jî çêdikirin, di nava heyvekê de çend civîn çêdibûn. Lê di dawiyê de me bîryar da ku em pergala xwe ya TEV-DEM'ê bidin rûnişkandin. Lewra di civînan de her tişt naye çareserkirin, an jî hemû gel naye civînê. Ji ber vê me xwest, em pergala xwe ava bikin. Gundên ku em çûne, mal bi mal em ketinê, me xwest wan nas bikin û armancên xwe bi wan bidin fêmkirin. Li gel xebatên TEV-DEM'ê, me dixwest xebatên jinan jî bimeşînin.

**-Di van xebatan de tevlêbûna jinan çawa bû?**

Civaka Efrînê, ji milê jinê ve ji berê ve vekirîbû. Serokatî bi xwe jî dibêje, "*di civakê de rista jinê heye, ger jinek bê qezenckirin, dê ew malbat bi giştî bê qezenckirin."* Ji ber vê yekê me xwest, xebatên xwe yên jinan jî bi pergal bikin û bidin rûnişkandin. Jin jî ji vê yekê re vekirîbûn, zû qebûl dikirin. Pir caran em diçûn û me behsa pergala xwe dikir; her çiqasa jin di nava malbatê de ketibe û bêdeng be jî, bi riya jinê me gelek tişt qezenc kirin. Lewra me jin qezenc bikira, dê hemû malbat jî qebûl bikira. Me hinek jin xistin nava TEV-DEM'ê jî. Di destpêkê de ji bo ku tu cudabûna xwe nîşan bide, di her gavê de jî divê tu li gorî wan xebatan bimeşîne. Tiştên ku berê di nava pergalê de hene, gel jî nedipejirand. Dema ku alternetîfa wê didît, zû dihat îqnakirin. Mesela berê li gundekî muxtarek hebe, her tişt ew bû û ew jî bi dewletê ve girêdayî bû. Li ser gel tirsek dida avakirin. Karên îstîxbarî jî ji rejîmê re dikirin. Lê di pergala me de, li gundekî tenê kesek nabe berpirsiyar, divê rêveberiyên demokratîk hebin. Gel jî ew qebûl dikir, pir caran me keya jî qezenc dikirin. Ji bo gel pergala me nas bike, me hin gavên wisa diavêtin.

Ji ber ku li ser pergalê di destê me de pir belge û hwd jî tine bûn. Ji bo ku di destpêkê de pergala me fêm bikin û qebûl bikin, me wisa bi hêsanî hin tiştên berbiçav pêk dianîn. Me digot, "*di gundekî de cihê ku tenê keyayek hebe, divê herî kêm 5-7 kes rêveberiya gund bikin. Her wiha divê di nav de jin jî hebin.*" Jixwe weke me got, ji aliyê jinê ve Efrîn hinekî vekirî bû û xwe pêşketî jî didît. Li Efrînê, di nava her xebatê de jin jî herî kêm di asta zilaman de tevlê dibû. Bandora tevgera azadiya yê PKK jî pir li ser hebû, her gundekî 15-20 şehîdên wan hebûn, bi dehan hevalên gerîla jê derketibûn. Ango zanebûna wan ya tevgerê hebû, pir zû qebûl dikirin. Ji ber vê yekê jî me li her gundekî komîteyên gund yên TEV-DEM'ê û jinê ava dikirin, li hinek cihan ciwanan jî xwe rêxistin dikirin. Ji vî alî ve jî xwestekek hebû. Di çend mehên ewil de hinekî zehmetî hatin kişandin, lê piştî wê hem di xebatên Yekîtiya Star de, hem jî di xebatên din de tevlêbûneke xurt hate çêkirin.

Herêma ku ez lê bûm, nêzikî 30 gundî hebû. Heya 2013'an jî xebatan berdewam dikir. Ji milê pergalê ve di 2 salan de gelek gavên mezin hatin avêtin. Li ser esasê meclîs û komîteyan xebatek dihat meşandin û ser êşandinek

hebû. Mesela dema ku me ew cihê ewil vekir, ew der ya apê hevalekî şehîd bû. Got, *“ez 60 salî me, lê ev cara yekemîn e tiştekî wisa dibînim. Ji min re weke xewnekê ye. Bi rastî jî hunê dibistana Kurdî vekin?”* Jixwe ji bo kirê ya wir pere jî nexwestin. Heya ku me dest danî ser saziyên dewletê jî, me ew cih bi kar dianî. Di bin navê dibistanê de hatibû vekirin; hem zarokan li wir dixwend, hem xebatên me yên giştî lê dihatin kirin, hem jî xebatên jin û ciwan lê dihatin meşandin. Çi kar û civînên me hebana, me li wir pêkdianî. Di rêveberiya wê derê de jî 2 jin, 3 xort hebûn. Me digot, dê hun karê vê derê bimeşînin; lê me jî alîkariya wan dikir.

***-Hûn jî li Efrînê xebatên şoreşê de mane. Dema hûn çûn Efrînê rewşa gel çawa bû, ji bo şoreşê amadekariyên çawa hatin kirin?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Dema ku em çûn herêma Efrîn û Helebê, tesîra dewletê ku bi komkujî û tûndiyan li ser gel çêkiriye me pir zû ferq kir, lewra berçav bû. Gel çiqasa xistiye nava psîkolojiyeke xwe parastinê û tenê jiyana xwe domandinê, bi awayekî vekirî dihat dîtin. Wê demê gelek kesan, ew guhertinên ku li Rojhilata Navîn çêbûne û rewşa ku Sûriye di nav de ye, nedîdît. Nedikarîn tehlîla wê çêbikin û li gorî wê bi hatina rêxistinê xwe ji nû ve ava û rêxistin bikin. Nedikarîn li gorî wê gaveke biavêjin û bikevin pratîkê. Ew di nava ew psîkolojiya parastinê de mabûn. Dê ew psîkolojî bi çi rê û rêbazan bihata derbaskirin?

Vê yekê hewldan û kedek dixwest. Di destpêkê de me xwest em xebatên leşkerî tanzîm bikin. Li erndnigarî û araziya Efrînê gerîn çêbû, em çiya bi çiya geriyan. Ji çiyayê Raco, Bilbilê bigre heya çiyayê Hawar, yek bi yek keşîfkirin hat çêkirin. Ew çiya, çiyayên ase yên Efrînê bûn. Ji çiyayê Şêrawa bigre, heya milê Qastel Cindo, Cindirêsê, Şiyê gerek çêbû. Ango di nava sînorên bajar û gundên Efrînê de gerîn û amadekariyek kirin hebû. Ew koma me ku çûye wir, planek wisa ji xwe re çêkir û hewl da ku wan çiyayan nas bike. Da ku di pêşerojê de em bikaribin di nava wan çiyan de gel perwerde bikin, rêxistin bikin û wan bigihînin asta xwe parastinê. Li ser wê esasê tevgerek çêbû.

Piştî wan ger û naskirinan, rêxistinkirina gel pêwîst dikir. Ji ber ku gel ketibû nava psîkolojiyeke cûda, ew coş û kelecaniya şoreşê li holê tine bû. Lewra hîs dikirin ku ger serî rakin, dê dîsa ew zirar bibînin. Her wiha dizanîn ku yên ku xwe weke mûxalîf didin nasîn bibin deshilatdar jî, dê hebûna Kurdan qebûl nekin. Bi nîqaş û danûstandinan gel dizanî ku li Sûriye guhertinek çêbe jî, ji bo Kurdan tu pêşketin çênabin. Ji ber vê yekê ji şoreşa Sûriye jî pir zêde coş nedigirtin. Ew yek bi awayekî zelal dest nîşan jî dikirin. Digotin, *“gelo îro em piştgiriya wan bikin, dê sibê ew me qebûl bikin, an na?”* Di mejî û fikrên wan de ew fikar hebûn. Ji bo derbaskirina van fikaran û perspektîfa rast ya partiyê bê qebûlkirin, ji her alî ve nîqaş û qanakirineke pêwîst dikir. Bi vê armancê em ketin nava gelê xwe yê Efrînê.

Me dizanî ku ji milê Kurdiniyê ve Efrîn xwediyê welatparêziyeke kevnare bû. Gelek rewşenbîrên Kurd yên weke Nurî Dersîmî jî di wan deran de jiyan kiribûn. Ji milê netewiyetê ve gelekî dewlemend bû. Kurdên Elewî û Sûnî, Ermenî, Ereb hebûn. Ango ji milê civakî ve pir rengiyek hebû. Lê gelek fikarên pêşerojê jî hebûn û êdî mijarên nîqaş û xebatan bûn.

Ji ber van sedeman em yekser ketin nava gel. Me hewl da propagandaya tehlîl û perspektîfên rêxistinê bikin û fikreke rast di mejiyê gel de ava bikin. Li gorî vê hewl dihat dayin ku coş, kelecanî, moral, rih û yekîtiyek bê çêkirin.

Dê di Sûriye de, xeta me ya seyemîn bi çi awayî be, em ê çawa tevbigerin, em ê çawa xwe rêxistin bikin, em ê çawa xwe ser piyan bigrin; van mijaran her dihatin nîqaş kirin. Ger tu biçûya malekê, sedan pirs ji te dihatin kirin. Lewra rewşeke siyasî ya germ li Sûriye dihat jiyankirin, îstiqrar tune bû û ti kes jî nedikarî pêşiya xwe bibîne. Lê felsefeya Rêber Apo û xeta me ya Rojava diyar bû û di vê çarçoveyê de nîqaş û danûstandin bi gel re çêdibûn.

Ji me re digotin, “*hûn ê aliyê dewletê bin, an hûn ê piştgiriya van hêzên din bikin?*” Dixwestin vê yekê fêm bikin. Bi taybetî ji ber ku dewletê li ser gelê me komkujî û tûndî çêkirine, li hemberî dewletê rikek jî hebû. Me jî digot, *“em ne aliyê dewletê digrin, ne jî em bi şêwaza van mûxalîfan têkoşîn dimeşînin. Armanca me ne talan û sûlta girtin e.”* Van gotinên me zêdetir meraq çêdikir. Digotin, *“ger wisa be, em ê çi bikin? Hûn ê bikarin Rojava azad bikin, an jî hûn ê bikaribin me biparêzin? Ji ber ku em ji 12’ê Adarê û vir ve her rastî talan û komkujiyan hatin, hûn ê bikaribin pêşiya vê bigrin?*” Her pirs û bersivên bi vî rengî hebûn.

Nêzikatiyên me pir bal dikşand û her kes meraq dikir ka em ê çi bikin. Ji ber vê jî divê me hin tişt dabana avakirin û hin tişt dabana îspatkirin. Wê demê her hefteyekî û 10 rojan carekê me meş lidardixistin û çalakî dikirin. Lê vê yekê ji bo gelê Kurd têrê nedikir, da ku tu bikaribê hemû gel rakê û bixê nava şoreşê.

Di vê mijarê de jî rastiya şehîdan li ser gel pir bandor kir. Hevalê Seydo li Botanê şehîd ketibû. Dema ku me anî Efrîn û merasîm çêkir. Me tahmîn nedikir ku dê gel bi coş û kelecaniyeke mezin pêşwazî bike. Me cara yekemîn di mizgeftên dewletê de bang kir û got, “*di falan seatê de falan cihî merasîm heye.”* Ji ber ku rêxistina me kêm bû, me bi vê rêbazê agahî da gel.

Careke me di hemû mizgeftan de bangî gel kir ku tevlî merasîma Şehît Seydo bibin. Merasîma Şehît Seydo, li Efrînê deng veda. Hevalê Seydo, hevalekî ciwan bû û bi ciwantiya xwe tevlî şoreşê bûbû û bi ciwantiya xwe jî şehîd ketibû. Her çiqasa ciwan be jî, bandora wî li ser gel pir zêde bû. Ji ber ku navê Şehît Seydoyê ku şehîdê ewil yê Efrînê ye jî girtibû, nunertiya çanda şehîdan dikir. Me tehmîn nedikir ku bi hejmareke ew qesa mezin xwedî lê derketina gel çêbibe. Vê mijarê jî mirov dikare weke kêmaniya xwe bibîne. Rexnedayina nedîtina rihê welatparêzî û berxwedaniyê ku di gelê Efrînê de heye ye.

Me digot, me bangawazî kiriye, çend hezar milet were em dikarin merasîmeke çêbikin. Lê roja merasîmê, ez dikarim bibêjim hemû Efrîn hat merasîmê û girêdanbûna xwe ya şehîdan re da diyar kirin. Di wê derê de baweriyeke xurt jî da çêkirin û peyama "*em weke gelê Kurd dikarin şoreşa xwe çêbikin û nîzama xwe ava bikin*" da her kes. Her çiqasa ne rêxistinkirî be, fikaran jiyan bike û di serê wan de pirs jî hebin, dan diyarkirin ku gelê Efrîn girêdayî şehîdan e, girêdayî Rêber Apo ye, welatparêziyeke kûr tê de heye û ji şoreşê re amade ye. Bes mirov bikaribe vî cewherî rêxistin bike û vegerîne hêzeke siyasî û parastinê, bikaribe bixe xizmetî wî gelî. Ew bi awayekî şênber derket holê.

Foto-62

Piştî ku me baweriyek wisa ji gel girt, êdî me pirsa "*em ê çawa vî gelî tanzîm bikin?*" li xwe kir. Di destpêkê de ji ber ku me gel nas nedikir, me nedikarî em xwe bigihînin her kes. Lê bi şehadet û merasîma hevalê Seydo deriyê her malekê, dilê her mirovek ji me re vebû. Ji bo hembêzkirina şervanên xwe û xwedî li şervanên xwe derketinê, helwesteke wisa nîşan dan û her tişt nîşanî me da. Li ser wê bingehê êdî gelê Efrînê, bi awayekî zelal helwesta xwe diyar kir. Helwesta xwe ya welatparêziyê, helwesta xwe ya şoreşê, helwesta xwe ya kûr bi rihê Apoger re diyar kir. Tenê divê mîlîtanên Rêber Apo, ew pirs û fikarên gel re bûbûya bersiv. Ew mijar ji bo me pir girîng bû. Me çiqasa bi gotin anibûya ziman jî heya merasîma Şehît Seydo gel qana nedibû. Lê dema ku dîtin em dikarin, cenazeyê şehîdekî ji Bakur derbasî Efrînê bikin, dikarin merasîmên girseyî dar bixin û dewleta Sûriye nikare bi hişkî were ser gel û di gel de vînekê dibîne û li gorî wê hesaban dike, gel tam bawerî bi xwe anî.

Bi vî awayî li Efrîn û Helebê ji nû ve me dest bi xebatên tanzîmkirina gel kir. Li gorî xeta seyemîn, tanzîm, siyaset, rêxistin, têkilî û parastinê gel çawa çêbe derket holê. Vê yekê mecalek da me. Şehîdan bi vî awayî me re riyek vekir, em derbasî nava gel bûn û me dest bi rêxistina xwe kir.

Li ser ciwanan bi taybetî bi rêka medreseyan û şerê taybet texrîbatên pir mezin çêbûbûn. Ji bo ku li ser rewşa xwe ya siyasî, civakî û aborî nefikire, madeyên hişbirinê pir zêde belav kiribûn. Mecala vê dabûnê û ew made bi erzanî di nava gel de dihat belavkirin. Dixwestin ciwanan bi vî awayî bikin bin serweriya xwe û bê bandor bikin. Xwe gihandin û rêxistinkirina ciwanan jî di nava gel de çêbû.

Pêwîstî bi rêxistinkirina ciwanan hebû û ji ber vê yekê em ketin nava wê xebatê. Divê bi rê û rêbazên cuda bala ciwanan bihata kişandan. Şoreşê destpê kiribû û gelek pirsgirekên civakî dihatin jiyankirin, dewletê êdî girîngî nedida civakê. Karên bi civakê ve têkîldar nedimeşandin. Lewra berê her tişt bi destê dewletê dimeşiya, lê dema ku şoreşê destpê kir, hêza dewletê tine bû ku bi van tiştan re alaqadar bibe. Ew tiştên weke firin, dermanxwane, kargeh, nexweşxane, medrese devletê ji çavan derxist, sist nêzikî bû. Zêdetir girîngî dida deshilatdariya xwe û hêza xwe ya leşkerî.

Vê yekê fersend da me ku em jî ciwanan rêxistin bikin. Çalakiya me ya ewil, me xwest bi civîn û kombûyinan ciwanan bikşînin nava serhildan û tevgerên şoreşgerî. Tiştên bi vî rengî di nava ciwanan de meraq ava dikir û ciwan dikirin nava tevgerê. Lê dema ku te behsa parastinê dikir, an jî te bigota em ê li hemberî dewletê hêzeke leşkerî çêbikin, zêdetir bala ciwanan dikşand. Ji ber ku hê jî dewlet hebû, hê tirsek jî hebû. Me zêde nedikarî yekîne û kombûyinan ava bikin. Ji ber vê jî ciwanan digot, "*hûn çi peywirê bidin min ez ê bikim, lê ez ê bi tenê bikim.*"

***-Di vê demê de gelo li hemberî dewletê çalakiyên we hebûn?***

Ji bo ku em bikaribin Efrînê ji destê dewletê derbixin, me hin çalakiyên biçûk çêdikirin. Mesela benzîn pir kêm dihat Efrînê. Jixwe kesên dewlemend karê xwe bi xwediyê benzînxanê re çêdikirin û karê xwe hal dikirin. Çîna navîn û dewlemend, bi awayekî karê xwe hal dikirin. Lê yên ku bê benzîn diman û nedikarîn baxçeyên xwe av bidin û pêwîstiyên xwe yên dîtir bibersivînin mirovên hêjar bûn.

Çalakiya leşkerî ku me ewilî kir, me dest da ser gaziyên li Efrînê hene û me xistin rêkekê. Bê ferq û cudahî, her kes dikarî mafê xwe bigre. Dema ku dest dayina ser benzînxane û rêxistinkirina wan çêbû, dewlet ket hûndirê tirseke. Berê karmendên dewletê benzîn belav dikirin, kê bihata û pere bixista berîka wan, ew dikarî mazot û benzînê bigre. Li hemberî vê çalakiyek kirin, di Rojava de cara ewil çêdibû. Me ciwan bi daran rêxistin kirin, da ku dest bidin ser benzînxaneyan û pergala wir çêbikin. 15-20 ciwan bi daran diçûn li ser disekinîn, pergala milet

çêdikirin, benzîn û mazot belav dikirin. Vê pergala nedihêlişt ku karmendên dewletê bên û bertîl bixwin û ew mazot tenê derdoreke dewlemend re biçe.

Tiştekî biçûk e, lê cara yekemîn e ku li herêma Efrînê em dewletê red dikin. Em nahêlin ku bikeva qada civakî û di qada civakî de hebûna xwe bide ferzkirin. Ji bo wê gazî ruspiyên Efrînê kirin gotin, "*em dizanin, hûn radibin serhildanan, hûn dirûşmeyan diavêjin, hûn meşan dardixin, ew yek me fêm kir. Ji bo vê em dest we nadin. Lê dest dayina ser gaziyan, tê wê wateyê ku hûn deshilatdariya dewletê qebûl nakin. Ango hûn me protesto û red dikin."* Bi vî rengî ecizbûna xwe dan nîşandan. Lê me paş ve gav neavêt, dijberî wê me rêxistina xwe li hemû herêman ava kir û da meşandin. Bi vî rengî, li Efrînê êdî bawerî bi ciwanan jî dihat. Di nava ciwanan de, bi ciwanên ku bawerî didin bi awayekî veşartî hêzeke leşkerî jî çêdibû. Tenê rêxistinkirina hêza ciwanan jî têrê nedikir, divê tu ji milê zanistî ve jî bidê çêkirin.

Li ser vê esasê cara yekemîn, li hemberî navçeya Reco di qontarên Çiyayê Hawarê de perwerdehiya leşkerî destpê kir. Wê demê jî hevaleke jin ew pêşniyar kir û rast hate dîtin. Dema ku em gihêştin meha Tebaxê, êdî hejmareke ciwan çêbûbû. Hemû jî bi fikir, coş û rihekî berxwedaniyê ew yek qebûl kiribûn. Divê êdî ji peywirên leşkerî re bûbana bersiv û li ser vê esasê perwerdehî bihata darxistin.

Ji bo ku veşartî be û naye deşîfre kirin, komên biçûk dihatin perwerdekirin. Weke tîmên ji 3-4 kesan pêk tên, tevdigeriyan. Bi rojan li wê derê perwerdehiyên xwe dîdîtin û dema ku dihatin tevlî karên pêwîst dibûn. Em dikarin vê yekê weke akademiya yekemîn jî bi nav bikin. Derxistina çiyan, di warê karanîna çekan de, di warê kesayet de, di warê parastina gel de perwerdekirina wan çêdibû. Di vê çarçoveyê de têkoşînek jî çêdibû. Vê yekê di nava ciwanan de moralek jî çêdikir.

Di nava gelê Efrînê de jî rêxistinkirinekê destpê kiribû, her taxekê komîteyên xwe didan çêkirin. Her wiha saziyên ciwan, jin û saziyên dîtir yên civakî dihatin vesazkirin. Piştî wê sûka bajêr xistina pergalê çêbû. Karmend hatin rêxistinkirin û saziyên wan hatin avakirin. Saziya dûkandaran çêbû, saziya hûnermendan çêbû, di sanaiyê de pergalek hat çêkirin û saziyên wan hatin avakirin. Dema ku me gihêşt meha îlonê, piraniya van saziyan hatibû çêkirin. Ji milekî xebatên leşkerî, ji milekî ve xebatên rêxistinî, ji milekî ve xebatên zimanî, çandî û hunerî, ji milekî ve xebatên civakî çêdibûn û her roj xurtir dibûn. Dewletê jî êdî fêm dikir ku li Rojava gelê Kurd ji nû ve şîn dibe, mezin dibe û rihek girtiye.

**-Partî û komên din yên siyasî jî tevlî vî pêvajoyî dibûn?**

Li Efrînê, çalakiyên van partî û komikan din tine bûn. Lewra piraniya Efrînê welatparêz bûn. Ew partiyên din li Efrînê hebin jî, hêza wan ku rabin, serhildanan bikin û bi awayekî vekirî kar bikin tine bû. Hinek hewl didan xwe tanzîm bikin. Wisa hêzeke wan tine bû ku derkevin kolanan û bibêjin, *"em bi te re ne Humus."* Weke meşên înê bi nav dikirin, her înekê bi navekî cuda meş dardixistin. Lê li Efrînê dervayî me ti hêzeke ku bikaribe meş û serhildanan dar bixe tine bû.

Me gelek cihên dewletê bê tesîr kiribûn. Dewlet ketibû nava qalikê xwe û bi parastina xwe re mijûl bû. Dervayî vê kar û xebateke bike tune bû. Ji ber ku hêza wê jî nemabû, nedikarî pêşiya tiştekî jî bigre. Ger mûdahaleyî tiştekî bikira, dizanî ku dê berxwedaniyeke mezin re rû bi rû were. Her çiqasa kiryarên me qebûl jî nedikirin, ji ber ku nedikarî tiştekî bike xwe da paş û bendewariya guherîna wê rewşê de ma.

***-Di destpêka şoreşê de we jî li Efrînê, di nava xebatan de cih girtiye, ew xebat çawa pêş ketin?***

**BERÎTAN DÊRÎK:** Raste, di despêka şoreşê de min li Efrînê xebat meşand. Hem bi giştî me kar dikir û bi wê ve girêdayî di xebatên jinê de min cih digirt. Di pêvajoya şoreşê de bingehê van saziyan hat danîn û pişt re jî navendên xebatê hatin avakirin. Despêkê bi navê navenda 'Şehîd Rûken' navenda Yekîtiya Star li bajarê Efrînê hat avakirin. Di vir de hem xebatên ziman dihat meşandin, hem xebatên jinê û hem jî xebatên ciwanan dihatin meşandin. Ji ber cihek bû despêkê xebatên jinê dihatin meşandin û pişt re jî xebatên rêxistinkirina perwerdê dihatin meşandin.

Di despêkê de ji ber bi hişmendiya dewletê hatibû avakirin, gelê wir xwe nêzî me nedikir. Çend dost hebûn, welatparêz bûn xwe nêzî me dikirin û bi rêka wan rêxistin hat firehkirin. Bi demê re her ku diçû di tevlîbûnê kar de nêzîkbûyîna me çêbû û bi vî awayî tevlîbûna perwerdê çêbû.

Şoreşa Rojava şoreşa jînê ye, ji ber di her beşê civakê de jinê pêşengî dikir. Bi taybet di xebatên jinê yên xweser de û di her tiştî de jin li pêşbû. Di meş, bi pirsgirêkê civakê re eleqederbûyîn, komkirina alîkarî, rêxistinkirina jinê, pisgirêkên cur bi cur yên ku dihatin jîyankirin xwedî lê derketin, xwe pêşxistin û tesîrên pergalê derbaskirinê de tevlîbûn û keda jinê mirov nikare ji nedîtî ve bê. Di şexsê Efrînê de ez dikarim bibijêm li tevayî Rojava wisa bû, despêkê xwe rêxistinkirin û pişt re pergala xwe dan rûnişkandin esas dihat girtin. Bi taybet jin di

milê vîn, zayend de xwe çawa perwerde bike, li mafê xwe xwedî derkeve, tekoşîn bike? Di despêkê de kar û xebat li ser vê esasê hatin meşandin. Bi vê ve girêdayî ji ber zor û zehmetiyên xwe pir bûn bi demê re dibûn xwedî ezmûn, tecrûbe digirtin û gavên mezin dihatin avêtin.

Ji bo xebatên ciwanan bi navê ciwanan weke tevger hebû, lê belê ji ber ku hîna sazî ava nebibûn, ciwanan bi çend cûran xebat dimeşandin. Ciwanan bi rêxistinkirina tevayî civakê û bi taybet jî rêxistinkirinên ciwanan ve girêdayî xebat dimeşandin.

**Remzeke Canciwan**

***-Di vê serdemê de li Efrînê bûyer, an jî remzên ku mohra xwe şoreşê dan hebûn?***

Gelek bûyer hene, lê ya ku mohra xwe şoreşê da hevalê Çekdar bû. Di vê qonaxa şoreşê de hêdî hêdî rêxistinkirina gel, rêxistinkirina ciwanan, rêxistinkirina jinan her ku çû xwe fireh kir û rojane tevlîbûn zêde dibû. Heval Çekdar 2012'an hate Efrînê; Pişt re şehîd ket. Ji beriya wî jî heval hebûn, lê belê her ku xebat fireh dibû pêwîstî bi rêxistinkirina wan hebû. Taybetmendiyên heval Çekdar pir cûdabûn, bi gotinê yan jî çend peyvan mirov nikare îfade bike. Bandora heval Çekdar li ser ciwanan û gel pir zêdebû. Her mala ku derbas dibûyê, her mirovek re dida û distand, di sûkan de, di kolanan de, di dûkanan de, di malbatan de her cih ji bo wî qada rêxistinê bû. Di nava civakê de li gor her nifşî dida û distand. Xwedî taybetmendîyên rêxistinî yên pir hêja bû. Kesayetek pir zindî bû, di nava civakê de û kîjan cihî mirov biçe misoger heval Çekdar li wir bû. Bi moral, coş, kelecan û rêxistinkirina xwe li wir bû.

Şehîd Çekdar girseyek ciwanan ya pir mezin li derdora xwe kom kirîbû. Gûrûbên cûr be cûr yên ku xebat bi rê ve bibe hebûn. Ji ber pir insan li derdora xwe kom dikir me digotê di aliyê ewlehiya xwe ve tedbîr bigire. Ji ber gelek kesên li dijî me kar dikirin di herêmê de hebûn. Hinekan bertekên wan cûda li beramberî me hebûn. Yên nêzîkî dewletê, yên xayîn hebûn. Ji xwe dewlet hebû. Pêwist bû di gelek aliyan de bi baldarî tevger bikira. Ji bona karê rêxistinî nesekine her tişt datanî holê û pê ve jî tedbîra xwe digirt.

Ji ber taybetmendiyê xwe yê zindî di nava civakê de pir dihat heskirin. Taybetmendiya wî wisa bû; karekê ku di ser de diçû bi coş û moralê xwe bi encam dikir. Li kuderê pêwist bikira pêşengtiya ji dest dihat dikir û dixwast bike. Li kur valetî, nebesî ditîba kesinlikle serde diçû, pêşengtî dikir û dixwest derbas bike. Bi eşq nêzî kar û jiyanê dibû. Şehîd Çekdar pir caran diwestiya, pir caran pêre nedigiha xwarin bixwe, lê ji hemû aliyan ve xwe karê rêxistinê de kîlît kirîbû. Me pir caran digotê "li xwe binêre xwe diqat ke." Bersiva wî ev bû; "*bila gelê me bi coş be û bila karê me serkeftî be, tiştekî din em naxwazin."*

Her insanek bi xwe ve dabû girêdan, pir caran bûm şahid gelek mirovan, dayîkan digot *"tu çima nayê mala me?"* Her kes dixwest heval Çekdar li cem wan be. Ji ber ku heval Çekdar timî bi yek çavî meyze civakê dikir, ferq û cûdayî nedixistê. Kantona Efrînê, her çendî bajarek ne pir mezin jî be şeş navçeyên wê hebûn, sed û şêst gûndên xwe hebûn. Ji bo wê şev û roj nedisekinî û ji bo rêxistinkirinê diçû her cihî. Heval Çekdar pir bi plan xebat dikir û rêxistin fireh dikir. Evên xayîn hebûn, heval Çekdar dixwest wan kesan jî rêxistin bike û ew fikrê nûker yê xayîn ji wana xilas bike.

Kar û sekna heval Çekdar bala herkesê dikişand. Ev kesayetên xayîn disa di nava komployekê de bûn. Dixwestin derbe li rêxistinê bidin, yan jî li xebatkarên me bidin. Ev El Partî, PDK û hêzên din yên xwedî heman teybetmendiyê di nava liv û tevgerekê de bûn. Kar û xebatên ku di nava gel de dihatin kirin, serhildan û sekna gel ya xwe rêxistinkirinê dihat dîtin, ji bona vala derxin disa di nava tevgerê de bûn.

Dema ku heval Çekdar pê hesiya, xwest bi van kesan re hevdîtinê çêbike, danûstandin çêke, ne ku bi şêwazeke cûda here ser wan. Yek berpisyarê wan hebû, jê re digotin Bekîr. Ev serokê El Partî bû û nûnerê PDK'ê yê Rojava bû. Rola xwe di aliyê neyînî de pir dilîst. Têkilîyên wî bi Tirkiyê re hebûn, bi hêzên dagirker yên cûda re hebû û ew rista neyînî di Helebê û Qamişlo de dilîst, li hemû bajaran dilîst. Diçû Iraqê, diçû Tirkiyê. Yanî kesayetekî ji rêzê nebû, destê wî di nav pir qirêjiyan de bû. Ji bo vê heval Çekdar xeteriya vê dît û xwest pêşiya wî û yên ku bi wî re di nav hevkariyê de ne bigire.

Hevalan xwestin weke gûrûbeke biçin wî kesî re hevdîtin çêbikin. Çawa diçin ber mala wî û li derî didin, wextê ku derî vedikin heval Çekdar dibêje, "*du pirsên me hene, derkevê derve wê baş bibe."* Wan jî pê hesiyabûn ku wê tewrê tevgerê li beramberî wan çêbibe. Wan ji ber dizanîn karên qirêj dikin li gor wê tedbîrên xwe girtibûn. Heval Çekdar dema li derî dide, derî vekir û got "*nekeve hûndir jin û zarokên me hene.*" Heval Çekdar got, *"ez derbas nabim hema du pirsên me hene, bersiv bide ji bo wê derkevê derve wê başbe."* Heval Çekdar pir hewildan nîşan dan, da ku ew derkeve, lê derneket. Piştî wê heval Çekdar destê wî girt, hinek sohbet pê re kir, da ku hêdî bi hêdî derxîne derve û bi wan re biaxife. Wan pir bi xayînî çûnê û kişandin hûndir û derî girtin.

Koma ku bi heval Çekdar re pir hewil dan ku derî vekin û di dawiyê de derî jî vekirin. Dema ku derî vekirin û ketin hûndir li heval Çekdar geriyabûn. Heval Çekdar di hundir de şehîd ketibû. Qasî ku me agahî girt nêzî 10-12 kesan li wir jiyan dikirin. Dibe jimar zêdetir be jî. Ji ber ciranên wan jî mirovên wan bûn, di nav vê hevkariyê de bûn. Xaniyê hemûyan bi hevdû ve bûn. Ji xaniyekî derî vekin dikarîn biçin xaniyê din. Ji berê ve amadekariyên xwe yên mewzîyê û tiştên jiyanê jî kiribûn.

Di wê pêvajoyê de li Efrînê tişti tû kes nebû, ambargo bû ti tişt nedihat û nediket bajêr. Lê belê van amadekariyên xwe bi her awayî kiribûn, her tiştê wan hebû, cebilxane, çek hemû amade kiribûn. Jixwe bi tişên ku amade kirine dikarîn bi mehan jî xwe bidin jiyankirin û şer bikin. Heval Çekdar gelek şopandibû û ev dek û dolabên wan dizaniya.

Dema ku heval bi zorê dikevin hûndir, dibînin ku bi awayekî hovane li wir hevalê Çekdar qetil kiribûn. Ji wan hevalên ku bi heval Çekdar re ne hevalek dixwaze mûdahale bike, lê çeka wî naxebite. Hevalên din jî hem dixwazin parastina xwe bikin û hem jî dixwazin heval Çekdar ji destê wan rizgar bikin. Dema heval dikevin hûndir hevalek birîndar dibe, pevçûn berdewam dike û heval teqwiye dixwazin. Ew mirovên wan hemû piştgiriya wan dikin. Ev kesên ku bi hevalan re ketine nava pevçûnê di malên xwe de veşartin. Di vir de destê jinan jî di nav qetilkirina hevalê Çekdar de hebû. Piştî takviye hat, ji bona cenaze were girtin û tola wî were hildan. Bangawazî hat kirin, da ku birîndarî an jî şehîd be teslîmî me bê kirin. Her çiqas bangawazî hat kirin jî ti kes bersiv neda. Me fêm kir ku heval Çekdar şehîd xistine.

Li gorî çand û pîvanên rêxistinê, çi dibe bila bibe divê jin û zarok nehatina kuştin. Ji bo wê me bangawazî kir jin û zarok derkevin. Di wir de nebesiyên me hebûn, me dem winda kir. Heya me bangawazî kir û wan derxistin, ji ber karekterê xayinan ewqas kirêt e, wan zilaman gelekan jê cilê jinan li xwe kirin û di nav wan de derketin. Heya du saetan pevçûn çêbû. Tola heval Çekdar li wir hat rakirin.

Qetilkirina heval Çekdar pir bi hovane bû, mirov çiqasa tola wî hilîne jî kêm dimîne. Şehadeta heval Çekdar bandora xwe pir li ser Efrînê kir, her kes nas dikir. Jin zarok her kesimê civakê heval Çekdar nas dikir. Ji bo wê bertekê milet li beramberî vê qetilkirinê pir zêde bû. Niha jî mirov biçe kîjan malê bipirse, her kes hevalê Çekdar nas dike. Her malekê navê heval Çekdar rakirine. Roja merasîmê jî gelek ciwanan bîryar dan, tevlî bûn û navê heval Çekdar rakirin.

Di pêvajoyên şoreşan de hinek kesayet hene mohra xwe li demê didin, heval Çekdar yek ji wan kesan bû. Ked û xebata heval Çekdar li wir kirî bandora xwe pir li ser civakê kir. Di warê tevlibûnê de, ketina nava xebatan de, alîkarî dayînê de pir bandora xwe da çêkirin. Malên zelal nebûn jî, piştî şehadeta heval Çekdar hatin guhertin û digotin *"kesayeteke wiha tu cara ji bîra me naçe. Çi ji me were em ê bikin, da ku em heqê şehîdên xwe bidin.*"

Her xebat bi navekê hat meşandin. Binesaziyê saziyan hat avakirin. Her xebatekê li gorî teybetmendiyê xwe, xwediyê giringî û mîsyoneke bû. Her ku diçû û xebat pêş diketin em jî dibûn xwedî tecrûbe. Piştî ku li beramberî dewletê helwest hat danîn, ji bajar û gundan dewlet hat derxistin. Piştî şoreşa 19'ê Tîrmehê her ku çû kar berfireh bû û sazî hatin avakirin. Di Efrînê navenda bi navê ''*şehîd Çekdar ya ciwanên şoreşger*'' hat avakirin. Ev navend li navçeyên Efrînê jî hatin çêkirin û hevalan dest bi xebatên xwe kirin.

**2-Li Efrînê Şoreşa 19'ê Tirmehê**

***-Piştî wan rêxistinbûn û amadekariyan li Efrînê, Şoreşa 19'ê Tirmehê, ango raperîn çawa pêş ket?***

**ZELAL EFRÎN:** Raperîna giştî bi vî awayî bû; di civînê de hevalan ji me re gotin, *"dê tiştekî wisa çê bibe, di destpêkê de li Kobanê dest pê dike û pişt re jî li Efrînê ye."* Li Efrîne jî divê Mabata destpê bike. Dema ku li Kobanê dest pê kir, em li malbatekê bûn. Êvarî di nûçeyan de me agahî girt, wê demê ew malbat hemû kêfxweş bûn, dayikan tilîlî dikşandin. Her kesî dixwest hema mîtîngan li dar bixin. Lê me di nava gel de eşkere nedikir ku dê li Efrînê jî tiştekî bi vî rengî çêbibe. Jixwe piştî çend rojan, li Efrînê jî destpê kir.

Raperîna Efrînê, li Mabata destpê kir. Lê ji ber ku cara yekemîn bû, heval hinek bi kelecan bibûn û hin şaştî jî kiribûn. Jixwe pişt re hatin rexne kirin. Li Mabata wisa pevçûn û berxwedaneke rejîmê çênebû, bi hêsanî her cih hate girtin. Lê hin sazî bi kelecanî hatibûn şewitandin. Piştre hevalan rexne kirin û gotin, "*jixwe sazî ji bo me pêwîst dikin, hûn çima dişewitînin.*" Piştî wê me bîryar girt ku divê cihên dîtir yên bêne girtin neyên şewitandin û em dest bidin ser.

Piştî girtina Mabata, di nava gel de hejandinek çêbû. Kesî bawer nedikir, weke xewnekê didîtin. Pişt re li Şiyê destpê kir. Ez jî tevlê bûm. Jixwe sê navendên leşkerî bi navê mexfer hebûn, di heman demê de em çûn ser her sêyan jî. Li Çeqelan, Şiyê û Selarê bû. Hejmara hevalan kêm bû; em sê heval bûn û her yek li ser cihekî bûn. Yên din ji gel bûn. Me di nava xwe de jî kom çêkiribûn. Mesela li Çeqelan me sê kom çêkiribûn. Malbateke hevalekî şehîd hebû, li kêleka mexferê bû. Ji ber ku dema girtina mexferê de netirsin û dernekevin derva, me xeber dabû wan jî.

Ez û welatparêzek ketin hundirê mexferê. Leşker tê de rûniştibûn, dema ku em dîtin şoq bûn. Me bi Erebî got, "*derkevin em dest didanin ser vê derê û êdî em ê bimeşînin.*" Wan jî gotin, "*divê em ji fermandarên xwe yên Efrînê re telefon vekin û li gorî wê tevbigerin.*" Lê me fersend neda wan. Jixwe em bi çek bûn û me her cih jî girtibû, ew jî ketibûn nava şoqekê. Hejmara wan jî ne zêde bû, 7-8 kes bûn. Şer çênebû, me tenê fişekek jî neteqand. Weke sê kom, em ketibûn tevgerê; komek ket hundir, komek li derdora mexferê bû, komek jî di parastinê de bû. Komeke dîtir jî ji bo tedbîr hebû, lê neket tevgerê.

Ji bo radest girtin û axaftina bi wan re jî ez û du heval çûn. Jixwe hevalekî li gel min bû, berê di zindana dewletê de mabû û bi hêrs bû. Digot, "*ger ew bixwazin şer bikin, ez ji bo wê amade me!*" Me jî dixwest, bi bêhnfirehî û bi axaftinê mexferê bigrin. Jixwe em çawa ketin mexferê, me dest da ser hemû çekan û ji wan re jî got, "*hemû alavên leşkerî radestî me bikin, hûn jî weke dîl di destê me de ne.*" Lê em bi bêhnfirehî tevgeriyan û me ew jî îqna kirin. Ji bilî tiştên taybet yên wan leşkeran, her tişt radestî me kirin. Leşkerên Sûriye jixwe diyar in, dev ji xwe berdane; çekên wan, telefon û her tiştên wan li ser maseyê bû. Me hema dest da ser her tiştî. Lê me li gorî şer jî xwe amade kiribû; çek, rext û narîncokên me amade bûn. Ji ber vê yekê dema ku em wisa leşkerî dîtin şoq bûn. Jixwe em nas jî dikirin. Ji ber vê yekê, nêzikî seatekê em bi wan re axifîn û her tişt weke xwesteka me bû. Em di seat 5'an de ketin mexferê; di seat 6'an de me tiştên taybet yên wan leşkeran dane wan, me maşîneyek ji wan re amade kir û ew derxistin.

Me ew leşker birin Şiyê, yên Senarê jî anîbûn wir. Me hemû leşker komî ser hev kirin. Lê yên Şiyê hinek pirsgirek derxistibûn. Ew jî dîsa bi destê Kurdekî ku reîsê Şiyê bû kiribûn. Ji ber ku wî kesî fêm kiribû ku hin tevger çêdibin, çekên mexferê biribûn û di mala xwe de veşartibûn. Leşkerên li Şiyê jî digotin, "*çekên me jixwe kêm bûn.*" Nedixwestin çekan radestî me bikin. Ji ber ku navenda wan jî Şiyê bû, 10-15 leşker tê de bûn. Yên Senarê û Çeqelan pirsgirek dernexistin, me çekên wan ji wan girtin û ew birin Efrînê, radestî navenda wan kirin. Lê me ji yên Şiyê re got, "*heya ku hun çekên xwe dernexin, em we û malbata we bernadin.*" Berpirsiyarê wan, di encamê de li xwe mukir hat û cihê çekan got. Me ew kes jî lêpirsîn kir, wî jî xwestibû çekan ji xwe re bigre. Bi vî awayî me ew çek jî girtin. Hinek malbatên leşkeran jî li wir bûn, di destpêkê de nexwestin biçin. Lê di encamê de me hemû li dewletê vegerandin.

***-Bi destxistina saziyên dewletê di gel de hesteke çawa ava bû?***

Piştî girtina van cihan, gelê me kelecaniyeke pir mezin jiyan kir. Hemû malbatên me yên şehîdan, welatparêzên me hatin û mexfer ziyaret kirin, kêfxweşiyên xwe anîn ziman. Lê di her sê cihan de jî me fîşek neteqand, lewra radestî me bûn. Leşkeran jî fêm kiribû ku emê rojekê vî karî bikin. Me got, "*ew cihê Kurdan e û emê bi xwe cihên xwe bi rê ve bibin*." Gaveke pir mezin bû, lê hê jî weke xewnekê bû. Ji ber ku canê wan şîrîne, şer nekirin û bi rehetî radest bûn. Gotin, *"em neçar mane û li vê derê mane. Hun çi dixwazin, dikarin bikin."* Me ji wî kesê ku çek veşartine re jî got, *"ew zilamên dewletê bi vî rengî nêzik dibin, lê tu weke Kurdekî karekî wisa dikê. Lê tu dizanê ku tu yê hesabê wê jî bidê.*"

Ew gava ku me avêt, weke pêkanîna xewneke şehîdan bû. Ji ber vê pir bi wate bû. Ji gund û cihên dîtir yên derdorê, kom bi kom dihatin û serdana mexferên ku me girtine dikirin. Ji gel re jî weke sûrprîzeke çêbû, kelecaniyeke pir mezin hebû. Me ew moral, kelecanî û hestên gel didîtin. Gelek kesên ku hatine girtin û di wan mexferan de mane, digotin *"em hatine vê derê bibînin, di destpêkê de lanetê lê bînin."* Dema ku me mexfer girtin jî, me di destpêkê de kontrol kirin. Di hundir û derdora mexferan de lêkolîn hatin kirin, me dest da ser belgeyên wir. Tiştên ne pêwîst me şewitandin...

***-We xwendin, ew belge li ser çibûn?***

Erê, di van belgeyan de li ser xebatên me jî hinek tişt hatibûn nivîsandin. Mesela berê me li Şiyê xebatên jinan meşandibûn. Herî zêde jî jinên ciwan û xwendekar tevlî wan xebatan dibûn. Beriya ku em dest bidin ser mexferan jî, me li Şiyê civînek jinan çêkiribû da ku em meclîsa jinan ava bikin. Di wê civînê de, me hilbijartin çêkirin. Me sindoq û alên Yekîtiya Star danîbûn. Me ew kolan xemilandibû, nêzikî hezar û 500 jin tevlî civînê bibûn. Weke mêvan ji gel jî tevlêbûn çêbûbû. Wê civînê moraleke mezin çêkir. Ji bo meclîsê 15 jin hatibûn hilbijartin.

Dema ku me dest da ser mexfera Şiyê, li ser wê civînê jî belgeyek derketibû. Navê hemû jinên ku hatine hilbijartin, navê gundên tevlê bûne, hejmara kesên tevlî civînê bûne; di wê belgeyê de hebûn. Me fêm kir ku hin Kurdên ku van agahiyên berfireh didin dewletê hene. Jixwe ew kesê ku çek ji me veşartine jî karên wisa dikirin. Hin derdorên din ku xwe dane keleka dewletê û berjewendiyê xwe dimeşînin hebûn. Ji milekî ve moral û kelecanî hebû, xewna sedan salan pêk dihat. Lê ji milekî ve kêm be jî hin tiştên wisa derdiketin.

Dema ku me dest da ser saziyên dewletê, hem weke TEV-DEM, hem weke Yekîtiya Star kar û berpirsiyariyên me jî zêdetir bûn. Piştî Mabata û Şiyê, gelê Reco jî dest da ser mexferên dewletê. Piştre Şêrawa, Cindirêsê û Bilbilê jî heman kar kir. Li her cihekî û herêmekê 4-5 mexferên dewletê hebûn. Hinek li ser sînoran bûn, hinek di nava gundan de bûn. Yên li gundan, jixwe bi hev re hatin girtin. Di encamê de ji bo giştî Efrîn bû moraleke mezin. Herî dawî jî Efrînê dest da ser saziyên dewletê. Jixwe hemû leşkerên gund û qezeyan li Efrînê kom bûn. Ya Efrînê ez bi xwe tevlê nebûm, lê ji ber ku radest nebûbûn, li hinek cihan şer çêbûbû. Heval bi narîncokan ketibûn hin cihan, du leşker miribûn. Di encamê de dîtin ku mesele cîdî ye, ew jî radestî me bûn. Şerekî demkurt çêbû.

Li Efrînê, dewletê pergaleke berfireh dabû rûnişkandin. Mesela nehiya Şiyê, ya herî biçûk bû, lê 3 mexferên wan hebûn. Li Cindirêsê, Mabata, Şêrawa, Bilbilê û Reco jî herî kêm 4-5 mexferên wan hebûn. Bi taybetî li ser Efrînê, pergalek hatibû avakirin. Her saziyek di Efrînê de hebû. Mesela li Kobanê pergaleke cudatir hebû, li wir saziyên dewletê ew qesa ne xurt in. Lê li ser Efrînê û gelê Efrînê pergaleke berfireh dabû rûnişkandin. Mintiqa bi mintiqa pergaleke cuda çêkiribû. Gelek saziyên leşkerî hebûn. Ji milê dewlemendiya erdnigariyê ve jî, her tişt xistibû bin kontrola xwe. Mesela gundiyekî nedikarî di nava zeviya xwe de bîreke xwe bikole, bi tirs bûn. Yekî ku xwedî pere bûya, dikarî bike. Mesrafa kolandina bîrekê, 100 hezar e; lê divê herî kêm ew qesa pere jî bidana dewletê. Ger dewletê destûr bida, dikarîn bîreke xwe bikolin. Lê piştî meş û serhildanan me dewletê ji Efrînê derxist.

**3-Li Efrînê Xebatên Xweseriyê**

***-Li Efrînê xebatên TEV-DEM'ê, ango xebatên avakirina xweseriya demokratîk bi çi rengî pêş ketin?***

**ZELAL EFRÎN:** Me di destpêkê de TEV-DEM ava kir. Lewra rastiyek wê jî hebû, heya ku TEV-DEM nehatibûya avakirin, Yekîtiya Star nedihat avakirin. Jixwe di nava TEV-DEM'ê de jî hevalên jin cih digirt. Tevgera jin jî bi keda Serokatî û şehîdan hat avakirin. Bi moral û coşeke mezin pêş ket. Ji vî alî ve bingehek hatiye avakirin, mîraseke pir mezin heye. Ji bo civaka me jî wisa ye. Weke jin ez dixwazim bibêjim; dema ku îro em pergala TEV-DEM'ê digrin dest, li cîhanê ti pergal û dewletên ku ewqesa girîngî dana jinê tine ne. Em dikarin bi hemû hêzê li ser navê azadiyê tevbigerin, hêzên Ewrupayî û hwd ve qiyas bikin.

Bi rastî jî li Rojava ji aliyê jinê ve pergaleke pêşketî heye. Ew pergala ku me avakiriye, li ber çav e. Ji bo azadî û mafê jinê li tevahî cîhanê bûye modelek. Ji bilî tevgera me ku di pêşengîtiya Rêber Apo de gihêştiye lutkeyê li ti cihên din ew pergal tine. Berê me li ser perwerde didît û nîqaş dikir, lê dema ku di pratîkê de pêk tê û diteyise ser civakê, mirov jê moral digre. Ji ber vê ji gundekî biçûk bigre, heya bajar û herêmê; ew pergal pêş dikeve.

Mînaka herî biçûk, me di gundekî de ew pergal ava dikir, li gorî wê rêveberiya wî gundî ava dikir. Me gel jî îqna dikir. Me digot, "*jin hebûneke esasî ya civakê ye, divê herî kêm biqasî hevalên zilam, hevalên jin jî di rêveriyê de cih bigrin. Endameke herî esasî ya xweseriyê jin e.*" Car caran fêmkirina wê çênebe jî, bi piranî dihat qebûlkirin. Bi vî rengî me di gundan de destpê kir ku em ew pergala xwe bidin rûnişkandin.

Jixwe Serokatî ji berê ve diyar dikir û digot, "*divê ew pergal di nava civakê de bê avakirin.*" Ji ber vê rêveberî weke hevserokatî dihat rêxistinkirin, endamên din yên rêveberiyê nîv bi nîv bûn. Mesela 20-30 gund dihat gel hev û meclîsek ava dikir. Hevalekî zilam û jin jî dibûn hevserokatiya wê meclîsê. Dema ku rêveberî jî ava dikirin, nîvê wan jin bûn. Me giranî da ser wê. Jinên ku hinekî pergalê fêm dikin, wek rêveberî hilbijartin. Mesela hevaleke keç hebû, di nava rêveberiya meclîsekê de du salan ew kar meşandin. Weke kadroyekî herêmî lê hat, gund bi gund digeriya; bi wan re civîn çêdikirin û pirsgirekên wan çareser dikirin. Her li kêleka me dimeşiya.

Me dixwest em vîna rêveberiyên xwe derxin holê. Jixwe ji sedî sed me nedikarî her tiştî bi rê ve bibin û çareser bikin. Divê me hevserok û rêveberiyên meclîsan daba fêrkirin û wan bi xwe karê rêveberiyê bikira. Jixwe dewreyên perwerdê hatin avakirin û hem hevalên jin, hem jî hevalên xort çûn perwerde dîtin. 20-30 rojî jî perwerde dîtin, ji ber ku xwendina wan jî hebû, pir zû pergala me nas dikirin. Her çiqes zehmetiyên wê hebin jî, lêgerîn û kedek hebû. Bi vî rengî ew hevala ku min behs kiriye, heya van demên dawî jî kar dikir. Mirov jê moral digirt. Ûslûp û xîtebeta wê jî baş bû. Jixwe bi piranî jinên Efrînê wisa ne. Hevaleke ku dihat hezkirin bû. Dixwest kar û xebata xwe pêş bixe. Digot, *"ger gel bawerî dabe min, ez wan vala dernaxim.*"

Jixwe bi awayekî demokratîk meclîs dihatin hilbijartin. Hinek hevalên jin 3-4 salan karê xwe berdewam dikirin, lê hevalên zilam carna dihatin guhertin. Mesela hevalekî zilam hebû, hem birayê hevalekî şehîd bû, hem jî berê endamê PYD bû. Salekê rêveberiya meclîsekê kir, piştre dev jê berda û got, "*ez dixwazim endamtiya xwe ya PYD berdewam bikim.*"

Di destpêkê de me dixwest, mirovên ku girêdayî û welatparêz in; di nava kar de bin. Lewra heya ku me pergal daye rûnişkandin, nêzikbûneke wisa pêwîst dikir. Jixwe me pergaleke demokratîk dimeşand, herî zêde 2 salan careke rêveberiyên me jî dihatin guhertin. Me li ser tu kesî jî rêveberî ferz nedikir. Yek nexwesta bike, bi

hilbijartinê hinekên din dibûn rêveberî. Bi rastî jî gelê Efrînê, fedakariyeke pir mezin kir. Wan 2-3 salan bê kar man û ji milê madî ve jî hinek zehmetî kişandin. Madiyetê li ser wan bandor dikir, lê li pêşiya tevlêbûna wan nedibû asteng. Karê meclîsan û TEV-DEM'ê jî dihatin meşandin. Lewra fêmkirin û ji dil tevlêbûnek hebû. Lewra jî me digot, "*vîna gel e.*" Bi rastî jî wisa bû. Ger tu çiqasa bikarê vîna xwe temsîl bike, dê tu ew qesa xizmet bike. Feraset û tevgerîna me wisa bû. Gund bi gund em diçûn û me bi vî rengî rêxistin dikirin.

Rêveberiyên herî jor jî, di nava meclîsê de derdiketin. Rêveberî bi erêkirin û hilbijartina meclîsan dihatin avakirin. Me digot, ji ber ku em pergalê nû didin avakirin; divê kesên girêdayî nirxa welatparezî û nirxên ku Serokatî avakiribûn bibin rêveberî. Ew jî mecbûrî bû. Lewra tu tiştekî nû dide avakirin û divê hin pîvan hebin. Li ser vê esasê em bi mirovan re diaxifîn. Heya pergal hate avakirin jî, her mirovek peywirên xwe anîn cih.

Piştî ku meclîs û rêveberî hatin avakirin; me got, divê di karê me de hin guhertin çêbibin. Jixwe Mala Gel hatibû avakirin, asayîş hatibûn avakirin. Karê me pir berfireh bû. Mesela ji bo asayîş bê avakirin, divê xebat çêbibin, gelek tevdîr hebin. Di vê derê de jî kêmasiyên me hebûn. Gel ji her tiştî re amade bû. Bi moral û xwestek tevlê dibûn. Mesela gelek mirovên di asayîşê de kar kirin, pere nedixwestin. Di nava wan 20-30'î gundî de, zêdetirî li 20 gundan asayîş jî hatibû avakirin. Di destpêkê de ne bi pergal bû.

Li cihê ku meclîs hatine avakirin, di nava wan meclîsan de komên parastinê dihatin rêxistinkirin. Pergalek pir xweş pêş ketibû. Ji ber ku destpêk bû, germahiyek hebû. Her kes digot, "*em amade ne.*" Li her gundekî, komîteyeke ji 7-10 kesan hatibûn rêxistinkirin. Bi maşîneyên xwe dihatin cihê asayîşê û disekinîn. Bi rastî jî mirov moral jê digirt. Piranî gund, dihatin û diçûn. Baweriya wan bi tevgerê hebû ku ew kar dikirin. Digotin, *"me xeyal nedikir ku dê rojekê emê bên û li cihên leşkerên dewletê, nobedariya xwe bikin."* Hin gundên weke Çeqelan, li ser rê nobedar datanîn. Lewra tu neçar bûyî, êvaran nobedaran derxînî. Her ku çû me fireh kir. Me digot, "*divê her meclîsek, parastinê esas bigre."*

***-Pergala meclîsan li ser çi esasî pêş diket?***

Di nava meclîsan de, divê nûnerên ciwanan hebana, nûnerên Yekîtiya Star hebana, divê saziyên li gund hatine avakirin di nav de cih bigirtana. Jixwe meclîs li ser çend saziyan hatibû avakirin. Li gorî pêwîstiyan bend bi bend sazî dihatin avakirin û van saziyan jî di nava meclîsê de cih digirtin. Mesela li hin gundan me şaredarî ava dikirin. Me digot, *"her hefte rojekê, bila hemû tiraktorên gund bikevin rêzê û gundê xwe paqij bikin."* Endamên meclîsê jî ew kar bi plan dikirin. Jixwe her ku me karê gel dida pêşiya meclîsan, kêfxweş dibûn û her roj zêdetir fêr dibûn. Di nava meclîsê de komîteya perwerdê jî hebû, xwendekaran jî di nav de cih digirt. Ji heftê rojekê perwerde dihat dîtin. Her yek bi karê xwe ve mijûl dibû. Li gorî mezinbûna gund, ji 7 kesan heya 15 kesan rêveberî hebû. Mesela ciwan bi karê ciwanan re mijûl dibûn, bi karê parastinê re mijûl dibûn. Ger êrîşek heba, ciwan amade bûn. Ciwan di nava pergala TEV-DEM'ê de rista xwe ji her alî ve dilîstin.

Pergala parastinê, di destpêkê de dema ku hate avakirin, hem li ser milê ciwanan bû, hem jî li ser endamên meclîsê bû. Bi taybetî ji bo komîteya parastinê her kesî xwe pêşniyar dikir. Di nava meclîsê de; komîteya ciwanan, komîteya jinan, komîteya xizmetê, komîteya aştiyê, komîteya parastinê dihat avakirin. Ya herî esas jî komîteya aştiyê bû. Gelek gund hebûn, pirsgirekên wan hebûn. Em bi meclîsê re diaxifîn û me digot, "*hûn bûne meclîs, mirovên ketine nava meclîsê jî divê xwe biguherînin. Mesela di nava meclîsê de 15 kes hebin û di nava wan de pirsgirek hebin, divê di destpêkê de pirsgirekên xwe çareser bikin."* Pîvana me ya herî esasî ew bû, divê di destpêkê de pirsgirekên xwe çareser bikirana; da ku piştre pirsgirêkên cîranên xwe û gundê xwe çareser bikirana.

Di nava komîteya aştiyê de hevalên jin jî hebûn. Risteke girîng ya vê komîteyê hebû. Lewra dewlet nemabû, car caran pirsgirekên gundiyan derdiketin, carna pevçûn çêdibûn. Divê hin kesên ku bi van pirsgirekan re mijûl bibin hebin. Ji ber vê yekê komîteya aştiyê jî bi karê xwe radibû. Di destpêkê de bawerî bi xwe nedianîn. Berê dewlet hebû, mexfer û zindanên wan hebûn. Ger du kesan li hev bida, ew digirtin û diavêtin hepsê. Ji ber vê komîteya me ya aştiyê her çiqas di destpêkê de zehmetiyan bikşîne jî, her ku çû ket ferqa peywirên xwe û pergala xwe avakir.

**Hemû cihên dewletê me dabûn gel...**

Di encamê de, me civînên xwe çêkirin û me bîryar da ku em derbasî merheleyekê din bibin. Lewra meclîsên gundan hatibûn avakirin, meclîsên jinan hatibûn avakirin, saziya ciwanan hatibû avakirin; komîteyên pêwîst hatibûn avakirin. Jixwe ew mexfera ku me girtiye mezin bû, piraniya saziyan di nav de cih bûbûn. Milek asayîş bû, cihek bû Mala Gel, me li cihekî komîteya aştiyê vekir, cihek jî bû mala jinê. Bi vî rengî hemû sazî li gel hev bûn û pir xweş hatin avakirin. Cihê BAAS'iyan hebû, me ew der dabû ciwanan. BAAS'iyan her hefte li wê navendê civînên

xwe çêdikirin. Bi vî rengî kelecanî û moraleke mezin jî çêbûbû. Hemû cihên ku berê di destê dewletê de bûn, me dabûn gel.

Zehmetî hebin jî, bi vî awayî me pergala xwe da rûnişkandin. Dibe ku li gor xwestina tevgerê, kêmasî û nebesî hebin; lê pergalek rûnişt. Mirov çiqasa teorî bizanibe jî, ger mirov nekeve nava pratîkê mirov tam fêm nake.

Dema ku me ew sazî û navend ava kirin; me li ser karên ku berfireh bûne û divê bên kirin nîqaş dikirin. Mesela karê ciwanan ku li wê derê dikirin, mirov moral jê digirt. Di her roja înê de, semînerên wan hebûn. Carna dahûrandinên Serokatiyê temaşe dikirin, carna fîlmên gerîla temaşe dikirin, carna li ser rêxistinbûyinê semîner dihatin dayîn. Bi vî rengî bi awayekî dewlemend karê ciwanan dihat meşandin. Bi navê ciwanan her kes lê kom dibû. Saziya ku me daye ciwanan jî, ji ber ku li ser rê bû, her kes dihat wê derê. Cihekî mezin û nû hatibû avakirin bû. Ciwan jî pir bi tevger bûn. Carna moral çêdikirin, carna perwerdeyên leşkerî dikirin. Me ji ber wê ew cih da wan. Moralekî mezin yê ciwanan hebû. Jixwe hevalê Çekdar Amed hebû, li Efrînê şehîd ket. Mirov ji wî hevalî pir moral digirt. Pir germ û bi kelecanî bû. Lê pir zû şehîd ket. Nahiye bi nahiye digeriya, civîn çêdikirin. Bandoreke mezin li ser ciwanan çêkiribû. Ciwanekî weke agir bû. Di meha heftan ya 2012’an de şehîd ket. Bi kompleyê şehîd xistin.

Di merasîma wî ya cenazeyê de jî, hemû gelê Efrînê û ciwan hatibûn. Hin dayikên Amedî jî weke mêvan hatibûn wir û tevlî merasîmê bûbûn. Di merasîmê de ew dayik jî axifîn. Bi vî awayî dîmenekî pir bi wate û hestiyar jî çêbû. Ciwan bi rihê Şehît Çekdar tevlî hemû xebatan û karên asayîşê dibûn. Her wiha gel jî wisa tevlî karên asayîşê dibû. Her kesî bi dil û can, bi awayekî fedakarî tevlê çêdikirin. Mexferên ku me girtin, her carê gundek dihat û tê de 3-4 rojan nobet digirtin. Mesela kesekî bi navê Mehmet hebû, muxtarî kiribû. Ji malbateke dewlemend bû. Lê ji ber ku bi xwe jî di zindanên dijmin de mabû, tevlêbûneke pir çalak dikir. Zanebûnek wî hebû û dixwest kar bike. Her wiha malbata şehîdan hebû, pir alîkarî didan me. Ew kesên wisa me dabûn ser karê asayîşê. Hem di asayişê de, hem jî di meclîsan de cihê xwe digirtin. Ji aliyê gel ve jî dihatin hezkirin.

Piştre pergala asayîşê berfireh bû. Du hevalên ji Şiyê hebûn, hevalek jî ji Çeqelan bû. Piştre me got, *“bila hevalên jin jî di nav de cih bigirin.”* Li Şiyê, me 7 hevalên keç jî xistin nav karê asayişê. Jixwe ji gundan jî bi nobedarî dihatin û nobeta xwe digirtin. Du salan vê pergalê berdewam kir. Ji ber ku kar û berpirsiyariyên me fireh bûbûn, diviyabû me alternatîfên xwe jî roj bi roj fireh bikira. Êdî hemû pirsgirekên gel dihatin pêşberî me. Di dawiyê de komîteya asayîşê serbixwe hate rêxistinkirin.

***-Ma van xebatan têrî pêwîstiyên civakê dikir?***

Bêguman kêmasî hebûn, lê di her tiştî de kelecaniya ewil hebû. Piştre me komîn ava kirin. Jixwe perspektîf û rexneyên kordînasyonê jî hebûn û digot, “*divê hûn pergala xwe berfireh bikin û pergal li ser çend kesan nemeşe. Divê gund bi gund komîn bêne avakirin.*” Berê jî li gundan rêxistinbûnên me hebûn, lê divê êdî herkes tevlê bibe û li her gundekî komîn jî bên rêxistinkirin. Fermanname jî hem bi Tirkî, hem bi Kurdî, hem jî bi Erebî bû. Me xwend û li ser nîqaş kir. Hem bi awayekî xweser, hem jî bi awayekî giştî me perwerde li ser didîtin. Lewra pergala ku em ê ava bikin, divê di serî de me bi xwe fêm bikira û nas bikira. Teoriya wê me dizanî, lê di pratîkê de divê kûrbûnek hebûya. Divê di destpêkê de, di her nahiye û xetekê de komîn bihatana avakirin, piştre jî li Efrînê. Divê li gund û taxan, ti kes li dervayî komînan nemabûya. Me gundên ku tê de wan partiyên din jî hene tespît kirin û me xwest li wir jî xebatan pêş bixin. Divê her kesî tê de cih bigirta.

Me digot, “*herî kêm di her gundekî nêzikî me de, divê em komînekê ava bikin.*” Mesela mehekê me gundê Xelîl anî rojeva xwe û em li ser wî gundî sekinîn. Di wê mehê de, li wî gundî me civînek giştî çêkir, civînek jinan çêkir û em mal bi mal jî geriyan. Da ku em pergalê bi gel bidin fêm kirin. 150 mal bû, lê nêzikî 20 malan ji van tevgerên din bûn. Lê em çûn gel hemûyan û me ew jî îqna kirin û tevlî komînê kirin. Tenê 5 mal tevlê nebûn. Wan jî digotin, “*ji bo gund çi bîryar bên girtin, em amade ne. Lê em di nav de cih nagrin.*” Me heya dawiya mehê, hemû amadekariyên xwe kirin û tenê îlankirin mabû. Me hemû endamên jin û zilaman diyar kiribûn. Hemû kom û saziyên pêwîst ava kirin. Komîna jinan cuda hatibû rêxistinkirin. Zarokên gund jî digotin, “*em jî dixwazin di nav de cih bigrin.*” Ew komîna ku hatiye avakirin, pir serkeftî bû û moraleke mezin da. Me dîsa jî digot, divê tu kes dervayî komînê nemîne û ji aliyê madî û manevî ve kî pirsgirekan jiyan bike, divê komîn piştgiriya wan bike.

***-Di aboriyê de; di karê cotkarî, bexçe û bazarê de rewş çibû?***

Ji milê aborî ve, di destpêkê de pir tengasî dihatin jiyankirin. Wê demê li Helebê jî şer destpêkiribû û piraniya gel hatibû Efrînê. Gundên pencî malî bûbûn sed mal; yên sed malî bûbûn dused mal. Me digot, malbateke feqîr bê kîjan gundî, divê komîna gund jê re alîkariyê bikin. Divê wan ziyaret bikin, moral bidin wan. Lewra balafiran li wan xistibûn, malên wan xirab kiribûn, perîşan bibûn. Di van karên wisa de jî, ew gundê ku me lê komîn ava kiribû

karên serkeftî pêk anîn. Di nava sîh gundî de bûbû mînak. Gundekî welatparêz bû, ew tevgerên din jî tê de pir tune bûn. Gundekî mînak hatibû hilbijartin. Tê de heft komînên jinan hatibûn avakirin, 17 rêvebirên wan hebûn. Komîna zarokan hebû, du komînên ciwanan hebûn. Komîna aştiyê hebû, komîna mamoste û xwendekaran hebû. Komîna perwerdê jî hebû û ji du zilam û sê jinan pêk dihat. Ew jin jî du mamoste bûn, yek jî xwendekar bû. Êdî karê kê çi dibe bila bibe, cihê ku lê ye li gorî danehevên xwe tevlî pergala civakê dibûn. Ji destpêkê ve me ti kes dervayî komînan nehişt. Lewra cara yekem bû û divê em pir bi baldarî nêzik bibana.

Komîn bi rastî jî moral didin. Lewra vîna gel derdikeve pêş. Dema ku me komîna yekemîn ava kir, min bi xwe hestên cuda jiyan kirin. Min got, "*mirov di karekî de ked bide û zehmetiyan bikşîne, dê ew kar bi ser bikeve.*" Dema me li gundê Xelîl komîn da avakirin, vîna gel derdiket pêş. Dema ku li wî gundî tiştêk derdiket, pirsgirekek çêdibû; bi xwe li ser disekinîn. Hemû tiştî wisa cihê xwe girt. Ji bo mirov komînan fêm bike, divê mirov pareznameyên Serokatiyê her bixwîne. Da ku bikaribe fêm bike. Di dîrokê de hin komîn hatine avakirin, lê bi sedan salan bandora wan heye. Ger mirov serê xwe pê biêşîne û fêm bike, mirov dikare di nava gel de pêk bîne. Gundî jî di gelek mijaran de şiyar bûbûn. Digotin, "*ger di nava gund de pirsgirêkek çêbibe, em dikarin di derbarê wê de bîryar bistînin.*"

Bi riya komînê gelek karên din jî dihatin kirin. Mînak perwerdeyên zimanê Kurdî çêdibûn. Perwerdeya xwe jî, bi xwe pêkdianîn. Herkes vîna xwe di nava komînê de didît û baweriya xwe pêdianî. Pişt re dema ku li cihên dîtir jî komîn hatin avakirin, hem bû mînak û hem jî bû ezmûnek. Dema ku li gundê yekemîn xebata komînê serkeftî bû, me li gundên din jî destpê kir. Serokatî dibêje, "*dema ku mirov ji karê herî biçûk destpê bike, bi awayekî ji dil ked bide û zehmetiyan bikşîne mirov serkeftî dibe.*" Di vê pêvajoyê de, ji bo ku fêm bikim min dubare pareznameyên Serokatî xwendin. Serokatî dibêje, *"ger ez li derve bama, minê bi avakirina komînekê dest bi kar bikira."* Ji ber ku me wisa kir, dewlet rûxiya û pergala me hate avakirin. Ew gotinên Serokatî, wê demê me baştir fêm kirin. Ger me xebateke bi vî rengî bimeşanda, me jê moral digirt. Lewra te hem gel dikir xwedî vîn, hem pergala Serokatî ava dikir, hem jî xeyalên şehîdan pêk dianî. Ji ber vê yekê di avakirina pergalê de pêşxistina komînan, em kêfxweş dikirin.

***-Di van demên ku em li ser diaxifin de li ber pevçûnên li Helebê, hejmareke zêde gel koçî Efrînê kiribû. Vegera gelê Helebê di kîjan deman de zêde bû û tesîreke çawa li ser Efrînê kir?***

Piştî 2012'an zêdetirî deh hezaran gelê me yê li Helebê hatibû Efrînê. Şer zehmet e, mirov kêfxweş nake. Şer talan, xirabkirin û kuştinê tîne. Lê şerê Helebê dihêlişt ku gelê me yê wê derê careke dîtir berê xwe bide welatê xwe. Berê li gundan pir kêm kes hebûn, lê piştî şerê Helebê gund tijî bûbûn. Ji ber xizanî û kar koçî bajaran kiribûn, lê bajar di heman demê de helandinek bû. Ne ku em ji ber şer kêfxweş bûne, lê bû sedemê vegera gel. Dema ku şer û koçberî çêbû, ew kesên ku hatin digotin, "*li Helebê malên me hebûn, hewşên me hebûn, dikanên me hebûn; lê bi rehetî me dev jê berda û em hatin.*" Di dîrokê de Kurd her koçber bûne, dijmin ew ji ax û welatê wan dûr xistine. Lê dema ku şer çêdibe, hemû dîsa vedigerin. Ji ber ku gel zêde hat Efrînê, mercên jiyanê hinekî zehmet bûn. Hem hejmar zêde bû, hem jî kar kêm bû.

***-Ji ber ku serhejmar zêde bû û qadên kar kêm bûn, gel zêdetir berê xwe neda afirîneriya aboriyê?***

Ger Efrînê çend salan kar nekiribûya jî, bi danehev û baxçeyên wan têra wan dikir. Lewra erdnigariyeke dewlemend e û çandinî pêş ketiye. Me ji bo şoreşê jî alîkarî dixwest, her malbatekê li gorî berhemên xwe alîkarî dida. Weke zekateke lê hatibû. Yên dewlemend zêdetir didan, yên xizan kêmtir didan. Bi vî awayî jî piştgiriya şoreşê dikirin. Piraniya wan ji sedî dehê berhemên xwe şoreşê. Carna jî me hin baxçe digirtin, gel dihat alîkariyê û komkirina wan çêdikir. Bi rastî jî gel fedakariyeke pir mezin dikir.

Ji bo gelê me yê ku ji Helebê hatibû jî pir alîkarî dihat kirin. Jixwe piraniya wan dihatin û li gund û erdên xwe bi cih dibûn. Malên xwe ava dikirin û erdên xwe didan şixûlandin. Berê dewletê ne dihêlişt ku di nava erdên xwe de bîrekê jî bikolin. Lê di dema şoreşê de, erdên xwe bi her awayî bi kar dianîn. Gel serbestbûnek jiyan dikir û giraniya vîna gel dihat hîskirin. Dizanîn ku êdî azadî heye û hemû tişt bi vîna wan e. Ewê êdî bi rengê xwe tevbigerin. Jixwe li Efrînê ji gelê Ereb jî kêmek hebû, lê dengê xwe dernexistin. Hinek kesên berê bi dewletê ve girêdayî hebûn, wan jî nedikarîn tiştekî bikin. Êdî pergala me hatibû rûnişkandin. Wan fêm kir ku weke tevger, em dikarin bi serkevin. Hinek kesên Kurd hebûn, hê baweriya xwe ji dewletê qut nekiribûn û hêvî dikirin ku dewlet careke dîtir vegere.

Ji ber ku dema me digot, "*em xeta sêyemîn in û şerê me û dewletê tine ye*" di nava wan de guman çêdibûn. Digotin, "*gelo van û dewletê li hev kirine?*" Lê peyamên me zelal bûn. Me digot, *"li Efrînê 10 hezar keç û xortên Kurd tevlî şoreşê bûne û ev der jî Kurdistan e.*" Bingeha tevgera me 40 sal berê hatibû avêtin û şoreş li ser wê bingehê dihat pêş xistin. Yên ku tevgera me nas nekiribûn, pir zêde hesabê van tiştan nedikirin. Lê dema ku me

digot, “*ew 40 sal in em ji bo şoreşa Kurdistanê berdêl didin, ji bo van rojan bû”,* hinek serwext dibûn. Me digot, *“xeyalek bû ku em ala xwe li vir liba bikin, bi zimanê xwe dibistanan vekin, xwe bi xwe rê ve bibin.”*

Ji ber wê teorî û pratîk bi hev re pêş diketin. Tiştê ku te digot, di heman demê de te dikir pratîkê. Dibistanên Kurdî jî wisa bûn. Dema ku bi Kurdî perwerde destpê kir, moral çêbû. Lê hinek kesan wate nedidayê, li çanda xwe biçûk meyze dikirin. Di bin bandora çanda Erebî de bûn. Me digot, “*em ne li dijî çand û zimanê Erebî û dewletê ne. Lê ger ew me qebûl bikin, emê jî wan qebûl bikin. Ev cihê me ye û pergala me heye, divê dewlet qebûl bike.*” Dema ku van tiştan me bi berfirehî dianîn ziman, îqna nebûbana jî, maf didan me. Lewra pergala Sûriye, Kurd gihandibûn wê astê ku xwe bi xwe înkar bikin. Ji vî alî ve konevaniyeke tenik dimeşandin û Kurdek ku ji bo dewletê her kar bike ava kiribûn. Ji ber vê yekê me gelek tişt didan ber çavan, lê me dizanî ku di dawiyê de dê xeta me bi ser bikeve. Jixwe ew pergala ku me li Rojava da avakirin, wisa di roj û kêliyekê de çênebû. Beriya her tiştî keda Serokatî û bi sedan şehîdan hebû.

***-Dervayî Kurdan, nêzikatiya gelên dîtir li hemberî guhertina pergalê çibû, mesela gelê Ereb çawa nêzik dibû?***

Ew jî tevlî pergala me bûn. Şêwaza me ku li Rojava hatiye meşandin de divê em kêmasiyên xwe bibînin. Divê ew gelê Ereb me ji destpêkê ve qezenc bikirana. Em bi her awayî ve avakirina pergalê tînin ziman. Me ji destpêkê ve xwest her kesî tevlê bikin, lê dîsa jî kêmasî hebûn.

***-Kêmasiyên çawa bûn?***

Mesela ew gundên ku tê de Ereb hebûn, em diçûn gel wan em fêm dikirin. Alîkarî jî didan me, pergala me qebûl dikirin. Me digot, “*şerê me bi pergalê re ye, ne bi Ereban re ye, şerê bi êrîşkaran re ye.*” Jixwe ji berê ve Kurd û Ereb li wir bi hev re jiyan dikirin. Li gelek cihên Rojava di van pencî salên dawî de Ereb bi cih kiribûn. Lê ev Erebên Efrînê, pir kevn bûn. Êdî weke Kurdan li wan hatibû. Nêzikatiyên wan jî pir ne şaş bûn. Me dixwest wan jî tevlî xweseriyê bikin. Pergala me qebûl jî dikirin. Me bi Ereban re civînên taybet çêdikirin.

Mesela kesekî bi navê Cebraîl hebû, Ereb bû. Di nava rêveberiya meclîsê de cih digirt, alîkariya me jî dikir. Dema ku me bi wan re civîn çêdikirin û semîner li dar dixistin, kêfa wan dihat. Digotin, hûn çima nayên û naçin? Me di her meclîseke gund de, nunerên wan jî xistibûn nav kar de. Lê hemû zilam bûn, jinên wan pir tevlî xebatan nedibûn.

Ji vî alî ve em dikarin bibêjin bi rastî jî Şoreşa Rojava, şoreşa gelan e. Lê weke pêşeng nebesiyên me hene. Ji bo demên pêş me amadekariyên pir berfireh nekiribûn. Ger me hemû gel nas bikira û pergala xwe dabûya nasandin, dê baştir biba. Lewra mirov çiqasa ked bide, ewqas encam digre. Tevgera me bi Rêber Apo destpê kir û îro Kurd bi mîlyonan rabûne ser piyan û ji bo Rojhilata Navîn bûne mînak. Em bi fikrên Rêber Apo li Rojava pergala xwe pêş dixin. Lê ji bo ku pêk bê û tu bikaribe bi gel bide fêmkirin, divê şev û roj kar çêbûya. Divê me xwe bixista dilê dayik, jin û zarokan. Divê tiştên ku Serokatî digotin, me bi gel bidana fêmkirin. Lewra em hem pêşengên gel bûn, hem jî kesên ku fikra Rêber Apo pêk bînin bûn. Ger em dibêjin, me Rêber Apo qebûl kiriye û weke Serokatî dibînin; divê weke şopdarên wî, di nava gel de bi fedakarî, wêrekî û moraleke mezin me pêş bixista. Divê hem me bida gel, hem jî ji gel bigirta. Me xwe ne di ser gel re bidîta û ne jî gel biçûk bidîta. Lewra me bi fedakariya wî gelî pergala Rêber Apo da avakirin.

Jixwe vî karî bi me destpê nekir, karê Rêber Apo û şehîdan bû. Rêber Apo hemû xebatkar û gelê Rojava bi xwe perwerde kiribû. Her mala ku em diçûnê, wêneyên Serokatî hebûn. Li gel Serokatî wêne kişandibûn û li mala wan, ber çavê wan dalîqandi bû. Ji ber vê yekê ew pergala Rêber Apo û hevalên şehîd yên serê çiya bû. Me jî li ser şopa wan dixwest bibin pêşengên vî gelî. Avakirina xweseriyê jî bi perwerdeyan û komînan destpê dikir. Bi taybetî di pêşengîtiya jinan de hemû xebat dihatin pêş xistin. Ew êşên bi salan hatine kişandin jî herî zêde jinan hîs kiribûn.

Ji ber ku em pêşeng in, divê di destpêkê de pergal û paradîgma me fêm bikira, da ku me bikaribe bida fêmkirin û ava bikin. Pergala ku li Rojava hatiye avakirin, bêguman zehmet bû. Lê ger mirov hewldana têkoşînê li hemberî kesayeta xwe nîşan bide, di avakirina pergalê de jî dê serkeftinên mezin pêk bîne. Dê bikare bibêje, “*ez xebateke ku civak, şehîd û Serokatî dixwaze pêk tînim.”*

**4-Li Efrînê Xebatên Parastinê**

Foto-62

***-Hûn kengê li Efrînê man û dema ku hûn li wir bûn, ji milê leşkerî ve li Efrîn û Helebê rewş çi bû?***

**MEHMUD BERXWEDAN:** Di Adara 2013'an de ez derbasî Efrînê bûm. Dema em gihiştin wir li Efrînê jî û li Helebê jî rewş aloz û tengav bû. Hem bi rejîmê û hem jî bi Artêşa Azad re nakokiyê me hebûn û ji hêla her du aliyan ve jî gef hebûn. Her du alî jî dixwestin li herêma Heleb serwer bin û em di navberê de diman. Artêşa Azad dixwest di herêma me re li rejîmê bide; rejîmê jî dixwest di heman herêmên me re li Artêşa Azad bide. Yanî dixwestin êdî herêma me ji me bistînin. Artêşa Azad li Helebê li taxa Kurdan ya bi navê Şêx Meqsûd, bi taybet di nava Ereban de xwe bi rêxistin kiribû. Rejîmê jî bi heman rengî rêxistina xwe çêkiribû. Êdî pêwîstî pê hebû, em li Helebê jî helwesta xwe nîşan bidin. Yanî pêwîst dikir me siyaseta xwe zelal kiriba.

Çeteyên girêdayî PDK'ê û Tirkiye hebûn. Van çeteyan xwe li derdor û nava Efrînê de jî bi rêxistin kiribûn. Heta rêbendên wan heya bi Birc Abdala û Basûta jî hatibûn. Yanî heta 3-4 km dûrî Efrînê hatibûn. Ya girîng jî wan di bin navê penaberên ji Heleb û cihên din de jî li gelek deverên Efrînê xwe bi cih kiribûn.

Li Efrînê siyaseteke me ya ku em karibin li ser hevsengiyan bimeşin hebû. Yanî, em bi her duyan re jî şer nekin; ne bi rejîmê re û ne jî Artêşa Azad re… Wan jî ji vê sûd wergirtibûn. PDK'ê di nava Artêşa Azad de *"Meclîs ul-Asker el Kurdî"* çêkiribûn. Yanî Meclîsa leşkerî ya Kurdan… Ev li ser me jî ferz dikirin. Serweriya xwe ferz dikirin. Ji ber ku rêyên me yên çûnûhatinê yê navbera Efrîn û Helebê, di bin kontrola Artêşa Azad de bûn. Herî dawî bi rengekî plankirî gotin "*divê hûn kaxizên çûnûhatinê ji ketîbeya Selehadîn bistînin."* Gelek caran jî gel bêzar dikirin, carinan digirtin. Yanî wisa li Efrînê ji derveyê şerê Qestelê yê du rojan ku me behs kiribû wisa şerekî me bi wan re çênebû. Li Efrînê jî di aliyê cebilxane û binesaziyê de lawaziyek hebû. Di rêxistinkirina YPG de zehmetiyeke cidî çêbibû. Tabûrên YPG'ê nû çêdibûn. Ji bo Efrînê destpêkê pêwîst bû me ev rewşa derbas bikira. Yanî diviyabû siyaseta me bihata asteke wisa ku me li hemberî rejîmê û Artêşa Azad helwesteke hîn xurtir bigirta.

Li ser vê bingehê li hemberî rejîmê helwesta me ya pêşî, di 8'ê Adara 2013'an, di roja jinên kedkar ên cîhanê de çêbû, me li wan xist. Du rêbendên wan hebûn û du hevalên me yên YPG'ê li wir girtibûn û gef dixwarin. Li ser vê nêzîkatiya wan li Birc Abdala û Basûtê me li rêbendê wan xist, du yan jî sê kes ji wan mirin û me çil kes jî dîl girt. Me rêbendên wan hemû rakirin. Jixwe aleke PDK'ê ya mezin pê ve kiribûn. Heta em hatin Basûtê, jixwe yên Basûtê reviyabûn. Piştî wê me li hemberê wan di tevahiya Efrînê de operasyonek da destpêkirin. Li hemû nahiyeyên Efrînê me ji bo hemû endamên wan alarma sor îlan kir. Yanî li ku bêne dîtin yan wê teslîm bin, yan bêne girtin û yan jî wê bihatana kuştin. Di encamê de me hinek ji wan girtin û hinek jî reviyan. Yanî me çeteyên Artêşa Azad hinekê ji Efrînê dûr xistin.

Îcar pêwîst bû ku em hemleyeke din bikin. Me bîryar girt ku li Helebê li taxa Şêx Meqsûd hem li ser Artêşa Azad û hem li ser rejîmê operasyon bikin, hemû endamên wan bigrin û ji Şêx Meqsûd biavêjin. Herî kêm em hundirê taxê paqij bikin û sînorê xwe deynin. Rejîma Sûriyê li ser girtinên alîgirên xwe bertekeke dijwar nîşan da û bi balafiran bi awayekî bê hesab û dijwar li Şêx Meqsûd da. Li ser vê yekê em jî bi awayekî pir dijwar bi rejîmê re ketin şer. Ji ber lêdana hewayî di nava sê rojan de nêzî sed hezar insanî ji Helebê koçî Efrînê kir. Lê me qad vala nehişt, ji Efrînê û ji cihên din heval teqwiye hatin û me rêbendên xwe danîn. Helbet di vê navberê de çewisîn û zextên Artêşa Azad sekinîn.

Di şerê me û rejîmê de me nehişt ku ew pêş de werin û bikevin qada me, lê hin heval li wê derê şehîd ketin. Heval Zekeriya li wê derê şehîd bû ku nû bibû endamê desteya leşkerî. Gelek ciwanên Efrînê ku tevlî bibûn şehîd ketin. Ev şer qederekê dirêj kir. Pişt re hêdî hêdî sekinî. Cara yekemîn bû ku em bi rejîmê re diketin şerekî ewqas dijwar û demdirêj. Rejîm jî bi hemû hêza xwe ve dihat ser me.

Di vê demê de li Efrînê piranî bi rêxistinkirina YPG'ê re mijûlbûn çêbû. Pêwîstiya ku bi şervanan, perwerdeyê û bi profesyoneltî heye, niha derdiket pêş. Êdî xuya bû ku bi YPG ya berê nedibû. Hemû hevalên li Efrînê ketin giraniya vê yekê. Giraniyeke ku bi rastî divê em li Efrînê xwe ji nû ve ava bikin. Di serî de ked û xebata Şehîd Ronahî, Şehîd Jînda, Şehîd Deştî, Şehîd Xabûr, Şehîd Ednan û bi dehan şehîdên ku wisa ji dil de xwe danê, nayê ji bîr kirin. Dîsa Şehîd Silava û Şehîd Bêrîvan yanî yê ku pişt re şehîd ketin, van Hevalan ji dil bi rêxistinkirina YPG re mijûl bûn. Her du hevalên bi navê Şehîd Zekeriya û Hevalên li Helebê jî ketin giraniya girîngiya pêvajoyê. Atmosfereke pir xurt çêbû.

Jixwe piştî wî şerê ku li Helebê çêbûyî, li Efrînê jî êdî ew çêbû. Yanî Artêşa Azad jî ev li ser me ferz dikir. Vê carê pirsgirêk bi navê 'Nûbl û Zehra', du bajarokên Şîa ku nêzîkî Efrînê bûn de derketin. Ev her du bajarok ne Elewî jî bûn, Şîa bûn û nêzî Îranê bûn, rejîm tê de bû û ji bo Artêşa Azad û Cebhet el Nusra hedef bûn. Wan dixwestin di araziya Efrînê re biçin li Nûbl û Zehra bixin. Me jî her digot, "*hûn nikarin bikevin araziya Efrînê, em qebûl nakin."* Ya din jî dixwestin matar ango balafirgeh a nêzî Efrînê bixin dorpêçê. Wan digot em ê balafirgehê bixin dorpêçê. Gotibûn "*em ê Cilbirê, Bênê, Basilê û Meryemînê bigrin ji bo ku em derdora balefîrgehê bigrin, dema balefîrgeh kete dest de, jixwe em ê ji van gundan derkevin."* Ew çend gundên li derdora balefîrgeh yên li rojhilatê Efrînê hatibûn ketibûn wê derê de.

Piştî wê jî gotin “*em dixwazin her du bajarokên Şiayan Nûbl û Zehra jî bixin dorpêçê.*” Ji bo ku Nûbl û Zehra bixin çemberê, ji berê de rojhilatê Efrînê girtibûn. Vê carê jî dixwestin milê başûrê Efrînê jî bigrin. Yanî milê çiyayê Lêlûn, Şêrawa û cihê stratejîk heya Kela Seman wisa diçe. Yanî esas beşeke hem rojhilat û hem jî başûrê Efrînê diçe. Helbet destpêkê me got riya herî baş em di navbera wan de aştiyê çêkin. Dijminê hev bûn, kî kê digire dikuje. Hevûdin serjê dikirin. Em çûne Nûbl û Zehra re me hevdîtin çêkir. Me li Anadanê bi Artêşa Azad re jî hevdîtin çêkir. Me her du alî jî ji bo aştiyê dawetî Efrînê kirin. Me nîqaşek çêkir lê encam negirt. Jixwe ne mimkûn bû ku encam bigire...

***-Çima?***

Ji ber ku nakokiyên wan kûr bûn. Ji bo wê bi israr dixwestin herêma me bi kar bînin. Me jî qebûl nedikir.

Digotin “*jixwe hûn li gel rejîmê ne, me çember daniye lê hûn xwarinê didin wan, alîkariya rejîmê hûn dikin, wê çaxê hûn bi rejîmê re ne.”* Yanî peyaman ew bû ku wê çaxê hêzeke bi rejîmê re ye jî heq e em pê re şer bikin, yan hûn ê bihêlin em di araziya we re derbas bin, yan jî eger na hûn wê çaxê li gel rejîmê ne.

Dema wisa bû ji bo ewlehiya Efrînê me araziya navbera xwe Nûbl û Zehra jî zêdetir êxiste bin çavdêriyê. Ji ber ku rewş aloz û ji provokasyonan re vekirîbû. Her çiqas berteke rejîmê ya Nûbl û Zehre çêbe jî lê me tedbîrên xwe xurt kirin. Vê carê jî çeteyan xwestin me û gelê Nûbl û Zehrayê berdin hev. Yanî fitne bixin navbera me. Xwestin wisa werin bi şev bikevin navbera me. Careke ceribandin, ji milê Nûbl û Zehra ve êrîşê mewziyên me bikin weke ku Şîa êrîşî me kiriye. Di encam de bibe şerê Efrînê û gundên Şîa û ew jî ji vê feyde bibînin. Yanî me û Şîa berdin hev. Komek çete bi dizî ji aliyê Şîayan ve hatin û şer derket. Hevalan li wan xist. Du-sê kes birîndar bûn. Me destpêkê nedizanî kî ne. Lê me texmîn kir ku ne Şîa ne, lê çete bi xwe ne. Helbet ev ketibeyên Selehadîn jî bi wan re ne.

Piştî birîndar bûna van kesan balkêş e ku gotin “*we li me xistiye.*” Me jî got, “*hûn wê çaxê dixwazin fitnê çêkin, me hevalên xwe hişyar kirine ku ji milê Nûblê de kî were lêxin, êdî hûn jî werin em ê li we bixin, ji ber ku em nizanin kî ne.”* Çend roj di ser re derbas bûn dîsa xwestin wisa bikin. Hevalan bi dûrbînê şevê dîtin û gotin “*ji milê Nûblê de hinek vedizine aliyê me.*” Me got weke berê li wan nexin, kemîna xwe baş vedin, berdin bila werin tam bikevin nava we, dema ketin nava we hûn jî baş lêxin û bila ji wan tu kes xilas nebe. Me got ku dema bû sibe, em ê ji cinazeyan bizanin kî ne. Bi vî rengî hevalan kemîn danî, heya ku tam hatin ketin navê û Hevalan li wan xistin, ji wan 2-3 çete mirin. Roja din çeteyên Artêşa Azad li ser wê bûyerê got ku *“we mirovên me kuştine, we li hemberê me şer îlan kiriye.”* Bi vî rengî rastî bi zelalî derkete holê.

**Şerê Şêrawa**

***-Di êrîşên li ser Efrînê de rista Tirkiye çibû?***

Helbet dewleta Tirk jî ew tehrîk dikirin ku wan bi Efrînê re bixin şerekî. Jixwe dûr neçû û li Şêrawa bi çeteyan re şer dest pê kir. Ev herêm heta ser Bircê bû ku koçberên wan tê de bûn, doçqaya wan tê de bû, li ser serê Efrînê bû. Ew bûyer kirin hincet û roja din wan êrîş kirin. Gotin “*we sê kesên me kuştine”* û hema êrîşê Aqûbê kirin. Hevalan gotin “*bi doçqayan êrîş dikin, bi ser me de gule dibarin û tên.*” Me got “dengê xwe nekin, dema hatin ketin mesafeya we, bi hev re hemû lêxin. Çend kes ji wan dimirin bila bimirin.” Ew hatin nêz bûn û hevalan li wan xist. Fermandarê wan yê herî mezin yê ketîba Selahadîn di pêş de mir. Çendekê din ji wan mirin û me got lêxin, operasyon e.

Şer li Aqûbe dest pê kir lê me bi giştî şer îlan kir. Me êdî kir fersendeke ku em hemû Efrînê paqij bikin. Em Artêşa Azad û van ketîbeyên di nava bajêr de, hucreyên wan ên razayî, çiqas hene em operasyonê li ser wan bikin. Me hem li Efrîn û hem jî li Aqûbê dest bi operasyonê kir. Lê me berê jê re amadekariyek tam nekiribû, me dest bi şer kir û pê re amadekariyên xwe jî kir. Şeva destpêkê me Bircê raserî Efrînê û derdor girt. Me di du baskan de êrîş ser Birca jorî kir. Wan Birc berdan û reviyan. Hinek gundên jorî hebûn, heval heya wê derê ketin pey wan. Lê hevalê me jî ketin serxweşiya serkeftinê. Li 2-3 deran ew wisa reviyan. Hevalan jî got qey em ê bidin pey wan û ew ê her birevin.

**Şehîdên YPJ’ê yên destpêkê Silava û Berîvan...**

Bi rojan hema ew çûn û Hevalan da pey şopa wan û ew çûn ketin gundê Basilê de. Mixabin, di Basilê de li hevalan xistin û 3 Hevalê YPG’ê şehîd ketin. Me fêm kir ku Heval bê kontrol çûne û me li wir paş de kişandin. Me êdî her der xist bin kontrolê û me bi kontrol meşand. Careke din Hevalan xwestin êrîşî gund bikin. Wan jî hemu hêza xwe di gund de kom kirin. Di Ziyaretê û Basilê de kom kirin. Hevalan cardin êrîşî Basilê kirin lê cardin sê heval

şehîd ketin. Yek Hevalê Serhed bû, yek Hevala Bêrîvan bû û şeva din jî Hevala Silava şehîd bû. Hevala Bêrîvan rojekê beriya Hevala Silava şehîd bû.

Hevalan cenazeyên wan nekarîbûn bigrin. Ji ber ku Heval ketin nava gund û şehîd ketin, birîndar pir çêbûn, heta ku Hevalan birîndar derxistin ew Heval man, me nikarîbû cenazeyên wan anîba. Lewre jî me Hevala Bêrîvan îlan nekir. Bi şev Hevala Silava şehîd bû. Hevala Silava fermandar bû, ji Efrînê bû û bibû endama meclîsa leşkerî ya YPJ'ê û YPG'ê. Şehîda destpêkê Hevala Bêrîvan bû, lê ji ber ku cenazeyê wê mabû, me îlan nekir. Şehîdê YPJ'ê ya destpêkê Hevala Silava bû. Heta wê demê Hevalên xort pir şehîd bibûn lê ji Hevalên jin destpekê Hevala Silava şehîd bû. Van şehadetan bandoreke mezin çêkirin. Cara destpêkê du hevalên jin ji Efrînê di şerê Efrînê de li wê derê şehîd bûn.

Piştî van şehadetan pêwîst bû êdî bi giştî em tarzê şer biguherin, tarzekî gerîla bimeşînin. Li ser vê esasê li gel hevalan nîqaş pêş ketin ku em ê çawa karibin tarzê nû pêş bixin. Ji hêla din piştî her du êrîşên hevalan û şeş şehîd, çeteyan hindekî cesaret girtin. Em gihîştin vê fikrê ku wisa sîngesîng çûna ser gundan xelet e

***-Ger şêwaza berê xeter be, we şêwaza şerê gerîla li vê herêmê çawa kar anî?***

Li Heleb û Serêkaniyê me şerê bajaran kiribû lê ev gund bûn. Yanî em ê çawa gundan bigrin, em zêde xwedî tecrûbe nebûn. Lê çeteyan hindekî tecrûbe girtibûn, ji ber ku li gundewarên Helebê bi rejîmê re şer kiribûn. Wan xwe di hundir de veşartibûn, dîwar kun kiribûn û di wir re şer dikirin lê Heval bê tedbîr diketin gund de. Di encamê de me bîryar girt ku em li Basilê nexin, li pişt wan bizîvirin. Li wir Gundê Cilbirê heye û li wir jî çete hebûn lê wan texmîn nedikir emê lêxin. Cilbir 2-3 km li kêleka wî gundî ye, hindekî li milê wî yê piştê ye. Me got em ê ji nişkê de lêxin û Cilbirê ji wan bistînin.

Li pişta Basilê mezrayeke biçûk heye, me got em ê di heman demê de êrîşî wê derê jî bikin û ji wan bistînin. Dema ku me çep û rastê Basilê girt, roja seyemîn êdî em ê riya wan ku tê Basilê qut bikin û şeva seyemîn em ê li Basilê jî bixin. Heval pêwîst bû wê şevê biçûna û Cilbir bigirtana. Ji Efrînê weke gerîla derketin û çûn lê paşî gotin "*wele me şaş kir.*" Me got tişt nabe bila bibe roj, pêşiya xwe hema bibînin, ji nişkê ve êrîş bikin û bikevin gund û bistînin. Hevalan wisa kir. Dema bû ronî Hevalan di carekê de êrîş birin ser gund, ketinê û gund girtin, hinek kuştin, hinek reviyan. Me Cilbirê ji wan girt. Hevalan mezraya piştê jî girtin. Basilê di navê de ma û kî hate Basilê me li wan xist.

Şeva din me got seat 1'e, em ê êrîşê Basilê bikin. Em çûn ketin Basilê ku di gund de kes ji wan nemaye, hemû reviyane. Me Basilê jî girt. Yanî êdî me teqtîk girt ku em ê çawa li hemberê wan şer bikin. Me careke din dît ku di şer de psîkolojî diyarîker e. Eger te pişta xwe parast ji milê pêş ve tu dikarî bi hêsanî şer bike. Lê dema te ji pişta xwe derb xwar, berî her tiştî psîkolojiya te tarûmar dibe û dişkê. Çeteyên Basilê jî wisa şikestin û reviyan.

Êdî me li ser gundê Bênê plan çêkir. Li pêşiya Bênê rêbend hebû. Mezrayek jî di ser Bênê re hebû. Helbet em heta wê derê çûn jî, miletê Bênê yê Efrînê ye, Kurd in. Milet di hundir de rabû serhildanê û bi keviran û daran bi pey wan ketin gotin *"ji gundê me derkevin."* Wan jî hinekê li gund xistin û weke ku serhildana gund temirandin. Lê me dizanîbû gund di hundir de bi me re ye. Telefonî me dikirin û digotin *"binêrin Heval di wê derê de ne ha, li pêşiya we ne ha bila agahiya we jê hebe!"* Yanî bi telefonê alîkarî didan Hevalan, cihê wan ji Hevalan re digotin. Me digot, "*baş e, hûn cihê wan ji me re bêjin.*" Alîkariya welatparêzên di hundir de pir feydeya xwe çêbû. Roja din Hevalan li mezrayê xistin û girtin. Hevalê Xebat li wê derê şehîd bû. Me doçqa û çend çekên din ji wê derê rakir. Cenazeyên wan û du birîndarên wan ketin destê me. Heval pey re li pişta rêbendê zîvirîn û ew der jî girtin.

Roja din helbet wan jî li gorî xwe teqtîk kirin. Êrîşî gundê Marazkê kirin. Marazkê li milê Bakur dikeve û nêzî Qestelê ye. Dema êrîşî wê derê kirin ji neçarî cebheyên me bûne du. Me di du cebheyan de şer dikir. Di êrîşa destpêkê ya Marazkê de 3 Heval şehîd ketibûn. Tecrûbeyên me li Basilê girtine, em çûn me li wê derê xistin pratîkê. Ew hatin wisa cebhe girtin. Me qet tiştek nekir û em li pişta wan zivirîn. Gundê Kefirmezê hebû. Bi dûrbînê me lê mêze kir ku kes tê de tune ye. Me gundiyek şand. Ew jî çû û hat û got "*kes tune ye".* Hema bi roj em çûn ketinê. Em ketinê, tu nabêjî li malên jor bûne. Ji wê derê avêtin me. Me şer kir û ew ji wan malan derxistin, reviyan û me gund stand û em li pişt Marazkê zivirîn.

Wan agahî şandin û gotin "*em dixwazin hevdîtinan bikin, em dixwazin li hev werin.*" Me hîn Bênê negirtibû. Ji ber ku êdî înîsiyatîfa şer di dest me de bû, me got "*wê çaxê hema îşev, heya seat 12'an ji Bênê, ji Marazkê û ji hemû araziya Efrînê ku hûn ketinê de derkevin. Heta seat 12 ji we re wext, eger bibe sibe em yekî ji we li Bênê bibînin, ev yek pêknayê.*" Dîsa me got, *"em bi şev seat 12 şer disekinînin, divê hûn jî bisekinînin lê sibê divê hûn li Bênê nebin."* Gotin "*baş e.*" Yanî me jî dixwest biçin.

Heval jî ev cara yekê bû ku nêzî mehekê, li ser hev di şer de bûn. Birîndar û şehîd hebûn. Tecrûbeyek jî çêbû. Asteke serkeftinê hebû. Lê me nedizanî ku me ew helak kirine, me prestîja 'Lîwa Tewhîd' aniye sifirê. Wê çaxê

Lîwa Tewhîd di Helebê de ya herî xurt bû. Jixwe em sibê rabûn ku ji Bênê çûne. Ji Marazkê jî çûbûn. Bi vî rengî wana ji wê derê derketin. Şer wusa sekinî.

***-Piştî wê qet şerê we çênebû?***

Piştî wê jî dîsa li pey komployan bûn ku bi komployan me bi bin bixin. Piştî wê bi hefteyekê êrîşî gundê Mezin kirin. Ew gund li başûrê Efrînê dikeve, gundê dawî yê Efrînê ye. Hevalên di gir de şiyar bûn, yanî wisa xafil nehatin girtin. Hatin ketin gir, hevalan lê xistin û 3 cenaze li pey xwe hiştin. Yên din reviyan. Li ser wê yekê şer sê rojan dirêj kir. Dîsa êrîşê gundê Başemlê kirin, hevalan ew êrîş şikandin. Yanî wisa du rojan şer çêbû. Di wan her du rojan de yek-du hevalên me birîndar bûn, lê gelek ji wan hatin kuştin, cenazeyên wan ketin destê me. Dîsa gotin "*em bisekinînin.*" Yanî wan jî dît ku bi komplo bi ser nakevin.

Vê carê ketîbeyeke din a Dar Azê ya Lîwa Tewhîd hebû lê paşî me fêm kir ku Cebhet el Nusra ne. Di carekê de bi roj li rêbenda me ya Xezebiyê dan û du heval şehîd xistin. Hevalê Egîd û hevalekî din. Em gihiştin lê ew reviyabûn. Rêbenda wan jî 2-3 km li jorî rêbenda me bû. Vê carê alozî çêbû, hîn me hevalên şehîd ranekirine grûbeke din hat rêbendê û gotin "*em vê meseleyê çareser bikin, bila şer mezin nebe.*" Ji ber ku ji me êdî ditirsiyan. Em jî aciz bûn û me ji wan re got ku "*herin baş amadekariya xwe bikin, em ê îşev werin di rêbenda we de li we bixin, piştî ku we li me xist em ê jî li we bixin. Niha em bi we re neaxifin.*" Bi rastî çûn û amadekariya xwe kirin. Çûbûn doçqayeke 23, yeke 14,5 û yeke 12,5 xistibûn rêbendê. Me jî bi rastî li wan xist.

Me bi terzê gerîla plan çêkir. Cara yekemîn di Efrînê de fermandarên baskan bêyî ku em erebeyan bişuxilînin, bi parastin û bi tarzê vedizînê, çûne ber mewziyên wan û me li wan xist, sê ji wan kuştin û yên din hemû reviyan. Me her sê doçqayên wan û hemû çekên wan anîn. Du heval birîndar bûn. Hevalek giran birîndar bû û piştre şehîd bû. Piştre me got, "*ka vê carê werin em biaxifin, me heyfa xwe rakir, hûn dikarin vê carê werin, em*ê *biaxifin.*" Îcar hevalan digot, "*ma, me ti caran ji dijminê xwe re gotiye 'here bikeve mewziyê, amadekariya xwe bike, ez têm ku li te bixim*!'"

Piştî wê me hemû tiştê wan yê di Efrînê de girtin. Bi sedan erebeyên wan ên di Efrînê de me hemû girtin. Yê Şêrawa me hemû girtin û Efrîn piçekê wisa zelal bû. Sînorê wê jî zelal bû, hundirê wê jî zelal bû.

Lê şerê me yê li Helebê dewam kir; bi rejîmê re jî û bi çeteyê Xalit Heyanî re jî… Piştî ku şerê me yê bi rejîmê re piçekê sekinî vêcarê Xalit Heyanî yê Artêşa Azad, êrîşî Hevalan kir. Şerekî dijwar derket. Gelek heval birindar bûn. Çawa ku heval bê amadekarî bûn, ew jî hatin li hevalan xistin. Ji rêveberiya me ya Helebê jî hin heval birîndar bûn, şehîd çêbûn. Şerê me yê bi çeteyên Heyanî re cih bi cih dewam kir, heta ku DAIŞ derket. Hevalan piştî wê, ji ber ku hemû milên Şêx Meqsûd di dorpêçê de ye, li derdora taxê hem li beramberî rejîmê û hem jî li beramberê Artêşa Azad mewzî çêkirin û Şêx Meqsûd hîn jî wisa diparêzin. Hevalan sîstemeke wisa ya parastinê çêkirine.

***-Ji bo Efrînê herî dawî hûn dikarin çi bêjin?***

Li ser şehîdên Efrînê, hin bûyerên ku li Efrînê qewimîne û li ser pêvajoyê bandor kirine mirov dikare bi xalên giştî bîne ser ziman. Ya destpêkê, bi pevçûnên hinek kesên girêdayî wan ketîbeyên bi navê Selehadîn ku girêdayî PDK'ê bûn, di navenda Efrînê de şer derket. Wan xwe di nava bajêr de bi cih kiribûn. Di pevçûnan de Hevalê Çekdar şehîd ket. Hevalê Çekdar, berpirsiyarê Ciwanên Şoreşger bû. Di pêvajoyên destpêkê de bandoreke mezin li ser Efrînê kir. Hem di çûna ser çeteyên Ketîbeya Selahadîn de û hem jî di tevlîbûna ciwanên Efrînê de bandora Hevalê Çekdar pir mezin bû. Guhertineke piralî di rihê ciwanên Efrînê de ji bo tevlîbûnê çêkir.

Hin bûyerên din hene piştî vê ne. Bûyerên ez behsa wan dikim ji 2012 heya bi Tîrmehê 2013'an e. Yek jî bûyera Dêrbelûtê ye ku Hevalê Zekeriya tê de şehîd ket. Ew jî endamên fermandariya YPG bûn, endamê meclîsa YPG bûn. Çete hatibûn ketibûn gundê Dêrbalûtê û heval jî ji bo destwerdanê çûbûn. Hevalê Zekeriya hevalekî ku li Cindirêsê di YPG'ê de herî aktîf kar dikir. Di veguhertina YPG de hevalekî ku xwe ji dil û bê fikar tevlê dikir. Ji hevalên ku bingehê YPG'ê li Efrînê ava kirine yek jî Hevalê Zekeriya bû. Du hevalên Zekeriya hebûn. Yek li Helebê şehîd bû. Her du Heval jî endamê meclîsa leşkerî ya YPG bûn. Piştî konferansê tevî Hevala Silava sê hevalên endamên meclîsê şehîd ketin. Pêdivî heye ku mirov li ser rastiya gelek hevalên din ku di Efrînê de bi rola xwe rabûne û şehîd ketine, bisekine.

Yek ji wan Hevalê Şehîd Kendal e. Hevalê Kendal bi xwe ji Efrînê ye. Di dema herî destpêkê ya şoreşê de erk girtibû. Di vê pêvajoyê de li gelek deran kar û xebat meşand. Di destpêkê weke fermandarê Kobanê erk wergirt. Di esas de ji nû ve avakirina YPG li Kobanê para Hevalê Kendal pir girîng e. Ew û hevala Jînda di dema şoreşa 19'ê Tîrmehê de fermandarên YPG'ê yên Kobanê bûn. Di pêşengîtiya şoreşê yanî esas gava şoreşê ya despêkê ku bi serkeftî derbas bû de, rola yek ji fermandarên Kobanê Hevalê Kendal hebû. Girêdaneke wî ya manewî ji bo Kobanê hebû. Piştre derbasî Efrînê bû. Di şerê Şêrawa de jî gelek rol û erkên girîng bi cih anî. Li ser tabûrên bi tevger di

cebheyên herî pêş de cihê xwe digirt. Roleke van tabûran di rizgarkirina Basilê, Cilbirê û Aqûbê de pir mezin bû. Hevalê Kendal di giştî Efrînê de di bi rolek mezin rabû û paşî dîsa derbasî Kobanê bû li wir şehîd ket. Ezê di şerê Kobanê de jî bînim ser ziman.

Hevala Jînda jî hevaleke ji Rojava bû û salên dûr û dirêj di nava têkoşînê de bû. Bi giştî asteke serwer girtibû. Di tevgera azadiya jinê de jî roleke wê ya mezin hebû. Bi rastî jî sekneke wê ya milîtantî hebû. Di tevgerîna wê de, di moral û axaftina wê de mirov jê moral digirt. Dema mirov pê re nîqaş dikir di kelecan û axaftina wê de şoreş didît. Di dema şoreşa 19'ê Tîrmehê de ew û Hevalê Kendal rêveberiya Kobanê bûn. Ev heval bûn yên ku şoreş di Kobanê de çêkirin. Hevala Jînda li Efrînê di şerê Basilê û di gelek şerên din de û bi taybet jî li Marazkê destpêkê di cebheya pêşiyê de bû. Di rêveberiya cebheyekê de cihê xwe digirt û kar û xebata xwe dimeşand. Li Qestelê Hevala Jînda û çend hevalên jin ên din bi berxwedaneke mezin heta guleya xwe ya dawî şer kirin ku heta şehîd ketin. Tevî ku şehîd ketin jî dijmin yanî çete newêrîbûn werin ser cenazeyên wan. Piştre hevalan êrîş kirin û car din ew rêbend girtin.

Hevalê Deştî li wir bû ku bi rastî jî hevalekî pir kevin û di pêşketina teknîk û çekên YPG'ê de roleke girîng pêk anî. Hemû jiyana xwe esas ji bo pêşketina YPG feda kiribû, hevalekî fedaî bû. Ew jî di wê derê de şehîd ket. Li milê Cindirêsê Hevalê Ednan şehîd bû. Ew heval jî di şerê Şêrawa û di hemû şeran de, tevî ku ne di YPG'ê de bû jî lê li pêş bû. Mînaka rihê fedakarî û cesaretê bû. Bi wê fedakarî û cesaretê di mewziya herî pêş de şer kir û heta şehîd bû mewziyên xwe berneda. Dîsa Hevala Ronahî Reşo hebû. Berê birayê wê jî şehîd bûne. Hevaleke ku di têkoşînê de kedeke wê ya mezin hebû. Hevaleke bi coş û xwestek bû. Bi eşqa şoreşê tevlî dibû. Bi şev û roj ranediza. Tevlî konferansa YPG'ê ya destpêkê bû. Tevlî konferansa avakirina YPJ'ê jî bû. Heval Ronahî mînaka hevaltiya mezin û bilind bû. Bi rastî jî hemû ciwanên Efrînê, keçên Efrînê xwe li Hevala Ronahî digirtin. Tim ev digot, "*heta em bi dehan tabûrên xwe yên profesyonel çênekin em rehet nabin.*" Ji bo wê jî di Cindêrêsê de beriya her derê tabûrên wisa çêkirin.

# BEŞA ÇAREMİN

# HELEB

### *1-Di Pengavên Ewil yên Şoreşê de Rewşa Heleb'ê*

***-We li xeta Helebê jî xebat meşandiye, li wê derê xebat û amadekariyên yekemîn bi çi rengî bûn?***

**CEMÎL KOBANÊ:** Rast e. Wê demê em diçûn Helebê jî. Di Helebê de li Şêx Meqsûd, Eşrefiyê, Behdîna û Heyderî me xwe rêxistin kiribû. Li cihên dîtir yên Helebê ti kes nedikarî meş û serhildanan dar bixe. Lê wan taxan me bi awayekî xurt meş dardixistin. Em dikarin bibêjin ku di nava gelê me yê Rojava de, cihekî taybet yê gelê Helebê heye. Hem ji milê siyasî ve, hem jî ji milê berxwedanî, wêrekî û şerkeriyê ve mirov Helebê dikare weke mînaka şoreşê bide. Hemû taxên me yên wê derê di dorpêçê de ne, lê gelê me yê wê derê heya niha jî bê qûsûr ber xwe didin.

Wê demê jî meclîsa xwe ava kirin, rêxistina xwe çêkirin, hêza xwe ya parastinê çêkirin. Gelek ciwan dişandin Efrînê û me perwerde dikirin. Pişt re quwetên Helebê bi awayekî serbixwe hatin rêxistinkirin. Li gel derfetên kêm her tiştê xwe, bi xwe avakirin û pêş xistin. Heleb xwediyê risteke wisa bû. Bajarekî dewleta Sûriye bû, lê ji dîrokê ve serî ti caran netewandibû, her di nava welatparêzî, berxwedanî û çalakiyan de bû. Weke hêzeke mûxalîf her li hemberî dewletê disekinî.

Dema ku şoreşê destpê kir jî, risteke pêşeng dilîst. Bi taybetî pêşengtiya gelê Efrîn û Kobanê, gelê ku li Helebê jiyan dikir bû. Mesela dema ku me li Efrînê çalakî dardixistin, gelê me yê Helebê bi ew derfetên xwe yên kêm dihat Efrînê û dîsa dizivirîn Helebê.

Çalakiya ewil, li Meydanka hat çêkirin. Ji Efrînê jî tevlêbûna çalakiyê çêbûbû. Jixwe piştî wê jî her çalakiyan berdewam kir. Di destpêkê de gelê Helebê xwediyê danehev û çawaniyeke bûn û rista pêşengî dilîstin. Dikarîn her piştgiriya xwe bidin şoreşê. Dema ku mirov îro jî Helebê bigre dest, ew rista xwe hê jî berdewam dike. Di destpêka şoreşê de risteke wisa ya pêşengiyê dîlîstin. Ji milê leşkerî ve jî astek girtîbûn.

***-Hûn kengê çûn Helebê û di wê demê de li Helebê çi pêşketin çêbûn?***

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Çûyina min ya Helebê, di adara 2013'an de çêbû. Min her tim Serok Apo dişopand. Piştî dîl hat girtin û xistin Imraliyê ji min her nêrînên Serok Apo dişopand. Beriya ez biçim Helebê, Serok Apo di têbiniyên xwe de ji Heleb digot, *"divê ew der jî bê parastin."* Heleb cihekî ku gelê Kurd lê dijiya bû. Kurdên me ku çûne metropolan bi piraniya xwe derbasî Şam û Helebê bûne. Sedhezaran Kurd li wir hebûn. Kedeke stratejik li wir çêbibû. Ji wir gelek tevlêbûn çêbibû. Gelek malbatên me hebûn.

Dema ku mirov bi awayekî rast felsefeya Rêber Apo binêre, tenê ne ji bo gelê Kurd e. Ji bo azadî û hevra jiyankirina gelan e. Li ser esasê Rojhilata Navîn ya konfederal û di Sûriyeyeke demokratîk de bi hev re jiyankirina gelan xebatên me pêş diketin. Divê me hemû gelan re jî îspat bikira ku em tevgereke di nava Sûriye de, ji bo hemû gelan têkoşîn didin in. Ji vî alî ve Heleb êniyeke me ya esasî bû. Di dema Serokatî de jî pir girîngî hatibû dayin, ji wir gelek ciwan tevlî tevgerê bibûn.

Gelê Kurd yê li Helebê her amade bû. Bi tevgerê ve pir girêdayî bûn. Asta girêdanbûnê pir berz bû. Dema ku ew meş û xwepeşandin çêdibûn; qesî ku li Helebê ew qesa meşên girseyî û lez çêdibûn, ti bajarên din çênedibûn. Gelê wê derê ji sedî 80 bi me re bû, Ereb jî di nav de bûn.

***-We li wir kîjan xebat meşandin?***

Ez ji bo hêzên YPG çûm.

***-Di dema hûn çûyî de li Helebê rêxistinbûna civakî û leşkerî çawa bû?***

Wê demê li Helebê rewşeke pir bi aloz hebû. Ji aliyekî ve çeteyan êrîş dikir, ji aliyekî ve jî rejîmê êrîş dikir. Dixwestin ku cihên ku Kurd lê jiyan dikin, bikin qadên şer. Şer jî şerê di navbera wan de bû. Dewletê ne dixwest ku li taxên Ermenî û Asûrî û yên din jiyan dikin şer derbikeve. Ji ber vê jî şerê xwe li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê pêş dixist. Bi vî awayî Eşrefiye çûbû, Şêx Meqsûd jî aliyê rojhilatê çûbû, aliyê rojava mabû. Gel jî bi piranî valakiribû, lê hê hejmarek zêde gel jî hebû. Heval her roj bi komek çete re diketin pevçûnan, çend dikuştin û hevalek ya birîndar dibû, an jî şehîd diket.

Heya demekê ez li Helebê mam, me dixwest em baş nas bikin û li ser kar hakîm bibin. Piştî demekê Kurdên li Heleb û wê derdorê bi awayekî herêmî hêzên Cebhed El Ekrad ava kirin. Bi navê Cebheya hêzên Kurdî bû, lê dê di nava Arteşa Azad tevdigeriyan.

Arteşa Azad ketibû hin herêmên me. Me got, *"hûnê çi bikin?"* Gotin "*hinek hevkarên rêjîmê li wir hene, em ê êrîşî wan bikin*." Operasyon li ser wan çêkirin û hinek girtin. Wisa derbasî wir bûn. Li ser vê dewlet ket êrîşê û bi topan nava Şêx Meqsûd ket. Talan kirin, gel hemû reviya, jixwe berê gelekên wan çûbûn, lê êdî tû kes nema. Gelek mirovên medenî şehîd ketin. Berê jî êrîşên rejîmê li ser Şêx Meqsûd çêbûbûn û gelek mirovên me şehîd xistibûn. Lê li gorî ku tê xwestin bersivdayin nehatibû kirin. Lê vê dorê dema ku lêxistin, me jî lêxist.

Me pir tiştek jî nedizanî. Jixwe deh rojên min çêbûbûn. Di wê navberê de rêveberiya wê derê jî bi me re bû. Hevalê Fuat Efrîn bû, hevalê Bedran Efrîn hebû. Jixwe me cih jî pir nas nedikirin, dora me bajarekî weke deryayekê hebû. Lê me digot, ji ku ve êrîş bikin em ê li wir şer bikin. Bi tanqan hatin û êrîşên xwe berdewam kirin. Me cih nas nedikir û li gorî wê me nedikarî teqtîk bimeşînin.

Di wê derê de rejîmê êrîşî hacizekî me kiribû. Li gel hevalan, em çûn me hacizê xwe dîsa girt. Hin komên Arteşa Azad jî piştgiriya me dikirin. Lê piranî şer nedikirin, di nava wan de hin kesên wisa zîrek hebûn û şer dikirin. Ew leşkerên rejîmê ku êrîşî haciz kirine, di encamê de reviyan û çûn. Şiyarbûna li hemberî hev, hev û din parastin û alîkarî dayina hev û din, di wan kêliyên wisa yên şer de diyar dibû.

Piştî ku me ew der dîsa girt, me nîqaş kir ka em çi bikin. Jixwe gel hemû çûbû. Em bi rêveberiya Efrînê re ketin têkiliyê. Divê me hem aliyê Arteşa Azad, hem jî aliyê rejîmê biparasta. Lê hêzeke me ya tanzîmkirî tune bû. Hevalan gotin, êdî em ê hêza xwe ji Efrîn û nahiyên wê tanzîm bikin û her panzdeh rojan her nahiyeyek dê hêzeke bişîne. Mînak Cindirêse dê bîst heval bişandana, piştî panzdeh rojan dê ew hevalên xwe biguhertina û hinek hevalên din bişandana. Nahiyên din jî dê wisa bikirana. Yanî her ji ser sed hevalî re, quwetên Efrînê li Helebê bûn. Lê pir bi moral û coş bûn. Ciwanên Efrînê mînak bûn. Çawa ku di şerê Serekaniyê de, ciwanên Qamişlo wan deran dihatin û bi awayekî moral tevlê dibûn, ciwanên Efrînê jî wisa bûn.

Sekneke Apoger bû. Nîzamê dixistin, hêzên mûxalîf dixistin. Ango em biçana şehadetê jî bi me re bûn. Piraniya wan jî nehatibû perwerdekirin. Ji ber ew rihê Apoger bû. Dema ku em dibêjin rihê Apoger, tenê ne ji bo kadroyan e. Di ciwanan de, di jinan de, di zarokan de, di îxtîyaran de ew rih hebû. Ew li Rojava me dît. Niha li Rojava malbatên Apoger pir wêrek in. Tu dibêjê qey hemû cîhan pişta wan e. Ne wisa tirsonek û melûl in.

Ew ciwanên Efrînê dihatin, hinekên wan ji ser bînayan re teqle didan xwe û diçûn. Rihekî êrîşê di wan hevalan de hebû. Wê demê şerekî pir dijwar berdewam dikir. Lê dijmin bi kîjan çekên giran hatin jî, van hevalên ciwan bersiv didan. Nehiliştin ku rejîm gaveke jî pêşve were.

Wê demê ji hevalên Kobanê re jî têkilî hate danîn. Wan jî hinek heval rêkirin. Nêzikî pencî hevalî hatin. Quwetên Kobanê û Efrînê her nêzikî sed û pencî hevalî hebûn. Yên din jî hemû quwetên Helebê bûn. Bi giştî nêzî 300 hevalî hebûn. Jixwe gel derketibû. Pir kêm malbatên hevalan û hinek malbatên welatparêz mabûn. Malbata şehîd Ozgur hebû, ew dayik her dihat gel hevalan û moral dida.

Ew meha Avrêlê şerekî pir dijwar li wir berdewam dikir. Jixwe ew hêzên Arteşa Azad hinek bi hev ketibûn, hinek ketibûn derdê dizî ye. Yên ku piranî bi me re di têkiliyan de bûn Ehrar Sûriye bûn. Di şerê nîzamê de me gelek tevdir girtin. Wan tanq didan şixûlandin. Hawan pir diavêtin. Tevdîra tanqan, me dîwar kûn dikirin. Me ew depoyên avê dianîn û didan ber dîwaran û tijî kevir û ax dikirin. Ger tanqê dîwar kûn bikira jî, nedikarî wan depoyan kûn bike. Agir li wan deran diket, xanî dibûn xarebe. Jixwe di navbera me û rejîmê de jî goristanên Ermenî û Sûryaniyan hebûn. Li rûxmî her tiştî me got, em taxên Kurdan bernadin. Heya panzdeh rojan şer bû, lê me li hemberî hemû êrîşan şer kir.

**2- Li Helebê Wane û Taybetmendiyên Şerê Bajaran**

***-Ji vegotinên we yên heya niha em fêm dikin ku şerê Helebê, ji cihê dîtir yên Rojava cudatir e. Hûn dikarin taybetmendiyên wê hinekî vekin?***

Di şerê Helebê de hinek danehevên min yên Serekaniyê hebûn, lê şerê Helebe cûda bû. Divê te şerekî pir bi pergal bimeşanda. Çar aliyên te girtî ne. Carna nîzam êrîş dike, carna arteşa azad êrîş dike. Jixwe arteşa azad jî bi sedan ketîbe ne, ne yek e. Kes kesî guhdarî nake. Baweriya me pê nedihat. Me car caran têkilî danîbana jî, me li hemberî wan her tedbîrên xwe jî digirtin. Dihatin gel me, me nîqaş dikir. Hinekan dixwest tevlî me jî bibin. Lê me nedikarî tevlî xwe bikin. Hem bawerî nedidan, hem jî em hêzeke xeta seyemîn bûn. Me van tiştan bi awayekî zelal wan re jî digot. Me digot "*hûn xeta me û vîna me nasnakin.*" Wan jî digot, "*hûn PKK'î ne.*" Me jî digot, "*fikra Rêber Apo tenê ne jî bo PKK ye, ji bo hemû mirovahiyê ye.*"

Ger me tevlê xwe bikirana, divê me her cebilxaneyên zêde jî bidana wan, jixwe nedikarîn şer bikin. Me bi hesap cebilxane kar tanî, me hevalan re digot, yek bi yek biavêjin. Wan digot, "*hevalên we hemû sekvan in.*" Dijberî wê gelek hevalên me perwerde nedîtîbûn. Çend ketîbên wan digotin, *"em dixwazin tevlî we bibin."* Lê me yek bi yek tevlî xwe dikirin. Lewra bi sedan endamên wan hebûn, ger me nikaribûya serweriya xwe li ser wan çêkira, dê rojeke ew çekan li hemberî me bişixûlandibana. Cihekî weke Helebê jî kontrolkirina wan ne gengaz bû. Yên ku me dizanî li dijî me kar dikin jî, me teşhîr dikirin; hêzên din jî bi wan diketin.

Carna şerê me jî, hin komên wan re çêdibû. Hinekên wan carna cebilxane jî me re tanîn. Nêzikbûna me ya giştî, li ser esasên perspektîfên Serokatî yên Sûriyeya demokratîk bûn, me dixwest wan nêzikî xwe bikin. Hinek ji wan zane bûn jî, paraznameyên Serokatî jî me didan wan. Lê hinekên wan jî tam zilamên Tirkan bûn. Pere û cebilxane bide wan, ti kesî nas nakin. Her kes li pêy berjewendiyên xwe yên şexsî ketibû. Dema ku ew çeperên xwe yên tanqan me nîşanî wan didan, didîtin ku em di hemû çeperan de bi cih bûne, digotin "*hûn di şer de cîdî ne.*" Pişt re jî diçûn, propagandaya me dikirin.

Ango ji aliyê Arteşa Azad ve, ew bingeh heye ku mirov gelekên wan bikşîne aliyê xwe. Jixwe di stratejiya Şoreşa Rojava de li hemberî wan şerkirin tune bû. Lê yên ku bihatana ser me jî, me lê dixist. Digotin, "*em ji Şêx Meqsût re êrîşî dijmin bikin,*" me nedihêlişt. Me digot, "*biçin aliyê xwe êrîş bikin.*" Lê carna navberê re diçûn. Ji ber vê me her cih kir çeper û me nehilişt ku tû kes derbasî wan deran bibe. Dema ku şerê me û rejîmê xilas bû, êdî gel jî dizivirî, carna wan jî dixwest nav gel de bikevinê, lê me nedihêlişt. An na me nedikarî em Helebê biparêzin. Bi vî awayî hêdî bi hêdî me çepêrên xwe çêkirin, her cih girt ewlehiyê.

Êdî danehevên hevalan jî çêdibûn. Dema ku me komekî çar hevalan dixist cihekî; me digot, "*hûnê derî û pencereyan bigrin, pişte re sîxûreyên xwe vekin.*" Jixwe li gel her komekî jî balyoz hebû. Êdî pirsgireka me ya cebilxaneyê jî nemabû. Dihatin kirîn. Me kirîna cebilxaneyê qet nedisekinand. Di şerê bajaran de guleyên BKC û yên qilêşê, narîncok û roket pir pêwîst dikin. Me têra xwe dikirîn. Arteşa Azad diçû didizî, me jî ji wan dikirî. Ji bo ku kes nizanibe di destê me de çiqasa cebilxane heye, me ji cihên cûda dikirî.

Me her komek li cihekî bi cih kiribû. Me wisa Şêx Meqsûd dorpêç kiribû ku dema tenê mîrovek jî bikeve hûndir, me dîdît. Jixwe me nedihêlişt ku her kes têkeve. Hevalan pir kar dikir. Ger çeperek ne ase be, heya ku hevalan ew ase nedikir ranedizan. Çeperên wisa ase bibûn ku BKC û roketan nedikarî birûxînin. Me di dîwaran de gelek kûn vekiribûn, da ku kûnên esasî ku em tê re dikevin pevçûnê nebin hedef. Hin cih bizanebûn me reş dikirin, da ku weke kûn xûya bibin û sekvanên dijmin xwe şaş bikin.

Heya ku destê mirov tê, divê mirov çeperên xwe di banê yekemîn yê xanî de çeneke. Da ku guleyên tanq û hawanê tesîr nekin. Divê çeper jî di hûndirê xanî de bin. Hinek hevalan diçûn li ser xanî çeper çêdikirin, hawan dihat û hema ew çeper îmha dibû.

Dîsa ji aliyê agahî û têkiliyan ve me pergaleke xurt çêkiribû. Gelek cîhazên me hebûn, her komek cîhazek hebû. Me, heval her hişyar dikirin. Carna heval xew ve diçin, an tiştekî din çêdibe. Tevdîrên me ji wî alî ve hebûn. Hemû hêz jî li derdora hev û bi awayekî çep û rast bi cih kiribûn. Divê her tîmî jî, tîmên din yên çep û rastê xwe nas bikirana. Dema ku li hember êrîşek dihat hema hevalan ji her cihî bersiv dida, nedikarî bisekinin. Ango nedikarîn hêza xwe bidin ser tîmekî û wan tengav bikin.

Di hin kolanan de divê perde bên danîn û her teqeziya wê bawer bê. Lewra tu dikarê rehet tevbigerê. Carna dijmin jî perde datanîn, me digot *"gelo çi dikin?"* Lewra tu êdî nikarê tevgerên wan bişopînê. Me perde pir bilind jî nedikirin, du metro datanî û em ber re dimeşiyan. Lê dema ku kolan pir dirêj be û yek dûr ve meyze bike dikare te bibîne. Ji ber vê di kolanên dirêj de divê perde bilindtir bin. Perde di şerê bajaran de pir stratejîk e. Berî ku em perde dînin, me gelek birîndar û şehîd dan. Lê piştî perdeyan, ew pir kêm bûn. Dema roj çû ava perde bên vekirin, ger roja din xirab bibe; divê tu êvarê dîsa çêkê. Hinek hevalan perde danetanîn, digotin "*fîşek tê re diçin."* Lê te perde datanî, dijmin çend seatên destpêkê fîşek diavêtin, meyze dikirin ku bê feyde ye. Êdî disekinîn. Dema ku mirov perde danî, divê çend seatên ewil mirov bikar nîne. Êdî çiqasa diavêje, bila biavêje. Tu cebilxane têrî wê perdê nakin ku her biavêjinê.

Divê şerê bajaran de qernesên te hebin. Divê dûrbîn hebin. Ger tu dûrbînê bidê ser qarnasê û bûrino, baş rista xwe dîlîzin. Hinek bûrino hebûn, hem fîşekên qarnasê dixwarin, hem jî fîşekên G3'ê dixwarin. Ew pir dihatin karanîn û rista xwe jî dîlîstin. Mirov bikare dûrbînê bide ser qileşê û li gorî wê araste bikê, pir baş e. Şerê bajaran de çekên bi dûrbîn risteke mezin dîlîzin.

Narîncok jî pir girîng in. Şerê bajaran de pir tên karanîn. Lê narîncokên destan pir biha ne, tu nikarê bikirê. Ji ber vê me narîncokên bi fîtîl kar dianîn. Te dikarî hûndirê wê dagrê û fîtîlê têxê. Lê divê di karanîna wê de mirov şiyar be. Divê fîtîl pir qût nebe. An na tûyê di xwe de biteqînê. Mesela di hevalekî de teqiya, agir pê dixe û navêje, dide sekinandin. Wisa di wî de diteqe. Em carna dibêjin, dibe ku dijmin dîsa biavêje. Lê dijminekî me ku ew qesa wêrek tine ku biçe ser wê narîncokê û dîsa biavêje. Divê piştî ku te fîtîl pêxist, tu 7-8 saniyan bihêjmêrê û biavêjê. Beriya ku tu narîncokan çêbikê, dikarê fîtîlan biceribînê jî. Mesela fîtîlekî deh santim, çend kêliyan de diteqe diyar e. Carna jî hevalan fîtîl kin çêdikirin, heya ku diavêtin li hawayê diteqiya. Divê mirov van tiştan tanzîm bike. An na em nikarin her tim bombeyên din bikirin. Cihê ku tu bombeyekî bikirê, tu dikarê deh bombayên bi fîtîl çêbikê. Ji vî alî ve divê em pergala xwe pêş bixin.

***-We qala danehevên şerê Helebê kir. Ev danehev we ji bo ciwanên ku nû tevlê bûne çawa vediguhest? Perwerdehiyên we yên leşkerî ku di şêwaza akademiyan de dimeşe hebûn?***

Jixwe li Helebê gelek wan hevalên ciwan jî bi bîryar bûn û tevlêbûn. Dema ew coş, kelecanî û moral derdikeve; her tişt pêk tê. Lê divê yên ku vê dîsîplîn bikin û tanzîm bikin hebin. Perwerdekirina hêzên Helebê bi pratîka wê çêbû. Hemû di nava pratîkê de perwerde dibûn. Xeynî wê derfetên perwerdeya bîrdozî tune bûn. Lewra em her di nava şer de bûn û her êrîş li ser me hebûn. Li Helebê heft mehan şer nesekinî. Serî carê yekî êrîş dikir. Di nava şer de jî her çeper çêdikirin. Mesela li Serekaniyê hevalan xerebeyek çêdikirin û digotin em westiyan. Lê Helebê dema ku me tîmekî re digot, "*xerebeyekê çekin.*" Sê heb çêdikirin, penc heb çêdikirin. Heya ku çeperên xwe ase nekirine sebra wan nedihat. Bi coş û kêfxweşî çêdibû. Dema diçûn cihekî din jî, her hevalek di serî de çeperên wir careke din ber çavan re derbas dikirin û ase dikirin.

Di van mijaran de û ji aliyê yek bi yek fîşek avêtinê ve divê mirov hevalan perwerde bike. Lewra di şerê bajaran de fîşek pir diçin. Divê fermandar, li ser vê hakîm be. Divê fermandar bi her alî ve li ser şervanên xwe hakîm be. Divê her di nava wan de be. Divê rojane di nav quwetan de bigere, moral bidê. Mesela quweta Helebê tû perwerde jî negirtibû. Lê bi demê re danehev çêbûn. Di nav de fêr bû. Dît ku çawa êrîş tên, çawa zehmetî tên kişandin. Li hemberî wê tevdîrên xwe girtin û wisa bû xwedî danehev. Rista hevalan di vir de pir e. Hem moral dide û motivasyon dike. Hem jî danehevan pêş dixe.

Dema ku şer destpê kir, divê teqez qatê binî nobedar hebin. Ger bi aweyekî veşartî were, dîwarekî xirab bike û bikeve hûndir, dê tuyê tasfiye bibê. Li Helebê şaştiyek wisa çêbû. Dijmin piştê re dîwar kûn kiribûn û ketibûn hûndir. Me carekê re dît ku heval dibêjin di hûndirê bînayê de ne. Êdî me got *"bi bombeyan lêxin."* Divê hema derbixistana, lewra donzdeh heval di hûndir de bûn û qarnas jî li ser wan bû. Me jî ji aliyê xwe ve pir dijwar lêxist. Me cîhazên dijmin guhdarî dikirin, digotin *"em tengav bûne."* Hinek moralê wan jî ketibû, lê me moral jî daye. Hevalên din ku cîhaz guhdarî dikirin, digotin *"em ê biçin!"* Lê me nehilişt, lewra di wê kêliyê de kî biça dê şehîd biketa. Me ser cîhaz jî hinek şer meşand, me got, em bi hêzên mezin tên. Me hinek fîşek jî diavêtin wê bînayê, lê

me hevalan re digot, *“em diavêjin”* Da ku xwe ji aliyê me jî biparêzin. Piştî demekê hevalan di hûndir de got, “*kes bînayê de nemane û çûne.*” Wê demê hevalê Zinar şehîd ketibû. Êvarê me heval ji wir derxistin.

Divê tu nehêlê dijmin bikeve qatê biniya te, ji bo vê jî divê tu her qatê binî jî biparêzê. An na dikare mayinan bike bînayê, dikare agir berdê û bi dûmanê te bêzar bike. Divê mirov nebêjê derî û şibake girtî ne, dikarin dîwar jî kûn bikin. Ji ber vê jî divê tu li gorî wê tevdîrên xwe bigrê. Divê bi qeyîde û dîsîplîn tevbigerê. Mesele şibakeyên hene; divê qatê jêr teqez bên girtin, lê qatê jorî jî divê perde bên danîn.

Ger di hûndirê bînayekê de tu tevdîrên xwe baş negrê, bi dehan heval nikarin wir biparêzin. Lê ger tu baş tevdîrên xwe bigrê çar heval bes dikin. Hinekên wan dê nobedar bin, hinek jî bikevin pevçûnê. Lê divê cebilxane jî li gel wan hebe. Mesela li cihekî di bînayekê de sê heval hebûn, dijmin bi hejmareke zêde hat. Tekbîr dianîn û gule direşandin. Lê ji ber ku heval bi tevdîr bûn, bombeyek avêtin ser wan û çend gule bi kontrol teqandin hemû reviyan û çûn. Divê mirov qûralên şer pêk bîne.

**3-Li Heleb’ê Êniya YPG-YPJ’ê**

***-Li Helebê komên ku hûn weke çete, an jî mûxalîf bi nav dikine jî hene. Ya yekemîn li gel van koman têkiliyên we çêbûn? Ya din jî hûn dikarin hinekî qala şerê xwe û van koman bikin?***

Van komikên mûxalîf vîna me qebûl nedikirin. Tirkan jî ew dahf didan, digotin “*ew çawa li wir dimînin*.” Di meha hazîranê de hatin û tevlîhevî çêkirin. Hevalên me yekî wan xistibûn. Dema ku mirov di nava quwetan de ne hakîm be, nêzikatiyên wisa şexsî jî derdikevin. Divê mirov her şiyar be. Pişt re hevalan gotin “*me mesele hal kiriye.*” Lê yekî wan tê xeberan dike û yên me jî wî birîndar dikin. Em jî ew cihê bûyerê kombûn, tabûrek heval li wir bû. Me got em hêzên asayişê li vir bikşînin û YPG bi cih bikin. Me dît bi çend maşîneyan ji wî alî ve tên, lê hevalan gotin “*dê ew ê derbas bibin*.” Maşîneya doçqa hat, gel me sekini. Me got, “*hûnê ji kû ve biçin?”* Bi wê yekê re dest bi gulebarindinê kir. Me hema xwe avêt ber dîwaran.

Êdî me heval li wir kirin çeperan û nehilişt pêş ve werin. Jixwe ew hêrem jî me pir nas nedikir, piranî şerê me li aliyê din bibû. Dema ku wê maşîneyê gulebaran kir, hevalê Loqman şehîd ket. Sê heval jî ketibûn destê wan. Hevalê Xelîl, hevalê Botan ku fermandarê tabûrê bû û hevalekî ciwan jî birîndar dibin û dikevin destê wan. Pişt re hevalekî din jî şehîd ket. Hinek hêzên mûxalîf a cuda re me got, “*gelo rast e ku hevalên me ketine destê wan?”* Hema çûbûn meyzekiribûn ku her sê heval li nexweşxaneyêne, ew girtibûn û biribûn li Efrînê radestî hevalan kiribûn. Wisa şerê me û wan destpê kir.

Me jî hinek darbe li wan xist û ew hacîzê ku ketiye destê wan me ji wan girt, me hinek ji wan dîl girtin. Me hinek cebilxane li ser wan rakir. Cihê nexweşxaneya me jî ketibû destê wan, ew der jî pişt re hate girtin. Wisa di çend rojan de me ew ji hêremên xwe derxistin û darbeyek mezin jî wan xist. Lê êdî me ji vî alî ve tevdîrên xwe jî xurt kirin. Wisa giraniyeke me jî li Helebê çêbû, êdî her kes nikarî xwe bide ser me.

Dema ku şer çêdibû, hevalên asayîşa me jî diketin çeperan û şehîd jî diketin. Fedakariyek hebû. Endamên me yên meclîsê jî diketin nava şer. Di navbera hêzên me de hevgirtinek jî hebû. Êdî gel jî dihat û tevlî şer dibû. Piştî şerê nîzamê û ew şerê dawî êdî pir kesî nedikarî êrîşî me bike. Hinek gef dixwarin, lê nedikarîn ji wê derbas bikin.

Careke jî DAIŞ hat, gelek cihên Helebê girtibûn. Gotin em ê ji hêremên we re derbas bibin, me jî got na. Êdî me rest kişand, me digot, “*hûn pir gef bixûn jî dê em ê şer bikin.”* Me li hemberî wan jî çeper girtin. Me hêzên xwe tanzîm kirin. Jixwe êdî hêz xurt bûbûn, bi dîsîplîn bibûn. Gel jî bi vê moral digirt. Hêzên me jî di nava şer de pijiyabûn. Çi peywir derdiket hema pêk dihat.

Ger pîvanên me yên giştî tunebana, tenê bi pratîkê xebat bi awayekî serkeftî nameşin. Me panzdeh rojan careke dewreya hevalên YPG dardixist. Ji aliyê me ve jî pir zehmetî dihatin kişandin. Lêhûrbûna me hemû li ser şer û çeperan bû. Te nedikarî hem bi perwerdê re, hem bi alaqadarbûna hevalan re û hem jî bi çeperan re mijûl bibê. Ango ji aliyê pirgirekên rêxistinî ve cih bi cih kêmasî derdiketin. Lê aliyê parastina qadê ve astek derketibû. Piştgiriya derve jî carna çêdibû, carna jî çênedibû. Lê me perspektîfên Serokatî esas digirtin.

Di çûyin û hatina Efrînê de her li ser me planên dijmin hebûn. Carna komikên El Nusra milet li ser rê digirt. Astengî derdixistin. Dixwestin teqwiye ji me re neye. Ew ketîbên Tirkmen ku Tirkiye ew araste dikirin, her pirsgirek derdixistin. Hin partiyên din yên Kurd wî hema dijminahiya me dikirin. Carna şerê me jî dikirin.

Careke di meha dehan de, hevalan xeber dan me ku hevalê Îsmaîl dîl girtine. Hevalê Îsmaîl xebatkarê çand û hûnerê bû, lê hemû hevalan şer dikir. Hevalê Îsmaîl bi maşîneyê ji nav hacizên wan re diçe cihekî, wî digirin, dixin paşiya erebê û dibin. Dema ku me bihîst, me jî nêzikî bîst û penc heban ji wan girtin. Me got, heya ku hevalê me bernedin em jî vanê di destê xwe de bernadin. Heval Îsmaîl gelek şikence dîtîbû. Jixwe hevalekî bi çavekî bû. Piraniya hevalan di kîjan xebatê de dibe bila bibe, di nava şer de bûn. Kesekî Apoger li cihekî be, kîjan karî dike bila

bike, ger êrîşek hat divê hemû bibin yek û bersiv bidin. Hevalê Îsmaîl, hevalekî her kar dikir bû. Bi vî awayî me ew jî rizgar kir.

Ji bo çûn û hatina Efrînê, me ji berê vê hevalan re gotibû ku ew çûn û hatin xeter e. Ji bo vê zextan li me dixwin, gel bêzar dikin. Me digot, ger hevalê vir mayinde bin û pir çûn û hatin çênebe baştir e. Lê wisa nebû. Careke dihat girtin, careke dihat vekirin. Em ne rehet bûn. Di kîjan kêliyê de çi bibe, ne diyar bû. Careke komeke çeteyan, 25 hevalên me li ser riya Efrînê girtibûn. Me digot, "herî zêde hejdeh kes in." Lê piştre diyar bû ku bîst û penc heval in. Me got, "*we çima girtine hevalên me?"* Digotin, *"me negirtiye."*

Planên wan dorfireh bûn. Digotin "*werin gel me, em nîqaş bikin."* Dixwestin me jî bigrin û radestî Tirkan bikin. Di wê navberê de, heman komikan êrîşî Cebhed El Ekrad kirin. Me jî kesên wan digirtin. Me sî û şeş heb ji wan girtin. Dema dipirsîn, me digot xebera me tine. Wê demê quweta Cebhet El Ekrad jî gelek cihan darbe xwaribû û li cihekî kêm quweta wan mabû, gef li wan dixwarin ku wê derê jî berdin. Bi vî awayî hêzên hemberî me amadekariyên êrîşê dikirin. Me jî amadekariyên xwe kirin. Careke re êrîş kirin.

Dema van ketîbên Arteşên Azad êrîşî Cebhed El Ekrad kirin, rewş cîdîtir bû. Sêzdeh tûgayên cûda bi hev re êrîş kiribûn. Jixwe hevalên Til Eran, Til Hesil û Babê tasfiye kiribûn. Quwetên mayî jî dixwazin tasfiye bikin û bere xwe bidin me. Jixwe şervanên Cebhed El Ekrad, xwe baş tanzîm nekiribûn. Di serî de derketineke wan ya baş çêbû, lê piştre pir bê dîsîplîn bûn. Her yekîneyek şandibûn cihekî. Di serî de baş bû, malbat li dora xwe kom dikirin û ew diparastin.

**4-Li Helebê Bênavber Şerê 22 Rojan**

Di navbera me û Cebhed El Ekrad de, hin têkilî û îtîfaq hebûn. Dema wan çeteyan li ser quwetên mayî yên Cebhed El Ekrad ve jî çûn û gef li wan xwarin. Me got, cihê xwe dernekevin, dema ku êrîş kirin xeber bidin me. Jixwe me jî hinek amadekarî kiribûn. Jixwe li hemû hêremên Şêx Meqsûd me çeperên xwe xurt kiribûn. Ber êvarekê re gotin, êrîş kirine. Me jî hevalan re got, *"we kîjan ji wan dît lê bixin."* Gelek cihan hevalan lêxist.

Wî şerî 22 rojan ajot. Di serî de Ehrar El Şam, gelek ketîbên wan tevlî vî şerî bibûn. Me cîhazên wan guhdarî dikirin, mirov dizanî ku quweteke mezin e. Ew Kurdên xayin jî di nava wan de bûn. Ew partiya azadî, Ehrar El Efrîn wan bûn. Şer pir berfireh bû. Ji sê aliyan ve hatin. Me got, êdî em ev şervanên Cebhed El Ekrad, ji cihên wan derxin û wan biparêzin. Jixwe heya ku bû êvar heft şehîd dabûn. Lê êvar xwe gihandin me. Me xetek ji hatina wan re vekir. Jixwe şeva ewil, hinek cih negirtibûn. Lê rojên din wan cihên din re jî êrîş kirin.

Li cihekî hacîzek hebû, me hevalên rêxistina ciwanan li wir bi cih kiribûn. Wê derê re digotin, taxa Maşûqê. Hevalê Tolhildan li ser wan hevalan disekinî. Ew jî hevalekî di xebatên ciwanan de bû. Dîsa çend hevalên YPG û asayişe li wir bûn. Em ji cîhazê fêrbûn ku dixwazin êrîşî wir bikin.

Dema ku şer giran bû, me heval Tolhildan wan re got, xwe amade bikin, da ku hûn di seat donzdehan de lêxin. Cihekî dijmin hebû, jixwe hema biniyê wan re bû, me got bi narîncok û B7'an lêxin. Wan digot, em ê dûdûyan de lêxin. Lê me donzdehan de lêxist. Hevalan heya çarê sibê lêdixistin û ketin cihê wan. Me cîhazê wan guhdarî dikir, qîre wîra wan bû. Piraniya wan reviya. Her ku wan cîhaz de qîr dikirin, me hevalan re digot lêxin. Me maşîneyek wan îmha kir. Hawan û gelek cebilxaneyên wan me girtin. Bi zorê cenazeyên xwe girtin û reviyan. Hevalan cihê wan girtin.

Dijmin gazî ketîbeyek din dikir. Ew ketîbe jî li hemberî hacîza hevalan bû. Lê ew kesên ku li Serekaniyê bi me re şer kirine û piştre berdane û çûne bûn. Berê jî me re gotibûn, "*em şerê Kurdan nakin."* Gotin, "*me careke kiriye, lê ne rast bûye."* Dema ku dijmin derbe xwar û gazî alîkariyê dikirin wan jî bersiv didan, digotin *"me ji we re negotiye nekevin nava vê meseleye de? Çi karê te bi wan hebû."* Ango poşman bibûn ku bela xwe li me dane. Bi vî awayî şer li her sê aliyên Helebê belav bû.

Di vî şerî de, roja destpêkê heft hevalên me şehîd ketin. Heft jî şervanên El Ekrad şehîd ketibûn. Ew şehadet jî ji ber bêdîsîplîniyê çêbibûn. Rast e, dijmin pir dijwar êrîş dikir, lê sedema şehadetan xurtbûna dijmin nebû. Dema ku wisa şehadet jî dihatin jiyankirin. Hevalên Efrînê êdî nedikarîn xwe bigrin. Gotin em ê hevalan bişînin. Hevalê Ehmed, Sîdar, Şiyar, Avereş şandin. Hevaltiya Apoger wisa bû, di wan şert û mercên zehmet de gotibûn, "*çi dibe bila bibe em ê xwe bigihînin Helebê."* Her hevalek li ser tabûrekê bû, hevalên zîrek bûn. Bi hin hêzên mûxalîf re ketibûn rê. Rê de hatin girtin. Dibe ku komplo jî çêbibe. Êdî em nizanin, çi jî bûn. Hê jî winda ne. Bi vî rengî 29 hevalên me di destê wan de dîl man. Me jî 36 heb ji wan girtibûn.

Di şer de me nehilişt pêşve werin. Her çi qes ji her alî ve êrîş dikirin û her cûre çek bi kartanîn jî nikarîn pêşve werin. Li xeta Şiqêf jî maqarek wan hebû, me êrîş kir û ew der girt. Li wir jî çend heb maşîne û hinek cebilxane bi dest me ket. Ew derdora cihê newrozê me hinek cih ji wan girtin.

Vî şerî wisa 22 rojan berdewam kir. Hinek hevalên me jî şehîd ketin. Mesela hevalê Gulo hebû, hevalekî pir xurt bû. Di şerê Serekaniyê de jî hebû. Piştre hate Helebê. Cihekî ew şer dikin, nêzikî bîst hevalan jî gel hebûn. Sê-

çar heval dixwazin cih biguherînin, da ku hinek hevalên din wan cihê wan û ew jî bêhna xwe bidin. Heval dibêjin, "*ji xereqê re biçin*." Lê ew heval ji ber ku li kolanan perde hene, ji kolanan re diçin. Lê dijmin ji dûr ve bi qarnasan wan dixe. Weke berê jî me got, dema ku perde ne bilind be, qarnas ji dûr ve kolanê dibîne. Hevalê Nuredîn Gulo wisa şehîd ket.

Hevalê Dersîm hebû, dema ku nobeta wî xilas dibe, dixwaze biçe cihê xwe. Lê ser xanî hawanek tê li wî dikeve û ew jî wisa şehîd dikeve. Hevalê Gîvara hebû, diçe ser xanî. Di şerê bajaran de mirov nikare biçe ser xanî. Ji hemû êrîşan re vekirî ye. Ew jî li ser xanî, bi guleya doçqa birîndar bibû. Ji ber ku derfetên dermankirinê tune bûn, şehîd ket.

Jixwe li Helebê derfetên me yên dermankirinê qet tune bûn. Rê girtibûn, bijîjkên Şêx Maxsûd jî hemû ji wir derketibûn. Hevalê Ebû Dara hebû, endamê meclîsê bû. Lê gel hevalan diket şer. Serê xwe ji ser çeperan re derdixe û sekvan wî dixin. Ew jî wisa şehîd ket. Dema ku şer berdewam dikir, ew şehadet hatin jiyankirin. Hevalên birîndar çêdibûn, lê me nedikarî em bişînin derve. Yên ku birînên wan giran bûn, şehîd diketin. Çend hevalên birîndar, wisa di wan riyan de şehîd ketin. Pişt re me şandina hevalên birîndar qedexe kir. Hinek hevalan jî, destê wan û lingên wan şikestibûn û şaş hatibûn girêdan. Piştî şer sekinî, me ew heval şandin Efrînê.

Tiştê ku em ditirsiyan, me digot dibe ku cebilxaneya me xilas bibe. Ji aliyê din ve ti fikarên me tune bûn. Hevalan baş şer dikir. Dijmin her quwetên xwe diguhertin, lewra pir israr dikirin ku me ji Şêx Meqsûd derxin. Dizanîn ku rê girtîne û ji me re ne cebilxane te, ne jî taqviye tê. Hin ketîbe hinek cebilxaneya xwe dida me. Me digot, "*dibe ku ew jî ji me bizivirin û êrîşî me bikin.*" Me ji wan bawer nedikir û me tevdîrên xwe li hemberî wan jî digirtin. Lê wan bi awayekî veşartî cebilxane ji me re dianîn. Dixwestin em yên din bidin.

Piştî demekê wanê ku şerê me dikirin, xwestin hevdîtin bikin û şer bidin sekinandin. Wisa hinek ketin navberê û şer sekinî. Em çûn da ku cihê sînorên di navberê xwe de diyar bikin. Hinek endamên Ehrar El Sûriye gel me bûn, endamekî wan ketîbên ku şerê me dikin jî li gel me bû. Wan qarnas avêt û endamekî Ehrar Sûriye xistin. Pişt re jî gotin, "*bila bibe şehîdê aşitiyê.*"

Li ser esasê hevkirinê me dikir ku em dîlên di destê xwe de jî biguherînin. Wê navberê de ew hevalên me yên ku di destê wan de, nozdeh heval reviyan. Hevalan xeber dan me, gotin hevalan xwe gihandiye me. Tenê hevala Binevş û 6 heval di destê wan de mane. Hepsê de pir rastî lêdanê jî hatibûn. Lê dema ku firsend dîtibûn reviyabûn. Me got, divê hûn wan hevalên me jî bînin. Ew jî anîn. Lê hevalê Ehmed û ew sê hevalên din nedan. Digotin "*ne di destê me de ne.*" Hincet ava dikirin. Dibe ku dabin Tirkiye jî. Dewsa hevalê Ehmed wan, me deh endamên wan di destê xwe de hiştin.

***-Êrîşên DAIŞ'ê li ser cihên ku di bin kontrola we de ne çawa pêş ketin?***

Piştî mehekê şunda DAIŞ êrîş kir. DAIŞ êrîşî Xal Heyanê kir. Riyên wir hemû girtin û wir ket tengasiyê. Ew hêzên wir hene, nedikarîn bi me re şer bikin. Lê DAIŞ'ê dixwest wan ji wir derxe û bi me re şer bike. Jixwe DAIŞ'ê gelek der girtibûn, ew der jî bigirta em diketin dorpêça DAIŞ'ê. Hevalan jî gotibû, "*Xal Heyanê re bila têkiliyên we hebin.*" Xal Heyanê jî got, *"em heyranê Kurdan e. Arteşa azad me xwedî derneketin, lê Kurd bêjin çi em ê wisa bikin."* Poşman bûn ku li hemberî me şer kirine, partiya wan ew jî nava xwe avêtin. Me hinek cebilxane da wan û me got, "*em alîkariya we dikin.*" Lê me got, "*heval Ehmed wan bidin me.*" Gotin, *"hepsa me ketiye destê DAIŞ û hemû birine.*" Carekê jî malûmat hat û gotin, *"di destê El Nusra de ne."* Bi vî awayî me nikarî em agahî ji hevalan bigrin.

Di vê navberê de DAIŞ'ê êrîş kir, me êrîşên wan jî sekinandin. DAIŞ'ê jî xwe ceriband û ew jî sekinîn. Jixwe Arteşa Azad jî nikarî bi me re şer bike. Wisa çar mehan şer sekinî. Em hinek pêşve jî çûbûn. Cihên ku ne di destê me de bûn jî, me girtin. Ew cihên ku me nû girtine jî me çepêrên xwe xurt kirin. Me rêkên bin erde çêkirin. Ew xet me weke kelehan lê anî. Derdorên Şêx Meqsûd weke kelehan bûn.

***-Piştî ku şer û pevçûn sekinîn, gel vegeriya?***

Rast e. Gel jî vedigerî, di wê navberê de nêzikî 10-15 hezaran gel hat cihên xwe. Moralê gel jî bilind bibû. Êdî dema ku êrîş dibûn, gel nediterikand. Alîkariya birîndaran dikirin, şehîdên xwe xwedî derdiketin. Me li wir newroz pîroz kir. Hevalên me jî moraleke mezin girt, êdî digotin, "*kî were ser me jî nikare me têk bibe.*" Baweriyeke xurt derketibû holê.

Di sal û nîvekê de me bîst û çar şehîd dan. Jixwe beriya me, heft heşt heval li Eşrefiyê şehîd ketibûn. Di dema ku ez li wir bûm, bi giştî nêzikî bîst hevalan şehîd ketin. Di wê navberê de tabûrên me hatin avakirin. Tabûra şehîd Gîvara hat avakirin. Tabûra şehîd Zinar hat avakirin. Dema ku heval Zinar şehîd dikeve, hevalekî din ji bo ku wî rake şehîd dikeve. Hevaltiyeke wisa hebû.

Bi kûrtasî bi berxwedaniyeke wisa Şêx Meqsûd hate parastin. Di şerê Helebê de, carna dixwastin me û rejîmê bidin şer kirin, me qebûl nedikir. Carna Îranî bi me re diaxifin û dixwestin me li hemberî mûhalîfan bidin şer kirin, me qebûl nedikir. Ango her çiqas her alî ve zext hebin jî, hêz û sekneke me hebû. Quwetên Helebê vînek nîşan dan û ew der parastin. Gel jî dema ku dît, li hemberî hemû bê derfetî û dorpêçan em ber xwe didin; baweriya xwe bi me dianî.

Di encamê de quweta Helebê, di şerê bajêr de teqtîkek girt û van hevalan rista xwe lîstin. Danehevek çêbû. Hinek heval jî derbasî Kobanê bûn û li wir rista xwe lîstin. Gel jî rista YPG dît û xurt kirin. Carna hevdu fêmnekirin çêdibû, lê dihat derbas kirin. Hem asayiş, hem YPG hate mezinkirin. Hem meclîsên me, hem meclîsên hevpar hatin avakirin. Wisa parastin û xebatên Helebê astek girtibû.

Wê serkeftinê hişt ku gel jî bizivire cihê xwe. Diyar bû ku; ger quweteke bi dîsîplîn, bi moral û bawerî hebe, quwet ger hişyar be, quweteke cebilxaneya wî hebe, dê kî were ser wan jî nikare wan têk bibe. Ew di Helebê de hat îspatkirin. Tabî kêmasiyên me yên rêxistinî jî çêbûn, ew jî mijara rexnedayinê ye. Lê Heleb dikare bibe mînakek xweseriya demokratîk. Bibe mînakek biratiya gelên weke Kurd, Ereb û Ermenî. Ger mirov xebatên wir xurt bike, dê ew yek jî pêk were. Têkoşînek hebû, lê hê jî pir kar pêwîst dike. Ji aliyê leşkerî ve astek hebû, lê ji aliyê din ve kêmasî hebûn. Divê ji van aliyan ve xebatên xurt bên pêşxistin.

***-Li Helebê, di nava wî şerî de tiştên wisa balkeş û li ser we tesîr kirine hene?***

Gelek tişt hene. Ez dixwazim bîranîneke bibêjim. Hevalê Xemgîn hebû. Hat li Kobanê şehîd ket. Me careke re dît ku rêjîmê hacîzê me xist. Hem teyarê dûr ve diavêt, hem jî tanqan lê dixist. Ew der wisa hinek hewşên valabûn. Hinek dar hene. Dema ku êrîşên ewil li wir çêbûn, di serî de hevalê Rênas şehîd ket. Jixwe li hemberî wan li ser bînayan hêzên rejîmê hebûn. Donzdeh heval li wir ber dîwarekî xwe wisa dirêj dikin, yek bi yek sekvan li wan dixin. Sê heval birîndar bibûn.

Hevalekî li ser cîhaz dibêje, heval zû me xilas bikin. Em çûn ku donzdeh hevalan wisa xwe ber dîwar dirêj kirine. Berî me hevalê Zekeriya çûbû. Ew jî endamê meclîsa YPG bû. Wî hevalî dîwar kûn dikir ku hevalan rizgar bike, lê wisa cihekî bilind de dîwar kûn kiribû û xwe jî ber wê kûnê sekinîbû. Sekvanan ew jî birîndar kiribûn. Me hinek meyze kir ka sekvanên dijmin li ku bi cih bûne. Wan hevalan re jî me got, “*kes seriyê xwe ranekin em ê we xilas bikin.*” Hevala Gulan hebû, ew jî di nav de bû û ji seriyê xwe birîndar bibû. Ji kelekê re, me kûn vekir û me yek bi yek derbasî hûndir kirin.

Dema ku dijmin pêhesiya dîsa gule avêtin. Lê dîsa jî me ew heval xilas kirin. Ger em negihêştibana, dê ew heval rabûna ser xwe û hemûyê şehîd biketana. Wê demê, dema ku dengê pevçûnan diçe ew hêzên arteşa azad ku roja ewil me bi hev re êrîşî rejîmê kiriye, ew jî hatin. Wan jî aliyekî re êrîşî dijmin kirin. Jixwe çandek wan jî heye, pir zêde cebilxane dişûxûlînin. Toz û dûman rakirin. Hevalên me jî nesekinîn û pevçûneke pir dijwar li wir çêbû. Bi vî awayî me ew heval xilas kirin. Jixwe em ji ew cihê ku dijmin lêdaye, nesekinîn. Hevalê Rênas û hevalê Zekeriya jî li wir şehîd ketibûn.

Piştî dû rojan me dît ku alek li ser ew hacîza me ye. Hevalê Xemgîn çû û ew al rakir. Pişt re heval Xemgîn li Kobanê şehîd ket. Hevalekî YPG bû, xwendekar bû, pir wêrek bû. Di şexsê Şehîd Xemgîn de em dikarin bibêjin ciwanên Helebê pir zîrek bûn. Ji ber ku bawerî girtibûn, me digot çi dikirin. Dema ku me talîmat dida, heya ku ew karê xilas nekirana ranedizan. Danehevên hevalên Helebê wisa çêbûn. Me dît ku derdorên me hemû hatine girtin, çûn û hatin tine; em neçar man ku çeperên xwe xurt bikin û Helebê biparêzin. Danehevên me jî wisa çêbûn.

# BEŞA PENCEMÎN
# ENCAM Û PEYAM

***Şoreş, dîlana gelan e!***

***-Herî dawî tiştekî ku hûn dixwazin li vegotinên xwe zêde bikin, an jî peyamên we hebin, em dikarin bigrin.***

**ADIL QAMIŞLO:** Li gel pirsa we, ez dixwazim di şexsê hevalê Xebat de, hinekî behsa hevalên şehîd jî bikim. Serfermandarê YPG ye. Di demeke ku hê rejîma Sûriye li Rojava serwer bû û nedihilişt Kurdek nefes bistîne de; bi kedeke mezin ciwanên Kurd perwerde kirin, wisa tîm bi tîm rêxistin kirin û gihand quweteke weke YPG. Gelek hevalên ku niha fermandariya YPG dikin jî, ji aliyê hevalê Xebat ve hatine perwerdekirin. Gund bi gund geriya ye, bajar bi bajar geriya ye. Her ciwanekî re yek bi yek axifiye, da ku wan tevlî parastinê bike.

Wê demê tû derfet jî tune bûn, çek jî tune bûn. Lê ji ber moral, hêz û rihê Apoger yê heval Xebat kîjan ciwanî ew dîtiye jê bandor bûye. Niha jî gelek hevalên di nava YPG de ne, hevalê Xebat ew beşdar kirine û perwerde kirine.

Hevalê Xebat, ciwanekî Kurd ku rihê şoreşgerî pê re pir zêde bû. Hevalê Xebat di nav refên PKK bû, dema şoreşa Rojavayê Kurdistanê destpêkir, hat tevlî şoreşa Rojava bû. Beriya tevlî PKK ê, xwestiye di nava şoreşa Fîlîstînê de cih bigre. Li wir perwerde dîtiye û di nava wan de maye. Lê dema ku PKK ê nas dike, dixwaze di nava şoreşa Kurdistanê de cih bigre. Li wir bi salan têkoşîn meşand. Fêrî şer bû, fermandarî kir. Dema şoreşa Rojavayê Kurdistanê jî hat, tevlî şoreşê bû. Ji ber ku şervanekî Serok Apo bû, xwe bi rengî erkdar didît, xwe ber pirsiyar didît ji şoreşa Rojava. Hevalekî qehremen û xwediyê rihê leşkerî bû. Li ser teqtîk û stratejiya şer hakîm bû. Di demeke kin de xwe pêş xist. Di pêşengtiya leşkerî de cih digre û pişt re jî bingeha YPG ava dike.

Şehadeta wî, ji bo gelê Rojava û YPG windahiyeke mezin bû. Lê ez di wê baweriyê de me ku, îro hemû akademiyên leşkerî bi navê heval Xebat hatine vekirin. Ciwan li wir perwerde dibînin û tevlî nava refên YPG dibin.

Hevalê Xebat bûye xetek. Ji bo ciwanên Kurd bûye modelekî têkoşînê ku li hemberî zilmê serî radike ye. YPG îro jî li ser fikir û xeta heval Xebat dimeşe. Gelek hevalên weke Arîn û Rûbar jî li ser ew xeta hevalê Xebat û YPG tevlî nava kervana şehîdan bûn.

Hevalê Rûbar Qamişlo jî, di dema berxwedana Serekaniyê di nava şoreşê de cihê xwe girt. Malbata wî pir welatparêz e. Bavê wî li Qamişlo dostekî ewil ku Serokatî jî nas dikir bû. Di dema Serokatî de tevlî Tevgera Azadiyê bibû. Serokatî jî pir nirx dida vê malbatê. Hevalê Rûbar jî di nava vê malbatê de tevlî şoreşa Kurdistanê bû û di demên herî dijwar de şoreşgerî kir. Gelek cihan fermandarî kir.

Li ser banga berxwedana şoreşê, bi dilê xwe derbasî Rojava bû. Li Rojava risteke mezin lîst. Bi taybetî di dema rizgarkirina Til Hemis û Til Berak de fermandar bû. Di eniya pêş de bû. Di pengava rizgarkirina Çiyayê Kizwan û Girêspî de jî fermandar bû, lê di bûyereke xemgîn de şehîd ket. Şahadeta wî bi qazayekê çêbû û pir giran bû. Lewra hevalekî di pêş de bû, risteke pir mezin lîstibû. Di hemû pengavên rizgarkirinê de cih girtibû. Plansazî û pengava ku ji bo rizgarkirina Çiyayê Kizwan û Girêspî bi navê wî berdewam kir.

Pişt re me xwest, em wî derxin derva. Lê di rê de şehîd ket. Ji malbatê kesek jî negiriya. Rûmetdariyek hebû, di malbatê de. Bavê hevalê Rûbar, wefat kiribû. Lê wê dayikê sekneke pir bi rûmet nîşan da. Jixwe gelek dayikên me, dema ku zarokên wan şehîd diketin, destên xwe hene dikirin. Dayika wî mîlîtaniyek nîşan da. Got, “*kûrê min tû kesî ne mezintir e, ez pê ser bilindim.”* Di Şoreşa Rojava de, mînakên wisa gelek in. Gelek mînakên ku mirov li ser romanan binivisîne û fîlîman li ser çeke hene.

Vê berxwedanê destan çêkirin. Gelek hevalên parçeyên din hebûn. Wan sûretê şoreşê jî pirengî û mezin kirin. Mesela hevalê Devrîm hebû û şehîd ket. Dayikek hebû, kûrê wê û dû nêviyên wê şehîd ketibûn. Lê digot, *“ez ji bo kûrên xwe ne eciz im. Ez ji bo hevalê Devrîm ecizim.”* Hevalê Devrîm ji Batmanê bû, fermandarê Qamişlo bû û pir bandor li ser Qamişlo kiribû. Hezaran ciwan pê ve hatibûn girêdan. Wê dayikê hevalê Devrîm nas jî nedikir. Lê digot, “*ta ji Batmanê hatiye, zane ye, fermandar e; divê ew şehîd neketiba.*”

Mesela hevalê Genco hebû, ji Başûrê Kurdistanê bû. Hevalan weke lehengekî lê meyze dikirin. Digotin, *“an ew dîn e, an jî qehreman e, divê mirov fîlm li ser çêke.”* Lewra birîndar dibû û bijijkan digot, “*divê tu hereket nekê.”* Wisa ew bi text ve girêdidan. Lê sibê dihatin ku xwe vekiriye û dîsa çûye eniya şer. Çar-penc caran birîndar bibû, xwe derman dikir û amaliyat dibû, dîsa diçû şer. Li Cezayê, li Hesekê, li Serekaniyê digeriya. Cihekî nedisekinî.

Berê li Qamişlo pir kêm bijîjkên me hebûn. Piraniya wan ji van partiyên din bûn. Lê ji ber ku ew helwesta hevalan dîdîtin, her dihatin heval derman dikirin û niha gelekên wan jî bûne dost. Digotin, “*em ji kîjan hizbê dibin bila bibe, em bi ew rihê ku hevalê Genco pê şer dikir re ne.*” Hevala Destîna dîsa wisa bû. Hevala Viyan hebû, birîndar bû. Hat tedavî dît û hê ku baş nebûbû dîsa çû şer û şehîd ket.

Weke me got, Şoreşa Rojava şoreşeke Sûriye ye û hemû pêkhateyên Sûriye di nav de cih digrin. Lê di heman demî de şoreşa hemû Kurdistanê ye. Lewra li wir berxwedaneke Kurdistanî hebû. Hemû parçe û bajarên Kurdistanê heval di nava vê têkoşînê de bûn. Hevalekî me dibêje, *“şoreş, dîlana gelan e.”* Dema ku dawet çêdibe, her kes bi cilên xwe dikeve dîlanê. Dîlan reng û reng e. Her kes kêfxweş e. Lewra dawet e, cejn e.

Tenê ji Sûriye û Kurdistanê jî ne, bi dehan ciwanên ji Emerîka û welatên din hatine hebûn. Mesela şehîdekî me ji Avusturalya bû. Yek ji Avusturalya hat, serokê sendîqayên Avusturalya bû. Dev ji karê xwe berdidan û dihatin tevlî şoreşê dibûn. Gelek dewletan zehmetî derdixistin û digotin, “*wan vegerînin.*” Lê me digot, “*hatiye tevlî şoreşê bûye û li hemberî paşverûtiyê şer dike. Em venagerînin.”* Ji vî alî ve em kêm jî man. Ger şoreşa me baş bihata danasîn, dê li her cihên cîhanê bi hezaran ciwan tevlê bibana. Gelekan nedikarî peywendî jî çêkin.

Lê Rojava bi nav û deng bibû. Mesela berê me Rojava li gorî Sûriye tarîf dikir. Lê vê dawiyê digotin, *“Sûriye li başûrê Kobanê ye.”* Li cîhanê kesekî navê Kobanê nezane nema.

**ZELAL EFRÎN:** Beriya her tiştî Şoreşa Rojava, keda şehîdan û Rêber Apo ye. Divê mirov di vê zanebûnê de xizmetî gel bike. Dema ku mirov diçe goristanên şehîdan meyze dike; tenê li Kobanê û Girêspî di her goristanekê de çend hevalên şehîd hebûn. Lê niha ji hezarî zêdetir hevalên şehîd hene. Di nava du salan de, ew qesa şehîd ne kêm in. Me berdêlên pir mezin dan. Divê em jî layiqî wan şehîdan bin. Ji ber vê em dibêjin, Şoreşa Rojava şoreşa şehîdan e. Bi dehan hevalên şehîd jî derbasî Bakur û kantonên din kirine. Hê bi sedan jî mirovên birîndar hene. Ew yek pir bi êş e. Dema ku mirov diçe goristana şehîdan di mirov de hêrseke pir mezin çêdibe. Goristana şehîdan ya şehîd Rûstem ya Berkevirê jî wisa ye. Li Hesekê û Serekaniyê her wiha…

Di her bajarekî de goristaneke şehîdan heye. Ji bo ku Şoreşa Rojava em pêk bînin me sedan şehîd dane. Şoreş bi hêsanî çênebû. Divê mirov vê yekê tu caran ji bîr neke. Serokatî dibêje, *"divê di her carê de tu hezar carî bifikirê û gava xwe biavêjê."* Divê di her gava ku em diavêjin de, em vê rastiyê bifikirin. Şoreş bi vî rengî çêbû.

Ji ber vê jî divê em pergala xweseriya demokratîk ava bikin û hemû gelên li Rojava em hembêz bikin. Divê em ti caran xwe ji bîr nekin û nekevin xefletê. Divê em her vê pergalê ava bikin û bi gel bidin nas kirin. Mesela Şoreşa Rojava cîhan hejand, lê hinek Kurd hene hê jî dûrî me disekinin. Divê em di vê derê de kêmasiya xwe bibînin. Divê em li xwe mikur werin ku ev mirov çawa bandor nabin û nayên guhertin. Lewra Şoreşa Rojava mîraseke pir mezin e, lehengiyên pir mezin hatin jiyankirin. Ji ber vê yekê ji milê wîjdanî ve divê mirov rexnedayineke ji dil bike û li hemberî gel û şehîdan sozeke bi vî rengî bide. Em li ku ne û pratîka me çi ye û ji aliyê din ve lehengiyên ku hatine jiyankirin li ku ne? Divê mirov bide ber hev. Divê hemû hevalên di şoreşê de pêşengîtî kirine û weke tevger em ji van jiyankirinan danehev û waneyan derbixin. Hem weke kes xwe di ber çavan re derbas kirin, hem jî weke tevger û pergal kêmasiyên heyî tehlîl kirin girîng e.

Divê mirov van danehevan jî ji bo şoreşê bike mîras. Pergala Şoreşa Rojava çawa hat avakirin, kêmasiyên me çi bûn û me çi bikirina dê baştir bûbûya? Ji bo tiştên kêm mayî û tiştên ku pêk nehatine em rexnedayineke ji dil bikin û li ser vê lêhûrbûneke bikin.

Weke me got, qada Rojava qada Rêber Apo ye. Ji 20 salan zêdetir li wê derê xebat meşandiye û gel perwerde kiriye. Şoreşa ku îro tê jiyankirin jî berhema keda Rêber Apo û şehîdan e. Divê em bizanibin ku her tiştî ji me destpê nekiriye. Qesî seriyê derziyekê me kar tê de meşandiye. Ji bo vê jî divê em Şoreşa Rojava diyarî Rêber Apo bikin. Divê em diyarî Rêber Apo û şehîdan bikin. Hesreta sedan salan bû ku azadî pêk were. Li Rojava ew çêbû, hezimkirinek jî heye. Xeyal û xewna şehîdên me bû. Dema ku îro em di bin ala kesk û sor û zer de zarokên ku bi zimanê xwe perwerde dikin û dibînin, ew me şad dike. Milekî heqîqeta azadiyê ev e.

Di Şoreşa Rojava de, her kêliya ku hatiye jiyankirin romanek e. Ji milê bîrdozî û rêxistinê ve jî mirov dikare binirxîne. Lê ya esas li wê derê çi kar pêkhat û tiştên ku hatine qezenckirin çi ne? Me berdêlên pir giran dan, nirxên ku hatine pêş xistin hene. Kedeke mezin ya Rêber Apo heye. Divê mirov di ferqa vê de be û bi wîjdanî nêzik bibe. Mirov bi rojan jî li ser biaxife têrê nake. Em dikarin bibêjin Şoreşa Rojava û lehengiyên li Kobanê jî, bûne parçeyekî nirxên tevgera me. Tevlî berxwedan û remzên me yên dîrokî bûye. Mîrasekî mezin hatiye avakirin.

Ji milê zîhnî û rihî ve jî divê guhertinên bingehîn çêbibin û şoreş mayinde bibe. Bi vî rengî pergala xweseriya demokratîk bê rûnişkandin. Divê neyê jibîrkirin ku dema Şoreşa Rojava tengav bûye jî careke dîtir bi bang û perspektîfên Rêber Apo xwe bi rê ve biriye. Serokatî got, *"ez gelê Rojava nas dikim, dê gel li ber xwe bide û têk naçe."* Ji bo vê jî em şoreşê diyarî avakarê wê dikin. Lewra yê ku ew gel çêkir jî Rêber Apo ye. Em hêvî dikin ku Serokatî jî demek beriya demekê ji nava çar dîwaran derkeve. Serokatî îro di nava çar dîwaran de be jî, heqîqeta Serok Apo di Şoreşa Rojava de pêk tê. Dîrok û heqîqet di şexsê Rêber Apo de tê jiyankirin.

**BERÎTAN DÊRÎK:** Di cihanê de cihekî ku ji Şoreşa Rojava bandor nebûye, tine ye. Tevahî cîhan jê bandor bûye, bi taybetî bi berxwedana Kobanê, Şoreşa Rojava li hemû cîhanê belav bû. Bi sedan şehîdên ku bi xwîna nehiliştine Kobanê bikeve jî em careke dîtir bi bîrtînin. Di destpêkê de gelê Bakur, gelek derdorên ku me qet nas nedikirin tevlî berxwedana Kobanê bûn û di nava her beşeke Şoreşa Rojava de jî tevlêbûna xwe dan çêkirin. Ew jî cihekî serbilindiyê ye. Em deyndarên wan şehîdan e ku ew destanên mezin li Kobanê dan avakirin.

Bi kurtasî em dikarin vegotinên xwe bi vî rengî bînin ziman. Lê em çi bibêjin jî dê kêm bimîne. Bi taybetî di mijara vegotina şehîdan de, mirov çi bibêje û çi bike jî kêm dimîne. Me gelek hevalan ve kar meşand, jiyan parve kir û pişt re şehîd ketin. Gelek hêvî, daxwaz û xeyalên wan yên nîvço mayî hene. Bi pêkanîna van daxwaz û xeyalan em dikarin ji şehîdan re bibin bersiv. Bi di her kêliyê de zindîkirina bîranînên wan, mirov dikare layiqî wan bibe.

Bi taybetî gelek fermandarên ku salên dirêj li qadên cûda yên têkoşînê mane û di Şoreşa Rojava de bi xwîna xwe dîrok nivîsandine, destan çêkirine; divê her kêliyê de bên bi bîranîn û têkoşîna wan xwedî bê derketin. Ew yek di mirov de ponijandin û lêhûrbûneke jî dide avakirin û rêka me ya têkoşînê jî ronî dike. Her hevalek ku bi wan hevalan re jiyan kiriye û bûye şahîdiya lehengiya wan, li gorî jêhatîbûna xwe divê berxwedan û bîranînên wan her zindî bike.  Ew erka me ya sereke ye.

**DIJWAR SERÊKANIYÊ:** Ez car din bi berxwedaniya Kobanê dixwazim dawî li axaftina xwe bînim. Berxwedaniya Kobanê, em çiqas vebêjin jî em nikarin heqê wê bidinê. Gav bi gav, metro bi metro şer hate kirin. Rast e, li cîhanê deng veda. Hêzên YPG û YPJ rola xwe lîstin û mohra xwe dîrokê dan. Lê yê ku rih da vê berxwedanê kî bû, yê ku ew rih afirand kî bû? Rêber Apo bû. Ger ew wêrekiya Apoger ne li şervanan re bûya, ew berxwedan nedigihêşt vê merhaleyê.

Gelek arteş û dewlet hene, derfetên wan jî heya dawî hene; lê nikarîn li hemberî van çetayan şer bikin. Lê şervanên YPG û YPJ û gelê Kurdistanê, bi perspektîf û ramanên Rêber Apo berxwedanek mezin kirin. Ger Tevgera Azadiyê ew rih nedabûya wî gelî, fedakariyeke wisa mezin çênedibû. Rûxmî ku me gelek birîndar û windahî jî dan, careke din danehev çêbûn û êrîş hat kirin. Ji bo ku em welatê xwe azad bikin, li hemberî ew çeteyên ku ji bo hemû mirovahiyê xeterî ne me şer kir. Yên ku ew şikenandin şervanên Rêber Apo bûn.

Di pergala me de çiqasî kêmasî hebin jî, bi berxwedaniyê ew kêmasî ji holê hatin rakirin. Ger berxwedaniya Kobanê bû dîrokî û her kes behsa Kobanê dike, ew bi fikir û ramanên Rêber Apo û keda şehîdan e. Bi sedan heval birîndar bûn, sedan heval şehîd ketin. Ji bo azadiyê berdeleke pir giran e. Li ser Kobanê tiştên ku tên gotin û cîhan behsê dike kêm in, ne zêde ne. Divê zêdetir bê ziman. Lewra li tû cihan ew mînak nehatiye jiyan kirin. Hemû dewletan bi hêza teknîka xwe ya pêşketî nikarîn li hemberî van çeteyan bisekinin, lê hevalên me bi qilêş, bawerî û vîna xwe ew çete şikenandin û pêşve çûn.

Ger me ew qesa şehîd dane, ji ber kêmasiyên me ne. An na ne ji ber xurtbûna dijmin e. Me dikarî bi windahiyeke kêmtir, serkeftineke mezintir bi dest bixista. Ger em zêdetir rêxistinkirîbana û me di cih de pengav biavêtana, ew qesa berdel nedihatin jiyankirin. Dîsa jî ger em îro gihêştibin serkeftinê û ew berxwedan ji bo gelê Kurd û gelê Ereb bûbe hêviyek, her kes dîtibe mirov dikare van çeteyan bişkîne, ev hemu ji ber keda şehîd û ew berdelên ku hatine dayin ve pêş ket. Ne şert e ku teyareyên mirov hebin, tevgera me bi vîna Apoger ew êrîş şikenandin.

Gelek zilm û zor li ser gel hate kirin; gel malê xwe berdan, warê xwe terikandin. Gelek malbatên me du-sê şehîd dan. Gelek mirovên zewicîne û xwedî malbat in, ji bo welatê xwe xwîna xwe rijandin. Ew serkeftin bi keda van mirovan çêbû. Gelek hevalên ku seqet mane hene, xwîna xwe kêlî bi kêlî rijandine.

Çar aliyên Kurdistanê tevlêbûna vê berxwedanê çêbû. Li Bakurê Kurdistanê jî serhildanek cûda çêbû. Gelê me yê Bakur, rih û felsefeya ku ji Rêber Apo girtiye di vê berxwedanê de nîşan dan. Madî û manewî her îmkanên xwe pêşkeşî tevger û şervanên xwe kirin. Her sê parçeyên din jî tevlêbûneke bi dil çêbû, gelek qehremanên van parçayan şehîd ketin. Şehîd Genco, Şehîd Destîna û Şehîd Gîvara bûn lehengên Başûrê Kurdistanê. Gelek hevalên din yên Başûrî ku heya kêliya xwe dawî şer kirin û şehîd ketin. Hevala Rojen û hevala Rojbîn û gelek hevalên din ku yên Rojhilatê Kurdistanê hatine û canê xwe dane hebûn. Gelek heval ji Bakur hatin Kobanê û xwîna xwe li Kobanê rijandin. Hevalê Gelhat û hevalê Gulan mînakên herî xurt û zindî ne.

Rojavayê Kurdistanê jî gelek malbatên me, bi tevahî bajarên Rojavayê Kurdistanê tevlî vê berxwedanê bûn û li Kobanê canê xwe dan. Ew tû caran naye jibîrkirin. Em jî weke şervanekî vî gelî, bi vî gelî serbilind in. Em soz didin ku em ê di riya van hevalan de armancên wan pêk bînin. Xwesteka wan azadiya gelê wan û azadiya welatê wan bû; li ser esasê felsefeya Serokatî, pêkanîna konfederalîzma demokratîk li Rojhilata Navîn bû.

Careke din em şehîdên xwe bi bîrtinin bejna xwe li ber wan ditewînin. Em soz didin ku em ê heya dawiyê, riya Rêber Apo û şehîdên xwe esas bigrin û armancên wan pêk bînin.

**DILDAR KOBANÊ:** Weke encam ez bibêjim, şehîdan tiştekî ku em bibêjin ji me re nehiliştin. Tiştê ku em bikin, şopandina riya wan e, şopandina riya serokatî û pêkanîna xeyalên van şehîdan e. Gelek hevalên ku me nas kirin û me bi hev re xebat meşand û jiyan kir, niha ne di nava me de ne. Ger dervayî şopandina riya wan û pêkanîna xeyalên wan, mirov tiştekî din bixwaze û li ser tiştekî din bihizire, dê ew bibe bê wîjdanî.

Îro û pê ve jî pêşiya me vekiriye. Dibe ku hê jî li ser me komkujî tên çêkirin. Lê rûxmî vê jî, cara yekeye ku gelê me ew qesa nêzî hev bûye. Çiqasa nêzî hev dibin jî, ew qesa nêzî azadiyê dibin. Divê em guhê xwe bidin bangawaziyên dîrokê û bangawaziyên şehîdan. Ger qesî serî derziyekê jî em pê re bibin bersiv, wê demê em ê bigêhêjin miradê xwe. Lê ger em nikarin bibin bersiv, dê dîrok jî, mirovahî jî me mahkûm bike.

**AYTEN SERÊKANIYÊ:** Ew mijarên ku me anîne ser ziman, beşeke biçûk ya berxwedana ku di nava vê şoreşê de hatine jiyîn in. Bêguman têrê nake. Şerekî bêhempa li Rojavayê Kurdistanê hat meşandin û ew zîhniyeta ku heye di astekê de şikest. Dijminê me, ne tenê DAIŞ bû, destê hêzên navnetewî jî tê de hebû. Destê dewleta Tirk jî tê de hebû. Herkesî li gorî berjewendiyên xwe dixwest li ser Rojava konevaniya xwe bimeşîne.

Ya ku mohra xwe li Rojavayê Kurdistanê xist jî YPG û YPJ bû. Lehengî û berxwedaniyeke pir mezin hate meşandin. Hemû hevalan sînga xwe dan ber hemû zehmetiyan. Şerên ku hatin pêş xistin, ne normal bûn. Cara yekemîn di nava bajaran û deştan de şerekî bi vî awayî dihat meşandin. Çi ji milê zehmetiyan ve be, çi ji milê

teqtîkan ve be, çi jî ji milê plansazîyan ve be; gelek hewldanên xurt hatin nîşan dayin. Em niha çiqasa behsa berxwedaniyên ku li vir hatine jiyîn bikin jî, wê kêm bimîne. Lê şoreşek hate avakirin û di nava vê şoreşê de gelek kêliyên dîrokî yên berxwedanê hatin jiyankirin.

Bi taybetî jî li hemberî DAIŞ'ê rihekî fedaî yê şehîd derket holê. Gelek hevalên weke Dilovan, heval Çekjîn, hevala Jiyan Ares, hevalê Akîf, hevala Ozlem, hevalê Xemgîn, hevalê Rûbar Qamişlo, hevala Dîcle Serhat jî pêşengîtiya vê berxwedanê kirin û navê xwe bi tîpên zêrîn li dîrokê nivîsandin. Mirov dikare navê sedan hevalên wisa bihejmêre. Çi serkeftin çêbibe jî, di pêşengiya van hevalan de çêbû.

Di nava vê şoreşê de danehevên pir xurt jî çêbûn. Encamên hatin bi dest xistin jî pir mezin bûn. Bû sedem ku çavê her kes bizîvire ser berxwedana Rojavayê Kurdistanê. Bi taybetî berxwedana ku bi Kobanê destpê kiriye û li Cizîrê berdewam kiriye, ji hemû cîhanê re da nîşandan ku hêzeke ew qesa xurt ku li hemberî hovitiya DAIŞ'ê dikare şer bike heye. Hêz û vîneke wisa derket holê. Şer û berxwedana ku hat meşandin, li cîhanê û Rojhilata Navîn temsîliyeta mirovahiyê kir. Gelek derdoran qebûl kir ku tenê şervanên ku bi bîrdoziya Apogerî tevdigerin, dikarin li hemberî ew zîhniyeta DAIŞ'ê şer bikin. DAIŞ'ê bi xwe jî ew rastî qebûl kir. Lewre ji derveyî me ti kes nikarî li hemberî wan serî rake û li ber xwe bide. Zîhniyeteke dagirker û bê wîjdan bû. Bi her şêwazê dikarî êrîş bike. Yên ku li hemberî wê rastiyê sekinîn, tenê hêza YPG û YPJ bû.

Li ser wê esasê mirov dikare bibêje li Rojavayê Kurdistanê, gelek encamên mezin hatin destxistin û gelek berhemên giranbiha hatin afirandin. Ew hem ji milê vîna mîlîtaniyê ve hem jî ji milê baweriya gel ve û wisa ye. Berxwedanên pir mezin hatin kirin, şehadetên pir bi nirx çêbûn. Her şehadetek jî dibû sedem ku hêrsa tolhildanê xurtir bibe û hêza YPJ û YPG mezintir bibe û vîn û bîryara têkoşînê teqeztir bibe. Li hemberî êrîşên ku têne ser welatê me, xwe kirina hêzeke herî xurt û têkoşînek pir dijwar meşandin barekî şoreşê bû. Di bingeha hemû tiştan de jî berxwedana wan hevalên leheng hebû. Têkoşîn û berxwedana wan, di asta herî jor de hêza YPJ û YPG da diyarkirin. Ger ew nebûya, ew qesa pêşketin jî çênedibûn.

Şoreşa Rojava, hem li Rojavayê Kurdistanê, hem jî li cîhanê bandoreke pir mezin çêkir. Li hemberî hemû dinyayê jî hate îspatkirin ku hêzeke dikare xwe li ser lingan bigre, gelê xwe biparêze û dikare bi vîna xwe, xwe bi rê ve bibe. Hêzeke bi vî awayî derket holê. Her wiha milê wê yê siyasî jî bi vê berxwedanê pêş ket.

Mirov dikare bibêje, Şoreşa Rojavayê Kurdistanê di şexsê hevalê Rûstem Cudî û Xebat Derîk de destpê kir û di şexsê wan hevalên ku herî dawî li ber xwe dane û şehîd ketine de jî berdewam kir.

Di nava şerên bi vî rengî de, kî teqtîkên dewlemend bi kar bîne ew bi ser dikeve. Di kû de lewazî hebûya, di wê derê de binketin çêdibû. Mesela lewaztiyeke me ya biçûk jî pir zirar dida me. Dijmin dixwest her qelsî û lewaziya me bi kar bîne û şoreşa me têk bibe. Lê di saya berxwedêrên şoreşê de, ti caran jî bi ser neket. Di şexsê wan hevalan de, şoreş jî li ser zîhniyet, vîn û fedakariyeke pir mezin hate avakirin. Em baş dizanin ku têkoşîna hate meşandin kêm hatiye ziman, lehengên ku derketine têra xwe nehatine vegotin. Lê em dikarin bibêjin ku di dema şoreşê de rojeke Rojavayê Kurdistanê vala derbas nebûye. Di her rojekê de lehengî û berxwedanî hene.

Niha jî hemû heval di nava çeperên şer yên parastinê de ne. Da ku şoreş bê parastin, da ku gelê me bê parastin. Ew jî bi vîn, bawerî û hêza cewherî çêdibe. Berxwedana ku destpê kiriye, bi heman şêwaze bêrdewam dike. Mirov dikare bibe şopdarê wan şehîdan, armancên wan pêk bîne û di riya wan de bimeşe. Tenê bi vî awayî em dikarin xwedî li wan pakrewanan derkevin. Divê em heqîqeta Serokatî ku di şexsê Şoreşa Rojava û berxwedana wan lehengan de derketiye bişopînin û têkoşîna wan bilind bikin. Mirov dikare hemû hêza xwe bixe xizmeta vî gelî û di şexsê wan hevalan de serkeftinên pir mezin bi dest bixe.

Xwestek û baweriya wan hevalan pir xurt bû, dixwestin rastiya şoreşê ji her alî ve bibînin û jiyan bikin. Gelek hevalan gava xwe avêtin ser xaka Rojava û şehîd ketin. Coş û kelecaniya wî gelî dîtin, lê nikarîn pir zêde di nav de jiyan bikin. Em dikarin ew xwestek û xeyalên wan her zindî bihêlin. Dema ku ew heval şehîd diketin, me li lenûskên wan meyze dikir. Hemû nivîsên wan li ser hevalên ku beriya wan şehîd ketine bû! Jiyana şehîdan ji xwe re dikirin mînak û li ser heqîqeta Serokatî ku niha berxwedana herî mezin dide meşandin, jiyan dikirin. Ger hincetên mirov yên azadiyê ne pir mezin bin, mirov nikare di nava wan şert û mercan de bimîne û têkoşîn bike. Bi wê rastiya Serokatî ve girêdayî, bîryarbûn û baweriya wan hevalan jî li ser esasê xizmetkirina gel û azadbûnê bû. Ji bo ku bikaribin xwe bigihînin rojeke wisa, têkoşîneke bi vî rengî pêwîst dikir. Ji ber wê jî gelek hevalan canê xwe feda kirin û gihiştin mertebeya herî mezin. Li ser vê esasê gelek hevalan çalakiyên fedaî pêş xistin, bê fikar êrîşî ser dijmin kirin û dijmin şikandin. Ew bû bawerî, hêz, moral û hêzeke bingehîn ku her tim wê bê şopandin…

**MERYEM KOBANÊ:** Bi rastî jî bi xeta stur me xwest em heqîqeta ku hatiye jiyankirin bidin diyar kirin. Lê ev rastiyeke ku di vê berxwedaniyê de her rastiyên ku hatine jiyan kirin bi pirtûkan mirov dikare bide diyar kirin. Divê destan û film li ser wan were çêkirin.

Ez di wê ferqê de me ku tişta ku hatiye jiyankirin li gorî tê xwastin û li gorî heqîqeta wê anîna ziman zehmet e. Jixwe mirov çi bike jî, mirov nikare ew tiştên ku hatine jiyan kirin bi awayekî giştî bîne ziman. Bêguman dîrokek

hate nivîsandin, ew dîrok jî bi awayekî zindî nivîsandin girîng e. Tiştên ku em jê dersan derbixin û kesayeta xwe li hemberî wan ber çavan re derbas bikin pir in. Lê zehmet e ku mirov bibe şahîdê ew qesa destan û hevaltiyê bi ew qesa rêhevalan re bikê. Ji aliyê din ve pir bi êş e. Tu di jiyana xwe de, di her kêlî û deqîqeyekê de tu bi hevalekî re jiyan dikê û lehengtiyeke re rû bi rû dimînê.

Ez ji bo wan hevalên leheng bibêjim, şoreşgerên kenê wan xilas nebûyî. Bêyî ku kenê wan yê ser levan xilas nebûye, li keleka te şehîd dikevin. Pir bi êş e. Lê ez di wê ferqê de me ku rizgarkirina welatekî û azadî jî ne hêsan e. Ger em ji milê bîrdozî û felsefî, felsefeya gerdûnî ve lê nenêrin, em nikarin rakin. Ji bo wê dema ku em van hevalan tînin ser ziman, ez dizanim ku min haqê wan nedayê. Li gorî ku berxwedanên hatine jiyîn, tiştên ku me gotine; çariyekê wê jî îfade nake. Tenê weke bibîranîneke wê ye.

Weke me berê jî got, li her xaniyekî, gaveke, bostekê weke kêleheke ne. Di her cihî de berxwedan hatiye kirin. Gotinên her hevalek, bi qesî destaneke ye. Hewldanên wan ku hiştin ew rih were ava kirin, bi serê xwe tiştekî cuda ye. Nizanim, em ê çiqasa bikaribin layiqî wan bibin û xwedî li wan derkevin. Bi heqîqeta wê re divê em jiyan bikin û bidin jiyankirin; bêyî ku tu ferq bixê navberê, bêyî ku tu bikevê nava fikarên cuda. Da ku ji mezinên Kurd re bibe dîrok û lehengtî, ji zarokên wan re jî bibe çîrok. Divê her mirovek dema destana van hevalan guhdarî kir, pê re bibe hêviyeke pêşerojê. Dema jineke ku ketiye nava zor û zehmetiyan, ew dîrok guhdar kir jê re bibe deriyekî rizgariyê.

Di lêgerîn, gotin û sekna her hevalek de, em dikarin viya bibînin ku şexsiyetên ku mirin bê wate kirin bûn. Yên ku wê jiyanê bi wate bikin jî, hevalên ku li pêy wan mane ne. Ew yek berpirsyariyeke pir mezin dide ser milên me. Divê em vê heqîqetê tenê bi hestan negrin dest, bi fikir ve bikin yek û ji xwe re bikin mîraseke jiyanê.

Em bûn şahîdê ew qesa hevalên bi hêrs, xwedî hêz û vîn ku em bi salan jî lêhûrbûn bikin. Tiştê ku me li ser piyan digre jî, bîranînên wan hevalan e. Kêliyek be jî min xwest ez bi we û hemû mirovahiyê re parve bikim. Lewra êdî ew heval û lehengtiyê ku kirine, mîrasa hemû mirovahiyê ye. Li ser esasê ku mirov bike malê dîrokê, divê mirov giştî bike. Weke kes jî ez ê bîranînên wan hevalan her bikim nexşereya jiyana xwe ya şoreşgerî.

Careke din di şexsê jinên ku di wê derê de berxwedanî kirin, bi taybetî di şexsê keçên Kobanê de bejna xwe ditewînim. Ya rast jina Kurd, di wê derê de rihê îxanetê têk bir. Rihê ku hatibû cemidandin, ji nû ve zindî kirin û bêhêvîtî parçe kirin. Jiyaneke nû afirandin. Her hevalek rengekî cuda bû. Kêliyeke be jî, tiştên ku li wir hatine jiyîn bûn hêviya mirovahî.